FETWAYÊN
KURDÎ

Amadekar

Haşim ÖZDAŞ

NAVEROK

PÊŞGOTIN 1

KURTEBÊJE 5

BEŞA YEKEM

BAWERÎ 8

1. Ma Xwedê Teala li ku ye? 8
2. Ma têgihîştina Xwedê bi awayekî tam, guncaw e? 10
3. Ma "Rebb/Perwerdegar", di nav Esmayê Husna de cih nagire? 11
4. Xeyb çi ye? Baweriya bi xeybê çawa pêk tê? 12
5. Ma baweriya me, divê ku bi rêya aqil be? 15
6. Di axirzeman de ma divê îmana mirov mîna ya pîrejinan be? 15
7. Kesê jiyana xwe di rêya Xwedê de borandibe, ma di sekratê de bê îman diçe? 17
8. Ma di sekratê de pelîd tê ku îmana mirov bistîne? 18
9. Gelo raserbûna Xwedê ya li ser 'erş, tê çi wateyê? 20
10. Haşa, ma qudreta Xwedê ya afirandina kevirekî ku nikaribe hilgire heye? 20
11. Ma gunehê şirkê bi tu awayî nayê bexşandin? 21
12. Ma li gorî Qur'anê, kesên ku bi hebûna Xwedê bawer nakin, kafir in? 22
13. Ma şeytan bêaqil e ku li ber Xwedê rabû? 23
14. Şeytan çima bû kafir? 24
15. Tirsa şeytên ya ji Xwedê Teala, tê çi wateyê? 25
16. Gelo firqeya naciye/xelasbûyî kîjan e? 26
17. Gunehên mezin kîjan in? 28
18. Digel em misilman in, çima hîn jî em ji Xwedê hîdayetê dixwazin? 32
19. Ma pirsyarî û lêpirsînên di derheqê Xwedê yan jî afirandinê de, mirov dike kafir? 33
20. Ma Xwedê Teala jirêderketina însanan dixwaze? 34
21. Ma Xwedê dixwaze hin kes, li ser kufrê bimirin? 36
22. Ji alimên berê, yekî ku ayeta 4an ji sûreyê Îbrahîm mîna we fêhm kiribe heye? 37
23. Tekfîra ehlê qibleyê tê çi wateyê? 39
24. Hûn dikarin di mijara ku xêr û şer ji Xwedê ye, me agahdar bikin? 39

25. Ma bikaranîna bêjeya “reb”, “seyyid” û “mewlana” ji bo însanan durist e? 40
USÛLU'L-FIQIH 42
26. Xwedê Teala ji me çi dixwaze? Çi naxwaze? 42
27. Ferz çi ye û cureyên wê çi ne? 42
28. Helal çi ye? Ma hûn dikarin tarîf bikin? 45
29. Heram çi ye û cureyên wê çi ne? 46
30. Ma têgehên mîna wacib, mekrûh, musteheb çawa pêk hatine? 48
31. Aqil çi ye? 49
32. Keçeke neh salî eger ketibe cilan, ma ji aliyê olî ve dibe berpirsyar? 49
33. Îctihad çi ye? 50
34. Tiştên ehliyeta mirov ya edayê ji holê radikin çi ne? 52
35. Gelo rewşa kesên şizofren ji aliyê berpirsyariyê ve çi ye? 54
36. Hukmê kesên fasiq çi ye? 55
37. Ma di Îslamê de borîna demê heye? Eger hebe jî dema wê çiqas e? 56
38. Ma hemû helwestên Pêxemberê me ji me re sunet in? 59
39. Biryarên Pêxember (s.a.w) ên ku bi wesfê serokê dewletê dane 59
40. Seddî zerayi‘ çi ye? 61
41. Da ku mirov Qur’anê baştir fêhm bike, ma ‘ilmê mentiqê ji mirov dibe alîkar? 61
42. Di têgihîştina wateya Qur’anê de, gelo ferhengên zimanê ‘Erebî çiqas ewle ne? 62
43. Kesên ayetên Xwedê Teala li gorî îctihadên xwe şîrove dikin 64
44. Gelo erk û wezîfeya Pêxember ya ravekirina Qur'anê heye? 65
45. Tebyîna Pêxember ya Qur'anê ma ne ravekirina wê ye? 65
46. Eger her kes bikaribe xwe bigihîne hikmetê, ma çi hewcedarî bi pêxemberan dimîne? 67
47. Ma Pêxemeberê me heta ku ayeta dawî daket, wî ji Qur'anê hikum nedaye? 68
48. Di serdema pêşîn de ji bo têgihîştina wateya Qur’anê, karê komxebat dihate kirin? 69
49. ‘Iletên qedexeyên Qur’anê li gorî çi tên tesbîtkirin? 70
50. Ma Henefiyan, dema seferê/rêwîtiyê bi qiyaseke çawa diyar kirine? 71
DESMÊJ 73
51. Ma di serdema Pêxember (s.a.w) de di dewsa sabûnê de çi bikar dianîn? 73
52. Ma mirov dikare li ser piyan mîz bike? 74
53. Di desmêjê de îstibra çawa tê kirin? 74

54. Ma misilmanan, nimêjên xwe li Mekkeyê bi desmêj dikirin? 75
55. Ma mirov dikare li qedemgehê desmêj bigire? 76
56. Ma di desmêjê de şûştina hundirê çavan jî ferz e? 76
57. Ma mirov dikare bi lensan desmêj bigire? 77
58. Ma mesihkirina serî di desmêjê de çawa tê kirin? 77
59. Hukmê mesihkirina paş stû çi ye? 77
60. Ma di desmêjê de muwalat ango şûştina endamên desmêjê li pey hev, ferz e? 78
61. Kesê ferzeke desmêjê jibîr bike, divê çi bike? 78
62. Ma pîrek piştî meshkirina guhan, paşiya stûyê xwe jî mesih dikin, an na? 79
63. Kesên nexweş dê çawa desmêj bigirin? 79
64. Di mezhebê Henefî de, mesihkirina li ser goreyan çawa tê kirin? 81
65. Bikaranîna xufikan, ma dibe sebebê kêmbûna xêra desmêjê? 82
66. Ma dema mesihkirina li ser xufikan, kengî dest pê dike? 82
.67 Ma xew û baberdan desmêjê dişikînin? 83
68. Desmêja kesê ku îdrara wî di torbeyekî de tê komkirin, kengî dişikê? 84
69. Ma kişandina cixarê, desmêjê dişikîne? 84
70. Ger zilamekî biyanî porê pîrekekê bibîne, gelo desmêja wê dişikê yan na? 85
71. Ma kenê bideng, desmêjê dişikîne? 85
72. Ava spî ya ku ji pîrekan tê, gelo desmêjê dişikîne yan na? 86
73. Ma pîreka li derve servekirî be, nimêja wê qebûl dibe? 86
74. Gelo bi desmêjekê, çend nimêj tên kirin? 87
75. Duayê desmêjê, çawa tê kirin? 88
76. Ma di secdeya tîlawetê de, divê ku mirov bi desmêj be? 88
77. Ji bo destdana Qur'anê ma divê ku mirov bi desmêj be? 90
78. Ma pîreka bi cenabet, dikare şîr bide zaroka xwe? 91
XUSUL 92
79. Menî, mezî û wedî çi ne? 92
80. mirov çawa xuslê ji ser xwe radike? 92
81. Niyeta xuslê çawa tê anîn? 94
82. mirov dikare bi rakirina xuslê bi tenê nimêj bike, an divê mirov desmêj jî bigire? 94
83. Dagirtina diranan, ma dibe asteng bo rakirina xuslê? 95

84. Ma mirov di serşokê de zêde bimîne guneh e? 96
85. Ma xusul kengî li ser mirov ferz dibe? 96
86. Tê gotin ku di binê her mûyekî de cenabet heye. Gelo ev rast e? 97
87. Ma pîrek jî bi cenabet dikevin? 97
88. mirov dikare kincên di dema cenabetê de piştî rakirina xuslê dîsa lixwe bike? 98
89. Gava mirov bi cenabetî li nivîna xwe razê û piştî rakirina xuslê dîsa lê rakeve ma careke din xusul lazim dike? 100
90. Destdana kesê bi cenabet, kincan nepak dike? 100
91. Di rakirina xuslê de gelo şûştina qulên guharan jî şert e? 101
92. mirov heta kengî dikare bi cenabet bisekine? 101
93. Kesê xusla xwe ranekiribe û miribe, rast e ku dê di dojehê de bişewite? 102
94. Muslimanên ku nimêj nakin, ma divê ku ew jî xusla xwe rakin? 102
95. Piştî muayena jinekolojiyê ma lazim e ku pîrek xusla xwe rakin? 103
96. Piştî tedawiya bo çêbûna zarokan ma divê ku pîrek xusla xwe rakin? 103
97. Pîreka ku li cem bijîşkekî zilam muayene bibe, ma lazim e ku xusla xwe rake? 103
98. Nexweşê ku tedawiya radyoterapiyê dibîne, ma dibe ku teyemum bigire? 104
99. Ez nexweş im. Heta ji nexweşiya xwe baş bibim ma ez dikarim xwe neşûm? 105
100. Bikaranîna bandên akupunkturê gelo dibe asteng bo rakirina xuslê? 106
101. Li malên ku ava germ lê tune ye, mesela desmêj û xuslê dê çawa bê çareserkirin? ... 107
102. Di rewşên ku em nikarin xwe bişon de ma dibe em teyemum bigirin? 107
103. Di xuslê de ma divê ku pîrek guliyên xwe vekin? 108
104. Piştî têkiliya cinsî bi saetekê menî parçe parçe diherike, divê ez çi bikim? 109
105. Ma ramûsan xuslê lazim dike? 110
106. Di pêwendiya cinsî de kengî xusul lazim dike? 110
107. Ma divê mirov çend gavan bimeşe û piştre xusla xwe rake? 111
108. Ma pîrek dê çawa xusla xwe rakin? 111
109. Gelo ji mêr û jinê divê kîjan berê xusla xwe rake? 112
.110 Piştî ku xwînmeha pîrekê biqede, ma dikare bi zilamê xwe re rakeve? 112
111. Eger piştî xuslê cihekî ziwa ji bedenê mabe divê mirov çi bike? 114
112. Qirêja ku ji guhan derdikeve ma xuslê betal dike? 114
113. Ma rast e ku bi dîtina avê teyemum betal dibe? 114
114. Ma dîn jî xusla xwe radikin? 115

XWÎNMEH 117
115. Ma pîreka di xwînmehê de dikare bikeve mizgeftê? 117
116. Ma nîkaha pîreka di kirasa de tê birîn? 117
117. Cezayê pêwendiya cinsî di rojên qedexekirî de çi ye? 117
118. Eger 40 roj ji çilê pîrekê derbas bibe, divê çawa tev bigere? 118
119. Ma pîrekek di hefteyekê de dibe ku du caran têkeve cilan? 118
120. Ma dema xwînmeha pîrekan kengî diqede? 119
121. Pîraka ku dema cilê wê xelas bûbe û dîsa jî xwînê bibîne, dê çi bike? 119
122. Ji ber tedawiya spîralê xwîna ku berî dema adetê tê, ma dibe asteng bo nimêjê? 120
123. Ma zilam dikarin di mijarên mîna xusul û heyzê de pîrekan agahdar bikin? 120
124. Madem bawermend necis nabe, jina di cila de çima ne paqij tê pejirandin? 121
125. Pîreka di heyza de be dikare Ke'beyê tewaf bike? 122
126. Pîreka di heyza de ma dikare biçe serdana goran? 123
QILIFKIRINA DIRANAN 125
127. Ma qilifkirin an jî dagirtina diranê ku naêşê, caiz e? 125
128. Gelo çêkirina diranan caiz e yan na? 125
129. Dema mirov bi cenabet be ma durist e ku mirov diranê xwe dagire? 125
130. Dagirtin an jî qilifkirina diranan, ma dibe asteng ji bo rabûna xuslê? 126
131. Di mijara dagirtina diranan de, 'emelkirina bi fetwayê mirov ji berpirsyariyê xelas dibe? 127
CENAZE 128
132. Hukmê girî û xemgîniya ji bo miriyan 128
133. Ma nimêjkirina li ser mirî û definkirin ji kengî ve heye? 130
134. Gelo kurê bavê me Adem, çima definkirina termê birayê xwe ji qijakê hîn bûye? 131
135. Li ser kê nimêja cenaze tê kirin û li ser kê nayê kirin? 132
136. Ma mirov dikare termê miriyên xwe bişewitîne? 133
137. Gelo çima goştê hin însanên mirî, narize? 134
138. Hukmê nimêja li ser zarokên ku ji ber diya xwe çûne çi ye? 134
139. Ma mêr dikare jina xwe ya mirî bişo? 137
140. Piştî mirina zarokên biçûk, divê mirov çi bike? 138
141. Hukmê kirina nimêja mirî piştî definkirinê li ser gorê çi ye? 139
142. Ma pîrek jî dikarin beşdarî nimêja cenaze bibin? 140

143. Piştî definkirinê, ma pêwist e ku telqîn jî bê xwendin? 140
144. Ma bi rastî jî telqîna li ser miriyan sunet e? 141
145. mirov kengî dikare li cihê teziyê xwarinê bixwe? 143
146. Hukmê beşdarbûna merasîma cenazeyê kesên xeyrimuslim çi ye? 144
147. Ma xêra sûreyê Yasîn û hwd. digihîje ber destê miriyan? 145
148. Ma di Îslamê de piştî ku mirov dimire îsqata ji bo rojî nimêj û hwd. heye yan na? ... 145
NIMÊJA ÎNÊ 148
149. Li gorî mezhebê Henefî, îro li Tirkiyê nimêja înê tê kirin an na? 148
150. Ma nimêja înê li ser pîrekan jî ferz e? 149
151. Li gorî mezheban ji bo nimêja înê herî kêm divê çend kes hebin? 149
152. Gelo tu hewcedarî bi ezana ku beriya xutba înê tê xwendin heye? 151
153. Ma nimêja înê çend rek'et e? 151
154. Li welatên misilmanan nimêja înê çend qam tên kirin? 153
155. Piştî nimêja înê, ma divê ku mirov nimêja nîvro jî bike yan na? 154
156. Gelo di kîjan şert û mercan de nimêja înê tê terkkirin? 157
157. Ji bo çûna nimêja înê, ma lazim e ku ez ji xwediyê kar destûrê bistînim an na? 158
158. Ji ber karê pir, ma dibe ez neçim nimêja înê? 159
159. Kesê ku nimêja înê nekiribe, ma ew ê nimêja nîvro digel sunetên wê bike? 160
160. Kesê ku di nav nimêja înê de desmêja wî bişikê divê çi bike? 160
161. Kesê xutba înê dixwîne, ma ne pêwîst e ku li pêşiyê nimêj jî bike? 160
162. Ma roja înê dema xutbe tê xwendin, nimêjên sunet tên kirin? 161
.163 Seqetên ku beşdarî nimêja înê dibin gelo ferza wê ji stûyê wan derdikeve yan na? .. 162
164. Ma rast e ku pîrek, roja înê nikarin nimêja nîvro bikin? 163
165. Ma pîrek roja înê, nimêja xwe ya nîvro kengî dikarin bikin? 163
ROJÎ 164
166. Rojî çi ye? Ma hûn dikarin tarîfa wê bikin? 164
167. Niyet çi ye? 164
168. Niyeta rojiya meha Remezanê kengî û çawa tê anîn? 164
169. Di rojiya sunet de, herî dereng heta kengî niyet tê anîn? 165
170. Ma girtina rojiya meha Remezanê li kê ferz e? 165
171. Hûn dikarin di derheqê çaxa balixbûnê de agahiyê bidin? 166

172. Gelo hikmetê ferzbûna rojiyê çi ye? ... 166
173. Ma di rojiyê de rabûna paşîvê pêwîst e? ... 167
174. Di rojiyê de divê em riayeta kîjan welatî bikin? ... 167
175. Gelo rojî heta şevê an jî heta êvarê tê girtin? ... 168
176. Nexweşên tedawiya kemoterapiyê dibînin, ma lazim e ku rojiyê bigirin? ... 169
177. Nexweşên diyabetê, gelo lazim e ku di meha Remezanê de rojî bigirin? ... 169
178. Nexweşiya min a mîdê heye. Ma dibe ku ez rojiyê negirim? ... 170
179. Nexweşên şekir, tansiyon, migren û hwd. ma divê ku rojiyê bigirin? ... 171
180. Kesên ku êşa serî dikişînin gelo dikarin rojiyê bigirin? ... 171
181. Ma rojîgirtina nexweşên ku tedawiyê dibînin mehzûr e? ... 172
182. Ma hebên bin zimên digihîjin mîdeyê û rojiyê dişikînin? ... 172
183. Erbabê pîşeyên giran dê çawa rojiyê bigirin? ... 172
FITRE ... 174
184. Gelo sedeqeya fitrê li kê dikeve? ... 174
185. Ma rêwî û nexweşên ku nikarin rojiyê bigirin jî dê fitrên xwe bidin? ... 174
186. Gelo ez dikarim fitreya xwe bidim xwişka xwe? ... 175
187. Alîkariyên ku beriya meha Remezanê hatine kirin, gelo dikevin şûna fitrê? ... 175
188. Ma sedeqeya fitreyê piştî meha Remezanê jî tê dayîn? ... 175
189. Dema em fitreyê derdixin, divê em wê çawa hesab bikin? ... 176
190. Ma mirov dikare fitreya xwe bide weqf û komeleyên ku xizmetên olî dikin? ... 176
191. Ma divê em sedeqeya fitreyê li çend kesan belav bikin? ... 177
192. Ma sedeqeya fitreyê divê ku ji cinsê xwarinan bê dayîn? ... 178
193. Ma fitre bi rêya wekaletê tê dayîn? ... 178
194. Ma kesên bi meaşê memûrtiyê debara xwe dikin, dikarin fitreyê bigirin? ... 179
HEC Û 'UMRE ... 180
195. Ma mirov niyeta hecê çawa tîne? ... 180
196. Kesê ku niyeta hecê kiribe, lê derfeta çûnê nedîtibe? ... 180
197. Ger misilman di rewşeke zor de bin, ma raste ku mirov bo çûna hecê pereyan kom bike? ... 180
198. Di edakirina hecê de mirov neçe Cebelu'r-Rehme û çiyayê Hîrayê ... 181
199. mirov bi qesabî here hecê? ... 181
200. Ya baş ku mirov çend caran biçe hecê yan jî wî pereyî înfaq bike? ... 182

201. Kesê nikaribe li Muzdelîfeyê bisekine ma divê çi bike? 182
202. Gotina "hec li ber deriyê mirov e", tê çi wateyê? 182
203. Mêr û jina ku bi hev re xebitîbin ma divê ku bi hev re biçin hecê jî? 183
204. Ji bo hecê ma divê ku pîrek destûrê ji mêrê xwe bigire? 183
205. Dîtina heyvê û weqfeya 'Erefeyê 183
206. Ma delîla ferzbûna sekna li 'Erefeyê çi ye? 185
207. Kesên heca îfradê dikin an jî yên ku nikarin qurbanekê serjê bikin 186
208. Kesê heca îfradê bike, ma herî zû kengî dikare 'umreyê bike? 187
209. Rêza ku ji bo Heceru'l-Eswed tê nîşandan, gelo tundrawî ye? 188
210. Qurbanên ku li hecê tên serjêkirin, ma tên îsrafkirin? 189
211. Bo çûna hecê ma ez dikarim krêdiyê bikişînim? 189
212. Ma rast e ku kesê 'umreyê bike hec jî lê ferz dibe? 190
213. Îbadeta hecê ma dibe sedemê biderengxistina zewacê? 190
214. Hukmê recma şeytên di hecê de çi ye? 191
215. Îhram çi ye? Delîla pêdiviya girêdana îhramê çi ye? 192
216. Berî îhraman ma caiz e ku mirov parfûm an jî deodorantê bikar bîne? 192
217. mirov kengî ji îhramê derdikeve? 194
218. Ji bo derketina ji îhraman, ma divê çiqas ji por bê jêkirin? 195
219. Gelo hukmê kirina 40 wext nimêj li Mescida Nebî çi ye? 196
220. Ma helwesteke rast e ku mirov xanima xwe nebe hecê? 196
221. Ma rojname dikare xwendakarên xwe bi rêya kupon û pişkê bibe 'umreyê? 196
222. Xanimeke ezeb ma dikare bi tena serê xwe biçe 'umreyê? 197
223. Ma temamê pêxemberan hec kirine? 197
224. Suûdî, çima bi kontenjanên hindik ji misilmanan re astengiyan derdixe? 199
225. Berî çûna hecê, ma lazim e ku mirov ji xizmên xwe helaliyan bixwaze? 200
226. Ma hurmeta ku ji bo ava zemzemê tê nîşandan di cihê xwe de ye? 201
227. Ma mirov dikare di şûna yekî din de hecê bike? 202
228. Ma di hundirê Ke'beyê de çi heye? 203
229. Kirasê Ke'beyê çima reş e? 204
NEZIR 205
230. Kesê ne balix, ma divê ku nezra xwe bîne cih? 205

231. Ma mirov dikare ji nezra xwe bixwe? 205
232. mirov dikare girtina rojiyê li xwe nezir bike? 205
233. Gelo dîk û mirîşk dibin qurban? 206
234. Ma nezra ku ji cureyê wê 'îbadet tune be, dibe nezir? 207
235. Min nezir kir ez ê ewqas pere bidim zarokên taxa xwe, ma dibe ku ez bidim hin zarokên din? 207
236. Rojiya nezir, ma divê ku li pey hev bên girtin an na? 208
CEZA 209
237. Ma rast e ku ehkamên Qur'anê dîrokî ne? 209
238. Di dema me de cezayê zinayê, dê çawa bê tetbîqkirin? 209
239. Di Qur'anê ji cezayê sed daran pê ve, ma tu hedekî din heye? 210
240. Bêjeya "el-'ezab" ya ku di mijara recmê de derbas dibe, tê çi wateyê? 211
241. Ma dibe ku gotina "sed daran" di mijara cezayê zinayê de sembolîk be? 212
242. Di huqûqa Îslamê de cezayê tecawuzkirinê çi ye? 213
243. Ma rast e ku kesê ji dîn derkeve ango "murted", tê kuştin? 215
244. Ma divê em hedîsa "Kesê ku dînê xwe guhert, bikujin" çawa fêhm bikin? 217
245. Ma di umetên berê de jî destê dizan dihate jêkirin? 218
246. Ma Pêxember (s.a.w) destê kesê diz jêkiriye? 219
247. Cezayê vexwarina meyê çi ye? 220
248. Ma kesê nikaribe deynê xwe bide, tu ceza lê tê birin an na? 221
249. Cezayê kuştina yekî bi şaşî çi ye? 222
250. Ma di Îslamê de tu ceza ji bo heqaretê heye? 223
251. Ma cezayê kesê ku teşwîqa dizî û mêrkuştinê bike çi ye? 224
252. Hukmê daxistina materyalan –bê destûr- ji înternetê çi ye? 226

BEŞA DUYEM

KIRÎN Û FIROTIN 230
253. Ji dikana ku mey lê tê firotin, gelo caiz e ku mirov tiştekî bikire? 230
254. Hukmê ku mirov ji yekî pere bistîne û bi zêdetirî lê vegerîne çi ye? 231
255. Gelo durist e ku di navbera bihayê bi deyn û pêşin de, ferq hebe? 231
256. Ferqa di navbera bihayê pêşin û bi deyn, gelo dibe faîz? 231
257. Gelo durist e ku mirov malê xwe bi du bihayên ji hev cuda bifiroşe? 232

258. Gelo di karkirinê de, tu sînorekî diyar heye yan na? 233
259. Gelo rast e ku îmam Ebû Henîfe, di tîcaretê de ji bo karkirinê sînorek daniye? 233
260. Ma rast e ku di "Mecelle"yê de tesbîta sînorê karkirinê hatiye danîn? 234
261. Gelo dînê Îslamê ji bo karkirinê, tu sînorek daniye? 235
262. Malê ku di destê me de ye, dema bihayê wê zêde bibe, ma divê em bi kîjan bihayî bifiroşin? 236
263. Ma firotina malekî bi bihayê nû durist e yan na? 236
.264 Di firotinê de bihayê wê demê yan jî malê ku hatiye firotin tê îtibarkirin? 237
265. Dema mirov deh çewalan bi deyn bibe, dê deynê xwe çawa bide? 238
266. Dema mirov dev ji bazarê berde, gelo tu cezayekî wê heye? 238
267. Gelo kirîna malê hicizkirî, caiz e? 239
268. Hukmê kirîn û firotina pisîk û kûçikan çi ye? 240
269. Gelo şikandina çekan, caiz e? 241
270. Firotina fêkiyên daran beriya ku kulîlkên xwe vekin 241
271. Hikmê bazirganiya li pêşiya mizgeftan çi ye? 242
272. Ma rast e ku Pêxemberê me (s.a.w) dema wefat kiriye, zirxê wî di ber deynê Cihûyekî de gerew bûye? 242
273. Hukmê beşdarbûna rêxistina Lyonessê çi ye? 243
274. Gelo stendina kuponan caiz e yan na? 244
275. Ma divê ku mirov hemû taybetmendiyên mal ji bikir re bibêje yan na? 245
276. Ma firotina bi rêya "Bey'ê bil-Wefa", caiz e? 245
277. Firotina malê ku ne di destê mirov de be, gelo caiz e yan na? 246
278. Hukmê malê ku bi rêya fermî nehatibe tomarkirin û bikir jî ew teslîm negirtibe, dê çawa be? 247
279. Kirîn û firotina di dema nimêja înê de, li ser înternetê gelo helal e yan na? 248
280. Ma di wextê nimêja înê de kirîna tiştekî ji kantînê caiz e? 249
281. Xaniyê ku hêj temelê wî jî nehatiye avêtin, gelo caiz e ku mirov jê qatekî bikire? 250
282. Hukmê kirîna wesayît an jî xaniyekî, bi rêya "Emin Evim"-"Emin Otomotiv"ê çi ye? 250
283. Gelo hukmê "Yekî ku wesayîteke modela wê 2009e ji mirov bistîne, bi şertê ku di sala pêş de yeke modela 2011 be, ji mirov re bikire" çi ye? 251
284. Kirîna xaniyan ji TOKİyê gelo caiz e yan na? 251

285. Ez dixwazim wesayîtekê bikirim, da ku nekevim faîzê divê ez kîjan rêyê bişopînim? 252
286. Hukmê kirîna malên qaçax çi ye? 253
287. Ma kirîna tiştekî bi rêya muzayedeyê durist e? 253
288. Hukmê kirîna diwîzan bi rêya sîstema Forexê, gelo durist e yan na? 254
289. Karkirina pereyan bi rêya serîlêdana malperan, helal e? 255
DEYN 257
290. Ma caiz e ku mirov TL bi deyn bide û deynê xwe bi dolar an jî zêr bistîne? 257
291. Zêrê ku bi deyn hatiye stendin, ma divê bi peretî yan jî bi zêrêtî were dayîn? 258
292. Ma mirov dikare doza zirara xwe li kesê ku deynê xwe di wextê wê de nede, bike? 259
293. Ma mirov dikare ji deynan karê bi dest bixe yan dibe faîz? 259
294. Kesê bi deyndarî bimire, ma lazim e ku xizmên wî, deynê wî bidin? 260
295. Dema deyndêrê mirov bimire, divê mirov çi bike? 261
FAÎZ 262
296. Ma faîz, ji ber ku navgîn e bo zilm û zordestiyê hatiye heramkirin? 262
297. Ma di faîzê de bi tenê rêjeya zêde û bilind heram e? 262
298. Ma gunehê kesê ku faîzê dide û yê distîne, mîna hev e? 263
299. Gelo tehwîlên dewletê û bonoyên xezîneyê heram in? 264
300. Faîzên ku di bankê de pêk tên, ma mirov dikare bide jar û feqîran? 265
301. Dema mirov pereyê faîzê dide jaran, ma divê em bibêjin ku ev ê faîzê ye? 266
302. Da ku însan jê îstifade bikin, ma mirov dikare malê xwe têxe faîzê? 266
303. mirov dikare deynê bavê xwe yê krêdiyê bi kara ji faîzê bide? 267
304. Ma mirov dikare bi rêya bankê xanî bikire? 268
305. Gelo promosyona ku bank didin memûr û karkeran, helal e? 268
306. Promosyona ku bank didin, ma ne faîz e? 269
307. Zemên memûran ên ku dereng tên razandin, gelo dibe faîz? 269
308. Ma meaşê karkerên ku meaşê wan di faîzê de tê razandin heram e? 270
309. Gelo em dikarin pereyên xwe di fonên bankê yên likitê de bixebitînin? 270
310. Gelo li daru'l-herbê faîz caiz e? 271
311. Gelo tu hedîseke ku li daru'l-herbê faîzê caiz bidêre heye? 272
312. Ji bo kişandina krêdiyê, gelo caiz e ku mirov bibe navgîn? 274
313. Hukmê ku mirov ji bo yekî krêdiyê bikişîne çi ye? 274

314. Dema mirov bo yekî krêdiyê bikişîne, guneh di stûyê kê de ye? 275
315. Bo xelasiya ji tengasiya malî, mirov dikare ji bankê krêdiyê bikişîne? 276
316. Di kîjan rewşan de mirov dikare bi faîzê ji bankan krêdiyê bikişîne? 276
317. Dema banka krêdiyê dide, ma qey pereyan nafiroşe ango bazirganiyê nake? 278
318. Kesê mecbûrî faîzê dibe, gelo di guneh de dibe mîna yê ku faîzê dixwe? 279
319. Da ku deynê xwe yê Tokiyê bidim, gelo ez dikarim krêdiyê bikişînim? 280
320. Gelo mirov dikare bi rêya krêdiya bankê, xanî bikire? 281
321. Krêdiyên ku faîza wan ji sedî sifir e, caiz in? 281
322. Ma caiz e ku mirov krêdiya fêrbûnê bistîne? 282
323. Da ku mirov pereyan bi neqît bistîne, gelo caiz e ku mirov karta krêdiyê li cem esnafan bikar bîne? 282
324. Ma caiz e ku seraf, zêr bifiroşin û yekser bikirin û li hember wê pereyan bidin? 283
325. mirov li ser înternetê zêr bikire û bifiroşe, caiz ye an na? 283
326. Di dayîna deyn de mirov karê bike gelo caiz e yan jî dibe faîz? 283
327. Hukmê mirov deynê karta xwe ya krêdiyê di dema wê de nede çi ye? 284
328. Hukmê kaskokirina otomobîlan çi ye? 285
329. Bêyî ku ez têkevim faîzê, ez çawa dikarim wesayîtekê bikirim? 286
330. Hukmê kişandina krêdiyê ji bankê, bo leşkeriya bi bedêl çi ye 287
331. Di navbera kara ku ji xeyrimenqûlan tê bidestxistin û ya faîzê çi ferq heye? 288
332. Gelo kara ku ji kirêya xeyrimenqûlan û faîzê tê bidestxistin heman tişt in? 289
333. Gelo caiz e mirov xeyrimenqûlên xwe bi kirê bide bankayan? 290
334. Teqawidiya ferdî çi ye? 291
335. Sukûkên bêfaîz, ma bi rastî jî bêfaîz in? 292
BORSA 293
336. Ma kirîna hiseyan ji Borsayê durist e yan na? 293
337. Gelo di kirîn û firotina ji borsa emtiayê tu mehzûrek heye? 293
ZAYIBÛNA EMANET 295
338. Pereyê bi emanet dema telef bibe, dê kî wî pereyî bide? 295

BEŞA SÊYEM

DAWET 299

339. Hukmê dawetê çi ye? 299
340. Li gorî Îslamê daweteke munasib divê çawa bê kirin? 299
341. Hukmê lêxistina daholê di dawetan de çi ye? 299
342. Ma mirov dikare beşdarî dawetên ku tê de heramî tên kirin, bibe? 300
343. Ma di şevên qendîlê de dawet an jî nîşanî tê kirin? 300
ZEWAC 302
344. Ma zewac di Îslamê de ferz e? 302
345. Ma nîkaka mut'e di Îslamê de heye yan na? 303
346. Hukmê hezkirina ji yekê çi ye? 304
347. Di hilbijartina hevalekî/ê ji bo zewacê, divê mirov bala xwe bide çi? 304
348. Ma mirov dikare keça xwe bide yekî ku nimêj nake? 305
349. Temenê keçan ji bo zewacê, herî kêm divê çiqas be? 306
350. Ma diya me 'Aişeyê, di neh saliya xwe de bi Pêxemberê me re zewicî? 307
351. mirov dikare bi yeke ji xwe mezintir re bizewice? 309
352. Têkiliya bi nîşaniya mirov re divê çawa be? 309
353. Bi duayên di dema nîşaniyê de nîkah tê birîn? 310
354. Ma kesa/ê ku însan dê pê re bizewice, berê hatiye tayînkirin? 311
355. Ma lixwekirina bûkaniyê guneh e? 311
356. Ma durist e ku nîkaha dînî bê xebera malbatê were birîn? 312
357. Ên ku sirf bi rêya fermî zewicîne, ma zinayê dikin? 313
358. Ma çêdibe ku nîkah bê mehr were birîn? 313
359. Hukmê zêr û xişrên ku di dawet û nîkahê de tên diyarîkirin çi ye? 315
360. Gelo mexduriyeta pîreka ku ne bi rêya resmî tê berdan, dê çawa were telafîkirin? .. 316
361. Hukmê zewaca bi zirxwişk/zirbirayan re çi ye? 317
362. Zewaca bi yeke xeyrimuslim re çawa ye? 317
363. Mêrê Misilman, ma dikare bi yeke Fileh re bizewice? 318
364. Ma zewaca bi yeke/î ku zina kiribe û piştre poşman bûbe re durist e? 319
365. Pîreka ku şeva wê ya gerdekê rastî dema xwînmeha wê were 321
366. Ma nîkaha yeke Şafiî û yekî Henefî dê çawa were birîn? 321
367. Ma zewaca bi yeke qereçî re durist e? 322
368. Yekî/e Sunî dikare bi yeke/î Elewî re bizewice? 322

369. Zilamê ku jina wî bimire, kengî dikare bi yeke din re bizewice? 323
370. Ma zewaca bi kîjan eqrebayî re heram e? 323
371. Kurê xal û keça metê dikarin bi hev re bizewicin? 325
372. Hukmê zewaca neviyên birayan bi hev re çi ye? 325
373. mirov dikare ji yekî ku ne bavê mirov e re bibêje "bavo"? 326
374. Ma nîkah bi henekan tê birîn? 326
375. Ma divê mirov ji îfadeya "Telaq du car in", çi fêhm bike? 327
376. Di kîjan rewşan de divê mirov nîkaha xwe nû bike? 328
377. Eger nîşanî were xerakirin, ma mirov dikare diyariyên xwe ji malbata keçikê bistîne? 328
378. Piştî nîşaniyê mirov dikare dev ji hev berde? 328
379. Ma lixwekirina gustîlka zewacê durist e? 329
380. Hukmê kirina du rek'et nimêj di şeva gerdekê de çi ye? 329
381. Gelo hedîseke bi awayê "Şeva gerdekê divê zava lingên bûkê bişo" heye? 330
382. Gelo xwişk û biratiya bi rêya xwînê jî heye? 330
383. Keçika ku ji diya min şîr vexwaribe, ma dibe xwişka min jî? 331
384. mirov dikare bi keçika ku bi xwişka mirov re ji heman pîrekê şîr vexwariye re bizewice? 331
385. Ma mirov dikare bi xwişka şîr ya xwişka xwe ya helal re bizewice? 332
386. Ên ku bi sedem xwezûrantiyê ebediyen mirov nikare bi wan re bizewice kî ne? 332
387. Mirov dikare jina xwe berde û bi xwişka jina xwe re bizewice? 333
388. Ma mirov dikare jina xwe ya nexweş bernede û bi xwişka wê re bizewice? 333
389. mirov dikare bi pîreka birayê xwe yê mirî re bizewice? 334
390. Di dînê me de, cih û girîngiya bekaretê çi ye? 334
391. Gelo mafê berdana pîreka şeva gerdekê kifş bibe ku ne bakir e, heye? 335
392. Eger pîrek ne bakîr be, ma mêr nikare sebebê wê bipirse? 336
393. Ma mêr û jin dikarin bi navê hev bangî hev bikin? 337
394. Ji aliyê dînî ve mafê mêr heye ku doza zarokan li jina xwe bike? 337
395. Tekiliya pir zarokî û pêşveçûnê 339
396. mirov serî li "tüp bebekê" bide baş e yan bi qedera xwe qayîl bibe? 340
397. Di heman demê de nîkah bi du kesan re were birîn? 341
398. Ma bûk mecbûr in ku xizmeta xwesû û xezûrê xwe bikin? 342

399. Ma ez mecbûr im ku li xwesûya xwe binihêrim? 344
400. Xwesûya min nimêj nake, ma divê ez çawa pê re tev bigerim? 345
401. Ma mafê mêr heye ku li jina xwe ferman bike? 346
402. Da ku ez diya xwe razî bikim, ma divê ez bi yekî bê dilê xwe re bizewicim? 346
403. Kesê zewicandî dema pirsgirêkên wî yên cinsî hebin, gelo dikare bi yeke din re rabe û rûnê? 348
404. Jina ku peywirên xwe yên jinantiyê nayîne cih, ma mêrê wê dikare pê re îxanetê bike? 348
405. Jina min bi pey yekî ket, ma ez dikarim wê vegerînim? 349
406. Ji tirsa zor û zehmetiyên madî malbata min naxwaze min bizewicîne. Divê ez çi bikim? 350
407. Gunehên ku me beriya zewacê kirine, ger em bi hev re bizewicin tên bexşandin? 351
408. Rast e ku pîrek ne mecbûr in şîr bidin zarokên xwe? 352
409. Tu ayeteke ku behsa bişîrvekirina zarokê bike heye? 352
410. Ma mêr û jin dikarin li derve bi destê hev bigirin û bimeşin? 353
411. Pîrek kengî dikare xebera hemlebûna xwe ji dost û hevalan re bibêje? 354
TELAQ 355
412. Berdaneke rast û durist divê ku çawa be? 355
413. Hukmê berdana formalîte çi ye? 355
414. Ma berdana bi sê telaqan heye? 356
415. Berdana ku ne li gorî ayetên pêşî ji sûreyê Telaq be, gelo durist e yan na? 357
416. Dema şahid tune bin, telaq pêk tê yan na? 357
417. Ma di berdanê de şahid, di dema telaq yan dema tefrîqê de tên girtin? 358
418. Ji bo lihevanîna mêr û jinê, mirov kengî dikeve dewrê? 359
419. Di berdana beriya zîfafê de, gelo dîsa jî şert e ku di hizûra du şahidan de pêk were? 360
420. Wateya bêjeya 'idde çi ye? 361
421. Pîreka ku hatibe berdan, kengî dikare bi yekî din re bizewice? 362
422. Gelo hikmetê pîreka ku hatiye berdan sê paqijiyan disekine çi ye? 363
423. Pîreka ku di dema 'iddeyê xwe ji mal derkeve, gelo hatiye berdan an na? 365
424. Dema mirov pîreka xwe ya berdayî ji malê derxe, telaq pêk tê? Ma ev jî ne fermana Xwedê ye? 366

425. Piştî berdana pîrekê dema mirov li jina xwe vegere, ma divê ku nîkaheke nû were birîn? ... 368
426. Ma rast e ku pîreka mêrê wê miriye, heta 'iddeyê wê neqede, nikare ji mala xwe derkeve? ... 368
427. Gelo 'iddeyê pîreka ku cara sêyem hatibe berdan, çiqas e? ... 369
428. Mêr û jina ku dev ji hev berdin, dê parvekirina mal di navbera wan de çawa bê kirin? ... 372
429. Gelo pîrek, bi gotina mêrê wê "min tu berdayî", tê berdan an na? ... 373
430. Ma mirov dikare di hundirê 'iddeyê de jina xwe cara duyem berde? ... 373
431. Gelo mehr ji pîreka ku berî zîfafê hatibe berdan re heye? ... 374
432. Berdana berî zîfafê ... 375
433. Ma pîreka ku piştî nîkah û xelweta sehîh e hatibe berdan, mehr jê re dikeve yan na? ... 376
434. Di kîjan rewşan de pîrek dikare doza berdanê li mêrê xwe veke? ... 376
435. Di kîjan halan de lazim e ku mêr, mehrê bide pîrekê? ... 377
436. Ma li gorî Qur'anê, berdana bi şert durist e yan na? ... 378
437. Berdana di gava hêrsbûnê de, gelo pêk tê yan na? ... 379
438. Ma mafê pîrekê heye ku xwe berde? ... 379
439. Ma pîrek dikare mafê xweberdanê ji mêrê xwe bigire? ... 380
440. Ma pîrek dikare doza berdanê li zilamê ku li mala xwe ne miqate ye û erka xwe ya mêrantiyê neyîne cih, bike? ... 380
441. Di meseleya îftidayê de, gelo çima pîrek divê ku mehrê li mêrê xwe vegerîne? ... 381
442. Pîreka ku bi rêya îftidayê ji mêrê xwe qetiya be, ma dikare dîsa pê re bizewice? ... 382
443. Dema pîrek doza berdanê veke, ma dê mal di navbera wan de çawa were parvekirin? ... 382
444. Lîstina pîreka bi mêr li pêşberî zilamên biyanî, ma dibe sedem ji bo xerabûna nîkaha wê? ... 383
445. Ma vekirina cihên mehrem tu bandorê li nîkaha pîrekê dike? Ango nîkaha wê betal dibe yan na? ... 383
446. Eger mêr angaşt bike ku pîreka wî zina kiriye, divê çi bike? ... 383
447. Di huqûqa Îslamê de nefeqe û pêdiviyên zarokan li ser kê ye? ... 385
EWLADGIRTIN ... 388
448. Hukmê ewladgirtina zarokê/a hêj nû hatiye dinyayê çi ye? ... 388
449. Zarokên me çênabin ma caiz e ku em zarokekî ji xwe re bigirin? ... 389

450. Ma ji zirkur û zirkeçan re jî ji mîratê par heye? 390

BEŞA ÇAREM

CÎHAD 393

451. Ma Îslam dînê şer e yan jî dînê aştiyê ye? 393

452. Piştî hicretê, ma Misilmanan çima êrîşî karwanê Qureyşiyan kirin? 395

453. Ma kuştina neyarên dînê Îslamê caiz e? 396

454. Ma Elmanya daru'l-herb e û pîrekên wan jî dikevin bin hukmê qerwaşan? 397

455. Di êrîşbirina li ser Lîbyayê, divê helwesta kesê misilman çawa bûna? 398

TÊKILIYA BI XEYRIMISLIMAN RE 400

456. Ma di teblîxê de pîvan çi ye? 400

457. Berpirsyariya kesên ku teblîxa Qur'anê negihîştibe wan çi ye? 401

458. Gelo kirinên xeyrimisliman ên baş, dê çawa be? Ma dê fêdeyê bide wan? 404

459. mirov dikare ji xeyrimuslimê ku ji mirovahiyê re tiştên bi feyde kiriye re rehmê bixwaze? 406

460. Kesên, ne ji malbateke misilman tên dinyayê ma bextreş in? 407

461. Ma Filehan diya me Meryem jî ji xwe re kirine îlah? 407

462. mirov dikare bi Fileh û Cihûyan re hevkariyê bike? 408

463. Ma Cihû, ji zikmakî lanetkirî ne? 409

464. Ma divê em bijartina Cihûyan ya li ser aleman çawa fêhm bikin? 410

465. Cihûyê ku dixwaze bibe misilman, ma divê pêşî bibe Fileh? 411

466. Ma Tewrat hatiye guhertin? 411

467. Digel ku lanet li Cihûyan hatiye barandin çawa dibin hêzeke navnetewî? 413

468. Ma guneh e ku mirov pesnê yekî xeyrimuslim bide? 415

469. mirov dikare diyariyan bide yên xeyrimuslim? 416

470. Xeyrimuslimên ku li welatê misilmanan dijîn, dê li gorî çi werin darizandin? 417

471. Rewşa misilmanê ku mafê yekî xeyrmuslim xwaribe dê çawa be? 418

472. Kesên xeyrimuslim, ma çima nikarin têkevin Mekkeyê? 419

473. Ma xeyrimuslim an jî keşe dikarin ayînên xwe di mizgeftê de bikin? 423

474. Ma rûxandina malperên ku heqaretê li dînê me dikin, durist e? 424

475. Ji bo xizmetên dînî mirov dikare ji xeyrimisliman alîkariyan kom bike? 424

476. Ma xwarina goştê heywanên ku Cihû û Fileh serjê dikin, helal e? 425

477. Hukmê xwarina nêçîrên xeyrimisliman çi ye? ... 425
HEMWELATIYA DEWLETÊN EWRÛPA ... 427
478. Eger mirov bibe hemwelatiyê dewletên Ewrûpa, rast e ku mirov ji dîn derdikev? ... 427
479. Serîlêdana li dadgehên xeyrî Îslamî ji bo bidestxistina mafê xwe, ma mirov ji dîn derdixe? ... 428
480. Hukmê firotina meyê li welatên xeyrimuslim çi ye? ... 429
481. Hukmê dayîna ruşwetê li welatên xeyrimuslim çi ye? ... 430

BEŞA PÊNCEM

CIN ... 434
482. Gelo lêxistina cinan heye? ... 434
483. Cin dikarin têkevin xewna meriv? ... 434
484. Gelo hemû nexweşiyên derûnî bi sedema cinan e? ... 435
485. Gelo zanyar çima hebûna cinan qebûl nakin? ... 435
486. Ma vampîr hene? ... 436
487. Ji bo xelasiya ji bandora cinan, divê mirov çi bike? ... 436
488. Ma cin jî ji ehkamên Qur'anê berpirsyar in? ... 436
489. Ji bo xweparastina ji cinan, ma gotina bêjeya "destûr" şert e? ... 438
490. Ma şeytan dikare têkeve dirûv û eşkalan û xwe nîşanî însanan bide? ... 439
EFSÛN ... 441
491. Sêhr çi ye? ... 441
492. Gunehê kesên sêhrê dikin û yên didin kirin çi ye? ... 442
493. Ma ji bo betalkirina sêhrê divê mirov çi bike? ... 443
494. Ji bo xelasiya ji bandora sêhrê divê mirov çi bike? ... 443
495. Ma rast e ku li Pêxemberê me (s.a.w) sêhr hatiye kirin? ... 444
496. Gelo însan çima diçin ba sêhrbaz û remildaran? ... 445
.497 Hukmê vekirina fala stêrkê çi ye? ... 445
XURAFE ... 448
498. Wesiyeta Şêx Ehmed, ma rast e yan jî xurafe ye? ... 448
499. Piştî birîna nîkahê derketina der bi şev, ma bêqidoşiyê çêdike? ... 449
500. Nêrîna li wêneyê mirî ma ezab dide mirî? ... 449

501. Ma nimêjeke bi navê nimêja gorê heye? ... 450
502. Pîreka bi hemil gava porê xwe kur bike, ma zarokê/a wê dê temenkin be? ... 450
503. Ma pîrek dikarin biçin serdana goran? ... 450
504. Ma çilê zarokan heye? ... 451
505. Divê mirov çi bike ji navika zarokê? ... 451
506. Ma rast e ku nîkahên di meha Seferê de tên birîn, temenkin in? ... 451
507. Rast e ku bazirganiya di roja aşûreyê de bereketê zêdetir dike? ... 452
508. Ma rast e ku pir bûyerên girîng di roja aşûreyê de qewimîne? ... 454
509. Şûştina destan bi axê ma dibe sedema feqîriyê? ... 455
510. Peydakirina 7 peykerên fîlan di malê de ma oxiriyê tîne? ... 456
511. Xidirellez çi ye? Ma tu girîngiyeke wê di dînê me de heye? ... 456
512. Gelo di kirina Wefqê de tu mehzûrek heye yan na? ... 457
513. Ma rûniştina di nav derî de guneh e? ... 458
DUA ... 459
514. Ma rast e ku dua, bê selat û selamdayîna li ser Pêxember (s.a.w) qebûl nabin? ... 459
515. Hûn dikarin di derbarê îstixareyê de min agahdar bikin? ... 461
.516 Ma mirov dikare bibêje: "Ya Rebbî! Tu bi xatirê filankesê… " duayê min qebûl bikî? ... 462
517. Rast e ku sehabiyekî kor, Pêxemberê me ji xwe re kiriye wesîle û dua kiriye? ... 463
518. Ma di dua de divê mirov herdu destên xwe bide ber hev an ji hev veqetîne? ... 466
519. Di hin duayan de gelo çima mirov berê destên xwe dide jêr? ... 466
520. Hukmê ku mirov piştî duakirinê destên xwe bi ser çavên xwe bixe çi ye? ... 467
521. Hukmê ku mirov piştî her duayî bibêje "el-Fatîhe" çi ye? ... 468
522. Ma rast e ku bêjeya "Amîn" ji Cihûyan derbasî çanda Misilmanan bûye? ... 468
523. Hukmê duakirina bi hev re di Îslamê de çi ye? ... 470
524. Gelo durist e ku mirov dua ezanê, digel cemaetê li mizgeftê bi hev re bixwîne? ... 470
525. Ma tu esil ji duayê "Kenzu'l-'Erş" û duayê "Qedeh"ê re heye? ... 471
526. Hûn dikarin di derbarê Cewşenê de agahiyan bidin? ... 471
527. Wateya duayê "la hewle wela qûwwete îlla billahîl aliyyîl ezîm" çi ye? ... 473
528. Gelo duakirina di nav xwarinê de sunet e? ... 473
529. Ma ji bo şeva gerdekê tu duayekî taybet heye? ... 474
530. Di duayên xwe de em jî mîna Pêxember dikarin daxwaziya "refîqî e'la" bikin? ... 476

531. Ma ji bo teseturê tu duayekî ku mirov bike heye? 476

BEŞA ŞEŞEM

CIL Û BERG 479

532. Ma jin çima xwe dinixumînin? 479

533. Ma divê pîrek xwe çawa binixumînin? 479

534. Ma divê mêr di kincan de bala xwe bidin çi? 481

535. Hukmê ku pîrek servekirî û bi derpê bixebitin çi ye? 482

536. Hukmê lixwekirina çarşevê çi ye? 482

537. Bêjeya "celabîb"ê, ma bi wateya çarşevê ye? 483

538. Lixwekirina çarşevê, ma tundrawî ye? 484

539. Ma lazim e ku pîrek bi peçeyê rûyê xwe bigirin? 484

540. Ma divê ku pîrek bi şev di dema razanê de xwe bigirin? 485

541. Derbarê dersên avjenî û werzîşê li dibistanên Elmanyayê 485

542. Pîrek, li cihê ku ew û mêrê xwe bi tenê bin, ma dikare bi mayo têkeve avê? 487

543. Ma tiştekî rast e ku pîrek bi xizmên xwe yên zilam re xeber nede? 488

544. Di hevdîtina bi xizmên xwe yên nêz re divê mirov bala xwe bide çi? 490

545. Ma di Îslamê de "mezinbûna mîna xwişk û birayan" heye? 490

546. Xwendekareke keç, ma dikare li mala mamosteyekî mêr dersê bigire? 491

547. Kesê ferzbûna teseturê mandel bike ma ji dîn derdikeve? 493

548. Gelo hukmê razana digel zarokên xwe yên balix re çi ye? 494

549. Ma di girêdana krawatê de tu mehzûrek heye? 495

550. Gelo ez dikarim ristika bi nîşana xaçê, têxim stûyê xwe? 495

551. Ma divê pîrek çarika xwe çawa girê bidin? 496

552. Pîrekeke misilman ma dikare werzişê bike? 496

553. Ma durist e ku mirov di saloneke ku mêr û jin tevlihev in werzişê bike? 497

554. Ez 14 salî me û dixwazim xwe bigirim. Divê ez çawa tev bigerim? 497

555. Mêrê min, daxwaza vekirinê li min dike. Divê ez çi bikim? 498

556. Digel hemû hişyariyên bavê min, eger dîsa jî ez serê xwe vekim, gelo ji wî re jî guneh heye? 499

557. Mijara xwegirtinê gelo çima di nav şertên Îslamê de nehatiye diyarkirin? 500

558. Dema em li pîrekên vekirî mêze bikin, gelo kî dibe sûcdarê eslî? 501

559. Gelo pîrek dikare li ba bapîrê xwe servekirî bimîne? 501
560. Ma bûk dikare li cem xezûrê xwe servekirî bimîne? 502
561. Gelo bûk dikare li cem xezûrê xwe yê nehelal servekirî be? 502
562. Gelo keçik dikare li cem zirbirayên xwe serê xwe veke? 503
563. Ma mêr, ji sergirtina jina xwe berpirsyar e? 503
564. Dema xwendina Qur'anê de ma lazim e ku pîrek serê xwe bigirin? 503
565. Pîrek dikarin servekirî tizbiyê bikişînin? 504
566. Gelo zirkurê pîrekê dibe mîna kurê wê yê rastîn? 504
567. Ma rast e ku diya me Reyhane serê xwe negirtiye? 505
568. Li gorî mezhebê Şafiî, ma divê ku pîrek dest û rûyê xwe jî bigirin? 506
569. Ma di dema xwarinê de jî divê ku pîrek serê xwe bigirin? 506
570. Ma durist e ku pîrek biçin hemama jinan? 507
TÊKILIYA BI EQREBAYAN RE 508
571. Bavê ku kafir be, gelo tu mafê wî li ser zarokên wî yên misilman heye? 508
572. mirov dikare têkiliyên xwe ji eqrebayên xwe bibire? 509
573. Di rojên cejnê de ma divê mirov biçe serdana kê? 510
574. Hukmê xeberdana pîrekê bi zilamên biyanî re çi ye? 512
575. Ma zewaca bi kîjan eqrebayan re li mirov heram e? 513
576. Gelo mirov ji nebaşî û xerabiyên dê-bavê xwe, mesûl e yan na? 515
577. Hukmê xeberdana pîrekê bi tiyê xwe re çi ye? 516
578. Ma mêr dikare nehêle ku jina wî biçe serdana dê-bavê xwe, an na? 517
JIYANA MALBATÎ 519
579. Gelo mirov dikare li ba dê-bavê xwe, ji zarokên xwe hez bike? 519
580. Tiştên ji zarokan re tên diyarîkirin, bav an jî welî dikare tê de teseruf bike an na? 519
581. Hukmê pîrozkirina roja jidayikbûnê çi ye? 520
JIYANA CINSÎ 521
582. Beriya têkiliya cinsî, ma xwendina tu duayekî ku hatibe tewsiyekirin heye? 521
583. Hukmê masturbasyonê çi ye? 521
584. Gelo masturbasyon heram e yan mekrûh e? 522
585. Eger masturbasyon mekrûh be, ma çima piştî kirina wê ez ewqas nerihet dibim? 523
586. Ma guneh e ku mirov lêvên jina xwe ramûse? 523

587. Hukmê nêzîkatiye bi bal pîrekê ve bi rêya "oral" ji dev çi ye? 523
588. Di têkiliya oral de eger avik ji mêr neyê, ma lazim e ku xusla xwe rake? 524
589. Mêr û jin, ma dikarin ewretê hev bibînin? 524
590. Ma di dînê me de, munasebeta bi pîrekê re ji paş ve teqez hatiye heramkirin an na? 525
591. Hukmê girêdana lûleyên malzarokê çi ye? 526
592. Da ku zarok çênebin, ma bikaranîna sîstema "vazektomi"yê caiz e? 527
593. Hukmê "kurtaj" ango jiberxwekirina zarokê çi ye? 527
594. Gelo caiz e ku mirov bi rêya "Tüp bebek" bibe xwedî zarok? 528
595. Gelo durist e ku pîrekeke biyanî, zaroka mirov di malzaroka xwe de hilgire? 529
596. Di demên hebilbûna pîrekê de, pêwendiya cinsî qedexe ye yan na? 530
597. Ma pêwendiya cinsî di rojên cejnê de heram e? 531
598. Pîreka ku zaroka wê ji ber çûye, kengî dikare bi mêrê xwe re razê? 531
599. Gelo heram e ku mirov behsa jiyana xwe ya cinsî bike? 532
600. Zilam, dema şîrê pîreka xwe vexwe ma eqrebatî di navbera wan de çêdibe? 533

BEŞA HEFTEM

FETWA 537
601. Fetwa çi ye? 537
602. Gelo di navbera misilmanên cîhanê yekîtiyek di fetwadayînê de heye? 538
603. Em êdî nizanin em ê bi kîjan fetwayê emel bikin. Divê em çi bikin? 538
604. Fetwayên ku seyda didin, gelo çima ne mîna hev in? 538
605. Xetera fetwadayîna kesên ne ehil 539
606. mirov bê zanebûn fetwa bide 539
607. Hin însan Îslamê li gorî roja me dinirxînin. Di vê mijarê de hûn çi dibêjin? 539
608. Ma di mijarên dînî de kî ehil e bo dayîna fetwayan? 540
609. Ji aliyê Îslamî ve gelo di navbera fetwa û teqwayê de tu ferq heye? 540
HEDÎS 541
610. Hukmê 'emelkirina bi hedîsa zeîf çi ye? 541
611. Ma çend hedîs ji Pêxemberê me hatine ragihandin? 543
612. Ma însanan bi kîjan mebestan hedîs lêanîne? 544
613. Hûn dikarin di derheqê berhemên ku hedîsên mewdû' berhev kirine, agahiyan bidin? 545

614. Ma li gorî Ebû Henîfe, di Kutubê Sitte de tu hedîsên li dijî Qur'anê bin hene? 547
615. Ma nusxeya destnivîsa Buxarî bi xwe heye, wenda ye, an nayê zanîn? 549
616. Ma di Qur'anê de di derbarê zewaca pîrik û nevî de, tu hukim tune ye? 550
617. Kesê di axirzeman de 'îbadetên hindik bike, ma dê xelas bibe? 551
618. Duayê Cewşenê ji aliyê 'ilmê hedîsê ve, çawa tê nirxandin? 553
619. Hedîsa "Zanayên umeta min, mîna pêxemberên Zaroyênîsrail in" 554
620. Ma hedîsa "Kesê nîşangêriyê hîn bibe û biterikîne, ne ji me ye" sehîh e? 555
621. Ma gotina "Quretiya li hemberî quretiyê sedeqe ye" hedîs e? 557
622. Ma gotina "Di hezkirina xwe de bi endaz be, di buxza xwe de bi endaz be", hedîs e? 557
623. Ma hedîsa "Xêr di pereyên ku bo çêkirina avahiyê tên xerckirin, tune ye" sehîh e? . 558
624. Hedîsa "'Eşereyê Mubeşşer", divê çawa were fêhmkirin? 559
625. Ma Pêxemberê me di bihuştê de dê bi diya me Meryem re bizewice? 561
626. Ma razana ber êvarê, bi zirar e? 561
627. Hûn dikarin hedîsa "cihê xeflet lê hatiye serê mirov biguherînin", rave bikin? 563
628. Ma hemû pêxemberan şivantî kirine? 564
.629 Gelo hedîsa kenza mexfî (gencîneya veşartî), sehîh e? 564
630. Hedîsa "Jiyana min û mirina min jî ji we re bi xêr e", sehîh e? 566
.631 Ma dibe ku însan, bêhemdî ketibe şirkê? 567
632. Ma sedeqe temen dirêj dike? 567
633. Meseleya Se'lebe gelo rast e, an jî çîrok e? 569
634. Hedîsa bihuşt di bin piyên dayikan de ye 570
635. Gotina "Ez kurê du qurbaniyan im", gelo hedîs e? 571
636. Ma nimêj servekirî tê kirin? 572
637. Ma divê em hedîsa "Ê ku bi pîreka xwe re herî rind tev digere, ez im" çawa fêhm bikin? 572
638. Hedîsa di derheqê bîata bi îmamê zeman re 573
639. Ma hedîsa "di demên zor de alîkariyê ji miriyan bixwazin", sehîh e? 574
640. Ma di derbarê hezkirina ji Pêxember tu hedîsek heye? 575
641. Li gorî hedîsan, mirovê herî qenc kî ye? 576
642. Ma rast e ku di her sed salî de mucedidek tê? 576
643. Ma hedîseke wiha "Kesê ji Xwedê sebrê bixwaze, wî bela xwestiye" heye? 577

644. Ma gotina “Limêj, mîraca kesê bawermend e” hedîs e? 579
645. Ma gotina “Em ji cîhada biçûk hatin bal ya mezin” hedîs e? 579
646. Ma ji bilî xanî, cil, nan û avê mafê însên di tu tiştekî din de tune ye? 581
647. Gotina “Ne di erd û asîmanan de, lê di dilê bendeyê xwe yê bawermend de bi cih dibim” hedîs e? 581
648. Ma hedîsa “Wê hin derewîn derkevin û bibêjin ku dev ji hedîsê berde, li Qur’anê binêre.” sehîh e? 582
649. Ma hedîsa “Temenê umeta min, 1.500 salî derbas nake.” sehîh e? 583
650. Ma gotina “Saeteke bi tefekkur, ji ‘îbadeta sunet ya salekê bi xêrtir e” hedîs e? 584
651. Ma hedîsa “Xewa kesên alim, ji ‘îbadeta nezanan bi xêrtir e” sehîh e? 585
652. Ma Îmam Nesaî, alimekî hedîsê yê pêbawer e? 585
653. Kitêba ‘Eclûnî ya bi navê Keşfu’l-Xefa, ma çavkaniyeke ewle ye? 586
654. Gotina “Li ser miriyên xwe sûreyê Yasînê bixwînin.”, ma hedîsa Pêxember e? 587
655. Ma hedîsa “Receb meha Xwedê ye, Şe’ban meha min e, Remezan jî meha umeta min e” sehîh e? 588
656. Ma Xwedê Teala, şêwirmendên şelaf museletî ser rêvebirên ku ji wan hez nake, dike? 589
657. Ma kesên li kilamên stranbêjên jin guh bidêrin, dê paxir bê berdan guhê wan? 590
658. Ma hedîsa “Kesê suneta min îhya bike, xêra sed şehîdî jê re heye” sehîh e? 591
659. Ma hedîsek bi vî awayî “Ji ber sê tiştan ji ‘Ereban hez bikin” heye? 592
660. Hedisa “Kesê çar rek‘et sunetên berî nîvro neke, mehdervaniya min nagihîjê” sehîh e? 592
661. Ma hedîsa “Ez hatime şandin da ku exlaqê xweş temam bikim” sehîh e? 593
662. Ma di derheqê hibekirina xêra sûreyê Îxlas de tu hedîsek heye? 595
663. Ma gotina “Hezkirina welêt, ji îmanê ye” hedîs e? 596
664. Ma hedîsa kesê qurbanê serjê neke bila nêzî mizgefta me nebe, sehîh e? 597
665. Ma di bara bikaranîna gopal de tu hedîsek heye? 598
666. Ma hedîsa “Roja qiyametê ez ê berî her kesî têkevim bihuştê” sehîh e? 599
HEZRETÎ ÎSA 601
667. Ma Îsa aleyhisselam dê careke din were dinyayê? 601
668. Ma divê em ayeta 159an ji sûreyê Nîsa ya di bara Îsa aleyhisselam de çawa fêhm bikin? 604
669. Ma Hz. Îsa, ji nesla Hz. Îshaq tê? 606

670. Divê em ayeta "Îsa, ji bo qiyametê zanînek e", çawa fêhm bikin? 606
671. Ma Hz. Îsa wefat kiriye yan ketiye xewê? 607
672. Ma ruhê Hz. Îsa yan jî bedena wî hatiye bilindkirin? 609
673. Ma Hz. Îsa di zarokatiya xwe de bûbû pêxember? 611
674. Ma bi rastî Hz. Îsa di dergûşê de xeber daye? 612

BEŞA HEŞTEM

TEDAWIYA BI RÊYA BIOENERJIYÊ 616
675. Gelo dermankirina bi rêya bioenerjiyê, mumkin e? 616
676. Ma bikaranîna kevirên bi şîfa, guneh e? 616
XWEKUJÎ 619
677. Hukmê întihar/xwekujiyê çi ye? 619
AJAL 622
678. Heywanên zirarê didin însanan, ma divê ku bên kuştin? 622
679. Ma xesandina heywanên kedî durist e? 622
MUDAXELEYA GENAN 623
680. Ji bo tayînkirina cinsiyetê ma mirov dikare di genan de mudaxele bike? 623
ASTENGDAR 625
681. Ma di Qur'anê di derbarê çêbûna bi qusûr de, tu agahî hene? 625
682. Kesê kor, gelo dikare li pêşiya cemaetê îmamtiyê bike? 626
683. Ma pîrek dikare serê apê mêrê xwe yê seqet bişo, an na? 627
684. Seqetên ku nikarin tu karî bikin, dikarin pereyê xwe di faîzê de bixebitînin? 627
HEVZAYENDÎ 629
685. Gelo Îslam li mijara hevzayendiyê çawa dinihêre? 629
686. Hukmê jiyana hevzayendiyê -sirf ji aliyê hestî ve- çi ye? 629
687. Bi şermezarî dinivîsim, ez hevzayend im. Lava dikim alîkariya min bikin? 630
688. Herçiqas zor û zehmet bû jî êdî min dev ji gaytiyê berda 637
689. Ez çawa dikarim dev ji hevzayendiyê berdim? 640
ÇAVKANÎ 642

PÊŞGOTIN

Hemd û spasiyên bêdawî ji Xwedayê alemê re bin. Selat û selam bi berdewamî li ser pêxemberê axirzeman Muhemmed aleyhisselam; li ser malbata wî, heval û hogirên wî û li ser yên ku dane pey wî bin.

Di sala 2008an de dema ez li Weqfa Suleymaniyeyê dixebitîm, Birêz Mamoste Abdülaziz Bayındır car caran dianî ziman ku divê ez lêkolîn û xebatên wan bi bal zimanê Kurdî ve wergerînim. Lê mixabin ji ber qelsiya min a di warê Kurdî de min cesaret nedikir û ditirsiyam ku ez ê di karekî wiha bi ser nekevim. Ji bo vê yekê min dest bi kursa zimanê Kurdî kir û min hewl da ez bi awayekî rêk û pêk ziman fêr bibim, kêmasiyên xwe temam bikim. Bi kerem û îhsana Xwedê, min dest bi xwendina Kurdî kir heta ku bawerî bi min re çêbû ku –digel hin kêmasiyan jî– êdî ez ê bikaribim ji zimanê Tirkî wergeran bikim.

Berhema bi navê **Fetwayên Kurdî**, ji wergera hin fetwayên Weqfa Sulemaniyeyê yên ku di malpera **www.fetva.net** hatine weşandin pêk tê. Her roj çi bi rêya telefonê çi jî bi rêya înternetê ji çar aliyên dinyayê bi dehan pirs ji Weqfa Suleymaniyeyê tên kirin. Ev pirsên han bi gelemperî, bi rêveberî û rêya Dr. Yahya Şenol ve tên amadekirin. Lê hin nivîsên ku pisporiyeke taybet dixwaze, ji aliyê Prof. Dr. Servet Bayındır, Prof. Dr. Hüseyin Hansu, Dr. Fatih Orum, Dr. Adem Yıldırım û Dr. Suat Erdoğan ve hatine amadekirin. Ji ber vê yekê ji bilî nivîsên Yahya Şenol, navê amadekar li binê fetwayê bi nîşana du stêrkan "**" di jêrenotê de hatiye nîşandan. Bersivên ku tên amadekirin, ji aliyê Abdülaziz Bayındır ê ku 21 salan li Muftîxaneya Stenbolê Serokatiya Heyeta Fetwayan kiriye ve tên kontrolkirin û ji

têkildaran re tên şandin. Ne hemû pirsên ku hatine bersivandin belbî yên ku munasib hatine dîtin, di malperê de tên weşandin. Fetwayên ku di malperê de tên weşandin, daxuyaniya di derbarê nav û paşnav û navnîşana e-postayê û hwd. ji tiştên ku bi nasnameya pirsyar ve têkildar e cih nagire.

Di rastiya xwe de ev berhema ku li ber destê we ye, encama xebata nêzî çar salan e. Lewra piştî ku ez di sala 2011an de vegeriyam welêt, li ser daxwaza Mamoste Abdülaziz Bayındır, min dest bi karê wergera fetwayan kir û piştre min ew di malpera **www.fetwayenkurdi.com** de weşandin. Ev nêzî sê salan e ku malper çalak e û hema çi bigire her roj, wergera fetwayekê di malpera navborî de tê weşandin.

Divê were zanîn ku fetwadayîn, di mijareke olî û huqûqî de ragihandina nêrînê ye. Ango ji bo fetwadayînê hewcedarî bi hebûna dewleteke Îslamî tune ye. Kesên fetwayan didin (muftî) seyda ne û nêrînên xwe radigihînin. Kesên ku nêrînên wan mentiqî û hevgirtî bibînin dê li gorî wan nêrînan tev bigerin, eger nebînin dê ji muftiyekî din bipirsin û li gorî fetwaya wî ‘emel bikin û tev bigerin.

Berhem, ji heşt beşan pêk tê. Di **beşa yekem** de me cî da fetwayên; bi bawerî û usûlu’l-fiqhê; mijarên di derbarê desmêj, xusul, xwînmeh, qilifkirina diranan û cenaze; ji ‘îbadetan jî meseleyên di derheqê nimêja înê, rojiya meha Remezanê, fitre û hec û ‘umreyê; herî dawî jî pirs û bersivên ku bi nezir û ceza ve girêdayî ne. **Beşa duyem**, di derbarê mijarên kirîn û firotin ango danûstendin, faîz, deyn, borsa û zayîbûna emanetan de ye. **Beşa sêyem**, di derheqê dawet, zewac, berdan û ewladgirtinê de ye. **Beşa çarem**, li ser pirs û bersivên di derheqê cîhad, têkiliya bi xeyrimisliman re û hemwelatiya dewletên Ewrûpa ye. **Beşa pêncem**, di derbarê çend mijarên cuda; ji pirs û bersivên di derheqê cin, efsûn, xurafe û dua de ye. **Beşa şeşem**, li ser mijarên mîna cil û berg; têkiliya bi eqrebayan re, jiyana malbatî û jiyana cinsî ye. **Beşa heftem**, li ser meseleyên fetwayan, pirs û bersivên di derheqê hedîs û nuzûla Hezretî Îsa de ye. **Beşa heştem** jî di derbarê tedawiya bi rêya bioenerjiyê,

xwekujî, ajal, mudaxeleya genan, astengdar û pirs û bersivên di derheqê hevzayendiyê de ye.

Di vê xebatê de gelek jêder û çavkanî derbas dibin. Di wergerên Qur'ana Pîroz de di serî de navê sûre, piştre jimara sûre û ayetê (wekî mînak: Beqere, 2/255); gava îşaret bi bal du sûre an jî berheman ve hatibe kirin bi danîna vê ";"nîşanê (wekî mînak: Taha 20/ 55; Murselat, 77/25 û ji yên hedîsê jî: Nesaî, Teharet, 160; Îbn Mace, Teharet, 96; Ehmed kurê Henbel, **Musned**, VI/6); heke du ayet an jî du rûpelên ji heman berhemê bin (wekî mînak: Nîsa, 4/22-24 û 'Eclûnî, **Keşfu'l-Xefa**, II, 283-284); eger ne li pey hev bin bi bêhnok ango bi vê "," nîşanê, hatiye diyarkirin. Di hin cihan de bi îşareta "*" stêrkekê bi tenê çend tişt ji aliyê min ve lê hatine zêdekirin.

Wekî din di çavkaniyên hedîsê de di Buxarî, Ebû Dawûd, Nesaî, Tirmizî û Îbn Mace de navê berhemê, kîtab û jimara bab (wekî mînak: Buxarî, Wudû', 54); di Muslim û Muwetta ya Îmam Malik bi piranî navê berhemê, kîtab, bab û jimara hedîsê (wekî mînak: Muslim, Teharet, 86 (277); di **Musned** a Ehmedê kurê Henbel û ji bilî yên navborî di çavkaniyên hedîsê yên din de navê nivîskar, berhem, berg û rûpel (wekî mînak: Ehmedê kurê Henbel, **Musned**, I/364) hatine destnîşankirin. Ji bilî vê, nasnameya berhemê cara pêşîn bi temamî; di carên din de bi kurtasî hatiye dayîn. Herî dawî di beşa jêderan de li gorî cureyên berheman me cî da navê wan. Bi qasî derfet û îmkanên xwe min hewl da ku di wergerê de zimanekî hêsan û zelal bikar bînim. Lewra hêviya me ew e ku ev berhem, ji civaka Kurdan xîtabî temamê Kurmancan bike. Ji bilî vê, heta ji destê min hat, min li gorî hevoksaziya Kurdî wergerandiye.

Ked û xebata gelek hevalan di vî karî de heye. Ji ber vê yekê, ez spasiya Seydayê Mele Muhammed Kandemir, Zülküf Taş, Mamoste Muhammed Baki İleri, Fethullah, Sinan Çakar, Mijdat û Mustafa Acar dikim. Lewra bi saya xwendin, sererastkirin û pêşniyariyên wan, min gelek şaşiyên xwe rast û tekteşe kirin.

Mîna ku diyar e, berhem û wergerên di warê dîn û zanistên olî de pir hindik in. Ango valahiyeke girîng xuya dike û hewcedarî bi xebatên ji vî celebî heye. Bi hêviya ku beşeke ji wê valahiyê dagire, me xwest ku em vê xebatê pêşkêşî xwendevanên zimanê Kurdî bikin. Eger xwendevanên hêja, me ji xeletî û şaşiyên me –çi ji aliyê zimên çi jî ji aliyê naverokê ve– agahdar bikin, em ê dilşad û bextewar bibin.

Xebat ji me, serkeftin ji Xwedayê Mezin e.

Haşim ÖZDAŞ

16/12/2016 WAN

KURTEBÊJE

a.s. : ‘Eleyhisselam

amd. : Amadekar

b.m. : Bê mêjû

Bnh. : Binihêrin

c. : Berg

DİA : Ansîklopediya Îslamî ya Dîyanetê (Diyanet İslam Ansiklopedisi)

ed. : Editor

hwd. : .ç.ç.ç.ç.ç.ç.

İFAV. : jgkhgkhjk

rp. : Rûpel

s.a.w. : Sellellahu ‘eleyhi we sellem

TDV. : Weşanên Weqfa Dîyanetê (Türkiye Diyanet Vakfı)

TDVY **:** Weşanên Weqfa Dîyanetê (Türkiye Diyanet Vakfı Yayınları)

Thq. : Tehqîq

w. : wefat

x.j.q. : Xwedê jê qayîl be

BEŞA YEKEM

- **BAWERÎ**
- **USÛLU'L-FIQIH**
- **DESMÊJ**
- **XUSUL**
- **XWÎNMEH**
- **QILIFKIRINA DIRANAN**
- **CENAZE**
- **NIMÊJA ÎNÊ**
- **ROJÎ**
- **FITRE**
- **HEC Û 'UMRE**
- **NEZIR**
- **CEZA**

BAWERÎ

1. Ma Xwedê Teala li ku ye?

Pirs: Xwedê Teala li ku ye? Gelek ayet û hedîs nîşan didin ku Xwedê Teala li asîmanan e û her çar Îmamên mezheban jî vê yekê dibêjin. Çend ayetên ku wekî delîl anîne jî wiha ne: "**Erê ma hûn ji wî Xwedayê li jor piştrast in ku kevirbaranekê bi ser we de nerijîne?**" (Mulk, 17) "**Ew, ji Xwedayê xwe yê ku di ser wan re ye ditirsin û ya pê hatine fermankirin jî dikin.**" (Nehl, 50) "**Naxêr, wan Îsa nekuştiye, belkî Xwedê ew hildaye cem xwe.**" (Nîsa, 158) Di derbarê mijarê de du hedîs wiha ne: "Pêxemberê me ji cariyekê pirsiye: "*Xwedê li ku ye*?" Wê jî wiha bersiv daye: "Li asîmana ye." Vê carê pirsiye: "*Ez kî me?"* Dema cariyê bersiv daye gotiye: "Tu qasidê Xwedê yî", Pêxemberê me ji efendiyê cariyê re gotiye: "*Tu wê azad bike. Lewra ew yeka bawermend e*." (Muslim, Ebû Dawûd, Nesaî). Li gorî ku Qasidê Xwedê, cariyeya ku gotiye Xwedê Teala li asîmana ye, yeka bawermend nîşan daye, ev yek dide diyarkirin ku ji bo îman û baweriyê divê ku mirov bizanibe Xwedê li asîmana ye. Pêxemberê me wiha jî gotiye: "*Ma hê jî hûn bi min ewle nabin, digel ku ez emînê Xwedayê ku li asîmana ye, me?*" (Buxarî û Muslim) Belê seydayê min li gorî ku min xwendiye Xwedê li asîmana ye. Em dikarin vê yekê di Qur'anê, hedîsan, gotinên sehabeyan de bibînin û baweriya çar Îmaman jî wiha ye…. Ma hûn di vê meseleyê çi dibêjin?

Bersiv: Dema سماء=sema tê gotin, berî her tiştî asîman tê hişê meriv. Asîman, temamê dinyaya gilover di xwe de digire, dipêçîne. Pêş, paş, jor û jêrê me tevde bi asîman hatiye dorpêçkirin. Sema, bi wateya bilindahiyê jî tê. 'Ereb ji bo banê xênî, bo pişta hespê û heta ji bo gihaya ku ji erdê bilind bûye jî dibêjin sema.[1]

[1] Bnh: Îbn Faris, **Mu'cemu Meqayisu'l-Luxe, "سمو" s-m-w.**



Wêneyê li jor, ê dinyayê ye.[2] Pêş, paş, ser û binê wê tevde sema ye.

Tiştekî ku em Xwedê bişibînînê tune ye.[3] "**Yê ku li asîmanan Xweda û li erdê jî Xweda, Ew e. Her Ew e yê karbinecih, yê zana**."[4]

"**Ê ku erd û asîman di şeş rojan de afirandine Ew e. Piştre li ser 'Erş raser bûye. Ew, bi ya ku dikeve erdê û bi ya ku jê derdikeve, bi ya ku ji asmên tê xwarê û bi ya ku hildikişe asmên jî dizane. Hûn li ku derê bin, Ew ligel we ye. Xwedê bi ya ku hûn dikin, bîner e. Xwedanî û hukumraniya erd û asmanan jê re ye û her kar û bar bes bi bal Wî ve têne vegerandin**."[5]

"**Birastî Me însan afirandiye û Em bi ya ku nefsa wî jê re dibêje dizanin û Em ji rahjiyana (şahdamara) wî jî bêhtir nêzîkî wî ne**."[6]

Xwedê Teala bi zanîn û şiyana xwe li her derê ye. Ew ji rahjiyana (şahdamara) me jî bêhtir nêzîkî me ye. Ji vê bonê Ew, bi tiştên di dilê me de derbas dibin dizane. Firîşteyên ku li ser me wezîfedar in jî nêzî me ne, lê belê nêzîkayiya wan ne bi qasî ku

[2] Ev wêne, ji navnîşana http://www.resimler.tv/resim4845.htm, hatiye girtin.
[3] Şûra, 42/11.
[4] Zuxruf, 43/84.
[5] Hedîd, 57/4-5.
[6] Qaf, 50/16.

bi tiştên di dilên me de veşartî ne, bizanibine. Ew, bi tenê gotinên ji devê me derdikevin û karên ku em dikin, dizanin. Xwedê Teala wiha ferman dike:

"**Li rast û çepê însên du peywirdarên rûniştî hene ku her hal û hereketên wî dinivîsin. Însan çi bibêje, her li balê çavdêr û amadekarek heye**."[7]

"**Birastî li ser we zêrevan hene. Ew, xwedanrêz û birûmet in, her tiştê hûn dikin dinivîsin. Ew, a ku hûn dikin dizanin**."[8]

Wê gavê peyva "Xwedê li asîmanan e", ne ji bo diyarkirina cihekî bo Wî, belbî ji bo îfadekirina mezinantiya Wî ye.

2. Ma têgihîştina Xwedê bi awayekî tam, guncaw e?

Pirs: Seyda, ez mamosteyê çanda dînî me. Xwendekarên min, pirsa ka Xwedê Teala ji çi çêbûye dikin. Ez dibersivînim; lê cewabên hîn xweştir ji we daxwaz dikim. Ma di vî warî de berhemek we heye? An jî hûn tewsiya xwendina kîjan pirtûkê li min dikin?

Bersiv: Mexlûq, nikarin di afirîner de tam têbigihîjin. Teknolojiya kompîturê çiqas pêş de biçe jî dîsa jî nikare di derheqê hilberînerê xwe de bibe xwedî fikir. Eger bernameyek ji ya ku hilberîner lê siwar kiriye, were barkirin, dê kompîtur bisekine û nexebite. Em jî encax bi qasî ku ji me re hatiye dayîn, dikarin bizanibin. Ji vê bonê Xwedê Teala wiha ferman kiriye:

"**Xweda! … Ji Wî pê ve tu îlah tun in. Her sax e, hebûna Wî bi Wî ye. Ne xew Wî digire ne jî hênijîn. Tiştên li erd û asîmanan, her ên Wî ne. Ji bilî yê ku Wî destûr dabe ew kî ye ku li cem Wî mehderiyê bike? Bi tiştê ku mirov dikin û tiştê ku kirine jî dizane. Ji ya ku Wî xwestiye pê ve, kes bi tiştekî ji zanîna Wî nizane.**

[7] Qaf, 50/17-18.
[8] Înfîtar, 82/10-12.

Kursiya Wî erd û asîman di xwe de vehewandine. Parastina wan pê giran nayê. Ê raser ê mezin her Ew e."[9]

"**Çav tênagihîjin, lê Ew bi xwe çavan dibîne. Yê hûrbîn û kûrbîn û bi her tiştî agahdar her Ew e**."[10]

"**Ê pêşîn û yê paşîn jî Ew e. Yê diyar û yê nepen jî Ew e. Ew, bi her tiştî dizane.**"[11]

Ji bo ravekirina mijarên wiha bo zarokan, hûn dikarin ji berhema Mehmet Emin Ay ya bi navê "**Çocuklarımıza Allah'ı Nasıl Anlatalım",** sûd wergirin.

3. Ma "Rebb/Perwerdegar", di nav Esmayê Husna de cih nagire?

Pirs: Digel ku "Rebb" ji navên Xwedê Teala ye, gelo çima di nav "Esmayê Husna" de cih nagire?

Bersiv: "**Rebb**", navek ji navên Xwedê ye û bi wateya "xwedî", "efendî", "rêveber", "xwedîkirin", "perwerdegar", "ê ku nîmetan dide" û hwd. tê.

Di Qur'ana Pîroz de piştî navê Ellah herî zêde ji navên îlahî **Rebb**, hatiye bikaranîn. Di hedîsan de jî ji bo navê Xwedê derbas dibe.

Lîsteya Esmayê Husna ya ku di nav misilmanan de belav bûye û bi şeklê 99 navan tê zanîn, di Kutubê Sitte de bi riwayeta ji Ebû Hureyre bi tenê di Tirmizî û Îbn Mace de dibore. Buxarî, Muslim, Nesaî û Ehmedê kurê Henbel di berhemên xwe de cih nedane vê lîsteyê.

"Baweriya gelek aliman ew e ku beşa duyem ji hedîsa Ebû Hureyre -not û neh nav- di eslê wê de tune ye û ji aliyê rawî ve hatiye zêdekirin. Cihnegirtina vê lîsteyê di Buxarî û Muslim de bi vê yekê hatiye şîrovekirin. Lewra herdu muhedisên ku cih

[9] Beqere, 2/255.
[10] En'am, 6/103.
[11] Hedîd, 57/3.

dane vê lîsteyê, bîst û pênc navên ku Tirmizî cih daye wan di Îbn Mace de, ji sed navên ku di Îbn Mace de hene jî bîst û şeş nav di Tirmizî de derbas nabin. Herdu lîste bi hev re digihên 125 navan.

Digel vê jî hin navên ku di Qur'anê de hene û di van herdu riwayetan de cih negirtine, navên ji heman kokê derketine yan jî ji kokên cuda çêbûne lê di eynî wateyê de ne jî di lîsteyê de hene. (…)

Hin aliman hewl dane ku navên di Qur'anê de neborîne lê di hedîsa navdar de derbas dibin jê temam dikin. Hinekên din jî di çarçoveya rêgezên ku wan bi xwe danîne, hin tesbîtên nû kirine. Îbn Hecer, bîst û heft navên ku di lîsteya Tirmizî de diborin lê di Qur'anê de tune ne diyar kiriye û di şûna wan de ji Qur'anê bi qasî wan nav dîtine û bi vî awayî lîsteke nû saz kiriye."[12]

Di lîsteya ku ji aliyê Îbn Hecer ve hatiye amadekirin de navê "Rebb", di nav Esmayê Husna de cih digire.

4. Xeyb çi ye? Baweriya bi xeybê çawa pêk tê?

Pirs: Gelo girîngiya baweriya bi "xeybê" ya ku di ayeta 3yem ji sûreyê Beqere derbas dibe, ji ku tê? Lewra "xeyb", bi awayê "her bûyera ku têgihîştina wê ji aliyê kesan ve zor e" tê tarîfkirin. Di vê rewşê de ma çima em bi baweriya tiştê ku têgihîştina wê zehmet e yan jî bi awayekî rêk û pêk em fêhm nakin, berpirsyar hatine girtin? Mebesta Xwedê Teala ji vê yekê çi ye? Ma divê em ayeta 3yem ji sûreyê Beqere çawa fêhm bikin?

Bersiv: Meala ku em didin çend ayetên pêş ji sûreyê Beqere wiha ye:

[12] Bnh: Bekir Topaloğlu, "Esmâ-i Hüsnâ,"**DİA,** 1995, XI, 407-408; heman muellif, "Rab", **DİA,** 2007**,** XXXIV**,** 372.

"**Elîf, Lam, Mîm. Kitêb ev e; qet tê de guman tune ye. Ji xweparêzan re rêber e. Ew ên ku ji dil[*] bawer dikin û bi awayê pêdivî nimêj dikin û ji rizqê ku Me daye wan xerc dikin**."[13]

Xeyb, ji tiştên ku bi hewas û endaman nayê zanîn re tê gotin. Du cureyên xeybê hene. Yek jê xeyba mutleq e, ku ji bilî Xwedê Teala tu kes pê nizane. Ya din jî xeyba îzafî ye; hin kes dizanin, hinên din jî pê nizanin. Ya di dilê mirov de ji bo biyaniyan xeyb e. Bawerî, tesdîqkirina bi dil e. Ji ber ku tu kesek ji tesdîqa di dil de agahdar nabe, ev dibe tesdîqeke di xeybê de. Weteya xweparêz/mutteqî di xeybê de bawer dikin, ev e. Ev jî di zimanê Kurdî divê wiha were wergerandin: "…ji dil bawer dikin…" Hin mirovên ku ji dil bawer nekirine û xwe bawermend nîşan didin jî hene. Ha ew kesên munafiq in. Hukmê wan, di çend ayetên pêş de tê diyarkirin.

Xeyb, bo tiştên veşartî ku bi çavan nayên dîtin, tê gotin.[14] Ji ber ku îman, di dil de ye, di xeybê de pêk tê. Hin tiştên di dil de bi aqlê manewî ango bi besîretê tê dîtin, lê mirov tam pê ewle nabe. Lewra tiştên tê de dibe ku werin veşartin. Jixwe li Medîneyê hin munafiqên wisa hebûn ku xwe bawermend nîşan didan û Pêxemberê me (s.a.w) bi wan nedizanî.[15]

Firîşte jî tam ewle nabin ku bi rastî jî ka kî bawermend e û kî ne bawermend e. Ew jî ne li dil, lê belê li gotinên ji dev derdikevin û li kirinên meriv, dinihêrin. Xwedê Teala wiha ferman dike:

"**Birastî Me însan afirandiye û Em bi ya ku nefsa wî jê re dibêje dizanin û Em ji rahjiyana (şahdamara) wî jî bêhtir nêzîkî wî ne**. **Li rast û çepê însên du**

[*] Wateya tam ya ayetê wiha ye: "**Di wê xeybê de baweriyê tînin, ango îmana wan di xeyba wan de ye**." Xeyba wan jî ya ku ji wan pê ve kes pê nizane. Ev jî dibe baweriya ku di dilê wan de ye.

[13] Beqere, 2/1-3.

[14] Bnh: Raxib el-Isfehanî, **Mufredat,** thq: Safwan 'Adnan Dawûdî, Dimeşq û Beyrût 1412/1992**, "**غيب**"** x-y-b.

[15] Bnh: Tewbe, 9/101.

peywirdarên rûniştî hene ku her hal û hereketên wî dinivîsin. Însan çi bibêje, her li balê çavdêr û amadekarek heye"[16]

Ji vê bonê ye ku roja qiyametê ji Xwedê pê ve tu kes mehderiyê nake. Xwedê Teala wiha ferman dike:

"**Ji bilî yê ku Wî destûr dabe ew kî ye ku li cem Wî mehderiyê bike? Bi tiştê ku mirov dikin û tiştê ku kirine jî dizane**."[17]

Ji ber vê ye ku di mijara baweriyan de kotekî nayê kirin. Lewra Xwedê Teala gotiye ku "**Di dîn de zordarî tune ye.**"[18] Xwedê Teala, di îmanê de teqeziyê şert didêre û wiha ferman dike:

"**Nekeve pey a ku derbarê wê de tu jê bêagah î. Bêguman guh, çav û dil ji ya ku ew dikin, berpirs in**."[19]

Em ne bi xeybê, belbî bi ya darîçav ango bi tiştên ku em bi çavên serê xwe yan jî bi besîreta xwe bi awayekî teqez dibînin, baweriyê tînin. Ji lewra em dibêjin "Eşhedu enne Muhemmeden resululah." Ango "Ez şahdeyiyê didim ku Muhemmed qasidê Xwedê ye." Lewra her kesê Qur'ana ku belgeya qasidtiya wî ye fêhm bike, dê vê yekê bi besîreta xwe bibîne. Celatkrina kesên kafir jî ji ber tevgera wan a şaş ya li hemberî rastiya ku bi awayekî zelal derketiye holê, ye.

"**Piştî ku rêya rast jê re aşkere bû, kî dijraberiya wî qasidî bike û di rêya misilmanan de neçe, Em ê wî di rêya ku berê xwe dayê de bihêlin û Em ê wî bixin dojehê. Çi pîsewar e ew dojeh!**"[20]

[16] Qaf, 50/16-18.
[17] Beqere, 2/255.
[18] Beqere, 2/256.
[19] Îsra, 17/36.
[20] Nîsa, 4/115.

5. Ma baweriya me, divê ku bi rêya aqil be?

Pirs: Ma divê ku baweriya me bi rêya aqil be? Ango em bi dil bawer dikin û bi dev jî dibêjin. Da ku baweriya me rast û durist be, ma divê ku em vê bi aqlê xwe jî tesdîq bikin? Lewra baweriya ku tam nekeve serê mirov dê çiqas bi hêz be û wê li dijberî ramanên dijraber çawa li ser piyan bisekine?

Bersiv: Em di kelîmeya şahdeyê ya ku şertê pêşîn e ji bo baweriyê, wiha dibêjin:

"Ez şahdeyiyê didim ku ji Xwedê pê ve tu îlah tune ne. Ez şahdeyiyê didim ku Muhemmed jî qasidê Wî ye."

Şahdedayîn, bi wateya dîtina bûyerekê ye. Ji kesê ku bûyer nedîtibe re nayê gotin şahid. Em Xwedê nabînin, lê belê bi çavdêriya li derdora xwe mîna ku me Ew dîtibe têdigihîjin, em dizanin ku ji Wî pêve tu îlahekî din tune ye. Baldar bin, em nabêjin "li gorî min bihîstiye" an jî "li gorî ji min re hatiye gotin, ji Xwedê pêve tu îlah tune ne." Li berevajî vê em dibêjin "Ez şahdeyiyê didim." Ango "mîna ku min bûyer bi çavê serê xwe dîtibe, bi awayekî teqez ez bawer dikim." Ev jî dide nîşandan ku heta em bi aqlê xwe nedin nepejirandin, me bawerî neaniye.

6. Di axirzeman de ma divê îmana mirov mîna ya pîrejinan be?

Pirs: Ma hedîsek bi vî awayî "Di axirzeman de wekî îmana pîrejinan baweriyê bînin, mîna wan îtiqad bikin." heye? Ger hebe jî gelo dereceya wê çi ye? Ma mebest ji vê gotinê çi ye? Ji ber ku bêhna propoganda nezaniyê jê tê, ez di rastiya vê hedîsê de hin zehmetiyan dikişînim. Li berevajî vê, girîngiya zanînê di dîn de çi ye? Di baweriyê de divê ku pîvan çi be? Behra aqil di îmanê de çi ye? Teslîmbûn û baweriya çavgirtî bi xêrtir e yan jî îmana bi pirs û lêpirsînê qenctir e? Ji ber ku ez her tiştî vedikolim, ji derdora xwe ve têm rexnekirin. Tê hizirkirin ku ez teslîm nabim. Hergav ji min re tê gotin ku tu ehemiyeta zanînê tune ye. Ya girîng ew e ku tu bê pirs

û lêpirsînê bawerî bînî. Ma divê pîvana mirov çi be? Qur'ana Pîroz rêyeke çawa bi ber mirov dixe?

Bersiv: Di tu çavkaniyên hedîsê yên ku me xwe gihandiye wan de me tebîreke bi awayê "îmanu'l-'acûz" ango "baweriya pîrejinan" nedît.

Xwedê Teala di Qur'ana Pîroz de diyar dike ku mirov dê çawa îmanê bîne. Da ku mirov li dinya û axretê bextewar bibe, divê îmana mirov li gorî pîvanên ku Xwedê danîne be. Di ayetekê de Xwedê Teala wiha ferman dike:

"**Bêguman ên bawermend, bes ew ên ku dema navê Xwedê tê gotin dilê wan dilerize û gava ku ayetên Xwedê li ser wan tên xwendin, baweriya wan zêde dike û her xwe dispêrin Rebbê xwe.**

Ew ên ku bi awayê pêdivî nimêj dikin û ji rizqê ku Me daye wan xerc dikin.

Ha bawermendên rasteqîn ew bi xwe ne. Ji bo wan li cem Rebbê wan mertebe (yên bilind), lêborîn û rizqekî berfireh heye."[21]

Ji bo têgihîştina girîngiya zanînê di dînê Îslamê de ku mirov li ser hikmeta fermana "bixwîne"[22] bifikire, besî mirov e. Wekî din jî Xwedê beyan kiriye ku Wî dereceya kesên zana di ser ên din re girtiye. Ayetek wiha ye:

"**Ew ên ku ji we bawerî anîne û ew ên ku zanîn ji wan re hatiye dayîn, Xwedê mertebeya wan bilind dike**."[23]

Divê mirov bi şuûr baweriyê bîne. Di îmanê de cih ji dudiliyê re tune ye. Ango divê ku îmaneke vebirî be. Di dînê me cî ji îmana çavgirtî û ya bêşuûr re tune ye. Xwedê Teala wiha ferman dike.

[21] Enfal, 8/2-4.
[22] 'Eleq, 96/1.
[23] Mucadele, 58/11.

"**Bawermend, bi tenê ew ên ku bi Xwedê û resûlê Wî îman anîne, piştre jî qet nakevin gumanê û di rêya Xwedê de bi mal û canên xwe cîhadê dikin. Ha ew in ên rast û durist.**"[24]

Kesê bawermend herçiqas lêkolînên kûr neke jî divê ku bizanibe ka bi çi bawer dike û çima îmanê tîne. Rast e ku di mijara baweriyê de cihekî mezin bo zanînê heye. Bi vegotineke din, eger hûn bi delîlên ku baweriyê misoger dikin îqna bibin, ne hewce ye ku hûn hikmeta fermanan fêr bibin. Gava mirov fermaneke dînî pêk bîne bê gotina "Ka hikmeta vê çi ye, çi fêdeya wê li min heye?", divê mirov wiha bibêje "Xwedê wiha ferman kiriye, li gorî baweriya xwe divê ez vê yekê bînim cî." Jixwe Îslam jî ev e. Xwedê wiha ferman dike:

"**Dema ku bawermend bi bal hukmê Xwedê û qasidê Wî ve werin vexwendin da ku di nav wan de hikum bike, gotina wan bes ev e: Me seh kir û me qebûl kir. Jixwe yên serfiraz bûne, ew bi xwe ne**."[25]

"**Bedewiyan gotin: Me bawerî anî. Bibêje: We bawerî neaniye, lê belê bibêjin; Em teslîm bûne. Hê jî îman di dilê we de bi cî nebûye. Heke hûn bi gotina Xwedê û qasidê Wî bikin, Xwedê dê ji karên we tiştekî kêm neke. Bi rastî Xwedê gunehjêbir e, dilovîn e**."[26]

7. Kesê jiyana xwe di rêya Xwedê de borandibe, ma di sekratê de bê îman diçe?

Pirs: Eger mirov 'îbadetên xwe yên rojane bike û xwe ji gunehan biparêze, gelo di gava mirinê de îhtimala windakirina îmanê heye?

Bersiv: Gava em li ayetên Qur'anê biponijin diyar dibe ku Xwedê Teala kesên kafir[27], fasiq[28], zalim[29], derewkar û nankor[30], derewkarên ji serxwe çûne[31] û kesên ku

[24] Hucurat, 47/15.
[25] Nûr, 24/51.
[26] Hucurat, 47/14.
[27] Beqere, 2/264; Maîde, 5/67; Tewbe, 9/37; Nehl, 16/107.

bi ayetên Wî baweriyê nayînin[32] nayêne rêya rast û Xwedê wan rasterê nake. Lewra wan, rêya delalet û şaşîtiyê hilbijartine. Ji lewre Xwedê jî wan di delaletê de dihêle.

Lê belê diyar kiriye ku kesên berê xwe dane Xwedê[33], ên ku li qayiliya Wî digerin[34] û yên di rêya Wî de cehd û xebatê dikin[35], dê wan hîdayet bike û gotiye ku "**Kî, xwe bi Xwedê bigire, teqez ew bi ser rêya rast ve bûye**"[36] Lewra wan kesan, hîdayet hilbijartine û di ser de jî cehd û xebata lazim pêk anîne. Ji ber vê yekê Xwedê jî ew rasterê kirine.

Eger hûn hewl bidin da ku mîna Xwedê xwestiye bijîn dê Xwedê, di nefesa dawî de digel we be û baweriya we winda nabe. Xwedê Teala wiha ferman dike:

"**Bêguman ew ên ku bawerî anîne û karên rind kirine, bi awayê pêdivî nimêj kirine û zekat dane, ji wan re li nik Perwerdegarê wan xelata wan heye. Ne tirs li ser wan heye, ne jî ew xemgîn dibin**."[37]

8. Ma di sekratê de pelîd tê ku îmana mirov bistîne?

Pirs: Seyda, gelo di ber mirinê de şeytan tê ku îmana mirov bibe? Di sekratê de digel têkoşîna bi serxweşî û zehmetiyên mirinê re ma mirov dê bi pelîd re jî mijûl bibe? An jî ev xurafeyeke ku terîqetan avêtine holê?

Bersiv: Ev bawerî, dereweke mezin e ku ji aliyê terîqetan ve hatiye derxistin. Ew, bi rêya vê derewê, hewl didin ku şêxê xwe pîroz û wan wekî rizgarker nîşan bidin.

---

[28] Maîde, 5/108; Tewbe, 9/24, 80; Seff, 61/5; Munafiqûn, 63/6.
[29] Beqere, 2/258; Alî Îmran, 3/86; Maîde, 5/51; En'am, 6/144; Tewbe, 9/19, 109; Qeses, 28/50; Ehqaf, 46/10; Seff, 61/7; Cum'e, 62/5.
[30] Zumer, 39/3.
[31] Mu'min, 40/28.
[32] Nehl, 16/104.
[33] Re'd, 13/27; Şûra, 42/13.
[34] Maîde, 5/16.
[35] 'Enkebût, 29/69.
[36] Alî Îmran, 3/101.
[37] Beqere, 2/277.

Xwedê Teala di bara bawermendan de wiha ferman dike:

"**Bêguman ew ên ku dibêjin: 'Perwerdegarê me Xwedê ye', paşê xwe rast û durist jî dikin; firîşte bi ser wan de tên û ji wan re dibêjin: 'Metirsin, xemgîn mebin û bi wê bihuşta ku soza wê ji we re hatiye dayîn, dilşad bibin!'**

Em li jiyana dinyayê û li axretê jî dost û piştgirên we ne, di bihuştê de tiştê ku dilê we bibijiyê û ya ku hûn bivên, ji bo we heye.

Ev, qedirgirtin û mazûvaniyeke ji cem Xwedayê ku gunehjêbir e, dilovîn e.

Erê ma gotina kê ji ya wî kesê ku xelkê gazî bal Xwedê ve dike, kar û kiryarên qenc dike û dibêjê: 'Bêguman ez ji misilmanan im', spehîtir e?"[38]

Mîna ku diyar bû kesên baweriyê bînin, kar û barên rast û durist bikin, firîşte dê piştgiriya wan bikin û dê bibin dost û alîkarên wan. Evan kesên han, di sekratê de dê rastî xetera ku wê îmana xwe winda bikin jî neyên.

Di heqê kesên rêwinda û ji rêderketî de jî wiha hatiye fermankirin:

"**Ma ji wî kesê ku li ser (navê) Xwedê derewan lêtîne yan jî -digel ku jê re peyxam nehatiye- bibêje: 'Peyxam, ji min re ji cem Xwedê hatiye' û ji wî kesê ku dibêje: 'Çawa ku Xwedê ayet şandine, ez ê jî ayetan bişînim', stemkartir kî heye?! Xwezî te halê wan stemkaran bidîta! Dema ew bikevin ber serxweşiyên mirinê û firîşteyên (rihstên) penceyên xwe dirêjî wan bikin û ji wan re bibêjin: 'De heydê canê (rihê) xwe derînin.' Îro, bi sedema ku we îftira li Xwedê dikir û we xwe li hember ayetên Wî mezin dikir, hûn ê bi ezabê riswatiyê werin celatkirin.**

Sond be! Ka çawa Me, cara pêşîn hûn afirandin, dîsa hûn ê wisa bi tenê bi bal me ve bên. Hûn ê malê ku Me li cîhanê dabû we li dûv xwe bihêlin. Ka ew mehdervanên ku we guman dikir ku ew ê hevaltiya we bikin, li ku ne?! Sond be,

[38] Fussîlet, 41/30-33.

pêwendiya di navbera we û wan de ji binî ve qut bû û ew ên ku we hêviya xwe bi wan ve girêdabû ji ber we winda bûn.”[39]

9. Gelo raserbûna Xwedê ya li ser ‘erş, tê çi wateyê?

Pirs: Gelo wateya raserbûna Xwedê Teala ya li ser ‘erş çi ye?

Bersiv: Qur’ana Pîroz, bi zimanê gel hatiye hinartin. Xwedê Teala wiha ferman dike:

“**Me, her qasidek bes bi zimanê gelê wî şand, da ku ji wan re bi zelalî rave bike**.”[40]

‘Erş di zimanê ‘Erebî de bi wateya “kursiya desthilatdariyê” ye. Raserbûna li ser ‘erş jî bi wateya “destpêkirina bi karê hikumdariyê” ye. Di zimanên din de jî mîna “padîşah li ser text rûnişt” û hwd. vegotinên bi vî rengî hene. Wateya wan jî ew kes gihîşte wî meqamî. Gotina Xwedê li ser ‘erş raser bû jî bi vî awayî ye. Ev jî di wateya ku desthilatdariya gerdûnê di destê Xwedê Teala de ye.

10. Haşa, ma qudreta Xwedê ya afirandina kevirekî ku nikaribe hilgire heye?

Pirs: Ateîst, bi vê pirsa han li ber hebûna Xwedê Teala radibin: “Eger şîna Xwedê digihîje her tiştî, wê gavê ma dikare kevirekî ku nikaribe hilgire biafirîne?” Eger mirov bibêje “dikare biafirîne”, wê gavê wiha bersiv didin: “Xwedê nikare kevir hilgire, nexwe şîna Wî li ser her tiştî tune ye. Ji ber ku ev rewş dijraberî wesfê Xwedê yê qudretê ye, ev tê wateya ku Xwedê tune ye.” Eger mirov bibêje “nikare biafirîne”, wê gavê jî dibêjin: “Nexwe, qudreta Xwedê li ser her tiştî tune ye; ev jî ji ber ku li dijî wesfê Xwedê yê bingehîn e, Xwedê dibe tune.” Ma em dikarin bersiveke çawa bidin kesên wiha?

[39] En‘am, 6/93-94.
[40] Îbrahîm, 14/4.

Bersiv: Kesên bi vî rengî, baş dizanin ku Xwedê heye û yek e; lê belê Xwedê dişibînin xwe û dixwazin pê re qayişê bikişînin. Xwedê Teala wiha ferman dike:

"**Hûn ji bo Xwedê tu metelokan negerînin. Bêguman Xwedê dizane, lê hûn nizanin**." [41]

"**Tu tiştê mîna Xwedê tune ye. Yê bihîzer, yê bîner her Ew e**."[42]

"**Tu hemkûf û hevta jê re tune ne**."[43]

Wesfê Xwedê yê qadir, di wateya ku Xwedê hêz û qawetê dide kes û heyberan û sînoran datîne.[44] Hem zanîn hem jî hêza însên bi sînor e. Di vê babetê de Xwedê Teala wiha ferman dike:

"… **Ji ya ku Wî xwestiye pê ve, kes bi tiştekî ji zanîna Wî nizane.**"[45]

"**Bibêje: Eger ji bo peyvên Xwedayê min derya hibir bûna û Me ewqasî din jî lê zêde bikira, beriya ku peyvên Xwedayê min biqedin ew ê derya biqediyana**."[46]

"**Eger bi rastî çiqas darên li erdê hene bibin qelem, derya û bi qasî wê heft deryayên din jî hibra wan be, gotinên Xwedê dê xelas nebin. Bêguman Xwedê ʿEzîz e, Hekîm e**."[47]

11. Ma gunehê şirkê bi tu awayî nayê bexşandin?

Pirs: Hûn dikarin ji Qur'an, hedîs û mezheban mînak bînîn ku kesê ketibe nav şirkê dema ji dil û can tobe bike dê were bexşandin? Ayet dibêjin ku Xwedê Teala tu carî şirkê nabexşîne. Nexwe kesê ketibe şirkê, mafê wî yê tobekirinê jî tune ye.

---

[41] Nehl, 16/74.
[42] Şûra, 42/11.
[43] Îxlas, 112/4.
[44] Bnh: Îbn Faris, **Mu'cemu'l-Meqayis fi'l-Luxe**
[45] Beqere, 2/255.
[46] Kehf, 18/109.
[47] Loqman, 31/27.

Bersiv: Tevlî şirkê jî tu gunehekî ku bi tobê neyê efûkirin, tune ye. Şirka ku Xwedê Teala wê nabexşîne, şirka kesê ku bê tobe ji dinyayê çûye, ye.

"**Bêguman Xwedê şirkê nabexşîne, ji bilî vê ji bo kesê ku bexşandin heq kiribe, wî dibexşîne. Çi kesê ji Xwedê re hevpar çêkiribe, wî bêbextiyeke giran û gunehekî mezin kiriye."**[48]

Ev ayet, di derbarê yên ku tobe nekirine û mirine de ye. Lewra li gorî ayeta jêrîn, her guneh -digel şirkê jî- gava mirov poşman bibe dê were bexşandin.

"**Bibêje: Gelî bendeyên min ên ku ji ola xwe derketine! Hêviya xwe ji rehma Xwedê nebirin! Bêguman Xwedê li temamê gunehan dibore. Bêguman yê gunehjêbir, yê dilovîn her Ew bi xwe ye**."[49]

12. Ma li gorî Qur'anê, kesên ku bi hebûna Xwedê bawer nakin, kafir in?

Pirs: Xwedê Teala di ayeta 28an ji sûreyê Beqere wiha ferman dike: "**Hûn çawa Xwedê înkar dikin?! Hal ev e ku hûn berê mirî bûn. Wî hûn sax kirin, paşê dê we bimirîne, paşê dîsa dê we sax bike, piştî vê hûn ê bi balê ve bên vegerandin**." Lê hûn car caran di sohbetên xwe de dibêjin ku li ser rûyê erdê tu kes, hebûna Xwedê Teala mandel nake. Wê gavê, înkara ku di vê ayetê de dibore ma ji bo hebûna Xwedê yan jî înkara afirendiyên Wî ye?

Bersiv: Em ayeta navborî wiha werdigerînin:

"**Hûn çawa dikarin li hember Xwedê korî bin?! Hal ev e ku hûn berê bê can bûn, vêca Wî hûn sax kirin. Paşê dê we bêcan bike, paşê dîsa dê we bi can bike, piştî vê hûn ê derkevin hizûra Wî**."

[48] Nîsa, 4/48.
[49] Zumer, 39/53.

Di wergerên Qur'ana Pîroz de bêjeya "kufrê" bi gelemperî bi awayê "înkarkirin"ê tê wergerandin. "Kufur" di zimanê 'Erebî de bi wateya "nixumandin"ê ye. Di Kurdî de em dikarin vê bêjeyê bi gotina "nankoriyê" wergerînin.

Nixumandin, da ku mirov tiştekî nîşan nede. Nixumandina tiştê tune jî ne pêkan e. Kafir jî kesê îman û baweriya ku pê re ye vedişêre û dinixumîne.

Ji lewre, bo kafirbûna yekî nepejirandina fermanek an jî çend fermanên Xwedê, nepesendkirina wan an jî wan di cî de nebîne, têr dike. Kafirî, ev e.

13. Ma şeytan bêaqil e ku li ber Xwedê rabû?

Pirs: Ma şeytan mexlûqekî bê aqil bû ku li ber Xwedê Teala rabû? Ji vî aliyî ve divê em qiseya Adem û Îblis çawa fêhm bikin?

Bersiv: Şeytan, ne mexlûqekî bêaqil e. Ji ber ku şîn û qudreta Xwedê Teala dizanî, gava ku hate qewitandin jî jê destûr xwestiye. Di hin ayetan de tê îfadekirin ku şeytan, ji Xwedê Teala ditirse jî.

Lê belê divê mirov bala xwe bide vê yekê: Biaqilî û ku mirov aqilê xwe bikar neyine ne heman tişt in. Şeytan bi sedema ku aqlê xwe bikar neanî û piştre jî tobe nekir û bexşandina xwe nexwest, kete vê rewşê. Eger ji dêvla his û hisiyatan aqlê xwe bikar bianiya û piştî şaşiya xwe tobe bikira û bexşandina xwe bixwesta îro dê ne di vî halî de ba. Haşa haşa, Xwedê Teala ne stemkar e ku wî ji rê derxe û paşê wî bide sezakirin.

Hezretî Adem jî Xwedê Teala baş nas dikir. Heta temamê tiştan Xwedê fêrî wî kiribû. Ji vî aliyî ve Xwedê, mamostetiya wî kiribû. Xwedê, tiştek bi tenê li Adem qedexe kiribû. Lê belê rabû wê qedexeya Xwedê, binpê kir. Heta vir di navbera kirina wî û ya şeytên de tu cudahî tune ye. Yekî fermana Xwedê pêk neanî, yê din jî qedexeya Xwedê binpê kir. Ferqa di navbera wan de paşê derket holê. Şeytan, di mijara ku helwesta wî rast e înad kir, xwe mezin dêra û ji hizûra Xwedê hat

qewitandin. Lê Adem, fêhm kir ku kirina wî şaş bû û pêre tobe kir û bexşandina xwe xwest; hate bexşandin jî. Ango herduyan jî çi kiribin, bi xwe kirine. Xwedê Teala di kirina vî karî de tu zordarî li wan nekiriye. Jixwe ferqa di navbera ku mirov biaqil be û aqlê xwe bikar bîne di vir de derdikeve holê.

14. Şeytan çima bû kafir?

Pirs: Ji şeytên re kafir tê gotin. Lê belê ew dizane ku Xwedê Teala heye. Ma kafirbûna wî, ji ber serkêşî û rabûna wî ya li ber Xwedê ye?

Bersiv: Kafir, ji kesê hebûn û yekîtiya Xwedê Teala dizane, lê "xwe linedîtinê datîne" re tê gotin. Kafirî, karekî bişuûr e, her kesê kafir jî bi rewş û pozîsyona xwe baş dizane. Ji lewre hinceteke saxlem ya tu yekî ji wan tune ye. Gava hewcedarî bi xweparastinê bibîne jî rastiyan vajî nîşan dide. Ayetên di derbarê Îblîs de mînakeke rind e ji bo vê. Xwedê Teala wiha ferman dike:

"**Sond be, Me hûn afirandin, paşê Me şekil û awa da we. Paşê Me ji firîşteyan re got: 'Ji Adem re herin sicûdê.' Ji bilî Îblîs tev çûne sicûdê; ew nebû ji yên ku çûne sicûdê.**

Xwedê jê re got: 'Dema Min fermana secdeyê li te kir, ew çi bû ku nehişt tu biçî sicûdê? Got: Ez ji wî çêtir im. (Lewra) Te ez ji êgir afirandime û Te ew ji heriyê afirandiye."[50]

Fermana bi secdebirina bo Adem, li xweşa Îblîs neçû. Herwekî ku emir ne yê Xwedê be û mîna ku li hemberî Adem be, tevgeriya. Rasterast newêribû li ber Xwedê rabe. Lewra dizane ku bi her tiştî ji Xwedê re deyndar e û herwiha dîsa dizane ku Wî, ew afirandiye. Ev tiştên han di van gotinên Îblîs de veşartî ne:

"(Îblîs) got: Ez ji wî çêtir im. Te ez ji êgir afirandime û Te ew ji heriyê afirandiye."[51]

[50] E'raf, 7/11-12.

"(Îblîs) Got: Ez ne ew im ku ez ji mirovekî ku Te ew ji hişkeheriyeke reşeguherî afirandiye re biçim sicûdê."[52]

Cezayê ku heq kiribû dereng neket. Xwedê Teala jê re wiha got:

"**Nexwe ji wê dakeve, vêca mafê te tune ye ku tu xwe li wê derê mezin bidêrî, de biteqize. Bêguman tu ji rezîl û riswayan î!**"[53]

Îblîs wiha bûbû kafir. Halbukî di hebûn û yekîtiya Xwedê Teala de tu dudiliya wî tune ye. Baweriya wî bi qiyametê/rabûna pişтî mirinê jî hebû. Lewra pişтî qewitandina wî, ji Xwedê wiha lava kiribû:

"**Îblîsî got: Xwedayê min! Nexwe heta roja qiyametê muhletê (derfetê) bide min**."[54]

Binpêkirina fermaneke bi tenê, bûye sedemê ku Îblîs bibe kafir. mirov jî wiha ye; ne ku nizane, ji ber ku naxwaze fermanên Xwedê Teala bibîne û pêk bîne dibe kafir.

15. Tirsa şeytên ya ji Xwedê Teala, tê çi wateyê?

Pirs: Di du-sê ayetan de dibore ku şeytan dibêje: "Ez ji Xwedê ditirsim." Em tirsa ji Xwedê bi awayê, "pêkanîna fermanên Wî û dûrketina ji qedexeyên Wî" dizanin; lê belê şeytan jî heman bêjeyê bikar tîne. Di vê rewşê de divê em tirsa şeytên ya ji Xwedê Teala çawa fêhm bikin?

Bersiv: Gava em li ayetên Qur'ana Pîroz dinihêrin em dibînin ku şeytan di du halan de dibêje ku ez ji Xwedê ditirsim:

1. Gava dibe wesîle ku yek bibe kafir:

---

[51] Sad, 38/76.
[52] Hicr, 15/33.
[53] E'raf, 7/13.
[54] Sad, 38/79.

"**(Rewşa munafiqan) eynî wekî rewşa şeytên e. Ji însên re dibêje: Bibe kafir, çi gava ku însan kafir dibe, jê re dibêje: Bi rastî ez ji te dûr im. Bêguman ez ji Perwerdegarê alemê Xwedê ditirsim**."[55]

2. Di cenga Bedrê de gava artêşa Mekkeyiyan teşwîq dikir û dît ku wa ye firîşte derketine û hatine:

"**Wê rojê Şeytên, kirinên wan ji wan re xemilandin û ji wan re got: Îro ji mirovan, tu kes nikare zora we bibe. Bêguman ez jî pişteva n û arîkarê we me. Lê belê çi dema ku herdu yekîne (bawermend û kafir) hatin hemberî hev, (şeytan) çerx kir û got: Ez ji we dûr im. Bêguman ya ku ez dibînim hûn nabînin. Bêguman ez ji Xwedê ditirsim. Cezayê Xwedê, dijwar e**."[56]

Temamê kafiran gotinên wiha dibêjin. Heta ew carinan ji dil û can dixwazin ku misilman bibin. Xwedê Teala wiha ferman dike:

"**Ew ên kafir bûne, gelek caran dixwazin ku ew jî misilman bûna**."[57]

Lê belê gotinên bi vî rengî, dê her gav mîna agirekî di dilê wan de bimîne. Lewra wan pişteva niya van gotinan bi biryar û kirinên saxlem nekirine.

Hûn ê gelek kesan bibînin ku gotinên rind û delal ji devê wan derdikeve; lê gava di jiyana wan de cî negirin ew gotin, ji bilî ku wan bike hîlekar û derewker tu encameke din dernaxe holê.

16. Gelo firqeya naciye/xelasbûyî kîjan e?

Pirs: Di hedîsa ku behsa 73 firqeyan dike, gelo firqeya naciye ango firqeya rizgarbûyî kîjan e? Taybetmendiyên wê çi ne?

[55] Heşr, 59/16.
[56] Enfal, 8/48.
[57] Hicr, 15/2.

Bersiv: Da ku bê zanîn ka firqeya naciye ango desteya rizgarbûyî kî ye, teqez divê ku li Qur'ana Pîroz bê nihêrtin. Lewra di vir de di gelek ayetan de Xwedê Teala wiha ferman kiriye "ên rizgarbûyî ev in." û bi berfirehî xususiyet û taybetmendiyên wan vegotiye. Ên ku wan taybetmendiyan di xwe de bihewîne çi kes, deste, civak, mezheb û hwd. –kî dibe bila bibe- bi destûra Xwedê Teala dê rizgar bibe. Berî hînbûn û lêkolînkirina van tiştan, ne hedê tu kesî ye ku bibêje "em ji vê desteyê ne", "ew ji wê desteyê ne." Di vê mijarê de pîvan Qur'an e. Misilmanê ku li gorî pîvanên Qur'anê tev bigere, ew ji firqeyê naciye ye. Ango ew ji ehlê xelasê ye.

Ayetên têkildar wiha ne:

"**Hûn tev li Xwedayê xwe vegerin, bi nekirina gunehan xwe jê biparêzin, bi awayê pêdivî nimêj bikin û nebin ji wan muşrikên ku dînê xwe ji hev parçe kirine û bûne bend û civak ku <u>her hevbendiyek bi ya li cem xwe dilşad dibe</u>.**"[58]

"**Celebek hatiye ser rêya rast û celebek jî rêşaşî li serê misoger bûye. Bêguman wan ji bilî Xwedê, şeytan ji bo xwe kirine dost û pişтevan û <u>ji wan we ye ku ew li ser rêya rast rasterêbûyî ne</u>**."[59]

Eger em vegerin ser hedîsa ku behsa 73 firqeyan dike: Di dîroka Îslamê de li ser vê gelek munaqeşe û gengeşî hatine kirin. Gelek hedîsên ku bi mijarê re eleqedar in ji aliyê Ebû Dawûd, Tirmizî, Îbn Mace û Ehmedê kurê Henbel ve hatine riwayetkirin. Ji ber ku ev, bi terîqên/rêyên ji hev cuda hatine ragihandin ji aliyê wateyê ve jî di navbera wan de ferq hene.

Sihet/rastiya wan hedîsan ji aliyê zanayên 'ilmê hedîsê hatiye gengeşkirin, hinekan gotine **sehîh** in û hinekan jî diyar kirine ku **zeîf** in.

Ji aliyê din ve, di dîroka Îslamê her firqeyê angaşt kiriye ku ew ji firqeya naciye ye.

---

[58] Rûm, 30/31-32.
[59] E'raf, 7/30.

Bi sedema ku di vî warî de xebatên serbixwe hatine kirin, ji dêvla agahiyên berfireh di derheqê mijarê de em ê navê wan xebatan bi we re parve bikin:

Pirtûk: Mevlüt Özler, **İslam Düşüncesinde 73 Fırka Kavramı,** Weşanên Nun, Stenbol 1996.

Gotar: Ahmet Keleş, "73 Fırka Hadisi Üzerine Bir İnceleme", Marife Dergisi/Kovara Marife**,** Ehl-i Sünnet Özel Sayısı, sal: 5, jimar: 3, 2005, rp. 25-45.

17. Gunehên mezin kîjan in?

Pirs: Gunehên mezin kîjan in? Ma kesê gunehên mezin bike, dibe kafir?

Bersiv: Ji gunehên mezin re "kebair" tê gotin. Ji wan jî yên sereke ev in:

Meriv hevpişkan ji Xwedê çêbike, kuştin, bêbextiya zinayê, kirina zinayê, reva ji cengê/cîhadê, kirina efsûnê, xwarina malê sêwiyan, rabûna li ber dê û bav, xwarina mafê xelkê, kirina gunehan di herema Mekkeyê de, xwarina ribayê/faîzê, kirina diziyê, vexwarina meyê/araqê û lîstina bi qumarê.

Merivê misilman -bê ku biçûk bibîne-, ger gunehekî mezin bike -digel ku di dilê wî de tesdîq hebe- bi wî gunehî ji dîn dernakeve û nabe kafir.

Gunehê herî mezin ku mirov Xwedê Teala bixe rêza duyem û jîndarekî ku qaşo hin taybetmendiyên Xwedê Teala tê de hene, bixe pêş. Ev kirin li hemberî Xwedê, dibe şirk. Ji vî gunehî re "ekberi kebair" ango gunehê herî mezin tê gotin.

"**Bêguman Xwedê şirkê nabexşîne, ji bilî vê ji bo kesê ku bexşandin heq kiribe, wî dibexşîne. Çi kesê ji Xwedê re hevpar çêkiribe, wî bêbextiyeke giran û gunehekî mezin kiriye."**[60]

Dabeşkirina gunehan bi bal gunehên mezin û biçûk bi ayet û hedîsan ve sabit e. Ayetên têkildar wiha ne:

[60] Nîsa, 4/48.

"Eger hûn xwe ji gunehên mezin ên ku li we hatine qedexekirin biparêzin, Em ê li gunehên we biborin û Em ê we bixin cihekî birûmet."[61]

"Ew bawermendên ku ji gunehên mezin û ji fehşîtiyan xwe diparêzin û dema ku ew hêrs dibin jî efû dikin."[62]

"Ji bo ew ên ku -gunehên biçûk ne tê de- xwe ji gunehên mezin û fehşîtiyan vedidin, lêborîna Xwedayê te berfireh e. Ew, dema hûn ji axê afirandin û dema hûn di zikên dayikên xwe de bûn jî bi we çêtir dizane. Vêca hûn xwe paqij nebînin, bi rastî Xwedê bi teqwadaran çêtir dizane."[63]

"Bibêje: Werin, a ku Xwedayê we li we heram kiriye ez ji we re rêz bikim: Qet tiştekî ji Wî re nekin hevpişk, qenciyê li dê û bavên xwe bikin, ji tirsa xizaniyê zarokên xwe nekujin. Lewra Em rizqê we û wan jî didin. Xwe nêzî tolaziyan nekin; çi yên aşkere, çi jî yên veşarî. Ew canê ku Xwedê kuştina wî li we qedexe kiriye bi nerewayî nekujin. Ha ev e ya ku Xwedê fermana we pê kiriye da ku hûn bifikirin û tê bigihîjin.

Heta sêwî kamil nebe, -helwesteke ku bo fêdeya wî ye ne tê de- hûn nêzî malê wî nebin. Pîvan û mêzînê bi dadmendî pêk bînin. Em li her kesî tenê bi qasî hêza wî bar lê dikin. Çendî xizmekî we yê pir nêz be jî dema hûn peyivîn vêca bi dadmendî bipeyivin. Soz û peymana ku we daye Xwedê, bi cî bînin. Xwedê, ha bi van tiştan qewîtiyê li we dike, da ku hûn heşê xwe bi serê xwe din.

Bêguman, ha ev rêya Min a rast û durist e, bidin pey wê û nedin dûv rêçikên din. An jî wê we ji rêya Min biqetînin. Ev jî daxwaziyên Xwedê ne ji we da ku hûn xwe biparêzin."[64]

---

[61] Nîsa, 4/31.
[62] Şûra, 42/37.
[63] Necm, 53/32.
[64] En'am, 6/151-153.

“Perwerdegarê te ferman kiriye ku hûn, bi tenê ji Wî re ‘îbadetê bikin û bi dê û bavê xwe qenciyê bikin. Vêca eger yek ji wan an jî herdu li cem te kal bibin; ji wan re nebêje “Of” û guhnedêriya wan neke û ji bo wan gotineke xweş û germ bibêje.

Wan bixe bin perê dilovaniya xwe û bibêje: Xwedayê min! Çawa ku wan di zarokatiya min de bi dilovanî ez xwedî kirim, Tu jî li wan dilovaniya xwe bike!

Perwerdegarê we, bi ya ku di dilên we de ye bêhtir dizane. Eger hûn qenc bin, vêca bêguman Xwedê ji bo yên ku berê xwe ji neqenciyan vedigerînin û tobe dikin, gunehjêbir e.

Mafê xizm û xizan û rêwiyan bide û li cihê nerewa û nepêdivî destbelaviyê neke.

Bêguman ên destbelav dost û birayên şeytên in. Şeytan jî di biwara Xwedayê xwe zêde nankor bû.

Eger tu berê xwe ji wan vegerînî, ji ber ku tiştek li cem te nîn e ku tu bidî wan û tu li hêviyê yî ku Xwedê keremekê li te bike, nexwe ji bo wan gotineke xweş bibêje.

Di rêya Xwedê de yekcar destgirtî nebe û bi giştî destvekirî jî nebe, paşê tu yê lomedar û destevala rûnê.

Bêguman Xwedayê te kê bivê rizqê wî fireh dike û kê jî bivê rizqê wî teng dike. Bêguman Xwedê bi bendeyên xwe hayedar û bîner e.

Ji tirsa xizaniyê zarokên xwe nekujin, Em rizqê wan û yê we jî didin. Bêguman kuştina wan sûcekî mezin e.

Nêzîkî zinayê mebin. Lewra ew, karekî pir kirêt û rêyeke pir pîs e.

Ji bilî ku sebebekî mafdar hebe, ew canê ku Xwedê (kuştina) wî heram kiriye mekujin. Çi kesê bi zilm û xerezî bê kuştin, vêca Me desthilatî (û selahiyet) daye welîyê (xwînwergirê) wî. Êdî bila welî jî di kuştinê de sînor derbas neke. Bêguman arîkariya wî hatiye kirin.

Heta sêwî balix nebin û aqil negirin, ji bilî niyeteke baş (ku malê wî biparêze) xwe nêzîkî malê wî mekin. Wê peymana ku hûn didin jî bînin cih. Bêguman peymana ku were dayîn, berpirsiyê pêwîst dike.

Dema we pîva tam bipîvin û bi mêzîna rast bikêşin. Ev hem çêtir e, hem ji aliyê encamê ve spehîtir e.

Nekeve pey a ku derbarê wê de tu jê bêagah î. Bêguman guh, çav û dil ji ya ku ew dikin, berpirs in.

Bi quretî li ser erdê bi rê ve neçe. Bêguman tu hîç nikarî erdê biqelişînî û qet tu nikarî bi çiyan re berberiya bilindahiyê bikî.

Ev hemû li cem Xwedayê te gunehê wan pîs e.

Ha ev, ji hikmet, biryarên rast in ku Xwedayê te ji te re hinartine. Digel Xwedê îlahekî din negire, piştre tu dê şermezar û qewitî, di dojehê de bê werkirin."[65]

Qasidê Xwedê wiha gotiye:

"*Xwe ji heft tiştên mirov dibin xeterê biparêzin.*"

- Gotin: Ey Qasidê Xwedê! Ew çi ne?

Got: "*Meriv şirîkan ji Xwedê çêbike, kirina efsûnê, bi sebebekî mafdar ne tê de kuştina canekî ku Xwedê kuştina wî qedexe kiriye, xwarina faîzê, xwarina malê sêwîyan, reva ji cenga li hemberî neyaran û mirov bêbextiya zinayê têxe stûyê pirekên bawermend ên bi namûs.*"[66]

[65] Îsra, 17/23-39.

18. Digel em misilman in, çima hîn jî em ji Xwedê hîdayetê dixwazin?

Pirs: Di her nimêjê de em wiha dua dikin "**Rêya rast û durist nîşanî me bide**."(Fatihe, 1/6). Di ayetên 3-4an ji sûreyê Beqere hatiye diyarkirin ka yên ku li ser hîdayetê/rêya rast in kî ne. Li gorî ku yên nimêj dikin li ser rêya rast in, wê gavê ma em di hin cihan de kêm dikevin ku em di her nimêjê de wiha "**Rêya rast û durist nîşanî me bide**" dua dikin? Madem Xwedê gotiye ku kesê bi Xwedê, bi pêxemberên Wî, roja axretê bawer bike, bi awayê pêdivî nimêj bike û ji malê xwe di rêya Xwedê xerc bike, "ew li ser rêya rast in", em çima hîn jî vî duayî "Rêya rast û durist nîşanî me bide" dikin?

Bersiv: Îslam menzûmeyeke hevgirtî ye. Bawerî û helwestên ku vê hevgirtinê xera dikin, mirov ji rê derdixin. Gunehê herî xeternak jî şirk e. Lewra jimara kesên digel ku nimêj dikin jî lê gava dikevin zor û tengasiyan ji bilî Xwedê, hawara xwe digihînin hin kesên din û dibêjin: "Meded ya filankes" ne kêm in. Ew bi vê helwesta xwe dikevin şirkê. Ji lewre divê mirov hay jê hebe û cehd û xebatê bike da ku mirov her gav li ser rêya rast bimîne.

Eger dema we hebe, hûn dikarin ji malpera me bermehên me yên bi navê **"Kur'an Işığında Tarikatçılığa Bakış"** û"**Kur'an Işığında Aracılık ve Şirk"** bixwînin. Hûn ê bibînin bê ka çiqas însan hene digel ku 'îbadetên we behsan wan kirin pêk tînin, lê dîsa jî ketine hin rewşên tirsnak. Ji vî aliyî ve duayê di sûreyê Fatiheyê de "Rêya rast û durist nîşanî me bide" gelekî girîng e.

Hûn dikarin ji www.suleymaniyevakfi.com xwe bigihînin berhemên navborî û herwiha ji vê navnîşanê jî http://www.suleymaniyevakfi.org/hizmetlerimiz/Kitaplarimizi-indirin.html hûn dikarin mift belaş wan li kompîtura xwe bar bikin.

---

[66] Buxarî, Wesaya, 23; Muslim, Îman, 145 (89).

19. Ma pirsyarî û lêpirsînên di derheqê Xwedê yan jî afirandinê de, mirov dike kafir?

Pirs: Min jî mîna gelek însanan bi Xwedê Teala bawerî aniye û hewl didim ku pênc wext nimêjên xwe bêkêmasî bikim. Lê belê di demên dawî de bûye ku êdî ez her tiştê di jiyana xwe de pirsyarî dikim. Ev jî çima, ji bo çi û ez çi dikim? Pêre xwe bi xwe bersivên wan jî didim. Ango ez hin tiştan ji xwe dipirsim. Wekî mînak ez dibêjim, ma nabe ku gerdûn tesadufî ango xwe bi xwe çêbûbe? Piştre bûyera bing bangê tê bîra min, piştî vê bi milyaran stêrkên ku di rêgehên xwe de malevaniyê dikin tê hişê min, li ser rewşa ku eger dinya 3 mm din jî nêzî rojê bibe yan jî jê dûr bikeve dê bişewite yan jî biqerise û bicemide, dihizirim û dibêjim ku "ev li gorî plan û bernameyekê tev digerin ango hatine afirandin" û bi vî awayî bersiva pirsa xwe didim. Gelo gava ez van tiştan dikim, ez dikevim guman û dudiliyan? Yanî esasê pirsa min, ma fikir û hizra bi vî rengî min dike kafir?

Bersiv: Naxêr, temamê van pirs û lêpirsînan, tê wateya ku hûn îmanê tînin.

Xwendina Qur'ana Pîroz, dewam bikin. Lê belê ger hin cihên we fêhm nekir, nikaribin fêhm bikin derkeve pêşiya we, teqez bi yên ku dizanin re bişêwirin. Lewra xwendina bê têgihîştin û naskirina wateya wê, tu fêdeyê nade însên. Xwendina ayeteke ku hûn wateya wê fêhm bikin, ji xwendina gelek rûpelên Qur'anê ya bê têgihîştin, pir çêtir e. Ger hûn hewld bidin, hûn ê bibînin ku Xwedê Teala alîkariya we dike û hûn ê zû pêşve bikevin. Ger hûn hiş û dilê xwe bo naskirina Qur'anê vekin, Xwedê jî dê fêhm û têgihîştina Qur'anê li dilê we veke.

Ji bo bidestxistina agahiyên berfirehtir di derbarê pirsa we de ji kerema xwe re hevpeyvîna me ya di navnîşana jêr de ye bixwînin:

http://www.suleymaniyevakfi.org/elestiriler/altinoluk-dergisinin-roportaji.html

20. Ma Xwedê Teala jirêderketina însanan dixwaze?

Pirs: Min do li ser înternetê li axaftineke birêz Abdülazîz Bayındır guhdêra. Di derbarê nakokiyên di wergerên Qur'ana Pîroz de du mînak anîn. Diyar kir ku wergera ayeta 26an ji sûreyê Nîsa, li dijî wergera ayeta 4an ji sûreyê Îbrahîm e. Sedemê nakokiyê jî wiha rave kir: Di zimanê 'Erebî bêjeya "şey/şae" ne di wateya "îrade"yê de ye û ji loma şaş hatine wergerandin. Lê belê di vê rewşê de em ê ayeta 34an ji sûreyê Hûd, çawa şîrove bikin? Mîna ku dê dîtin "**Eger ez bivêm li we şîret bikim jî şîreta min wê tu fêdeyê nede we eger ku Xwedê jirêketina we vîyabe**…" di vê ayetê de jî bêjeya îradê derbas dibe. Ma ev ayet jî bi ayeta 26an ji sûreyê Nîsa re tu nakokiyê pêk nayine?

Bersiv: Ayeta 34an ji sûreyê Hûd, ji aliyê me ve wiha hatiye wergerandin:

وَلاَ يَنفَعُكُمْ نُصْحِي إِنْ أَرَدتُّ أَنْ أَنصَحَ لَكُمْ إِن كَانَ اللّهُ يُرِيدُ أَن يُغْوِيَكُمْ هُوَ رَبُّكُمْ وَإِلَيْهِ تُرْجَعُونَ

"**Ji bo başiya we çiqas hewl bidim jî ger Xwedê jirêketina we pesend kiribe, ev hewldana min tu fêdeyê nade we. Ew Perwerdegarê we ye. Hûn ê lê werin vegerandin**."

Lêkera "îrad"ê ya ku di vir de dibore, dikeve bin beşa îradeya tekwîniye/îradeya di derheqê afirandinê de ya ku behsa wê di ayeta dawî ji sûreyê Yasîn hatiye kirin. Di wê ayetê de Xwedê Teala wiha ferman dike:

إِنَّمَا أَمْرُهُ إِذَا أَرَادَ شَيْئًا أَنْ يَقُولَ لَهُ كُنْ فَيَكُونُ

"**Dema ew tiştekî bixwaze, tenê jê re dibêje "bibe"; vêca ew jî çêdibe**."

Li gorî vê, îrade du qisim in; ya yekem "xwestin", ya duyem jî "biryardarî" ye.

Ev ayeta li jêr, îradeya Xwedê ya bi wateya "xwestinê", nîşan dide.

وَاللَّهُ يُرِيدُ أَنْ يَتُوبَ عَلَيْكُمْ وَيُرِيدُ الَّذِينَ يَتَّبِعُونَ الشَّهَوَاتِ أَنْ تَمِيلُوا مَيْلًا عَظِيمًا

"**Xwedê dixwaze tobeya we bipejirîne û ew ên ku didin pey hewesên xwe jî dixwazin hûn bikevin rêşaşiyeke mezin**."[67]

Îradeya Xwedê, ya bi wateya xwestinê dibe ku neyê cî. Lê belê îradeya Wî ya bi wateya biryarê, teqez tê cî. Xwedê Teala wiha ferman dike:

إِنَّ رَبَّكَ فَعَّالٌ لِمَا يُرِيدُ

"**Bêguman Perwerdegarê te, tiştê ku îrade bike, dike**."[68]

Lêkera îradê ya di ayeta 34an ji sûreyê Hûd, biryara Xwedê nîşan dide. Ji lewra me di wergera wê de îfadeya "**ger Xwedê jirêketina we pesend kiribe**" bikar anî. Pesendkirina Xwedê Teala bo jirêderketina bende, dawiya qonaxeke dûr, destpêka rêyeke ku êdî vegera wê tune ye; gava ku êdî tobe fêdeyê nade. Xwedê Teala, derfet û îmkanên bêdawî dide bende. Ji bo bende rêya rast û rêyên din tên nîşandan. Lê belê bende, ger îsrar bike ku nekeve rêya rast û ev helwest êdî xwezaya wî xera bike, bende êdî rêya xwe hilbijartiye. Gava Xwedê Teala vê jirêderketinê bipejirîne –jixwe bende bi xwe ev hilbijartiye– êdî tu tiştekî ku bende bike, namîne. Rewşa wî kesî, mîna rewşa nexweşê ku digel temamê hişyariyan, bizanîn bi salan cixare kişandibe û ji bo mayina li jiyanê tu tiştekî ku bê kirin nemabe.

Ji bo agahiyên berfirehtir di derbarê îrade û meşîetê de ji kerema xwe re nivîsa me ya di navnîşana jêr de ye bixwînin:

http://www.suleymaniyevakfi.org/arastirmalar/kuranda-irade-sey-ve-fitrat.html

[67] Nîsa, 4/27.
[68] Hûd, 11/107.

21. Ma Xwedê dixwaze hin kes, li ser kufrê bimirin?

Pirs: Di berhema "Doğru Bildiğimiz Yanlışlar" de mijara "Kalbin Mühürlenmesi/Mohrbûna Dil" hatibû ravekirin. Lê belê du ayetên ku di wir de diborin, hinekî hişê min tevlihev kirin. Ew jî ayeta 5an û 85an ji sûreyê Tewbe… Mîna hev dixuyin. Derbas dibe ku Xwedê Teala dixwaze bereke ji dirûyan bi mal û zaroyan ceza bike û ya herî girîng jî dixwaze ku ew li ser kufrê bimirin. Kesê ku Xwedê Teala mirina wî li ser kufrê xwestibe, ma ne jixwe êdî tiştekî ku bikaribe bike nemaye? Bi giştî dilê wî mohr dibe! Ango hîn li jiyanê di derheqê wî de biryar hatiye dayîn û êdî îmanê nayine yan jî destûra ku îmanê bîne nayê dayîn. Gelo tiştê di ayetan de tê gotin, ev e?

Bersiv: Ayetên we behsa wan kirin di derbarê dirûyan de ne û wergera wan wiha ye:

"**Bila xweziya te ne bi malên wan û ne jî bi zarokên wan were. Bêguman Xwedê dixwaze di jiyana cîhanê de wan pê bide ezabdayîn û ruhê wan li ser kufrê ji wan bistîne**."[69]

Ev, rê û rêbazeke ku ji aliyê Xwedê ve hatiye danîn. Ger ji bo guhertina şert û mercan cehd û xebatê nîşan nedin, ev rêbaz dê bimeşe. Lê belê deriyê veger û tobeyê jî her gav vekirî ye; kesê vegerê bixwaze dikare vegere.

Ji ayetên jêr em dikarin vê yekê fêhm bikin.

"**Ma wê Xwedê çawa civakeke ku piştî bawerî anîn û şahdeyî dan ku ew qasid heq e û delîlên aşkere ji wan re hatin, dîsa kafir bibin, bîne ser rêya rast?! Bêguman Xwedê, civaka zaliman nayine ser rêya rast.**

Cezayê wan ev e: Laneta Xwedê, ya ferişte û hemû mirovan dê li ser wan be! Ew ê her gav di wê lanetê de bimînin, ezab jî li ser wan nayê sivikkirin û derfet jî

[69] Tewbe, 9/55, 85.

ji wan re nayê dayîn. Yên ku piştî vê poşman bûne û li ser rastbûna xwe xebitîne ne tê de. Lewra Xwedê, her gunehveşêr e, dilovîn e."[70]

22. Ji alimên berê, yekî ku ayeta 4an ji sûreyê Îbrahîm mîna we fêhm kiribe heye?

Pirs: Hûn ayeta 4em ji sûreyê Îbrahîm, ne wekî wergerên Qur'anê yên din werdigerînin. Gelo ji zayanên Îslamê yên berê heta niha kesekî mîna we, ew ayet fêhm kiribe heye?

Bersiv: Me, ayeta 4an ji sûreyê Îbrahîm wiha wergerandiye:

وَمَا أَرْسَلْنَا مِنْ رَسُولٍ إِلَّا بِلِسَانِ قَوْمِهِ لِيُبَيِّنَ لَهُمْ فَيُضِلُّ اللَّهُ مَنْ يَشَاءُ وَيَهْدِي مَنْ يَشَاءُ وَهُوَ الْعَزِيزُ الْحَكِيمُ

"**Me her qasidek bi zimanê gelê wî şand, da ku ji wan re bi awayekî zelal rave bike. Vêca Xwedê, kî jirêderketinê hilbijêre wî rêşaş û kî jî hîdayetê tercîh bike wî di rêya xwe de qebûl dike. Yê hêzdar Ew e, yê biryara rast dide Ew e.**"[71]

Ev meala ku me da vê ayetê, piştî nêzî 8 salan me bi kêfxweşiyeke mezin tesbît kir ku Îmam Maturîdî jî wiha meal dayê. Maturîdîyê ku di sala 333ê Hicrî (944ê Miladî) de wefat kiriye, ayeta 4an ji sûreyê Îbrahîm wiha tefsir kiriye:

لِيُبَيِّنَ لَهُمْ فَيُضِلُّ اللَّهُ مَنْ يَشَاءُ وَيَهْدِي مَنْ يَشَاءُ: أي يضلُّ اللّهُ مَن آثر سبب الضلال و يهدي مَن آثر سبب الذي به يهتدي ، يهدي ذلك. وقال قائلون: فيضلُّ اللّهُ مَن يَشَاء وَيَهْدِي مَن يَشَاء، هذا حكم الله أن يضل المكذبين و يهدي المصدقين. لكن الوجه فيه ما ذكرنا بدءً أنه يضل من آثر سبب الضلال ويهدي من يشاء، أي من آثر سبب الإهتداء.

[70] Alî Îmran, 3/86-89.
[71] Îbrahîm, 14/4.

"Xwedê, kî rêşaşiyê hilbijêre wî ji rê derdixe, kî jî rêya hîdayetê tercîh bike dibe ser hîdayetê. Hinekan ji bo ayeta (فَيُضِلُّ اللَّهُ مَنْ يَشَاءُ وَيَهْدِي مَنْ يَشَاءُ) gotine ku "Ev, biryara Xwedê ya di derbarê kesên biderewînin wan ji rê derxe, yên ku rast bidêrin jî wan bîne ser rêya hîdayetê." Lê belê rastî, ya ku me got. Ango Xwedê, kesê sebebê (rêya) delaletê tercîh bike ji rê derdixe, kesê sebebê (rêya) hîdayetê jî tercîh bike tîne ser hîdayetê."[72]

Raxib el-Isfehanî jî gotiye ku gelek zanayên 'ilmê kelamê, wateya "erade" (اراد) ango xwestinê dane lêkera **"şae"** (شاء) ya di vir û di gelek ayetên din de dibore.[73] Nexwe Îmam Maturîdiyê ku di sala 333ê Hicrî de wefat kiriye, ne ji wan zanayên 'ilmê kelamê yên ku Raxib behsa wan kiriye. Lewra wî ew wate nedaye vê bêjeyê. Lê belê peyrewên Maturîdî ji zanayên mezhebê eqîdeya Maturîdî, li berevajî Îmam Maturîdî wateya (îradeyê) ango "xwestinê" dane vê bêjeyê. Ev jî bi rastî tiştekî sosret e û mirov di heyretê de dihêle.

Di wergera Tirkî ya Serokatiya Karên Dînî, wergera Weqfa Dîyanetê, herwiha di tefsîra bi navê "Kur'an Yolu Tefsiri" ya ji aliyê Dîyanetê ve hatiye amadekirin û di meala Elmalılı Muhemmed Hamdi Yazır de (فَيُضِلُّ اللَّهُ مَنْ يَشَاءُ وَيَهْدِي مَنْ يَشَاءُ) digel hin cudahiyên hûr hema çi bigire bi vî awayî "Êdî Xwedê kê bivê ji rê derdixe, kê jî bivê têne hîdayetê" hatiye wergerandin.

Eger Xwedê kê bivê ji rê derxe û kê jî bivê bîne ser rêya rast, wê gavê çima qasid ango pêxemberan bişîne? Di vê rewşê de çi wate dimîne ku qasid bi zimanê wî gelî bi awayekî zelal rave bike? Karekî wiha bê mane û ne cî de ma bi wî Xwedayê ku "biryara rast dide" dikeve? Îfadeyên ku nakokî di wan de hebin, ma dibin ku gotina Xwedê bin?

---

[72] Ebû Mensûr Muhemmedê kurê Muhemmedê el-Maturîdî, **Te'vîlâtü'l-Kur'ân**, thq: Hatice Boynukalın, Daru'l-Mîzan, Stenbol 2006, VII, 458.
[73] Bnh: Raxib el-Îsfehanî, **el-Mufredat**, " شيء" ş-y-e.

Henefî, xwe ji peyrewên mezhebê Maturîdî dibînin. Mîna ku tê dîtin dûrketina mezheban di nava kûrahiya dîrokê de ji rêya sereke, wergerên Qur'anê jî kirine bê wate.

Ji bo kesên dixwazin di derheqê vê mijarê de agahiyên berfirehtir bidest bixin, em tewsiye dikin ku nivîsa me ya bi sernavê "**Kur'an'da İrade, Şey ve Fıtrat**" bixwînin. Nivîs, di navnîşana jêr de ye:

http://www.suleymaniyevakfi.org/arastirmalar/kuranda-irade-sey-ve-fitrat.html

23. Tekfîra ehlê qibleyê tê çi wateyê?

Pirs: Tekfîr/kafirdêrana ehlê qibleyê tê çi wateyê?

Bersiv: Ehlê qible, tebîreke ku ji bo hemû misilmanên ku ji peyrewên mezhebên itiqadî ne û bingehên baweriyê bi awayên cuda şîrove dikin, tê bikar anîn.

"Terkîba ehlê qible (ehlu'l-qible) ya ku bi wateya yên berê xwe didin Ke'beyê û nimêj dikin", têgeheke ku ji misilmanên tê qebûlkirin ku neketine kufrê û bawer dikin ku nimêj ferz e –di nimêjê de berê xwe didin Ke'beyê– û vê dikin re tê gotin. Di destpêkê de ji dêvla vê zêdetir, tebîra ehlê selatê dihat bikaranîn. Tekfîra ehlê qibleyê jî tê wateya mirov yekî wiha kafir bijimêre. Mafê tu misilmanî tune ye ku ji ehlê qibleyê birayekî xwe tekfîr bike.[74]

24. Hûn dikarin di mijara ku xêr û şer ji Xwedê ye, me agahdar bikin?

Pirs: Tiştên ku di jiyanê de tên serê me, bêguman ceribandin û îmtihan e. Gelo dibe ku ev îmtihan, ji ber gunehên me bin? Ango em çawa dikarin bela, musîbet, nexweşî û bûyerên ku tên serê me ji hev veqetînin?

[74] Ji bo agahiyên berfirehtir di derbarê ehlê qible de ji kerema xwe re bnh: Metin Yurdagür, "Ehl-i Kıble", **DİA**, 1994, X, 515-516.

Bersiv: Xêr û şer du cur in; ji bo ceribandin û îmtîhanê em pêrgî yekê tên; ya din jî di encama îmtîhanê de em bidest dixin. Xwedê Teala wiha ferman dike:

"… **Em ê we bi şer û xêrê bi îmtîhaneke dijwar biceribînin, hûn ê dawî her li Me werin vegerandin**."[75]

"**Sond be; Em ê bi hinekî ji tirsê û birçîbûnê, bi kêmkirina mal û can û kêmkirina mêweyên we, we îmtîhan bikin û mizgînê bide yên sebirkêş.**

Ew ên ku dema belayek bê serê wan, dibêjin "Em yên Xwedê ne û em ê li Wî jî vegerin."

Evên ha ji Perwerdegarê wan rehmet û dilovanî li wan dibare û yên ku li ser rêya heq rasterê bûne, her ew in."[76]

Xêr û şera ji vî celebî, tê serê her kesî. Li aliyê din, xêr û şera ku di encama îmtîhanê de tê bidest xistin heye. Xwedê, dide kesê ku ew heq kiribe. Tiştên ku tên serê meriv, ger bo îmtîhanê be, divê mirov sebrê bikêşe û di wê îmtîhanê serfiraz bibe. Na ger ji ber guneh û şaşiyên mirov bin, wê gavê, divê mirov poşman bibe û careke din li karekî wiha venegere.

25. Ma bikaranîna bêjeya "rebb", "seyyid" û "mewlana" ji bo însanan durist e?

Pirs: Di ayeta 50î ji sûreyê Yûsuf, di vê axaftina xwe de Yûsuf Pêxember: "Li efendiyê xwe vegere û jê bipirse" rengdêra "Rebb" ji bo însanekî bikar tîne. Herwiha di gelek ayetan de ji bo mirovan wesfê "Mewla" tê xebitandin. Lê belê hinek seyda dibêjin ku bikaranîna vî wesfî bo însanan şaş e, ne durist e. Madem ev ayet li holê ne, ma bikaranîna wesfê Rebb, Mewla (Mewlana) an jî Efendî û hwd. ji bo kesan dibe ku şaş be?

[75] Enbiya, 21/35.
[76] Beqere, 2/155-157

Bersiv: Hin têgeh hene ku ji bo Xwedê û ji bo însanan jî tê xebitandin. "Rebb" jî yek ji wan têgehan e. Wergera herî munasib ji bo bêjeya rebb, "xwedî" ye. Di zimanê 'Erebî de ji bo xwediyê xanî **rebbu'd-dar**, ji bo sermayedar jî **rebbu'l-mal** tê gotin. Yûsuf aleyhiselam, ji koleyê ku qral şandibû re wiha gotibû:

قَالَ ارْجِعْ إِلَى رَبِّكَ فَاسْأَلْهُ مَا بَالُ النِّسْوَةِ اللَّاتِي قَطَّعْنَ أَيْدِيَهُنَّ إِنَّ رَبِّي بِكَيْدِهِنَّ عَلِيمٌ

"… **Li xwediyê xwe vegere û jê bipirse: Ka derdê wan pîrekên ku destên xwe birîbûn çi bû? Bêguman Rebbê min hîle û pîleyên wan dizane**."[77]

Ji lewre di vê ayetê de bêjeya Rebb, hem ji bo Xwedê hem jî ji bo qralê ku xwediyê kole ye, hatiye bikaranîn.

Mewla di wateya "dost" û "efendî" ye. Di Qur'anê de mînakên wê hene ku ji bo însanan di vê wateyê de hatiye xebitandin.[78]

Bêjeya **seyyid** jî di wateya "efendî" de ye. Ev peyv, di ayeta 30an ji sûreyê Alî Îmran ji bo Yehya aleyhisselam hatiye bikaranîn. Ji ber vê yekê di esas de di xebitandina vê de ji bo însanan, tu mehzûrek tune ye. Lê belê tiştê ku rengê meseleyê diguherîne, wateyên ku di dema bikaranîna wê de lê tên barkirin. Mesela gotina **Seyyidu'l-Kaînat=Efendiyê Gerdûnê** îfadeyeke gelekî çewt e. Ev wesf, bi tenê û encax ji bo Xwedê Teala tê bikaranîn.

Bêjeya Rebb, ji ber ku di zimanên xincî 'Erebî de bi wateya "xwedî" nayê fêhmkirin, bikaranîna wê jî xeternak e.

Di encamê de di dema xebitandina van bêjeyan de ji bo însanan, divê mirov gelekî baldar be û wateyên yên şaş li wan bar neke.

---

[77] Yûsuf, 12/50.

[78] Wekî mînak bnh: Nehl, 16/76; Ehzab, 33/5.

26. Xwedê Teala ji me çi dixwaze? Çi naxwaze?

Pirs: Ji kirina tiştên ku Xwedê ji me dixwaze û jê razî ye, dûrketin û nekirina tiştên ku Xwedê jê hez nake û li me qedexe kirine re çi tê gotin?

Bersiv: Helwestên ku Xwedê Teala kirin û pêkanîna wan ji me dixwaze, du beş in:

Beşa yekem: Eger Xwedê Teala bi awayekî pêdivî û bi îfadeyeke teqez kirina tiştekî ji me bixwaze, jê re **wacib** tê gotin. Wacib di literatura olî de –ji bilî Henefiyan- li gorî pirê zanyarên 'ilmê fiqhê, ji berpirsyariyên olî yên ku bi delîleke teqez û bi awayekî pêdivî divê were kirin re tê gotin. Lê belê Henefî, di du astan de; bi awayê **ferz** û **wacib** li mijarê dinihêrin.

Beşa duyem: Mendûb in. Kirin û helwestên ku bicihanîna wan hatine teşwîqkirin û kirinên ku ne bi awayekî teqez hatine daxwazkirin. Ango helwestên ku ne ferz û ne jî wacib in. Ev jî sunet û musteheb in.

Tiştên ku Xwedê Teala nekirina wan ji me dixwaze jî bi serekeyî du beş in:

Beşa yekem: Heram in. Helwestên ku Xwedê Teala bi awayekî teqez û pêdivî kirina wan li me qedexe kirine.

Beşa duyem: Mekrûh in. Helwestên ku Xwedê Teala ne bi awayekî teqez û pêdivî nekirina wan li me ferman kirine.

27. Ferz çi ye û cureyên wê çi ne?

Pirs: Ferz çi ye, ji çi re tê gotin û gelo cureyên wê hene?

Bersiv: Her kar û erka ku olî be û kirina wê bi awayekî teqez û pêdivî hatibe fermankirin, jê re **ferz** tê gotin. Bi sedema ku Xwedê Teala, "**Nimêjê bi awayê pêdivî**

bikin, zekatê bidin."[79] li me ferman kiriye, li ser misilmanan kirina nimêjê li gorî şertên pêwîst û dayîna zekatê, ferz e. Pêxember jî (s.a.w) ferman kiriye ku "*Mîna ku hûn dibînin ez nimêj dikim, nimêj bikin*."[80] "…*Çaryeka deh yekê (ji malên xwe ji çilî yekê), ji herçil dîrhemî dîrhemekî bi zekatî bînin*."[81] Ji vê bonê kirina nimêjê mîna me ji Pêxember (s.a.w) dîtiye û dayîna ji çilî yekê bi zekatî ji mal, li ser me ferz e.

Ji bilî Henefîyan di mezhebên din de têgeha "**wacib**"ê tune ye. Li gorî wan ferz û wacib bi heman wateyê ne. Mezhebê Henefî, tiştên ku bi delîleke ne di asteke teqez û vebirî sabit bûbe, wê dixin beşa wacib. Mezhebên din tiştên ku Henefî wê wacib dijimêrin, beşekê jê ferz û hinan jî sunet dijimêrin.

Wekî mînak di nimêjê de te'dîlî erkan, ango di ruknên nimêjê de yên mîna rabûna li ser piyan, rukû û secdeyê de ku mirov bi hêsanî bîne cih û di wê navberê de endamên mirov hereket nekin, li gorî Ebû Henîfe wacib, li gorî mezhebên din ferz e. Û mîna ku nimêja witir û nimêja herdu cejnan li cem Henefiyan wacib in, lê belê di mezhebê Şafiî de sunet in.

Ferz jî mîna ku bi bal **Ferzu'l-ayn** û **ferzu'l-kîfaye** ve tê dabeşkirin, bi bal qismên **ferza qet'î** (an jî ferza îtiqadî û 'emelî) û **ferza zennî** (an jî ferza 'emelî) ve tên teqsîmkirin.

Ferzu'l-ayn: Ferza ku divê hemû mukelef bikin. Mîna kirina nimêjê, girtina rojiyê, bicihanîna peymanên ku li gorî rê û rêbazên şerîetê hatine danîn.

Ferzu'l-kîfaye: Ferza ku dema hinek bikin berpirsyarî ji ser ên din radibe. Ev, berpirsyariyên ku Îslamê li civakê bar kirine. Erkeke ku ferzu'l-kîfaye be, dema ku berek ji mukelefan wê peywirê bicihanîn ên din ji berpirsyariya wê, rizgar dibin. Eger ji mukelefan tu kes wê bicih neyîne, hemû dibin berpirsyar. Mîna, kirina nimêja mirî, cîhad, darazî (qeda) dayîna fetwayan, hebûna hin kesên têgihîştî di zanyariyên

[79] Beqere, 2/43.
[80] Buxarî, Ezan, 18.
[81] Îbn Mace, Zekat, 4.

olî û di zanyariyên ku hewcedariya civakê pê heye, hebûna kesên erbab û xwedî ehliyet di hin pîşe-meslek û huneran de û ku mirov li hember neyarên xwe her dem amade be û hwd. her yek ji wan li ser civakê fefzu'l-kîfaye ye. Kesên ku wan erk û wezîfeyan bicih bînin, xêra wê bi dest dixin.

Ferza qet'î: Tiştê ku bi awayekî zelal û teqez bi delîleke şer'î sabit bûbe. Ango ferza ku bi Qur'ana Pîroz an jî bi awayekî zelal di hedîseke ku hatina wê ji Pêxember (s.a.w) teqez sabit bûbe, derbas bûbe. Mîna nimêj, zekat û cîhadê. Mandelkirina ferzeke wisa dibe sedem ji bo derketina ji dîn û mirov bibe kafir. Bi sedema ku divê mirov bawer bike û ji ber ku divê mirov wê bike, jê re **ferza îtiqadî** û **ferza 'emelî** jî tê gotin.

Ferza zennî: Ferza ku bi delîleke zennî lê xwedî hêz be, sabit bûbe û ev delîl ji aliyê muctehidan ve nêzî delîleke qet'î hatibe dîtin. Ev ji aliyê baweriyê ve, ne mîna ferza qet'î ye. Kesê wê mandel bike nabe kafir. Lê belê ji aliyê 'emelkirinê ve, mîna ferza qet'î ye. Ji vê bonê navê **ferza 'emelî** digire. Bi sedema ku di encama îctihadekê de derketiye holê, jê re **ferza îctihadî** jî tê gotin.

Di ferza qet'î de di navbera mezheban de tu îxtilaf tune ye. Qada ku mezheb tê de îxtilaf dikin, ferza zennî ye. Mîna di ayeta mijara desmêjê de dema tê fermankirin "… û **serê xwe mesih bikin**…"[82], mesihkirina serî ferza qet'î ye. Di vê mijarê de di navbera mezheban de yekîtiyek heye. Lewra mesihkirina serî di desmêjê de bi awayekî zelal hatiye fermankirin. Lê belê di ayetê de nehatiye vegotin ku çiqas ji serî tê mesihkirin. Ji vê bonê muctehidan, di encama lêkolîn û lêgerînên xwe de li gorî nêrîna xwe bi delîleke zennî ku nêzî delîleke qet'î ye, di derbarê mesihkirina serî de gelo çiqas jê ferz e, îctihad kirine. Ji mezhebê Malikî zanyarê 'ilmê fiqhê Ebû Bekir Îbnu'l-Erebî (w. 543 /1148) di pirtûka xwe ya bi navê **Ehkamu'l-Qur'an**[83] de bi mijarê re têkildar 11 nêrîn tesbît kirine û li ser wan nîqaş kirine. Li gorî mezhebê Şafiî, eger mirov mûyekî yan jî qismekî hindik ji serî bi awayekî ku mirov bikaribe jê re bibêje

[82] Maîde, 5/6.
[83] Darû Îhyai'l-Kutubi'l-'Erebiyye, 1376/1957, II, 568 û pişt î wê.

mesih, serê xwe mesih bike kafî ye. Li gorî Malikî û Henbeliyan mesihkirina tememê serî ferz e. Li gorî mezhebê Henefî mesihkirina çaryeka serî ferz e. Lê belê, mesihkirina temamê serî sunet e.

28. Helal çi ye? Ma hûn dikarin tarîf bikin?

Pirs: Helal çi ye, gelo hûn dikarin wê tarîf bikin?

Bersiv: Helal, di ferhengê de bi wateya 'vekirina girêkê', 'serbestbûn û helalbûna tiştekî' ye. Ev bêje, ji jêderka 'hell' (الحل) ya 'Erebî hatiye çêkirin û wekî têgeheke olî bi wateya 'tiştê ku ji aliyê olî ve kirina wê serbest e.'

Xwedê Teala di Qur'ana Pîroz de wiha ferman dike:

"**Çi tiştên li ser rûyê erdê hene, Wî hemû ji bo we afirandine**…"[84]

Ev ayet dide nîşandan ku çi tiştê li ser rûyê erdê hene, ji bo însanan mubah e. Lê belê ji wan ên bi zirar û ne paqij û yên ku mafê hin kesên din in, bi ayetên din ji Qur'ana Pîroz hatine qedexekirin. Can û namûsa însanan jî ji wan tiştên ku hatine heramkirin. Piştî ku ewlehiya can, mal û namûsê ji tiştên ku ji bo domandina jiyanê şert û pêwîst in hatin bidestxistin, gotina "Di tiştan de esl û esas helalbûn e, tiştê ku li ser herambûna wî tu delîl tune be mubah e." dibe prensîbekî fiqha Îslamê. Yanî heta hukmekî li dijber neyê dîtin, her tişt mubah û helal in.

Li gorî vê, dema yek biçe mala yekî û xwediyê malê xwarinekê îkramî wî bike, dikare jê bixwe. Yanî ne lazim e ku lêkolînê bike û li pey bigere "Gelo wî ev mal ji helalî bidest xistiye; pereyê wê xwarinê daye yan na; an jî wî ev xwarin xesp kiriye ango bi zorê bidest xistiye."

Hatiye ragihandin ku Pêxember (s.a.w) wiha gotiye:

[84] Beqere, 2/29.

"Helal diyar e, heram jî diyar e. di navbera van herduyan de tiştên bi guman hene, pirê însanan wan nizanin. Kesê xwe ji tiştên bi guman biparêze, wî dîn û namûsa xwe parastiye. Kesê wan bike, mîna şivanê ku li nêzî hemiyekê heywanên xwe biçêrîne; dibe ku bikeve qada qedexekirî."[85]

Meriv dikare vê hedîsê wiha rave û şîrove bike:

Eşya sê celeb in:

Tiştên helalbûna wan aşkere ne û di wê babetê de tu aliyê wan ên girtî tune ne: Mîna nan, fêkî, av, axaftin û birêveçûnê ye.

Tiştên herambûna wan kifş in: Mîna tiştên mirov pê serxweş dibe, goştê berêz, goştê heywana mirar, qumar, zina û kirina derewan.

Tiştên ku di wan de girtîbûn heye, tiştên ku helalbûn an jî herambûna wan tam ne kifş in. Ev tiştên di wan de taybetiya ku mirov ji hin aliyan ve helal û ji hin aliyan ve jî heram binirxîne heye. Ango hem li ser herambûna wan û hem jî li ser helalbûna wan mirov dikare delîlê bîne. Di tiştên wiha de pirê însanan bi awayê pêdivî nikarin binirxînin û biryarekê bidin. Di mijarên wiha de encax muctehid dikarin biryarê bidin. Tiştên ku di vê qadê de ne, muctehidek dikare wê heram û yekî din wê helal bijimêre. Xweparastina ji tiştên di vê qadê de ne, ji bo kesên ku ne di asta îctihadê ne, ji bo teqwayê pêdiviyek e. Tiştê ku di hedîsê de hatiye tewsiyekirin ev e. mirov dikare li gorî biryara muctehidekî jî tevbigere. Lewra Xwedê Teala Di Qur'ana Pîroz de wiha ferman dike: "**Eger hûn nizanibin, ji zaneyan bipirsin.**"[86]

29. Heram çi ye û cureyên wê çi ne?

Pirs: Heram çi ye û cureyên wê çi ne?

[85] Buxarî, Îman, 39, Buyû' 2; Muslim, Musaqat, 107-108.
[86] Enbiya, 21/7.

Bersiv: Heram, çi tiştê ku kirina wê ji aliyê olî ve hatibe qedexkirin. Mîna vexwarina meyê, lîstina qumarê, kirina zinayê, xwarina malê yekî bi neheqî.

Ji tiştên heram re **muherremat** tê gotin. Kesên ku heraman nekin xêrê û yên bikin jî guneh bidest dixin. Di hin rewşan de di dinyayê de jî tên cezakirin. Mîna kesê zinayê bike 100 dar lê dikeve, ê diz destê wî tê jêkirin.

Heram jî mîna ku bi bal **heram lîaynîhî** û **heram lîxeyrîhî** ve tê teqsîmkirin, bi bal qismên **herama qet'î** û **herama zennî** ve jî tê dabeşkirin.

Heram lîaynîhî: Ji tiştên ku bi sedem xerabî û zirara tê de ye hatiye qedexekirin re tê gotin. Mîna xwarina goştê heywana mirar, vexwarina meyê, lîstina qumarê, kirina zinayê, mirov diziye bike û bi neheqî canekî bikuje.

Tu mukelef nikare van tiştan bike. Bi vê rêyê, tu encameke huqûqî nayê bidestxistin. Eger bûbe mijar ji bo peymanekê, peyman betal tê jimartin. Kirîn û firotina heywanên mirar û meyê nayê kirin. Malê ku bi rêya qumar û diziyê hatibe bidestxistin eger heman mal hebe divê ew, eger ew tune be jî divê bedêla wî li xwediyê mal bê vegerandin. Bi zinayê ne neseb û ne jî mafê mîratê, sabit nabe. Di rewşên awarte de ji heram lîaynîhî mirov dikare hin tiştan bike. Kesê bitirse ku dê ji birçîbûnê bimire dikare ji goştê heywana mirar bixwe. Kesê tiştek di gewrîya wî de mabe û ji meyê pê ve tu tiştekî din nebîne, da ku nefetise dikare meyê vexwe. Lê belê encax bi mîqdarê zerûretê dikare wan tiştan bikar bîne.

Heram lixeyrîhî: Ji tiştên ku herambûn, ne di wê bi xwe de de be belbî bi sedemeke din hatibe heramkirin re tê gotin. Mîna xwarina malê kesan bi neheqî û kirîn û firotina di roja înê de di dema xwendina ezanê de. Herambûna xwarina sêva yekî ne ji ber sêvê bi xwe ye, belbî bi sedema ku xwediyê sêvê di xwarina wê de destûra me nedaye. Herwiha kirîn firotina di roja înê di dema ezanê de tu ferqa wê ji kirîn û firotinên di rojên din de tune ye. Encax herambûna wê ji ber ku Xwedê Teala di wê gavê de kirîn û firotin qedexe kiriye.

Herama qet'î: Tiştê ku bi awayekî zelal û teqez bi delîleke şer'î sabit bûbe. Ango bi Qur'ana Pîroz an jî herama ku bi awayekî zelal di hedîseke ku hatina wê ji Pêxember (s.a.w) teqez sabit bûbe, derbas bibe. Mîna vexwarina meyê, kirina zinayê, îsyankariya li hember dê û bavan û jin li hember zilamên biyanî deverên xwe yên mehrem vekin. Mandelkirina heramên ji vê beşê dibe sedem ji bo derketina ji dîn û mirov bibe kafir.

Herama zennî: Herama ku bi delîleke zennî lê xwedî hêz be sabit bûbe û ev delîl ji aliyê muctehidan ve nêzî delîleke qet'î hatibe dîtin. Ev heram ji aliyê baweriyê ve ne mîna herama qet'î ye. Kesê wê mandel bike nabe kafir. Lê belê ji aliyê 'emelkirinê ve, mîna herama qet'î ye. Di herama qet'î de di navbera mezheban de tu îxtilaf tune ye. Qada ku mezheb tê de îxtilaf dikin, ferza zennî ye. Mezhebek tiştekî dikare heram bijimêre ji ber ku wî ew xistiye wê qadê, di halê ku mezhebekî din heman tiştî dikare helal bibîne. Mîna mezhebê Henefî, di nêrîna xwe de bi delîleke ji aliyê hêz û qewetê ve nêzî delîleke qet'î ye, delîl tînin û dibêjin xwarina heywanên deryayê yên ku ne di şeklê masiyan de ne, heram in. Lê belê mezhebê Malikî û Şafiî xwe bi wateya giştî ya ayet û hedîsê ya mijarê ve digrin û dibêjin hemû heywanên deryayê helal in. Encax xwarina goştê berêz ji ber ku bi awayekî aşkere û zelal hatiye qedexekirin, di vê mijarê tu nêrîneke cuda ji mezheban tune ye.

30. Ma têgehên mîna wacib, mekrûh, musteheb çawa pêk hatine?

Pirs: Gelo têgehên mîna wacib-mekrûh-mendûb- mubah çawa derketine holê? Di Qur'anê de behsa wan nayê kirin. Ma em li hember wan tiştan berpirsyar in?

Bersiv: Têgehên wiha bi çêbûna 'ilmê **usûlu'l-fiqhê** derketine holê. Hukmên ku di Qur'an û sunetê de derbas dibin, diyarkirina bê ka ew dikevin bin kîjan beşê -ji yên ku navê wan li jor derbas bûne-, ne karê her kesî ye, belbî karê zanyaran e. Kesên ku zanabûna wan a bikaribin tesnîfên wiha bikin tune be, di mijarên wisa de divê ku bidin pey zanyaran.

31. Aqil çi ye?

Pirs: Aqil çi ye? Di Îslamê de ji bo mukelefbûnê, divê mirov çiqas biaqil be?

Bersiv: Biaqil û kesê xwedîaqil, wekî têgeheke huqûqî ku mirov ji aliyê melekeyên zihnî ve têra xwe bike û mirov baş û nebaş, kar û zirarê ji hev derxe re tê gotin.

Dema aqil û qabiliyeta temyîzê xira bibe, berpirsyariyên olî ji ser mirov radibin. Di vir de tiştê balkêş û herî girîng, di dema taserufkirin û kirina karekî de ka gelo qabiliyeta jihevveqetendina ya baş û nebaş bi mirov re heye yan tune ye. Lewra hin nexweşî hene ku her dem qabiliyet û hêza mirov ya temyîzê ji holê radike, hinên din jî hene hêza temyîzê ne her dem belbî hin caran radikin. Di vir de nexweş, di demên ku heşê wî li serê wî be ji kar û kiryarên xwe, berpirsyar e. Mîna kesên bi nexweşiya sarayê ne, di navbera herdu nobetan de aqlê wan li serê wan e. An jî yên di xewa xwe de digerin, di demên din de hêza wan a temyîzê heye.[87]

32. Keçeke neh salî eger ketibe cilan, ma ji aliyê olî ve dibe berpirsyar?

Pirs: Seyda keçeke 9 salî; aqil û balix ango dest bi dîtina xwîna xwînmehê kiribe, gelo ji berpirsyariyên dînî mesûl e? Ji ber ku ji aliyê temen ve biçûk e, min hewcedariya pirsê kir. Ango hin helwestên wan ên zaroktî hene. Gelo hûn dikarin vê yekê şîrove bikin?

Bersiv: Di dînê me ji bo çaxa mukelefbûna bi 'îbadetan re çaxa balixbûnê tê gotin. Ev çax jî ji bo keçan ku xwîna xwînmehê bibînin û ji bo lawan jî ku îhtilam* bibin.

Ji vî aliyî ve, keçeke ku gihîştibe temenê dîtina xwîna xwînmehê, çawa ku cara yekem ket cila, li hember hemû emr û fermanên dînî ji nimêj, rojî û hwd. dibe

[87] Çavkanî: Bendên "Âkıl", **DİA**, 1989, II, 247 û "Akıl Hastalığı" ji nivîsên Hamdi Döndüren ên di Ansîklopediya Şamil İslam û Ansîklopediya Dîyanetê.

* Li hin herêmên Kurd lê dijîn ji bo vê yekê "Şeytan bi wan bikene" tê gotin. (Şîroveya amadekar)

berpirsyar. Ev keç, çawa ku ji xwîna xwînmehê paqij bû divê ku dest bi kirina nimêjê bike. Biçûkbûna temenê wê û nîşandana helwestên zarokan nabe asteng ji bo vê yekê.

Di rewşên wisa de berpirsyariyeke mezin dikeve stûyê malbatê û bi taybetî jî dikeve stûyê dayikê. Divê ku vê rewşa nû, bi awayekî xweşik ji keça xwe re îzah bikin û wê ji mesûliyetên wê agahdar bikin. Eger îhtiyac hebe divê ku serî li pisporan bidin û ji wan alîkariyê bixwazin.

33. Îctihad çi ye?

Pirs: Îctihad çi ye?

Bersiv: Îctihad di ferhengê de bi wateya hewldayîn û tehemula zor û zehmetiyan e. wekî têgehekê, ku zanyarekî 'ilmê fiqhê da ku ji delîleke şer'î hukmekî derxe, hewl bide û di vî warî de hemû hêza xwe bikar bîne. Di vir de delîl, Qur'ana Pîroz û suneta Pêxember (s.a.w) e. Ev di huqûqa Îslamê de çavkaniyên sereke ne.

Ji kesê ku îctihadê dike re **muctehid** û ji hukmê şer'î ku bûye mijar jî re **muctehedun fîh** tê gotin. Ji bo kesê ku dikare di hemû mijarên dînî de îctihadê bike re **muctehidê mutleq**, ji bo yên ku di hin mijaran de dikarin îctihadê bikin jî re **muctehidê muqeyyed**, tê gotin. Ji zanyarên 'ilmê fiqhê yên negihîştine asteke ku bikaribin îctihadê bikin re jî muqellid tê gotin. Lewra xebatên van kesan, bi fêhmkirina nêrîna muctehidekî din û fetwadayîna li gorî wê fêhmê, sînorkirî ye. Bi gelemperî girêdayî bi mezhebekî ve ne û di berhemên xwe de nêrîn, mînak û riwayetên wî mezhebî berhev û tomar dikin. Muctehidên ku rêbaz û azîneyeke wan a taybet heye, divê ku Qur'ana Pîroz û hedîsên cenabê Pêxember (s.a.w) bi awayekî baş bizanibin. Ayetên bi hukman ve girêdayî ne ango divê **ayatu'l-Ehkaman** ji aliyê ziman û şer'îtê ve baş bizanibe û di derbarê têgehên mîna xas, 'am, mucmel, mufeser, nasix û mensûxê ji zanyariyên Qur'anê xwedî agahî be. Hedîsên di derbarê hukman de ne, digel ku ji aliyê ziman û şer'îetê ve bizanibe divê ku baş bizanibe bê ev riwayet

çawa hatine ragihandin. Di îctihadê de cihekî girîng ji qiyasê re heye. Da ku qiyasên şaş neyên kirin divê qiyasê têr baş bizanibe. Îmam Ebû Hanîfe (w. 150/767), Îmam Şafiî (w. 204/819), Îmam Malik (w. 179/795) û Îmam Ehmedê kurê Henbel (w. 241/855) ji wan zanyarên ku hemû şertên ji bo îctihadê pêwîst in, di xwe de civandine. Muctehidên mutleq bi van zanyaran bi tenê ne sînorkirî ne. Ji bilî van zatan pir muctehidên din ên mutleq hene, lê belê ev çar zatên han ji ber ku nêrînên wan ji aliyê pir zanyarên fiqhê ve hatine pejirandin, bi tevkariya wan bûne mezheb û hebûna xwe heta roja me domandine. Îctihad, nêrîn û qinyata zanyarê fiqhê ya ku piştî lêkolîn û lêgerînên di çavkaniyên Îslamê de di mijarekê de bidest xistiye. Encama zanyar gihîştiyê dibe ku şaş be, ji vê bonê jê re **zena xalib** tê gotin. Ji ber vê yekê ye ku tu muctehid nikare angaşt bike ku nêrîna wî teqez rast e û nêrîn û îctihadên din şaş in.

Ji ber ku di çavkaniyên sereke yên şerî'etê de ango di Qur'anê û sunetê de di derbarê her bûyereke dadî de rave û şîroveyên berfireh tune ne, lê belê di wan de azîne û rêgezên giştî û îfadeyên mutleq û teqez hene, muctehidan bi xweragirtin û spartina van rêgezên giştî û îfadeyên teqez, hukmên şer'î yên bûyerên ku pêrgî wan hatine yan jî wan tesewir dikin, derxistine holê.

Li gorî ku Muazê kurê Cebel (w. 18/629) (x.j.q) ragihandiye, Qasidê Xwedê dema wî dişîne Yemenê jê re wiha dibêje:

-Ey Muaz! Tê bi çi biryar bidî!

- Bi tiştê ku di kitêba Xwedê Teala de ne.

- Eger tu wê di kitêba Xwedê Teala de nebînî?

- Ez ê bi tiştê ku Qasidê Xwedê biryar daye, biryar bidim.

- Eger tu wê di biryarên Qasidê Xwedê de nebînî?

- Ez ê bi nêrîna xwe îctihad bikim.

Li ser vê yekê Qasidê Xwedê (s.a.w) wiha kerem kir: "*Hemd ji Xwedayê ku memûrê Qasidê xwe serfiraz dêra*."[88]

Pirsa Pêxember (s.a.w) ji Muazê kurê Cebel (x.j.q) ya di rewşa ku hukm û biryara tu lê digerî, di Qur'an û hedîsên Cenabê Pêxember de nebînî tê çi bikî, dide nîşandan ku ev herdu çavkanî di hemû bûyeran de biryareke aşkere dernaxin holê. Di dewama hedîsê de îfade dike ku tiştê divê bê kirin jî îctihad e. 'Ebdullahê kurê 'Umer (x.j.q) radigihîne ku rojekê Qasidê Xwedê (s.a.w) ji Emrê kurê As re (x.j.q) wiha dibêje:

- Di navbera van herdu kesan de dadgerî bike.

'Emrê kurê 'As got:

- Di hebûna te de ez ê çawa dadgeriyê bikim?

- Got, belê.

- Pirsî, li gorî çi ez biryarê bidim?

-(Pêxember got:) *Li gorî nêrîn û îctihada xwe, eger tu îctihadê bikî û rastiyê bibînî ji te re deh xêr hene, an jî tu xeletiyê bikî ji te re xêrek heye*.[89]

Zanyarên Îslamê ji îfadeya Pêxember (s.a.w) kesê di îctihada xwe de şaşiyê bike jê re xêr heye, cesaret girtine. Bi vî awayî di biwara kirina îctihadê de li hember bûyerên ku nû derdikevin, dê tu tirs û tirsonekî li ser wan çênebe.

34. Tiştên ehliyeta mirov ya edayê ji holê radikin çi ne?

Pirs: Tiştên ku ehliyeta edayê ji holê radikin çi ne? Kesê ku nexweşê kronîk psikiyatrik a giran be û nexweşê derûnî gelo ehliyeta wî ya edayê heye?

[88] Ebû Dawûd, Aqdiye, 11; Şemsuddîn Muhemmedê kurê Ehmedê es-Serexsî, **el-Mebsût**, XVI, 76.
[89] Serexsî, **el-Mebsût**, XVI, 76.

Bersiv: Ehliyet, di ferhengê bi wateya "kêrhatinê" ye. Ev, di termînolojiya 'ilmê fiqhê de bi bal du celeban tê dabeşkirin:

Ehliyeta Wucûbê: Bi wateya ku mirov bibe xwediyê mafan û bikaribe deynan bigire. Bingeha vê celebê ehliyetê jî hebûna mirov li jiyanê wê pêk tîne. Ji vê bonê ye ku ehliyeta wucûbê, ji her merivî re ji dema ku jiyan dest pê dike heta jiyan bi dawî bibe, heye. Bêyî ku li taybetmendiyên mirov ji temen û ji melekeyên însên ên aqlî bê nihêrtin, hebûna vê ehliyetê ji her însanî re tê pejirandin.

Ehliyeta Edayê: mirov bikaribe kirinên ku ji aliyê zagonî ve muteber tên jimartin, derxe holê. Bingeha vê ehliyetê jî ne mîna ehliyeta wucûbê ku taybetmendiya xwe ji jiyanê digirt; belbî esas û bingehê wê xwe dide ser hêz û qaweta hebûna temyîzê ango jihevqetandinê. Di vê rewşê de cenînê ku di zikê diya xwe de ye û zarokê negihîştiye temenê –heft salan - temyîzê ji bo wan ehliyeta edayê ne mewzûbehs e.

Rewşên ku qada ehliyetê teng dikin an jî ehliyetê ji holê radikin ev in:

Dînîtî: Rewşeke ku aqlê mirov an jî şiyana temyîzê tune dike. Tu bandoreke vê rewşê li ser ehliyeta wucûbê tune ye. Lê belê ehliyeta edayê ji holê radike. 'îbadet li ser van kesan, ne wacib e û teserufatên wan jî ji aliyê zagonî ve, ne muteber in.

Ji xeyrî vê, rewşên ku qada ehliyetê teng dikin an jî ehliyetê ji holê radikin; 'eteh (kesên aqilsivik), sefih (kesên di xerckirinên xwe de bêtedbîr in), sekr (serxweşbûn) û îkrah (meriv gefan li yekî bixwe da ku tiştekî ku bi kirina wê ne mukelef e mirov bi zorê pê bide kirin.)[90]

Nexweşên derûnî û nexweşên kronîk psikiyatrik, eger vê nexweşiya xwe bi awayê nobetê derbas bikin, di esnayê nobetê de ji ehliyeta edayê mehrûm in. Di

[90] Zekiyyuddîn Şa'ban, **İslam Hukuk İlminin Esasları (Usûlü'l-Fıkh)**, wergêr: İbrahim Kafi Dönmez, TDVY, Enqere 1996, rp. 295-306.

demên xwe yên din de jî mîna hemû însanan xwediyê ehliyeta tam in. Lê belê eger her gav di vê rewşê de bin, ji ehliyeta edayê mehrûm tên jimartin.

35. Gelo rewşa kesên şizofren ji aliyê berpirsyariyê ve çi ye?

Pirs: Di dînê me de ji bo yên "dîn" însanên ku denga wan a aqlî ne di cih de ye tê gotin ku li axretê pirs ji wan nayê kirin. Gelo sirf astengdarên zihnî dikevin vê kategoriyê? An jî şîzofren, paranoya û kesên nerihetiyên wan ên derûnî hene jî dikevin bin vê beşê? Mîna kesê şizofren dema curmekî bike, ma dê ji vî karê xwe berpirsyar neyê dîtin?

Bersiv: Di huqûqê de ji bo kesê 'ji aliyê melekeyên aqlî ve bikaribe başî û xerabiyê, kar û zirarê ji hev veqetîne' re tê gotin aqîl û xwedî aqil. Dema aqil û qabiliyeta jihevqetandinê zirarê bibîne, berpirsyariyên mirov ên olî radibin.

Xwedê Teala di Qur'ana Pîroz de wiha ferman dike:

"**Xwedê her kesî bes li gorî hêza wî, wî binbar dike**."[91]

Riwayeteke ku ji Pêxemberê me (s.a.w) hatiye ragihandin wiha ye:

"*Ji sê kesan berpirsyarî hatiye rakirin: Dînê ku aqlê wî tune ye, ji kesê di xew de heta hişyar bibe û ji zarok heta bigihîje çaxa balixbûnê*."[92]

Nexweşên derûnî, li gorî rabûna qabiliyeta wan a temyîzê bi giştî yan jî qismen; ji zikmakî, herdem an jî di demên xuya de derdikeve holê, cudahîtiyan nîşan dide. Ji ber vê yekê her nexweş li gorî nexweşiya wî ka gelo hêz û qabiliyeta xwe ya aqlî û temyîzê ji dest daye yan nedaye, hukmên wan jî diguherin.

Kesên di vê rewşê de bin, heta ku nexweşiyên wan ên ku aql û hêza wan a temyîzê ji holê radikin berdewam bin, teserufên ku dikin ne muteber in. Di vê demê de ji ber curmên ku dikin tu ceza li wan nayê tetbîqkirin. Ew ji her celebên cezayên

[91] Beqere, 2/286.
[92] Ebû Dawûd, Hudûd, 16; Tirmizî, Hudûd, 2.

bedenî muaf in. Lewra ew ne ehl in ji bo tetbîqkirina cezayên bedenî. Lê belê, zirarên malî ku dane kesan, ji malê wan dê bê tezmînkirin.[93]

36. Hukmê kesên fasiq çi ye?

Pirs: Ez dixwazim di mijara kesên fasiq de li gorî huqûqa Îslamê agahiyan bidest bixim. Yek ji wan mijarên ku ez di berhemên Îslamî de pêrgî wan hatim; di dadgehê de şahdeyiya kesên fasiq nayê qebûlkirin. Heta, kesê fasiq bibêje ku min heyva meha Remezanê dîtiye dîsa jî jê nayê qebûlkirin. Niha fasiqiya kesên wiha dê çawa bê tesbîtkirin? Gelo li gorî çi fasiqiya mirov tesbît dibe?

Bersiv: Di derbarê vê mijarê de di rûpelên 176-177an ji pirtûka me ya bi navê "**İslâm Muhâkeme Hukûku**" ev îfade derbas dibin:

Kesê fasiq şahdeyiya wî nayê qebûlkirin. Ji misilmanên ku di helwestên xwe de ji sînorên ku dîn danîne bibuhure, re fasiq tê gotin. Lewra kesê xwe ji qedexeyeke dînî neparêze digel ku bawer dike ew heram e, dibe ku xwe ji şahdeyiya bi derewîn jî neparêze digel ku dizane heram e jî. Xwedê Teala ferman dike ku nûçe û agahiyên kesên fasiq digihînin meriv, yekser neyên qebûlkirin û wiha kerem kiriye:

"**Gelî bawermendan! Eger yekî fasiq ji were xeberekê bîne, vêca rastiya wê vekolin. Da ku hûn bê zanîn destdirêjiya civakekê nekin û piştre hûn li kirina xwe poşman nebin**."[94]

Fermana bi neqebûlkirina xebera yekî wisa, dibe asteng ji bo qebûlkirina şahdeyiya wî. Daxwaziya divê li ser xeberê lêkolîn bê kirin, dide nîşandan ku bi gotina wî bawerî nayê kirin. Di vê mijarê hemû mezheban tifaq kirine. Kesên ji ber ku fasiq in, dema ji aliyê dadgerekî ve şahdeyiya wan hatibe redkirin, li pêşberî dadgerekî din di wê mijarê de nikarin şahdeyiyê bidin. Eger dadgerê duyem

[93] Bnh: Mustafa Uzunpostalcı, "İslâm Hukukunda Ehliyeti Daraltan veya Ortadan Kaldıran Sebepler", İslam Hukuku Araştırmaları Dergisi, jimar: 9, sal: 2007, rp. 67–100.
[94] Hucurat, 49/6.

şahdeyiya wan qebûl bike û biryarê bide jî biryara wî ne muteber e. Û herwiha dema dadgerek şahidan bi sedem fasiqiyê red bike, di heman dozê de nikare careke din lê guh bidêre.

Mijara gelo kîjan helwest mirov dike fasiq, mijareke bi gengeşî ye. Çavkaniyan di derbarê mijarê de cih dane agahiyên berfireh. Kesên hînî helwestên ku namûs û heysiyeta mirov dişikînin bûne, mîna kesên reqs û mesqere dikin, kesên bi lîstik û şahiyan demên xwe derbas dikin an jî xwe noqî lîstikan dikin û nimêj li wan diçin, zilamên jinmeyl (hevzayend), kesên hînî vexwarina meyê bûne, kesên faîzê dixwin û kesên helwestên dijraberî exlaqê gelemperî nîşan didin, şahdeyiya wan nayê qebûlkirin.

Kesên wiha di rewşa ku tobe bikin û xwe rast û durist bikin, şahdeyiya wan tê qebûlkirin. Encax kesê bi derewkarî hatibe zanîn û bi wî awayî nav dabe, herçiqas tobe bike jî tu carî şahdeyiya wî nayê qebûlkirin. Lewra nayê zanîn ka di tobeya xwe de rast e yan na.

Li gorî Ebû Yûsuf, kesê fasiq eger di civakê de xwedan nufûz, şeref û bi heysiyet be, şahdeyiya wî tê qebûlkirin. Lewra di şahdeyiya wî de gumana derewan tune ye. Ji ber ku merivekî xwedan giranî ye, tu kes nikare cesaret bike da ku bi pereyan şahdeyiyê pê bide kirin û ji ber şeref û heysiyeta xwe jî bêyî ku li hêviya tu feydeyekê de be dê xwe ji derewan biparêze. Vê nêrîna Ebû Yûsuf, peyrew ji xwe re nedîtine.[95]

37. Ma di Îslamê de borîna demê heye? Eger hebe jî dema wê çiqas e?

Pirs: Gelo di huqûqa Îslamê ji bo dozan "demborîn" heye? Eger hebe jî çiqas e?

[95] Abdülaziz Bayındır, **İslâm Muhâkeme Hukûku (Osmanlı Devri Uygulaması)**, Weşanên Weqfa Suleymaniyeyê, Stenbol 1437/2015, rp. 176-177.

Bersiv: Nivîseke[96] me ya ku me di derbarê mijara demborînê de nivîsandibû wiha ye:

Di rewşa dozên şexsî ku hewcedarî bi vekirina dozê heye, borîna demê ne mewzûbehs e. Lê belê ji bo vê, dewlet dikare demekê dêne. (Ali Haydar, IV/692; Ji bo mînakekê bnh: İst. Bab Mah. 2/11 vr. 29-b.) Di sûc û curmên tê qebûlkirin ku bi temamî li dijî raya giştî hatine kirin, da ku li dozê bê nihêrtin, di halê ku tu mazeret tune be divê ku demeke dirêj di ser de derbas nebûbe. Ev jî helwestên ku dibin sedem ji bo kirina heramiyekê û curmên ku cezayê hedê pêwîst dikin:

1. Sûcên ku dibin sedem ji bo kirina qedexeyekê (heramiyekê)

Kesên ku dibin şahidê kirina gunehekî mezin, divê herî kêm di hundirê pênc rojan de serî li dadgehê bidin. Eger bê hebûna uzrekî vê demê derbas bikin, serîlêdan û şahdeyiya ku dê piştre bikin nayê qebûlkirin. Mîna kesê bibe şahidê mêr û jineke ku dizane nezewicandî ne û wekî mêr û jina zewicandî bi hev re dijîn, eger bê hebûna uzrekî di hundirê pênc rojan de serî li dadgehê nedin û wan şikayet nekin, şikayet û serilêdana wan a piştre nayê qebûlkirin. (Ankaravi, I/406) Lewra şahidan bi vê helwesta xwe nîşan dane ku rizaya wan bi dewamkirina vê kirina nebaş heye. Kesên ku çavên xwe li kirina gunehên wiha mezin digirin, şahdeyiya wan nayê qebûlkirin.

2. Sûcên ku cezayê hedê pêwîst dikin

Ev sûc jî sûcên ku sirf mafê Xwedê Teala ne ji kirina zinayê, vexwarina meyê, eşqiyatî û dizî. Kesên ku bibin şahidê bûyerekê ji wan bûyeran, di navbera ku şahdeyiyê bike yan jî wan bistrêne azad e. Eger dê bûyerê nestrêne, divê ku di hundirê dema wê de serî li dadgehê bide. Lewra mirov di serî de bûyerê veşêre û piştre hewl bide ku şahdeyiyê bide û serî li dadgehê bide, nîşan dide ku ji bo vê kîn,

[96] Bayındır, **İslâm Muhâkeme Hukûku**, rp. 156-157.

nefret û dijminatiyekê ew tehrîk kiriye. Şahid bi vê helwesta xwe ji ber ku dikeve bin tohmetê, şahdeyî û îxbara wî ya di vê meseleyê de nayê qebûlkirin.[97]

Eger derengmayin bi sebeb uzrekî be, serîlêdan tê pejirandin û li dozê tê nihêrtin. Mîna gumandar li cihekî ku dadgerê wê tune ye be û birina wî ya ji bo hizûra dadger eger bûbe sedem ji bo derengmayinê, ew derengmayin uzur tê pejirandin û li dozê tê nihêrtin.

Ebû Henîfe ji bo derengmayinê tu dem xuya nekiriye û teqdîra wê xistiye destê dadgeran. Lewra derengmayin, dibe ku bi sedem uzrekî be. Uzur jî bi pîvanên cuda tên nirxandin. Ji ber vê yekê sînorkirina bi demeke xuyakirî, ne pêkan e. Divê ku nirxandina mijarê ji nêrîna dadger re bê hiştin.

Ebû Yûsuf û Îmam Muhemmed gotine ku derengmayina bi qasî mehekê ji dema çêbûna bûyerê, dibe asteng ji bo nihêrtina li dozê.[98] Di tetbîqê de jî derengmayina heyvekê esas û bingeh hatiye girtin.[99]

Gumandarê bi sûcê diziyê, ji sûcê diziya ku bi tevahî mafê Xwedê Teala ye (mafê gelemperî) û ji dayîna malê kesê diziya wî hatiye kirin ku mafê bendan (mafê taybet) tê qebûlkirin, berpirsyar e. Borîna demê, sûcdarî ji jêrikirina dest rizgar dike, encax da ku tezmîna malê hatiye dizîn bê kirin, borîna demê nabe asteng ji bo vekirina dozê.

Sûcê bêbextiya li yekî/yeke bi namûs û dawpaqij bi xerabiya zinayê, cezayê hedê qezfê li mirov pêwîst dike. Di vê de digel ku mafê Xwedê Teala bêhtir e jî lê belê ji ber ku mafê kesê ku bêbextî lê hatiye kirin jî tê de heye, nêrîna li dozeke wiha xwe bi şikayeta kesê mexdûr digire. Eger di şikayeta xwe de dereng bimîne, ev nabe asteng ji bo nêrîna li dozê.[100]

---

[97] Kasanî, **Bedaiu's-Sanai**', VII, 46; Molla Hüsrev, II, 85.
[98] Kasanî, **Bedaiu's-Sanai**', VII, 47.
[99] Ankaravî, I, 406.
[100] Kasanî, **Bedaiu's-Sanai**', VII, 47; el-Haskefî II, 158; Molla Hüsrev, II, 85.

38. Ma hemû helwestên Pêxemberê me ji me re sunet in?

Pirs: Gelo hal û hereketên ku Pêxember (s.a.w) bi mebesta ‘îbadetê kirine yan jî hemû helwestên wî ji bo me dibin sunet?

Bersiv: Kirinên Pêxember (s.a.w) bi bal sê qisman ve tên dabeşkirin:

Helwestên wî yên beşerî. Ango hal û hereketên ji ber ku însan e kirine. Helwestên Pêxember (s.a.w) ên ji vî celebî di ‘ilmê usûlu’l-fiqhê de bi navê “**el-ef’‘alu’l-cibilliyye**” tên naskirin. Ango tiştên ku xwariye û lixwe kiriye… Hukmê van îbahe ye. Yanî mirov di kirin û nekirina wan de serbest e. Lewra ev tişt ji Qasidê Xwedê Teala, ne bi wesfê pêxemberiyê belbî ji ber ku însan e derketine holê. Encax eger yek bibêje “Da ku ez bişibim Pêxemberê me, ez dixwazim wekî wî bikim” bi sedem dilsoziya niyeta wî, hêvî heye ku li cem Xwedê Teala bigihîje xêr û sewabê.

Helwestên ku babetên Pêxemberê me ne. Mîna rabûna nimêja şevê ya ku li ser wî ferz bû û helalbûna zewaca bi zêdeyî ji çar jinan û hwd. ji helwestên ku bi delîleke şer‘î hatibin diyarkirin. Kesê misilman nikare van helwestan ji xwe re delîl bigire.

Kirinên Pêxember (s.a.w) ên ku ji bo me mînak in. Mîna kirina nimêjê, çawa rojî girtiye û hec kiriye. Kesê misilman divê di van tiştan bide pey Pêxember (s.a.w). Lewra wî ev helwest ne ji ber xwe û ji hewa nefsa xwe derxistine; belbî li gorî hukmên ku ji Qur’ana Pîroz derxistine, ev helwest nîşan dane.

39. Biryarên Pêxember (s.a.w) ên ku bi wesfê serokê dewletê dane

Pirs: Çawa ku Pêxemberê me (s.a.w) Qasidê Xwedê Teala bû, herwiha ew serokê dewletê jî bû. Gelo mahiyeta ferman û qedexeyên wî yên ku ji bo tevgera dewletê dida û yên ku bi sedem pêxember bû dida mîna hev in? Ango hukmên ku bi wesfê serokatiyê dida, dibin mijar ji bo dîn?

Bersiv: Resûlullah, bi wateya Qasidê Xwedê ye. Wî, ayet û nîşanên ku ji Xwedê digirtin bi wesfê Qasidtiyê teblîxî mirovan dikir. Di heman wextê de wî, di her mijarê de ji wan ayetan hikum derdixistin. Ew hikum ji mirovan re digotin û ew tetbîq dikirin. Ev tişt di Qur'anê de bi awayê "hikmet" yani biryar û hukmê rast derbas dibe. Hem hînkirin hem jî tetbîqkirina hikmetê wezîfa wî bû. Xwedê Teala wiha ferman dike:

"**Da ku Em qenciyên xwe li ser we temam bikin[101], Me ji nav we ji bo we qasidek şand. Ew, ayetên Me ji we re dixwîne, we paqij dike, we hînî Qur'an û hikmetê dike û we fêrî tiştê ku hûn pê nizanin dike**."[102]

Dema Pêxember (s.a.w) ji Qur'anê hikum derdixistin dibû ku hin şaşîtî bikirana. Mîna di têkiliyên wî yên bi jinên wî re (Tehrîm, 66/6), di tetbîqa wî ya bi dîlên herbê re (Enfal, 8/67-68), dema destûr dabû munafiqan (Tewbe, 9/43) û helwestên wî yên li hember hin misilmanan ('Ebese, 80/1-10) hin şaşîtî kiribûn, Xwedê Teala îtab lê kiribû û ew hişyar kiribû. Bi vî awayî Xwedê Teala şaşîtiyên wî sererast dikirin, da ku bide nîşandan ku ew ne Xweda ye.

Qur'an, pirtûkeke îlahî ye ku di xwe ayetên jê re hatine hinartin digire. Hikmetên ku Pêxember (s.a.w) ji Qur'anê derxistine jî suneta wî pêk tîne. Sererastkirina şaşîtiyên ku hatine kirin jî dide nîşandan ku suneta Pêxember (s.a.w) ji aliyê Xwedê ve hatiye pejirandin. Xwedê Teala wiha ferman dike:

"**Dema Xwedê û Qasidê Wî li ser tiştekî biryar dan, ji bo tu mêr û jineke bawermend maf tune ye ku di karên xwe de li rêyeke din bigerin. Kî li hember Xwedê û Qasidê Wî derkeve, êdî bi rastî wî bi rewşeke aşîkar rê şaş kiriye**."[103]

---

[101] Tîpa كَ a ku di serê vê ayetê de derbas dibe, bi lêkera لِأُتِمَّ ya ku di ayeta pêş de derbas dibe ve girêdayî ye. Ji ber vê yekê me ayet wiha "**Da ku Em qenciyên xwe li ser we temam bikin**" wergerand.

[102] Beqere, 2/151.

[103] Ehzab, 33/36.

"**Na, sond bi Perwerdegarê te, ew heta ku di lecên nav xwe de te nekin hekem û paşê ji hukmê te daye re jî tu tengezariyekê di dilê xwe de nebînin û ji bo wê biryara te daye jidil xwe berdest nekin, wan bawerî neaniye**."[104]

Di encamê de di kîjan mijarê de be bila bibe tetbîq û biryarên wî, ji bo misilmanan zerûrî ne û divê bên peyitandin.[**]

40. Seddî zerayi' çi ye?

Pirs: Gelo seddî zerayi' prensîbeke huqûqê ya rast e? Girtina rêyên ku diçin heramiyê ma sînorên heramiyan berfirehtir nakin?

Bersiv: Zerayi', pirjimara bêjeya zerî'e ye. Zerî'e, di termînolojiya huqûqa Îslamê de ji navgînên ku mirov dibin bal encamên ku di dîn de hatine qedexekirin. Seddî zerayî' jî girtin û qedexekirina wan rê û navgînan e. Li gorî vê seddî zerayî', bi wateya qedexekirina navgîn û wasiteyên ku dibin sedem ji bo mefsedetê. Mefsedet jî rewşên ku ji aliyê dîn ve hatine qedexekirin îfade dike.[105]

Ev, prensîbeke huqûqê ya rast e. Bi taybetî jî dema Xwedê Teala gunehên mezin qedexe dike, ferman dike ku "**nêzî wan nebin**", "**ji wan dûr bimînin**". Dûrmayin jî encax ku mirov di navbera xwe û wan de mesafeyekê bihêle pêkan e û jixwe ji vê re jî **seddî zerayî**' tê gotin.

41. Da ku mirov Qur'anê başтir fêhm bike, ma 'ilmê mentiqê ji mirov dibe alîkar?

Pirs: Xebata di warê 'ilmê mentiqê de (çi ya kevn çi jî ya nûjen) ji bo têgihîştina wateya Qur'anê gelo ji mirov re dibe alîkar? Di vê mijarê de hûn çi pêşniyar dikin?

---

[104] Nîsa, 4/65.

[**] Dr. Fatih Orum

[105] Şa'ban, **İslam Hukuk İlminin Esasları**, rp. 202.

Bersiv: Qur'ana Pîroz her dem bala mirov dikişîne ser xweza, aql û tefekurê û bûyerên li derdora mirov diqewimin tehlîl bike û bi hûrebînî lê binihêre. Ayetên Pirtûka Pîroz li muxatebên xwe yên difikirin û fikr û ramanên xwe bikar tînin bi awayekî zelal berpirsyariyan li wan bar dike. Ev hemû jî encax bi rê û rêgeza aqlê ku xwe ji pêşdaraziyan, ji hestên siyasî, çandî û hestên hestiyarî xwe parastibe û safî bûbe ango bi rêya hizirandina rast pêkan e. Însan, ayetên ku di Kitêb û xwezayê de ne, encax bi vê rêbazê dikare têbigihîje, xwe bigihîne encamê û tetbîq bike. Qebûl û itirazên xwe di bin siya van rêgezan de bike. Bi tevgera ji vê xalê mentiq, 'ilmê ku rê û rêgezên hizir û fikirandina rast û durist ji xwe re dike mijar ew rêgezên ku bi her kesî re ji zikmakî hene û di her qada jiyanê de divê bên zanîn û bên tetbîqkirin û wekî bersiva pirsa we jî di mijara ji bo têgihîştina wateya Qur'anê, ji me re dibe alîkar.[**]

42. Di têgihîştina wateya Qur'anê de, gelo ferhengên zimanê 'Erebî çiqas ewle ne?

Pirs: Dema em ayetên Qur'anê ji însanan re rave dikin, em dibêjin ku Xwedê Teala Qur'an rave kiriye û divê em jî li ser wateya bêjeyan lêkolînê bikin. Em di pirên rave û şîroveyên wateya bêjeyan de jî maneyên sereke yên ferhengan çavkanî nîşan didin. Lê belê hevalekî, piştî ku me wateya bêjeyên"muteşabih" û "şae" ji wan re rave kir, pirtûka Raxib el-Isfehanî wekî çavkanî nîşan da û îfadeyên ku piştgiriya wateya kevnar ya klasik ji bo van herdu bêjeyan dikin nîşan da. Da ku em doz û angaştên xwe îsbat bikin, em serî li zimanê 'Erebî û ferhengan didin, di pir mijaran de (Mîna Seydayê Abdülaziz Bayındır jî di gotar û nivîsên xwe de wan ferhengan çavkanî nîşan dide) di ferhengên wiha de bêjeyên ku wateya wan hatine guhertin û xerakirin, em ê çawa îzah bikin? Ango wateya ku em didin ayetan em ê li ser çi esasî ava bikin? Eger em bibêjin ku ferheng jî xera bûne, wê gavê dibêjin madem wisa ye, çima hûn di bêjeyên din de ferhengê wekî çavkanî nîşan didin?

[**] Dr. Fatih Orum

Bersiv: Wateya ku Qur'ana Pîroz kitêbeke ronker û diyar e, bi wateya ku rave û şîrovekirin ji aliyê Xwedê ve hatine kirin. Tiştê li me dikeve jî ku em cehd û xebat bikin da ku em van rave û şîroveyan tesbît bikin. Encax divê em vê di sînorê usûl û qaydeyekê de bikin. Di derbarê vê usûlê de em dibînin ku di Qur'anê de agahî û raveyên berfireh hene.

http://www.suleymaniyevakfi.org/arastirmalar/kurani-aciklamada-usul.html

Berhevkirina ayetên muhkem û muteşabih li gorî rêz û distûra **mesanî**yê bi awayê ku komeke ji wateyan pêk bîne, prensîba sereke ya vê usûlê pêk tîne. Lê belê Qur'ana Pîroz bi xwe ferman dike ku dema em di navbera ayetan de pêwendiyan çêbikin divê em bala xwe bidin hin pîvanên cuda. Ha yek ji wan pîvanan, zimanê 'Erebî ye.

Rêya ku em mijarekê çareser bikin, ango rêya ku em di derbarê wê mijarê de komeke ji wateyan pêk bînin, di navbera gotin û wateyê de pêwendiyekê saz bikin, çêdibe. Dema em bi lefzê bêjeyê re eleqedar dibin, wateyên ku Qur'an li wê bêjeyê bar dike pir girîn in. Di vê astê de ferheng jî tên bikaranîn. Lê belê, ferheng bi tenê nabin delîl. Lewra ferheng dibin ku hewl dabin îstilahên ku însanan pêk anîne û nêrîneke xuya di rewacê de bigirin. Ji vî aliyî ve jêgirtiyên ferhengê divê di bin kontrolê de be û dema mirov wateyê bide bêjeyan, wateya gişтî ya Qur'anê bide ber çavê xwe. Mîna hin ferhengan bêjeya "qeda" ya di hedîsê

ما بال الحائض تقضي الصوم ولا تقضي الصَلاة ؟ فَقَالَتْ: أحَرُورِيَّةٌ أنْتِ؟ قلت لست بحرورية ولكني أسأل. قالت كان يصيبنا ذلك فَنُؤْمَرُ بقَضَاءِ الصَّوْمِ وَلا نُؤمَرُ بِقَضَاءِ الصَّلاةِ.

derbas dibe, bi awayê ku mirov 'îbadetekê piştî derbasbûna dema wê bike, watedar kirine. Hal ew e ku wateya rast, mirov 'îbadetekê di dema wê de û bi awayekî tam bike.[**]

43. Kesên ayetên Xwedê Teala li gorî îctihadên xwe şîrove dikin

Pirs: Li gorî Qur'ana Pîroz, kesên ayetên Xwedê Teala li gorî îctihadên xwe şîrove bikin, çawa tên nirxandin?

Bersiv: Ayetên 1em û 2yem ji sûreyê Hûd mealen wiha ne:

"**Elîf, Lam, Ra. Ev kitêbeke wisa ye ku ayetên wê ji aliyê Xwedayê Hekîm ê Xebîr ve muhkem hatiye dêrandin û piştre hatiye tefsîlkirin.**

Da ku hûn ji bilî Xwedê 'îbadetê ji tiştekî din re nekin. (Bibêje:) Bêguman ez ji aliyê Xwedê ve ji bo we mizgînber û hişyarker im."[106]

Mîna ku tê dîtin rave û şîrovekirina Qur'anê, Xwedê bi xwe girtiye ser xwe. Ayetên 16em û 19em ji sûreyê Qiyamet jî divê bi vî awayî bên fêhmê. Erka me jî ew e ku em cehd û xebatê bikin da ku em rave û şîroveyên Xwedê Teala bibînin. Hereketa îctihadê, encax di vê astê de dibe mewzûbehs.

Di kar û xebata xwe ya îctihadê de dema em ji vê xalê hereket bikin, da ku em xwe bigihînin rave û şîroveyên Xwedên Teala, ji ber ku em însan in dibe em şaşiyan bikin û ew uzur tê dîtin. Hereket û çalakiya îctihadê, eger ne bi mebesta tesbîta rave û şîroveyên Xwedê Teala bin, belbî bi mebesta pêkanîna çareseriya angaştên ku di Qur'anê de derbas nabin, wê demê dê pir şari' derkevin holê. Di wê rewşê em ê bibin dîndarên dînê ku hatiye çêkirin û em ê nebin peyrewên dînê ku hatiye hinartin.

Di derbarê şîrovekirina Qur'anê de di lînka jêr de agahiyên berfireh hene. Em tewsiye dikin ku hûn bixwînin:

[**] Dr. Fatih Orum
[106] Hûd, 11/1-2.

http://www.suleymaniyevakfi.org/arastirmalar/kurani-aciklamada-usul.html[**]

44. Gelo erk û wezîfeya Pêxember ya ravekirina Qur'anê heye?

Pirs: Mîna ku ji nivîsa we ya di derbarê tebyîna Qasidê Xwedê de diyar dibe, erka pêxemberan (s.a.w) ku wehyê veneşêrin. Ev, jixwe tiştekî diyar û kifş e. Tiştê ku ez dixwazim bibêjim, gelo tu erkeke pêxemberan an jî zanayan a tefsir û şîrovekirinê tune ye? Eger wisa bûna, we dê di wergera sûreyê Beqere de ya ku min ji malpera we daxist, beşeke ji bo raveyan terxan nekiribûya? Di vê mijarê de ez serî li agahiyên we didim.

Bersiv: Çalakî û bizava ku we behsa wê kir, hînkirina Qasidê Xwedê Teala ya hikmetê ye. Ev, li gorî rê û rêgezeke xuya derxistina hukmên ku jixwe di Qur'anê de hene. Ango tiştên ku bi xwe hene, mirov wan derxe holê. Ji aliyê mecazî ve mirov dikare ji vê re bibêje rave. Lê belê nêrîna kevneşopî, tebyînê wiha fêhm nake. Ew tebyînê, bi awayê tiştên rave û fêhmkirina wan bê rave û şîroveyên Qasidê Xwedê, ne pêkan bin fêhm dikin. Û tê gotin ku beşeke ji van rave û şîroveyan jî bi wehyeke ji bilî Qur'anê pê hatiye danezanîn. Ev herdu jî du tiştên ji hev cuda ne.

Ji bo agahiyên berfirehtir ji kerema xwe re nivîsa di lînka jêr de ye bixwînin:

http://www.suleymaniyevakfi.org/kutsanan-gelenek-ve-kuran/kitap-ve-hikmet.html

45. Tebyîna Pêxember ya Qur'anê ma ne ravekirina wê ye?

Pirs: Eger Pêxember (s.a.w) Qur'ana Pîroz rave nekiribe, wê demê sunet çawa pêk hatiye? Di meha Remezanê ya çûyî de di kanala Hilalê de hûn beşdarî bernameyekê bûbûn. Di derbarê erk û wezîfeya Pêxemberê me (s.a.w) de we hin îfade anîbûn ser zimên. Di derheqê bêjeya "tebyîn"ê de rexneyek hatiye kirin û ferhenga **Lîsanu'l-Ereb** wekî çavkanî hatiye nîşandan û hatiye gotin ku du wate ji bo

[**] Dr. Fatih Orum

vê bêjeyê hene. Ev jî “kifşkirin” û “kifşbûn” e. Di rewşa yekem de lêker gerguhêz e û bi vê sedemê bireser dixwaze, ya duyem jî negerguhêz e. Ji ber ku lêkera “tubeyyînû” bireser girtiye wateya yekem derbas dibe. Min nikaribû bersiva van pirsan bidana. Ango ez hizirîm ku wateya bêjeyan di hevokê de li gorî bêjeya pêş û paş diguhere. Gelo hûn van pirsan çawa dibersivînin?

Bersiv: Qur’an kitêbeke bi zimanê ‘Erebî ye. Xwedê Teala di pir cihan de bal kişandiye ser vê babetê. Ji ber vê yekê ji bo têgihîştin û fêhmkirina wê, divê mirov rêziman û qaydeyên zimanê ‘Erebî li ber çavan bigire. Lê belê, çi musteleh û têgeha ku di Qur’anê de derbas dibe, di serî de divê ku mirov hewl bide ku wateya wê ji Qur’anê bi xwe derxe. Eger em ji mînaka xwe dest pê bikin, gelo bêjeya tebyînê bi kîjan wateyê hatiye bikaranîn?

Ji bo vê yekê, cihên ku bêje digel muşteqên xwe tê de derbas dibin divê bên tesbîtkirin û hewl bê dayîn ku çarçoveya wateya wê bê tayînkirin. Ev, asta yekem e. Di asta duyem de bêjeyên ji aliyê wateyê ve nêzî wê ne, divê ku mirov li wan bigere. Divê li ser eleqe û têkiliya musteleh û têgeha yekem bi yên din re lêkolîn bê kirin, li ser rewşa gelo tu têkilatiyeke ku bandorê li wateya mustelehê ku em li ser dixebitin, heye yan na, bê rawestin. wekî mînak di tesbîtkirina çarçoveya wateya bêjeya tebyînê de resûl, nebî, îtaet, teblîx, tefsîl, tasrif û hwd. divê mirov têkiliya wan bi bêjeya tebyînê re derxe holê. Digel kirina van tiştan hemiyan, bikaranînên ku ji aliyê Qur’anê ve jî hatibin pejirandin, divê mirov qayde û rêzimanê ‘Erebî jî li ber çavan bigire û wan paşçav neke. Dema mirov dest bi tesbîtkirina çarçoveya wateyê kir, di sînorê mentiqê de digel ku mirov Qur’anê bi giştî li ber çavan bigire, bêjeya ku xebat li ser tê kirin mirov dê hewl bide wê tarîf bike. Testkirina tarîfa ku derketiye holê jî bi pirxwendina ayetên ku bêje di wan de derbas dibe, tê kirin. Tarîfa ku derketiye holê, eger bi ayetan re mutefiq be, tarîfeke rast û serkeftî tê qebûlkirin. Mîna ku dê were dîtin, kitêba ku zimanê wê ‘Erebî ye ji bo watedayîna bêjeyeke wê, sirf mirov serî li ferhengan bide yan jî serî li rêzimanê bide, ne kafî ye. Rêziman û ferheng navgîn in. Ne çavkanî û xwediyê gotina dawî ne. Bêjeya tebyînê, dema ew û muşteqên xwe

digel mustelehên din ji Qur'anê bên tehlîlkirin, bi wateya -ji aliyê Xwedê Teala ve- "**ravekirin**, **bi awayekî zelal derxe holê**" tê. Xwedê Teala ayetên xwe rave û tefsîl kirine, di encamê de kitêbeke ronker (kitêba mubîn) derketiye holê. Di rewşa ku ev bêje ji bo pêxemberan û însanên din were bikaranîn, tê wateya kitêba ku ew bi xwe ronker û zelal e "**wê bi xwe derxin holê**." Ji vî aliyî ve tebyîn, erkeke ku ji pêxember û mirovan re hatiye dayîn. Ji vê bonê ye ku ev bêje, ji bo mirovan bi wateya dijberî "veşartin", "xefkirin" tê bikaranîn. Şîrovekirina bi berfirehî di malpera me de di bin sernavê tebyînê de heye.

http://www.suleymaniyevakfi.org/kuran-arastirmalari/kurana-gore-resulullahin-tebyn-gorevinin-anlami.html

Eger em werin mijara suneta Qasidê Xwedê Teala: Ev, derxistina hikmetê ye. Raveyên ku Qur'an wan di xwe de digire, tefsîlat û ehkamên ango hikmetên ku piştî hin cehd û xebatan derketine holê. Qasidê Xwedê, hikmet daye fêr kirin. Ango Wî bi xwe hikmet derxistiye û rêya wê fêrî însanan kiriye. Agahiyên berfireh di derbarê mijarê de di malpera me de di beşa "Kitap ve Hikmet"ê de hene. Ji kerema xwe re bixwînin:

http://www.suleymaniyevakfi.org/kutsanan-gelenek-ve-kuran/kitap-ve-hikmet.html**

46. Eger her kes bikaribe xwe bigihîne hikmetê, ma çi hewcedarî bi pêxemberan dimîne?

Pirs: Seyda, ez bi taybetî jî gotina we ya "Qur'an û sunet beşên parçeyekî ne." bi bîra hevalên xwe dixim. Ango ez dibêjim "Hemû tiştên Pêxemberê me kiriye û gotiye, di Qur'anê de hene." Ew jî dibêjin "Eger em jî bikaribin wan tiştan bibînin, wê gavê pêxember çima hatiye afirandin?" Divê em vê çawa bibersivînin?

** Dr. Fatih Orum

Bersiv: Digel erka pêxemberan ya teblixkirinê, erka wan a ku ji kitêka îlahî hukman derxin jî heye. Ev, karekî pir bi zor û zehmet e. Pêxember vê erkê hem bicih tînin û hem jî fêrî mirovan dikin. Pêxemberê me jî ji Qur'anê hikum derxistine û hînî hevalên xwe jî kiriye. Bi vî awayê xwe, ew ji me re mînak e.

Şayed eger pêxember nehatibana şandin, di mijara gihîştina hikmetê de mirovan dê nikaribana xwe zû bizû bigihandanayê. Di xwezayê de her tişt hene; lê belê kifşkirin û berhevkirina wan û di encamê de çêkirin û afirandina teknolojiyekê ked û xebatê dixwaze. Wekî din jî pêwîstî bi mirovên pispor û yên ku vê ji xwe re bikin erk û wezîfe heye. Eger her yekî bixwesta ku kompîtura bi xwe çêbikirina pêşketin dê ewqas zû çênebûna.

Ji bo agahiyên befirehtir di derbarê têkiliya sunet û hikmetê de ji kerema xwe re serî li lînkên jêr bidin:

http://www.suleymaniyevakfi.org/kutsanan-gelenek-ve-kuran/kitap-ve-hikmet.html

http://www.fetva.net/goruntulu-fetvalar/sunnet-hikmet-iliskisini-aciklar-misiniz.html

http://www.fetva.net/goruntulu-fetvalar/hikmet-nedir-peygamber-olmayanlara-hikmet-verilir-mi.html

47. Ma Pêxemeberê me heta ku ayeta dawî daket, wî ji Qur'anê hikum nedaye?

Pirs: Hûn dibêjin ku "Heta ku Xwedê Teala ayetên Qur'anê temam neke, pêxember hikum û biryarekê ji wan dernaxe." Di vî halî de ma rewşeke xerîb dernakeve holê. Ew jî Pêxember (s.a.w) di 23 salan de bêyî ku tu hikum û biryarekê bide, pêxemberî kiriye?

Bersiv: Di ayeta 114an de ji sûreyê Taha Xwedê Teala radigihîne Qasidê xwe ku heta pêvajoya hinartina wehyê temam nebe, di hikum û biryardayîna bi Qur'anê de lez meke. Lê mebest ji pêvajoya hinartina wehyê ne temamê Qur'anê ye, belbî heta hinartina ayetên bi wê mijarê re têkildar in temam bibe. Lewra Qur'an, kitêbeke ku ji komên wateyan pêk tê. Piştî di mijarekê de komek ji wateyan temam bû êdî hikum û biryar tê dayîn. Tiştê ku ji Qasidê Xwedê dihate xwestin ev bû. Ayetên 16-19an ji sûreyê Qiyamet û ayeta 106an ji sûreyê Îsrayê jî divê bi vî çavî bên nirxandin.

Hin ayet, mijarekê bi awayekî kifş û zelal vedibêjin. Ev hukmê zelal, di heman wextê de tê tetbîqkirin. Lê belê, dibe ku di wê ayetê de hin hukmên ku bi giştî nayên fêhmê hebin. Ew hikum jî encax bi temambûna ayetên têkildar ên din re zelal û ronî dibin. Tiştê ku li Pêxemberê me (s.a.w) hatiye fermankirin, ku li benda wê pêkhatinê be. Ne ku jê hatiye xwestin heta hinartina ayeta dawîn ji Qur'anê temam bibe -23 salan- tu hukmekî nede.[**]

48. Di serdema pêşîn de ji bo têgihîştina wateya Qur'anê, karê komxebat dihate kirin?

Pirs: Di mijara ravekirina Qur'anê bi Qur'anê de hûn her dem balê dikişînin ser karê bi hev re. Baş e lê belê, derxistina agahî û zanayiyên rast û durist ji tiştên ku ji Qasidê Xwedê Teala tên û em bi "hikmetê" wan bi nav dikin, gelo bi heman rê û rêbazê hatine bidestxistin? An jî di vê mijarê de ji qasidan re îmtiyaz û cihêwaziyek heye?

Bersiv: Qasidê Xwedê Teala ji me re mînaka herî xweşik e. Ew, di babeta ka hikmet çawa tê derxistin jî ji me re mînak e. Di ayetên pêşîn ji sûreyê Muzzemmil de tê ragihandin ku wî, di dema Mekkeyê de bi komek ji hevalên xwe bi şevê dixwendin û di vê xwendina xwe de jî li ser esasê "tertîl"ê (bi hûrbûna li ser wateyên yên wê), Qur'an dixwendin. Û ji ayeta paşîn ji heman sûreyî ya tê gotin ku li Medîneyê hatiye hinartin, tê fêhmê ku ew rewş demeke dirêj dewam kiriye.

[**] Dr. Fatih Orum

Eger rewş ne wisa bûna, piştî wefata wî dê tu kesê ku vî karî bizanibûna, hînbibûna û bidana hînkirin, tune bûna! Encax, bûyer ne wisa ye. Heta di dema ku Qasidê Xwedê hîn li jiyanê bûye ji ber ku pêvajoya wehyê hîn dewam dikir, em dibînin ku tesbîtên wî û yên derdora wî hin caran bi wehyê hatine sererastkirin. Ev derfeta ha di destê me de tune ye. Ên ku dê şaşiyên me sererast bikin, dîsa yên mîna me ji wan ên ku hewl didin di mijarên wiha de hikmetê derxin holê ne.

Ji bo agahiyên befirehtir di derbarê têkiliya sunet û hikmetê de em tewsiye dikin ku hûn nivîsa di lînka jêr de ye bixwînin:

http://www.suleymaniyevakfi.org/kutsanan-gelenek-ve-kuran/kitap-ve-hikmet.html

49. 'Iletên qedexeyên Qur'anê li gorî çi tên tesbîtkirin?

Pirs: Qedexeyên di Qur'anê de ne, gelo digel 'iletên xwe bi hev re ji aliyê Xwedê Teala ve hatine diyarkirin û qedexekirin? Mîna qedexebûna vexwarina tiştên ku serxweşiyê çêdikin, gelo bi diyarkirina 'iletê wê yan jî bi qiyasê hatine tesbîtkirin û qedexekirin?

Bersiv: Ji bilî tiştên ku sirf ji bo ceribandin û îmtihankirinê ne, nayê tesewirkirin ku ferman û qedexeyên Xwedê Teala, bê sebeb bin. Lê belê, divê 'ilet û hikmet bi hev neyên şaşkirin. Di Qur'anê de xemr, ango her tiştê dema bê xwarin, vexwarin an jî bê bikaranîn mirov serxweş bike, hatiye qedexekirin. 'Iletê wê, mîna ku ji navê wê jî tê fêhmê, ji ber ku aqlê mirov dinixumîne ango bi sedema ku serxweşiyê çêdike.

Di vê rewşê de xemr, dibe qedexeyeke ku 'iletê wê ji aliyê Şari' (Xwedê Teala) ve hatiye diyarkirin û ev qedexe hemû madeyên ku mirov pê serxweş dibe, di xwe de digire.

Hikmetê qedexebûna tiştên ku mirov bi wan serxweş dibe jî bi sedema ku karên nebaş ên şeytan in, neyartiyê dixin navbera mirovan û dibin asteng ji bo bîranîna Xwedê Teala.

'Iletê herambûna faîzê jî ku mirov ji deynekî karekê bidest bixe û hemû karên bi vî awayî jî dibin faîz. Hikmetê qedexebûnê jî ji ber ku dibe sedem bo tengasî û qeyranên aborî û herwiha dibe sedem ji bo pêkhatina pergala kedxwarinê û hwd.

Aliyê herî girîng ji pirsa we; pêdiviya ku divê 'iletê qedexeyan bi awayekî xweşik û rind bê tesbîtkirin. Ev 'ilet jî bi awayekî teqez divê ku ji Qur'anê bê tesbîtkirin. Piştî tesbîta 'iletê, mijara gelo çi dikeve bin vê yan nekevê, êdî ev dibe mijareke îctihadî. Xeletî û şaşiyên ku di vê astê de bên kirin, tên bexşandin. Encax mirov tesbîta 'iletê bi xwe bi îctihadê bike, ev nayê qebûlkirin. Lewra ev nabe xeletî, belbî dibe zêdegavî û derbaskirina sînor.[**]

50. Ma Henefiyan, dema seferê/rêwîtiyê bi qiyaseke çawa diyar kirine?

Pirs: Di berhemên mezhebê Henefî de dema behsa hukmên rêwîtiyê tê kirin, tê gotin ku rêwîtiyên ji 15 rojan kêmtir didomin hukmê seferîtiyê li ser tê tetbîqkirin. Di bersiva pirsa çima 15 roj jî wiha tê şîrovekirin, "ji bo jinan dema paqijiyê ya di navbera du xwînmehan de herî kêm 15 roj in." Mîna ku çawa pîrek di navbera du xwînmehan de herî kêm divê 15 rojan bi bal 'îbadetên xwe ve vegere, ên rêwî jî di roja xwe ya 15an de divê vegerin bi bal rewşa xwe ya normal. Ev qiyaseke çawa ye, hûn dikarin şîrove bikin?

Bersiv: Henefî dibêjin mijarên ku ji celebên teqdîratan bin û di derbarê wan de tu ness ji ayet û hedîsan tune bin, mirov nikare bi re'yê (nêrînê) hikum bide. Mîna mirov nikare bibêje "Kesê jineke tacîz kiribe û pê re zina nekiribe, bi qiyasa li ser hedê zinayê em ê 50 darî lêdin." Digel vê jî Henefî dibêjin mijarên ku ji cureyê teqdîratan e û sînorê wan ê jor û jêr xuya ye, di navbera pîvanên jor û jêr de mirov

[**] Dr. Fatih Orum

dikare bi re'yê hikum bide. Mîna eger temenê balixbûnê di navbera 10 û 20an de be, di pîvanên di navbera van de li gorî însanan mirov dikare hikum bide.[107]

Sînorkirina dema rêwîtiyê bi 15 rojan bi qiyasa li ser dema herî kêm di navbera du xwînmehan 15 roj in[108], di esas û bingeha xwe de li gorî nêrîna Henefiyan ya qiyasê, ne qiyaseke rast û durist e. Bêimkaniya ku bi qiyaseke wiha ji serî ve hikum pê were dayîn, şîrovekerê pirtûka **el-Hîdaye** Kemaluddîn Îbnu'l-Humam aniye ziman. Û bal kişandiye ser rola ku qiyaseke wisa di teyidkirina hukmekî ku bi riwayetê sabit bûbe heye.[109]

Ango li gorî Henefiyan dema rêwîtiyê ne bi qiyasa li ser dema paqijiya rojên jinan, belbî li gorî riwayeteke angaşt dikin ku di vê mijarê de heye, hatiye tesbîtkirin; qiyasê jî wekî destek û delîleke duyem bikar anîne.[**]

[107] Serexsî, **Usûl**, II, 112-112.
[108] 'Elî kurê Ebûbekrê el-Merxînanî, **el-Hîdaye Şerhû Bidayetî'l-Mubtedî**, Stenbol 1985, I, 81; Kemaluddîn Muhemmed Îbnu'l-Humam, **Şerhû Fethi'l-Qedîr**, Beyrût, II, 35.
[109] Bnh: Îbnu'l-Humam, **Şerhû Fethi'l-Qedîr**, II, 35.
[**] Dr. Fatih Orum

DESMÊJ

51. Ma di serdema Pêxember (s.a.w) de di dewsa sabûnê de çi bikar dianîn?

Pirs: Eqrebayekî min piştî ku ji avrêjê derket, bêyî ku destê xwe bi sabûnê bişo desmêj girt. Gelo di serdema Pêxember (s.a.w) de sabûn hebû? Eger tune be, di şûna wê de çi bikar dianîn? Eger ku hûn min agahdar bikin, ez jî dixwazim di nav xeberdanê de bêyî ku dilê wî bihêlim, wî agahdar bikim.

Bersiv: Di serdema Pêxember (s.a.w) de şert û mercên jiyanê yên vê demê tune bûn. Wan, ji bo paqijiyê tiştên mîna sabûn şampuan, dermanê kincan û hwd. bikar nedianîn. Belbî li gorî mercên xwe yên wê demê çi pêwîstbûna, ew dikirin. Ango paqijiya xwe bi wî tiştî dikirin.

Li gorî agahiyên ku di berhemên 'ilmê hedîsê de derbas dibin, Pêxember (s.a.w) dema ku ji qedemgehê derdiket, ne bi avê tenê belbî beriya avê destên xwe bi axê jî dişûştin.

Ebû Hureyre (x.j.q) wiha dibêje:

"*Dema Pêxember (s.a.w) bixwesta ku biçe avrêjê, min jê re di firaqek bi navê tewr an jî rekwe, av dibir. Bi wê, paqijiya xwe dikir û destên xwe bi axê paqij dikirin. Piştre min di firaqek din de jê re av dibir û bi wê desmêj digirt*."[110]

Di beriya xuslê jî de da ku bêhtir paqijî pêk were, hatiye ragihandin ku Pêxember (s.a.w) destên xwe di axê didan.[111]

Erka ku axê di wê demê de bi cî dianî, îro sabûn pêk têne. Ji ber vê yekê destşûştina bi axê, hem ji aliyê tenduristiyê ve pêdiviyek e û hem jî peyrewiya rêçika (suneta) Pêxember aleyhisselam e.

[110] Ebû Dawûd, Teharet, 24; Nesaî, Teharet, 43; Îbn Mace, Teharet, 29.
[111] Buxarî, Xusul, 7-8; Muslim, Heyz, 37 (317).

52. Ma mirov dikare li ser piyan mîz bike?

Pirs: Hukmê mîzkirina li ser pîyan –ji piya- çi ye? Û di derbarê wê de gelo tu hedîsên Pêxember (s.a.w) hene yan na? Eger hebe dereceya wê ji rastiyê çi ye?

Bersiv: Di çavkaniyên sehîh ên hedîsê de hedîseke ku mîzkirina ji piya qedexe bike tune ye. Di dema mîzkirinê de mirov rûdinê, da ku pîsîtî nepejiqe mirov. Pêxember (s.a.w) pirê caran rûniştî kiriye û ya sunet jî ev e. Lê belê hin caran jî li ser pîyan mîz kiriye. Hedîsek wiha ye: Ebû Mûsa (x.j.q) dibêje ku: Rojekê ez bi Qasidê Xwedê Teala re bûm, ji bo destava biçûk xwest ku derkeve avrêjê, yekser çû binê dîwarekî ku ax û xîz lê hene û îhtiyaciya xwe li vir dît, piştre wiha ferman kir; "*Dema yekî ji ve xwest ku desmêja xwe ya biçûk bişikîne bila li cîhekî munasib bigere û bişikîne*."[112]

Di mezhebê Henbelî de mîzkirina li ser pîyan **mubah** e. Li gorî mezhebê Malikî, eger îhtimala pejiqandinê mîzê tune be caiz e û eger hebe **mekrûh** e. Piraniya zanyaran dibêjin ku: "**Mîzkirina li ser pîyan û bê sebeb mekrûh e. Lê belê ew kerahet, keraheta tenzîhî ye**." Îmam Newewî û nivîskarê pirtûka Bezlul-Mechûd dibêjin ku ew nêrîna mezhebê Henefî ye jî.[113]

Di encamê de herçiqas mîzkirina li piya dibe sedem ji bo hin nexweşiyan jî ji bo hukmê wê mirov dikare encax bibêje ku mekrûh e. Lewra hin caran be jî Pêxember (s.a.w) li ser piyan mîz kiriye.

53. Di desmêjê de îstibra çawa tê kirin?

Pirs: Piştî ku mirov desmêja xwe ya biçûk şikand divê mirov çiqasî bisekine û piştre desmêj bigire. Lewra hin caran mîz ji mirov diniqute, ma ev tişt zirarê dide duristiya desmêja mirov an na?

---

[112] Ebû Dawûd, Teharet, 2.

[113] Bnh: **Sünen-i Ebu Davud Terceme ve Şerhi**, amd: Necati Yeniel, Hüseyin Kayapınar, Weşanxana Şamil, Stenbol 1989, Teharet, 12, şîroveya hedîsa 23yem.

Bersiv: Piştî ku mirov desmêja xwe dişikîne, bi kirina hin helwestan û bi mebesta bê ka îdrara mirov tam sekiniye yan na, di pîrtûkên fiqhê de jê re tê gotin "**îstibra**". Loma piştî ku mirov ji qedemgehê derket divê mirov zû zû ranebe û desmêj negire. Demekê bisekine û "**îstibra**"yê berdewam bike heta ku mirov bawer bike ku êdî îdrar tam sekiniye. Piştî girtina desmêjê şayed mîz biniqute desmêj dişikê. Ev rewş bêhtir di zilaman de derdikeve holê. Ji ber vê yekê divê zilam di mijara "**îstibra**" yê de pir bi hizir bin.

Şekl û dema "**îstibra**"yê li gorî xwezaya însanan ji hev cuda ne. Yanî ne mîna hev in. Şîret û tewsiyeyên ku di pirtûkên fiqhê de ji bo îstibrayê derbas dibin ji kuxik, birêdeçûn û xwedirêjkirinê, tu aliyekî wan ên dînî tune ne. Ango ji bo îstibrayê divê ku her kes usûl û esasên munasibî xwezaya wî ne bikar bîne û heta xwe tam paqij neke dest bi desmêjê neke.

54. Ma misilmanan, nimêjên xwe li Mekkeyê bi desmêj dikirin?

Pirs: Nimêj, beriya hicretê ferz bûye û ayeta ku behsa girtina desmêjê dike li Medîneyê nazil bûye. Gelo di dema Mekkeyê de nimêj bi desmêj dihat kirin?

Bersiv: Wekî hemû 'îbadetan desmêj û nimêj jî ne sirf li Pêxember (s.a.w) û umeta wî bi tenê, belbî li hemû pêxember û umetên wan hatiye ferzkirin. Ji Ubeyyê kurê Ke'b (x.j.q) wiha hatiye ragihandin:

Qasidê Xwedê av xwest, 'ezayên desmêjê carekê şûştin û desmêj girt. Piştre wiha ferman kir: "*Ev, desmêja mirov ya wisa ye ku kesê wê negire Xwedê Teala tu nimêjekê jê qebûl nake*." Dûvre du caran 'ezayên xwe şûştin û desmêj girt û wiha ferman kir: **"***Ev, desmêja mirov ya wisa ye ku kesê wê bigire, Xwedê Teala du qat xêrê didê***."** Piştre wî, 'ezayên xwe sê caran şûştin û desmêj girt û wiha got: "*Ev, desmêja min û ya qasidên beriya min e***."**[114]

[114] Îbn Mace, Teharet, 47.

Hevoka dawî ji hedîsê di **Musned** a Ehmedê kurê Henbel bi vî awayî derbas dibe: "*Ev, desmêja min û ya pêxemberên beriya min e*.**"**[115]

Çawa ji hedîsê tê dîtin, gotina Pêxember (s.a.w) "*Ew desmêja qasid û pêxemberên beriya min e*." dike lazimê xwe ku desmêj li Mekkeyê dihat zanîn û nimêj jî bi desmêj dihat kirin. Lê belê bi sedemê ku ayeta behsa desmêjê dike piştre nazil bûye, dibe ku ew agahî negihîştibin me.

Usameyê kurê Zeyd (x.j.q) di hedîsek din de ji bavê xwe Zeydê kurê Harîse wiha radigihîne: desmêj û nimêj ji aliyê Cibrîl (a.s) ve bi despêka daketina wehyê re bi Pêxember (s.a.w) hatiye hînkirin.[116]

Di Ansîklopediya Îslamî ya Dîyanetê de wiha derbas dibe: "Cebraîl hem desmêj hem jî nimêj, fêrî Pêxember (s.a.w) kiriye û bi hevdu re desmêj girtine û nimêj kirine. Beriya daketina ayeta desmêjê tu carî Pêxember (s.a.w) bê desmêj nimêj nekiriye. Ew tişt ji aliyê ulemayên Siyerê tevan bi vî şeklî hatiye qebûlkirin."[117]

55. Ma mirov dikare li qedemgehê desmêj bigire?

Pirs: Gelo mirov dikare li qedemgehê desmêj bigire?

Bersiv: Ne qedexe ye ku mirov li qedemgehê desmêj bigire. Lê belê pêkan e ku necaset û pîsî bipejiqe mirov. Loma divê ku mirov bi hizir be. Şayed derfeta girtina desmêjê li cihekî din hebe ya baş ew e ku mirov li qedemgehê desmêj negire.

56. Ma di desmêjê de şûştina hundirê çavan jî ferz e?

Pirs: Tê ragihandin ku 'Ebdullahê kurê 'Umer (x.j.q) û 'Ebdullahê kurê 'Ebbas (x.j.q) dema desmêj digirtin, hundirê çavên xwe jî dişûştin. Di girtina desmêjê de ma

[115] Ehmedê kurê Henbel, **Musned**, II/98.
[116] Ehmedê kurê Henbel, **Musned**, II/161.
[117] Abdulkadir Şener, "Abdest" **DİA**, 1988, I, 69.

divê ku mirov hundirê çavên xwe jî bişo? Eger ne ferz be hikmetê kirina wan dibe ku çi be?

Bersiv: Di ayeta derbarê desmêjê de ji sûreyê Maîde, Xwedê Teala fermana şûştina "**rû**" dike. Ji vê fermanê tu kes şûştina hundirê çavan fêhm nake. Eger riwayeta ku 'Ebdullahê kurê 'Umer û 'Ebdullahê kurê 'Ebbas hundirê çavên xwe jî dişûştin rast be, **ev, îctihadeke şexsî ye ji wan**, ne tiştekî zêdetir e. Di vê mijarê de ji Pêxember (s.a.w) tu tetbîq (pê 'emel kirin) an jî tu gotin nehatine ragihandin.[118]

57. Ma mirov dikare bi lensan desmêj bigire?

Pirs: Di çavên min de lens hene. Hin caran derfeta ku ez wan derxim û desmêj bigirim nabînim û digel lensan desmêj digirim. Gelo desmêja min durist e yan na?

Bersiv: Şûştina hundirê çavan, çi ji bo desmêjê çi jî ji bo xuslê ne ferz e. Ji ber vê yekê tu eleqeya lensan û desmêj û xuslê bi hev re tune ye. Bê derxistina lensan jî desmêjgirtin durist e.

58. Ma mesihkirina serî di desmêjê de çawa tê kirin?

Pirs: Mesihkirina serî çawa tê kirin? Yanî dê mirov bi ser re mesih bike yan jî divê ku ser û binê por hemû şil bibe?

Bersiv: Mesih, di ferhengê de bi maneya "destdana tiştekî" ye. Di desmêjê de mesihkirin, ku mirov destên xwe yên şil di porê xwe bide. Yanî ne pêwîst e ku binê por şil bibe. Eger ku wisa bûna wê demê navê wê nedibû **mesih,** dê bibûna **şûştin**.

59. Hukmê mesihkirina paş stû çi ye?

Pirs: Hukmê mesihkirina paşiya stû çi ye û çawa tê mesihkirin?

[118] Bnh: Yehyayê kurê Şerefê en-Newewî, **el-Mecmû' Şerhu'l-Muhezzeb li'ş-Şîrazî**, I, 202-203, Fer'un fî keyfiyyetil-Medmedetî wel-Îstinşaqî.

Bersiv: Li gorî mezhebê Henefî, **sunet e** ku mirov piştî mesihkirina serî û guhan, bi pişta sê tiliyan ji destên xwe û bêyî tu avek nû paşiya stûyê xwe mesih bike. Li gorî hin alimên din ev kirin, **musteheb** e. Ango bi xêr e.

Di vê mijarê de hedîseke ku di **Musned** a Ehmedê kurê Henbel de derbas dibe, ji xwe re dikin delîl. Lê belê ulemayên 'ilmê hedîsê îsbat kirine ku ew hedîs zeîf e. Ango 'emel pê nayê kirin. Ji ber vê yekê piraniya zanyarên Îslamê dibêjên ku di desmêjgirtinê de mesihkirina paşiya stû **mekrûh** e. Yanî ne baş e. Û ew ê bibe sedem ji bo îfrat û te'essubê.[119]

60. Ma di desmêjê de muwalat ango şûştina endamên desmêjê li pey hev, ferz e?

Pirs: Ma çêdibe ku mirov beriya lingên xwe bişo, dest û rûyê xwe ziwa bike û piştre lingên xwe bişo?

Bersiv: "**Muwalat**" ango şûştina 'ezayên desmêjê li pey hev û bê navber di mezhebê Henefî û Şafiî de **sunet** e û li gorî mezhebê Malikî û Henbelî ferz e.[120]

Lê belê li gorî ayeta 6em ji sûreyê Maîde ya ku desmêjê bi me dide danasandin û li gorî hedîsên ku di derbarê desmêjê de hatine ragihandin, mirov nikare bibêje ku "**muwalat**" ferz e. Lê belê dîsa jî ya baş ew e ku mirov piştî şûştina her endamekî, bêyî ku bi tiştekî din mijûl bibe dest bi şûştina 'ezayê din bike û ziwakirina wan, bihêle dawî.

61. Kesê ferzeke desmêjê jibîr bike, divê çi bike?

Pirs: Piştî ku min nimêja xwe kir, hat bîra min ku min di dema desmêjgirtinê de serê xwe mesih nekiriye. Di vî halî de nimêja ku min kiriye qebûl dibe? An jî divê ku ez careke din nimêj bikim?

---

[119] Bnh: Wehbe ez-Zuheylî, **el-Fiqhu'l-Îslamî we Edilletuh**, çapa 3yem, Dimeşq 1409/1989, I, 253.
[120] Bnh: Zuheylî, **el-Fiqhu'l-Îslamî,** I, 233-234.

Bersiv: Mesihkirina serî ji ferzên desmêjê ye. Eger te ji bîr kir û serê xwe mesih nekir, piştre hat bîra te, divê ku tu ji nû ve desmêj bigirî û nimêja xwe careke din bikî. Lê belê ku nehat bîra te, tiştekî ku bê kirin tune ye.

62. Ma pîrek piştî meshkirina guhan, paşiya stûyê xwe jî mesih dikin, an na?

Pirs: Hûn dikarin şeklê desmêjgirtina jinan vebêjin? Ma pîrek piştî mesihkirina guhan, paşiya stûyê xwe jî mesih dikin an na?

Bersiv: Di desmêjgirtinê de tu ferq di navbera jin û mêran de tune ye. Lê di dema desmêjgirtinê de eger zilamên nemehrem (yanî yên ku mara wan li hev dibin) hazir bin, jin nikarin mil û porê xwe vekin. Lewra ew der ji jinan re ewret in. Lê belê zilam dikarin vekin. Lewra ji wan re ne ewret in.

Li aliyê din çi mêr dibe çi jî jin, ne şert e ku paşiya stûyê xwe mesih bikin. Lewra delîla di vê mijarê de (ango hedîsa behsa mesihirina paşiya stû dike) zeîf e.

63. Kesên nexweş dê çawa desmêj bigirin?

Pirs: Ji ber nexweşiyeke genetik ji 14 saliya min de ye, ez nikarim bimeşim. Ji stûyê xwe pê ve ez nikarim xwe bilivênim. Xwarin û vexwarina min jî bi alîkariya hinekên din e. Kinc û laşê min paqij e. Lê belê tu derfeta min a desmêj û teyemumgirtinê tune ye. Di vê rewşê de divê ez çi bikim?

Bersiv: Xweda Teala di Qur'ana Pîroz de wiha ferman dike:

"**Xwedê, her kesî bes li gorî hêza wî, wî binbar dike.**"[121]

Di mijarên dînî de Xwedê Teala, tiştên ku mirov nikare hilgire ango taqet û hêza mirov nagihêjê li mirov bar nake û mirov jê berpirsyar nagire.

Xwedê Teala di dawiya ayeta ku behsa girtina desmêjê dike wiha ferman dike:

[121] Beqere, 2/286.

“**Xwedê naxwaze ji we re zehmetiyê derxe; lê belê dixwaze we paqij bike û qenciya xwe li ser we temam bike. Da ku hûn Wî bişêkirînin**.”[122]

“**Di mijara dîn de Wî tu zehmetî li we bar nekiriye**.”[123]

“**Li ser koran tu guneh nîn e, li ser seqetan tu guneh nîn e û li ser nexweşan jî tu guneh nîn e**.”[124]

Berpirsyariya we, di derbarê tiştên ku hûn dikarin bikin de ye. Ê ku nexweşiyê jî dide Ew e û yê ku ferman jî dike Ew e. Ji ber wî hawî qaweta we bigêhîje çi, divê hûn wî bikin. Li gorî vê, tiştên ku hûn ê bikin wekî ku li jêr hatiye birêzkirin;

Wexta yek li ba we hazir be, bi alîkariya wî hûn ê desmêj bigirin û nimêja xwe bikin.

Ku alîkerê we tune be û hûn bikaribin rûyê xwe bişon, tenê rûyê xwe bişon û nimêja xwe bikin.

Ku hûn nikaribin rûyê xwe bişon, bi axeke ku li pêşiya we wê bê danîn, hûn ê teyemum bigirin. Tenê rûyê xwe hûn ê di axê bidin.

Hûn nikaribin wê jî bikin bê desmêj û teyemumê hûn ê nimêja xwe bikin.

Di vê mijarê de di pirtûka “‘Büyük İslam İlmihali” de ev agahî derbas dibe: “Kesê ku destê wî pûç be û nikaribe avê bikar bîne û tu alîkarê wî jî tune bin, dest û rûyê xwe dê di axê bide û teyemum bigire. Eger dest û milên wî jêkirî bin, sirf dê rûyê xwe di axê bide û teyemum bigire. Şayed ku rûyê wî birîndar be, wê bê teyemum nimêj bike.”[125]

---

[122] Maîde, 5/6.
[123] Hec, 22/ 78.
[124] Fetih, 48/17.
[125] Ömer Nasuhi Bilmen, **Büyük İslam İlmihali**, Stenbol 1986, rp. 91, paragraf: 208.

64. Di mezhebê Henefî de, mesihkirina li ser goreyan çawa tê kirin?

Pirs: Li gorî mezhebê Henefî, ma duriste ku mirov li ser goreyan mesih bike?

Bersiv: Di mezhebê Henefî de ji bo mesihkirina li ser goreyan du şert hene:

1. Divê gore, xwe li lingê mirov bigirin bi awayekî ku ji ber xwe ve dernekevin.

2. Ne tenik bin, bi awayekî ku rengê lingên mirov tê de xuya nebe.

Hemû goreyên ku îro zilam dixin lingên xwe munasibî vê tarîfê ne. Encax goreyên ku jin dixinê û rengê lingên wan didin nîşandan ne wiha ne. Ev agahî, di pirtûkên derheqê mezhebê Henefî tevan de derbas dibe. Wateya stûriya goreyan ku ne tenik bin ango ne şefaf bin. Îbn Abidîn, stûriya goreyan, "bi awayekî ku ji ziraviya wan binê xwe nedin nîşandan" îfade kiriye.[126]

Birêdeçûna bi goreyan ne ku mirov wan, wekî pêlavê bikar bîne. Lewra gore, bi çi mebestê hatibe lixwekirin, birêdeçûna wê qonaxê bi xwe ye, ne qonaxeke din e. Em hemû dizanin, temamê goreyên ku îro em dixin lingên xwe, ji bo birêdeçûna qonaxeke wiha, saxlem û tekûz in.

Ji aliyê deh sehabeyan -havalên- Pêxember (s.a.w) hatiye ragihandin ku wî li ser goreyan mesih kiriye. Îmam Ebû Henîfe, berê di baweriya ku divê gore binê wan bên taban kirin de bû. Lewra wê demê wekî pêlavê mirov dikare bikar bîne. Lê belê piştre dev ji vê nêrîna xwe berdaye.

Di encamê de di mezhebê Henefî de fetwa hatiye dayîn ku li ser goreyan mesih tê kirin.[127]

[126] Îbn Abidîn Ehmedê kurê 'Ebdulxenê, **Reddu'l-Muxtar**, Stenbol 1984, I, 269.
[127] 'Ebdullahê kurê Mehmûdê kurê Mewdûd el-Mewsillî, **el-Ixtiyar**, Beyrût 1395/1975, I, 25.

65. Bikaranîna xufikan, ma dibe sebebê kêmbûna xêra desmêjê?

Pirs: Bikaranîna xufikan di desmêjê de dibe sedemê kêmbûna xêra wê, an na? Ango îsbaxul-wudû' (girtina desmêjê bi awayekî rêk û pêk) tê cî yan na?

Bersiv: Bikaranîna xufikan, nabe sedem ji bo kêmbûna xêra desmêjê. Lewra ew hêsaniyeke ji aliyê Xwedê Teala ve ji me re hatiye dayîn. Qasidê Xwedê Teala û hevalên wî her dem ji vê hêsaniyê sûd wergirtine û xufik bikar anîne. Eger ne wiha bûna, dê Pêxember (s.a.w) û hevalên wî, ew bikarneanîna. Tebîra ku di hedîsekê de "*digel ku nefis nexwaze jî desmêjgirtina tam*" derbas dibe, bi wateya; di hemû şert û mercên giran de jî nemaze di zivistanê de mirov 'ezayên xwe yên desmêjê tam û durist bişo yanî **mirov guh bide sunet û mestehebên desmêjê**.

66. Ma dema mesihkirina li ser xufikan, kengî dest pê dike?

Pirs: Wextê mesihkirina li ser xufikan, ji dema lixwekirina wan yan ji wexta ku desmêja mirov dişikê dest pê dike?

Bersiv: Dema meshê li gorî mezhebê Henefî ji bo kesê "**muqîm**" yanî ne rêwî şev û rojekê ye. Ango bîst û çar saet e. Ji bo kesê rêwî, sê şev û sê roj e. Yanî heftê û du saet e. **Destpêkirina wê demê jî piştî ku mirov xufikên xwe lixwe kir û bêdesmêj bû dest pê dike.** Yanî îtibar ne bi wexta lixwekirina xufikan e, belbî ji dema mirov bêdesmêj dibe dest pê dike.

Li gorî Malikiyan tu dem ji bo meshê tune ye. Heta ku xusul li mirov wacib nebe mesih tê kirin. Lê belê ji bo kesên ku dê nimêja înê bikin, "**mendûb**" (bi xêr e) e ku her în, xufikên xwe derxin û lingên xwe bişon.

Li gorî Şafiî û Henbeliyan, kesê ku derkeve rêwîtîyeke helal yanî ne di rêya gunehkariyê de be, sê şev û sê rojan (heftê û du saet) dikare li ser xufikan mesh bike. Eger di rêya gunehkarî û me'siyetê de be, şev û rojekê (bîst û çar saet) ye.[128]

67. Ma xew û baberdan desmêjê dişikînin?

Pirs: Gelo xew û baberdan desmêjê dişikînin an na?

Bersiv: Di ayeta 6em ji sûreyê Maîde "**hatina ji nav darîstanê** -avrêjê-", di nav tiştên ku desmêjê dişikînin hatiye jimartin. Baberdan jî yek ji wan tiştên ku li wê derê tên kirin. Lewra tiştên ku li wir tên kirin mîna mîzkirinê û hwd. eger li derve jî bên kirin, dibin sedem ji bo desmêjşikandinê. Ango mebest ji "*hatina ji nav darîstanê -avrêjê-*" ne çûna qedemgehê bi xwe ye, belbî kirina tiştên ku li wir tên kirin e. Lê belê di Qur'ana Pîroz de ji bo edebê **"***hatina ji nav darîstanê*" bi awayekî mecazî hatiye îfadekirin. Ji ber vê yekê aşkere û xuya ye ku baberdan jî desmêjê dişikîne.

Lê belê xew, li gorî giranî û şeklê dirêjkirina ji bo xewê tê îtibarkirin. Yanî xewa kûr û giran desmêjê dişikîne. Encax xewa nîv xewî û ya ne temam desmêjê naşikîne. Herwiha rûniştina ji bo xewê jî muhîm e. Eger bi şeklê ku kulîmekên mirov erdê bigirin rakeve desmêj naşikê. Lewra xewa bi vî awayî nahile ku ba bi ber mirov bikeve. Ji ber vê yekê desmêj jî naşikê.

Di hedîseke Pêxember (s.a.w) de wiha derbas dibe:

"*Desmêjgirtin, bi tenê ji kesê xwe dirêj kiriye (li ser kêlekê) û raketiye re heye.*"[129]

Hedîseke din ji Pêxember (s.a.w) wiha ye:

"*Eger yek ji we his bike ku tiştek ji nava wî derket, lê belê tam nizanibe ku tiştek jê derketiye, heta ku deng nebihîse yan jî bêhn neyê bila ji mizgeftê/nimêjê dernekeve***.**"[130]

[128] Bnh: Nasuhi Bilmen, **Büyük İslam İlmihali**, "Dema Meshê", rp. 77, paragraf: 156 û 158.
[129] Ebû Dawûd, Teharet, 80.
[130] Muslim, Heyz, 99 (362); Bnh: Buxarî, Wudû', 4, 36.

Di "**Mecelle**" benda 4em de wiha derbas dibe: "**yeqîn bi gumanê ranabe.**"

Bi kurtasî, di xewê de eger îhtimala baberdanê hebe ihtiyaten em dibêjin desmêj dişikê û eger îhtimal tune be, naşikê.

68. Desmêja kesê ku îdrara wî di torbeyekî de tê komkirin, kengî dişikê?

Pirs: Bavê min 'emeliyata prostatê bû û piştî 'emeliyatê nikara mîza xwe li xwe bigire. Îdrara wî di torbeyekî ku bi lingê wî ve girêdayî ye kom dibe û piştre tê valakirin. Di vê rewşê de ji bo her nimêjekê divê ku desmêjeke nû bigire yan jî dema ku torbeyê îdrarê tê valakirin wekî ku çûbe qedemgehê desmêja wî dişikê?

Bersiv: Xwedê Teala di sûreyê Maîde de wiha ferman dike: "….**Eger hûn nexweş bin yan rêwî bin yan yek ji we ji avrêjê hatibe yan jî hûn hinguftbin jinan û we av nedîtibe, wê çaxê bi axeke paqij teyemumê bigirin; rûyê xwe û destên xwe bi axê mesih bikin.**"[131]

Ev ayet, behsa mijarên ku desmêjê dişikînin dike. Mirov diçin "**daristanê**" ango xelayê da ku desmêja xwe ya biçûk an jî mezin bişikînin. Yanî îhtiyaciya xwe bibînin. Çûna bavê we jî bi bal xelayê ve dema ku torbeyê xwe vala dike. Yanî desmêja wî di dema valakirina torbe de dişikê.

69. Ma kişandina cixarê, desmêjê dişikîne?

Pirs: Gelo kişandina cixarê dibe sedem ji bo şikandina desmêjê yan na?

Bersiv: Tiştên ku desmêjê dişikînin di sûreyê Maîde de wiha hatine rêzkirin: "**Eger hûn nexweş bin yan rêwî bin yan yek ji we ji avrêjê hatibe yan jî hûn hinguftbin jinan û we av nedîtibe, wê çaxê bi axeke paqij teyemumê bigirin; rûyê xwe û destên xwe bi axê mesih bikin**."[132]

[131] Maîde, 5/6.
[132] Maîde, 5/6.

Ji ber vê yekê desmêj, bi derketina tiştekî ji laşê mirov ji yên ku li qedemgehê tên kirin dişikê, ne bi xwarin û vexwarina tiştekî. Yanî desmêj bi kişandina cixarê, destdan û vexwarina mey (şerab) û tiştên din ên ku heram in naşikê. Ev tişt, herçiqas heram bin jî lê belê nabin sedem ji bo şikandina desmêjê. Encax divê neyê ji bîr kirin ku fermana Xwedê Teala ne bi tenê nevexwarina meyê ye. Belbî bi dûrketina ji wê ye. Lewra Xwedê Teala di sûreyê Maîde de wiha ferman dike:

"**Gelî bawermendan! Bêguman mey (şerab), qumar, peykerên çikandî û falên bi zar pîs in, ji karê şeytên in. Nexwe xwe ji wan dûr bigirin, da ku hûn serfiraz bibin**."[133]

70. Ger zilamekî biyanî porê pîrekekê bibîne, gelo desmêja wê dişikê yan na?

Pirs: Şayed zilamekî nemehrem porê pîrekekê bibîne, gelo desmêja wê dişikê yan na?

Bersiv: Naxêr, desmêja wê naşikê. Lê belê, ji ber ku por ji bo jinan ewret e û nixumandina wê di dînê Îslamê de hatiye fermankirin, divê ku li ba zilamên nemehrem binixumîne, da ku cihên wê yên ewret neyên dîtin.

71. Ma kenê bideng, desmêjê dişikîne?

Pirs: Di nimêjê de kenê bi deng desmêjê dişikîne yan na? Şayed bişikîne jî çima li derveyî nimêjê jî naşikîne?

Bersiv: Li gorî her çar mezheban jî kesê ku di nimêjê de bikene nimêja wî betal dibe. Henefî bi tenê dibêjin ku bi nimêjê re desmêj jî betal dibe. Lê belê hedisa ku Henefî ji xwe re dikin delîl, ji aliyê zanyarên 'ilmê hedîsê ve sehîh nehatiye qebûlkirin. Yanî wê zeîf qebûl dikin. Ji ber vê yekê çi di nav nimêjê de çi jî li derveyî

[133] Maîde, 5/90.

nimêjê, kenê bi deng desmêjê naşikîne. Di heman wextê de ayeta 6em ji sûreyê Maîde ku behsa tiştên desmêjê dişikînîn dike, behsa kenê bi deng di nav nimêjê de nekiriye.

72. Ava spî ya ku ji pîrekan tê, gelo desmêjê dişikîne yan na?

Pirs: Ji bilî heyz (xwînmeh) û nîfas (çilê pîrekan) û ji demên nexweşiyê, gelo ava spî ku ji jinan tê, desmêjê dişikîne yan na?

Bersiv: Xwedê Teala wiha ferman dike:

"Eger hûn nexweş bin yan rêwî bin yan yek ji we ji avrêjê hatibe yan jî hûn hinguftbin jinan û we av nedîtibe, wê çaxê bi axeke paqij teyemumê bigirin; rûyê xwe û destên xwe bi axê mesih bikin."[134]

Tiştên ku desmêjê dişikînin ev in. Ava spî ku ji jinan tê, ne ji wê qebîlê ye. Yanî ne tiştên ku li "**daristanê**" xelayê tên kirin. Ji ber vê yekê ev av, nabe sedem ji bo şikandina desmêjê.

Di heman wextê de di vê mijarê de ne hedîseke sehîh an jî zeîf û ne jî gotinek ji sehabiyekî yan jî ji tabiîyekî nehatiye ragihandin ku bibêjin desmêj bi vê avê dişikê.

Ev av, mîna ava poz an hêstirên çavan e. Çawa ku ev herdu av ne necis in, ew av jî ne necis e û ne jî pîs e. Ji ber vê yekê ne pêwîst e ku pîrek beriya nimêjê kincên xwe yên bin jî biguherînin.

73. Ma pîreka li derve servekirî be, nimêja wê qebûl dibe?

Pirs: Ez nimêj dikim lê belê di dervayî nimêjê de serê min vekirî ye. Gelo nimêjên ku ez dikim meqbûl in? Di heman wextê de ez bi desmêj û servekirî digerim, gelo desmêja min dişikê yan na?

[134] Maîde, 5/6.

Bersiv: Nimêjkirin jî û sergirtin jî emr û fermana Xwedê Teala ye. Çawa ku bi lêmêjkirinê hûn fermaneke Xwedê Teala bi cî tînin, divê ku hûn bi sergitina xwe jî emr û fermana Xwedê Teala bi cî bînin.

Dema hûn fermanekê bi cih tînin û yeke din nayinin cih, ew zirarê nade ya ku hûn dikin. Eger hûn nimêj bikin, we fermaneke Xwedê Teala bi cih aniye û servekirina we nabe asteng ji bo qebûlkirina nimêja we û herwiha nabe sedem ji bo şikandina desmêja we jî.

74. Gelo bi desmêjekê, çend nimêj tên kirin?

Pirs: Ma bi desmêjekê mirov dikare çend nimêjan bike?

Bersiv: Desmêj, ji bo nimêjê şert e. Heta ku desmêj neşikê mirov dikare pê nimêj bike. Çiqas bixwaze, mirov dikare bike. Di vir de tu sînor û jimarek aşkere tune ye. Hedîseke ku bi vê mijarê re têkildar e ye:

Li gorî ku Suleymanê kurê Bureyde ji bavê xwe (x.j.q) ragihandiye wî wiha gotiye: Pêxember (s.a.w) di roja fethê de hemû nimêjên xwe bi desmêjekê kiriye û li ser xufikan mesih kiriye. Hezretî 'Umer (x.j.q) jê re dibêje "Ez qesem dikim bi navê Xwedê tiştê ku te îro kir, heta niha te qet nekiribû." Qasidê Xwedê wiha bersiva wî dide: "*Ya 'Umer! Min ev qesden kir***.**"[135] Ango ya 'Umer! min ev bi zanebûn kir, ne ku min xwe ji bîr kiriye.

Gotina Pêxember (s.a.w) "*Min ev qesden kir*" rastî û duristiya ku mirov dikare bi desmêjekê -heta ku mirov bêdesmêj nebe- pir nimêjan bike, dide nîşandan.

Di Sehîha Buxarî de jî agahiya ku Pêxember (s.a.w) û hevalên xwe (x.j.q) heta ku bêdesmêj nebûbana bi desmêjekê pir nimêj kirine, derbas dibe.[136]

[135] Muslim, Teharet, 86 (277).
[136] Bnh: Buxarî, Wudû', 54.

75. Duayê desmêjê, çawa tê kirin?

Pirs: Ma mirov piştî desmêjê kîjan dua an jî duayan dixwîne?

Bersiv: Piştî desmêjê mirov kelîmeya şahdeyê bibêje, kafî ye. Li gorî hedîsa ku dê li jêr were, ev tewsiyeyek xweş e ji Pêxember (s.a.w). Uqbeyê kurê Amir (x.j.q) gotiye ku: "Dema ku em li ba Qasidê Xwedê bûn, me karên xwe bi destê xwe dikir û şivantiya hêştirên xwe me bi dorê dikir. Rojekê bû dora min ya şivantiyê. Êvarê min deve birin axur. Ez gihîştim Qasidê Xwedê ku ji gel re sohbet dikir û min jê wiha bihîst: "*Eger yek ji we xweşik desmêj bigire, piştre bi dil û rûyê xwe berê xwe bide (nimêjê) û du rek'et nimêj bike Xwedê Teala, teqez hikum dike ku ew kes dê here bihuştê***.** " Min got, "çiqas xweş, çiqas xweş", yekî ku li pêşiya min bû got, "Ya 'Uqbe! Tiştê berê ji yê niha xweştir bû." Min dît ku ew 'Umer e (x.j.q). Min jê pirsî "Tiştên berê çi bûn ya Ebû Hefse?" Wî wiha bersiv da: Beriya ku tu werî bi hindikî Qasidê Xwedê Teala got ku: "Eger yek ji we xweşik desmêj bigire, piştre bibêje "*Ez şahdeyiyê didim ku ji Xwedê pê tu îlah tune ne û ez şahdeyiyê didim ku Muhemmed bende û qasidê wî ye, heşt deriyên bihuştê (bi hev re) jê re vedibin ji kîjanî bixwaze dikevê*."[137]

Mebest ji îfadeya ku di hedîsê de "*deriyên bihuştê (bi hev re) jê re vedibin*" derbas dibe, "ya bi wateya heqîqî –rastînî - wê gavê bi xwe deriyên wê jê re vedibin û li benda wî kesî ne. An jî mebest ji vebûna deriyan, wî kesî karekî wiha kiriye ku pê deriyên bihuştê vedibin."[138]

76. Ma di secdeya tîlawetê de, divê ku mirov bi desmêj be?

Pirs: Di secdeya tîlawetê de divê ku mirov bi desmêj be yan bê desmêj jî dibe?

Bersiv: Li gorî pirên aliman, ji ber ku secdeya tîlawetê wekî parçeyekî ji nimêjê hatiye qabûlkirin, tiştên ji nimêjê re pêwîst in ji desmêj, berdana qiblê, nixumandina ewret û hwd. ji secdeya tîlawetê re jî şert dêrane.

---

[137] Muslim, Teharet, 17 (234); Ebû Dawûd, Teharet, 65; Nesaî, Teharet, 109.
[138] Bnh: **Sünen-i Ebu Davud Terceme ve Şerhi**, I, 309.

Di vê mijarê de Şewkanî wiha dibêje: "Di hedîsên bi secdeya tîlawetê re têkildar in, tu îşaretek tune ye ku kesê dê secdeya tîlawetê bike divê ku bi desmêj be. Dema ku ayeta secdeyê dihat xwendin kî bi Qasidê Xwedê Teala re bûna bi hev re diçûn secdeyê. Û ji tu kesî ji wan, nehatiye ragihandin ku Qasidê Xwedê emrê wan kiriye bi girtina desmêjê. Di heman wextê de îhtimala ku hemû bi desmêj bin jî dûr e. Keza bi Qasidê Xwedê re muşrikê (Mekkeyê) jî diçûn secdeyê."[139]

Hal ev e ku muşrik pîs û necis in ka wê çawa desmêja wan durist be. Dîsa li gorî ku Buxarî ragihandiye ku 'Ebdullahê kurê 'Umer ê kurê Xettab (x.j.q) bê desmêj secdeya tîlawetê dikir.

Îbn Hecer di pirtûka xwe ya bi navê **Fethul-Barî Şerhû Sehîhi'l-Buxarî** di derheqê vê mijarê cih dide van agahiyan: "Di mijara ku secdeya tîlawetê bê desmêj tê kirin, ji Şe'bî pê ve tu kesî nedaye pey 'Ebdullahê kurê 'Umer."[140] Îbn Ebî Şeybe vê xeberê (hedîsê) bi senedeke (rêyeke) sehîh texrîc (ragihandiye) kiriye. Dîsa li gorî ku Îbn Ebî Şeybe, ji Ebû 'Ebdurrehman es-Sulemî texrîc kiriye: "'Ebdullahê kurê 'Umer, ayeta secdeyê dixwend, digel ku ne bi desmêj bû bêyî ku berê xwe bide qiblê dimeşiya û bi rêya îşaretkirinê diçû secdê."[141]

Tiştên ku li jor hatin gotin mutabiqî ayeta şeşem ji sûreyê Maîdeyê ne. Lewra di wê ayetê de Xwedê Teala desmêjê, ji bo nimêjê şert dêraye. secdeya tîlawetê, herçiqas wekî parçeyekî ji nimêjê bê xuyakirin jî lê belê di rastiyê de ne nimêj e. Ji ber vê yekê mirov dikare bê desmêj secdeya tîlawetê bike.

Nîşe: Riwayeta "'Ebdullahê kurê 'Umer, bê desmêj secdeya tîlawetê dikir." di hin çapên Sehîha Buxarî de di riwayeta el-Asîlî "'Ebdullahê kurê 'Umer, bi desmêj secdeya tîlawetê dikir." derbas dibe. Lê belê li gorî ku Îbn Hecer îfade kiriye, rastiya

---

[139] Bnh: Buxarî, Sucûdul-Qur'an, 4.

[140] Îbn Hecer Ehmedê kurê 'Elî, **Fethul-Barî Şerhû Sehîhi'l-Buxarî**, V, 252-253, şîroveya hedîsa 1071em.

[141] Şewkanî Muhemmedê kurê 'Elî, **Neylul-Ewtar**, III, 119, Babut-Tekbîr lis-Sucûdî we ma yuqalû fîhî; Seyyid Sabiq, **Fiqhu's-Sunne**, çapa 12em, Muessesetu'r-Risale, Beyrût 1996, I, 166.

wê ‘Ebdullahê kurê ‘Umer bê desmêj secdeya tîlawetê dikir. Û pirê çapên Sehîha Buxarî bi vî şeklî ne.[142]

77. Ji bo destdana Qur’anê ma divê ku mirov bi desmêj be?

Pirs: Ji bo destdan, guhdarkirin û xwendina Qur’ana Pîroz, ma divê ku mirov bi desmêj be yan na?

Bersiv:

1- Ji bo xwendin, guhdarkirin û destdana Qur’ana Pîroz, ne lazim e ku mirov bi desmêj be yan jî desmêj bigire. Lewra li gorî ayeta 6em ji sûreyê Maîde û li gorî hedîsên Pêxember (s.a.w) ên sehîh, girtina desmêjê ne ji bo xwendin an jî destdana Qur’ana Pîroz e. Belbî ji bo nimêjkirinê şert e. Hukmê ku di merhemên “‘Ilmihalan” de derbas dibe ku: “Destdana Qur’ana Pîroz, bê desmêj ne durist e.” ‘emel pê nayê kirin. Lewra hedîsên di derbarê wê de zeîf in.

Ev hukmê em dibêjin ne ji ber zerûretê, sirf ji bo zarokên ku Qur’anê hîn dibin re hatiye dayîn. Belbî çi misilman çi jî xeyrimuslim ji bo her kesî re ev hikum heye û her kes dikare bê desmêj Qur’anê bixwîne û dest bidê.

2- Keç û jin di rojên xwe yên heyzan de Qur’anê çi ji ‘Erebî çi jî ji meala wê dikarin bixwînin, dest bidinê û dua bikin. Tiştê ku di rojên heyza de nikarin bikin bi tenê nimêj e.

3- Keçikên misilman dema balix dibin divê ku serê xwe li ba zilamên biyanî yên nemehrem binuximînin. Emrê Xwedê Teala bi vî tiştî teqez e. Lê belê ne lazim e ku di dema xwendina Qur’anê de serê xwe binixumînin. Ji bo xwendina Qur’anê, Xwedê Teala wiha ferman dike:

“**Çi dema te dest bi xwendina Qur’anê kir, vêca xwe bi Xwedê ji şeytanê recîm biparêze.**”[143] Ango bibêje: “**E‘ûzûbillahî mîneşşeytanîrrecîm.**” Wekî ku ji

[142] Bnh: Îbn Hecer, **Fethul-Barî**, V, 252, şîroveya hedîsa 1071em.

ayetê tê fêhmkirin di dema xwendina Qur'anê de ji vê pê ve tu tiştekî din ji mirov nehatiye xwestin.

Li gorî riwayeteke ku ji 'Ebdullahê kurê 'Ebbas (x.j.q) hatiye ragihandin, carekê Pêxember (s.a.w) ji avrêjê derket, xwarin jê re hatibû amadekirin. Ên li wê derê gotin ku "Ji bo girtina desmêjê em ji te re avê bînin?" Pêxember (s.a.w) wiha bersiva wan da: "*Bi tenê dema ku ez ê rabim nimêjê, emrê min hatiye kirin bi girtina desmêjê*."[144]

Pêxember (s.a.w) bi gotina "*Bi tenê dema ku ez ê rabim nimêjê, emrê min hatiye kirin bi girtina desmêjê*" îşaretî bi bal ayeta 6em ji sûreyê Maîde "**Gelî bawermendan! Dema we xwest hûn nimêj bikin, rûyê xwe û destên xwe heta enîşkan bişon…**" ve kiriye. Û îfade kiriye ku fermana bi girtina desmêjê, ji bo nimêjê ye. Ne ji bo tu tiştekî din e.

78. Ma pîreka bi cenabet, dikare şîr bide zaroka xwe?

Pirs: Pîrek di dema cenabetiyê de dikare şîr bide zaroka xwe yan na?

Bersiv: Ne pêwîst e ku pîrek dema şîr dide zaroka xwe bi desmêj be. Di her hal û rewşê de dayik dikare şîr bide zaroka xwe. Çi bi desmêj çi bê desmêj, ji bi cenabet û çi jî di heyza de. Û ev tişt tu bandoreke neyînî li ser zarokê çênake. Tiştên ku di vê mijarê de tên gotin an jî bên gotin tu bingeh û esas ji wan re tune ne. Tiştên ku bandorê li zarokan dikin helwestên we ne û tiştên ku hûn hînî wan dikin.

---

[143] Nehl, 16/98.

[144] Tirmizî, Et'îme, 40; Ebû Dawûd, Et'îme, 11.

XUSUL

79. Menî, mezî û wedî çi ne?

Pirs: Di dema nêrîna li tiştekî yan jî dema em dest didin jinên xwe de ma tiştê rohnî ku ji pêşiya mêran derdikeve menî ye û xuslê lazim dike?

Bersiv: Tiştên rohn ên ku ji pêşiya mêran derdikevin sê cure ne. Ew jî menî, mezî û wedî.

a) Menî: Ji aveke spî û tîr ku bêhneke wê ya taybet heye, -çi bi şehwet çi jî bêşehwet be- ku bi şehwet ji mirov diherike re tê gotin

b) Mezî: Ji aveke rohnî spî ku piştî daketina şehwetê, lê bêşehwet ji mirov diherike re tê gotin.

c) Wedî: Aveke spîçolkî mizeloqî bê bêhn e ku piştî destava biçûk ji mirov diherike re tê gotin.

Ji van her sê cureyan bi tenê menî, xuslê lazim didêre. Herdu cureyên din sirf desmêjê dişikînin. Di encama nihêrtina li yekê yan jî destdana wê eger bi şehwet menî ji mirov derkeve ev rewş, xuslê pêwîst dike. Ji reng û bêhna tiştê diherike hûn dikarin bizanibin ka menî ye yan na. Eger tiştê diherike aveke rohnî spî be, ev ne menî ye, belbî mezî ye. Ji vê bonê serşûştinê lazim nadêre.[145]

80. Meriv çawa xuslê ji ser xwe radike?

Pirs: Xusul çawa ji ser mirov radibe, gelo hûn dikarin vebêjin?

Bersiv: Xusul, ku mirov ji serî heta lingan xwe baş bişo. Di xuslê de li gorî mezhebê Henefî û Henbelî şûştina dev û poz jî ferz e; lê di mezhebê Şafiî û Malikî de sunet e. Sedemê vê jî ji tercîha gelo dev û poz ji beşa laş ya hundir an jî ya derve tê

[145] Bo agahiyên berfirehtir hûn dikarin ji pirtûka Ömer Nasuhi Bilmen ya bi navê **Büyük İslam İlmihali**, li beşa desmêj û xuslê binihêrin.

jimartin, derdikeve holê. Mezhebê Henefî û Henbelî, dev û poz ji qismê bedenê yên derveyî jimartine û li ser vê biryara ku divê baş werin şûştin dayîne, lê Şafiî û Malikiyan bi sedema ku ew ji beşên bedenê yên hundir hesibandine, şûştina wan ferz nedîtine.

Di serşûştinê de tiştê ku divê mirov bala xwe bidê ev e; gelo temamê bedena mirov baş hatiye şûştin an na. Dema ev yek pêk hat, xusul temam dibe. Babetên din ên ku tên gotin, bo xuslê musteheb an jî sunet in. Ango bê hebûna wan jî xusul ji ser mirov radibe. Mîna berî xuslê mirov navê Xwedê bilêv bike, girtina desmêjê, berê milê rastê, piştre milê çepê û piştre avê bi ser xwe de dake, ha ev sunetên xuslê ne.

Eger em dubare bikin xusul wiha tê rakirin: –Eger hebe- pîsîtiya li cihê şermegehê tê rakirin. Piştre mîna ku mirov desmêjê digire destên xwe dişû û dev û pozê xwe baş paqij dike. Piştre hemû laşê xwe bi awayekî rind dişû û hewl bide ku tu cihekî ziwa nemîne. Ha xusul ev e.

Çend hedîsên Pêxemberê me (s.a.w) yên ku behsa xuslê dikin wiha ne:

Ji ‘Aişeyê (x.j.q): “Pêxember (s.a.w) dema wê ji cenabetiyê serê xwe bişûşta, pêşî bi şûştina destan dest pê dikir. Piştre mîna ku ji nimêjê desmêj bigirta desmêj digirt. Piştre tiliyên xwe dixist nav avê û bi wan binê porê xwe tev dida. Piştre bi herdu destên xwe sê kulm av li serê xwe dikir. Piştî wê, av li hemû bedena xwe dikir.”[146]

Ji Meymûne (x.j.q): “Pêxember (s.a.w) ji bilî ku lingên xwe bişo, mîna ku ji bo nimêjê be desmêj girt. Nav lingên xwe, tiştên gihabin wê derê û pêdivî bi şûştina wan hebe şûşt. Piştre av bi xwe dakir. Piştre lingên xwe ji erdê rakir û şûştin. Serşûştina wî ya ji cenabetiyê ha wiha bû.”[147]

[146] Buxarî, Xusul, 1.
[147] Buxarî, Xusul, 1.

Ji Meymûne (x.j.q): "Bo serşûştinê min ji Pêxember re av dagirt. Wî jî destên xwe du car an jî sê caran şûştin. Piştre av li destê xwe yê çepê kir û ewretê xwe şûşt. Piştre destê xwe bi erdê da. Piştre av di devê xwe werda û av bire pozê xwe. Destên xwe û rûyê xwe şûştin. Piştre av li bedena xwe kir. Dûvre ji cihê xwe rabû û lingên xwe şûştin."[148]

81. Niyeta xuslê çawa tê anîn?

Pirs: Pîrek, di hemû rewşên xwe yên ku xusul lazim dikin de gelo dê wiha niyeta xwe bînin "ez bi niyet im ferza xuslê ji ser xwe radikim" an ji bo xusla heyzê niyeketekê û bo xusla cenabetê yeka din tînin?

Bersiv: Di mezhebê Henefî de niyetanîna bo xuslê ne ferz e ne jî wacib e; sunet e. Di vê de jî diyarkirina niyetê, ne şert e. Pîrek, çi ji bo xusla bênimêjiyê çi jî bo xusla cenabetê be, ne şert e ku di niyetê de bi taybetî diyar bike. Ango ne lazim e ku bibêje "ez bi niyet im xusla bênimêjiyê ji ser xwe radikim" an jî "ez bi niyet im xusla cenabetiyê ji ser xwe radikim." mirov tu tiştekî mebêje jî xusul ji ser mirov radibe.

82. Meriv dikare bi rakirina xuslê bi tenê nimêj bike, an divê mirov desmêj jî bigire?

Pirs: Piştî rakirina xuslê, bo kirina nimêjê ma lazim e ku mirov dîsa desmêj bigire? Ango bi rakirina xuslê bi tenê mirov dikare nimêj bike?

Bersiv: Ayeta ku xusl û desmêjê tarîf dike wiha ye:

"**Gelî bawermendan! Dema we xwest hûn nimêj bikin, rûyê xwe û destên xwe heta enîşkan bişon, serê xwe mesih bikin herdu lingên xwe digel gwîzekan jî. Eger hûn bi cenabet bin xwe ji cenabetiyê paqij bikin. Eger hûn nexweş bin yan rêwî bin yan yek ji we ji avrêjê hatibe yan jî hûn hinguftbin jinan û we av nedîtibe, wê çaxê bi axeke paqij teyemumê bigirin; rûyê xwe û destên xwe bi axê**

[148] Buxarî, Xusul, 5.

mesih bikin. Xwedê naxwaze ji we re zehmetiyê derxe; lê belê dixwaze we paqij bike û qenciya xwe li ser we temam bike, da ku hûn Wî bişêkirînin."[149]

Li gorî vê ayetê kesê bi cenabet be, bi tenê dema ku xusla xwe rake dikare nimêj bike. Ji vê bonê kesê ku xusla xwe rakir, heta sedemeke ku desmêjê dişikînin peyda nebe, ne hewce ye ku bo kirina nimêjê desmêjeke nû bigire. Di vê mijarê de rakirina xuslê, têr dike.

Ji diya me 'Aişeyê hatiye ragihandin:

"Qasidê Xwedê (s.a.w) xusla xwe radikir, du rek'et (sunet) û (ferza) nimêja sibehê dikir. Nayê bîra min ku wî, piştî xuslê desmêjeke nû digirt."[150]

Ji diya me 'Aişeyê hatiye ragihandin:

"Qasidê Xwedê (s.a.w), piştî xuslê desmêj nedigirt."[151]

Îmam Tirmizî piştî ku vê hedîsê riwayet dike, wiha dibêje: "Nêrîna pirên sehabî û zanyarên tabiîyan jî wiha ye." Ango dibêjin " Girtina desmêjê piştî xuslê, ne hewce ye."

Li gorî ku ji 'Ebdullahê kurê 'Umer (x.j.q) hatiye ragihandin, dema ji Qasidê Xwedê (s.a.w), pirseke bi mijara girtina desmêjê piştî xuslê re têkildar, hate kirin, Wî wiha bersiv da; "*Ma kîjan desmêj ji xuslê çêtir e.*"[152]

83. Dagirtina diranan, ma dibe asteng bo rakirina xuslê?

Pirs: Tê gotin ku li gorî mezhebê Henefî, kesê diranê xwe dagirtibe xusla wî ji ser ranabe. Loma, bo girtina desmêjê û rakirina xuslê, divê ku mezhebê Şafiî teqlîd bike. Lê belê, li dijberî vê fetwayê hin fetwayên din jî hene. Gelo kîjan ji wan rast e?

---

[149] Maîde, 5/6.
[150] Ebû Dawûd, Teharet, 98.
[151] Tirmizî, Teharet, 79; Nesaî, Teharet, 160; Îbn Mace, Teharet, 96; Ehmedê kurê Henbel, **Musned**, VI/68.
[152] Hakim, **Mustedrek**, Teharet, jimara hedîsê: 103 (548).

Bersiv: Dagirtina diranan nabe asteng bo rakirina xuslê. Lewra ew êdî bûye parçeyekî ji diran.

84. Ma mirov di serşokê de zêde bimîne guneh e?

Pirs: Ji min re bûye xuy ku ez pir zêde di hemamê de bimînim. Ango di dema rakirina xuslê de weswese bi min re çêdibe û ez ji xwe re dibêjim xusla min ji ser min ranebû û dîsa xusla xwe radikim. Pirsa min ev e, ez di serşokê de dimînim heta ku ez ji xwe bibêjim êdî xusla min çêbû, gelo ev sekna min dibe guneh? Ma divê mirov çiqasî di hemamê de bimîne?

Bersiv: Di rakirina xuslê de çêbûna wehman, ji weswesa şeytên e. Bo xwe parastina ji vê, divê hûn 'ezûzû bixwînin ango bi Xwedê Teala parastina xwe ji şeytên bikin, sûreyên Feleq û Nas pir bixwînin û piştî we xwe paqij kir di cih de ji serşokê derkevin. Divê hûn tu carî guh nedin wesweseya ku "xusla min ji ser min ranebû." Ha wê gavê hûn ê bikaribin zora şeytên bibin.

85. Ma xusul kengî li ser mirov ferz dibe?

Pirs: Min di cihekî de xwendibû ku bi derketina meniyê ji cihê xwe, mirov bi cenabet dibe. Ango bi derketina ji bedena însên, mirov bi cenabet dikeve û ne lazim e ji pêşiya mirov biherike û derkeve. Ma di vir de esas ne ew e ku ka ji pêşiya mirov derdikeve yan na?

Bersiv: Mijara ku hûn behsa wê dikin, di pirtûkên fiqhê de nîqaş li serê hatine kirin û nêrînên ji hev cuda derketine holê. Dema mirov îhtilam dibe ango dema vala dibe, hêj berî ku menî ji însên derkeve derve di bedena mirov de hin cudahî çêdibin, şehwet pêk tê. Di wê gavê de ger aletê mêr bê guvaştin menî jê dernakeve, lê piştî derbasbûna şehwetê derdikeve. Piştî wê mirov bi rihetiyekê dihese, lewra êdî menî ji însên derketiye. Ji vê bonê bo cenabetê, ne şert e ku menî bi şehwet derkeve. Dema ew rewş pêk were, xusul li ser mirov ferz dibe.

86. Tê gotin ku di binê her mûyekî de cenabet heye. Gelo ev rast e?

Pirs: Min bihîstibû ku di binê her mûyekî de cenabet heye. Kesê bi desmêj be, dema mirov ji porê xwe, ji riha xwe yan jî simbêlê xwe mûyekî rake, gelo desmêj pê dişikê? Min di nav rewşên ku desmêjê dişikînin de tiştekî wiha nedîtiye.

Bersiv: Di hedîsekê de derbas dibe ku "*Di binê her mûyekî de cenabet heye.*"[153] Ev hedîs jî di derbarê serşûştin û xwepaqijkirina ji cenabetê ye. Yanî tu têkiliya wê bi desmêjê re tune ye.

Îmam Ebû Dawûd û Tirmizî dibêjin ku ev hedîs zeîf e. Hedîs herçiqas zeîf be jî mebest jê ev e, kesê bi cenabet be divê hemû bedena xwe heta binê mûyan jî bişo. Ango bi rakirina mûyekî, ne xusul ne jî desmêja mirov xera nabe.

87. Ma pîrek jî bi cenabet dikevin?

Pirs: Eger pîrek di xewna xwe bibînin ku dikevin pêwendiya cinsî, gelo divê ku xusla cenabetê ji ser xwe rakin?

Bersiv: Hedîsên di derheqê vê mijarê de wiha ne:

Hezretî 'Aişeyê dibêje ku: "Ji Qasidê Xwedê hate pirsîn, "Eger mirov di cil û bergê xwe de şilayî bibîne, lê nayê bîra wî ku bi cenabet bûye (gelo divê ku xwe bişo?)" Wî wiha bersiv da "*Belê, divê xwe bişo*."

Piştre di derbarê kesê bibîne ku bi cenabet bûye, lê şilbûn nedîtibe hate pirsîn:

Got ku "*Hewceyî bi xuslê tune ye*."

Ummû Suleym (x.j.q) pirsî:"Eger pîrek vê bibîne, gelo xusul lê dikeve?" Li ser vê wiha bersiv da:

"*Belê! Pîrek jî mîna mêran in***!**"[154]

[153] Ebû Dawûd, Teharet, 99; Tirmizî, Teharet, 78; Îbn Mace, Teharet, 106.

Dîsa Hezretî ʻAişeyê dibêje ku: "Ummû Suleym (x.j.q), ji Qasidê Xwedê (s.a.w), "Di derbarê tiştê ku zilam dibînin eger pîrek jî di xewna xwe de bibînin pirsî, xwest ku bizanibe gelo xusul li wan dikeve yan nakeve." Selat û selam li ser bin wiha bersiv da:

"*Belê! Dema avê bibîne!*"

Hezretî ʻAişeyê li Ummû Suleym vegeriya û wiha ew şermezar kir: "Emir dirêjê (tu çi dibêjiî)." Qasidê Xwedê (s.a.w) (li ʻAişeyê vegeriya) û wiha got:

"*ʻAişe! dev jê berde (tiştê dixwaze bila bipirse!) Eger ne wisa be ma zarok dê çawa bişibin (aliyê dê)? Eger ava pîrekê li ser ava zilam xalib were, zarok dişibe xalanê xwe; eger ya mêr li ser ya pîrekê xalib were, zarok dişibin apanê xwe*."[155]

Di riwayeteke din ya Muslim de ev zêdeyiyên han jî hene:

"*… Ava zilam tarî û spî ye. Ava pîrekê, zer û herikbar e. Ji van kîjan xalib were yan jî bipêşkeve, (li gorî wê) şibandin hasil dibe*."[156]

88. Meriv dikare kincên di dema cenabetê de piştî rakirina xuslê dîsa lixwe bike?

Pirs: Piştî min xusla xwe rakir, min kincên xwe li xwe kirin. Lê pantolonê min lixwe kir, ê ku dema ez bi cenabet ketibûm. Ji ber ku min derfeta şûştinê nedît, min heman derpê lixwe kir. Di vê rewşê de gelo xusla min hatiye cih? Ez dikarim wiha nimêj bikim? Di halên wiha de ma şûştina çarşevê û lihêfê jî hewce dike?

Bersiv: Eger tiştekî pîs mîna meniyê gihîştibe çarşev û lihêfê, divê ku mirov paqij bike. Ji bo vê jî ne hewce ye ku mirov temamê betanî yan jî çarşevê bişo. Cihê

---

[154] Ebû Dawûd, Teharet, 95; Tirmizî, Teharet, 82.
[155] Muslim, Heyz 33; Muwetta, Teharet, 84; Ebû Dawûd, Teharet, 96; Nesaî, Teharet, 131.
[156] Muslim, Heyz, 30.

pîsbûyî, eger ziwa bûbe mirov bifirikîne, ger şil jî be mirov wê derê bişo, kafî ye. Ji bilî vê, pêdivî bi tu tiştekî din tune ye.

Hedîsên di derbarê vê mijarê de wiha ne:

Hezretî 'Aişeyê (x.j.q) dibêje:

"*Min meniya ku li kincê Qasidê Xwedê (s.a.w) diket, dişûşt. Ew, digel ku cihê şil (hêj ziwa nebûbû) diçû nimêjê.*"[157]

Di riwayeteke din de ji Muslim wiha hatiye ragihandin: "Merivek bû mêhvanê Hezretî 'Aişeyê (x.j.q). Zilamî, serê sibê cilê xwe şûşt. Hezretî 'Aişeyê jê re got:

"*Cihê ku (menî) gihîştiyê (te dît) te wê derê bişûşta kafî bû, di halê ku te nedît, te dê derbora wê bişûşta. Ez dizanim ku min ji cilê Qasidê Xwedê (s.a.w) (cihê menî gihîştibûyê) bi awayê firikandinê jê dibir. Wî, (bê ku bişûşta) bi wan cilan nimêj dikir.*"

Riwayeteke din wiha ye:

"*Ez baş dizanim ku min ji cilê Qasidê Xwedê (s.a.w) meniya ziwa bi neynûkên xwe dikola û jê dibir.*"[158]

Li gorî ku Yehyayê kurê 'Ebdurrehmanê kurê Hatib radigihîne, Hezretî 'Umer (x.j.q) bi komeke ku 'Emrê kurê 'As jî di nav wan de bû 'umre kir. Hezretî 'Umer di dema rêwîtiyê de ber destê sibê li rêyeke ku nêzî avê bû, rawestiya. (Mîna her kesî ew jî raza, Di wê esnayê de), bi cenabet ket. Dema bû sibeh, bi karwan re av nehat dîtin (bo şûştinê). Li heywana xwe siwar bû û çû bal wê ava (nêz). Pêre dest bi şûştina cihê ku menî lê ketiye kir. Piştre derdor ronî bû. 'Emrê kurê 'As (x.j.q) ji Hezretî 'Umer re got:

[157] Buxarî, Wudû' 64, 65; Muslim, Teharet, 108, (289); Ebû Dawûd, Teharet, 136; Tirmizî, Teharet, 85, 86; Nesaî, Teharet, 187, 188.
[158] Muslim, Teharet, 105, 109, (288, 290).

"Bû sibeh. Li cem me kincên paqij hene, dev ji (şûştina) vî kincî berde, piştre tê şûştin." Lê Hezretî Umer wiha bersiva wî da:

"Kurê As, bi rastî tu ecêb î! Ango te kinc bidest xistiye, ma dê herkes kinca bidest bixe? Ez qesem dikim bi navê Xwedê, eger ez bi gotina te bikim, ev dê bibe sunet. Naxêr, (menî) a ku dibînim, ez ê bişom û ya ku nabînim jî ez ê (avê lê) bireşînim (û paqij bijimêrim)."[159]

89. Gava mirov bi cenabetî li nivîna xwe razê û piştî rakirina xuslê dîsa lê rakeve ma careke din xusul lazim dike?

Pirs: Nivîn an jî palgeha ku mirov bi cenabetî li ser wan razê, piştî rakirina xuslê mirov dîsa li serê rûnê û razê gelo careke din xuslê pêwîst dike yan na?

Bersiv: Rewşên ku xuslê pêwîst dikin; têkiliya cinsî, di xew an jî di hişyariyê de menî ji mirov were û bo pîrekan jî piştî ku xwînmeh an jî çilê piştî wîladetê biqede. Ji ber vê yekê dema mirov bi cenabet be li cihekî rûnê, piştî rakirina xuslê mirov dîsa li wê derê rûnê, ev tişt xuslê lazim nake.

90. Destdana kesê bi cenabet, kincan nepak dike?

Pirs: Kesê bi cenabet dema destê xwe bide kincê meriv, ma divê ku ew kinc jî were şûştin?

Bersiv: Cenabetî ne pîsîtiyek e "madî" ye, belbî nepaqijiyeke "manewî"ye ku dibe asteng bo kirina nimêjê. Ji ber vê yekê ye ku destdana kesê bi cenabet, kincan pîs nake. Ango hewcedarî bi şûştinê tune ye.

Herwiha di dema cenabetiyê de xwarin an jî amadekirina xwarinê jî ne tiştekî qedexe ye.

[159] Muwetta, Teharet, 83.

91. Di rakirina xuslê de gelo şûştina qulên guharan jî şert e?

Pirs: Guhên min bi qul in, lê ez guharan bi kar nayinim. Bi vê sedemê ez di xuslê de zehmetiyê dikişînim. Ez bi derziyê hewl didim ku avê bigihînim qulên guhê xwe, ev jî dibe sedemê ku ez pir li hemamê bimînim û guhê min bibin birîn. Di xuslê de ma şert e ku av di qulên guharan jî de derbas bibe?

Bersiv: Di rakirina xuslê de ji bo ku av bigihîje qulên guharan tu carî derzî û hwd. bikar neyînin! Ev, ji aliyê dînî ve ne tiştekî pêdivî ye. Lewra qulên guharan ne ji derveyî bedena mirov e. Tiştê ku divê hûn bikin, pir hêsan e. Di dema serşûştinê de hûn ê nermikên guhê xwe bi awayekî hêdî bifirikînin. Tiştekî zêdeyî vê ne hewce ye ku hûn bikin. Dînê me, dînê hêsaniyê ye. Xwedê Teala di dawiya ayeta ku tarîfa desmêj û xuslê dike de wiha ferman dike:

"**Xwedê naxwaze ji we re zehmetiyê derxe; lê belê dixwaze we paqij bike û qenciya xwe li ser we temam bike, da ku hûn Wî bişêkirînin**"[160]

Ev ayet dide nîşandan ku Xwedê naxwaze zehmetiyê derxe, lê dixwaze ku me paqij bike. Ji ber ku hukmekî şilkirina qulên guharan pêwîst bike tune ye, kirina vî karî di xuslê de xuya ye ku dê zehmetiyê ji însên re derxe holê.

92. Meriv heta kengî dikare bi cenabet bisekine?

Pirs: Piştî têkiliya cinsî gelo herî zêde heta kengî mirov dikare rakirina xuslê bi dereng bixe? Lewra rakirina xuslê serê sibê zehmet e. Eger ez berî nimêja nîvro serê xwe bişom dibe?

Bersiv: Bi şertê ku tu nimêj li we neçin, di derengxistina rakirina xuslê de tu pirsgirêk tune ye. Li gorî dînê me, kesê ku bi sedemeke ji sedeman bi cenabet bikeve ango rakirina xuslê li ser lazim bibe, herî zêde bi qasî dema navbera du nimêjan dikare bi cenabet bisekine. Sekna zêdeyî vê, ne caiz e.

[160] Maîde, 5/6.

Li gorî vê, hûn dikarin bi şev bi cenabetî razên. Lê belê, ji ber ku kirina nimêja sibehê li ser we ferz e, divê hûn serê sibê hişyar bibin û xusla xwe rakin da ku hûn bikaribin nimêj bikin. Tiştê ku divê hûn ji bîr mekin ev e: Xwedê Teala bi sebeb kirina nimêjê rakirina xuslê, ferz kiriye. (Li ayeta şeşem ji sûreyê Maîde binihêrin.)

93. Kesê xusla xwe ranekiribe û miribe, rast e ku dê di dojehê de bişewite?

Pirs: Kesê derfeta wî ya ku xusla xwe rake hebe û bê uzur wê bidereng bixe û bi cenabetî bimire, ma rast e ku dê heta bi hetayê di agirê dojehê de bişewite?

Bersiv: Bela û felaketa mezin, ne ku mirov bi cenabetî, belbî ku mirov bê îman bimire. Ên ku dê heta bi hetayê di dojehê de bimînin jî kesên muşrik in.

Xwedê Teala, bi sedema ku mirov bi cenabet miriye, mirov berpirsyar nagire. Dê li xêr û gunehên wî bê nihêrtin; li gorî wê, an tê xelatkirin an jî tê celatkirin.

94. Muslimanên ku nimêj nakin, ma divê ku ew jî xusla xwe rakin?

Pirs: Hukmê ku mirov bi cenabetî bimîne çi ye? Heta kengî mirov dikare bi cenabet bimîne? Wekî din jî hevaline hene ku dibêjin "Jixwe ez nimêj nakim, xem nake ez bi cenabet bimînim." Hûn di derbarê wan de nebêjin çi?

Bersiv: Bi sedema ku cenabet dibe asteng bo kirina nimêjê, bi qasî ku mirov bikaribe nimêja xwe di dema wê de bike, mirov dikare xwe neşû. Sekna ji vê zêdetir, ne caiz e.

Xusul, bo kirina nimêjê şert hatiye dêrandin. Lê belê ev jî heye, çawa mirov dê dibêje "Ez misilman im" û nimêj neke, ma ev karê aqil e! mirov nikare nimêja xwe neke û bibêje ez ê paşê qeza bikim. Kesê nimêjê di wexta wê de neke, eger temamê emrê xwe bi nimêjê derbas bike dîsa jî nikare wê valahiya han dagire.

95. Piştî muayena jinekolojiyê ma lazim e ku pîrek xusla xwe rakin?

Pirs: Piştî ku pîrek li cem bijîşkê jinekolojiyê muayene bibin, ma divê ku xusla xwe rakin?

Bersiv: Piştî muayena jinekolojiyê, ne şert e ku pîrek xusla xwe rakin. Bo kirina nimêjê girtina desmêjê bi tenê kafî ye. Rewşên ku xuslê pêwîst dikin; têkiliya cinsî, di xew an jî di hişyariyê de menî ji mirov were û bo pîrekan jî piştî ku xwînmeh an jî çilê piştî wîladetê biqede.

96. Piştî tedawiya bo çêbûna zarokan ma divê ku pîrek xusla xwe rakin?

Pirs: Da ku ez zarokan bînim ez tedawî dibim. Xwedê hez bike di nêz de wê tedawiya min dest pê bike. Gelo piştî ku ez parza/aşî bibim, hewce ye ku ez xusla xwe rakim? Lekeyên ku piştre derdikevin holê ma dibin asteng bo kirina nimêjê?

Bersiv: Li gorî agahiyên ku me ji bijîşkan bidest xistine, piştî parzayê/aşiyê dibe ku mîna êşa xwînmehê bi qasî 1-2 rojan êşa piştê bi pîrekê re peyda bibe û xwîneke hindik jê were. Ev, ne xwîna kirasa ye, belbî ev xwîneke ji bilî ya xwînmehê ye û bi sedem tedawiya ku dibîne ji pîrekê tê. Ji ber vê yekê divê ku hûn nimêja xwe berdewam bikin. Ango dev jê bernedin. Û ji bo vî tiştî, ne hewce ye ku hûn xusla xwe jî rakin.

97. Pîreka ku li cem bijîşkekî zilam muayene bibe, ma lazim e ku xusla xwe rake?

Pirs: Ez ducanî me, li cem bijîşkekî zilam muayene bûm. Dibêjin ku divê tu xusla xwe rakî. Gelo tu delîla vê gotinê heye?

Bersiv: Tu delîleke ku rakirina xuslê ji bo pîrekên li ba bijîşkên zilam muayene dibin pêwîst bike, tune ye.

Rewşên ku xuslê pêwîst dikin; têkiliya cinsî, di xew an jî di hişyariyê de menî ji mirov were û bo pîrekan jî piştî ku xwînmeh an jî çilê piştî wîladetê biqede. Muayenebûna li cem bijîşkekî zilam, ne yek ji van e jî.

98. Nexweşê ku tedawiya radyoterapiyê dibîne, ma dibe ku teyemum bigire?

Pirs: Ez nexweşê kansêrê me û tedawiya tîrojê dibînim. Di dema radyoterapiyê de divê ez xwe neşûm. Ev jî nêzî meh û nîvekê ye. Lewre ez nikarim xusla xwe rakim. Cihê ku tîroj lê dikevin, divê av negihîjê. Ma ez dikarim teyemum bigirim? Bi rastî ez nizanim ka ez ê çi bikim?

Bersiv: Xwedê Teala di Qur'ana Pîroz de wiha ferman dike:

"**Xwedê her kesî bes li gorî hêza wî, wî binbar dike**."[161]

Di babeta mijarên dînî de Xwedê Teala tu zor û zehmetî li însanan bar nekiriye. Ew, wiha ferman dike:

"**Xwedê naxwaze ji we re zehmetiyê derxe; lê belê dixwaze we paqij bike û qenciya xwe li ser we temam bike. Da ku hûn Wî bişêkirînin**."[162]

"**Di mijara dîn de Wî tu zehmetî li we bar nekiriye**."[163]

"**Li ser koran tu guneh tune ye, li ser seqetan tu guneh tune ye û li ser nexweşan jî tu guneh tune ye. Kî bi gotina Xwedê û Qasidê Wî bike, Xweda dê wî bixe bihuştên ku di binê wan de çem diherikin. Kî jî li paş bimîne, Xwedê dê bi ezabekî dijwar wî ceza bike**."[164]

[161] Beqere, 2/286.
[162] Maîde, 5/6.
[163] Hec, 22/ 78.
[164] Fetih, 48/17.

Eger di hundirê vê demê de divê ku av negihîje tu cihekî ji bedena we, wê gavê hûn dikarin teyemum bigirin. Ev, ji bo we hêsaniyek e ji aliyê Xwedê ve ye. Lê cihê tê tedawîkirin, eger biçûk be û şûştina deverên din dê zirarê nedê, ew der dê bi paçekî bê girêdan û cihê mayî jî dê were şûştin. Jixwe şertê vê jî ev e ku zirarê nede tedawiya we. Eger zirarê bide, mîna ku me berê got, divê hûn teyemum bigirin.

Bûyereke ku di serdema Pêxember de (s.a.w) qewimiye û têkiliya wê bi vê mijarê re heye wiha ye:

Li gorî ku ji Cabirê kurê 'Ebdullah (x.j.q) hatiye ragihandin, wî wiha gotiye:

Em derketibûn rêwîtiyekê, kevir li zilamekî bi me re bû ket û serê wî şikand. Paşê vî zilamê han bi cenabet ket. Ji hevalên xwe pirsî: "Hûn ruxseta ku ez teyemumê bigirin dibînin?" Wan jî got ku: "Tu dikarî avê bikar bînî, em bo te ruxseta (teyemum girtinê) nabînin." Li ser vê yekê, zilam serê xwe şûşt û di encama wê de mir. Dema em derketin hizûra Pêxember (s.a.w), ev bûyer jê re hate gotin. Li ser vê, Pêxemberê me (s.a.w) wiha got:

"*Zilam kuştine, Xwedê jî wan bikuje! Madem nizanibûn, çima nepirsîn? Dermanê nezanînê, pirskirin e. Teyemum jê re bes bû. Divê birîna wî bi paçekî bihata girêdan û ser wê bihata mesihkirin, piştre jî tiştê mayî ji laş bihata şûştin*."[165]

99. Ez nexweş im. Heta ji nexweşiya xwe baş bibim ma ez dikarim xwe neşûm?

Pirs: Ez xwendekarê Zanîngehê me û emrê min 19 sal e. Bi sedema ku min pir caran serê xwe şûşt ez nexweş ketim û heta çend rojan ez ê nikaribim têkevim nav avê. Ez dikarim bi cenabet bimînim, heta ez ji nexweşiya xwe baş bibim? An jî ez ditirsim ku nexweş bikevim û ji xwendina xwe paşde bimînim.

[165] Ebû Dawûd, Teharet, 125, jimara hedîsê: 336.

Bersiv: Ne ji ber şûştina pir, pêkan e ku piştî şûştinê hûn li xwe ne miqate ne lewra hûn nexweş dikevin. Divê hûn hay ji xwe hebin.

Merivê misilman herî zêde bi qasî dema nimêjekê dikare bi cenabet bimîne. Ji vê bêhtir, ne caiz e ku mirov bi cenabet bisekine.

Lê belê di halê ku eger hûn serê xwe bişon hûn ê nexweş bikevin, wê demê hûn dikarin teyemum bigirin. Xwedê Teala wiha ferman dike:

"**Gelî bawermendan! Dema we xwest hûn nimêj bikin, rûyê xwe û destên xwe heta enîşkan bişon, serê xwe mesih bikin herdu lingên xwe jî digel gwîzekan. Eger hûn bi cenabet bin serê xwe bişon. Eger hûn nexweş bin yan rêwî bin yan yek ji we ji avrêjê hatibe yan jî hûn hinguftbin jinan û we av nedîtibe, wê çaxê bi axeke paqij teyemumê bigirin; rûyê xwe û destên xwe bi axê mesih bikin. Xwedê naxwaze ji we re zehmetiyê derxe; lê belê dixwaze we paqij bike û qenciya xwe li ser we temam bike da ku hûn Wî bişêkirînin**."[166]

100. Bikaranîna bandên akupunkturê gelo dibe asteng bo rakirina xuslê?

Pirs: Bikaranîna bandên akupunkturê gelo dibe asteng bo rakirina xuslê?

Bersiv: Çawa ku bikaranîna bandên akupunktûrê xuslê li mirov lazim nake, herwiha bi awayê ku ew band bi guh an jî bi cihekî ji bedena mirov zeliqandî bin tu mehzûr tune ye ku mirov xusla xwe rake. Lewra ev, şeklekî dermankirinê ye.

Di babeta mijarên dînî de Xwedê Teala tu zor û zehmetî li însanan bar nekiriye. Ew, wiha ferman dike:

"**Xwedê naxwaze ji we re zehmetiyê derxe; lê belê dixwaze we paqij bike û qenciya xwe li ser we temam bike. Da ku hûn Wî bişêkirînin**."[167]

"**Di mijara dîn de Wî tu zehmetî li we bar nekiriye**."[168]

[166] Maîde, 5/6.
[167] Maîde, 5/6.

101. Li malên ku ava germ lê tune ye, mesela desmêj û xuslê dê çawa bê çareserkirin?

Pirs: Di mala me ya nû de pirsgirêka me ya ava germ heye. Wekî din jî bi sedema ku min serma girtiye, ez nikarim bi ava sar desmêj bigirim û xusla xwe rakim. Ji ber vê yekê ez nizanim ez ê çawa nimêjên xwe bikim. Ma divê ez çi bikim?

Bersiv: Bo rakirina xuslê bi ava germ ne lazim e ku kombî, şofpen an jî termosfona bi kehrebayê hebe. Hûn dikarin li ser ocaxê yan jî li ser tûp hinekî av germ bikin, tevî ava sar bikin û pê xusla xwe rakin. Heta mirov serî li hemû rê û derfetan nede, ne rast û durist e ku mirov bipirse û bibêje ku "ez nikarim xusla xwe rakim, divê ez çi bikim?" Ji bîr mekin ku di roja me ya îroyîn de hîn jî li gelek deveran kombî, şofben tune ne û misilmanên li wan deran dijîn wekî me li we tewsiye kir, xusla xwe radikin.

102. Di rewşên ku em nikarin xwe bişon de ma dibe em teyemum bigirin?

Pirs: Di rewşên ku em nikarin xusla xwe rakin de gelo dibe em bi tenê teyemum an jî desmêj bigirin? Mîna, gava em bo demeke dirêj bi mêhvanî diçin cem dê û bavê xwe, mirov here serşokê tiştekî şerm tê dîtin, di halên wiha de em xwe dûr digirin. Ma rêyeke hêsan bo vê tune ye? Wekî din jî piştî desmêjeke normal, mirov potekî şil bike û tevdê bedena xwe pê paqij bike, gelo dikeve şûna xuslê? An jî divê av li ser laşê mirov biherike?

Bersiv: Xwedê Teala wiha ferman dike:

"**Gelî bawermendan! Dema we xwest hûn nimêj bikin, rûyê xwe û destên xwe heta enîşkan bişon, serê xwe mesih bikin herdu lingên xwe digel gwîzekan jî. Eger hûn bi cenabet bin xwe ji cenabetiyê paqij bikin. <u>Eger hûn nexweş bin yan rêwî bin yan yek ji we ji avrêjê hatibe yan jî hûn hinguftbin jinan û we av nedîtibe, wê çaxê bi axeke paqij teyemumê bigirin</u>; rûyê xwe û destên xwe bi axê**

[168] Hec, 22/ 78.

mesih bikin. Xwedê naxwaze ji we re zehmetiyê derxe; lê belê dixwaze we paqij bike û qenciya xwe li ser we temam bike, da ku hûn Wî bişêkirînin."[169]

Li gorî cihên ku binê wê xêzkirî ji ayetê, mirov encax di halê ku av tune be, eger hebe jî bi sedem nexweşî û hwd. dikare teyemum bigire. Ji lewra dema mirov rêwî be jî eger derfeta bikaranîna avê hebe, teyemum nayê girtin. Heman tişt bo mêhvandariyê jî derbas dibe. Ji ber ku di ayetê de bo girtina teyemumê şertê şermkirinê nabore, di rewşên wiha de divê ku mirov xusla xwe rake.

Hûn xwe nexin zehmetî û nerihetiyên nehewce. Berî niha bi 20-25 salan dê-bav, kur-bûk, tî-jintî her kes bi hev re di heman malê de dijiyan. Serşoka tevan yek bû û di ser de jî bo bidestxistina ava germ, çi zor û zehmetî didîtin. Digel her tiştî jiyan dewam kir û hate vê rojê. Şerma ji van tiştan tune ye. Bi çi sedemê dibe bila bibe, eger pêwîstiya rakirina xuslê pêk hat, divê bê rakirin. Wexta derfeta girtina xuslê hebe, desmêj bi tenê yan jî teyemum nayê girtin.

Gava we bi paçikekî şil bedena xwe paqij kir, eger av li ser çermê canê we biherike şûştin tê cih. Na eger neherike, xusul pêk nehatiye.

103. Di xuslê de ma divê ku pîrek guliyên xwe vekin?

Pirs: Pîreka ku porê wê gulî ango honandî be, ma divê ku bo rakirina xuslê guliyê xwe veke?

Bersiv: Eger av xwe bigihîne koka tayên serî, ne lazim e ku bê vekirin. Hedîsên ku bi vê meseleyê re eleqedar in wiha ne:

Ji Ummû Seleme (x.j.q) hatiye ragihandin ku wê wiha gotiye: Ji Qasidê Xwedê re pirsiye "Ey Qasidê Xwedê! Ez porê xwe baş dihonim, ji bo rakirina xuslê ma ez

[169] Maîde, 5/6.

guliyê xwe vekim?" Wî wiha ferman kir: "*Naxêr, tu sê caran avê li serê xwe bikî kafî ye, piştre tê temamê bedena xwe bişo, ha bi vî awayî tu paqij dibî*."[170]

Diya me 'Aişeyê dibihîze ku ji sehabeyan 'Ebdullahê kurê Emr, emir dike ku pîrek di dema serşûştinê de divê guliyên xwe vekin. Li ser vê yekê gotiye; "Ez li vî kurê Emr şaş dimînim, emrê pîrekan kiriye ku di dema rakirina xuslê de guliyên xwe vekin. Baş e, emrê wan nekiriye ku porê xwe biqusînin! Ez qesem dikim bi navê Xwedê, min û Qasidê Xwedê ji heman firaqê serê xwe dişûştin. Ji zêdeyî ku ez sê caran avê li serê xwe bikim min tiştekî din nedikir (Qasidê Xwedê jî mudaxele nedikir û nedigot "guliyê xwe veke.")"[171]

104. Piştî têkiliya cinsî bi saetekê menî parçe parçe diherike, divê ez çi bikim?

Pirs: Piştî pêwendiya cinsî ez serê xwe dişûm. Lê belê, digel ku nîv saet an jî saetek derbas dibe hin caran parçe parçe menî diherike, dilê min nerihet e. Ma lazim e ku ez careke din xusla xwe rakim?

Bersiv: Kesê bi cenabet ketibe yan jî ketibe têkiliya cinsî, eger mîza xwe nekiribe yan jî qederekî baş nemeşiyabe yan jî berî razanê xusla xwe rakiribe, piştre tiştê mayî ji meniyê jê biherike, divê ku careke din serê xwe bişo. Lê eger mîza xwe kiribe yan jî têr bi rê ve çûbe yan jî piştî razanê bêşehwet menî jê hatibe, di van halan xusul ne lazim e. Lewra di vî halî de ew menî, bê hebûna şehwetê ji cihê xwe derketiye.

Pîrekek piştî ku serê xwe şûşt, eger meniya zilamê wê jê were, dîsa ne lazim e xusla xwe dubare bike.[172]

---

[170] Muslim, Heyz, 58, (330); Tirmizî, Teharet, 77; Ebû Dawûd, Teharet, 99.
[171] Muslim, Heyz, 59 (331).
[172] Bnh: Nasuhi Bilmen, **Büyük İslam İlmihali**, "Guslü Gerektiren Haller/Haletên ku Xuslê Lazim Didêrin ", paragraf: 178.

105. Ma ramûsan xuslê lazim dike?

Pirs: Dema ez jina xwe ramûsim an jî dema em hevdu mist bidin, gelo xusul lazim dike? Li gorî ku ez dizanim di têkiliya cinsî bi tenê de xusul lazim dike. Eger mirov cima'ê neke bi tenê hevdu bifirikîne ma dîsa jî divê ku mirov serê xwe bişo? Lewra pîrek du av ji wan tê; yek jê aveke şemitokî ye, ya din jî ya ku Serwerê me (s.a.w) gotiye aveke zer e. Ji kerema xwe re bi min re bibin alîkar. An jî her kesê zewicandî ji ber ku jina xwe ramûsaye serê saetekê ma divê ku serê xwe bişo?

Bersiv: Ji bo ramûsanê yan jî mistdanê bi tenê xusul lazim nake. Rewşa ku xuslê pêwîst dike; yan pêwendiya cinsî yan jî munasebet pêk neyê jî ku avik ji mirov biherike. Di encama ramûsandinê yan jî mistdanê de eger avik ji mirov neherike, lê bi sebeb şehwetê bi tenê ava zewqê/şemitokî ji mirov were, xusul lazim nake. Ji ber vê yekê bi tenê desmêj dişikê.

106. Di pêwendiya cinsî de kengî xusul lazim dike?

Pirs: Eger mirov bi pîreka xwe re têkeve pêwendiya cinsî, lê berî ku avik biherike bi sedemeke ji sedeman mirov dawiyê lê bîne, gelo dîsa jî divê ku mirov serê xwe bişo? Ez vê pirsê ji ber vî sebebî dikim: Di pirtûka hedîsê ya bi navê Cem'ul Fewaidê de di cildê yekem rûpelê 123an li gorî hedîseke ku ji Îmam Muslim hatiye girtin, dibêje ku xusul ne lazim e. Lê li gorî hedîsên di heman rûpelî de ne û yên ku di rûlepên din de derbas dibin, divê ku mirov xusla xwe rake. Di vê rewşê de gelo kîjan hedîs bêhtir saxlem e?

Bersiv: Divê ku serê xwe bişo. Lewra di Qur'ana Pîroz de wiha tê ferman kirin: "**Eger hûn bi cenabet bin xwe ji cenabetiyê paqij bikin."**[173] Di zimanê 'Erebî de cenabet, bi wateya pêwendiya cinsî ye, çi avik were çi jî neyê. Hedîsa têkildar

[173] Maîde, 5/6.

wiha ye: **"***Eger yek ji we li pêşberî çar ezayên jina xwe rûnê, piştre pê re têkeve pêwendiya cinsî, çi vala bibe çi jî nebe xusul lê wacib dibe***."**[174]

Tê riwayetkirin ku vê hedîsa ku di Sehîha Muslim de derbas dibe, hedîsa ku hûn behsa wê dikin nesix kiriye. Ango hukmê wê ji holê rakiriye.

107. Ma divê mirov çend gavan bimeşe û piştre xusla xwe rake?

Pirs: Piştî têkiliya cinsî da ku mirov serê xwe bişo, çend gav tên avêtin? Ma em dikarin pêre serê xwe bişon**?**

Bersiv: Piştî têkiliya cinsî, pêwîstiya avêtina hin gavên diyar tune ye. Piştî ku we parçeyên meniyê yên ku bi beden û bi ewretê ve zeliqîne paqij kirin, hûn ê devê xwe, pozê xwe û ji serî heta binê lingê xwe bişon. Û bi vî awayî hûn ê xusla xwe ji ser xwe rakin.

108. Ma pîrek dê çawa xusla xwe rakin?

Pirs: Pîreka ku bi mêrê xwe re dikeve pêwendiya cinsî ma divê ku di dema girtina desmêjê de xwe zêde paqij bike? Ava ku ji mêr tê jixwe ji aliyê bedenê ve tê avêtin. Digel vê jî min bihîst ku lazim e mirov beriya xuslê, xwe bi tiliyan baş paqij bike. Ji aliyê tenduristiyê ve ez vî karî rast nabînim. Ji aliyê rakirina xuslê ve, ma kirina tiştekî wiha şert e?

Bersiv: Ji bo rakirina xuslê kirina tiştekî wiha ne şert e. Lê piştî ku pîrekê serê xwe şûşt, eger meniya (spermên) mêr, ji pîrekê derkeve, wê demê xusul lazim nake, belbî desmêja wê dişikê. Ji bo vê jî tê tewsiyekirin ku beriya serşûştinê mirov demekê bisekine û bi vî awayî mirov tam paqij bibe û piştre xusla xwe rake.

[174] Muslim, Heyz, 22.

109. Gelo ji mêr û jinê divê kîjan berê xusla xwe rake?

Pirs: Dema mirov bi jina xwe re raza ma lazim e ku pîrek pêşî serê xwe bişo? Ma tu zirara wê heye ku mêr berê serê xwe bişo?

Bersiv: Piştî têkiliya cinsî, rakirina xuslê lazim e. Di vê de ji bo mêr û jinê, tu rêz an jî dor tune ye. Ger bixwazin bi hev re yan jî cuda dikarin serê xwe bişon. Di vê meseleyê de tu delîleke ku vî tiştî ferman an jî tewsiye bike tune ye.

110. Piştî ku xwînmeha pîrekê biqede, ma dikare bi zilamê xwe re rakeve?

Pirs: Pîreka ji cila derket berî ku xusla xwe rake ma dikare bi mêrê xwe re têkeve pêwendiya cinsî? Ma durist e ku piştî munasebetê serê xwe bişo? An jî divê di serî de xusla xwe rake?

Bersiv: Di ayeta 222an de ji sûreyê Beqere Xwedê Teala wiha ferman dike:

"**Ji te, pirsa heyzê pîrekan dikin. Bibêje: Ew ezyet e. Di rojên heyzê de xwe ji wan dûr bigirin. Heta ku ew jê paqij nebin nêzîkî wan mebin. Dema tam jê paqij bûn, êdî ji cihê ku Xwedê li we ferman kirî herin cem wan. Bêguman Xwedê ji tobekaran hez dike û ji yên pak û paqij jî hez dike.**"

Li gorî ayeta jorîn, ji bo rabûna vê qedexeyê û helalbûna têkiliya cinsî lazim e ku du şert pêk werin:

1. Divê edetê pîrekê xelas bibe.

2. Divê pak û paqij bûbe. Ango divê serê xwe şûştibe.

Di serî de mezhebê Şafiî, Henbelî û piraniya aliman tifaq kirine ku: Pîreka edetê wê xelas bûbe, lê belê hîn xwe neşûştibe, heram e ku mirov pê re têkeve pêwendiya cinsî. Bi tenê di mezhebê Henefî de eger ku xwîna edetê di dawiya wextê

de bisekine, bêyî ku xwe bişo û bi qasî wextê nimêjekê derbas bûbe, pêwendiya cinsî di vê rewşê de caiz dibînin.[175]

Li gorî Henefiyan, wexta heyzê ya herî zêde deh roj e, piştî ku ew dem derbas bibe, bêyî ku bedena xwe bişo jî pêwendiya cinsî helal dibe. Lê belê eger ku xwîna wê ne di dawiya wê demê de bisekine, wê gavê bi seknê re yekser pêwendiya cinsî helal nabe. Di vê rewşê de da ku têkiliya cinsî helal bibe, pêwîst e ku pîrek ya serê xwe bişo yan jî bi qasî dema nimêjekê di ser xwînsekinandina wê re derbas bibe yan jî bi uzrekî teyemum girtibe û bi wê teyemumê jî nimêjeke sunet kiribe.[176]

Di gihîştina vê nêrînê de delîla Îmam Ebû Henîfe ev e:

Gotina Xwedê Teala ya ku dibêje: "**heta ku ew jê paqij nebin nêzîkî wan nebin**" ev qedexebûna han, bi paqijbûna ji xwînê bi dawî dibe. Bi xelasbûna edetê jinan, yanî bi dawîlêhatina wextê heyzê êdî qedexebûna cinsî jî ji holê radibe.

Razî di tefsîra xwe de wiha cî dide bersiva el-Qadî (muhtemel e ku Qadî 'Ebdullcebbarê Mu'tezîlî be) ya li hemberî Ebû Henîfe:

"Eger Xwedê Teala sirf bigota "**heta paqij bibin**" wê gavê gotina we teqez dê rast bûna. Lê belê piştî ku "**heta ku baş paqij bibin**" li ser hate zêdekirin, ew herdu îfade bi hev re dibin meqsed û sedem ji bo rabûna wê qedexeyê."[177]

Di encamê de dema em li delîlên herdu aliyan dinihêrin, tê dîtin ku ya rastî nêrîna cumhurê ulemayan e. Ango piştî qutbûna xwîna heyzê, bê serşûştin nêzîkayiya bi bal jinan ve heram e.

---

[175] Yunus Vehbi Yavuz, "Hayız", **DİA,** 1998, XVII, 53.
[176] Mehmet Şener, "Heyz", **İslam'da İnanç İbadet Ve Günlük Yaşayış Ansiklopedisi**, Redaktor û Şêwirmendî: İbrahim Kâfi Dönmez, Stenbol 1997, II, 218.
[177] Fexruddîn er-Razî, **et-Tefsîru'l-Kebîr**, VI, 419, tefsîra ayeta 222an ji sûreyê Beqere.

111. Eger piştî xuslê cihekî ziwa ji bedenê mabe divê mirov çi bike?

Pirs: Piştî min xusla xwe rakir bi 3-4 saetan min ferq kir ku cihek ji lingê min ziwa maye, nehatiye şûştin. Ma divê ku ez careke din serê xwe bişom?

Bersiv: Eger mirov piştî xuslê têbigihîje ku devê xwe yan jî pozê xwe neşûştiye yan jî fêhm bike ku cihek ji bedena mirov ziwa maye, ne lazim e ku ji nû ve serê xwe bişo. Şûştina wan deveran bi tenê têr dike. Di vê navberê de eger nimêjeke ferz kiribe, divê ku wê nimêjê careke din bike.

112. Qirêja ku ji guhan derdikeve ma xuslê betal dike?

Pirs: Piştî ku ez li serşokê xusla xwe radikim û derdikevim, qirêja guhên xwe bi darikê guhan paqij dikim. Ev qirêja ji binê guhê min derdikeve gelo dibe asteng bo xusla min?

Bersiv: Di rakirina xuslê de divê ku ji bedenê cihên derve bên şûştin. Dema hûn dervê guh ango cihê ku bi hêsanî hûn dikarin bi tiliyên xwe dest bidinê hûn şil bikin, xusla we pêk tê. Qirêja ku paşê ji guh derdikeve nabe asteng bo xuslê. Di vê mijarê de bila tasewas bi we re çênebin.

113. Ma rast e ku bi dîtina avê teyemum betal dibe?

Pirs: Kesê bi sedem uzrekî ji dêvla xuslê teyemum girtibe, dema derfeta ku avê bikar bîne derkeve holê ma divê ku serê xwe bişo? Lewra di şûna desmêjê de em teyemum digirin. Dema îmkana bikaranîna avê çêbû desmêj betal dibe. Bi heman aqil û mentiqê kesê di dewsa xuslê de teyemum girtibe dema xwe bigihîne avê ma xusla wî ya berê betal dibe? Hin kesên ku dibêjin betal nabe hene. Lê belê tu delîl û şîroveyekê li ser vê nayînin.

Bersiv: Herçiqas di pirtûkên fiqhê û ilmîhalan de bê gotin ku "dema av bê dîtin teyemum betal dibe", lê bi dîtina avê ne desmêj ne jî teyemum betal nabe.

Lewra hebûna avê, ne desmêjê ne jî xuslê lazim nadêre; bi tenê dibe asteng bo girtina teyemumê.

Tiştên desmêj betal dikin –ger li derveyî avrêjê bên kirin jî- tiştên li qedemgehê tên kirin. Ev jî babiberketin, desmêja mezin û ya biçûk in.

Tiştên ku xusla cenabetê pêwîst dikin jî pêwendiya cinsî -çi di xew de çi jî di hişyariyê de be-, menî ku ji mirov were û ji bo jinan piştî derbasbûna dema xwînmehê û çilê piştî welidandinê ne.

114. Ma dîn jî xusla xwe radikin?

Pirs: Kurekî dîn ê cîranê me heye. Bibexşînin, em dikarin bibêjin ku her roj bi cenabet dikeve. Ji ber ku sobe bi ser xwe de aniye xwarê, şewatên wî yên giran jî hene. Dayika wî, da ku serê wî bişo bi zorê dikare wî zebt bike. Ev pîrek, divê çi bike?

Bersiv: Di dînê me de ji şertên mukelefbûna bi 'îbadetan yek jê jî ku mirov **bi aqil be**. Eger ew zarok ji aliyê seqetiya aqil ve, di asta ku nikaribe nimêjê bike de be, ne pêwîst e ku xuslê jî ji ser xwe rake. Lewra rakirina xuslê ji bo nimêjê şert e.[178] Ji vê bonê ne ku çi dema bi cenabet bibe; belbî divê dayika wî çi dema pêwîstî bi serşûştina wî çêbibe, serî wî bişo.

Xwedê Teala di ayeta bi mijarên desmêj, xusul û teyemumê re têkildar e, wiha ferman dike:

"**Gelî bawermendan! Dema we xwest hûn nimêj bikin, rûyê xwe û destên xwe heta enîşkan bişon, serê xwe mesih bikin herdu lingên xwe digel gwîzekan jî. Eger hûn bi cenabet bin xwe ji cenabetiyê paqij bikin. Eger hûn nexweş bin yan rêwî bin yan yek ji we ji avrêjê hatibe yan jî hûn hinguftbin jinan û we av nedîtibe, wê çaxê bi axeke paqij teyemumê bigirin; rûyê xwe û destên xwe bi axê**

[178] Maîde, 5/6.

mesih bikin. Xwedê naxwaze ji we re zehmetiyê derxe; lê belê dixwaze we paqij bike û qenciya xwe li ser we temam bike da ku hûn Wî bişêkirînin."[179]

[179] Maîde, 5/6.

XWÎNMEH

115. Ma pîreka di xwînmehê de dikare bikeve mizgeftê?

Pirs: Pîreka di xwînmehê de gelo dikare bikeve mizgeftê?

Bersiv: Mezhebên fihqî, çûna mizgeftê bo pîreka di heyza de caiz nadêrin. Lê belê ji hedîsên bi mijarê ve têkildar in derxistina encameke wiha ne pêkan e. Li gorî nêrîna me, di dema heyzê de pîrek dikarin biçin mizgeftê li we'z û nesîhetan guh bidêrin û lê rûnên. Qedexeya ku di hin hedîsan de derbas dibe, bi mebesta ku mizgeft qirêjî mebe.

Tiştên ku pîreka di xwînmehê de nikare bike; kirina nimêjê û têkiliya cinsî ye.

Di vê mijarê de me, bi sernavê **Abdest Ve Hayız** lêkolînek bi xwendekareke xwe da kirin. Beşa sêyem ji wê lêkolinê bi navê **Abdestsiz Mescide Girme** ye. Em tewsiye dikin ku hûn wî cihî bixwînin.

http://www.suleymaniyevakfi.org/arastirmalar/abdest-ve-hayiz.html

116. Ma nîkaha pîreka di kirasa de tê birîn?

Pirs: Gelo nîkaha pîreka di kirasa de tê birîn?

Bersiv: Nîkaha di dema xwînmehê de were birîn durist e. Bo nîkahê tu şertekî ku divê pîrek di paqijiyê de be, tune ye.

117. Cezayê pêwendiya cinsî di rojên qedexekirî de çi ye?

Pirs: Eger mirov di rojên qedexekirî de bi jina xwe re têkeve munasebeta cinsî, gelo cezayê wê çi ye?

Bersiv: Kesê ku bi jina xwe re beriya ku ji heyzê derkeve têkeve eleqeya cinsî, ew kes gunehkar dibe. Ji bo vî tiştî lazim e ku poşman bibe û tobe bike. Piştre ku mirov bi qasî (4,25 gr zêr) sedeqe bide munasib hatiye dîtin.

Ji ‘Ebdullahê kurê ‘Ebbas (x.j.q) hatiye ragihandin, Pêxember (s.a.w) di derheqê kesê di zemanê heyzê de nêzî jina xwe dibe wiha ferman kiriye: “*Bila ew kes ya dînarekî yan jî nîv dînarî sedeqe bide.*”[180]

Ebdullahê kurê ‘Ebbas (x.j.q) wiha gotiye: “*Eger mirov di serê dîtina xwîna heyzê de nêzî jina xwe bibe, bila dînarekî û eger piştî xwîn sekinî, lê beriya serşûştinê nêzî wê bibe, bila nîv dînarî sedeqe bide.*”[181]

118. Eger 40 roj ji çilê pîrekê derbas bibe, divê çawa tev bigere?

Pirs: Çil roj ji çile/nîfasa pîrekê derbas bû. Xwîn hê jî nesekiniye. Bo kirina nimêjê divê li benda sekinandina xwînê bisekine yan jî piştî ku çil roj derbas bû herçiqas xwîn nesekine jî divê xwe bişo û dest bi kirina nimêjê bike?

Bersiv: Di rewşa çilê pîrekê de herî pir çil roj xwîn tê dîtin. Xwîna ku piştî vê demê ji pîrekê were, ne xwîna nîfasê ye.

Vê xwîna ku navê îstihazê lê tê kirin, mîna xwîna ku ji endamên mirov ên din tê ye. Pîreka ku di rewşeke wiha de be berpirsyariya kirina nimêjê ji ser ranabe. Herwiha dikare bi zilamê xwe re têkeve pêwendiya cinsî jî.

119. Ma pîrekek di hefteyekê de dibe ku du caran têkeve cilan?

Pirs: Piştî ku dema xwînmeha min bi tekûzî qediya bi 6 rojan dîsa ez ketim cila û ev rewş 7 rojan dom kir. Piştî 7-8 rojan dîsa ez ketim heyza. Ji lewra di navbera kirin û nekirina nimêjê de dudilî me. Ma ez dikarim di vî halî de nimêj bikim? Eger hûn bikaribin min agahdar bikin ez ê dilşad bibim.

Bersiv: Ji bo rewşa paqijiya navbera du adetan tuhr (paqijî) tê gotin. Dema wê jî herî kêm 15 roj e.

[180] Ebû Dawûd, Nîkah, 46-47.
[181] Ebû Dawûd, Nîkah, 46-47.

Eger bi sebeb nexweşiyekê ji pîrekekê her dem xwîn were, dê li gorî rojên diyar ên rewşên wê yên xwînmeh û paqijiyê, hikum bê dayîn.

Ji ber vê yekê hûn li gorî demên xwe yên diyar ên berê tev bigerin. Eger di rojên din de xwîn were, ev dibe xwîna uzur/nexweşîyê û hûn ê li ser kirina nimêjê dewam bikin.

120. Ma dema xwînmeha pîrekan kengî diqede?

Pirs: Ma pîrek di dawiya xwînmehê de gava lekeyên xwînê bi gişt qut dibin an jî gava ku hîn ava spî ji wan diherike xusla xwe radikin?

Bersiv: Heta xwîna di hundirê cila de tê bi gişt nesekine, heyz/xwînmeh bi dawî nabe. Ev xwîn, çawa dibe ku reş, sor, kesk an jî zer be, herwiha dibe ku şolî û di rengê axê jî de be. Pîreka ku dema xwînmeha xwe temam kiribe, aveke çîlspî jê tê. Ji lewra îtibar bi şolîtiya piştî vê nayê kirin.

Ji Ummû Etiyye wiha hatiye ragihandin:

"*Piştî ku dema xwînmehê xelas dibû me zerîtî û şolîtî tiştek (ji heyzê) nedihesiband*."[182]

121. Pîraka ku dema cilê wê xelas bûbe û dîsa jî xwînê bibîne, dê çi bike?

Pirs: Dema xwînmeha/cilê jina min xelas bû û xusla xwe rakir. Lê piştî demekê ferq kir ku dîsa xwîn jê tê. Ma qey jina min hîn di cila de ye? Divê çawa tev bigere?

Bersiv: Dema xwînmeha pîreka we bi dawî bûye. Xwîna ku jê tê jî ne xwîna cila ye. Pêkan e ku ev xwîn, ji rehên xwînê yên terikî tê. Di huqûqa Îslamê de ev xwîn, bi navê "îstihzayê" ango "xwîna uzur" tê binavkirin. Pîreka ku di vê rewşê de be, divê ku nimêj bike. Herwiha dikare bi mêrê xwe re jî razê ango pê re têkeve munasebeta cinsî.

[182] Buxarî, Heyz, 26; Ebû Dawûd, Teharet, 117; Nesaî, Heyz, 7.

122. Ji ber tedawiya spîralê xwîna ku berî dema adetê tê, ma dibe asteng bo nimêjê?

Pirs: Xwîna ku bi sebeb tedawiya spîralê beriya dema cila ji pîrekê tê, gelo dibe asteng bo kirina nimêjê?

Bersiv: Ji aliyê bijîşkî ve xwîna cila, herî zêde 7 rojan didome. Eger xwîna xwînmehê ji 7 rojan derbas bibe yan di xeyrî wexta adetê de di navberê de xwîn were yan jî lekeyên xwînê bên dîtin, ev rewşên han dibe ku nîşana nexweşiyekê be. Di van halan de divê mirov serî li bijîşkekî/ê bide. Di encama muayene û tetkîkan de eger nexweşiyek hebe dê bê tedawîkirin.

Hebûna lekeyan û dirêjbûna dema adetê cila, zêdeyiya mîqdarê xwîna xwînmehê, bi sedem bandora RİA (Navgînên di Malzorokê de) derdikeve holê. Xwîn û lekeyên ku ne di gava adetê de tên dîtin, ji xwîna cila nayên jimartin. Ji lewra ev nabin asteng bo têkiliya mêr-jinê û kirina nimêjê.

123. Ma zilam dikarin di mijarên mîna xusul û heyzê de pîrekan agahdar bikin?

Pirs: Gelo xoceyên zilam dikarin di sohbet an jî civînan de di derbarê desmêj, xusul, heyz/xwînmeh û hwd. ji mijarên paqijî û teharetê pîrekan agahdar bikin? Ma ev tiştê han caiz e?

Bersiv: Belê caiz e. Lewra Pêxemberê Xwedê (s.a.w) di mijarên paqijî, têkiliya cinsî, rewşên pîrekan ên taybet û hwd. de ji pîrekên sehabeyan re şîrove dikir. Piştî wefata Pêxemberê me jî ji pîrekên wî diya me 'Aişeyê vê peywira han bi cih dianî. Vê carê zilam dihatin cem; di derbarê desmêj, xusul û têkiliya cinsî de hemû pirsên xwe jê dikirin û bersiva xwe digirtin. Di vir de cinsiyeta kesê bersivê dide ne girîng e, belbî ya muhîm ka gelo ehl e ji bo bersivdayînê yan na. Piştî ku mirov pisporê mijarê be, zilam dikarin hinî pîrekan bikin û herwiha pîrek jî dikarin zilaman di van mijaran de agahdar bikin.

Bi kurtasî: Cinsiyeta zanistê tune ye; ji lewra fedîkirin jî tune ye. Riwayeta li jêr bo vê mijarê dibe mînak.

Li gorî ku ji 'Aişeyê (x.j.q) hatiye ragihandin diya Enesê kurê Malik Ummû Suleym el-Ensariye (tê ba Pêxember):

"Ey Qasidê Xwedê! Bi rastî di babetê pirsa ji rastiyê de Xwedê Teala fermana bi şermkirinê nake. Tiştê mêr di xewna xwe de dibîne eger pîrek jî bibîne, ma wê serê xwe bişo yan naşû? Hûn dikarin (vî hukmî) ragihînin min?

Qasidê Xwedê wiha ferman kir: "*Belê. Eger avê bibîne, bila xwe bişo*."

Ez li Ummû Suleym vegeriyam û min jê re got: "*Wa! Ma pîrek vê qet dibînin?*" Qasidê Xwedê li min vegeriya û wiha kerem kir: "*Ey 'Aişeyê! Xwedê temenê te dirêj bike. Ma (zarokê wê) çima dişibê?*"[183]

124. Madem bawermend necis nabe, jina di cila de çima ne paqij tê pejirandin?

Pirs: Di Sehîha Buxarî de tê ragihandin ku Pêxemberê me gotiye kesê bawermend necis nabe. Ma qey ev mijar ji bo pîreka di heyza de tiştekî cuda ye? Kesên muşrik, kafir û munafiq nepak in, lê Îslam ji aliyê manewî ve wan pak û paqij dike. Di vî halî de gelo çima jina di cila de ji aliyê manewî ve nepaqij tê jimartin? Ma qey ji dîn derdikeve? Eger hûn vê mijarê şîrove bikin ez ê dilşad bibim.

Bersiv: Desmêja ku ji bo kirina nimêjê şert e "**paqijiyeke madî ya ku aliyê wê yê manewî girantir e**." Lewra desmêj, ne bi tiştên ji endamên desmêjê derdikevin, belbî bi pîsîtiyên ku ji pêş û paşê mirov derdikevin xera dibe.

Li gorî Henefiyan xwîn desmêjê betal dike. Lê di derbarê vê biryarê de ne tu ayet ne jî hedîs hene.

[183] Muslim, Heyz, 31(312); Ebû Dawûd, Teharet, 96.

Nepaqijiya pîreka di cila de jî "**nepaqijeyeke madî ya ku aliyê wê yê manewî girantir e**." Lewra herçiqas cihê ku xwîn jê tê, tam were paqijkirin jî heta xwîn bi gişt nesekine pîrek paqij nayê hesibandin. Ji ber vê yekê bêdesmêjî û heyz "**nepaqijeyeke taybet e ku dibin asteng bo kirina nimêjê.**"

Mijara kesên kafir, cuda ye. Nepaqijî û pîsîtiya wan sirf bi sedem bîr û baweriyên wan ên çewt in û ji ber vê yekê pîsîtiya wan manewî ye. Tiştê wan pak û paqij bigerîne; ku bibin xwediyê baweriya rast û durist. Hedîsa ku di pirsa we de derbas dibe li ser vê yekê radiweste. Kesê xwediyê baweriya rast be ji aliyê eqîde û baweriyê ve pak û paqij e, çi bi desmêj be çi jî bê desmêj be.

Nîşe: Riwayeta ku di pirsê de derbas bû wiha ye:

Ebû Hureyre bi canabetî di rêyeke Medîneyê de pêrgî Pêxember (s.a.w) tê. Xwe vedidize û xusla xwe radike. Pêxember lê dipirse, dema Ebû Hureyre tê, jê dipirse:

"*Ey Ebû Hureyre! Tu li ku mayî?*" Ebû Hureyre wiha bersiv dide:

"Ez bi cenabet bûm. Heta ku min serê xwe neşûşta min rûniştina li cem te rast nedît." Li ser vê yekê Qasidê Xwedê wiha kerem dike: "*Subhan ji Xwedê re! Ma kesê bawermend necis dibe!*"[184]

125. Pîreka di heyza de be dikare Ke'beyê tewaf bike?

Bersiv: Di derbarê ku pîreka di kirasa de ye ji bilî tewafa hecê, dikare hemû menasikên hec û 'umreyê bike, hin hedîs hene:

Ji Hezretî 'Aişeyê hatiye ragihandin:

"Ez di halê ku di kirasa de bûm, hatim Mekkeyê. Min Ke'be, tewaf nekir. Di navbera Sefa û Merweyê de se'y nekir. Min Pêxemberê me ji vê rewşê agahdar kir.

[184] Buxarî, Xusul, 23; Muslim, Heyz, 371.

Wî wiha got: **"***Heciyên din çi bikin tu jî heman tiştî bike. Lê belê heta ku tu paqij nebî, Ke'be'yê tewaf meke***."**[185]

"*Pîrekên ku di heyz û çila de ne, xusla xwe radikin, îhramên xwe girê didin û ji bilî tewafa Ke'beyê, hemû menasikên xwe pêk tînin*."[186]

Di vê mijarê de Îbn Qeyyim el-Cewzî -bi kurtasî- vê tesbîta han dike: "Di demên pêşî de karwanên ku ji bo pêkanîna 'îbadeta xwe dihatin hecê, heta tevan wezîfa xwe bi cih neanîna venedigeriyan welatê xwe. wekî mînak, dema ji karwan pîrekek biketa kirasa û tewafa xwe nekira, karwan li benda paqijiya wê pîrekê dima, heta pîrek paqij bibûna û tewafa xwe bikira piştre vedigeriyan welatê xwe. Lê belê di roja me de rewş ne wisa ye. Pîrekeke ku ji cihekî dûr ji bo bicihanîna 'îbadeta xwe hatibe û di rojên ku tewaf tê kirin de têkeve heyza, nikare tewafa xwe bike. Lê dibe ku karwan li bendê nesikine heta ji heyza paqij bibe û vegerin welatê xwe. Li gorî ku pîrek jî nikare ji wan veqete, xetera ku pîrek tewafê neke û vegere welatê xwe dertê pêşberî wê. Di vî halî de rewşeke awarte derdikeve holê. Û zerûret jî heraman mubah didêrin. Eger karwan, heta roja ku pîrek paqij bibe dê li Mekkeyê bimîne, divê ku pîrek heta dema paqijiya xwe ji xeyrî tewafê hemû erkên xwe yên hecê bike. Dema ku paqij bû jî dê tewafa xwe bike. Lê eger karwan heta roja paqijiya pîrekê dê li Mekkeyê nemîne, wê gavê pîrek, dê di heyza de tewafa xwe ya ziyaretê bike."[187]

Li gorî me jî nêrîna herî munasib, ev e.

126. Pîreka di heyza de ma dikare biçe serdana goran?

Pirs: Gelo pîreka di heyza de dikare serdana goran bike? Eger bikaribe jî bi şertê ku bi desmêj be gelo dikare Qur'anê bixwîne û dua bike?

[185] Buxarî, Hec, 81; Muslim, Hec, 120; Ehmedê kurê Henbel, **Musned**, VI/39, 219, 273.
[186] Tirmiz, Hec, 98; Ebû Dawûd, Menasik, 9; Ehmedê kurê Henbel, **Musned**, I/364.
[187] Îbn Qeyyim el-Cewzî, **Î'lamu'l-Muweqqi'în**, Beyrût 1986, III, 25-40.

Bersiv: Heyz nabe asteng bo serdana goran. Pîreka ku di rewşeke wiha de be, dikare ji bo xwediyê gorê dua bike. Hûn dikarin ayetên ku dua di wan de diborin bixwînin. Me bi taybetî behsa ayetên dua kir, da ku hûn ji bo mirî dua bikin. An na di tu ayet û hedîsekê de derbas nabe ku mirov Qur'anê bixwîne û xêra wê bexşî canê mirî bike. Lewra xêra xwendina Qur'anê bi tenê bo kesê dixwîne, wateya wê fêhm dike û hewl dide ku li gorî wê bijî, heye. Lê belê kesê mirî eger di jiyana xwe de xwendina Qur'anê hînî yekî kiribe yan jî bûbe wesîle bo xwendina wê, her cara ku ew Qur'anê bixwîne xêra wê ji wî re hasil dibe. Ev jî ji xwe xêra ku mirov bibe wesîle bo kirina karekî baş.

Di vê navberê de di derbarê ku pîreka di heyza de dikare Qur'anê bixwîne yan jî nikare bixwîne em tewsiye dikin ku hûn ji malpera me www.suleymaniyevakfi.org di beşa "**Araştırmalar"** de xebata bi navê **"Fıkhi Yorumlarla Abdest-İbadet İlişkisi"** bixwînin:

http://www.suleymaniyevakfi.org/arastirmalar/abdest-ve-hayiz.html

QILIFKIRINA DIRANAN

127. Ma qilifkirin an jî dagirtina diranê ku naêşê, caiz e?

Pirs: Di roja me de li ba bijîşkê diranan, diranên di navbera du diranên saxlem de bi diranên ji plastîk, krom, porselen û hwd. tên dagirtin. Da ku diranê dikeve navbera herduyan saxlem bimîne û ji cihê xwe nelive, herdu diranên saxlem jî tên qilifkirin û ji vê yekê re tê gotin "köprü" ango pir. Gelo li gorî mezhebê Henefî, ez dikarim diranê xwe bi vî awayî çêbikim?

Bersiv: Belê, hûn dikarin çêbikin.[188]

128. Gelo çêkirina diranan caiz e yan na?

Pirs: Gelo caiz e ku ez diranê xerabe yê ku naêşê, bi rêya qilifkirinê yan jî bi rêya dagirtinê, çêbikim?

Bersiv: Hebûna diranê xerabe di devê mirov de ji ber ku li dijî tenduristiya însên e, çi biêşê çi jî neêşê, ji lewre mirov dikare bi rêya qilifkirinê yan jî bi rêya dagirtinê, çêbike.[189]

129. Dema mirov bi cenabet be ma durist e ku mirov diranê xwe dagire?

Pirs: Dema mirov di rewşeke ku tê de xusul lazim dike de diranê xwe dagire, divê mirov çi bike? Ango pêwîst e ku mirov wê macûnê ji ser diran rake**?**

Bersiv: Naxêr, ne lazim e. Lewra derxistina wê macûnê ji diranan ji we re ne karekî hêsan e. Li aliyê din, di ayeta ku desmêj û xuslê bi me dide danasandin, Xwedê Teala wiha ferman dike:

"**Xwedê naxwaze ji we re zehmetiyê derxe…**"[190]

---

[188] Îbn Abidîn, **Reddu'l-Muxtar 'ala Durri'l-Muxtar**, Matbaa-i Amire, V, 318.

[189] Ji fetwa Şeyxulîslam Hasan Hayrullah Efendi, ev mesele bi rihetî tê fêhmkirin. Bnh: Yalovalı Ali Murteza (ed), **İlaveli Mecmua-i Cedîde**, Stenbol 1326-1329, rp. 12.

Di ayeteke din wiha ferman dike:

"**Di mijara dîn de Wî tu zehmetî li we bar nekiriye**."[191]

Wekî din, li gorî mezhebe Şafiî û Malikî dev û poz ne ji ezayên der ve, belbî ji yên hundir tên hesibandin. Ji ber vê yekê di dema xuslê de li ba herdu mezheban, şûştina dev û poz ne ferz e, belbî sunet e. Hûn dikarin li gorî wê 'emel bikin.

130. Dagirtin an jî qilifkirina diranan, ma dibe asteng ji bo rabûna xuslê?

Pirs: Li gorî mezhebê Henefî, di dema rakirina xuslê de bi sedema ku diran bi rêya qilifkirinê û hwd. hatibe çêkirin, eger av xwe negihêne wî cihî, gelo xusul ji ser mirov radibe yan na?

Bersiv: Di rewşeke wiha de li gorî mezhebê Henefî, ev tiştê han nabe asteng ji bo rabûna xuslê ji ser meriv. Êdî ev diranê nû dikeve cihê yê berê û şûştina wan dibe mîna şûştina yên esasî. Lewra hebûna van diranan di dev de ji aliyê tenduristiyê ve îhtiyacî ye û hewldana derxistina van diranan di dema xuslê de zehmetiyê derdixe holê.

Di dema rakirina xuslê de cihên ku di şûştina wan de tu zehmetî dernakeve holê, ferz e. Di ayeta ku bi mijara desmêj û xuslê re têkildar e, Xwedê Teala wiha ferman dike:

"**Xwedê naxwaze ji we re zehmetiyê derxe; lê belê dixwaze we paqij bike û qenciya xwe li ser we temam bike da ku hûn Wî bişêkirîni**."[192]

Di ayeta 78an ji sûreyê Hec, Xwedê Teala wiha ferman dike: "**Di mijara dîn de Wî tu zehmetî li we bar nekiriye**."[193]

---

[190] Maîde, 5/6.
[191] Hec, 22/78.
[192] Maîde, 5/6.
[193] Hec, 22/78.

Ji ber van sedeman, di fiqhê de tiştên ku zehmetiyê derdixin holê de hikum tê guhertin. Ev jî bi qayde û distûra "zehmetî tê rakirin" hatiye girêdan. Dagirtin û qilifkirina diranan, ji aliyê tenduristiyê ve pêwîstiyek e. Rakirina wan di dema xuslê de û şûştina binê wan û piştre dîsa çêkirina wan ji ber ku dibe sedem ji bo zehmetiyên giran, êdî mirov dest nade wan. Ji ber ku şûştina wan bi xwe nabe sedem ji bo tu zehmetiyan, sirf mirov dê wan bişo. Di dema rakirina xuslê de cihên ku di şûştina wan de zehmetî derdikevin holê, di pirtûkên fiqhê yên mezhebê Henefî de bi awayekî aşkere hatiye îfadekirin ku şûştina wan cihan ne ferz e.[194]

131. Di mijara dagirtina diranan de, 'emelkirina bi fetwayê mirov ji berpirsyariyê xelas dibe?

Pirs: Di çavkaniyeke ku min serî lê da, derbas dibû ku; "dema li hember fetwaya ku tê dayîn di hundirê însên de şek û guman çêbibe, 'îbadeta însên ya di wê mijarê de ne durist e." Di mijara duristbûn an jî neduristbûna rakirina xuslê ji bo kesê ku diranê xwe qilif kiriye û hwd. di mezhebê Henefî de li gorî fetwaya Dîyanetê û pirê kesan bi awayê; ku durist e, li aliyê din li gorî hindik kesan; ne durist e. Digel ku ez bi fetwaya Dîyanetê 'emel dikim jî bi min re hin weswese û guman jî heye. Bi vê re girêdayî, gelo 'îbadeta ku ez dikim durist e yan na? Eger bi min re guman hebe, gelo ez û yên ku mîna min dikin ji peywirdariyê xelas dike? Ma em kesên muqellid (teqlîda mezhebekî dikin), sirf bi 'emelkirina bi fetwayê mesûl in?

Bersiv: Kesên ku nikaribin xwe bigihînin çavkaniyan û muqayeseya delîlan bikin, ji kesên ku baweriya wan bi wan tê, ji seyda û bi nêrînên mezheban dê 'emel bikin. Bi şertê ku ev tiştê tê teqlîdkirin ne li dijî hukmekî aşkere ji ayet û hedîsan be, ji aliyê dînî ve tu mehzûrek di 'emelkirina bi tiştekî wiha tune ye.

Lê mixabin nêrîna ku dibêje desmêj û xusul ji ser mirov ranabe, yek ji mijarên ku serê însanan tevlihev kiriye.

[194] Bnh: Îbn Abidîn, **Reddu'l-Muxtar**, Stenbol 1307, I, 141 û piştî wê.

CENAZE

132. Hukmê girî û xemgîniya ji bo miriyan

Pirs: Ez ducanî bûm û di meha pêncem de sanciya min çêbû û cêwiyê min bi mirîtî hatin dinyayê. Dîsa jî hemd ji Xwedê re be. Hin caran ez pir li ber dikevim û didim girî. Gelo di xemxwarin û girînê de sînor çi ye?

Bersiv: Tiştê ku qewimiye û hatiye serê we, ji ber qanûn û destûra îmtihana ku Xwedê Teala ji bo jiyanê daniye ye. Lewra Xwedê Teala wiha ferman dike:

"**Sond be; Em ê bi hinekî ji tirsê û birçîbûnê, bi kêmkirina mal û can û kêmkirina mêweyên we, we îmtîhan bikin û mizgînê bide yên sebirkêş.**

Ew ên ku dema belayek bê serê wan, dibêjin "Em yên Xwedê ne û em ê li Wî jî vegerin."

Evên ha ji Perwerdegarê wan rehmet û dilovanî li wan dibare û yên ku li ser rêya heq rasterê bûne, her ew in."[195]

Ji Pêxemberê me (s.a.w) wiha hatiye ragihandin:

"*Karê kesê misilman xerîb e; karên wî hemû xêr in. – Ev jî bi taybetî di karê kesê bawermend de ye– tiştekî kêfxweşiyê were sera spas dike û jê re dibe xêr; eger tiştekî bi zirar were sera sebir dike, ev jî jê re dibe xêr*."[196]

Piştî musîbet û belayên mîna vê belayê, bi şertê mirov li hember emrê Xwedê îsyaniyê meke û radestîi fermana Xwedê bibe tu mehzûr di xemxwarin û girînê de tune ye. Lewra hatiye ragihandin ku Pêxember (s.a.w) piştî mirina zarokên xwe û mirina neviyên xwe giriyaye. Ji Enesê kurê Malik (x.j.q): Qasidê Xwedê wiha gotiye: "*Îşev kurekî min çêbû. Min navê bavê xwe Îbrahîm lê kir***.**" (Piştre Enes tiştê mayî ji)

[195] Beqere, 2/155-157.
[196] Muslim, Zuhd, 64.

hedîsê ragihand. (Enes di dewama wê de wiha) got: "(Piştî demekê) min ew zarok di hizûra Qasidê Xwedê dît ku can dide. (Di wê navberê de) ji çavê Qasidê Xwedê hêstir dibariyan (û wiha) got:

"*Çav şil dibin, dil xemgîn dibe, lê belê em ji gotinên ku Xwedayê me razî bikin pê ve tu gotinan nabêjin. Ey Îbrahîm! Bi rastî jî em bi (mirina) te xemgîn in.*"[197]

Dîsa ji Enesê kurê Malik (x.j.q): Em li ser cenazeyê keçeke Pêxember (Ummû Gulsum) hazir bûn. Qasidê Xwedê li aliyekî gorê rûniştibû. Min dît ku ji herdu çavên Qasidê Xwedê hêstir dibarin…[198]

Ji Usameyê kurê Zeyd (x.j.q): Keça Pêxember (s.a.w), (Zeyneb) jê re xeberê dişîne ku lawê min (di riwayetek din de "keça min") li ber mirinê ye, werin ba min. Hezretî Pêxember (s.a.w) ji keça xwe re selaman dişîne û wiha bersiva wê dide:

"*Tiştên Xwedê distîne û dide hemû yên Wî ne. Her tişt li ba Xwedê bi dem û temenekî hatiye diyarkirin. Ji ber vê yekê keça min sebir bike. Bîne bîra xwe ku ev sebra te li ba Xwedê, xêra wê heye*."

Vê carê Zeyneb (x.j.q), xeberê jê re dişîne û dibêje ku tu bi Xwedê kî "Teqez hûn werin."

Li ser vê xeberê Pêxember rabû. Digel sehabiyên ku pê re bûn ji Se'dê kurê Ubade, Mu'azê kurê Cebel, Ubeyyê kurê Ke'b, Zeydê kurê Sabit û digel hin sehabiyên din (x.j.q) hat mala Zeynebê. Zarok dan hemêza Qasidê Xwedê. Canê zarokî diçû û dihat û diliviya. Ji çavên Qasidê Xwedê hêstir bariyan. Se'dê kurê Ubade (x.j.q) pirsî:

"Ya Qasidê Xwedê! Ev çi hêstir û girî ye? " Qasidê Xwedê wiha bersiv da:

[197] Buxarî, Cenaiz, 43; Muslim, Fedail, 62; Ebû Dawûd, Cenaiz, 23-24; Îbn Mace, Cenaiz, 53.
[198] Buxarî, Cenaiz, 32.

"*Ev hêstir, rehmeteke ku Xwedê ew xistiye dilê bendeyên xwe. Xwedê, encax li bendeyên xwe yên birehm rehmê dike.*"[199]

133. Ma nimêjkirina li ser mirî û definkirin ji kengî ve heye?

Pirs: Şûştina miriyan, nimêjkirina li ser wan û definkirina wan ji ku derê derbasî ba me bûye û me mînaktiya van adetan ji ku derê girtine? Gelo ji dema afirandina însên li ser rûyê erdê ve dest pê kiriye û heta roja me dewam kiriye? An ji kîjan pêxemberî hatiye hînkirin?

Bersiv: Dema ji herdu kurên Hezretî Adem, Qabîl birayê xwe dikuje, ji bo definkirina termê Habîl Xwedê Teala di sûreyê Maîde ayeta 31. de behsa şandina qijikê wiha dike:

"**Vêca dilê wî kuştina birayê wî jê re xweş kir û birayê xwe kuşt. Êdî ew bû ji yên ku xisar kirin.**

Xwedê, qijikek şand ku bi nikil û lingên xwe ax dikola da ku nîşanî wî bide ku ew ê termê birayê xwe çawa veşêre. (Birayê kujer) got: Xwelî li serê min be! Ez nebûm wekî vî qijikî, vêca ku ez cendekê birayê xwe veşêrim. Êdî ew bû ji poşmanbûyan!"[200]

Mîna ku tê dîtin, bi awayekî aşkere xuya ye ku însanên beriya me, miriyên xwe diveşartin. Ji xeynî vê, em dikarin bibêjin ku şûştina miriyan û nimêjkirina li ser wan ji zemanê pêxemberên ewil ve û bi taybetî jî ji dema Hezretî Nûh ve heta niha dewam kiriye. Lewra Xwedê Teala wiha ferman dike:

---

[199] Buxarî, Cenaiz 32, 43, Merda, 9, Eyman, 9, Tewhîd, 2; Muslim Cenaiz, 11; Ebû Dawûd, Cenaiz, 23-24; Nesaî, Cenaiz, 13, 22; Îbn Mace, Cenaiz 53; Ehmedê kurê Henbel, **Musned**, I/268, 273.
[200] Maîde, 5/30-31.

"Fermana ku Xwedê li Nûh kiriye, ya ku ji bo te wehî kiriye, ya ku li Îbrahîm, Mûsa û Îsa emir kiriye ji bo we kiriye rêk û rêbaza vî dînî. Hûn dîn li ser piyan bigirin û hûn tê de nekevin îxtilafê…"[201]

Di suneta Pêxemberê me de jî laşê miriyan tê şûştin, tê kefenkirin û nimêj li ser wan tê kirin. Di vê mijarê de suneta Pêxember (s.a.w) -li gori ayeta jorîn- xwe dispêre û digihîne Pêxemberê ewil.

134. Gelo kurê bavê me Adem, çima definkirina termê birayê xwe ji qijakê hîn bûye?

Pirs: Digel ku Xwedê Teala navê her tiştî fêrî bavê me Adem kiriye û zanebûna wî ya di derbarê tiştan de em îro nikarin xeyal jî bikin. Dema yek ji herdu kurên wî, yê din dikuje, gelo çima definkirina birayê xwe ji qijakê hîn dibe? Û bê hînbûna ji qijakê wan bi xwe, çima ev tişt nizanibû?

Bersiv: Bi rastî bersiv, di pirsa we de veşartiye. Xwedê Teala navê her tiştî hînî Hezretî Adem kiriye, hînî kurên wî nekiriye! Eger ev bûyer bihata serê Hezretî Adem dê bizanibûna dê bi wî laşî çi bikira.

Li gorî ku ji ayetan tê zanîn, dema Qabîl, Habîl dikuje kesek li cem tune bûye. Ji ber vê yekê ji bavê xwe û ji yên wê demê dijiyan, bi dizî birayê xwe dikuje. Lê belê, ji ber ku heta wê demê rewşeke wiha nehatibûye serê wî, nizanibûye dê çi bi laşê birayê xwe bike. Xwedê Teala jî mîna ku di sûreyê Maîde ayeta 31em de ferman dike, bi şandina qijakekê definkirinê fêrî wî dike.

Ayetên bi mijarê re têkildar in wiha ne:

"**Ji wan re xebera rastîn a herdu kurên Adem bixwîne. Dema herduyan qurbanên xwe (ji Xwedê re) pêşkêş kirin. Îcar ji yekî ji wan qurban hate**

[201] Şûra, 42/13.

qebûlkirin û ji yê din jî nehate qebûlkirin. Got: Sond be, ez ê te bikujim. Yê din got: Bêguman Xwedê, tenê ji xweparêzan qebûl dike.

Eger tu destê xwe dirêjî min bikî da ku tu min bikujî ez bi xwe ji bo kuştina te qet destên xwe dirêjî te nakim. Lewra ez ji Xwedê Perwerdegarê alemê ditirsim…

Bêguman ez dixwazim, tu bi gunehê (kuştina) min û bi gunehê xwe vegerî da ku tu bibî ji xelkê êgir û ev e cezayê zaliman.

Vêca dilê wî, kuştina birayê wî jê re xweş kir û birayê xwe kuşt. Êdî ew bû ji yên ku xisar kirine.

Xwedê, qijikek şand ku bi nikil û lingên xwe ax dikola da ku nîşanî wî bide ku ew ê termê birayê xwe çawa veşêre. (Birayê kujer) got: Xwelî li serê min be! Ez nebûm wekî vî qijikî, vêca ku ez cendekê birayê xwe veşêrim. Êdî ew bû ji poşmanbûyan!"[202]

135. Li ser kê nimêja cenaze tê kirin û li ser kê nayê kirin?

Pirs: Ma li ser kê nimêja cenaze tê kirin û li ser kê nayê kirin?

Bersiv: Kesên ku bi misilmanî tên naskirin û li welatê misilmanan jiyana xwe ji dest dabin, eger gunehkar bin jî yan hatibin kuştin û di derbarê dînê wan de tu zanebûn tune be nimêja cenaze li ser wan tê kirin.[203]

Di çavkaniyan de derbas dibe ku Pêxemberê me (s.a.w) li ser miriyên ku gunehên mezin mîna zinayê kirine, nimêja cenaze kiriye.[204]

Xwedê Teala, di derbarê hin munafiqên ku rastî û munafiqiya wan aşkere kiriye, wiha ferman dike:

---

[202] Maîde, 5/27-31.
[203] Bnh: Nasuhi Bilmen, **Büyük İslam İlmihali**, rp. 238, paragraf: 585.
[204] Muslim, Hudûd, 24 (1696).

وَلَا تُصَلِّ عَلَى أَحَدٍ مِنْهُمْ مَاتَ أَبَدًا وَلَا تَقُمْ عَلَى قَبْرِهِ إِنَّهُمْ كَفَرُوا بِاللَّهِ وَرَسُولِهِ وَمَاتُوا وَهُمْ فَاسِقُونَ

"**Tu, li ser çi kesî ji wan -ku bimire- nimêj neke û li ser gora wî jî raneweste. Lewra wan bi Xwedê û Qasidê Wî bawerî neaniye û li ser fasiqiyê mirine**."[205]

Kafirtî, ku mirov Xwedê û Qasidê Wî înkar bike û hesabê wan neke. Ayet, nimêjkirina li ser kesên ku kafir tên zanîn û çûna bi wan re heta ser gorê, qedexe dike.

136. Ma mirov dikare termê miriyên xwe bişewitîne?

Pirs: Di Îslamê de hukmê şewitandina termê miriyan çi ye?

Bersiv: Li gorî dînê me şûştin, kefenkirin û çalkirina cenazeyan ferz e. "Ev kirina han di Qur'ana Pîroz de ji aliyê Xwedê Teala ve bi însan hatiye hînkirin. Behsa kurê Hezretî Adem dema heyirî bê ka wê çi bi termê birayê xwe yê kuştî bike, wiha tê kirin: "**Xwelî li serê min be! Ez nebûm wekî vî qijikî, vêca ku ez cendekê birayê xwe veşêrim. Êdî ew bû ji poşmanbûyan!**"[206] Di hin ayetên din de ne yekser belbî bi rêya îşaretkirinê behsa pêwîstiya veşartina termê miriyan tê kirin.[207] Veşartina termê mirî, ji bo paqijiya derdor, tenduristî, parastina rûmeta însên û ji bo bîranîna mirinê pir hikmetan di xwe de dihewîne."[208]

Di derbarê termê kesê mirî de ji Pêxember (s.a.w) hedîseke wiha tê ragihandin. Hezretî 'Aişeyê (x.j.q) dibêje Pêxember (s.a.w) wiha ferman kiriye:

"*Şikandina hestiyê mirî wekî şikandina yê zindî ye***.**"[209]

[205] Tewbe, 9/84.
[206] Maîde, 5/31.
[207] Taha 20/ 55; Murselat 77/25-26; 'Ebese, 80/21-22.
[208] Mustafa Uzunpostalcı, "Defin", **DİA**, 1994, IX, 86.
[209] Muwetta, Cenaiz, 15; Ebû Dawûd, Cenaiz, 58-60; Îbn Mace, Cenaiz, 63.

Yanî çawa di saxîtiyê de şikandina hestiyê însên, ne caiz e, herwiha yê miriyan jî ne caiz e. Şewitandina termê mirî jî mirov dikare têxe bin vî hukmî û bi vî awayî binirxîne.

137. Gelo çima goştê hin însanên mirî, narize?

Pirs: Di Qur'an û suneta Pêxember (s.a.w) de agahiya ku piştî mirinê dê goştê însanan birize û hestiyên wan bimînin û wê Rebbê me, me wisa vejîne, derbas dibe. Lê belê, tê gotin ku hin kes piştî demekê dema gorî wan tê vekirin, tê dîtin ku laşê wan neriziyaye. Em van agahiyan ji rojnameyan û hwd. dixwînin û dibînin. Bi taybetî jî ev kesên han, ên ku bi hezaran însan li pey wan derin. Gelo dibe ku nerizîbûna laşê wan, nîşana ku ew li ser rêya rast in?

Bersiv: Xwedê Teala wiha ferman dike:

"Me hûn ji axê afirandine û Em ê dîsa we li wê vegerînin û careke din jî (piştî mirinê) Em ê we jê derînin."[210]

Li gorî ayetê însan hemî, di dawiya dawî de dê bibin ax. Rizîbûna laşê însên li gorî hin şert û mercên fizîkî yên curbicur e. Heta vejîn û afirandina ji nû ve, rizîbûna laşê mirov ku bibe ax dê temam bibe. Di navbera rizîbûna laşê însan û başî û nebaşiya wî tu têkilî tune ye. Lewra cesedên Fîrewnan jî ji ber ku hatine mumyakirin neriziyane. Lê belê, beriya ku qiyamet rabe dema şert û merc pêk werin dê ew jî bibin ax.

138. Hukmê nimêja li ser zarokên ku ji ber diya xwe çûne çi ye?

Pirs: Gelo şûştin û nimêjkirina li ser zarokên ku ji ber diya xwe çûne yan jî yên bi mirîtî hatine dinyayê, ferz e yan na?

Bersiv: Eger zarok kêmî çar mehan be û hatibe dinyayê, nayê şûştin û nimêj jî li ser nayê kirin. Belbî dê cawek lê bê pêçandin û bê çalkirin. Di vê mêjarê tu îxtilaf û

[210] Taha, 20/55.

gelemşeyî tune ye. Lê belê eger zarok piştî çar mehan ji ber diya xwe çûbe, di vê meseleyê de du nêrînên cuda hene:

Ya yekem: Eger zarok bi ruh hatibe dinyayê hem tê şûştin û hem jî nimêj li ser tê kirin. Di vê mijarê de yekîtî û tifaq heye. Lê belê di rewşa ku zarok tê dinyayê û tu nîşanên saxbûnê li ser xuya neke li gorî mezhebê Henefî, Îmam Malik, el-Ewzaî û Hesenê Besrî, ev zarok tê şûştin, lê nimêj li ser nayê kirin. Delîla wan jî ev hedîsa li jêr e:

"Dema zarok tê dinyayê eger bigirî (yanî nîşanê saxbûnê lê xuya bike) û piştre bimire, nimêj li ser tê kirin û mirov dibe mîratxwerê wî."[211] wekî ku tê dîtin di vê hedîsê de ji bo nimêja li ser zarok, girî yanî nîşana saxbûnê wekî şert hatiye danîn.[212]

Ya duyem: Tu ferq û cudahî di navbera ku zarok sax an jî mirî were dinyayê tune ye. Di herdu rewşan de jî nimêj li ser tê kirin. Ehmedê kurê Henbel, Se'îdê kurê Cubeyr, Îbn Sîrîn û Îshakê kurê Raheweyh jî di wê nêrînê de ne.

Ew di vê mijarê de piştî çar mehan pufkirina ruh di zikê dayikê de esas digirin. Lewra, piştî ku ruh dikeve bedena cenîn, êdî dibe însanekî tam. Mîna zarokê ku bi saxîtî hatibe dinyayê û miribe, nimêj li ser tê kirin. Xwediyên vê nêrînê, hedîsa ku li jor behsa wê hat kirin "mudterib"[213] dibînin û dibêjin, ew hedîs li dijî hedîsa ku behsa pufkirina ruh dike yanî "muarid"ê wê ye. Ji ber vê yekê dibêjin ku ew hedîs, bi delîltî nayê qebûlkirin.[214]

---

[211] Ebû Dawûd, Cenaiz, 44-45; Nesaî, Cenaiz, 26; Darimî, Feraid, 47.
[212] Seyyid Sabiq, **Fiqhu's-Sunne**, I, 277.
[213] Hedîsa "**mudterib**" hedîsa ku bi çend awayên mîna hev hatibe riwayetkirin û mirov nikaribe yekê li ser yekê tercîh bike û dev ji awayên din berde. Cudahiya di navbera wan awayan de dibe ku ji yekî bi tenê yan jî ji çend rawiyan hatibe riwayetkirin. Ev jî di halê hemî rawiyên ku di zincîra senedê de ne, siqe bin ango bawerî bi wan bê.
[214] Bnh: Seyyid Sabiq, **Fiqhu's-Sunne**, I, 277.

Ev nêrîna dawî, munasibî Qur'anê ye. Lewra, li gorî Qur'anê piştî ku bedena zarok temam dibe û ruh tê pufkirin. êdî ew dibe însanekî tam û kamil. Xwedê Teala wiha ferman dike:

"**Ew Xwedayê ku her tişt bedew çêkiriye û afirandine însên ji heriyê dest pê kiriye. Piştre zuriyeta însên ji dilopek ava lawaz çêkiriye. Piştre dirûv daye însên, ji ruhê ku mexluqê Wî ye pif kiriyê û ji we re guh, çav û dil çêkirine. Hûn Xwedayê xwe çiqas hindik dişêkirînin!**"[215]

Wexta em ayetên Qur'ana Pîroz didin ber hev, em dibînin ku ruh di hefta 16em de dikeve bedena cenîn. Xwedê Teala wiha ferman dike:

"**Me li însan ferman kir ku ji dê û bavê xwe re baş bin. Lewra dayika wî, bi çi zor û zehmetiyan ew di zikê xwe de hilgirtiye. Bişîrvekirina wî jî du salan dewam dike**…"[216]

"**Me li însan ferman kir ku ji dê û bavê xwe re baş bin. Dayika wî bi zehmetî ew hilgirtiye û bi zehmetî ew welidandiye. Hilgirtina wî û bişîrvekirina wî sih mehî dewam dike**…"[217]

Dema şîrdayînê 24 meh in. Ev digel zemanê hilgirtina zarokê di zikê dayikê de ango ku cenîn dibe wekî însanekî kamil bi hev re digihîje sîh mehî. Di vir de ew dema ku behsa wê tê kirin şeş meh in. Zemanê bi hemilbûn/avisiyê ji çil hefteyan hinekî zêdetir e. Ango 282 roj tê qebûlkirin. Şeş meh, ji ber ku dê bi mehên heyvê bên hesabkirin û bi kêmasî mirov sê mehan jê 29 roj hesab bike bi tevahî dike 177 roj. Wexta em van rojan ji 282an derxin, dimîne 105 roj. Ku em wan jî li hefteyan parve bikin, 15 hefte dertê holê. Piştî wê hefta 16em tê. Destpêka şeş mehan hefta 16em ya ku tê de ruh tê pufkirin e.

---

[215] Secde, 32/7-9.
[216] Loqman, 31/14.
[217] Ehqaf, 46/15.

Qur'ana Pîroz pişti wê heftê, navê însan li cenînê dike. Ji ber vê yekê mîna ku di nêrîna duyem de hatibû îfadekirin, pişti vê mehê eger zarok mirî jî hatibe dinyayê mîna însanên din divê ku cenazeyê wî were şûştin û nimêj li ser bê kirin.

139. Ma mêr dikare jina xwe ya mirî bişo?

Pirs: Gelo mêr dikare cenazeyê pîreka xwe ya mirî bişo?

Bersiv: Li gorî Qur'anê dema yek ji hevseran bimire, mêr û jinantî naqede. Lewra pîrek û mêr dibin mîratxwerê hev. Wekî din, em ji ayetên Qur'anê fêr dibin ku dê têkiliya wan a di bihuştê de jî bidome. Xwedê Teala wiha ferman dike:

"Dikevin bihuştên 'Ednê û ji dê û bavên wan, ji jin û kinêsa wan ên qenc jî dikevinê. Firîşte jî ji her dergehî ve diçin ser wan…

Silav li we be! We bi sebra xwe ev xelat heq kiriye. Vêca çi xweş encam e!"[218]

Pêxemberê me (s.a.w) carekê ji diya me Hezretî 'Aişeyê re (x.j.q) wiha gotiye:

"*Eger tu beriya min bimirî, ez ê te bişom û te kefen bikim…*"[219]

Wekî din jî hatiye ragihandin ku dema Hezretî Fatîme (x.j.q) wefat dike, mêrê wê Hezretî Elî kurê Ebû Talib, wê dişû û ji sehabeyan tu îtiraz nehatiye kirin.[220]

Di encamê de çawa ku pîrek dikare cenazeyê mêrê xwe bişo, herwiha mêr jî dikare cenazeyê pîreka xwe bişo.

Li gorî Îmam Şafiî, Îmam Malik û Îmam Ehmed kurê Henbel, mêr dikare cenazeyê pîreka xwe bişo.

Li gorî Henefiyan, dema pîrek dimire nîkah ji holê radibe û jin û mêrantî diqede. Ji vê bonê mêr nikare cenazeyê pîreka xwe bişo. Lê belê, pîrek ji ber ku di

[218] Re'd, 13/23-24.
[219] Ehmed kurê Henbel, **Musned**, VI/228; Îbn Mace, Cenaiz, 9.
[220] Hakim, **el-Mustedrek**, III, 179, jimara hedîsê: 4769.

hundirê ‘iddeyê mirinê de têkiliya wê ya jinantiyê hîn bi dawî nebûye, dikare mêrê xwe bişo.

Henefî, ji bûyera ku Hezretî ‘Elî, Hezretî Fatîme şûştiye re dibêjin ku ew rewşeke taybet e ji bo wan û hedîsa Pêxember (s.a.w) ku ji diya me ‘Aişeyê re (x.j.q) dibêje ez ê te bişom jî bi wateya ku ez ê bi hin kesên din te bidim şûştin, şîrove kirine.[221]

140. Piştî mirina zarokên biçûk, divê mirov çi bike?

Pirs: Piştî mirina zarokên biçûk divê mirov çi bike? Ên balix bin mirov ji bo wan wiha dua dike “Xwedê Teala gunehên wî bibexşîne” û Qur’ana Pîroz dixwîne. Lê belê ji bo yên bê guheh mirov dê çi duayî bike?

Bersiv: Zarokên ku beriya dema balixbûnê miribin, ew bê guneh in û ew ji ehlê bihuştê ne. Ji vê bonê duakirina ji bo bexşandina gunehên wan ne hewce ye.

Encax Îmam Buxarî, di derbarê zarokên mirî yên biçûk de ji Hesenê Besrî yê ku ji pêşengên nesla tabiîyan e, wiha radigihîne:

“Kesê ku li ser cenazeyê yên biçûk (bi îmamtî) nimêjê dike, dê fatîhayê bixwîne. Piştre wiha dua bike:

اَللَّهُمَّ اجْعَلْهُ لَنا فَرَطاً وسَلَفاً وأَجْراً

Xwendina wê: Ellahummec‘alhû lena faratan we selefen we ecran.

“Ya Rebbê me, vî zarokî –di bihuştê de– ji me re bike pêşwazîker, rûmetdar û xelata axretê**.”**[222]

Di nimêja li ser cenazeyê zarokan de ev dua her daîm bûye adet. Vî duayî mirov her dem dikare bike. Ji xeyrî vî, tiştekî pêwîst ku mirov bike tune ye.

[221] Bnh: Serexsî, **el-Mebsût,** II, 71 û piştî wê.
[222] Buxarî, Cenaiz, 65.

141. Hukmê kirina nimêja mirî piştî definkirinê li ser gorê çi ye?

Pirs: Eger li ser mirî nimêja cenaze nehatibe kirin, ma durist e ku mirov piştî definkirinê li ser gorê nimêja wî bike yan na? Tiştekî din, li gorî Şafiîyan hukmê kirina nimêja cenaze bi pêlavê çi ye?

Bersiv: Bi sedemeke ji sedeman eger li ser mirî nimêja cenaze nehatibe kirin û bê nimêj hatibe definkirin, piştre li ser gorê nimêja wî tê kirin. Delîla vî tiştî, ev hedîsên li jêr in:

Ji Ebû Hureyre (x.j.q) hatiye ragihandin: Zilamekî zencî yan jî pîrekeke zencî, mizgeft paqij dikir. Rojekê ji rojan wefat dike. Lê Pêxember (s.a.w) ji mirina wî/wê, agahdar nabe. Rojekê ew zat tê bîra Pêxember (s.a.w) û dipirse: "*Ew însan çi karî dike?*" Sehabeyan gotin: "Ya Qasidê Xwedê! Ew mir." Qasidê Xwedê got: "*Ma ne lazim bû ku we xebera (mirina) wî (wê) bidana min?*" Sehabeyan gotin: Ew wiha wiha bû û behsa hîkaya wî/wê kirin. Rawî dibêje: Sehabeyan bi wan gotinên xwe, ew biçûk û yekî negirîng didîtin. Qasidê Xwedê got: "*Rabin, gora wî nîşanî min bidin*." Piştre çû ser gora wî û li ser nimêj kir.[223]

Ji Se'îd kurê Museyyeb (x.j.q) hatiye ragihandin: Di dema ku Pêxember (s.a.w) ne li Medîneyê bû, diya Se'îd wefat dike. Gava Pêxember (s.a.w) vedigere Medîneyê, digel ku di ser mirina wê re mehek derbas bûbû jî nimêja wê ya cenaze dike.[224]

Bersiva pirsa we ya din: Halil Günenç di derbarê nimêja cenaze bi pêlav, di pirtûka xwe ya bi navê "**Büyük Şafii İlmihali**" van agahiyan dide:

"Ne caiz e ku mirov bi pêlavê nimêja cenaze bike..."[225]

Encax Pêxember (s.a.w) bi pêlavê nimêj kiriye. Lewra wê demê binê mizgefta Pêxember mîna îro bi xaliyan nehatibû raxistin; zemîna mizgeftê ji kevir û axê bû. Ji

[223] Buxarî Cenaiz, 66; Muslim, Cenaiz, 71 (956).
[224] Tirmizî, Cenaiz, 47.
[225] Halil Günenç, **Büyük Şafii İlmihali,** çapa 2yem, Weşanên Hilal, rp. 177.

vê bonê dema mirov li zemîna ji axê nimêj bike, ne pêwîst e ku mirov pêlavên xwe derxe. Mirov dê binêre, ka pêlav paqij e yan na. Eger pîsîyek hebe dê mirov jê bibe û nimêja xwe bike.

142. Ma pîrek jî dikarin beşdarî nimêja cenaze bibin?

Pirs: Pîrek dikarin nimêja mirî, ango nimêja cenaze bikin? Eger ku bikin dê li paş sef bigirin an na?

Bersiv: Pîrek jî mîna mêran dikarin nimêja mirî bikin. **Û tu delîl tune ye ku bibêje jin divê nimêjê li ser mirî nekin**. Li berevajî vê, li gorî delîlên li ber destê me ne, em dizanin ku jinan nimêja miriyan kirine. Di kitêbên Siyerê (Jînenigariya Hezretî Pêxember) de tê rahigandin ku jinan li ser Pêxember (s.a.w) nimêj kirine.

Di pirtûkên fiqhê de hatiye beyankirin ku jin jî mîna mêran dikarin nimêja meyit bikin û li ser vê nêrînê hin ehkam ava kirine. Li gorî vê, dema jin bi mêran re nimêj bikin, wekî nimêjên din pêwîst e ku li herî paş sef bigirin. Ev tişt, muwafiqî sunetê ye. Lê belê ji ber ku nimêja li ser mirî ne wekî nimêjên din e, eger ku pîrek bi mêran re di heman sefê de cih bigirin yan jî li pêşiya wan sef bigirin, ne nimêja mêran û ne jî ya jinan betal dibe.

143. Piştî definkirinê, ma pêwist e ku telqîn jî bê xwendin?

Pirs: Dema mirî tê definkirin, herî dawî mela ango seyda ji gora mirî vediqetin. Min bihîst ku mirî di gorê de ji mirina xwe agahdar dibe û dema dixwaze rabe, serê xwe li kevirê ser gorê dixe û piştî bihîstina dengê ku ji serî tê, îmam ji gorê vediqete. Gelo ev tiştê han rast e?

Bersiv: Tu rastiya vê meseleyê tune ye. Sebebê ku îmam herî dawî ji gorê vediqete, bi sedem "telqîn"a ku herî dawî tê kirin ya di nav gel de meşhûr e û tu esas û bingeh jê re tune ye.

Peyva telqînê bi wateya ku mirov li pêşiya yekî bibêje. Di vir de dixwazin hin agahî û zanînên olî bidin kesê mirî. Lê belê telqîn, ne ji bo kesên mirî, belbî ji bo yên sax an jî yên di ber mirinê de ye. Li gorî ku ji Ebû Se'îd el-Xudrî (x.j.q) hatiye ragihandin, Qasidê Xwedê wiha gotiye:

"*Ji we, kesên ku di ber mirinê de ne, li pêşiya wan gotina la îlahe îllallah bibêjin.*"[226]

Di derheqê piştî definkirinê li ser gorê dê çi bê kirin de hedîseke Pêxember (s.a.w) heye:

Ebû Emr Osman kurê Effan (x.j.q), wiha riwayet dike:

Pêxember (s.a.w) piştî ku miriyek hat definkirin, li ser gora wî sekinî û wiha got:

"*Bexşandina birayê xwe bixwazin û ji bo wî serkeftin û tewfîqê ji Xwedê bizwazin. Lewra niha, pirs jê tê kirin.*"[227]

144. Ma bi rastî jî telqîna li ser miriyan sunet e?

Pirs: Seyda, hin kes dibêjin ku xwendina telqînê li ser miriyan sunet e û dibêjin ku di vê mijarê de delîla me jî heye. Ma bi rastî jî xwendina telqînê li ser miriyan sunet e?

Bersiv: Riwayetên di derbarê telqînê de ne, di çavkaniyên sehîh de derbas nabin û bi sedema ku ev riwayet ji aliyê zanyarên 'ilmê hedîsê ve "zeîf" hatine qebûlkirin, nabin delîl. Ayetên ku mîna delîl hatine nîşandan jî ji siyaq û sîbaqa wê hatine veqetandin.

Xwedê Teala wiha ferman dike:

[226] Muslim, Cenaiz, 1,2.
[227] Ebû Dawûd, Cenaiz, 69.

"**Zindî û mirî jî nabin wekî hev. Bêguman Xwedê, kî bivê bi wî dide bihîstin. Teqez tu nikarî (heqiyê) bi miriyên di goran de bidî sehkirin**."[228]

Kesê di ber mirinê de ye, li gorî bawerî û nebaweriya wî muamele pê re tê kirin. Eger bawermend be, li gorî wê giyanê wî jê tê stendin.[229] Eger kafir be, bi ezab tê stendin.[230] Piştî mirinê, kesên ku xêr û xêratên wan dewam dikin, ên ku beriya mirinê li paş xwe tiştên baş hiştine. Di derbarê wan de Xwedê Teala wiha ferman dike:

"**Bêguman bes Em miriyan vedijînin. Em kar û barên ku wan li pêşiya xwe şandine û berhemên ku li dûv xwe hiştine jî dinivîsin**…"[231]

Li gorî ku ji Ebû Hureyre (x.j.q) hatiye ragihandin, Qasidê Xwedê wiha gotiye:

"*Dema însan bimire, ji van her sê karên wî pê ve, xêrê hemû karên wî tên birîn:*

Sedeqeya cariye, (dema ji bo riza Xwedê Teala hatibe kirin, piştî mirina mirov jî xêra wê dewam dike.)

'Ilmê ku îstifade jê bê dîtin.

Zarokên bi xêr ên ku piştî wî jê re dua bikin."[232]

Li aliyê din Ali Çolak, li ser riwayetên ku bi telqînê ve girêdayî ne, lêkolînek kiriye û ew nirxandine. Di gotara xwe de encama xebatê wiha parve dike:

"… mîna ku tê fêhmê, telqîna ku li ser miriyan tê xwendin, bîd'et e. Riwayeta ku mîna delîlê tê nîşandan, wekî ku Îbn Qeyyim el-Cewzî (w. 1350) di berhema xwe ya bi navê **Zadu'l-Me'ad** de gotiye, ne sehîh e. En-Newewî (w. 676/1277) û hinên din jî ew zeîf dîtine. Es-Sen'anî (w.1182/1768) di berhema xwe ya bi navê **Subulu's-**

[228] Fatir, 35/22.
[229] Waqi'e, 56/90-91.
[230] Fussîlet, 41/30.
[231] Yasîn, 36/12.
[232] Muslim, Wasiyet, 14 (1631). Bnh: Ebû Dawûd, Wesaya, 14; Tirmizî, Ehkam, 36; Nesaî, Wesaya, 8.

Selamê de heman nêrînê parve dike. Di rastiyê de yê ku telqînê dixwîne, bi daxwaza ku bila mirî misilman bibe, dibe mijar ji bo tinazan. Suneta Pêxember (s.a.w) di vê mijarê de ku telqîn ji bo însanên di dema definkirinê hazir in, bê kirin." (rp. 213)[233]

145. Meriv kengî dikare li cihê teziyê xwarinê bixwe?

Pirs: Ma hukmê xwarinê li mala mirî çi ye?

Bersiv: Di dînê me de dema xizm, cîran û dost ji bo te'zî û serdanê diçin mala mirî, tê tewsiyekirin ku bi xwe re ji bo mala teziyê xwarinê bibin, ne ku li wê derê xwarinê bixwin.

Ji Pêxemberê me (s.a.w) wiha hatiye ragihandin:

Ebdullah kurê Cafer (x.j.q) dibêje ku Pêxember (s.a.w) wiha ferman kiriye:

"*Ji malbata Caferî re xwarinê amade bikin. Lewra ew pir mijûl in û derd û karê wan ji serê wan zêde ye*."[234]

Ji ber vê hedîsê fuqehayên Îslamê dibêjin: Di teziyê de amedekirina xwarinê ji bo tezîvanan **mekrûh** e.

Heta ev gotina ku ji Cerîr kurê 'Ebdullah el-Becelli hatiye ragihandin ku mirov bi kûrahî li ser bifikire, pir watedar e:

"Me, kombûna li cem malbata mirî û ew xwarinê amede bikin, bi giriyê li ser mirî bi dengekî biling bi feryad û fîgan,(di gûnehbûnê de) wekî hev didîtin."[235]

---

[233] Ji bo gotarê bnh: Ali Çolak, "Ölmek Üzere Olan Kişiye ve Mezardaki Ölüye Yapılan Telkin ile İlgili Rivayetler", **Çukurova Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Dergisi**, 2004, c. 4, jimar. 2, rp. 201-222.

[234] Ebû Dawûd, Cenaiz, 25-26; Tirmizî, Cenaiz 21; Îbn Mace, Cenaiz, 59; Ehmedê kurê Henbel, **Musned**, VI, 380.

[235] Îbn Mace, Cenaiz, 60.

Lê belê, kesên ji cihên dûr tên û mecbûr dimînin ku li mala mirî şeva xwe derbas bikin, ji aliyê malbata mirî ve ji van kesan re xwarin bê amedekirin li gorî hin aliman **caiz** hatiye dîtin. Bi me jî ya rast ev e.

146. Hukmê beşdarbûna merasîma cenazeyê kesên xeyrimuslim çi ye?

Pirs: Mirov dikare beşdarî merasîma cenazeyê kesên xeyrimuslim bibe yan na?

Bersiv: Mirov dikare beşdarî merasîma cenazeyê yên xeyrimuslim; ji malbat, eqreba, heval û yên derdora xwe bibe, bi vê mebestê biçe kilîse û dêrê û sersaxiya wan bike. Encax ne durist e ku mirov bexşandina wan ji Xwedê Teala bixwaze. Lewra ji bo kesên ku mirov bizanibe teqez li ser kufr û şirkê mirine, ne caiz e ku mirov ji wan re dua û bexşandinê bixwaze. Ev helwest ji ber van ayetên li jêr qedexe ne. Xwedê Teala wiha ferman dike:

"**Tu, li ser çi kesî ji wan -ku bimire- nimêj neke û li ser gora wî jî raneweste. Lewra wan bi Xwedê û Qasidê Wî bawerî neaniye û li ser fasiqiyê mirine**."[236]

"**Ji Pêxember û bawermendan re ne durist e ku ji bo muşrikan lêborînê bixwazin -çendî ew xizmên wan jî bin- piştî ku ji wan re diyar bû ku ew xelkê dojehê ne**."[237]

Eger malbat û hevalên mirov ne misilman bin jî bi şertê

Ji bo dîn û baweriya mirov bi mirov re neyartiyê nekin,

Mirov ji warê mirov dernexin û mirov nekin penaber,

Nebin alîkar ji bo yên ku mirov ji warê mirov der dixin.

Mirov dikare bi wan re dostaniyê pêk bîne û başiyê bi wan bike.[238]

[236] Tewbe, 9/84.
[237] Tewbe, 9/113.

Ên ku van xalan binpê bikin, ne durist e ku mirov bi wan re dostanî û hevaltiyê bike û qenciyê bi wan bike.

147. Ma xêra sûreyê Yasîn û hwd. digihîje ber destê miriyan?

Pirs: Hukmê xwendina sûreyê Yasînê û diyarîkirina xêra wê bi bal ruhê miriyan ve çi ye?

Bersiv: Di derbarê pêdiviya xwendina Qur'anê li ser miriyan an jî gihîştina xêra wê bi bal wan ve, tu ayet an jî hedîs tune ye.

148. Ma di Îslamê de piştî ku mirov dimire îsqata ji bo rojî nimêj û hwd. heye yan na?

Pirs: Li welatê me, dema yek bimire kefaretê rojî û sondên wî tê dayîn. Gelo helwesteke wiha di dînê me çiqas rast e?

Bersiv: Di fiqha Îslamê de ev tetbîqa han bi navê "îsqata nimêjê" û "îsqata rojiyê", meşhûr e. Lê belê hemû delîlên li ber destên me, didin nîşandan ku îsqateke wiha ne pêkan e. Xwedê Teala wiha ferman dike:

"**Ji rizqê ku Me daye we înfaq bikin, beriya ku mirina yekî ji we bê û bibêje: Perwerdegarê min! Xweziya Te mirina min bidaya paş, da min sedeqe bidaya û ez bibûma ji qencîkaran!**

Xwedê, mirina tu kesî bi paş de naxe dema ku mirina wî were. Xwedê bi ya hûn bikin agahdar e."[239]

Dema yek bimire malê ku li pey xwe dihêle, êdî malê mîratxweran e. Bi sedema ku piştî mirina mirî, mal êdî yê mîratxweran e, ji terîkeyê tu xêr li mirî nayê kirin.

---

[238] Mumtehîne, 60/8-9.
[239] Munafîqûn, 63/10-11.

Di ayetekê de Xwedê Teala wiha ferman dike:

"**Hingê her kes dê bizanibe ka çi li pêşiya xwe şandiye û çi li dûv xwe hiştiye**."[240]

Ji Ebû Hureyre (x.j.q) hatiye ragihandin: Zilamek hat cem Qasidê Xwedê û jê pirsî:

"Ey Qasidê Xwedê! (Ji aliyê xêrê ve) kîjan sedeqe herî mezin e?" Qasidê Xwedê wiha bersiv da:

"*Di rewşeke ku tu li ser xwe bî (ne nexweş bî), pir çikûz bî, ji xizaniyê bitirsî û hêviya te di dewlemendiyê de hebe û tu sedeqeyê bidî. (Vi karî) nehêle heta ku ruh bigihîje gewriya te û tu bêjî bila ewqasî bidin filankes û ewqasî bidin bêvan kes. Bi hizir be, (ew mal) ji xwe bûye yê filankes*."[241]

Di Ansîklopediya "Türkiye Diyanet Vakfı İslam Ansiklopedisi" de ev agahî derbas dibe:

"Ev îsqat ji 'îbadetan nimêj, rojî qurban, nezir û kefaret û deynên ku nehatine dayîn, da ku mirov ji van deynan xelas bike, ku mirov fidyê bide feqîran re tê gotin… Di dema Hezretî Pêxember, sehabi, tabiî û etba-êı tabiîyan îsqateke bi vê wateyê tune bûye. 'îbadet û kefaretên bi vî rengî, ji ber ku dikeve bin beşa mafê Xwedê Teala, wekî rêgezê îsqata wê nayê dayîn."[242]

Ji bo kesên ku dixwazin agahiyên berfirehtir bidest bixwin, dikarin li dersa ku di tarîxa 16 Rêbendan a 2010an ya bi sernavê "**mukayeseli fıkıh müzakereleri**" hatiye kirin ji lînka jêr temaşe bikin û heman dersê bi awayê nivîskî li jêrê vîdeoyê bixwînin:

---

[240] Înfîtar, 82/5.

[241] Buxarî, Zekat, 10; Muslim, Zekat, 92 (1032).

[242] Ji bo agahiyên berfirehtir bnh: Ali Bardakoğlu, "Iskat", **DİA**, 1999, XIX, 137-143.

http://www.kurandersi.com/mukayeseli-fikih-muzakereleri/2010/iskat-olen-kimseyi-ibadet-borclarindan-kurtarmak.html

NIMÊJA ÎNÊ

149. Li gorî mezhebê Henefî, îro li Tirkiyê nimêja înê tê kirin an na?

Pirs: Ji bo kirina nimêja înê, gelo destûra xalîfe ango serokê welêt lazim e yan na? Hin kes hene dibêjin ku nimêj bê destûra xelîfe nayê kirin. Gelo rastiya vê meseleyê çi ye?

Bersiv: Di mezhebê Henefî de ji bo ferzbûna nimêja înê, pêwîstî bi hin şert û mercan heye. Ji wan şert û mercan yek jê jî ev e ku: Nimêja înê, divê ji aliyê sultan-desthilatdarê welêt- yan jî yê ku ji teref wî ve hatibe peywirdarkirin, bê kirin. Hin kes bêyî ku li sedemên -gihîştina mezhebê Henefiyan ya di- wê nêrînê de binihêrin û bixwînin, peyva sultan ya ku tê gotin, wekî desthilatdarê welêt fêhm kirine. Di encamê de tê gumankirin ku: Nimêja înê sirf, ya bi rêya îmamtiya sultan an jî bi rêya peywirdarê wî, tê kirin. Bi wê dîtinê û bi hin hincetên din dibêjin ku: Li gorî mezhebê Henefî şert û mercên nimêja înê li cihên mîna dewleta Tirkiyeyê pêk nayê. Mirov dikare vê angaştê bi kurtasî wiha rave bike:

"Tirkiye dewleteke laîk e. Di vê rewşê de îmamtiya serokê dewletê bi xwe ne pêkan e. Nimêja înê, nîşana desthilatdariya Îslamê ye. Lê belê pergala laîk desthilatdariya Îslamê napejirîne. Loma nimêj li pey peywêrdarên wê pergalê jî nayê kirin."

Hin birayên me yên ku ji bicihanîna emrê Xwedê Teala pê ve tu arzû û daxwazên wan tune ne û piraniya wan jî xort in, baweriya wan bi rastiya vê nêrînê çêbûye. Di roja me de hin kes jî derketine meydanê û ji bo desthilatdariya Îslamê, neçûna nimêja înê wekî cîhadê qebûl dikin.

Mezhebê Henefî, tu carî tiştekî wiha qebûl nake. Ên ku bi wan hincet û angaştan derdikevin meydanê, ji ber ku dibin asteng li 'îbadeteke mîna nimêja înê, dikevin bin bar û gunehekî pir giran û mezin. Heta ku ji vê dîtina xwe venegerin, hem gunehê wan û hem gunehê yên ku didin pey wan di stûyê wan de ye.

Di malpera me de di beşa lêkolînan de lêkolîneke me ya bi sernavê "**Hanefi Mezhebine Göre Cuma Namazı/ Li Gorî Mezhebê Henefî Nimêja Înê**" heye. Di wê lêkolînê de hûn dikarin nimêja înê û ayeta wê, gotinên Pêxember (s.a.w) ên bi mijarê re eleqedar in û nêrîna mezhebê Henefî ji çavkaniyên wan ên meşhûr mîna **Mebsût, el-Bedaî', el-Hîdaye** û **Îbn Abîdîn**, bixwînin.

Nivîs di lînka jêr de ye:

http://www.suleymaniyevakfi.org/arastirmalar/hanefi-mezhebine-gore-cuma-namazi.html

150. Ma nimêja înê li ser pîrekan jî ferz e?

Pirs: Gelo nimêja înê li jinan jî ferz e?

Bersiv: Nimêja înê, li berevajî her pênc nimêjên din ên ferz, lazim e ku bi hev re ango bi cem'etî bê kirin. Xwedê Teala di vê nimêjê de bêyî ku ferqê têxe navbera mêr û jinan li ser herduyan jî wekî di ayeta 9an ji sûreyê Cumu'e de derbas dibe, ferz kiriye. Qasidê Xwedê jî (s.a.w) di hatina nimêja înê de tu ferq nexistiye navbera mêr û jinan û ji herdu aliyan re jî ev nimêj meşrû dêra ye. Lê belê çawa uzr û me'zeretên meşrû ji mêran re hene, herwiha ji pîrekan re jî ruxset hatiye dayîn ku başdarî nimêjê nebin.

151. Li gorî mezheban ji bo nimêja înê herî kêm divê çend kes hebin?

Pirs: Li gorî mezhebên Îslamî, ji bo nimêja înê divê çend kes bicivin?

Bersiv: Li gorî mezhebê Henefî, da ku nimêja înê bê kirin, ji bilî îmam herî kêm divê sê kes hebin. Li gorî Îmam Ebû Yûsuf, ji xeyrî îmam ku du kes bi tenê jî hebin, kafî ye.

Nêrîna meşhûr ya mezhebê Şafiî û Henbelî, ji bo nimêja înê divê ku çil kes beşdarî nimêjê bibin.

Di mezhebê Malikî de digel nêrîna ku ji bilî îmam bi duwazdeh kesan nimêja înê tê kirin, lê belê qinyata ku di mezheb de hakim e, ne li gorî jimara cema'etê belbî li gorî nufûsa gundeki biçûk bê tesbîtkirin.[243]

Ayeta ku bi nimêja înê re têkildar e wiha ye:

"**Gelî bawermendan! Gava roja înê ji bo nimêjê hat bagnkirin, vêca bi bal zikrê Xwedê (nimêja înê) ve lez bikin û dev ji kirîn û firotinê berdin. Ha ev, eger hûn bizanin ji bo we çêtir e. Piştî ku nimêj hate kirin vêca li ser erdê belav bibin û ji kerema Xwedê bixwazin. Xwedayê xwe pir bi bîr bînin da ku hûn rizgar bibin**."[244]

Li gorî vê ayet û hedîsên ji Pêxember (s.a.w) hatine ragihandin, da ku nimêja înê bê kirin, jimara herî kêm nehatiye diyarkirin. Lê belê, îfadeya "**dev ji kirîn û firotinê berdin**" ya di Qur'anê de derbas dibe, dide nîşandan ku cihê lîmêja înê lê tê kirin, divê ku cihekî bazar û sûka wê hebe. Û di dema Pêxember (s.a.w) de li cihên biçûk li derdorên Medîneyê nimêja înê nedihate kirin. Ev, dide nîşandan ku li cihên biçûk ên ji bajaran dûr in, bi jimareke hindik nimêja înê nayê kirin. Ji ber vê yêkê ne pêkan e ku mirov jimareke tam bide û bibêje da ku nimêja înê bê kirin pêdivî bi ewqas ceme'et heye.:

Ji bo agahiyên berfirehtir di derbarê nimêja înê de em tewsiye dikin ku hûn nivîsa me ya bi sernavê **"Delillerle Cuma Namazı/Bi Delîlan Nimêja Înê"** ya di lînka jêr de bixwînin:

http://www.suleymaniyevakfi.org/arastirmalar/delillerle-cuma-namazi.html

[243] Hayreddin Karaman, "Cuma", **DİA**, 1993, VIII, 86.
[244] Cumu'e, 62/9-10.

152. Gelo tu hewcedarî bi ezana ku beriya xutba înê tê xwendin heye?

Pirs: Di dema xelîfetiya Hezretî Osman de ji ber ku jimar û nufûsa misilmanên Medineyê zêde bûye, ezaneke din jî bi ser ve kirine. (Buxarî, Cumu'e, 21). Seyda, di roja înê de zêdekirina ezaneke din, gelo ne bîd'et e?

Bersiv: Xwedê Teala wiha ferman dike:

"**Gelî bawermendan! Gava roja înê ji bo nimêjê hat bagnkirin, vêca bi bal zikrê Xwedê (nimêja înê) ve lez bikin û dev ji kirîn û firotinê berdin**."[245]

Hezretî Osman jî (x.j.q) bi banga însanên ku li sûk û bazaran e ji bo nimêjê, fermana Xwedê Teala ya ku di ayetê de derbas bûye, aniye cih.

Ji vê bonê ne pêkan e ku mirov vê helwestê bîd'et bijimêre. Encax di roja me ya îroyîn de ji ber ku bi alîkariya dengweşan banga nimêjê ji her derê ve tê bihîstin, êdî hewceyî bi ezana ku li hundir tê xwendin nemaye. Ji vê saetê pê ve, divê ku mirov dev ji vê pratîk û tetbîqê berde û piştî banga ku dengê wê diçe der ve, dest bi xutbeyê bê kirin.

Ji bo agahiyên berfirehtir di derbarê nimêja înê de em tewsiye dikin ku hûn nivîsa di lînka jêr de bixwînin:

http://www.suleymaniyevakfi.org/arastirmalar/delillerle-cuma-namazi.html

153. Ma nimêja înê çend rek'et e?

Pirs: Gelo piştî nimêja înê tu nimêjên din ên ferz hene? Û tetbîqa Pêxember (s.a.w) çawa bûye?

Bersiv: Di derbarê nimêja înê de Perwerdegarê me wiha ferman dike:

[245] Cumu'e, 62/9.

"…**Piştî ku nimêj hate kirin vêca li ser erdê belav bibin û ji kerema Xwedê bixwazin**."[246]

Ebû Bûrde kurê Ebû Mûsa el-Eş'erî (x.j.q) dibêje ku, 'Ebdullahê kurê 'Umer kurê Xettab (x.j.q) ji min pirsî "Ma, bavê te di derbarê saeta înê de tu tişt ji Pêxember (s.a.w) bihîstiye? Min got "Belê min bihîst wiha digot." Qasidê Xwedê (s.a.w) wiha ferman kir: "*Saeta înê, ji dema ku îmam dertê ser mînberê û heta nimêj xelas bibe***.**"[247]

Piştî ku du rek'et nimêja înê kir, divê mirov yekser belav bibe. Ayeta jorîn jî vê pêdivîyê derdixe pêşiya me. 'Ebdullahê kurê 'Umer (x.j.q) wiha dibêje:

"Pêxember (s.a.w) piştî nimêja înê heta ku ji mizgeftê derdiket tu nimejên din nedikir. Ku ji mizgeftê diqetiya li mala xwe du rek'et dikir."[248] Gotina "li mala xwe" di Muslim de derbas dibe.

Ebdullahê kurê 'Umer (x.j.q) li cihê nimêja înê dît ku însanek du rek'et nimêj dike, ew dehf da û wiha got: Ma tu dixwazî nimêja înê çar rek'etan bikî? 'Ebdullah li malê du rek'et dikir û wiha digot: "Pêxember (s.a.w) wiha dikir."[249]

'Eta di derheqê 'Ebdullahê kurê 'Umer (x.j.q) de wiha gotiye: Eger li Mekkeyê nimêja înê bikira piştî nimêjê pêşde diçû û du rek'et dikir, dîsa pêşde diçû vê carê çar rek'et nimêj dikir. Dema ku li Medineyê bûya, nimêja înê dikir, piştre vedigeriya mala xwe û du rek'et nimêj dikir. Li mizgeftê nedikir û digot Pêxember (s.a.w) wiha dikir.[250]

[246] Cumu'e, 62/10.
[247] Muslim, Cumu'e, 16, Ebû Dawûd, Cumu'e, 1048.
[248] Buxarî, Cumu'e, 39, Muslim Cumu'e, 71.
[249] Ebû Dawûd, Cumu'e, 1127.
[250] Ebû Dawûd, Cumu'e, 1130.

Ji Nafi‘ bi vî awayî hatiye ragihandin: “ ‘Umer kurê Xettab (x.j.q) nimêja beriya înê dirêj dikir. Ya piştî înê jî li mala xwe, du rek‘et dikir. Û digot: Pêxember (s.a.w) wiha dikir.”[251]

Ebû Hureyre (x.j.q) ji Pêxember (s.a.w) wiha radigihîne: “*Her yek ji we, bila piştî nimêja înê çar rek‘et nimêj bike*.”[252]

Ebû Hureyre (x.j.q) ji Pêxember (s.a.w) wiha radigihîne: *“Eger we piştî nimêja înê nimêj kir, çar rek‘etan bikin.*”[253]

Es-Saîb dibêje ku: Me bi Mûawiye re (x.j.q) nimêja înê kir. Piştî selamdayîna îmam, ez rabûm û li heman ciyî min nimêj kir. Mûawiye yek şand ba min û ji min re got ku: “*Careke din wiha neke*.” Piştî ku te nimêj kir beriya tu derkevî der yan jî tu biaxivî, tu nimêjên din neke. Lewra Pêxember (s.a.w) li me wiha ferman kiribû. “*Nedixwest du nimêj, bêyî ku axaftin an jî derketina der têkeve navbera wan, li dûvhev werin kirin*.”[254]

154. Li welatên misilmanan nimêja înê çend qam tên kirin?

Pirs: Ez dixwazim hîn bibim bê ka li welatên Îslamê, nimêja înê çawa tê kirin û çend rek‘et in. Ez projeyekê amade dikim, eger hûn bi min re bibin alîkar, ez ê bextewar bibim. Mîna li Efxanîstan, Azerbeycan, Behreynê jimara rek‘et in nimêja înê…

Bersiv: Bersiva pirsa *li welatên Îslamê nimêja înê çend rek‘et, tê kirin?*

Meriv dikare bi van awayan lêkolîna xwe bike:

Ku mirov bi şexsê li wan welatan mabe,

[251] Ebû Dawûd, Cumu‘e, 1128.
[252] Muslim, Cumu‘e, 67; Ebû Dawûd Cumu‘e 1131.
[253] Muslim, Cumu‘e 68; Ebû Dawûd Cumu‘e, 1131, Tirmizî, Cumu‘e, 523.
[254] Muslim, Cumu‘e, 73; Ebû Dawûd, Cumu‘e, 1128.

Bi yên ku li wan deran mayine re hevdîtinê pêk bîne,

An jî mirov binihêre bê ka li wan welatan kîjan mezheb bêhtir belavbûyî ye.

Li gorî qinyata me ji van her sê rêyan, rêya sêyem bêhtir munasibî we ye. Ji vê bonê em tewsiye dikin ku hûn mada "**Cuma**"yê ya ku di cildê heştem ji Ansîklopediya "**Türkiye Diyanet Vakfı İslam Ansiklopedisi**", bixwînin. Di wir de li gorî mezheban nêrîn û pratîkên cuda di derbarê hikum û mîqdarê nimêjê de hatine nirxandin. Ji wê madê divê hûn tesbît bikin, bê ka di kîjan mezhebî de çend rek'et tê kirin, piştre hûn ê binihêrin, kîjan mezheb li kîjan welatî zêdetir 'emel pê tê kirin û li gorî wê hûn ê hewl bidin ku xwe bigihînin encamekê.

155. Piştî nimêja înê, ma divê ku mirov nimêja nîvro jî bike yan na?

Pirs: Piştî nimêja înê divê ku mirov nimêja nîvro jî bike yan na? Di vê mijarê de hûn dikarin daxuyaniyekê bidin?

Bersiv: Di derbarê kirina nimêja nîvro piştî nimêja înê, Komiteya Bilind ya Karên Dînî (Din İşleri Yüksek Kurulu) ya Dîyanetê, metnekî muzakerê weşandiye. Nêrîna ku em jî beşdar dibin mîna ku li jêr e:

Piştî nimêja Înê nimêja Nîvro

Ev nimêja han ji aliyê hin zanyaran ve li ser îhtimala ku nimêja înê nebûbe û mirov îhtiyaten nimêja wê rojê ya nîvro bike re tê gotin.

Ji ber ku zanyar li ser şertên duristiya nimêja înê ketine îxtilafê û ji ber îhtimala ku nimêja înê nebûbe, çawa ku hin zanyar dibêjin ku divê mirov bike, keza hinên din jî li hember vê nêrînê derketine.

a. Delîlên Kesên Ku Dibêjin Divê mirov Bike

Ên ku pêdiviya kirina vê nimêjê diavêjin holê, ji nuqteya îhtimala dema -li cihekî- li çend mizgeftan nimêja înê bê kirin, ku nimêja înê ne durist e, hereket dikin.

Li gorî wan dema rewşeke zerûrî tune be, li nişte cihekî (bajar) encax li cihekî bi tenê nimêja înê tê kirin. Dema hewceyî tune be û li pir cihan bê kirin, kê zû nimêja înê kiribin, ya wan durist e (sehîh e) û nimêja yên din ne durist e. Di vê rewşê de yên din divê ku nimêja xwe ya nîvro bikin. Dema neyê tesbîtkirin bê ka kê berê nimêja înê kiriye, wekî rêyeke çareserkirinê hatiye dîtin ku îhtiyaten divê hemû nimêja xwe ya nîvro bikin. Di vê nêrîna xwe de bi hinceta ku nimêja înê, da ku însan kom bibin û xutbe were xwendin hatiye teşrîkirin û xwe dispêrên teqbîqa ku di dema Pêxember (s.a.w) û xulefayên raşidîn de ku bi tenê li cihekî dihate kirin.[255]

b. Delîlên Kesên Ku Dibêjın Di Wê Rojê De Nimêja Nîvro Nayê Kirin

Ên ku li hember vê nimêjê derdikevin, ji nuqteya ku 'îbadeta bi guman bê kirin, ne di cih de ye, ji ber vê yekê dibêjin ku divê neyê kirin, hereket dikin. Li gorî van, 'îbadeta bi guman bê kirin ne meqbûl e. Bi vî awayî bi fikra "dibe ku nimêja înê ne sehîh be" mirov nimêja nîvro bike, ne rast e. Li aliyê din, dema mirov bibêje divê nimêja nîvro jî bê kirin, di çavê gel de dê gumana ku nimêja înê ne ferz e yan jî di demekê de du ferz hene, çêbibe. Zanyarên mîna Îbn Nuceym, Elaud-Dîn Haskefî, Cemaleddin el-Qasimî, Mehmet Zihni Efendi û hwd. di vê nêrînê de ne.[256]

Heta birek ji zanyaran, ji fikra ku nimêjeke wiha di dema Pêxember (s.a.w) û sehabeyan de nehatiye kirin, kirina nimêja nîvro di roja înê de bîd'et dihesibînin.[257]

c. Nirxandina Delîlan

Dema mirov delîlên nêrîna aliyên ku dibêjin divê piştî nimêja înê nimêja nîvro jî bê kirin dide ber çavên xwe, tê dîtin ku ne pêwîst e nimêjeke wiha bê kirin. Di dema Pêxember de (s.a.w) ku nimêj bi tenê li cihekî dihate kirin, nake lazimî xwe ku

[255] Xetîb eş-Şirbînî Muhemmedê kurê Ehmed, **Muxnî'l-Muhtac**, I, 544; Newewî, **el-Mecmû'**, IV, 451-452; Sehnûn 'Ebdusselamê kurê Se'îd, **el-Mudewwenetu'l-Kubra**, I, 277-278; Îbn Qudame 'Ebullahê kurê Ehmed, **el-Muxnî**, III, 212; Xereşî Muhemmedê kurê 'Ebdullah, **Şerhû Muxteseri Xelîl**, II, 74-75.
[256] Îbn Nuceym Zeynuddînê kurê Îbrahim, **el-Behru'r-Raiq**, II, 154-155; Îbn Abidîn, **Reddu'l-Muxtar**, I, 536; Cemaluddîn el-Qasimî, **Îslahu'l-Mesacid**, rp. 50; Mehmet Zihni Efendi, **Nimet-i Îslam**, 439-440.
[257] 'Ezimabadî Muhemmedê kurê Emîr 'Elî, **'Ewnü'l-Ma'bûd**, III, 397,406; Reşîd Riza, **Fetawa**, I, 199-200,301-305; III, 941; IV, 1551, 1591; VI, 2521.

nimêj sirf li cihekî bi tenê bê kirin. Li aliyê din nayê ber aqil û hişê însên, sehabiyên ku bi coş û heyecanê li hêviya ayeteke nû ji aliyê Xwedê hatibe şandin û ji devê Qasidê Xwedê bibihîsin, rabin nimêja xwe li cihekî din bikin.

Hemû muctehidên ku dibêjin divê nimêj li cihekî bi tenê were kirin, di halê ku hewceyî hebe, fetwaya kirina nimêjê li çend cihan dane. Lewra Îmam Şafiî dema ku diçe Bexdayê digel ku dibîne li pir cihan nimêja înê tê kirin, li hember wê rewşê derneketiye.[258] Di roja me de ji ber ku êdî li bajarekî ne pêkan e hemû misilman li cihekî bi tenê nimêj bikin, kirina li çend deran êdî bûye tiştekî misoger.

Di 'îbadetan de esl û esas li ser qebûlkirina wan hatiye avakirin. Pêxember (s.a.w) bi vê gotina xwe ya di derheqê Xwedê Teala de "*Ez bi bendeyên xwe re xwe li gorî zen û gumana wan 'emel dikim*."[259] me agahdar dike. Di hedîseke xwe ya din de jî wiha dibêje: "*'Emel li gorî niyetê ne*."[260] Ji ber van tiştan divê mirov bawer bike ku nimêja mirov dê qebûl bibe û di vê de tu car nekeve şek û gumanan.

Li aliyê din, kirina nimêja nîvro di roja înê de ji ber ihtiyatê, tu bingeheke wê ya saxlem tune ye. Lewra îhtiyat ku mirov ji du delîlan ya bi hêz tercîh bike. Hal ew e ku li hember ayet û hedîsên îfade dikin ku nimêja înê ferz e, tu delîlek ku bibêje nimêj li bajarekî encax li cihekî bi tenê tê kirin, tune ye. Gotina kesên dibêjin ku divê li cihekî bi tenê were kirin û îfadeya wan a ku di rewş û halê ku îhtiyac hebe mirov dikare li çend cihan bike, vî tiştî dide nîşandan. Tiştekî din jî heye Xwedê Teala Di Qur'ana Pîroz de wiha ferman dike: "Xwedê her kesî bes li gorî hêza wî, wî binbar dike…"[261]; "…**Di mijara dîn de Wî tu zehmetî li we bar nekiriye**…"[262]

Li aliyê din, di ihtiyatê de divê feydeyek hebe. Hal ew e ku gotina divê piştî nimêja înê nimêja nîvro jî bê kirin, dibe sedemê ku misilman dev ji sunetê piştî

[258] Newewî, **el-Mecmû'**, IV, 452; Şirbînî, **Muxnîl'l-Muhtac**, I, 544.
[259] Muslim, Zikir, 1; Tirmizî, Zuhd, 51.
[260] Buxarî, Bedu'l-Wahy, 1.
[261] Beqere, 2/286.
[262] Hec, 22/78.

nimêja înê berdin. Tê gotin ku piştî nimêja ferz ji sunetê pê ve tu nimêjek din tune ye û şayed bi vî awayî 'emel bê kirin, jimara kesên ku vê sunetê tînin cih dê pir bibe. Îhtiyata esasî ew e ku, Xwedê û Qasidê wî misilman bi çi peywirdar kiribin mirov wan bîne cih û tiştekî din li wan zêde meke.

Encam:

(…)

Biryara ku, mirov li warekî dikare nimêja înê li çend cihan bike, bi vê sedemê ne pêwîst e ku mirov piştî nimêja înê nimêja nîvro bike (…) hatiye girtin.

(Çavkanî: Biryara Lijneya Bilind ya Karûbarên Dîyanetê ya di mêjûya 26.03.2002an de hatiye stendin.)

156. Gelo di kîjan şert û mercan de nimêja înê tê terkkirin?

Pirs: Gelo mirov dikare neçe nimêja înê? An jî di kîjan rewşan de mirov dikare neçe? Mîna mamosteyekî ku dersa wî rastî dema nimêjê, ma dikare dev ji nimêjê berde?

Bersiv: Di derbarê nimêja înê de Xwedê Teala wiha ferman dike:

"**Gelî bawermendan! Gava roja înê ji bo nimêjê hat bagnkirin, vêca bi bal zikrê Xwedê (nimêja înê) ve lez bikin û dev ji kirîn û firotinê berdin. Ha ev, eger hûn bizanin ji bo we çêtir e. Piştî ku nimêj hate kirin vêca li ser erdê belav bibin û ji kerema Xwedê bixwazin. Xwedayê xwe pir bi bîr bînin da ku hûn rizgar bibin**."[263]

Di Qur'ana Pîroz de ji bo tu nimêjan îfadeya "**çêtir e**" derbas nabe. Lewra her pênc nimêj di her şert û mercan de tên kirin lê belê, nimêja înê di hin rewşan de mirov dikare neke. 'Ebdullah kurê 'Ebbas (x.j.q) di rojeke baran de ji muezzin re got

[263] Cumu'e, 62/9-10.

ku dema te bangî nimêjê kir, piştî ku te got "Eşhedû enne Muhemmeden Resulûllah" mebêje "Heyye 'ele's-sela", belbî bibêje: "**nimêja xwe li malên xwe bikin**."

Mîna ku ev rewşa ha li xweşa însanan neçû. Got ku, "Ev tiştê ha yekî ku ji min bi xêrtir (ango Hezretî Pêxember) kiriye." Ji ber ku nimêja înê ferz e, min nexwest ku ez zehmetiyê bidim we. Wê demê hûn ê li ser zemîneke şemetok û bi herî bimeşiyana."[264]

Ji pîrekên Pêxember (s.a.w) diya me Hezretî 'Aişeyê (x.j.q) wiha dibêje: Gel ji malên xwe û derdorên Medîneyê bi nobetê dihatin nimêja înê. Bi tozê dihatin, bi toz û xwelî bûn û xwêdan ji wan diherikî. Dema Pêxember (s.a.w) li cem min bû yek ji wan hat. Pêxember got ku: "*Xweziya ji bo vê rojê we xwe paqij bikira*."[265]

Ev riwayetên han didin nîşandan ku di hin rewşên zerûrî de mirov dikare dev ji nimêja înê berde. Mamostetî jî yek ji wan rewşên zerûrî ye. Di vê rewşê de divê ku nimêja nîvro ya wê rojê were kirin.

157. Ji bo çûna nimêja înê, ma lazim e ku ez ji xwediyê kar destûrê bistînim an na?

Pirs: Di demên kar de bêyî ku ez destûrê ji xwediyê kar bistînim, ez dikarim herim nimêja înê?

Bersiv: Destûrê ji xwediyê kar bistînin û bi dizî nerin nimêja xwe ya înê. Bi wêrekî pêdiviya çûna xwe ya nimêjê qise bikin û mafê xwe di vî warî de biparêzin. Di encamê de digel hemû teşebusê te, eger tu nikaribî destûrê jê bistînî, sirf nimêja xwe ya nîvro bike. Lê belê di heman wextê de ji xwe re li karekî din bigere, da ku tu bikaribî nimêja xwe ya înê bikî.

[264] Buxarî, Cumu'e, 14.
[265] Buxarî, Cumu'e, 15.

158. Ji ber karê pir, ma dibe ez neçim nimêja înê?

Pirs: Di wexta nimêja înê de karê me pir dibe, ji aliyekî ve ez dixwazim herim nimêjê û li aliyê din kar li ber destê me pir e, ka ez çi bikim?

Bersiv: Ayetên Qur'ana Pîroz yên ku ferzbûna nimêja înê bi me didin zanîn wiha ne:

"**Gelî bawermendan! Gava roja înê ji bo nimêjê hat bagnkirin, vêca bi bal zikrê Xwedê (nimêja înê) ve lez bikin û dev ji kirîn û firotinê berdin. Ha ev, eger hûn bizanin ji bo we çêtir e. Piştî ku nimêj hate kirin vêca li ser erdê belav bibin û ji kerema Xwedê bixwazin. Xwedayê xwe pir bi bîr bînin da ku hûn rizgar bibin.**"[266]

Xwedê Teala dema vî emrî li misilmanan dike, dizane ku dê karê wan pir hebe. Lê belê ya muhîm ew e ku, di nav ewqas kar û şixûl de mirov emrê Perwerdegarê xwe bîne cî. Mirov guh bide banga Xwedê Teala û divê ku tu tişt nekeve pêşiya emrê Wî û emrê Qasidê Wî. Pêşanî, her dem ji fermanên Wî re ne. Xwedê Teala di ayetekê de wiha ferman dike:

"**Bibêje: Eger bavên we, kurên we, birayên we, jinên we, eşîra we, malê ku we bi dest xwe xistiye, ticareta ku hûn ji zirarkirina wê ditirsin û xaniyên ku hûn ji wan xweş in, li cem we, ji Xwedê ji qasidê Wî û ji cîhada di rêya wî de şîrîntir û xweştir bin, vêca çavlirê bin heta Xwedê ferman xwe bîne. Xwedê, miletê jirêderketî teqez nayêne ser rêya rast**."[267]

Tiştê layiqî mirovê misilman, ku banga Xwedê Teala vala venegerîne û her gav bi aliyê wê bangê ve baz bide. Lewre, digel hemû kar û baran, Wî fermana "Êdî dev ji bazirganiyê berdin û herin zikrê Xwedê (limêjê)" li we kiriye. Ê ku rizqê we dida û yê ku wê bide jî dîsa Ew e.

---

[266] Cumu'e, 62/9–10.
[267] Tewbe, 9/24.

Dema ezan hat xwendin herin mizgeftê. Ne pêwîst e ku hûn zû yan jî beriya wextê nimêjê herin mizgeftê. Piştî ku nimêj xelas bû yekser bêyî ku hûn tu nimêjên din bikin, vegerin ser karê xwe. wekî ku ji ayetên jorîn tê fêhmkirin tiştê ku Xwedê Teala ji me dixwaze jî ev bi xwe ye. Eger hûn li cihê kar derfeta kirina çar an jî du rek'etê sunet bibînin û bikin baş e û eger hûn nekin jî tu şaşîtî û kêmasî nakeve nimêja we ya înê.

159. Kesê ku nimêja înê nekiribe, ma ew ê nimêja nîvro digel sunetên wê bike?

Pirs: Kesê ku nimêja înê bi sedem uzrekî li rê nekiribe, dema nimêja xwe ya nîvro bike, dê digel sunetan bike?

Bersiv: Eger ji ber sedemeke zarûrî kirina nimêja înê ne pêkan be, divê ku mirov nimêja wê rojê ya nîvro bike. Mîna hemû rewşên din, di vê rewşê de jî mirov di kirin û nekirina sunetan de serbest e. Di kirina wan de dê xêr ji mirov re bê nivîsandin û mirov neke jî tu guneh li ser însên çênabe.

160. Kesê ku di nav nimêja înê de desmêja wî bişikê divê çi bike?

Pirs: Wexta ku xutbe tê xwendin eger desmêja mirov bişikê divê mirov çi bike?

Bersiv: Di wexta nimêja înê de eger desmêja mirov bişikê divê ji nû ve desmêja xwe bigire. Bi tirsa ku wê nimêj li min derbas bibe nikare teyemumê bigire. Eger ji nimêjê bimîne yanî lê derbas bibe bila nimêja xwe ya nîvro bike. Bi kirina nimêja nîvro, êdî tu tişt li ser mirov namîne û ji bin berpirsyariyê derdikeve.

161. Kesê xutba înê dixwîne, ma ne pêwîst e ku li pêşiyê nimêj jî bike?

Pirs: Di nimêja înê de Îmamek xutbeyê dixwîne û yekî din jî meletiya wan a nimêjê dike. Di rewşên normal de gelo ne pêwîst e ku kesê xutbeyê dixwîne di heman demê de meletiya cem'etê jî bike?

Bersiv: Di pratîka Pêxember (s.a.w) û hevalên wî de xwendina xutbeyê û kirina nimêjê ji aliyê heman kesî ve dihate kirin. Lê belê ji ber ku tu hukmekî vê qedexe bike tune ye, mirov nikare bibêje ku pratîka ku îro 'emel pê tê kirin, ne caiz e.

162. Ma roja înê dema xutbe tê xwendin, nimêjên sunet tên kirin?

Pirs: Li gorî mezhebê Henefî, dema ezana hundir tê xwendin an jî Îmam xutbeyê dixwîne, mirovê ku dikeve hundirê mizgeftê, dikare nimêja sunet bike?

Bersiv: Di mezhebê Henefî de di dema xwendina xutbeyê de nimêj nayê kirin. Cemaet di dema xutbeyê de (limêj be jî) divê bi tu tiştî mijûl nebin, bi tenê li xutbeyê guhdarî bikin.

Henefîyan hedîsa li jêr di nêrîna xwe de delîl û esas girtine.

Ji Ebû Hureyre (x.j.q), Pêxember (s.a.w) wiha ferman kiriye:

"*Roja înê dema îmam xutbeyê dixwîne, mirov ji hevalê xwe re bibêje hiş be, wî karekî bê feyde pêk aniye/kiriye*."[268]

Îmam Malik jî di vê meseleyê de weke Henefiyan difikire.

Şafiî û Henbelî dibêjin:

Di wexta xutbeyê de be jî mirov dikare du rek'et nimêja sunet bike. Bi me jî ya rast ev e. Hedîsên bi vê mijarê re tekildar in wiha ne:

Cabir kurê 'Ebdullah (x.j.q) gotiye:

"Pêxember (s.a.w) roja înê dema ku xutbe dixwend, merivek ket hundir. Jê re got; "*Te nimêj kiriye?*" Wî jî got naxêr. Pêxember (s.a.w) got: "*Rabe du rek'et nimêj bike*."[269]

[268] Buxarî, Cumu'e, 36; Muslim, Cumu'e, 11-12.
[269] Buxarî, Cumu'e, 33; Muslim, Cumu'e, 54-58.

Ji Cabir kurê ‘Ebdullah (x.j.q) riwayeteke din wiha ye:

“*Roja înê dema îmam ji bo xutbeyê derketibe û yek ji we têkeve hundir, bila du rek‘et nimêj bike*.”[270]

Dîsa ji Cabir kurê ‘Ebdullah wiha hatiye ragihandin:

“Roja înê dema Pêxember (s.a.w) xutbe dixwend, ji qebîla Xetefan Sûleyq ji nişka ve derket û rûnişt. Pêxember (s.a.w) wiha ferman kir:

“*Sûleyq! Rabe, du reket nimêj bike. Bila bi awayekî caiz û ne dirêj bin*.” Dûvre wiha domand: “*Dema yek ji we roja înê dikeve hundir û îmam xutbeyê dixwîne, bila du rek‘et nimêj bike û bi qasî ku caiz be, kin bike*.”[271]

163. Seqetên ku beşdarî nimêja înê dibin gelo ferza wê ji stûyê wan derdikeve yan na?

Pirs: Ez merivekî bi uzr im. Ez pênc wext nimêja xwe dikim. Ji bo nimêja înê jî bêyî ku ez zehmetiyê bibînim û zehmetiyê bidim arîkarê ku bi min re tê, ez diçim nimêjê. Gelo ji ber ‘uzrê min nimêja înê ji min re dibe nafîle (sunet)? Min ji seydayan bihîstiye ku dibêjin, nimêja înê li ser ên xwedî ‘uzr ne ferz e. Ji vê bonê piştî nimêja înê û çar rek‘etên dawî ez ferza nimêja nîvro û sunetên wê dikim. Gelo bersiva pirsa min çi ye?

Bersiv: Heta ku hûn bikaribin biçin nimêja înê, we ferza wê ji ser xwe rakiriye. Ên ku nimêja înê li ser wan ne ferz e, kesên ku ji ber ‘uzr û sedemeke li rê û rewa, nikaribin biçin nimêjê.

Di pirtûkên fiqhê de tê îfadekirin ku kesên nexweş dema biçin nimêjê bitirsin ku dê nexweşiya wan zêde bibe yan jî dê dereng rihet bibe, nexweşên nav nivînê û

[270] Muslim, Cumu‘e, 57.
[271] Muslim, Cumu‘e, 59.

yên ku lingên wan jêbûne, li ser wan ne ferz e. Lê belê digel wî halê xwe eger hûn biçin û nimêja xwe ya înê bikin, hûn ji nimêja wê rojê ya nîvro xelas dibin.

Ên ku neçin nimêja înê, divê ku nimêja nîvro ya wê rojê bikin.

164. Ma rast e ku pîrek, roja înê nikarin nimêja nîvro bikin?

Pirs: Di roja înê de pîrekan nimêja nîvro nedikirin. Gelo ev agahî rast e yan na?

Bersiv: Naxêr, ne rast e. Kesên ku nikarin nimêja nîvro bikin, ên ku nimêja înê bi cemaetî kirine. Eger pîrek nikaribin herin nimêja înê, divê ku nimêja xwe ya nîvro ya wê rojê bikin. Lê belê yên çûbin nimêja înê, nimêja wê rojê ya nîvro nakin.

165. Ma pîrek roja înê, nimêja xwe ya nîvro kengî dikarin bikin?

Pirs: Roja înê çawa ezan hat xwendin, pîrek li malên xwe nimêja xwe ya nîvro bikin durist e yan na?

Bersiv: Pîrekên ku nikarin herin nimêja înê, bi kirina nimêja nîvro ya wê rojê mukelef in. nimêja nîvro jî piştî ku dema wê hat, mirov dikare bike. Û ne lazim e ku li benda zilaman bin, heta ku ji nimêja înê derkevin.

Lê belê di pirtûkên îlmhalê de agahiyeke wiha derbas dibe:

"Ên xwedî uzur an jî yên di hebsê de ne, roja înê di bajêr de berî nimêja înê yan jî piştî wê ku nimêja xwe ya nîvro bi cemaetî bikin, mekrûh e. Belbî piştî ku nimêja înê hat kirin, nimêja xwe ya nîvro bikin musteheb e. Lewra heta wê demê hêvî heye ku uzrê wan ji holê rabe." (Bilmen, **Büyük İslam İlmihali**)

Li gorî mezheban ji ber ku nimêja înê li ser pîrekan ne ferz e, ew li derveyî vî hukmî dimînin.

ROJÎ

166. Rojî çi ye? Ma hûn dikarin tarîfa wê bikin?

Pirs: Rojî çi ye? Ma hûn dikarin tarîfa wê bikin**?**

Bersiv: Rojî, ku mirov ji spêdeyê heta roj here ava, bi mebesta 'îbadetkirinê nexwe, vemexwe û nekeve têkiliya cinsî.

167. Niyet çi ye?

Pirs: Niyet çi ye?

Bersiv*:* Niyet, ku mirov ji dil û can biryarekê bide û tiştê ku dike bizanibe ka ji bo çi dike. Ji aliyê dînî ve niyet ji "Qerara pêkanîna peywirekê, ji bo bicihanîna fermana Xwedê û bidestxistina riza Wî" pêk tê.

Di 'îbadetan de niyet, şert e.

168. Niyeta rojiya meha Remezanê kengî û çawa tê anîn?

Pirs: Mirov niyeta rojiya meha Remezanê çawa tîne?

Bersiv: Ji bo meha Remezanê, mirov dikare piştî fitarê ji şeva rojiyê heta roja din berî nîvro ango ji nîvro 5-10 deqîqe bimîne, niyeta xwe bîne. Di hundirê vê demê de, gava mirov di dilê xwe de ji bo qayilbûna Xwedê Teala niyeta girtina rojiyê bîne, niyet tê cî. Eger mirov rabe paşîvê, ew jî dibe niyet.

Hûn dikarin bersiveke me ya din bi awayê vîdeoyê ji navnîşana jêr temaşe bikin:

http://www.fetva.net/goruntulu-fetvalar/ramazan-orucuna-ne-zaman-ve-nasil-niyet-edilir-2.html

169. Di rojiya sunet de, herî dereng heta kengî niyet tê anîn?

Pirs: Eger mirov heta dema taştê tiştek nexwaribe, ma dibe ku ger taştê li xweşa mirov biçe mirov bixwe û ger na jî mirov niyeta xwe li rojiyê bîne?

Bersiv: Di derheqê meseleya we de hedîseke wiha heye:

Li gorî ku ji dayika bawermendan 'Aişeyê (x.j.q) hatiye ragihandin, wê wiha gotiye:

"Qasidê Xwedê, rojekê hate cem min û pirsî '*Tiştekî xwarinê li nik me heye?*' Min jî got naxêr tune ye. Wî jî wiha got '*Wê gavê, ez bi rojî me***.'"**[272]

Li gorî vê hedîsê, kesên rojiya nafîle/sunet digirin, piştî dema paşîvê, eger tiştek ji kirinên ku rojiyê betal bikin mîna xwarin, vexwarin û têkiliya cinsî nekiribin, dikarin heta berî nimêja nîvro bi 5-10 deqîqeyan jî niyetê bînin û rojiya xwe bigirin.

170. Ma girtina rojiya meha Remezanê li kê ferz e?

Pirs: Ma girtina rojiya meha Remezanê li kê ferz e?

Bersiv: Li ser her misilmanê ku gihîştibe dema balixbûnê û baqil be, lazim e ku meha remezanê bi rojiyê biborîne. e. Ango rojîgirtina meha remezanê, 'îbadeteke ku li ser wan ferz e.

Hûn dikarin bersivên me yên bi awayê vîdeoyê ji navnîşanên jêr temaşe bikin:

http://www.fetva.net/goruntulu-fetvalar/ramazan-orucu-kimlere-farzdir.html

http://www.fetva.net/goruntulu-fetvalar/ramazan-ayinda-hangi-hallerde-oruc-tutulmayabilir.html

[272] Buxarî, Sewm, 21, 51; Muslim, Siyam, 169 (1154)-170).

171. Hûn dikarin di derheqê çaxa balixbûnê de agahiyê bidin?

Pirs: Gelo hûn dikarin di derheqê dema balixbûnê de agahiyê bidin?

Bersiv: Dema balixbûnê, bo lawan ku îhtilam bibin ango şeytan bi wan bikene û ji bo keçan jî wexta ku êdî xwîna heyzê dibînin. Destpêka çaxa balixbûnê bo keçan neh sal e, bo kuran jî duwazdeh sal e. Herî dawî bo herduyan jî pazdeh sal e. Ango keç û kurên ku gihîştibin pazdeh saliya xwe, êdî ew balix bûne.

172. Gelo hikmetê ferzbûna rojiyê çi ye?

Pirs: Ji bo hikmetê rojiyê, dibêjin da ku "meriv ji halê jar û belengazan fêhm bike". Hûn dikarin hikmetê wê yê di Qur'anê de dibore, diyar bikin? Ango ez bawer im ku divê ewqas ne erzan be. Mebesta Xwedê Teala bi rojiyê gelo çi ye? Ez difikirim ku rojîgirtina ji salê mehekê û şeva qedrê, ne mumkin e ku bi tenê da ku mirov ji halê jar û feqîran fêhm bike, ferz bûbe.

Bersiv: Xwedê Teala di ayeta 183an ji sûreyê Beqere, armanca ferzbûna rojiyê wiha diyar dike:

"**Gelî yên ku bawerî anîne! Rojîgirtin, çawa li ser umetên beriya we hatibû ferzkirin, herwiha li ser we jî hatiye ferzkirin; da ku hûn xwe biparêzin**."[273]

Parastina bingehîn ew e ku mirov xwe ji dojehê biparêze. Ev jî ku mirov nekeve şirkê, pêk tê. Kesê rojiyê digire, digel ku dilê wî dibije tiştan û derfeta wî heye jî fermana Xwedê Teala di ser arezûyên xwe re digire û xwe ji xwarin, vexwarin û têkiliya cinsî dûr digire.

Hûn dikarin nivîseke me ya bi vê yekê re têkildar ji navnîşana jêr bixwînin:

http://www.suleymaniyevakfi.org/arastirmalar/firsatlar-ayi-ramazan.html

[273] Beqere, 2/183.

Digel vê jî rojî tenduristiya mirov diparêze, dike ku qîmetên nîmetan bê zanîn û sebirkêşî û wateya birçîbûnê bi mirov dide fêrkirin û hwd.

Di rojiyê gelek hikmetên din jî hene. Ji bo tesbîtkirina wan, hewcedarî bi xebata digel komeke ji pisporan heye. Lewra hikmetên qedexebûna faîzê tu kes mîna pisporên aboriyê nizane. Ji ber vê yekê, hikmetên rojiyê jî bi xebatên digel kesên ku di qadên bijîşk, civaknasî û psîkoljiyê de pispor in, tên tesbîtkirin. Îro, di dermankirina nexweşiyan de rojî tê bikaranîn û tê vegotin ku gelek encamên balkêş hatine bidestxistin.

173. Ma di rojiyê de rabûna paşîvê pêwîst e?

Pirs: Ji bo rojiyê, ma pêwîst e ku mirov rabe paşîvê?

Bersiv: Rabûna paşîvê, ne ji şertên rojiyê ye. Rabûna wê, tê tewsiyekirin, sunet e û ji aliyê tenduristiyê ve jî gelek bi fayde ye. Lê belê yên ku nikarin rabin û yên ku ranabin jî dikarin rojiyê bigirin. Bi tenê piştî banga sibê/îmsakê tiştekî nexwin û venexwin. Di vê yekê de di navbera rojiya ferz, qeza û sunet de tu ferq û cudahî tune ye. Hatiye ragihandin ku Pêxemberê me (s.a.w) wiha gotiye:

"*Paşivê bixwin. Lewra di paşîvê de bereket heye.*"[274]

Ji ber vê yekê, heta ji dest bê, divê ku mirov vê tewsiya wî bi cî bîne û ji bereketa paşîvê sûd wer bigire.

174. Di rojiyê de divê em riayeta kîjan welatî bikin?

Pirs: Di derbarê rojî û cejnê de pirseke min heye. Ez li derveyî welêt dijîm û li dewleta ku ez lê dimînim, gelek caran meha Remezanê li gorî Tirkiyê û Suûdî 'Erebîstanê rojeke piştre ye. Di rojiyê de ez bêhtir li gorî dewleta Suûdî tev digerim. Lê belê misilmanên li dorhêla min dibêjin ku tu li kîjan welatî bijî, divê tu li gorî wî welatî rojiya xwe bigirî. Carekê meha Remezanê li gorî 'Ereban du roj û li gorî

[274] Buxarî, Sewm, 20; Muslim, Siyam, 45 (1095).

Tirkiyeyê jî rojekê dereng dest pê kir. Niha li vir divê mirov riayeta çi bike? Divê ez riayeta dewleta ku lê dijîm bikim an jî li gorî Suûdî 'Erebîstanê tev bigerim? Ji xeynî vê, îsal dîsa jî dewletên Xelîcê rojekê zû dest bi rojiyê kirine. Divê em çawa bikin?

Bersiv: Welatê ku hûn lê dijîn, eger hûn di bîst û nehê meha Şe'banê de heyvê bibînin, diyar dibe ku sibê meha Remezanê ye û hûn ê rojiyê bigirin. Eger we heyv nedît, hûn ê meha Şe'banê, sî roj hesab bikin û piştre dest bi girtina rojiyê bikin. Herwiha eger hûn di bîst û nehê rojiyê de heyvê bibînin sibê dibe cejn, ji ber vê yekê hûn rojî nagirin. Eger we nedît, hûn ê meha Remezanê sî roj qebûl bikin, rojeke din jî rojî bigirin û piştre cejna xwe bikin.

Salnameya ku li Tirkiyê tê bikaranîn, di vê meseleyê de ya herî rast e. Rastiya wê bi muşahede û çavdêriyê jî tê teyîdkirin. Ev salname, bi mebesta pêkanîna yekîtiyê di tevekê cîhanê de di wextên Remezan û cejnê de ji aliyê lijneya navnetewî ve hatiye amadekirin. Eger hûn riayeta vê bikin, we daye pey ya rast.

175. Gelo rojî heta şevê an jî heta êvarê tê girtin?

Pirs: Di ayeta 187an de ji sûreyê Beqere, bêjeya "leyl" derbas dibe. Ev kelîme di çi wateyê de ye? Ma ev peyv, ne bi wateya "şev"ê ye?

Bersiv: Di zimanê 'Erebî de bêjeya leylê, di van wateyan de tê bikaranîn:

"Yekser piştî rojê. Destpêka şevê, ku roj here ava."[275]

Di Buxarî de riwayeteke ku ji 'Umerê kurê Xettab hatiye ragihandin wiha ye:

Qasidê Xwedê got ku:

"*Kesê bi rojî, gava şev ji vî aliyî ve hat, ro jî ji wî aliyî ve çû û roj çû ava, difitire*."[276]

[275] Îbn Manzûr Cemaluddîn Muhemmedê kurê Mukerrem, **Lisanu'l-Ereb,** "ليل" l-y-l, Beyrût, XI, 607.
[276] Buxarî, Sewm, 43.

Mîna ku di hedîsê de bi awayekî zelal hate dîtin, Pêxemberê me (s.a.w) şev (leyl), ji gava ku roj çûye ava daye destpêkirin.

Hûn dikarin bi vê meseleyê re eleqedar, bersiveke me ya din ji navnîşanên jêr temaşe bikin:

http://www.fetva.net/goruntulu-fetvalar/oruc-aksama-kadar-mi-yoksa-gece-olana-kadar-mi-tutulur.html

http://www.fetva.net/goruntulu-fetvalar/oruc-niye-kuranda-belirtildigi-gibi-gece-olana-kadar-tutulmuyor.html

176. Nexweşên tedawiya kemoterapiyê dibînin, ma lazim e ku rojiyê bigirin?

Pirs: Ma seyansên kemoterapiyê rojiyê betal dike? Nexweşên di vê rewşê de dikarin rojiyê bigirin?

Bersiv: Dermanên ku li ser nexweşên pençeşêrê tên bikaranîn, bi piranî digel hin tiştên din (serûm) tên dayîn. Ji ber vê yekê, ne dermanên kemoterepiyê, belbî serûmên ku digel wê tên bikaranîn, rojiyê betal dikin. Ji bilî vê, kesên ku bi nexweşiya pençeşêrê ne û tedawiya kemoterapiyê dibînin jixwe muqawemeta wan qels e, rojîgirtin dibe ku muqawemeta wan hîn qelstir bike. Ji ber vî sedemî, nexweşên tedawiya kemoterapiyê dibînin dikarin rojiya xwe di rojên pêşde bigirin. Ango rojiya xwe taxîr bikin û piştre bigirin.[277]

177. Nexweşên diyabetê, gelo lazim e ku di meha Remezanê de rojî bigirin?

Pirs: Nexweşên diyabetê, ma pêwîst e ku di meha Remezanê de rojî bigirin?

[277] Bnh: Zeki Bayraktar, "Oruçlu Hastalar İçin Bazı Tıbbi Öneriler", **Kitap ve Hikmet Dergisi**/Kovara Kîtab û Hikmetê, Tîrmeh-Îlon 2015, jimar: 10, rp. 21-22.

Bersiv: Xwedê Teala ruxset daye nexweşan ku dikarin rojiyê negirin. Ji sûreyê Beqere ayetên di vê mijarê de wiha ne:

"**Di çend rojên bijimar de rojiyê bigirin. Di wan rojan de kî ji we nexweş yan jî di rêwîtiyê de be, bila bi qasî wan rojên borî di rojên din de bigire. Ên ku qaweta wan ji rojîgirtinê re heye li ser wan fidyeya xureka jarekî heye. Kî bêhtir bide, ew ji bo wî çêtir e. Eger we bizaniba, rojîgirtin ji were bi xêrtir e. Meha Remezanê, ya ku Qur'an tê de hatiye şandin ayetên wê ji mirovan re rêber in û ji bo veqetandina heq ji batilî delîlên eşkere ne. Êdî kî ku ji we gihîşt vê mehê bila tê de rojî bigire. Çi kesê ku nexweş yan jî rêwî be û rojî negirtibe bila di rojên din de bi qasî wan rojên ku rojî negirtiye, bigire. Xwedê ji bo we rihetiyê dixwaze, zehmetiyê naxwaze. Ev, da ku hûn rojên rojiyê bêkêmasî bigirin û ji bo ku hûn rasterê kirine hûn Wî mezin bidêrin û da ku hûn bişêkirînin**."[278]

Kesên niyet li rojiyê bînin û piştre nexweş bikevin jî dikarin rojiya xwe xera bikin.

Dema nexweş baş bibin, divê rojiya xwe qeza bikin. Ger baş nebin jî tu tiştekî ku bikin tune ye.

Ji kerema xwe re li nivîsa di navnîşana jêr de binihêrin:

http://www.fetva.net/goruntulu-fetvalar/insulin-kullanmak-orucu-bozar-mi.html

178. Nexweşiya min a mîdê heye. Ma dibe ku ez rojiyê negirim?

Pirs: Ez nexweşê refluyê me. Divê ez rojiyê negirim, lewra di rojê de ez sê dermanan dixwim. Lê dîsa jî dixwazim biceribînim. Di vê rewşê de ma ez neheqiyê li xwe dikim? An jî divê ez kefareta xwe bidim? Ma nexweşiya min dibe mazeret?

[278] Beqere, 2/184-185.

Bersiv: Xwedê Teala ragihandiye ku kesên nexweş û yên ku dema rojiyê bigirin dê nexweşiya wan girantir bibe, dikarin negirin, lê belê eger bigirin ji wan re hîn bi xêrtir e.

http://www.fetva.net/goruntulu-fetvalar/hasta-veya-yolcu-oldugu-icin-oruc-tutamayanlar-ne-yapmali.html

Nexweş û rêwiyên ku rojiyê nagirin, divê piştre bi qasî rojên ku negirtine rojî bigirin. Eger derfeta ku rojiyê bigirin nebînin û bimirin, tu mesûliyet li ser wan tune ye. Kesên wiha, kefaret/fidyê jî nadin.

179. Nexweşên şekir, tansiyon, migren û hwd. ma divê ku rojiyê bigirin?

Pirs: Ma nexweşên şekir, tansiyon û migrenê dê rojiyê bigirin? Wekî mînak ez nexweşê tansiyonê me û îlacên ku divê sibê-êvarê bixwim hene. Hûn tewsiya çi li min dikin?

Bersiv: Xwedê Teala di ayeta 184an ji sûreyê Beqere ragihandiye ku kesên nexweş, dikarin rojiyê negirin. Û divê piştre bi qasî rojên ku negirtine rojî bigirin. Lê belê dayîna fidyeyê/kefaret ji dêvla rojiyê, ne durist e. Nexweş, eger derfeta ku rojiyê bigirin nebînin û bimirin, tu mesûliyet li ser wan tune ye. Herwiha ayet diyar dike ku rojîgirtin ji bo kesên nexweş bi xêrtir e.

180. Kesên ku êşa serî dikişînin gelo dikarin rojiyê bigirin?

Pirs: Nexweşên migrenê yên ji ber ku birçî dimînin êşeke giran dikeve serê wan, gelo dikarin rojiyê bigirin?

Bersiv: Dibe ku birçîbûn bandorê li êşa migrenê bike. Di vê rewşê de eger tedbîr têr nekin, mirov dikare rojiyê paşde bide. Lewra nexweşî, ruxsetek e ji bo taxîrkirina rojiyê. Lê belê ev heye, ji ber ku nexweşiya migrenê kronik e ango berwedam e, ev nexweş, dibe ku piştî rojiyê jî nikaribin rojî bigirin. Ji ber vê yekê, bi şertê ku dermanê xwe jî bikar bînin eger girtina rojiyê mumkin be, divê vê rêyê

hilbijêrin. Eger ev jî nebe rêya çareseriyê (ango rojî, digel îlacan jî bandorê li migrenê bike), wê gavê dikarin rojiyê negirin.[279]

181. Ma rojîgirtina nexweşên ku tedawiyê dibînin mehzûr e?

Pirs: Keça min nexweşa tuberkuloz a hestiyan e û niha tedawiyê dibîne. Gelo di rojîgirtina wê de tu mehzûrek heye?

Bersiv: Em nikarin biryar bidin bê ka keça te dikare rojiyê bigire yan na. Belbî bijîşkên ku tedawiya wê birêve dibin, dê biryara vê yekê bidin. Lê belê li gorî ku niha tedawiyê dibîne, destûr û ruxseta ku rojiyê negire heye. Dikare vê ruxsetê bikar bîne û rojiya xwe negire. Gava tedawiya wê kuta bû jî divê ku bi qasî rojên ku negirtiye rojiyê bigire.

182. Ma hebên bin zimên digihîjin mîdeyê û rojiyê dişikînin?

Pirs: Ma hebên bin zimên digihîjin mîdeyê û rojiyê betal dikin?

Bersiv: Hebên bin zimên (sublingual) nagihîjin mîdeyê. Mîna ku ji nav jî diyar e heb, di bin zimên de dihele û di hundirê dev de tê mêtin. Bi vî awayî tevlihevbûna wê bi xwînê re (û bandora wê) li gorî dermanên din hîn zûtir xuya dike. Ango ev derman rojiyê naşikîne.[280]

183. Erbabê pîşeyên giran dê çawa rojiyê bigirin?

Pirs: Ji ber ku xwediyên pîşeyên mîna agirkujî, bijîşkî û hwd. divê mesaiyeke giran bixebitin, ger rojiyê bigirin dê nikaribin erka xwe bi rêk û pêk bi cî bînin. Kesên wiha divê di meha Remezanê de çi bikin?

Bersiv: Ji bo kesê sax û saxlem (ji bilî rewşên hindik tê dîtin û gelek taybet) tu rewşeke bibe asteng ku mirov van pîşeyan bi rojiyê derbas bike tune ye. Ji ber ku erbabê van pîşeyan di şert û mercên normal de jî (mîna nobet û hwd.) mesaiyeke

[279] Bhn**:** Bayraktar, "Oruçlu Hastalar İçin Bazı Tıbbi Öneriler", rp. 19.
[280] Bhn: Bayraktar, "Oruçlu Hastalar İçin Bazı Tıbbi Öneriler", rp. 21.

giran dikin, jixwe bi sedem pîşeyê xwe hînî van şertan bûne. Lê eger nexweş bin, ruxset û destûra ku ji her kesî re heye wê gavê ji wan re jî heye û ji ber nesaxî û nexweşiyê dikarin rojiyê negirin.[281]

[281] Bayraktar, "Oruçlu Hastalar İçin Bazı Tıbbi Öneriler", rp. 21.

FITRE

184. Gelo sedeqeya fitrê li kê dikeve?

Pirs: Divê kî sedeqeya fitrê bide?

Bersiv: Kesê ku di meha Remezanê de karibe rojiyê bigire -girtibe- çi dewlemend çi jî feqîr dibe, divê ku sedeqeya xwe ya fitreyê bide. Nîsab, dewlemendîtî û hin şertên din ên ku ji bo ferzbûna zekatê pêwîst in, di sedeqeya fitreyê de ne hewce ne. Ango kesên ku sedeqeya fitreyê li wan diçe jî divê ku bidin. Bi saya vê, dê her bawermend bi alîkariya birayên xwe yên hewcedar bextewar û dilşad bibe.

Ango kesên ku sedeqeya fitreyê li wan diçe jî divê ku bidin. Her mirovê misilman divê ku miskînekî ji miskînên (jarên) derdora xwe têr bike. Di sedeqeya fitreyê de dayîna genim, ceh, mewîj û xurmeyan ne şert e. Belbî dayîna diravan jî çêdibe.

185. Ma rêwî û nexweşên ku nikarin rojiyê bigirin jî dê fitrên xwe bidin?

Pirs: Hûn dibêjin ku kesên dikarin rojiyê bigirin divê sedeqeya fitreyê bidin. Di vê rewşê de rêwî û nexweşên ku ruxseta negirtina rojiyê bo wan heye, gelo dê sedeqeya fitreyê bidin an na?

Bersiv: Kesên rêwî û nexweş jî ji rojîgirtinê berpirsyar in. Ango girtina rojiyê li ser wan jî ferz e, lê belê ji ber uzrê wan ruxseta negirtina rojiyê bo wan hatiye dayîn. Lewra ji sûreyê Beqere di dawiya ayeta ku ruxseta fitariyê dide wan, wiha derbas dibe: "**Eger we bizaniba, rojîgirtin ji were bi xêrtir e**"[282]. Ji ber vê yekê sedeqeya fitreyê li ser wan jî ferz e.

[282] Beqere, 2/184.

186. Gelo ez dikarim fitreya xwe bidim xwişka xwe?

Pirs: Ez zewicandî me. Dê û bavê min li heyatê ne. Xwişkeke min ya ezeb heye. Gelo ez dikarim fitreya xwe bidim xwişka xwe?

Bersiv: Ji aliyê dînî ve, mirov dikare zekat û fitreya xwe bide xwişk û birayên xwe yên jar û feqîr. Çi ezeb dibin çi jî zewicandî. Heta eqrebayên ku zekat li wan diçe ger mirov zekat û fitreya xwe bide wan hîn çêtir e. Ew jî di serî de divê mirov bide xwişk û birayên xwe yên hewcedar, piştre ap, met, xal ji eqrebayên nêz, cîran û hwd.

187. Alîkariyên ku beriya meha Remezanê hatine kirin, gelo dikevin şûna fitrê?

Pirs: Beriya meha Remezanê min ji xwarziyê xwe re cil û berg kirîn. Min ev bi mebesta fitreyê kirî. Gelo ev kirîna min, dikeve şûna fitrê?

Bersiv: Fitre, têrkirina jarekî ye li ser kesê ku di meha Remezanê de hêza wî ya girtina rojiyê hebe. Ji ber ku heta meha Remezanê neqede ev rewş dernakeve holê, beriya vê mehê jî hûn nikarin fitreyê bidin.

Cil û bergên ku we kirîne nakeve şûna fitrê, lê belê ew ji we re dibe sedeqe.

188. Ma sedeqeya fitreyê piştî meha Remezanê jî tê dayîn?

Pirs: Gelo mirov dikare sedeqeya fitreyê piştî meha Remezanê bide? Û di dema dayînê de pêwîst e mirov diyar bike ku ev sedeqeya fitreyê ye? Ango mirov sirf niyet bike kafî ye?

Bersiv: Li gorî hedîsên ku ji Cenabê Pêxember (s.a.w) hatine ragihandin, divê sedeqeya fitreyê berî nimêja cejnê bê dayîn. Sedeqeya ku piştî vê demê tê dayîn, êdî ne sedeqeya fitreyê ye, belbî dibe wekî xêr û xêratên ku her wext tên dayîn. Hedîsa ku bi vê mijarê têkildar e wiha ye:

"*Kesê ku sedeqeya fitra xwe berî nimêja cejnê bide, ew zekatek meqbûl û pejirandî ye. Ê ku piştî nimêjê bide, ew dibe sedeqeyek ji sedeqeyan*."[283]

Ji bo kesê ku zekat an jî sedeqeya fitreyê dide, niyetanîna bi dil kafî ye. Yanî ne hewce ye ku di dema dayînê de bibêje: "Ev fitreya min **e**". Li aliyê din, kesê qebûl dike jî ne lazim e ku bizanibe bê ka ew çi mal e û ji bo çi digire.

189. Dema em fitreyê derdixin, divê em wê çawa hesab bikin?

Pirs: Ez li Elmanyayê dijîm. Dema ez fitreyê bidim, ez çawa hesab bikim? Ango divê ez çiqas fitre bidim?

Bersiv: Di fitreyê de esas, kesên li derdora we ne ji jar û feqîran. Xwarina wan a rojekê hesab bikin û li gorî wê fitreya xwe derxin. Ango li Elmanyayê li herêma ku hûn lê dijîn, mirovekî ku neçar –bê derfet û îmkan- mabe bi çiqasî ji xwarinê têr dibe, wê hesab bikin. Hesabê ku derket holê sînorê herî jêr e, hûn jî di ser wî sînorî de li gorî derfeta xwe, çiqasî bixwazin hûn dikarin bidin.

190. Ma mirov dikare fitreya xwe bide weqf û komeleyên ku xizmetên olî dikin?

Pirs: Gelo em dikarin fitreyên xwe bidin weqf û komeleyên ku xizmetên olî dikin, da ku ew jî hewcedariyên xwe pêk bînin?

Bersiv: Xwedê Teala wiha ferman dike.

"**Di rojên bi jimar de…Di wan rojan de kî ji we nexweş yan jî di rêwîtiyê de be bila bi qasî jimara wan rojên borî di rojên din de bigire. Yên ku qaweta wan ji rojîgirtinê re heye li ser wan fidyeya xureka jarekî heye. Kî bêhtir bide, ew ji bo wî çêtir e. Eger we bizaniba, rojîgirtin ji were bi xêrtir e.**"[284]

[283] Ebû Dawûd, Zekat, 18.
[284] Beqere, 2/184.

Ji Qasidê Xwedê Teala jî di vê babetê de wiha hatiye ragihandin: "**Qasidê Xwedê fitre ferz kiriye, da ku yê rojî digire ji kirinên nexweş û kirêt paqij bike û da ku ji yên hewcedar re jî bibe pariyek xwarin**."[285]

Sedeqeya fitrê, mîna ku di ayet û hedîsê bi awayekî zelal tê dîtin, xwarina bi qasî "têrkirina jarekî" ye. Ji vî aliyî ve, ne munasib e ku mirov fitreya xwe bide weqf û komeleyan, da ku hewcedariyên xwe pêk bînin. Belbî, divê bi xwe ji jar û miskînan re bê dayîn. Encax ew weqf û komele, eger firteyên ku kom dikin ji dêvla ku di hewcedariyên xwe de xerc bikin, bigihînin kesên feqîr û miskîn, wê demê hûn dikarin fitreyên xwe bidin wan.

191. Ma divê em sedeqeya fitreyê li çend kesan belav bikin?

Pirs: Sedeqeya fitreyê ya ku em di meha Remezanê de didin, gelo em dikarin li sê-çar feqîran belav bikin?

Bersiv: Xwedê Teala di derbarê sedeqeya fitreyê di Qur'ana pîroz de wiha ferman dike:

"…Di wan rojan de kî ji we nexweş yan jî di rêwîtiyê de be bila bi qasî jimara wan rojên borî di rojên din de bigire. Yên ku qaweta wan ji rojîgirtinê re heye li ser wan fidyeya xureka jarekî heye. Kî bêhtir bide, ew ji bo wî çêtir e. Eger we bizaniba, rojî girtin ji were bi xêrtir e."[286]

Tiştê ku di Qur'ana Pîroz de hatiye fermankirin, "**têrkirina miskînekî (jarekî) ye**." Eger sedeqeya fitreyê li çend kesan were parvekirin, tu kes ji wan têr naxwe. Lewra wekî ku derbas bû, miqdarê wê "**têrkirina miskînekî**" ye. Ji ber vê yekê divê mirov sedeqeya xwe nede çend kesan, belbî bide yekî bi tenê.

[285] Ebû Dawûd, Zekat, 17; Îbn Mace, Zekat, 21.
[286] Beqere, 2/184.

192. Ma sedeqeya fitreyê divê ku ji cinsê xwarinan bê dayîn?

Pirs: Di serdema Qasidê Xwedê Teala de digel ku di wê demê de dirav jî hebûne sedeqeya fitrê; ji ceh, genim xurme û hwd. ji cureyê xwarinan dihate dayîn. Gelo Pêxemberê me (s.a.w) çima negotiye ku "bedêla van xwarinan jî tê dayîn." Tiştê ku dixwazim bipirsim, gelo di roja me de jî divê ku mirov sedeqeya fitreyê ji cureyê xwarinan bide? Eger em bedêla wê bi diravî bidin dibe?

Bersiv: Di mijara sedeqeya fitreyê de di ayeta 184an ji sûreyê Beqere "**têrkirina miskînekî (jarekî)**" derbas dibe. Mîna ku mirov dikare bi dayîna xwarinê -têrkirina jarekî- erka xwe bîne cih, herwiha mirov bi dayîna bedêla wê jî -da ku kesê jar ji xwe re xwarinê bidest bixe-, erka xwe bîne cih.

Di hedîsên Cenabê Pêxember de (s.a.w) pîvana sedeqeya fitrê, sa'ek (pîvanek ku di dewra Pêxember de dihate bikaranîn û nêzî 3 kîloyan e) ji genim, ceh, mewîj/tirî û xurmeyan hatiye diyarkirin. Diyarkirina sedeqeya fitreyê bi van celeban, ji ber şert û mercên aborî û bi sedem xwedîbûna civakê ya wê demê bûye. Li gorî vê, her kesê misilman ji xwarinên ku li derdora wî pir tên xwarin, dikare sedeqeya xwe ya fitreyê bide.

193. Ma fitre bi rêya wekaletê tê dayîn?

Pirs: Em difikirin ku fitreya xwe bidin feqîrên welatê xwe. Lê belê, herî zû roja yekem ji cejnê em dikarin biçin welêt. Eger li welêt wekîlek ji dêvla me fitreya me bide û em jî roja cejnê pereyê wî bidinê, gelo durist e? An jî em dikarin roja cejnê fitreya xwe bidin? Kîjan ji wan çêtir e?

Bersiv: Fitre, herî dereng divê heta dema nimêja cejnê bê dayîn. Herçiqas hedîsên di vî warî de îfade bikin ku baş e di roja yekem ji cejnê di navbera nimêja sibehê û nimêja cejnê bê dayîn, ji ber ku zûdayîn di lehê muhtac û neçaran de ye fuqehayan/zanyaran gotina ku beriya cejnê bi çend rojan jî tê dayîn.

Lê belê, hûn dikarin fitreya xwe bi rêya wekaletê bidin. Li gorî vê, kesê ku bûye wekîlê we, di dema wê de ji dêvla we dê fitreya we bide feqîran, piştre hûn ê jî bidin wî.

194. Ma kesên bi meaşê memûrtiyê debara xwe dikin, dikarin fitreyê bigirin?

Pirs: Ez memûr im. Mehane jî nêzî 1.800i distînim. Lê belê di halê hazir de di destê min de mîqdarê nîsabê pere tune ye. Ma divê ez fitreya xwe bidim? Eger ne hewce be ku ez derxim, gelo ez dikarim bigirim?

Bersiv: Kesê ku di meha Remezanê de karibe rojiyê bigire -girtibe- çi dewlemend û çi jî feqîr dibe, divê sedeqeya xwe ya fitreyê bide. Nîsab, dewlemendîtî û hin şertên din ên ku ji bo ferzbûna zekatê pêwîst in, di sedeqeya fitreyê de ne hewce ne. Kesên ku sedeqeya fitreyê li wan diçe jî divê bidin.

Fitre li kesên muhtac û neçar diçe. Da ku mirov bikaribe zekatê yan jî fitreyê bigire divê mirov miskîn be. Ango mirov bê kar be yan jî malekî ku têra debara mirov bike tune be. Li gorî agahiyên ku we dan, ji ber ku kara we baş e, hûn nikarin fitreyê bigirin.

HEC Û ‘UMRE

195. Ma mirov niyeta hecê çawa tîne?

Pirs: Gelo mirov niyeta hecê çawa tîne?

Bersiv: Kesê sirf bo hecê yanî heca îfradê niyetê bîne, dê bibêje: “Xwedayê min! Ez dixwazim hecê bikim. Wê ji min re hêsan bike û ji min qebûl bike.”

Ji bo heca qîranê jî dê wiha niyetê bîne: “Xwedayê min! Ez dixwazim hec û ‘umreyê bikim. Wan ji min re hêsan bike û ji min qebûl bike.”

Kesê bixwaze ku heca temettu‘ê bike, di mewsimê hecê de dê bo ‘umreyê niyeta xwe bîne. Piştî ku ‘umreya xwe temam kir di mewsimê heman salî de mîna heca îfradê dê bi tenê bo hecê niyeta xwe bîne û îhrama xwe girê bide.

Kesê sirf bo ‘umreyê niyet tîne jî dê wiha bibêje: “Xwedayê min! Ez dixwazim ‘umreyê bikim. Wê ji min re hêsan bike û ji min qebûl bike.”

196. Kesê ku niyeta hecê kiribe, lê derfeta çûnê nedîtibe?

Pirs: misilmanê ku bo çûna hecê niyet û hemû amadekariyên xwe kiribe, lê di dema birêketinê de nexweş bikeve û neçe hecê yan jî di rêya hecê wefat bike, gelo ev însan dibe hecî, ango ev hewldana wî jê re dibe hec?

Bersiv: Naxêr ev nakeve şûna hecê. Lewra ji bo ku mirov bibe hecî divê mirov di demeke diyar de li cihekî diyar û hin menasik û ‘îbadetên diyar, bike. Lê, Xwedê Teala, dê wî kesê han ji ber vê niyet û hewldana wî, xelat bike.

197. Ger misilman di rewşeke zor de bin, ma raste ku mirov bo çûna hecê pereyan kom bike?

Pirs: Di rewşa ku misilmanên cîhanê birçî ne û Filistîn di halekî perîşan de ye, ma çiqas rast e ku mirov ji bo çûna hecê pereyan bide ser hev?

Bersiv: Tayînkirina pêşanî yan jî paşênî di navbera fermanên Xwedê Teala de ne karê misilmanan e. Kesê misilman hem ji çûna hecê hem jî li hemberî peywirên xwe yên din berpirsyar e. Ji bo bicihanîna 'îbadetekê, ne lazim e ku mirov dev ji yeke din berde. Ji vê bonê di roja me de kesê misilman divê hem pereyan bide ser hev da ku bikaribe biçe hecê, hem jî divê alîkariya misilmanên din bike.

198. Di edakirina hecê de mirov neçe Cebelu'r-Rehme û çiyayê Hîrayê

Pirs: Kesê ferza xwe ya hecê pêk anîbe, dema bi sedemên curbicur nikaribe ku biçe Cebelu'r-Rehmeyê yê ku li 'Erefeyê ye û çiyayê Hîrayê yê ku li nêzî Mekkeyê ye, gelo ev dibe kêmasî û noqsanî bo heca wî?

Bersiv: Naxêr, ev nabe kêmasî bo heca meriv.

199. Meriv bi qesabî here hecê?

Pirs: Ez ê bi qesabî biçim hecê. Li gorî ku ji me re hatiye gotin, nîvê qesaban ji saet 6ê sibehê heta dudoyê nîvro, ên din jî piştî dudoyê nîvro dê dest bi kar bikin. Qesabên ku dê ji saet 6an heta 2an kar bikin, çi li Muzdelîfeyê be çi jî di mesela recma şeytên de -roja cejnê ya yekem-, dê hin pirsgirêk derkevin pêşiya wan. Li gorî mezhebê Henefî, divê mirov çawa tev bigere?

Bersiv: Qesabên ku dê ji 6an heta 2an bixebitin, piştî ku weqfeya xwe ya Muzdelîfeyê kirin dê yekser biçin selexana Mînayê û dest bi karê xwe bikin. Ev kesên han îhramên xwe ji xwe nakin û heta saet 2an dê qurbanan serjê bikin. Piştre dê recma şeytên bikin, piştre dê qurbana xwe jî serjê bikin, serê xwe biqusînin û ji îhramên xwe derên. Di serjêkirina qurbanên kesên din di wexta îhramê de tu mehzûrek tune ye.

Karkirina bi îhraman eger bibe sebebê ku qesab nikaribin tam bixebitin û destûr neyê dayîn ku bi îhraman bişixulin, vê carê ev qesabên han dibin xwedî uzur, li benda nimêja sibehê nasekinin û ji Muzdelîfeyê yekser dê dakevin Mînayê. Piştî

nimêja sibehê dê derkevin Mînayê recma şeytên bikin, porê xwe biqusînin û ji îhraman derkevin. Bi vî awayî dê bikaribin berî saet 6an dest bi karê xwe bikin. Li gorî mezhebê Henefî kesê ku bi sedem uzrekî wacibên hecê terk bike, mîna weqfeya Muzdelîfeyê, tu tiştek lê nakeve.

200. Ya baş ku mirov gelek caran biçe hecê yan jî wî pereyî înfaq bike?

Pirs: Kesê carekê hec û 'umreya xwe kiribe, gelo careke din ku biçe hec û 'umreyê jê re bi xêrtir e yan jî ku wî pereyî bide feqîr û belengazan?

Bersiv: Ji aliyê şexsî ve, çûna hec û 'umreyê baştir e. Lewra kesê ku hec û 'umreyê dike hem wî pereyî di riza Xwedê Teala xerc dike hem jî wextê xwe bi wê 'îbadetê re derbas dike.

201. Kesê nikaribe li Muzdelîfeyê bisekine ma divê çi bike?

Pirs: Kesê hecî dema ji ber sedemeke ku ne di dest de ye nikaribe weqfeya Muzdelîfeyê bike ango lê bisekine, divê çi bike?

Bersiv: Weqfeya li Muzdelîfeyê ji wacibên hecê ye. Ev wezîfa han, ji kesê bi sedema ku rê tije û girtîne û nikaribe di dema diyarkirî de xwe bigihîne wê derê, dikeve. Yanî tu tiştek lê nakeve.

202. Gotina "hec li ber deriyê mirov e", tê çi wateyê?

Pirs: Peyva "hec li ber diriyê mirov e" tê çi wateyê?

Bersiv: Ev gotin, ji bo yên ku dibêjin kesê ez alîkariya wan bikim ez nabînim an jî mirov xêrê bi kê bike baştir e re hatiye gotin. Ango ne hewce ye ku tu li yên dûr bigerî, belbî ku tu bi eqrebayên xwe yên nêz û bi yên hatine ber destê te re bibî alîkar. Lê belê, tu eleqeya vê gotinê bi heca ferz re tune ye. Kesê derfeta wan a çûna hecê hebe divê ku biçin û tu xêreke din nakeve şûna çûna hecê.

203. Mêr û jina ku bi hev re xebitîbin ma divê ku bi hev re biçin hecê jî?

Pirs: Eger mêr û jin li kargeh, karê çolê û hwd. bi hev re bixebitin û kar bikin, di halê ku pereyên wan çêbibin, ma divê ku bi hev re biçin hecê?

Bersiv: Mêr bi debarkirina mal û malbata xwe berpirsyar e. Tiştê ku pîrek bi dest dixe jî yê wê ye. Eger pîrek ji qezenca destê xwe îhtiyaciyên malê temîn bike û bi vî awayî bibe alîkarê mêrê xwe, dibe xwedan xêr. Mesela hecê jî pereyê kê hebe û rewşa wî/wê ya tenduristî jî derfeta çûnê bide, ew ê biçe hecê. Eger herdu jî bi qasî ku bikaribin biçin hecê dewlemend bin, divê herdu jî herin. Lê, zilam ne mecbûr e ku ji malê xwe bide da ku jina wî biçe hecê. Eger bibe jî bi vê kirina xwe dibe xwedan xêr.

204. Ji bo hecê ma divê ku pîrek destûrê ji mêrê xwe bigire?

Pirs: Jina min heca xwe ya ferz bêyî ku ji min destûrê bigire û pê re tu kesên mehrem jî hebin, eda kir, ango bi cih anî. Bi qefleyekî ji pîrekan, çû hecê û hat. Gelo heca wê qebûl bûye?

Bersiv: Jin, bo çûna heca ferz, ne lazim e ku destûrê ji mêrê xwe bixwaze. Lê ev heye, eger destûr ji we bixwesta helbet dê çêtirbûya.

205. Dîtina heyvê û weqfeya 'Erefeyê

Pirs: Li gorî resed û dîdevaniya heyvê ya ku di salên berê de li Tirkiyê hatibû kirin, 10ê Zilhiccê ango roja cejna Qurbanê ya yekem rastî filan rojê dihat. Di wan salan de Suûdî 'Erebîstan, cejna Qurbanê rojeke bi pêş de xistibû. Li gorî vê, hecî rojeke berê derketibûn 'Erefeyê. Heciyên ji Tirkiyê jî wiha kirin. Li gorî ku hec, ji 'Erefeyê pêk tê û weqfeya di dema xwe de neyê kirin ne meqbûl e, gelo mesûlê vî karî kî ye?

Bersiv: Weqfeya 'Erefeyê ji 9ê Zilhiccê piştî nîvro dest pê dike û heta ku roj biçe ava dewam dike. weqfeya 'Erefeyê, heta şefeqa roja din jî tê kirin. Meha Zilhiccê ji heyvên qemerî ye. Beriya wê meha Zilqa'de ye. Mîna her mehên qemerî, Zilqa'de jî

29 an jî 30 roj e. Di 29ê Zilqa'dê de piştî ku roj çû ava, eger heyva ku di asoyê rojava de diçe ava bê dîtin, wê gavê meha Zihiccê dest pê kiriye. Lê eger heyv neyê dîtin, ji ber ku meha Zilqa'dê dibe 30 roj, mirov digihîje bawerî û qinyata ku 1ê Zilhiccê roja piştî wê ye.

Bi sebeb taybetmendiya erdnîgariya dinyayê, heyv di heman rojê de li her derê nayê dîtin. Ji vê bonê destpêka mehê ji berê ve ye bûye mijareke ku gengeşî li serê derketine. Ji bo dawîanîna vê îxtilafê di bin serokatiya Tirkiyê de hin xebat hatine kirin û Encumeniya Salnameya Dewletên Îslamê hatiye damezirandin. Encumeniya salnameyê zêrevanî û çavdêriyê nake, belbî guncawiya dîtina heyvê li gorî hesaban, berê diyar dike. Lê pirê alimên berê tesbît û diyarkirina meheke nû li ser esasê hesab, rast nedîtine û çavdêriya bi çavan şert dêrane. Serokatiya Karên Dînî, ji daîreyên muftîtîyê daxwaz dike ku çavdêriya heyvê bikin û rastiya hesabê ku Encumeniya Salnameyê kiriye didin nîşandan.

Suûdî 'Erebîstan, li gorî biryara diyarkirina destpêka mehên qemerî bi hesab, tev nagere. Ew, li gorî şahdeyiya kesên serî li deshilatdaran didin û dibêjin ku me heyv dîtiye, destpêkirina meheke nû diyar dikin. Hin caran di rewşên ku dîtina heyvê ne pêkan e û dîsa jî meheke nû tê îlankirin, qinyata dibe ku yên çavdêriya heyvê dikin xwe şaş an jî derew kiribin derdixe holê. Hewldanên Tirkiyê ku desthilatdarên Suûdî îqna bikin, heta roja me tu encam nedane. Ji ber vê ye ku ew gengeşî û îxtilafa ji berê ve heye, hîn dewam dike.

Lê belê ev îxtilaf, tu carî rê nedaye ku di du rojan de weqfeya 'Erefeyê bê kirin. Lewra Pêxember (s.a.w) erka Mîrîtiya Hecê daniye. Hecî jî divê di mêjûya ku Mîrê Hecê diyar dike de weqfeya 'Erefeyê bikin. Lewra biryara ku ew di mijareke xwedî îxtilaf de bide, dê gengeşî û îxtilafê ji meydanê rake.

Ji Hezretî Muhemmed (s.a.w) hedîseke wiha hatiye ragihandin: "Rojiya we, di roja ku hûn rojî digrin de cejna we ya Remezanê di roja ku hûn dikin cejn de, 'Erefeya we di roja ku hûn derdikevin 'Erefeyê de cejna we ya Qurbanê jî di roja ku

hûn goriyan tê de serjêdikin e."[287] Li gorî vê dema weqfeya 'Erefeyê, roja ku însan bi qinyata ku roja 'Erefeyê ye û tê de weqfeyê dikin e.

Ji Îmam Muhemmed hatiye neqilkirin ku wî wiha gotiye: "Kesê bi xwe heyv dîtibe, li gorî tesbîtên xwe di roja 'Erefeyê de weqfeyê bike, weqfeya wî ne caiz e. Divê careke din jî digel Mîrê Hecê weqfeyê bike. Lewra roja ku tê de bi hev re weqfe tê kirin, eger di rastiyê de roja cejnê be jî ji bo wê civakê roja hecê ango 'Erefeyê tê hesabkirin. Ne caiz e ku mirov di wexta weqfeyê de têkeve cihêwaziyê. Ji ber vê yekê weqfeya ku wî kesî bi tena serê xwe kiriye tu girîngiya wê tune ye. Eger Mîrê Hecê ji ber sedemeke ku nêrîn û qinyata wî caiz bidêre –hebe-, weqfeyê rojekê bi paş de bixe, weqfeya kesê ku berî wî bike jî ne caiz e."[288]

Di encamê de weqfeya ku hecî li 'Erefeyê dikin, ji ber şertên wê yên taybet tam û di cihê xwe de ye. Di derbarê weqfeya 'Erefeyê, ne mumkin e ku Serokatiya Karên Dînî kiryareke cihê bike.

206. Ma delîla ferzbûna sekna li 'Erefeyê çi ye?

Pirs: Mamoste, li gorî ez dizanim di derbarê 'Erefeyê di Qur'ana Pîroz de tu agahî nehatiye dayîn. Lê Pêxemberê me (s.a.w) dibêje ku "Hec ji 'Erefeyê pêk tê" û misilman jî gelo çawa 'Erefeya ku behsa wê di Qur'ana Pîroz de nehatiye kirin, ferz qebûl dikin? Di vê mijarê de hûn dikarin bi min re bibin alîkar?

Bersiv: Weqfa/sekna li 'Erefeyê ji ruknên hecê yên ferz in. Di Qur'anê de bi bal weqfeya li 'Erefeyê wiha tê îşaretkirin:

"**Li ser we tu guneh tune ku hûn (bi rêya bazirganiyê) ji kerema Xwedayê xwe bixwazin. Êdî dema hûn ji 'Erefeyê pêl bi pêl daketin vêca li Meş'erul**

[287] Îbnu'l-Humam, **Şerhu Fethi'l-Qedîr**, III, 169.
[288] Îbnu'l-Humam, **Şerhu Fethi'l-Qedîr**, III,169.

<u>Heramê, Xwedê bi bîr bînin.</u> Çawa Xwedê hûn serwext kirin her wisa Wî bi bîr bînin. Çendî ku hûn berê rêwindayî bûn."[289]

Hevoka "**<u>Êdî dema hûn ji 'Erefeyê pêl bi pêl daketin vêca li Meş'erul Heramê, Xwedê bibîr bînin</u>**" îşaretî bi bal weqfeya 'Erefe û Muzdelîfeyê dike. Ayeteke din a ku îşaretî bi bal weqfeya 'Erefe û Muzdelîfeyê ve dike wiha ye:

"**Di heman demê de[290] bila tefesên xwe (weqfeya 'Erefe û Muzdelîfeyê) pêk bînin, bila qurbanên xwe bînin cih[291] û bila wê mala qedîm (Ke'beyê) tewaf bikin**."[292]

Ji vê hedîsa ku ji Pêxember (s.a.w) hatiye ragihandin tê fêhmê ku meqsed ji "tefes" a ku di ayetê de derbas dibe, weqfeya 'Erefe û Muzdelîfeyê ye. Hedîs wiha ye:

Ji qebîla Teyy 'Urwe kurê Muderis got ku, ez hatim cem Qasidê Xwedê (s.a.w), ez li weqfeya Cem'ê (Muzdelîfeyê) bûm. Min got ku, "Ey Qasidê Xwedê! Ez ji çiyayê Teyyê hatim. Merkeba min perîşan ket û min zor da xwe jî. Ez qesem dikim bi navê Xwedê, tu girekî qûmê ku ez li ser nesikinîbim nemaye, gelo ez dibim hecî? Qasidê Xwedê got ku; "*Kî bi me re vê nimêjê bike û berê jî bi şev an jî bi roj hatibe 'Erefeyê, wî heca xwe temam kiriye, tefesa xwe bi cih aniye*."[293]

207. Kesên heca îfradê dikin an jî yên ku nikarin qurbanekê serjê bikin

Pirs: Di pirtûkên fiqhê de derbas dibe ku kesê niyeta heca îfradê anîbe bêyî ku qurbanekê serjê bike dikare hecê bike. Di ayeta 196an ji sûreyê Beqere de jî di derbarê kesê ku nikaribe qurbanekê serjê bike, hukmê ku divê rojî bigire heye. Gelo ev

[289] Beqere, 2/198.
[290] Bêjeya "ثُمَّ" ya ku di 'Erebiya ayetê de derbas dibe bi wateya "مَعَ" ye. Ango digel, di heman demê de.
[291] Ji ber ku di ayetên curbicur de behsa qurbanan hatiye kirin, di vir de meqsed ji qurbanê peywir û wezîfeyên ku kesê hecî bi girêdana îhramê li xwe bar kirine. Xwedê Teala wiha ferman dike: "Hec di mehên diyar de ye. Kî ku di wan mehan de (bi girêdana îhramê) hecê li ser xwe ferz bike, êdî bila nêzî nivîna jina xwe nebe, ji rêya Xwedê dernekeve û gengeşî û pevçûnê neke." (Beqere, 2/197).
[292] Hec, 22/29.
[293] Ebû Dawûd, Menasik, 69; Tirmizî, Hec, 57; Nesaî, Menasik, 211.

hukmê han, ji bo kesê di hecê de nikaribe qurbanê serjê bike (pereyê wî/wê nemîne) jî derbas dibe yan na?

Bersiv: Beşa têkildar ji ayeta 196an ji sûreyê Beqere mealen wiha ye:

"**Eger hûn ewle bûn, vêca ji bo kesê ku bixwaze heyanî rojên hecê ji 'umreyê sûdê wergire, divê qurbaneke ku jê re hêsan be, şerjê bike. Kesê ku wê bidest nexe, sê rojan li hecê û heft rojan jî dema vegeriya malê rojî digire. Ev bi tevayî deh roj in. Ev, ji bo yê ku malbata wî ne li derdora Mizgefta Heramê be. Ji Xwedê bitirsin. Bizanin ku ezabê Xwedê pir dijwar e**."

Li gorî vê ayetê, kesên heca îfradê bikin ango yên ku 'umreyê nekin; belbî sirf 'îbadeta hecê bikin, ne lazim e ku qurbanê serjê bikin. Lê yên heta dema hecê 'umreyê bikin (kesên temettu' an jî heca qîranê bikin) divê ku qurbanekê serjê bikin. Eger bi sedem tunebûna pereyan û hwd. nikaribin qurbanê serjê bikin, sê roj li hecê û li vegerê jî heft roj bi tevahî deh rojan dê rojiyê bigirin.

208. Kesê heca îfradê bike, ma herî zû kengî dikare 'umreyê bike?

Pirs: Di heca îfradê de kesê recma şeytên bike û porê xwe kur bike, piştre jî tewaf û se'yê bike, gelo dikare di heman rojê de biçe mîqatê ango cihê girêdana îhramê û ji bo 'umreyê îhrama xwe girê bide?

Bersiv: Kesê hecê dike, di roja cejnê ya yekem de piştî ku şeytanê mezin recim kir, porê xwe kur dike û ji îhramê derdikeve. Bi derketina ji îhraman ji bilî têkiliya di navbera mêr û jinê de qedexeyên îhramê yên din jî ser radibin. Piştre dê biçe Ke'be'yê tewaf bike û se'yê bike. Di heman rojê de dîsa dê vegere Mînayê. 11 û 12ê meha Zilhiccê dê li wê derê derbas bike û her roj recma her sê şeytanan jî bike. Eger bixwaze, dikare 13ê wê jî li wir bimîne. Piştî nîvro her sê şeytanan jî recim bike û vegere Mekkeyê.

Hec; çi îfrad, çi qîran, çi jî temettu‘ be, wiha tê kirin. Heta ku mirov di rojên teşrîqê de herî kêm du rojan şeytanan recim neke, ‘îbadeta hecê naqede. Ji ber vê yekê, mirov nikare di vê navberê de ‘îbadeta xwe ya ‘umreyê bike.

209. Rêza ku ji bo Heceru’l-Eswed tê nîşandan, gelo tundrawî ye?

Pirs: Bi qasî ez dizanim, hurmet û qîmeta ku bo Heceru’l-Eswed tê nîşandan, ji bo tu tiştekî din ê Îslamê nayê nîşandan. Digel ku helwesta Îslamê ya li hemberî pûtan û redkirina şirkê li holê ye, sirf ji ber ku sunet e gelo çiqas rast e mirov vî karî bike? Bi awayekî din, ev qîmet û hurmetnîşandana han ma bi rastî jî helwesta Pêxemberê me ye?

Bersiv: Qîmet û hurmeta ku ji bo Heceru’l-Eswed tê nîşandan tu eleqeya wê bi pûtan re tune ye. Pûtperest, pûtên xwe di navbera xwe û Xwedê de navgîn dibînin, bawer dikin ku ew ê wan bêhtir nêzî Xwedê Teala bikin û dê ji wan re mehdervaniyê bikin. Ji bo Heceru’l-Eswed, tu wesfekî bi vî awayî nayê dayîn. Ew, bi tenê nîşana detpêkirina tewafê ye. Ramûsandina me, bi sedema ku Pêxemberê me (s.a.w) ew ramûsaye. Vê gotina Hezretî ‘Umer ya ku ji bo Heceru’l-Eswed gotiye gelek navdar e: “Ez dizanim ku tu kevikerî, ne tu feyde û ne jî zirareke te heye. Eger min nedîtibûya ku Qasidê Xwedê tu maçî dikirî, min qet tu maçî nedikir.”[294]

Henzele dibêje ku: “Min (di tewafê) rehmetiyê Tawûs dît. Dema dihat cem rukin (Heceru’l-Eswedê) eger gelemşeyî li serê hebûna qelebalixî çênedikir, derbas dibû; lê eger vala û guncaw bidîta sê caran radimûsa. ‘Umer (x.j.q) gotiye: “Min dît ku Qasidê Xwedê wiha dikir.”[295]

[294] Buxarî, Hec, 50, 57, 60; Muslim, Hec, 248, 120; Muwetta, Hec, 36, (1367).
[295] Nesaî, Hec, 148.

Pêxemberê me (s.a.w) ji 'Umer re (x.j.q) wiha gotiye: "*Ey Ebû Hefs! Tu merivekî pir bihêzî, eziyetê nede yên lawaz. Eger tu koşe vala bibînî nêz bibe û ramûse, eger ne vala be tekbîr bîne û derbas bibe*."[296]

Di roja me de beşek ji yên ku diçin hecê, ramûsana Heceru'l-Eswedê, ne wekî ku sunetê tewafê, belbî wekî 'îbadeta herî girîng ji bo xwe dibînin. Ya şaş, ew helwesta wan e. Di vî warî de divê mirov însanan perwerde bike.

210. Qurbanên ku li hecê tên serjêkirin, ma tên îsrafkirin?

Pirs: Li gorî nûçeyeke ku di kanalekê de derket, qurbanên li hecê tên serjêkirin li cihekî ku kamera wan nakişîne tên tomarkirin û ew goşt ne li feqîran tê belavkirin û ne jî tê parastin. Ev mijar fikr û ramanê min tevlihev kir. Di dînê me yê ku îsraf tê de ne caiz e, kirina tiştekî wiha ma rast e?

Bersiv: Rast e, mixabin di salên berê de tiştên mîna vê bûyerê qewimîn. Elbet ev tiştê han bi tu awayî nayê qebûlkirin. Lê belê, tê dîtin ku di salên dawî de bi taybetî jî di encama rêxistinên mezin de goriyên ku li hecê tên serjêkirin digihîjin welat û dewletên feqîr. Divê mirov ji hemû tiştên di televîzyonan de derdikeve, bawer meke.

211. Bo çûna hecê ma ez dikarim krêdiyê bikişînim?

Pirs: Niyeta min a çûna hecê heye, lê pereyê min tam têr nake. Gelo durist e ku ez tiştê mayî bi kirêdiya ji bankê temam bikim?

Bersiv: Krêdî, deynê bi zêdeyî ango bi faîz e. Faîz jî ji qedexeyên Xwedê yên herî mezin e. Ji bo çûna hecê be jî bi tu awayî ne durist e ku mirov faîzê bigire. Eger pereyê mirov têr nekin, jixwe hec li we ferz nebûye. Ji ber vê yekê xwe nexin zor û zehmetiyan.

[296] Ehmed kurê Henbel, **Musned**, 1/23.

212. Ma rast e ku kesê 'umreyê bike hec jî lê ferz dibe?

Pirs: Yekî bi qasî ku bikaribe biçe hecê pereyê wî tune bin, ma dikare here ‘umreyê? Di halê ku çû ‘umreyê jî bi sedema ku dê Ke‘beyê bibîne, wî kesî çûna hecê li xwe ferz kiriye. Ma ev tişt rast e?

Bersiv: Ji bo kesê ku derfetê bibîne di emrê xwe de carekê ‘umreyê bike, sunetê muekked e. Kirina ‘umreyê di roja ‘Erefeyê û her çar rojên cejna Qurbanê de mekrûhê tehrîmî ye. Ji bilî van rojan di hemû rojên salê de ‘umre tê kirin.

Meha Şewal û Zilqa’de û deh rojên meha Zilhiccê, mewsimê hecê ye. Misilmanê ku ne di mewsimê hecê de ‘umre kiribe, sirf bi sedema ku Ka’be dîtiye, hec li ser ferz nabe.

Kesê ‘umreya xwe di mewsimê hecê de bike, dikare heta dehê meha Zilhiccê li wê derê bimîne. Ji bo wî, derfeta ku heca xwe jî bike hatiye bidestxistin. Misilmanê ku bi vî awayî derfeta pêkanîna hecê bidestxistibe û neke, li hember vê kirina xwe berpirsyar e.

Muslimanên ku ji deverên dûrî Mekkeyê tên da ku ‘umreya xwe bikin, eger berê hec kiribin, divê ku ‘umreya xwe ne di mewsimê hecê de bikin. Di rewşa ku di mewsimê hecê de ‘umreyê bikin jî divê ku heta rojên hecê bisekinin û ‘îbadeta xwe ya hecê jî bikin.

213. Îbadeta hecê ma dibe sedemê biderengxistina zewacê?

Pirs: Ez merivekî 25 salî me, karê mamostetiyê dikim û ezeb im. Di van deman de dixwazim bizewicim. Bi ya ku difikirim pê re bizewicim re hemû şert û mercên pêwîst me pêk aniye. Lê malbata keçikê, naxwazin vê salê jî keça xwe bidin, dixwazin biçin hecê. Di halê ku di malbatê de yeka berzewac hebe, ma rast e ku mirov here hecê? Ji aliyê dînî ve hukmê vê çi ye? Ma nabe ku malbata keçikê çûna xwe ya hecê salekê bi paşde bixe?

Bersiv: Mirovê misilman, da ku keça xwe ya ezeb bizewicîne nikare heca ku li ser ferz e bi derengî bixe. Herwiha bi sedema ku wê biçin hecê, nikarin zewaca keça xwe jî bi paşde bixin. Ev herdu tişt bi hev re, ne girêdayî ne. Lewre divê ku herdu jî di vê salê de bên kirin.

214. Hukmê recma şeytên di hecê de çi ye?

Pirs: Ma recma şeytên heye? Di van demên dawî de hin seyda li ser ekranên televîzyonan dibêjin ku recma şeytan tune ye, belbî piştre hatiye derxistin. Gelo rastiya vê meseleyê çi ye?

Bersiv: Recma şeytên bi ayetê sabit e. Xwedê Teala wiha ferman dike**:**

"**Di rojên bijimar de Xwedê bibîr bînin. Vêca kî di du rojan de (ji Mînayê) vegere, tu guneh li ser namîne. Kî dereng bimîne jî li ser wî jî tu guneh namîne. Ev, ji xweparêzan re ye. Ji Xwedê bitirsin. Bizanin ku, bi rastî hûn ê bi bal Wî ve bên komkirin**."[297]

Ji roja yekê cejnê re **yewmu'n-nehr**, ji roja duyem, sêyem û çaremê wê re jî **eyyamu't-teşrîq** tê gotin. Di roja yekem de hecî, şeytan direcimînin, qurbanê serjê dikin û dadikevin Mekkeyê û Ke'beyê tewaf dikin. Dema ku vedigerin Mînayê jî ev roj diqede, roja duyem ango eyyamu't-teşrîq dest pê dike. Piştre li Mînayê 'îbadeta recma şeytên ya sê rojan li pey hev, dimîne. Hecî jî mîna ku Pêxember (s.a.w) kiriye, her roj piştî nîvro şeytanên biçûk, navîn û yê mezin recim dikin û bi vî awayî 'îbadeta xwe ya hecê temam dikin. Mîna ku di ayetê hate diyarkirin, kesê 'îbadeta xwe ya hecê pêk anî eger di hundirê vê demê de ji kirinên nebaş xwe parastibe, hemû gunehên wî ji serê radibin. Rewşa kesên ku ev peywira han di du rojan de qedandibin jî wiha ye. Di dema recma şeytên de mirov dibêje "Bîsmillahî Ellahû ekber." Zikrê van rojan ev e. Pêxemberê me (s.a.w) bi kirina xwe ev nîşanî me daye.

[297] Beqere, 2/203.

215. Îhram çi ye? Delîla pêdiviya girêdana îhramê çi ye?

Pirs: Îhram çi ye? Delîla pêdiviya girêdana îhramê çi ye?

Bersiv: Kesê dest bi 'îbadeta hecê yan jî 'umreyê dike, hin tiştên ku di demên normal de dikare bike, êdî lê heram/qedexe dibin. Jixwe îhram jî bi wateya ketina di nav qedexeyeke wiha de ye. Îhram ji ferzên hec û 'umreyê ye. Lewra heta ev pêk neyê, nayê hesab ku mirov dest bi 'îbadetê kiriye. Ev, wekî rewşa kesê ku dema dest bi nimêjê dike çawa xwarin û vexwarin lê qedexe ye. Di nimêjan de xwarin û vewarin û qedexeyên din, piştî niyetanînê û gotina "Ellahû Ekber" dest pê dike. Loma jê re "tekbîra tehrîmê" hatiye gotin, ango tekbîra ku hin tiştan li mirov heram/qedexe dike. Girêdana îhramê di hec an jî 'umreyê de bi niyet û telbiyê pêk tê. Di ayeta têkildar de wiha tê fermankirin:

"**Mehên hecê, diyar in. Kî di wan mehan de dest bi hecê bike, êdî bila di hecê de nêzî bi bal jinan nebe, kirina gotinên nebaş û pevçûnê neke**."[298]

Destpêkirina hecê, mirov xwe ji qedexeyên ku di ayetê de derbas bûn, dûr bigire. Ji bo kesekî wiha nêçîr jî qedexe ye. Xwedê Teala wiha ferman dike:

"**Gelî bawermendan! Dema hûn di îhraman de bin (heywanên) nêçîrê nekujin**." [299]

"**Heta ku hûn di îhraman de bin ji bo we nêçîra bejahiyê jî hatiye heramkirin**." [300]

216. Berî îhraman ma caiz e ku mirov parfûm an jî deodorantê bikar bîne?

Pirs: Ma di bikaranîna bêhn, deodorant an jî mendîla bi kolonyayê berî girêdana îhramê bo hec û 'umreyê de tu mehzûrek heye?

---

[298] Beqere, 2/197.
[299] Maîde, 5/95.
[300] Maîde, 5/96.

Bersiv: Li gorî piraniya aliman, piştî girêdana îhramê qedexe ye ku mirov misk, enber, kafûr û hwd. ji bêhnên xweş di bedena xwe yan jî di îhrama xwe bide. Li gorî fuqehayan, kesê di îhraman de ye dema bêhnê li laşê xwe, cihê lê radizê, îhrama xwe, li por û riha xwe bide, an jî parfûm û spreyê bikar bîne, ceza lê dikeve. Delîla vê jî ev riwayet e:

Ji Qasidê Xwedê hate pirsîn: "Di derbarê kesê bêhnê di xwe bide piştre cube li xwe bike û têkeve îhraman hûn çi dibêjin?" Wî jî wiha bersiv da:

"*Bêhna ku te li bedena xwe kiriye sê caran bişo. Cubeyê li ser xwe ji xwe bike. Piştre tiştê te di hecê de dikir, di 'umreyê de jî bike*."[301]

Malikî, bêhnê dikin du beş. Yek jê ya ku tê hiskirin û rengê wê namîne mîna yasemîn, rihan, gul, menekşe û bêhnên wekî van. Ya din jî ya ku bêhna wê tê hiskirin û rengê wê jî dimîne mîna zeferan, kafûr, enber û hwd. Bêhnkirin û bikaranîna ya yekem mekrûh e û fidyê lazim nadêre. Bikaranîna ya duyem an jî destdana wê çi bêhn bê hiskirin çi jî neyê hiskirin, çi bandor bike çi neke mekrûh e û fidye pêwîst dike. Li gorî Henefî û Henbeliyan, bi tu awayî ne durist e ku mirov bêhnê di kincên xwe bide.

Digel vê jî riwayeta ku ji diya me Eyşê hatiye ragihandin, ji ber ku di Heca Xatirxwestinê de di sala dehê koçbûnê de pêk hatiye, ev rewşa dawî hukmê ku di bûyera yekem de hatiye ji holê radike. Hedîsên ku mezhebê Şafiî jî di mijara kesê di îhraman de be dikare bêhnê di kincên xwe bide wiha ne:

Ji diya me 'Aişeyê wiha hatiye ragihandin:

"*Dema Qasidê Xwedê îhrama xwe girêdida, min bêhna herî xweş ya ku min bidîta tê dida*."[302]

[301] Buxarî, Hec, 17, 'Umre, 10; Muslim, Hec, 6.
[302] Buxarî, Hec, 7, Libas, 79, 81; Muslim, Hec, 37; Tirmizî, Hec, 77; Darimî, Menasik, 10.

"*Qasidê Xwedê, dema telbiya dianî, çirûskên miskê yên ku di nav porê wî de li ber çavê min in.*"[303]

"*Qasidê Xwedê, dema dê îhramên xwe girêbidana bêhna herî xweş ya ku bidest bixista bikar dianî. Piştre min çirûskên bêhnê di ser û riha wî de didîtin*."[304]

Ev gotin didin nîşandan ku bêhna mirov di xwe dide eger piştî girêdana îhramê jî dewam bike, ne qedexe ye. Ev bûyer di gava Heca Xatirxwestinê de çêbûye. Eger tiştekî mehzûr bûna, Qasidê Xwedê dê destûr nedana. Heta bikaranîna bêhna xweş berî girêdana îhramê, ne bi tenê caiz e belbî, bi sedema ku helwesta Pêxember e (s.a.w) mirov dikare wekî sunetê jî binirxîne.[305]

217. Meriv kengî ji îhramê derdikeve?

Pirs: Min ji nivîsa di malpera we de ya di derbarê Heca Pêxemberê me de ev encama derxist: Hezretî Pêxember dema ji Medîneyê tê Mekkeyê, bi sedema ku bi xwe re heywanên qurbanê anîbûn heta ew gorî nekirin di îhraman de maye, lê yên ku bi xwe re qurban neanîbûn li wan ferman dike ku ji îhraman derkevin. Di roja me de yên diçin hecê, digel ku niyeta gorîkirina qurbanê dikin jî piştî 'umreyê ji îhramê derdikevin. Ma ev kirin (heca temettu'ê) durist e? Tiştê ez dizanim, endamê hecê ya dê heca qîranê (heta qurbanê serjê bike dê di îhrama de bimîne) yan jî heca îfradê bike (bê ku qurbanê gorî bike dê ji îhrama derkeve). Gelo encama ku ez gihîştimê rast e?

Bersiv: Kesê heca îfradê bike, ne lazim e ku qurbanê serjê bike. Lê kesê digel hecê 'umreyê jî bike divê ku qurbanekê gorî bike. Xwedê Teala wiha ferman dike:

---

[303] Muslim, Hec, 39.

[304] Muslim, Hec, 39.

[305] Bnh: Abdullah Tırabzon, **Hac İbadetinde Yasak Davranışlar**, teza doktorayê ya neçapbûyî (İstanbul Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü), Stenbol 2008, rp. 122-124.

"… Eger hûn ewle bûn, vêca ji bo kesê ku bixwaze heyanî rojên hecê ji 'umreyê sûdê wergire, divê qurbaneke ku jê re hêsan be, şerjê bike. Kesê ku wê bidest nexe, sê rojan li hecê û heft rojan jî dema vegeriya malê rojî digire. Ev bi tevayî deh roj in. Ev, ji bo yê ku malbata wî ne li derdora Mizgefta Heramê be. Ji Xwedê bitirsin. Bizanin ku ezabê Xwedê pir dijwar e."[306]

Kirina hec û 'umreyê bi hev re yan mîna ku Pêxemberê me (s.a.w) kiriye bi îhramakê tê kirin, yan jî wekî ku pirê sehabeyan kiriye berê 'umre tê kirin, piştî derketina ji îhraman, bo hecê mirov careke din îhraman girê bide tê kirin.

218. Ji bo derketina ji îhraman, ma divê çiqas ji por bê jêkirin?

Pirs: Da ku mirov bikaribe ji îhramên hec û 'umreyê derkeve, gelo mîqdarê ku ji por tê jêkirin çiqas e? Ango ma divê em porê xwe kur bikin, an jî divê em ji binî ve rût bikin?

Bersiv: Di vê mijarê de di mezheban de nêrînên cuda hene. Henefî dibêjin ku herî kêm, ji çara yekê por divê bê jêkirin. Li gorî Şafiîyan jêkirina sê mûyan bi tenê jî têr dike. Lê Malikî û Henbelî dibêjin ku divê temamê por bê qusandin.

Ev cudahitiya di navbera mezheban de dide nîşandan ku di vê mijarê de delîleke ku pîvaneke teqez dide ragihandin, tune ye. Ji ber ku di ayeta 27an ji sûreyê Fetih "helq:حلق "a ku bi wateya jêkirina por ji binî ve cara pêşîn hatiye, "teqsîr: تقصير"

kurkirin jî di asta duyem de derbas bûye, hatiye gotin ku ya baş ji bo mêran ku porê xwe ji binî ve jêbikin.

Dema por, bi qasî mîqdarê ku di urfê de kurkirin tê hesibandin bê jêkirin, mirov dikare ji îhraman derkeve.

[306] Beqere, 2/196.

219. Gelo hukmê kirina 40 wext nimêj li Mescida Nebî çi ye?

Pirs: Ma riwayeta kirina çil wext nimêj li Medîneyê heye? Eger hebe jî gelo rast e, zeîf e yan jî tiştekî urfî ango adet e?

Bersiv: Di derbarê kirina çil nimêjan li Mescida Nebî/Mizgefta Pêxember de em tewsiye dikin hûn metnê muzakereya ku di navşîna jêr de ya ku ji aliyê Abdülaziz Bayındır li ser teblîxa ku Birêz Xelîl Altintaş amade kiriye û di civîneke ku Serokatiya Karûbarên Dînî di derheqê Hecê de lidarsixtibû bixwînin:

http://www.suleymaniyevakfi.org/fikih-arastirmalari/mescid-i-nebde-kirk-vakit-namaz.html

220. Ma helwesteke rast e ku mirov xanima xwe nebe hecê?

Pirs: Hin kes xanimên xwe nabin hecê. Bi sebeb ku mêr û jin di heman cihî de bi hev re ne, dibêjin ku pîrek dê têkevin heramiyan. Di hecê de di navbera mêr û jinan de ma tu ferq heye? Di vê meseleyê de em dikarin şîroveya we hîn bibin?

Bersiv: Di mesela hecê de di navbera mêr û jinan de tu ferq tune ye. Tiştê ku hecê ji ‘îbadetên din cuda dike jî ev e. Kesên bi sedema ku pîrek û zilam bi hev re ne, jinên xwe nabin hecê, divê ku ew bi xwe jî neçin hecê. Lewra li wê derê bi tenê, ne zilam, belbî pîrekên ku ji aliyê dînî ve li wan heram in jî hene.

Ji vê bonê mehrûmkirina pîrekan ji ‘îbadeta hecê ya ku ji sembol û nîşanên girîng ê dîn e, lihevanîna dînekî nû ye.

221. Ma rojname dikare xwendakarên xwe bi rêya kupon û pişkê bibe 'umreyê?

Pirs: Rojnameyekê par ji kiryarên xwe 100 kes birin hecê. Kesên dê biçin hecê bi pişkê hatin diyarkirin. Herkesê ku 49 kupon kom kiribe dikaribû beşdarî vê pişkê bibûna. Di vê rêxistinê de ma tu mehzûrek heye?

Bersiv: Eger xwendevan ji bo wan kuponan tu pereyekî din nedabe ango sirf bihayê rojnameyê dabe, di vê de tu mehzûrek tune ye. Diyarkirina 100 kesên ku dê biçin hecê bi rêya çîtikê, vê rêxistinê nake lîstikên sihûdê/qumarê. Lê eger ev rêxistin bi dayîna tiştekî zêdeyî ji bihayê rojnameyê bê lidarxistin, wê demê ev dibe organizasyoneke qumarê.

222. Xanimeke ezeb ma dikare bi tena serê xwe biçe 'umreyê?

Pirs: Xanimeke nezewicandî ma dikare bi tena serê xwe biçe ‘umreyê?

Bersiv: Pêxemberê me (s.a.w), ji ber ku ewlehiya rê û çûnê tune bûye destûr nedaye pîrekan ku bê hebûna yekî mehrem bi tena serê xwe derkevin rêwîtiyê. Lê di halê ku ewlehiya rê û can bê temîn kirin –jixwe di roja me de ew tişt hatiye bidestxistin- pîrek dikarin bi tena serê derkevin rêwîtiyê.

Lê dîsa jî dema mirov şert û mercên roja xwe bide ber çavan ji bo rêwîtiya hec an jî ‘umreyê herî kêm divê ji xizmên pîrekê yekî nêz pê re hebe. Heta pêkan be, divê ku pîrek bi vî awayî herin ‘umreyê. Lê eger ev derfet bi dest nexistin, ango eger mehremekî wan î ku bi wan re here tune be, dikarin bi qefleyeke ewle ji pîrekan re biçin.

223. Ma temamê pêxemberan hec kirine?

Pirs: Ma hemû pêxemberan hec kirine? Eger ez neşaşbim di derseke berê de Abdülaziz Xoce behsa ku divê tevdê pêxemberan çûbin Mekkeyê kir. Ma wî ev tişt li ser esasê ku ji dema Hezretî Adem heta îro ‘îbadeta hecê li ser her kesi ferz e got? Bi rastî ew beşa ha jî tam nayê hişê min. Çendê ha ev mesele bû mijara xeberdanê, bi qasî ku di aqlê min de mabû min got dibe ku temamê pêxemberan bo ‘îbadeta hecê çûbin Mekkeyê. Hevalê min got ku ‘îbadeta hecê bi Hezretî Îbrahîm re bûye ferz û dibe ku pêxemberên berê neçûbin Mekkeyê. Gelo zanîna min an jî ya hevalê min rast e?

Bersiv: Di derbarê Ke'beyê de Xwedê Teala wiha ferman dike:

"**Bêguman mala pêşîn a ku (ji bo 'îbadetê) ji mirovan re hatiye avakirin a li Mekkeyê (Ke'be) ye. Cihekî pîroz e û ji bo xelkê cihê hîdayetê ye**."[307]

"**Dema ku Me cihê Malê (Ke'be) ji Îbrahîm re diyar kir û (me jê re got:) Ji Min re tu tiştî hevpişk negire û mala Min ji tewafker, nimêjker, rikûker û secdebiran re paqij bike**."[308]

Li gorî vê, îhtimala ku mala pêşîn a ku ji bo 'îbadetê hatiye avakirin bi însanê herî pêşîn re çêbûbe bêhtir nêzî hêş û aqil e. Îbrahîm (a.s) jî ne avakerê Ke'beyê yê pêşîn e, belbî avakerê duyem ê li ser esasê wê yê berê bilind kiriye.

Ayetên din wiha ne:

"**Me Ke'be ji mirovan re gerand cihê lihevkombûnê û ewlegehiyê. "Hûn jî meqamên Îbrahîm ji xwe re bikin cihên duayan. Me peywir da Îbrahîm û Îsmaîl û me ji wan re got: "Mala Min; ji bo tewafker, îʿtîkafkar, rikûkar û secdekaran paqij bikin." Îbrahîm wiha lava kir: "Xwedayê min! Vê derê bike bajarekî aram û êmin. Nişte cihên wê jî; ew ên ku bi Xwedê û roja axretê bawerî bînin bi texlîtên fêkiyan risiqdar bike." Xweda got: "Kesê kafir bibe Ez ê demeke kurt qenciyê pê bikim, paşê Ez ê wî bikişînim azara êgir." Ew çi pîs war e! Dema Îbrahîm û Îsmaîl hîmên Beytê bilind dikirin (û digotin:) "Xwedayê me! Ji me qebûl bike, bêguman, yê bihîzer yê zana her Tu yî**."[309]

"**Di nav mirovan de îlana çûna hecê bike ku yên peya û yên siwar li ser heywanên weza û westiyayî ji her riyên dûr ve werin cem te (serdana Ke'beyê bikin). Da ku ji bo xwe (di hecê de) hin berjewendiyan bibînin, da ku navê Xwedê di rojên jimare de li ser şerjêkirina heywanên qurbanê yên ku Me bi rizqînî daye**

[307] Alî Îmran, 3/96.
[308] Hec, 22/26.
[309] Beqere, 2/125-127.

wan bibêjin. Vêca ji (goştê) wan bixwin û bidin jar û xizanan jî. Paşê bila qirêja xwe ji ser xwe rakin û bila qurbanên ku li ser xwe nezir kiribûn bînin cih û bila wê mala qedîm (Keʿbê) tewaf bikin. Kî ku rêz li fermanên Xwedê bigire ev, li cem Xwedayê wî jê re çêtir e."[310]

Ji van ayetan tê fêhmê ku Ke'be hîn berî Îbrahîm (a.s) jî hebûye, lê belê xera bûye û demeke dirêj cihê wê wenda bûye û ji aliyê Îbrahîm (a.s) hatiye dîtin û ji nû ve hatiye avakirin.

Dîsa bi qasî ku em ji ayetan fêhm dikin 'îbadetên bi Ke'beyê re têkildar in "limêj" û "tewaf"e. Ji ber ku tewaf di hec û 'umreyê de ruknê herî esasî ye, tê fêhmê ku hec jî ji roja Ke'be hatiye avakirin hebûye.

Ayeta li jêr jî delîleke din e; dide nîşandan ku 'îbadeta hecê berî Îbrahîm (a.s) hebûye. Xwedê Teala wiha ferman dike:

"**Fermana ku Xwedê li Nûh kiriye, ya ku ji bo te wehî kiriye, ya ku li Îbrahîm, Mûsa û Îsa emir kiriye ji bo we kiriye rêk û rêbaza vî dînî. Hûn dîn li ser piyan bigirin û hûn tê de nekevin îxtilafê**…"[311]

Li gorî ku hec di şerî'eta Îbrahîm (a.s) de û di şerî'eta me de jî ferz e, nexwe ew li Nûh (a.s) û li umeta wî jî ferz bûye. Wekî din jî bi awayekî teqez em dizanin ku Nûh (a.s), berî Îbrahîn (s.a) bûye.

224. Suûdî, çima bi kontenjanên hindik ji misilmanan re astengiyan derdixe?

Pirs: Piştî ku mirov bo çûna hecê şert û mercên diyar bidest xistin, ma çiqas rast û durist e ku Qraliyeta Suûdî 'Erebîstan bibe astengê pêkanîna edakirina heca ku Xwedê Teala ferz dêraye?

---

[310] Hec, 22/27-30.
[311] Şûra, 42/13.

Bersiv: Dewleta Suûdî, bo pêkanîna hecê nabe astengê tu kesî. Lê belê ne pêkan e ku destûra misilmanên jimara wan herî kêm milyar û nîve bide ku bi hev re hecê bikin. Lewra kapasîteya bajarê Mekkeyê diyar e. Eger zêdeyî kontenjana hatiye diyarkirin hecî bên girtin, dibe ku 'îbadeta hecê biewiqe û bi sebeb îzdihamê dibe ku ev tişt rê li mirina mirovan veke. Ji vî alîyî ve, ji bo her welatekî misilman kontenjana ji hezarî yek hatiye veqetandin û em dibînin ev bi xwe jî hin caran ji ber îzdihama pir, dibe sebebê birîndarbûn û mirina hin însanan. Ji ber vê yekê divê em bi vî çavî li meseleyê binihêrin û di mijareke tam zanîna me di derbarê wê de tune be divê em di derheqê kes, sazî û dewletan de biryar nedin.

225. Berî çûna hecê, ma lazim e ku mirov ji xizmên xwe helaliyan bixwaze?

Pirs: Dema mirov dê biçe hecê ma divê ku mirov vê bi hevnasên xwe re parve bike, li hev helal bike û helaliyan ji wan bixwaze? Eger mirov bi wan re parve neke gelo tu berpirsyariya wê heye? Piştî hatina ji hecê, mirov dayîna diyariyan (mîna ava zemzemê, xurme, şalik, tizbî û hwd.) serdana heciyan û pîrozkirina wan bike adet, ma tiştekî rast e?

Bersiv: 'Îbadeta hecê di dînê me de ji 'îbadetên herî mezin û yên xwedî fezîlet e. Çend hedîsên di derbarê vê mijarê de wiha ne:

Ebû Hureyre (x.j.q) wiha vedibêje: Qasidê Xwedê wiha gotiye:

"*'Umreyek, dibe kefaretê kirinên heta 'umreyeke din. Perûya heca mebrûr jî ji bihuştê pê ve ne tiştekî din e.*"[312]

Ebû Hureyre (x.j.q) wiha got: Ji Pêxember (s.a.w) hate pirsîn:

- 'Emelê herî bilind kîjan e?

- Wî wiha bersiv da: "*Baweriya bi Xwedê û bi Qasidê Wî ye.*"

[312] Buxarî, 'Umre, 1; Muslim, Hec, 437, (1349); Tirmizî, Hec, 90; Nesaî, Menasik, 3, 5; Îbn Mace, Menasik, 3; Muwetta, Hec, 65.

- Hate pirsîn: Piştre kîjan e?

- Got ku: "*Cîhada di rêya Xwedê de ye*."

- Piştre kîjan e?

- Ferman kir ku: "*Heca meqbûl e*."[313]

Dîsa Ebû Hureyre got ku, min bihîst Qasidê Xwedê wiha digot:

"Kesê hec kiribe û gotinê nexweş negotibe û gunehên mezin nekiribe, her wekî roja ku ji dayika xwe bûye bêguneh vedigere (mala xwe)."[314]

Di nav gunehên ku tên bexşandin de heq û huqûqê mirovan tune ye. Ji ber vê yekê divê mirov bi cîran, eqreba û hevalên xwe re yên ku mumkin e heqê wan ketine aliyê mirov li hev helal bike û helaliyan ji wan bixwaze, da ku bi destûra Xwedê Teala temamê gunehên mirov bên bexşandin.

Anîna diyariyan ji hecê û pîrozkirina kesên jê tên, herçiqas ne fermaneke olî be jî dîsa jî di kirina wê de tu mehzûrek tune ye û ji ber rewşa hecê ya taybet ev tiştê han di 'îbadetên din de nayê dîtin.

226. Ma hurmeta ku ji bo ava zemzemê tê nîşandan di cihê xwe de ye?

Pirs: Ava zemzemê ya ku kesê diçin hecê yan jî 'umreyê bi xwe re tînin, di civakê de girîngiyeke mezin jê re tê nîşandan û mîna aveke pîroz tê dîtin. Ev girîngiya ku li hember ava zemzemê tê nîşandan, gelo tiştekî rast e?

Bersiv: Ava zemzemê aveke mubarek e. Ev av, li cihekî nêzî Ke'beyê bi tenê derdikeve. Qasidê Xwedê (s.a.w) jê vexwariye û tewsiya vexwarina wê kiriye. Ava zemzemê, diyariya herî biqîmet e ya ku mumkin e hecî yan jî 'umrevan bi xwe re

[313] Buxarî, Îman, 18, Hec, 4, 34, 102, 'Umre, 1, Seyd, 26, Cîhad, 1, Tewhîd, 47; Muslim, Îman, 135, Hec, 204, 437.
[314] Buxarî, Hec, 4, Muhser, 9, 10; Muslim, Hec, 438.

bînin. Nîşandana rêz û hurmeta zêde ji aliyê gel ve, ji qîmeta vê avê tu tiştekî kêm nake.

227. Ma mirov dikare di şûna yekî din de hecê bike?

Pirs: Gelo mumkin e ku mirov di şûna yekî din de hecê bike? Bavê min, ji ber nexweşî û kalîtiyê nikare here hecê, lê belê pereyê wî hene. Ma ez dikarim ji dêvla wî herim?

Bersiv: "Di derbarê girîngî û menasikên hecê de ji Pêxember (s.a.w) pir hedîs hatine neqilkirin. Lê belê di derheqê ferzbûna hecê li ser kesê kal an jî nexweşê halxweş, an jî di derheqê pêwîstiya ku eger ew nikaribin bi xwe bikin jî divê bi hinekî din bidin kirin de tu hedîseke sehîh tune ye. Eger di mijarekê de ayet an jî hedîsa sehîh ya ku şîroveya wê ye tune be, hukmê ferzbûnê dernakeve holê. Lewra ferz, ji tiştê ku bicihanîna wê bi delîleke teqez hatiye xwestin re tê gotin.

Pêgirên mezhebê Henefî, Şafiî, Zahirî û Zeydî, bi piranî derfet û îmkana madî li ber çavan girtine û gihîştine encama ku kesê bi sebeb kalîtî yan jî nexweşiyê nikaribe bi xwe hecê bike, ferz e ku bi rêya wekîlekî hecê bide kirin. Ên ku tenduristiyê bingeh û esas digrin mîna piraniya zanyarên mezhebê Malikî, dibêjin ku kesê pirsgirêka wî ya nexweşiyê yan jî pîrîtiyê hebe, herçiqas halxweş be jî hec lê ne ferz e.

Hin fuqehayên mîna Ebû Henîfe, Serexsî û Îbnu'l-Humam, derfeta madî û tenduristî bi hev re li ber çavan girtine û gotine ku kesê ev herdu tişt di wan de tune bin, hec li wan ne ferz e.

Qenaet û baweriya Îmam Muhemmed wiha ye: Heca ku bi rêya wekaletê bê kirin, ji kesê hec kiriye bi xwe re tê hesibandin. Kesê di şûna wî de hec hatiye kirin jî ji ber ku bûye wesîle bo kirina hecê û pereyên xwe di vê rêyê de xerc kiriye, ji wî re jî xêra hecê heye.

Di derbarê mijara kesê kirina heca ferz li ser navê xwe wesiyet kiribe de fuqehayan tifaq kirine ku li ser wêrisên wî wacib e ku ji malê wî yekî bişînin hecê.

Qenaet û baweriya me: Kesê hec lê ferz bûbe û rewşa wî ya tenduristî û şertên din di cih de bin û di wexta wê de eda nekiribe piştre ketibe halekî nexweş, bi şandina yekî din di şûna xwe de ji vê berpirsyariyê xelas nabe. Ji ber vê yekê û ji ber deynê heca ku ketiye stûyê wî divê ji Xwedê Teala bexşandina xwe bixwaze. Eger hebe, bi qasî mesrefê hecekê ji malê xwe bi awayê xêr û xêratan belav bike, ji wesiyeta bi kirina hecê çêtir e."

Ji bo kesên dixwazin di mijara bedêlhec de digel delîlan agahiyên berfirehtir bidest bixin, em tewsiye dikin ku gotara Prof. Dr. Servet Bayındır ya ku di lînka jêr de ye bixwînin:

http://www.suleymaniyevakfi.org/arastirmalar/baskasinin-yerine-hac-yapmak.html

Herwiha hûn dikarin derseke me ya di vê mijarê de ji lînka jêr temaşe bikin:

http://www.kurandersi.com/mukayeseli-fikih-muzakereleri/2010/baskasinin-yerine-hacc-yapmak.html

228. Ma di hundirê Ke'beyê de çi heye?

Pirs: Ma di hundirê Ke'beyê de çi heye?

Bersiv: Li aliyê Ruknê Îraqî/Qorniya Îraqî ji Ke'beya çargoşe ya ku di şeklê odeyekê de ye, nêrdenaveke ku derdikeve banî û li pêşiya wê jî deriyekî bi navê "deriyê tobê" heye. Binê wê bi mermeran raxistî ye, dîwarên wê heta bilindiya 2 metreyan bi mermer kiraskirî ye. Piştî temîrat û avakirina ji nû ve li dîwarên rojava, rojhilat û bakur kîtabe hatine bicihkirin. Di nava wê de sê stûnên darînî ku bakur û başûr rêzkirî ji dema 'Ebdullah kurê Zubeyr mane û ji vana bi aliyê dîwarê rojava li pêşiya yê li hemberî derî cihê ku Hezretî Pêxember lê nimêj kiriye cih digire; ev der,

di şeklê secadê de bi mermerekî hatiye nîşankirin. Arîk û dîwarên wê, ji jor heta cihê bi mermer hatiye kiraskirin bi perdeyeke ji etleseke sor nixumandî ye. Di navbera arîk û banê wê de bi qasî bilindiya 1,33 m valahiyek heye.[315]

229. Kirasê Ke'beyê çima reş e?

Pirs: Gelo kirasê Ke'beyê çima reş e?

Bersiv: Rengê kirasê Ke'beyê, ne ji ber hinceteke dînî, belbî ji ber kevneşopiyê reş e. Ji dema Pêxemberê û vir de her sal, di dehê meha Muherremê de ango di roja aşûreyê de kirasekî sor, di 27ê Remezanê de jî yekî spî li Ke'beyê dihate kirin. Di dema Xelîfeyê 'Ebbasiyan Me'mûn de bi zêdekirina yekî spî yê din êdî kirasê Ke'beyê salê sê caran dihate guhartin. Di salên pêşî ji xelîfetiya Nasir Lidînillah, bo Ke'beyê kirasê kesk dihate şandin, lê kirasê di salên paşî de şandibû reş bû û rengê nivîsa li ser jî zer bû. Ev rewş heta roja me jî wiha dewam kiriye.[316]

[315] Bnh: Sadettin Ünal, "Kâbe", **DİA**, 2001, XXIV, 15.
[316] Ji bo agahiyên berfirehtir ji kerema xwe re bnh: Ünal, "Kâbe", **DİA**, XXIV, 17-19.

NEZIR

230. Kesê ne balix, ma divê ku nezra xwe bîne cih?

Pirs: Seyda, ji bo du tiştan, ji bo her yekî min soza heyvek rojî dabû. Ya yekem, berî ku ez balix bibim min dabû û daxwaziya min hate cî. Ma divê ku ez wê rojîyê bigirim? Ya duyem, min gotibû ku ez dibistana Anatolyayê qezenc bikim ez ê heyvek rojî bigirim. Lê belê min dibistaneke din qezenc kir. Ma ji bo vê jî hewce ye ku ez rojî bigirim an na?

Bersiv: Weke hemû 'îbadetên din, ji bo nezir jî bê cî, pêwîst e ku mirov musilman, bi aqil û balix be. Ji ber vê yêkê qewlê zarok û yên ne baqil nabe nezir. Ji ber vê yekê ne hewce ye ku tu rojiyê bigirî. Ya duyem, te gotiye ku ez dibistana Anatolyayê qezenc bikim ez ê rojî bigirim, te ew qezenc nekiriye û daxwaziya te nehatiye cî. Ji bo soza (nezir) te ya dawî jî tu rojîyê nagirî.

231. Ma mirov dikare ji nezra xwe bixwe?

Pirs: Kesê ku boraqa nezrê dide, ma ew û malbata xwe dikarin jê bixwin?

Bersiv: Kesê ku boraqa nezrê dide, ne ew û ne jî malbata wî ji usûl û firû'an nikarin jê bixwin. Yanî dê, bav, bapîr, dapîr, zarokên wî û neviyên wî jî nikarin bixwin. Belbî divê ku bide feqîr û belengazan. Eger ew an jî yekî ji malbata wî jê bixwin divê bi qasî qîmeta tiştê ku jê xwarine, pereyan sedeqe bidin.

232. Meriv dikare girtina rojiyê li xwe nezir bike?

Pirs: Ma nezra (qewl) rojîyê çêdibe yan na? Mesela mirov bibêjê ku "**Ev karê min çêbibe ez ê du rojan rojî bigirim**" ma lazim e ku mirov herdu rojan li ser hev bigire yan na?

Bersiv: Ji ber ku rojî jî 'îbadet e, çêdibe ku mirov wê qewl (nezir) bike. Ku te qewl (nezir) kir û daxwaziya te pêk hat. Divê ku tu soza xwe bînî cî û rojî bigirî. Lê belê ne şert e ku tu li ser hev bigirî.

233. Gelo dîk û mirîşk dibin qurban?

Pirs: Di zemanê me de hin misilman hene ku dîk û mirîşkan qewl dikin û wan serjê dikin**.** Ma mirov dikare dîk û mirîşkan bike nezir? Û gelo ev adetekî Cihûyan e yan na?

Bersîv: Li gorî ayeta 28 û 34an ji sûreyê Hecê, heywanên ku dibin dehî ango qurban, pêwîst e ku ji cureyê "**behîmetul-en'am**" bin. Di sûreyê En'am ayetên 143 û 144an de derbas dibe ku ew, nêr û mêyên pez, bizin, dewar û hêştiran in. Ji bilî wan, heywanên din nabin qurban.

Di heman wextê de ne pêkan e ku mirov tam bizanibe, bê ka hin misilman li gorî kîjan adet û çavkaniyan dîk û mirîşkan dikin qurban. Lê belê, li ba Cihûyan adeta ku digel dewar û heywanên çar ling ên mezin û yên biçûk, ji heywanên koxan jî sirf kebok, kew û yên mîna wan, dikin qurban heye. Li gorî vê adetê, berî roja "**Yom Kîpûr**" bi rojekê, yekî balix ji Cihûyan radihêje heywanekî/e koxan (eger mêr be radihêje dîk û eger jin be radihêje mirîşkê) bi stûyê wî/wê digire li dora serê xwe sê caran digerîne û wiha dibêje: "Ev kefaretê min, fidya min û telafiya min e. Ev dîk (mirîşk) dê bimire. Lê belê ez ê heyateke dirêj û bextewar bijîm." Piştre heywan tê serjêkirin û li feqîran tê belavkirin an jî bi qîmeta wê sedeqe dide.

Ev adeta bi navê "**Kapara-Kaparot**", tu têkiliya wê bi mijara qurbanên ferz ya di Tewratê de tune ye û li gorî baweriya wan, kesê ku bi sedem û wesîleyên curbicur guneh kiriye, da ku hestên xwe yên poşmaniyê îfade bike dîk û mirîşkê serjê dike û sedeqe dide. Kapara, ne peywirekî olî ye, belbî sirf adetek e.[317]

[317] Bnh: Yusuf Besalel, "Kapara-Kaparot", **Yahudi Ansiklopedisi,** Gözlem Gazetecilik, II, 309-310.

234. Ma nezra ku ji cureyê wê 'îbadet tune be, dibe nezir?

Pirs: Dema ku ez di dibistanê de xwendekar bûm, min hin qirîzên derûnî derbas kirin û min gelek soz û qewl dabûn. Mesela carekê ji seydayê Mizgefta ku li hember mala min bû re got ku ez ê du mirîşkan serjê bikim û bidim ên xwedî îhtiyac. Niha divê ez çi bikim? Ma ez wan mirîşkan li cihê ku lê dijîm serjê bikim û li feqîran belav bikim durist e?

Bersiv: Yek ji şertê qewlê (nezir), divê ku ji cureyê wê 'îbadetek hebe. Ji ber ku ji mirîşkê qurban çênabe, qewlê (nezir) wê jî çênabe. Ji ber vê yêkê ne lazim e ku tu mirîşkê serjê bikî.

235. Min nezir kir ez ê ewqas pere bidim zarokên taxa xwe, ma dibe ku ez bidim hin zarokên din?

Pirs: Dema pîreka min ducanî bû, min nezir kiribû ku zaroka min bêqeza û bela were dinyayê, ez ê ewqas pere bidim zarokên belengaz yên taxa me. Lê belê piştî ku qewlê min hat cî, ez pê hesiyam ku ew zarok ji taxa me çûne. Divê ez niha çi bikim? Ma lazim e ku ez li wan kesan bigerim an na? Eger ez li wan negerim tu gunehê wê heye?

Bersiv: Ne lazim e ku tu li wan kesan bigerî. Tiştê te qewl kiriye eger tu bidî hinên din ên xwedan îhtiyac çêdibe.

Ömer Nasuhi Bilmen di pirtûka xwe ya bi navê "**Büyük İslam İlmihali**" de di derbarê vê mijarê de van agahiyan dide: "Nezra ku bi şert tê kirin bi dem, cih, perekî aşkere û bi feqîrên xuyakirî, nayê girêdan."

Mîna: “Filan karê min pêk bê ez ê roja înê rojî bigirim, ez ê pere bidim feqîrê ku li filan derê dijî. Kesê ku bi vî awayî qewl bide, piştî ku ew kar pêk hat dikare di rojekê ji rojan rojî bigire yan jî bedêla wî perî bide feqîrekî ku li cihekî din dijî.”[318]

236. Rojiya nezir, ma divê ku li pey hev bên girtin an na?

Pirs: Heft roj rojiya min ya qeza hebû. Min qesd kir ku ez wan li pey hev bigirim, eger ez li pey hev negirim tu guneh ji min re heye yan na? Ango gotina min a ku ez ê wan li pey hev bigirim dibe nezir?

Bersiv: Naxêr, ev nabe nezir. Lewra nezir, ‘îbadeta ku li mirov ne wacib be û mirov soz bide Xwedê Teala û li xwe wacib bike re tê gotin. Rojiya ku bi sedemê rêwîtî yan jî nexweşiyê nehatiye girtin ji rojiyên ku qezakirina wan wacib e. Ji ber vê yekê ne pêkan e ku ew bibe rojiya qewl.

Ji ber vê yêkê ev heft rojên ku we gotiye, ne lazim e ku hûn wan li pey hev bigirin. Eger hûn di demên cuda de jî bigirin, we wezîfa xwe aniye cî.

[318] Nasuhi Bilmen, **Büyük İslam İlmihali,** “Belirli ve Belirsiz, Mutlak ve Muallak Adaklar”, paragraf: 241.

CEZA

237. Ma rast e ku ehkamên Qur'anê dîrokî ne?

Pirs: Gelo mirov dikare angaşt bike û bibêje ku hedên di Qur'anê de derbas dibin, dîrokî ne ango ji bo demekê ne û ne ji bo hemû deman in?

Bersiv: Muweqetbûna ehkamên Qur'anê, di roja me ya îroyîn de zêdetir bi wateya mirov bipejirîne ku Pêxember (s.a.w) di demeke ji tarixê li erdnigariyekê desthilatdar bûye yan jî li cihekî wiha bîrewerekî bi bandor bûye û Qur'ana Pîroz jî mîna pirtûkeke ku di wê tarîx û erdnigariyê de hin sazî pêk aniye, bijmêre û qebûl bike. Ev angaşt, ji ber ku rewaciya ehkamên Qur'anê yên ku heta qiyametê dê li ser piya bin, ji holê radike û xelelê dixe têgeha "Pêxemberê paşîn ji Pêxemberan", nayê qebûlkirin. Angaşta dîrokbûna ehkamên Qur'anê û saziyên wê yên ku nesix nebûne, bi tu awayan nayê qebûlkirin.

238. Di dema me de cezayê zinayê, dê çawa bê tetbîqkirin?

Pirs: Hedên ku di Îslamê de hene, gelo li cihên ku esas û qanûnên Îslamî tê de nameşin, dê çawa bên tetbîqkirin? Mîna hedê dizî, zinayê û hedê bêbextiya zinayê, kesê ku bixwaze li vê dinyayê cezayê xwe bikişîne, divê çi bike?

Bersiv: Di dema Pêxember de (s.a.w) zilamek, sûcê xwe yê zinayê îtiraf dike. Qasidê Xwedê dar dixwaze. Darekî şikandî tînin. Dibêje "*Bila yekî çêtir be*." Yekî nû tînin, girêkê wî nehatibû teraş kirin. Dibêje "*Bila ji vî siviktir be*." Darekî rast û nerm tînin. Qasidê Xwedê ferman dike û bi dar li wî zilamî dixin. Piştre wiha dibêje:

"*Gelî însanan! Êdî dem hatiye hûn xwe ji sînorên ku Xwedê danine biparêzin. Kî pîsiyekê ji wan pîsiyan bike, bila xwe bi paçikê Xwedê, binixumîne. Lewra yê ku rûyê xwe şanî me bide, em ê Kîtaba Xwedê li ser tetbîq bikin*."[319]

[319] Muwetta, Hudûd, 2/12.

Îfadeya "*Kî pîsiyekê ji wan pîsiyan bike, bila xwe bi paçikê Xwedê, binixumîne***.**" Bi wateya bila tobe bike û xwe rast û durist bike. Lewra tobe, ku mirov dev ji guneh berde û rastkirin jî tê wateya ku êdî mirov li wî gunehî venegere û meke. Eger mafê yekî li ser mirov hebe, heta ku mirov wî heqî lê venegerîne mirov xwe rast nekiriye.

Babeta ku li jor derbas bû, di derbarê dema Pêxember (s.a.w) de ya ku hemû ehkamên Qur'anê bi gişti dihatin tetbîqkirin. Li cihên ku derfeta tetbîqkirina ehkamên Qur'anê tune be, mirov dê tobe bike û xwe rast û durist bike. Lewra tu rêyeke din tune ye.

239. Di Qur'anê ji cezayê sed daran pê ve, ma tu hedekî din heye?

Pirs: Di rûpelê 294an de ji pirtûka we ya "**Doğru Bildiğimiz Yanlışlar**" derbas dibe ku "Di Qur'ana Pîroz de ji sed daran pê ve tu cezayekî din tune ye." Hal ew e ku di Qur'anê de behsa cezayê jêkirina destan jî heye. Divê mirov vê yekê, çawa fêhm bike?

Bersiv: Di pirtûka me de beşa bi sernavê "**Recmin Kalktığını Gösteren Hadisler**" (Hedîsên Didin Nîşandan ku Recm Rabûye), wiha ye:

Zilamek sûcê xwe yê zinayê îtiraf dike. Qasidê Xwedê dar dixwaze. Darekî şikandî tînin. Dibêje "*Bila yekî çêtir be*." Yekî nû tînin, girêkê wî nehatibû teraş kirin. Dibêje "*Bila ji vî siviktir be*." Darekî rast û nerm tînin. Qasidê Xwedê ferman dike û bi dar li wî zilamî dixwin. Piştre wiha dibêje:

"*Gelî însanan! Êdî dem hatiye hûn xwe ji sînorên ku Xwedê danine biparêzin. Kî pîsiyekê ji wan pîsiyan bike, bila xwe bi paçikê Xwedê, binixumîne. Lewra yê ku rûyê xwe şanî me bide, em ê Kitêba Xwedê li ser tetbîq bikin*."[320]

Di vir de bê nihêrtina ku ezeb e yan na, ferman dike ku sed dar lê bên xistin. Piştre dibêje ku min emrê Kîtêba Xwedê aniye cih û hemû gumanên di vê mijarê de ji

[320] Muwetta, Hudûd, 2/12.

holê radike. Lewra di Kitêba Xwedê Teala de ji cezayê sed daran pê ve tu cezayekî din tune ye."[321]

Çawa ku tê dîtin di vir de tiştê ku behsa wî tê kirin, cezayê zinayê ye. Peyva "Di Kitêba Xwedê Teala de ji cezayê sed daran pê ve tu cezayekî din, tune ye" sirf ji bo cezayê zinayê hatiye gotin. Eger hûn rabin tiştên beriya vê hevokê û tiştên piştî wê jê bibin û hewl bidin ku wê fêhm bikin, teqez hûn ê bigihîjin hin encamên şaş.

Di rûpelên 262-268an ji heman berhema me, bi sernavê "**Ceza Hukuku Prensipleri**" (Prensîbên Huqûqa Cezayê), hûn dikarin cezayên sûcan ên di Qur'ana Pîroz de derbas dibin, bixwînin.

Nîşe: Hûn dikarin berhema "**Kur'an Işığında Doğru Bildiğimiz Yanlışlar**" ji lînka jêr bidest bixin.

http://www.suleymaniyevakfi.org/hizmetlerimiz/Kitaplarimizi-indirin.html

Herwiha hûn dikarin nivîsa me ya "**Nesih ve Zina Cezası**" (Nesix û Cezayê Recmê) jî ji lînka jêr bixwînin.

http://www.suleymaniyevakfi.org/arastirmalar/nesih-ve-recim-cezasi.html

240. Bêjeya "el-'ezab" ya ku di mijara recmê de derbas dibe, tê çi wateyê?

Pirs: Di mijara recmê de we di hin ayetan de bêjeya "el-'ezab" bi "cezayê sed daran" şîrove kiriye. Gelo nabe ku wateya "el-'ezab" cezayê li axretê be? Û hûn ayeta "Dema pîrekên Pêxember zinayê bikin cezayê wan dibe du qat." bi du sed daran şîrove dikin. Di vî halî de ev nayê wateya ku "Pîrekên Pêxember li axretê cezayê wan dê bibe du qat." Çawa çêdibe ku hûn di wateya vê bêjeyê de ewqas bi xwe bawer in.

[321] Abdülaziz Bayındır, **Kur'an Işığında Doğru Bildiğimiz Yanlışlar,** çapa 3yem, Weşanên Weqfa Suleymaniyeyê, 2007, rp. 294.

Bersiv: Di sûreyê Nûr ayeta duyem de tê xwestin ku komek ji bawermendan ji bo cezayê "el-'ezab" zinaya ku zilam û pîrekê kiriye, bibin şahid. Cezayê "el-'ezab" ku ji bawermendan tê xwestin ku li ser şahid bin, cezayê di vê dinyayê de ye.

Di heman sûreyî di ayeta 8em de tê îfadekirin ku pîreka ji aliyê mêrê xwe ve bi sûcê zinayê bê sûcdarkirin, dema çar caran sond bixwe, ji wî cezayî "el-'ezab" rizgar dibe. Pêkan e ku wê pîrekê bi rastî jî zina kiribe. Lê belê ji ber ku mêrê wê nikare çar şahidan bîne, pîrek ji **cezayê dinyayê** yanî "ji cezayê sed daran" xelas dibe. Encax eger pîrekê bi rastî jî zina kiribe, gelo ji cezayê axretê xelas dibe? Naxêr, teqez xelas nabe. Ev jî dide nîşandan ku bêjeya "el-'ezab" ya ku di ayetên behsa zinayê dikin de derbas dibe, mebest jê ne cezayê axretê ye. Belbî cezayê dinyayê, yanî sed dar e.

Di derbarê cezayê zinayê de ji bo agahiyên berfirehtir, ji kerema xwe nivîsa me ya di lînka jêr de ye bixwînin:

http://www.suleymaniyevakfi.org/arastirmalar/nesih-ve-recim-cezasi.html

241. Ma dibe ku gotina "sed daran" di mijara cezayê zinayê de sembolîk be?

Pirs: Di sûreyê Nûr ayeta duyem de tê emirkirin ku "zilam û pîrekên zina kiribin bila sed dar li wan bê xwistin." Gelo ev vegotineke sembolik e? Ango wateya ku dê Xwedê Teala li axretê ceza bide wan, ma ne rastir e?

Bersiv: Kesên ku zina kiribin hem li vê dinyayê hem jî li axretê ji bo wan ceza heye. Xwedê Teala di vê mijarê de wiha ferman dike:

"**Jin û mêrê zinaker her yekî ji wan sed darî li wan bidin. Eger hûn bi Xwedê û roja axretê bawerdar in, di (tetbîqa hukmên) dînê Xwedê de bila di biwara wan de hestê merhemetê, we negire! Bila ji bawermendan civakek hazirî cezayê wan bibe**."[322]

[322] Nûr, 24/2.

Vegotina lêdana sed darî ne sembolik e, cezayekî rasteqîn e. Eger ne wiha bûna dê îfadeya "**Bila ji bawermendan civakek hazirî cezayê wan bibe**" bê wate bûna.

Lêdana sed darî cezayê wan ê li vê dinyayê ye. Eger mirov tobe neke, cezayê li axretê ji vê cuda ye.

Xwedê Teala zinayê, di nav gunehên mezin jimartiye û di derbarê cezayê wê yê di axretê de wiha ferman kiriye:

"Ew ên ku digel Xwedê 'îbadetê ji mebûdekî din re nakin û bi neheqî ew canê ku Xwedê (kuştina) wî heram kiriye nakujin û zinayê nakin. Kî ku van bike dê (li axretê) rûbirûyî ceza bibe.

Roja qiyametê ezabê wî dê qat bi qat zêde bibe û bi şerpezeyî her û her dê tê de bimîne.

Lê belê yê ku tobe bike, bawerî bîne û karê qenc bike, ew cuda ye. Xwedê gunehên wan bi xêran diguherîne. Xwedê gunehjêbir e, dilovîn e."[323]

Dema şert û merc di cih de bin, di roja me jî de ev ceza tê tetbîqkirin.

242. Di huqûqa Îslamê de cezayê tecawuzkirinê çi ye?

Pirs: Li gorî Qur'ana Pîroz û suneta rast û durist, cezayê kesê ku tecawuzê bike çi ye? Ango di dînê Îslamê kîjan ceza lê tê birîn?

Bersiv: Kesekî wiha sê cezayên cuda jê re hene:

Cezayê zinayê: Ew jî lêdana sed darî û qedexebûna zewaca bi yeke bi namûs re. Ev kesê han heta xwe bi giştî rast meke, nikare bi yeke bawermend a bi namûs re bizewice. Xwedê Teala wiha ferman kiriye:

[323] Furqan, 25/68-70.

"**Jin û mêrê zinaker her yekî ji wan sed darî li wan bidin. Eger hûn bi Xwedê û roja axretê bawerdar in, di (tetbîqa hukmên) dînê Xwedê de bila di biwara wan de hestê merhemetê, we negire! Bila ji bawermendan civakek hazirî cezayê wan bibe. Zilamê zinaker, tenê bi jineke zinaker re yan jî bi jineke muşrik re dikare bizewice. Jina zinaker jî tenê mêrekî zinaker yan jî mêrekî muşrik dikare wê mar bike. Ew li ser bawermendan hatiye heramkirin**."[324]

…

"**Lê belê ew ên ku piştî vê, tobe bikin û rewşa xwe rast û durist bikin, ew cuda ne. Vêca bi rastî Xwedê gunehjêbir e, dilovîn e.**"[325]

Cezayê êrîşkirinê: Xwedê Teala wiha ferman dike:

"**Eger hûn ceza bidin, bi qasî ya ku li we hatiye kirin ceza bidin. Eger hûn xwe ragirin, helbet ew ji sebirkêşan re hê çêtir e**."[326]

Sûcê ku di vir de hatiye kirin ji ber ku tiştekî heram e hemkûfiya di cezayê de ne mumkin e. Yanî ne pêkan e ku mirov bi qasî wê, ceza bidê. Ji ber vê yêkê divê mirov tiştekî ku têkeve şûna wê lê bibire. Yanî cezayê ziyanê lê bibire. Ew jî dayîna mehreke bi qasî mehra yeka ku hemkûfê wê be.

Cezayê te'zîrê: Eger ev kes di kirina tecawuzê de bi ser nekeve jî dîsa jî ev kirina wî bê ceza namîne. Li gorî rewşa wî, dê cezayekî din lê bê birîn. Ev jî di dest û teqdîra rayedarê dadgehê de ye. Tetbîqeke mîna vê ji Pêxember (s.a.w), em ji vê riwayetê agahdar dibin:

Ji Qasidê Xwedê (s.a.w) di derbarê fêkiyên li darê, hat pirsin: "*Kesê, ji bo ku îhtiyaca wî hebûye jê xwaribe, encax tiştek nexistibe dawa xwe û nebiribe, tiştek nakeve. Kî rahêje tiştekî û bibe, dê bi du qatan vegerîne û di ser de jî ceza jî lê tê birîn.*"[327]

---

[324] Nûr, 24/2-3.
[325] Nûr, 24/5.
[326] Nehl, 16/126.

Kesê ku fêkiyê li ser darê xistibe dawa xwe û biribe, wî sê sûc kirine. Yek li hember xwediyê fêkî, ya din li hember civakê û ya sêyem li hember Xwedê Teala. Ji bo xwediyê fêkî, tiştê ku diziye û bi qasî wî dê bide. Ango eger du kîlo dizî be, bi du kîloyan re divê ku du kîloyên din jî bide.

Vî şexsî, ji ber ku ewlehiya mal ji holê rakiriye li hember civakê tawanbar e. Cezayê vî sûcî, di destê desthilatdar û rayedaran de ye. Ev şexsê han, ji ber sûcê ku li hember Xwedê Teala kiriye, divê ku tobe bike. Di bûyera tecawuzê jî de ji ber ku ewlehiya namûsê ji holê rakiriye, cezayekî din jî lê dikeve. Ew jî di dest û teqdîra rayedar û desthilaran de ye.

243. Ma rast e ku kesê ji dîn derkeve ango "murted", tê kuştin?

Pirs: Di dînê me de kesên **murted** ango yên ji dîn derketine ma divê ku werin kuştin?

Bersiv: Di kuştina kesên ku ji dîn derketine, ên ku çêra dikin Pêxember (s.a.w) an jî heqaretê lê dikin, di nav mezheban de yekîtî heye.[328] Ji bo yên dev ji dînê xwe berdane û bûne ji murtedan wiha hatiye ferman kirin:

"**Gelî bawermendan! Ji we kî ji dînê xwe vegere (bila bizanibe ku) Xwedê, dê (di şûna wan de) civakeke ku ji wan hez dike û ew jî ji Wî hez dikin, bîne. Li ber bawermendan stûxwar in û li ser kafiran de jî xurt û serbilind in. Di rêya Xwedê de cîhadê dikin û ji gazindên gazindkeran jî natirsin. Ev pirdayîna Xwedê ye. Kî bivê, Ew dide wî. Xwedê destfireh e, zana ye**."[329]

Li gorî ku Muqatil kurê Suleyman (w. 150/767) radigihîne, 12 kesên misilman, bûn kafir. Bi fikr û ramanan ji Medineyê dertên, didin rêya Mekkeyê û dikevin nav muşrikên Mekkeyê. Piştre ji wan Haris kurê Suweyd poşman dibe, vedigere û ji

---

[327] Ebû Dawûd, Luqata, 1.
[328] Zuheylî, **el-Fiqhu'l-Îslamî we Edilletuh**, VI, 184.
[329] Maîde, 5/54.

birayê xwe Culas re peyamekê dişîne û dibêje: "Min tobe kiriye û ez vegeriyame, ka ji Pêxember hîn bibe, ma mafê min ê tobekirinê heye yan jî ez herim Şamê. Culas, Pêxember (s.a.w) ji bûyerê agahdar dike, encax tu bersivê nagire. [330] Piştre ev ayetên han daketin:

"**Ma wê Xwedê çawa civakeke ku piştî bawerî anîn û şahdeyî dan ku ew qasid heq e û delîlên aşkere ji wan re hatin, dîsa kafir bibin, bîne ser rêya rast?! Bêguman Xwedê, civaka zaliman nayine ser rêya rast.**

Cezayê wan ev e: Laneta Xwedê, ya firîşte û hemû mirovan dê li ser wan be!

Ew ê her gav di wê lanetê de bimînin, ezab li ser wan nayê sivikkirin û derfet jî ji wan re nayê dayîn.

Yên ku piştî vê poşman bûne û li ser rastbûna xwe xebitîne ne tê de. Lewra Xwedê, her gunehveşêr e, dilovîn e."[331]

Nexwe, cezayê kesên ku dev ji dîn berdane, laneta Xwedê Teala, ya firîşteyan û ya hemû mirovan dê li ser wan be. Ên ku tobe bikin dê ji wê lanetê rizgar bibin. Digel ku hukm û biryar ev e, gotin û yekîtiya di navbera mezheban de; ku kesên murted tê kuştin, bi rastî jî tiştekî xerîb e. Ayeta ku Henefiyan ji xwe re kirine delîl wiha ye:

"**Ji bedewiyên ku li paş mane re bibêje: Li hemberî miletekî ku xwedan hêzeke dijwar e gaziya şer dê li we bê kirin. <u>Hûn ê şerê wan bikin, an jî ew ê (bêşer) teslîm bibin.</u> Vêca eger hûn (çûna şer) qebûl bikin, Xwedê dê perûyeke spehî bide we. Lê belê eger weke cara pêşîn hûn dîsa pişt bidinê, Xwedê dê bi ezabekî dijwar we ceza bike**."[332]

---

[330] Tefsîra Muqatilê kurê Suleyman, thq: Ehmed Ferîd, Beyrût 1424/2002, I, 180-181.
[331] Alî Îmran, 3/86-89.
[332] Fetih, 48/16.

Beşa "**Hûn ê şerê wan bikin an jî ew ê (bêşer) teslîm bibin**" ji ayetê, delîla kuştina kesên murted hisab kirine.[333] Lê belê derxistine hukmekî wiha ji vê ayetê, ne mumkin e.

244. Ma divê em hedîsa "Kesê ku dînê xwe guhert, bikujin" çawa fêhm bikin?

Pirs: Li gorî tê bîra min hûn di pirtûkeke xwe de wiha dibêjin: "Di babetê kuştina kesên ji dîn derketine hemû mezheban tifaq kirine û ev jî tiştekî xerîb e". Lê belê li gorî lêkolîna min ya di Kutubê Sitte de bi hindikahî li gorî rewşa li jêr kesê ji dîn derkeve tê kuştin û nêrîna mezheban di vê mijarê de rast e. Lewra hedîs mîna şîroveya Qur'anê ne. Ji ber vê yekê em dikarin bibêjin ku mezheban biryareke rast dane. Gelo nêrîneke we di vê mijarê de heye? Hûn dikarin vê meseleyê şîrove bikin? Yek ji Hedîsên têkildar wiha ye: Zeyd kurê Eslem (x.j.q) dibêje: "Qasidê Xwedê (s.a.w) gotiye ku: "*Kesê ku dînê xwe guhert serê wî jê kin*." Îmam Malik, vê hedîsê di Muwetta xwe de di behsa Eqdiye 15, (2, 736) bi cih kiriye û di derbarê wê de vê şîroveyê peşkêş dike: "Wateya vê hesîdê wiha ye: **"**Kesê ku ji Îslamê derkeve û têkeve dînê zindiqî û yê mîna vê, dema ev tişt lê xelebe bike tê kuştin. Kesê wiha, teklîfa tobekirinê lê nayê kirin. Lewra nayê zanîn bê ka bi rastî tobe kiriye yan na. Lewra wan beriya (xelebê) kufra xwe vedişartin û misilmantiya xwe didan nîşandan. Kufra yên mîna wan, eger bi delîlê bê îsbatkirin jî ez vexwendina wan a bi bal tobekirinê ve munasib nabînim, (eger tobe bikin jî divê ku neyê qebûlkirin.)"

Bersiv: Hedîsên Pêxember (s.a.w), ehkamên ku Xwedê Teala di Qur'anê de gotine, -lê belê hinekên ku di dîtina wan de em zehmetiyan dikişînin-, taybetmendiyên wan ji me re aşkere dikin û di her mijarê de ji me re dibin mînak. Ji ber vê yekê hedîs, ji bo têgihîştina Qur'anê çavkaniyeke girîng e.

Lê belê mîna ku ji her kesî re diyar e, hedîsên mewdû'-derewîn jî pir in û hinek ji wan bi sedemên siyasî yan jî bi hin sedemên din, ketine pirtûkên hedîsê yên

[333] Ebûbekrê kurê Mesûd el-Kasanî, **Bedaiu's-Sanai' fi Tertibi'ş-Şerai'**, VII, 111.

sehîh. Ji vê bonê kesê alim divê ku pir bi hizir be, ji bîr meke ku hedîs bi Qur'anê ve girêdayî ne û bi awayekî ku bi Qur'anê re yekîtiyekê çêbike li wan bê nihêrtin. Eger mirov wiha neke, mîna ku di mijara kesê ji dîn derkeve divê bê kuştin, dê hedîs têkeve rewşa ku hukmê Qur'anê ji holê radike.

Di vê mijarê de hukmê Qur'anê pir aşkere ye. Ji vê bonê ne pêkan e ku hedîseke li dijberî vê hebe. Heta di hedîsa ku we di pirsa xwe nivîsandiye de pirsgirêkên mezin hene. Mîna riwayeta "*Kesê dînê xwe biguherîne wî bikujin*." bi gelemperî ye. Cezayekî girîng mîna cezayê kuştinê bi îfadeyeke wiha nayê dayîn. Wê demê yên xeyrimuslim jî dema misilman dibin ji ber ku dînê xwe diguherînin divê ku ew jî bên kuştin. Bi vê sedemê ye ku Îmam Malik, ji mecbûrî dibêje: "Wateya vê hedîsê ev e: "Kesê ku ji Îslamê derkeve û têkeve dînê zindiqî û yê mîna vê, dema ev tişt lê xelebe bike tê kuştin."

Ev, daxuyaniya Îmam Malik e û bi tu awayî nabe ji eslê hedîsê.

Eger em bibêjin di hedîsê de tu pirsgirêk tune ye jî li hember hukmên ayetan ên aşkere, dîsa jî mirov nikare hukmê kuştinê bide. Çawa ku me li jor jî îfade kiribû eger em bibêjin hukmê kuştinê tê derxistin, ev tê wateya ku hedîs ayetê nesix dike û xuya ye ku tiştekî wiha tu car nayê qebûlkirin.

Ji bo dîtina rêgeza me di babetên wiha de em hêvî dikin ku nivîsa me ya bi sernavê "Nesh ve Recm Cezası" ji pirtûka ku we behsa wê kir (Kur'an Işığında Doğru Bildiğimiz Yanlışlar) dê bi feyde be.

Ji bo xwendina nivîsa têkildar, ji kerema xwe re serî li lînka jêr bidin:

http://www.suleymaniyevakfi.org/arastirmalar/nesih-ve-recim-cezasi.html

245. Ma di umetên berê de jî destê dizan dihate jêkirin?

Pirs: Tê gotin ku cezayê destjêkirinê ji bo diziyê ji sûreyê Maîde ya ku di ayeta 38an de derbas dibe, di pirtûkên îlahî yên beriya Qur'anê de tune ye. Cezayê ku di vê

ayetê de derbas dibe, eger ji cezayê umetên beriya me cuda be, di vî halî de em dikarin bibêjin ku Qur'ana Pîroz, ehkamên pirtûkên îlahî yên berê, ne bi hukmekî "mislî-wekhev" belbî bi tiştekî "qenctir" veguhertiye. Lê belê, eger ev ceza li ba umetên berê tune be, vê gotina me gelo nabe li dijî prensîba nesxê ya ku di Qur'anê de derbas dibe?

Bersiv: Em ayeta 38an ji sûreyê Maîde, mîna ku hukmekî ku di şerî'etên berê de hebe û hatibe nesixkirin bifikirin. Di nesxê de rêgez ew e ku divê bi tiştekî "mîna wê" yan jî bi tiştekî "qenctir" bê nesixkirin. Di umetê beriya me de cezayê diziyê yan destjêkirin bû yan jî cezayekî hîn girantir. Ji ayetên ku di sûreyê Yûsuf de derbas dibin[334], em hîn dibin ku di şerî'eta Yaqûb aleyhisselam de cezayê diziyê ku azadiya mirov bihata zêfandin. Diyar e ku "zêfandina azadiya mirov" ji destjêkirina ji zendê hîn girantir e. Di vê rewşê de tu dijberî di navbera ayeta 38an ji sûreyê Maîde û prensîba nesxê tune ye.[**]

246. Ma Pêxember (s.a.w) destê kesê diz jêkiriye?

Pirs: Gelo Pêxember (s.a.w) tu caran destê dizan jê kiriye yan jî daye jêkirin?

Bersiv: Ayeta ku behsa pêdiviya jêkirina destê dizan dike wiha ye:

"Ew mêr û jinên dizîker, vêca bi sebeb ku dizî kirine destên wan jê bikin. Ev cezakirin ji cem Xwedê ve bo vekişandinê ye. Xwedê Ezîz e, Hekîm e." [335]

Di pirtûkên hedîsê de tê ragihandin ku Pêxember (s.a.w) di serdema xwe de ji ber hukmê ayeta ku li jor derbas bû, destê kesên ku dizî kirine jê kiriye yan jî daye jêkirin. Ji wan riwayetan du heb jê wiha ne:

Hezretî 'Aişeyê (x.j.q) wiha gotiye:

---

[334] Yûsuf, 12/74-75.

[**] Adem Yıldırım

[335] Maîde, 5/38.

"Qasidê Xwedê (s.a.w) (di diziya) çaryeka[336] zêr de û bêhtirê wê de destê kesê diz jêdikir."

"**Kesê diz, destê wî encax di çaryeka zêr de yan jî di zêdetirî wê de tê jêkirin**."[337]

247. Cezayê vexwarina meyê çi ye?

Pirs: Di Qur'an û sunetê de ji bo vexwarina meyê tu cezayekî sabit heye yan na? Min di hin çavkaniyan de xwend ku Pêxember (s.a.w) û Hezretî 'Umer (x.j.q), li kesê ku mey vexwariye 40 dar an jî 80 qamçî, xistiye. Ma ev agahî rast in?

Bersiv: Di huqûqa Îslamê de ceza sê cur in. Qisas, hed û te'zîr. Cezayên ku bi Qur'an û bi suneta sehîh hatine tesbîtkirin ji bilî qisas û diyetê (xwîn), di termînolojiya fiqhê de jê re tê gotin hed. Lê têgeha te'zîrê, di huqûqa Îslamê de ji bo cezayên ku ji bilî hed û qisasê û bi îctihadê tên tesbîtkirin re tê gotin.

Li gorî Qur'ana Pîroz cezayên hedê wiha ne:

Cezayê zinayê lêdana (100) daran,

Lêdana 80 darî û neqebûlkirina şahdeyiya kesê ku sûcê zinayê dixe stûyê pîrekeke bi namûs,

Jêkirina destê kesê diz,

Kesê ku bi çekan xesbê bike yan jî li serê rêyan eşqiyatiyê bike, kuştin, bidarvekirin, jêkirina dest û piyan çepûrast an jî penaberkirina wan.

"Di Qur'an û sunetê de digel ku mey û tiştên serxweşiyê çêdikin bi awayekî aşkere hatine qedexekirin jî ji ber ku di serdema Pêxember de (s.a.w) ji bo kesê ku mey vexwaribe ji aliyê şekl û jimarê ve cezayên celdê yên cuda û hin cezayên zêdeyî

[336] Dînar, bi graman nêzî 4.25 gr. ye.
[337] Muslim, Hudûd, 1 (1684). Wekî din bnh: Buxarî, Hudûd, 14; Ebû Dawûd, Hudûd, 12; Tirmizî, Hudûd, 16.

celdê hatine dayîn[338], Hezretî Ebû Bekir (x.j.q) li kesê ku mey vexwariye 40, Hezretî 'Umer (x.j.q) di encama şêwra ku bi sehabeyan re dike, 80 daran tetbîq dike.[339] Ev dibin sedem ji bo nîqaşa ku ev ceza, bê ka çiqas hed e.

Li gorî Henefî, Malikî û Henbeliyan 80 darê ku li kesê serxweş tê xistin hemû hed e, li gorî Şafiî, Zahirî û Zeydiyan, 40ê pêşîn ji heştêyî hed in, çilê paşî dikeve bin qismê te'zîrê.

Herçiqas herdu alî jî di lêdana çil an jî heştê daran ji bo kesê mey vexwaribe behsa îcma'a sehabeyan bikin jî dema mirov riwayetên ku behsa tetbîqatên cuda ji serdema Pêxember û Xulefayê Raşidîn dide ber çavan, îmkana nirxandina ku tetbîqa Qasidê Xwedê bi xwe jî dibe ku ji qismê te'zîrê be, derdikeve holê."[340]

248. Ma kesê nikaribe deynê xwe bide, tu ceza lê tê birin an na?

Pirs: Li gorî huqûqa Îslamê, kesê ku nikaribe deynê xwe bide, ma cezayê wî girtîgeh e?

Bersiv: Di babeta kesê ku nikare deynê xwe bide tifaqa zanyaran heye ku tu ceza lê nayê birîn. Lewra ayeta têkildar pir aşkere ye. Xwedê Teala wiha ferman dike:

"**Eger (deyndar) desteng be, heta destfirehiyê li hêviyê tê sekinandin. Eger we bizanibûna, lêborîna we ji we re hîn çêtir.**"[341]

Ji bo kesê ku qaweta wî digihîje dayîna deyn û bi derengî dixe, Ebû Henîfe dibêje ku tê hebiskirin. Lê belê ew vî tiştî, ne ji bo derengxistina deyn belbî da ku deyndar deynê xwe bide û hebiskirina wî, wekî rêyeke ji bo astengkirina neheqiyê dibîne. Lewra Ebû Henîfe, firotina malê deyndar bi rêya heczê qebûl nake. Li gorî wî, "Eger malê deyndar hebe, dadger di vî malî de nikare teseruf bike. Dê deyndar bi

[338] Buxarî, Hudûd, 4; Ebû Dawûd, Hudûd. 35-36; Şewkanî, **Neylu'l-Ewtar**, VII, 156-157.
[339] Ebû Dawûd, Hudûd, 37; Şewkanî, **Neylu'l-Ewtar**, VII, 156-157.
[340] Ali Bardakoğlu, "Had", **DİA,** 1996, XIV, 548.
[341] Beqere, 2/280.

demeke nediyar hebis bike, da ku malê xwe bifiroşe û deynê xwe bide. Vê jî ji bo ku deyndêr mafê xwe bi dest bixin û neheqî ji holê rabe, dike."[342]

Derketina deyndar ji hebsê piştî ku deynê xwe da, dide xuyakirin ku hebiskirina wî ne ji bo derengxistinê ye. Kesê ku beriya ketina hebsê deynê xwe bide, tu kes wî naxe hebsê. Ji Henefiyan pê ve tu mezhebekî ku behsa pêdiviya hebsê bike, tune ye.

249. Cezayê kuştina yekî bi şaşî çi ye?

Pirs: Ma kesê bi şaşîtî yekî bikuje, çiqas xwîn lê dikeve û dê çawa bide?

Bersiv: Di derbarê kuştina bi şaşîtî de Xwedê Teala wiha ferman dike:

"**Tu car ji bawermendekî re ne rewa ye ku bawermnedekî bikuje. Lê ku bi şaşî be, ew tiştekî din e. Kesê ku bi şaşî bawermendekî bikuje divê koleyekî bawermend azad bike û xwînekê bide xwediyên kuştî. Lê ku ew di xwînê biborin ew tiştekî din e! Eger ew kuştî ji qewmekî dijminê we be û bawermend be, vêca azadkirina koleyekî bawermend pêwîst e. Eger ew ji qewmekî be ku di navbera we û wan de peyman heye, vêca (cezayê wî) xwîneke ku ji malbata wî re were dayîn û azadkirina koleyekî bawermend pêwîst e. Kesê ku koleyekî bawermend bi dest nexe, divê du mehan li pey hev rojî bigire. Ev, da ku tobeya wî ji aliyê Xwedê ve, bê pejirandin. Xwedê zana ye, karbinecih e.**"[343]

Xwîna kuştina bi şaşî, ji pênc cureyên hêştiran ji her cureyekî bîst hêştir bi giştî 100 hêştir tên dayîn. Pênc celebên hêştiran wiha ne:

Bintî mexaz: Hêştira mê ya ku ketiya du salan: 20

Bintî lebûn: Hêştira mê ya ku ketiye sê salan: 20

Hiqqa: Hêştira mê ya ku ketiye çar salan: 20

[342] Merxînanî, **el-Hîdaye**, Kitabu'l-Hacr, Babu'l-Hacr bi Sebebi'd-Deyn, III, 285.
[343] Nîsa, 4/92.

Ceze'a: Hêştira mê ya ku ketiye pênc salan: 20

Îbn mexaz: Hêştirê nêr î ku ketiye du salan: 20[344]

Di roja me de dê qîmetên van hêştiran bi peretî bê hesabkirin û ji malbata kuştî re bê dayîn. Di heman wextê divê ku du mehan li ser hev rojî bê girtin.

Di serdema Pêxember de (s.a.w) qîmetê van hêştiran 1.000 dînar, yanî 4.350 gr. zêr digirt. Ji vê bonê di pirtûkên fiqhê de derbas dibe ku mirov ji bo xwînê 1.000 dînarî bide, kafî ye. Ev jî di hundirê sê salan de bi teqsîtan, dê bê dayîn.

250. Ma di Îslamê de tu ceza ji bo heqaretê heye?

Pirs: Cezayê kesê ku yekî misilman pîs dike yan jî gotinên ne xweş jê re bibêje çi ye?

Bersiv: Ji bilî ku mirov wî hişyar bike û lê şîret û nesîhetan bike pê ve, mirov nikare tu tiştekî din bike. Lewra dîn, qada ezmûnê ya herî mezin e. Ji bo dîtina rêya rast pêdivî bi nîqaşkirinê heye. Nîqaşên bi vî awayî nakevin qada huqûqa cezayê. Ji ber vê yekê divê ku mirov li ser tengasî û nerihetiyên ji wan nîqaşan derdikevin holê, sebir bike. Xwedê Teala wiha ferman dike:

"**Hûn ê di mal û canê xwe de werin ceribandin. Misoger hûn ê ji wan ên ku beriya we kitêb ji wan re hatiye dayîn û ji wan ên ku ji Xwedê re hevpişkan çêdikin, pir gotinên birenc bibihîzin. Eger hûn sebir bikin û xwe biparêzin, vêca ha ew bi rastî ji karên mikûm ên giran in.**"[345]

Li hember heqaret û gotinên ne xweş ji sebir, tedbîr û mayina li ser biryara xwe pê ve, tu rêyên din nehatine nîşandan. Pêxemberê me (s.a.w) ji yên ku di serî de misilman bûbûn, piştre ji dîn vegeriyan û durûyên ku serekên pirsgirêkan bûn, pir

[344] Ömer Nasuhi Bilmen, **Hukukı İslamiyye ve Istılahat-ı Fıkhiyye Kamusu,** Stenbol l967, III, 48.
[345] Alî Îmran, 3/186.

kişandiye; lê belê dîsa jî ceza nedaye wan. Ji vî aliyî ve, sûreyê Munafîqûn pir muhîm e. Em tewsiye dikin ku hûn bi fêhmkirinê vî sûreyî bixwînin.

251. Ma cezayê kesê ku teşwîqa dizî û mêrkuştinê bike çi ye?

Pirs: Di dînê me de cezayê dizî û mêrkuştinê xuya ye. Lê belê eger yek teşwîqa yekî din bi bal diziyê ve bike, dê cezayê wî çi be? Yanî yê ku teşwîqa diziyê bike cezayê destjêkirinê lê tê birîn an na?

Bersiv: Alîkariya ji bo kirina sûcekî dereceyên wê yên cuda hene û di wêjeya huqûqê de jê re tê gotin "hevpariya sûc". Bi awayên cuda sûc çêdibin û pêk tên. Mîna sûcê bi çend kesan re tê kirin, mirov bi yekî bide kirin, alîkariya bi kesê ku sûc dike û hwd. li gorî rewşa wan hin ceza li wan tê birîn. Mîna di kuştina yekî de dema çend kes bi hev re yekî bikujin, ji bo her yekî ku hevparê wê kuştinê ye, di navbera zanyarên Îslamê de tifaq heye ku cezayê qisasê li tevan tê birîn.[346]

Hukmê ayeta di derbarê pîreka Hezretî Lût de "…**Bêguman ew ezabê ku dê bê serê wan, teqez dê bê serê wê jî**." (إِنَّهُ مُصِيبُهَا مَا أَصَابَهُمْ)[347] di mijara hevpariya sûc de mînakeke girîng e. Ji ayetên têkildar mirov dikare bibêje ku gelê Hezretî Lût (s.a.w) ji ber ku di jiyana xwe de rêya hevezayendiyê-lîwatayê dipejirandin.[348] Ji ber vê yêkê mirov dikare bibêje ku ev helwesta wan bi hindikî be jî dibe sedem ji bo wendabûna nesla însên, eger îfadekirin ne şaş be, ji ber ku li hember mirovatiyê sûcê nijadkujiyê kirine, Xwedê Teala ew ceza kirine. Û tê fêhmê ku pîreka Hezretî Lût ji ber ku pîrek e, sûcê ku zilaman dikirin, nikare bike. Ma ku alîkariya wan kiribe, ji wan re cih temîn kiribe yan jî ji ber sûcê 'ezimkirinê, heman ceza heq kiribe.

Di meseleya diziyê de dema tometa birayên Hezretî Yûsuf bi diziye tê kirin û ji wan re tê gotin "…**Gelî karwaniyan! (Rawestin) bi rastî we dizî kiriye**." (أَيَّتُهَا الْعِيرُ

[346] Îbn Qudame **el-Muxnî**, XI, 490; Zuhaylî, **el-Fiqhu'l-Îslamî we Edilletûh**, VI, 235 û dewama wê; Ebû Zehra, **el-Cerîme we'l-'Uqûbe fi'l-Fiqhi'l-Îslamî**, rp.299; û benda. 37an ji TCK.
[347] Hûd, 11/81. Wekî din bnh: E'raf, 7/83.
[348] Bnh: E'raf, 7/81, 82; Hicr, 15/70, 71, 72.

لَسَارِقُونَ)[349] wan ev tometa han qebûl nekirin. Ji ber vê yêkê ji ayetên paş tê fêhmê ku tiliya wan di diziyê de tune bûye. Lê belê tometkirina hemû birayan bi diziyê û bikaranîna "hûn dizin" (سَارِقُونَ) bi forma pirjimariyê balkêş e. Dema mirov ji vê xalê hereket bike û bi sawa ku bêsûcûya birayan dernekeve holê, mirov dikare bigihîje encama ku her birayek di wê diziyê de hevpar e. Di vê mijarê de hin nirxandinên din jî hene. Mesela li gorî Îmam Ebû Henîfe, eger yek rahêje malekî ku li cihekî starkirî ye û bide hevalê xwe û ew jî mal ji wî cihê derxe, li herduyan jî cezayê destjêkirinê nayê birîn.[350]

Sîstema tesbîta cezayan ya ku Qur'ana Pîroz daniye meydanê, wekî teraziyeke ku mirov pê zêr bipîve. Yanî di tesbîta cezayan de dengeyek pir hesas heye. Ji ber vê yekê ji bo tesbîta cezayekî dadmend, divê mirov bi hûr û kûrê sûc bizanibe. Yanî ne krîterek bi tenê, belbî hebûna çend qistasan dikevin dewrê. Mesela di tesbîta sûc de mebesta fail, wesfê wê, kîjan mafan îxlal kiriye û mîna şeklê kirina sûc û hwd.

Di encamê de eger mebesta we ji gotina teşwîqa bi bal sûc ve, sirf alîkariya bi devkî be û rasterast tu hevpariya wî di kirina sûc de tune be, mirov dikare bigihîje encama ku ew û xwediyê sûc ne di heman teraziyê de ne. Ji ber vê yêkê heman ceza lê nayê birîn. Lê belê di vê rewşê de da ku mirov bikaribe tesbîta cezayekî bike, pêdivî bi hin zanabûnên zêde û hûrikê meseleyê heye. Eger em di çarçoveya ayeteke bi mijara me re têkildar e bersivê bidin "**Kî jî neqenciyekê bike, vêca ew bi wê tenê tê cezakirin û li wan stemkarî nayê kirin**."[351]

Ji bo tesbîta cezayekî munasib, di serî de divê mirov "sûcê ku kiriye (جَاءَ بِالسَّيِّئَةِ)" bibîne.**

[349] Yûsuf, 12/70.
[350] Kasanî, **Bedaiu's-Sanai**', VII, 66.
[351] En'am, 6/160.
** Suat Erdoğan

252. Hukmê daxistina materyalan –bê destûr- ji înternetê çi ye?

Pirs: Daxistina materyalên mîna fîlm, muzîk, pirtûk û hwd. bê destûr ji înternetê, ji ber ku dibe sedem ji bo îxlalkirina mafê çêkeran, "sûcê ragihanzanî" tê jimartin. Tê gotin ku ev û sûcê diziyê manandê hev in. Ji aliyê mentiqî ve jî dema mirov lê dinihêre karê ku tê kirin, parçeyekî ji diziyê ye. Lê belê cezayê ku di Îslamê de ji bo diziyê tê dayîn, ji bo vî tiştî jî heye yan na? Min jî di demên cuda de bi vê rêyê fîlm û muzîk daxistibûn. Di vê rewşê de ma min jî dizî kiriye! Li gorî hukmê Îslamê divê ku destê min bê jêkirin? Eger em bi gelemperî bibêjin, cezayên van sûcan, cezayê ku di Qur'anê de ji bo diziyê hatiye aşkerekirin e yan tiştekî din e?

Bersiv: Di çarçoveya Qur'an-Sunetê de diziya ku sînorê wê hatiye xêzkirin û li hember wê cezayê destjêkirinê[352] heye, ne cezayekî ku ji bo hemû îxlalên li dijî mal tê kirin e.

Daxistina materyalan ne bi rêya huqûqî, ji ber ku ji aliyê her kesî ve bi hêsanî pêk tê û bi vî awayî dibe sedemê ku hirz (parastina materyalan) pêk nehatiye, dikeve bin qismê diziya besît û mirov dikare mîna "îxlalkirina maf" binirxîne û ji sûcên "ragihanzanî"yê bihesibîne. Lê belê ji bo vê jî divê ku materyalên ku hatine daxistin, di binê parastina kesekî yan jî saziyekê de be. Tiştên ku li derveyî heqê mulkiyetê dimîne, nakeve bin vî hukmî û mirov nikare behsa hukmê "îxlalkirina maf" bike.

Di vê rewşê de di îxlalkirina maf de dema mirov di çarçoveya qaydeyê "**Cezayê neqenciyekê bi neqenciyeke eynî mîna wê ye**"[353] binirxîne mirov dikare bigihîje van encaman:

Divê ku bi qasî qîmeta materyalan li xwediyê heq vegerîne,

Bi qasî wê jî li hember mafê civakê/giştî cezayê pereyan bide,

[352] Maîde, 5/38.
[353] Şûra, 42/40.

Ji ber ku di îstifadekirina ji xizmeta înternetê sînorê xwe derbas kiriye, cezayê mehrûmiyeta ji mafê înternetê bê dayîn.

Bi mînakekê em mijarê vekin: Em bifikirin ku yekî materyalekî ku mafê daxistina wê ya bê pere hatiye qedexekirin, daxist û piştre bi hinekî din re parve kir. Em bibêjin qîmeta wî materyalî ya madî 100 lîre ye. Di vî halî de 100 lîreyî bide xwediyê heq, 100 lîre jî mafê civakê/giştî divê ku wekî ceza bide û heta xwe îslah bike jî ji mafê înternetê bê mehrûmkirin.

Eger ev sûc ne bi mebesteke şexsî, belbî bi meqsedeke aborî hatibe kirin, divê ku mexduriyet ji holê bê rakirin û cezayê madî ku dê bê dayîn ji ber ku li gorî sûc tê tesbîtkirin, teqez dê meblaxên zêde were dayîn. Wekî din jî heta xwe îslah bike jî ji mafê înternetê û ji ticaretkirina bi rêya înternetê bê mehrûmkirin. Mirov dikare bibêje ku bicihanîn û tetbîqkirina cezayekî wiha di roja me de ne karekî zehmet e.[**]

[**] Suat Erdoğan

BEŞA DUYEM

- **KIRÎN Û FIROTIN**
- **DEYN**
- **FAÎZ**
- **BORSA**
- **ZAYIBÛNA EMANET**

KIRÎN Û FIROTIN

253. Ji dikana ku mey lê tê firotin, gelo caiz e ku mirov tiştekî bikire?

Pirs: Hukmê kirîna tiştekî ji dikaneke ku tê de mey (‘eraq û şerab) tê firotin çi ye? Li aliyê din, kirîna ne bi qesda vexwarinê, belbî ji bo ku mirov wê birêjîne, da ku hin kesên din wê venexwin, xêr e yan na?

Bersiv: Ne muhîm e ku firoşkar çi difiroşe. Ya muhîm tiştê ku hûn dikirin. Ji ber vê yekê kirîna tiştekî ji dikana ku digel tiştên xwarin û vexwarinê, meyê jî difiroşe, ne heram e. Lê belê bi qesda protestokirinê, eger hûn tercîha cihên ‘eraq û mey lê nayê firotin bikin, we karekî baş kiriye. Xwedê Teala wiha ferman dike:

“**Gelî bawermendan! Bêguman mey (şerab), qumar, peykerên çikandî û falên bi zar pîs in, ji karê şeytên in. Nexwe xwe ji wan dûr bigirin, da ku hûn serfiraz bibin**.”[354]

Wateya “**xwe ji wan dûr bigirin**”, yanî bila di navbera we û wan de qonaxek hebe. Ji vê sedemê, Qasidê Xwedê Teala wiha gotiye:

Ji Enes (x.j.q) hatiye ragihandin ku “Pêxemberê Xwedê Teala, di tiştên ku mirov serxweş dikin, li deh kesan lanet kiriye: “*Ê ku diguvêşe, ê dide guvaştin, ê vedixwe, ê hildigire, ê dide hilgirtin, ê têne ber mirov, ê difiroşe, ê pereyê wê dixwe, ê dikire û dide kirîn*.”[355]

Kesê ji dikan û marketên ku mey lê tê firotin tiştekî bikire, herçiqas nabe yekî ji wan deh kesên ku di hedîsa Pêxember de (s.a.w) derbas bû jî lê belê eger sirf ji bo pêkanîna fermana Xwedê Teala “**xwe ji wan dûr bigirin**”, rabe ji dikanek din bikire, dibe xwedî xêr.

[354] Maîde, 5/90.
[355] Tirmizî, Buyû‘, 59.

Bersiva pirsa we ya duyem: Mirovê misilman bi çi mebestê dibe bila bibe, ne durist e ku meyê bikire. Lewra li gorî 'ilmê fiqhê, tiştên ku Xwedê Teala heram kiribe, nabin mijar ji bo kirîn û firotinê. Ji ber vê yekê ji mirovê misilman re kirîneke wiha, ne caiz e. Ji dêvla ku mirov li hemberî meyê mucadele bike, divê ku mirov li hember meyxweran têbikoşe û rastiya meseleyê ji wan re bibêje. Kar û 'emelê esasî ji mirov re divê ev be.

254. Hukmê ku mirov ji yekî pere bistîne û bi zêdetirî lê vegerîne çi ye?

Pirs: Hukmê ku mirov ji yekî perekî bi deyn bistîne, lê belê ji deynê xwe zêdetir lê vegerîne çi ye?

Bersiv: Eger mirov di dema deyndayînê de bê şertê ku tê zêdetirî deynê min li min vegerînî bide, durist e. Heta di mezhebê Îmam Şafiî de helwesteke wiha, sunet tê qebûlkirin.

255. Gelo durist e ku di navbera bihayê bi deyn û pêşin de, ferq hebe?

Pirs: Di navbera bihayê firotina bi deyn û pêşin de gelo durist e ku hin ferq û cudahî çêbibe? Mîna mirov malekî pêşin bi 500î, lê belê bi deyn bi 700î bifiroşe. Di vî halî de ev ferqa di navbera herdu bihayan de ma dibe selef/faîz an nabe?

Bersiv: Dibe ku di navbera bihayê tiştan, bi pêşin û bi deyn de hin cudahî hebin; ne bi heman bihayî bin. Bi şertê ku mirov bikir nexapîne, ji nezanbûna wî ya bi bihayê bazarê îstifade neke û li gorî şertên bazarê be, mirov bihayê tiştan çi bi deyn çi jî bi pêşin, bi serbestî dikare tesbît bike.

256. Ferqa di navbera bihayê pêşin û bi deyn, gelo dibe faîz?

Pirs: Gelo durist e ku mirov ji bihayê pêşin zêdetir, bi deyn tiştekî bikire yan jî bifiroşe?

Bersiv: Durist e ku mirov ji bihayê pêşin cudatir, tiştekî bi deyn bifiroşe. Di vê mijarê de di navbera mezhebên Îslamî de tu ferq tune ye.

Di kirîn û firotineke wiha de pir kes guman dikin ku faîz çêdibe. Lê belê di vir de pere bi mal tê guhertin. Li gorî huqûqa Îslamê, di kirîn an jî firotineke wiha de faîz pêk nayê. Mîna mirov malekî pêşin bi 1.000î û bi deyn bi 2.000an bikire yan jî bifiroşe, caiz e. Ferqa di navbera pêşin û deyn de nabe faîz.[356]

Di kirîna bi deyn de divê di gava bazarê de tiştê ku mijara firotinê ye, bihayê wê û dema dayîna deyn, xuya be. Dema ev her sê şert hatin cî, ne muhîm e ku di navbera bihayên pêşin û bi deyn de cudahî hebe.[357]

257. Gelo durist e ku mirov malê xwe bi du bihayên ji hev cuda bifiroşe?

Pirs: Di kirîna pêşin de em ji %10 kêm didin. Lê belê ev kêmkirina biha, ji bikirên bi çekê dikirin re tune ye. Gelo di vê rewşê de em ji bikirên xwe yên ku bi çekê ji me dikirin, ferqa bi deyn nastênin? Di haletên wiha de ferqa ji bo ku bi deyn e tê stendin, ma nakeve bin hukmê faîzê?

Bersiv: Di ticaretê de firoşkar mafê wî yê diyarkirina biha -bi çi awayî bixwaze- heye; Dikare bi pêşin bi bihayekî û bi deyn jî bi bihayekî din bifiroşe. Bi şertê ku bikir nexapîne û bihayê wê li gorî rizaya herdu aliyan were tayînkirin, tu mehzûra wê tune ye. Lê belê divê ku qayde û esasê faîzê neyên îxlal kirin. Di vê pirsê de ji ber ku îxlala qaydeya faîzê tune ye, di kirîn û firotineke wiha de tu mehzûr tune ye.

---

[356] Kemaluddîn Îbnu'l-Humam, **Fethul-Qedîr**, V, 218, Bulak 1316.

[357] Şemsuddîn es-Serexsî, **el-Mebsût**, XIII/8, Babul-Buyû'il-Fasîde, Ji mezhebê Şafiî, Îbn Hecer el-Heysemî, **Tuhfetul-Muhtac bi Şerhîl-Minhac**, II, 37, Babul-Buyû'il-Menhiyyî anha wema yetbe'uha.

258. Gelo di karkirinê de, tu sînorekî diyar heye yan na?

Pirs: Di kirînên bi deyn de hin caran ji sedî sed kar tê kirin. Mîna malê ku bi 80 lireyî bê kirîn, pêşin bi 100î û bi deynê salekê bi 200î bê firotin. Ma di kirîn û firotinê de ji bo karkirinê sînorekî xuyakirî heye yan na?

Bersiv: Di kirîn û firotinê de çênabe ku sînorekî xuyakirî ji bo karê hebe. Pêxemberê me (s.a.w) îhtimam daye ku bihayê tiştan, di derdorên reqabeta azad de pêk were û derkeve holê û tiştên ku dibin asteng ji bo vê, qedexe kiriye. Li Medîneyê bihayê tiştan zêde dibe û gel ji Qasidê Xwedê Teala xwestine ku "**nerh**"ê tetbîq bike. Nerh, bi wateya tesbîta bihayên tiştan ji aliyê desthilatdaran ve, ku herî zêde dê bi çiqasî bê firotin e. Li ser vê daxwaziya gel, Qasidê Xwedê (s.a.w) wiha dibêje:

"*Kesê ku bihayan tesbît (aşkere) dike, dadixîne, berfireh dike û riziq dide Xwedayê Bilind e. Daxwaziya min ya bingehîn ku ez bigihêjim Rebbê xwe, bêyî ku tu kes ji we dozê ji bo neheqiyekê di derbarê can û mal de ji min bike.*"[358]

Bi vê gotina xwe, wî tetbîqa "nerh"ê qedexe kiriye. Zanyarên 'ilmê fiqhê yên ku ji bo tetbîqa nerhê fetwa dane, ev fetwayên wan bi giştî ji bo rewşên zerûrî ne. Lê belê ev fetwa, hem li dijî vê qedexekirinê ye û hem jî di pêş de dibe sedem ji bo ziyan û xisara gel. Lewra, dema nerh bê tetbîqkirin, dê mal hindik têkeve sûkê û dê xela û sûka reş li bazaran, bike serdest. Encax bi sûk bazareke azad, mumkin e ku erzanî pêk were.

259. Gelo rast e ku îmam Ebû Henîfe, di tîcaretê de ji bo karkirinê sînorek daniye?

Pirs: Tê angaştkirin ku Îmam Ebû Henîfe sînorê karkirinê bi sedî ji sed, sînor kiriye. Tê gotin ku "Li gorî Ebû Henîfe, ku mirov di malekî de çi di firotinekê de çi jî di çend firotinan de bi giştî ji sedî sed zêdetir kar bike, ne caiz e." Di derheqê vê yekê de hûn çi dibêjin?

[358] Tirmizî, Buyû', 73.

Bersiv: Îman Ebû Henîfe, tu sînorekî xuyakirî ji bo karkirinê tesbît nekiriye. Mijara ku behsa wê tê kirin, ne di mijara sînorê karkirinê de ye. Belbî di derbarê murabeheyê (firotinên bi kar) de ye. Firotina murabehê ev e: Ku mirov bihayê kirîna mal an jî bi çi li ser mirov bûye mal û kara xwe jî têxe ser û bihayê wî bide bikir. Kurteya gotinên Ebû Henîfe di vê mijarê de wiha ye:

Kesê malekî ku bi deh lîreyan kirîbe û bi bîstî bifiroşe, piştre heman malî bi deh lîreyan bikire ew mal bi belaşî dikeve destê wî. Malê ku maliyeta wî sifir be, bi rêya murabehê %10, % 20 bi karê bifiroşe, ne pêkan e. Lewra sifra ji % 10 û ji % 20an, sifr e. Bi vê sedemê Îman Ebû Henîfe dibêje ku di rewşeke wiha de firotina bi rêya murabehê nabe. "Lewra di firotina murabehê de karkirin parçeyekî ji bihayê mal e."[359] (Yanî malê ku cara duyem kiriye bi belaşî ketiye destê wî. Ji ber vê yekê cara duyem heman malî bi rêya murabehê nikare bifiroşe.)

Li hember vê, Îmam Ebû Yûsuf û Îmam Muhemmed dibêjin ku em, kirîn û firotina cara yekem nakin hesabê. Ji ber ku vî kesî heman mal careke din bi deh lîreyan kiriye, wê demê para murabehê li ser van deh lîreyan tê hesabkirin. Ne li ser bihayê kirîna cara yekem.[360]

Ji ber vê yêkê nêrîna Îmam Ebû Henîfe ku dibêje bi awayekî wiha murabehe pêk nayê, ne rast e ku mirov wê bi sînordayîna ji bo karkirinê re tevlihev bike, yanî şaş bike. Şayed ev kesê han, vî malî ne bi rêya murabehê belbî bi bazarkirinê, yanî bêyî ku bihayê mal an jî maliyeta wê bibêje, dîsa bi 20 lîreyan bifiroşe, li gorî Îmam Ebû Henîfe, tu mehzûra wê tune ye.

260. Ma rast e ku di "Mecelle"yê de tesbîta sînorê karkirinê hatiye danîn?

Pirs: Hin kes dibêjin ku ji bo karkirinê di "Mecelle"yê de tesbîta sînorekî hatiye kirin. Hûn dikarin ji rastiya vê yekê me agahdar bikin?

[359] Kasanî, **Bedaiu's-Sanai'**, V, 221.
[360] Kasanî**, Bedaiu's-Sanai',** V, 224.

Bersiv: Em dibînin ku hin kes sînorê "xebnî fahiş" ya ku di "Mecelle"yê benda 165an de derbas dibe, bi sînorê karkirinê tevlihev dikin. Benda ku di "Mecelle" de derbas dibe tu têkiliya wê bi sînordayîna karkirinê re tune ye. Lewra xebnî fahiş, mijareke din e. Hûn dikarin vê mijarê, di beşa "İslam İktisadı" (Aboriya Îslamî) de ji malpera me bixwînin. http://www.suleymaniyevakfi.org/islam-iktisadi.html#

Benda di "Mecelle"yê de wiha ye:

"Gabn-i fâhiş, uruzda nısf-ı uşur ve hayvanatda uşur ve akarda hums mikdarı veya daha ziyade aldanmakdır.**"**

Weregera wê: "Xebna fahiş ku mirov, di pertalan de ji deha nîv, di heywanan de ji deha yek û di 'eresan (xeyrî menqûlan) de ji pênca yek an jî hîn zêdetir bê xapandin."

261. Gelo dînê Îslamê ji bo karkirinê, tu sînorek daniye?

Pirs: Hin kes dibêjin ku dînê Îslamê sînorek ji karkirinê re tesbît kiriye. Ew kar jî di malên ticaretê de % 5, di kirîn û firotina heywanan de % 10 û di malên xeyrimenqûl de ji % 20 e. Di firotinê de eger karek ji wê zêdetir bê bidestxistin, dibe qezenza fahiş yanî dibe heram. Di vê mijarê de hûn çi dibêjin?

Bersiv: Huqûqa Îslamî, di kirîn û firotinê de ji bo karkirinê sînorek dananiye. Bihayê tiştan, ji mudaxeleyên ji der ve dûr û bi awayekî azad pêk tê û mal bi wî awayî li gorî bihayê sûkê û bazarê tê firotin. Para karkirinê, çi pir çi hindik dibe, ne muhîm e. Firoşker, nikare malê xwe bi bihayekî fahiş bifiroşe.

Buhayê fahiş, ê ku di ser bihayê bazarê de ye. Dema bihayê fahiş bigihîje astekê, ê ku hatiye xapandin dikare bazara ku kiriye betal bike. Rêjeya ku di pirsa we de derbas dibe, di "Mecelle"yê benda 165an de ji bo tesbîta rêjeya (xebnî fahiş) xapandina fahiş e. Mîna kesê ku malekî bihayê wî yê bazarê bi 100î be, bi 105 lîreyan

bikire û piştre agahdar bibe ku hatiye xapandin, dikare wî malî vegerîne û pereyê xwe bistîne. Yanî di rewşên wiha de mafê bikir heye ku bazarê betal bike.

Xapandin, ne sirf ji bikir re heye. Belbî ji bo firoşker re jî heye. Mîna di zemanê me de bihayê tiştan pir zêde dibin. Malekî ku di bazarê de bihayê wî zêde bûbe, lê belê ji ber ku hayê firoşker ji zêdebûnê tune ye, rabe bi kêmî bihayê bazarê malê xwe bifiroşe, piştre angaşt bike ku hatiye xapandin, dê li meseleyê bê nihêrtin, eger malê xwe bi %5 kêmî bihayê bazarê firotibe, dikare wê firotinê betal bike. Li gorî Mecelle'yê rêjeya xapandinê di malên ticaretê de ji %5, di heywanan de ji %10 û di malên xeyrimenqûl de ji %20e.

262. Malê ku di destê me de ye, dema bihayê wê zêde bibe, ma divê em bi kîjan bihayî bifiroşin?

Pirs: Malê ku em dikirin, şayed bihayê wî zêde bibe, gelo em jî dikarin bihayê xwe zêde bikin? Mîna malê ku em bi 100î dikirin û bi 110an difiroşin, kirîna vî malî ku bû 140 lîre ma em dikarin tiştê mayî ji mal, li gorî bihayê nû bifiroşin?

Bersiv: Hûn dikarin li gorî bihayê nû wî malî bifiroşin. Dema hûn tiştekî difiroşin, bihayê kirînê nayê îtibarkirin, belbî mirov dê li bihayê wê rojê binihêre. Malê ku we bi 10 lîreyan kirîbe gava ku bihayê wî li bazarê bû 100 lîre, hûn bi 100î bifiroşin. Li aliyê din malê ku we bi 100 lîreyan kirîbe û bihayê wî daket 10an divê hûn wî jî bi 10an bifiroşin. Ev, ji bo kirîn û firotinê, rêgezek xwezayî ye, yanî qaydeyekî esasî ye.

263. Ma firotina malekî bi bihayê nû durist e yan na?

Pirs: Hin kes dibêjin ku hûn nikarin malê di destê we de ye bi bihayê nû bifiroşin, divê ku hûn bi bihayê kevn bifiroşin. Ma tu bingeh ji vê gotinê re heye?

Bersiv: Ji vê gotinê re tu esas û bingeh tune ye. Di heman wextê de ev gotin li dijî emrê Xwedê ye ku divê bihayê tiştan li gorî rizaya herdu aliyan be. Lewra dema

bihayê tiştan zêde bibe û mirov ji firoşker bixwaze ku bi bihayê kêm yanî yê berê bifiroşe, dibe firotineke bi zorê û bê riza dilê wî. Xwedê Teala wiha ferman dike:

"**Gelî bawermendan! Di navbera xwe de malên hev bi neheqî nexwin, lê belê ji bazirganiyeke ku we bi dilê xwe li hev kiribe hûn dikarin bixwin.**"[361]

Qasidê Xwedê (s.a.w) wiha gotiye:

"*Ku ne bi riza dilê mirov be, malê tu kesî li kesekî din helal nebe*."[362]

264. Di firotinê de bihayê wê demê yan jî malê ku hatiye firotin tê îtibarkirin?

Pirs: Em karê esnaftiyê dikin. Usûla firotina me bi vî awayî ye: "Bi bihayê pêşin, lê belê piştre em pereyê xwe distînin". Dema em malekî difiroşin, bi bihayê wê rojê li fîşekê dinivîsin. Lê belê hin caran, encax piştî salekê em dikarin deynê xwe tehsîl bikin. Di hundirê wê demê de hin caran bihayê mal zêde dibe û ji bihayê ku me ji kirîdar re nivîsandiye, derbas dike. Di rewşeke wiha de ku em bi bikir re biaxivin û fîşên berê hatine nivîsandin ji nû ve serast bikin û em wan bi yên nû biguherînin, caiz e yan na?

Bersiv: Di rewşên wiha de muamele, ya bihayê mal tê tesbît kirin/qeydkirin û belge li gorî wê tên sazkirin an jî mal û mîqdarê wê bi xwe tê nivîsandin. Eger bihayê mal hatibe tesbîtkirin û tomarkirin û bazar bi vî awayî hatibe temamkirin, dema qewlê deynê mirov hat an jî di rojeke din de bêyî ku tu guhertin çêbibe li gorî bedelê tesbîtkirî deyn tê dayîn.

Na, eger bazar bi qeydkirina mal û mîqdarê wê hatibe kirin, mirov dikare li gorî bihayê malê wê rojê deynê xwe ji deyndar tehsîl bike. Ev rêbaz û metod, di

[361] Nîsa, 4/29.
[362] Ehmed kurê Henbel, **Musned**, V, 72.

malên ticaretê yên tên firotin û di bedêla wan de pere tê stendin de derbas dibe, ne di yên ku dikevin bin hukmê kirîn û firotina bi faîz.[**]

265. Dema mirov deh çewalan bi deyn bibe, dê deynê xwe çawa bide?

Pirs: Ez karê elaftiyê dikim. 10 çûwalên ku min firotiye bikir, 100 lîreyan digire û ez li deftera deynan dinivîsim. Piştî ku salek di ser de derbas dibe, bikir dê deynê min ê ku lê ye 100 lîreyan bide yan jî dê li gorî bihayê piştî salekê were nirxandin û wî bihayî bide min?

Bersiv: Piştî ku we bazara xwe fek kir û mal hat teslîmkirin, deynê bikir sirf dibe 100 lîre. Eger deynê xwe di wext de nede û bi sedem enflasyonê qîmeta pere dakeve, hûn dikarin ji roja qewlê xwe ferqa enflasyonê ji bikir tehsîl bikin. Ji vê pê ve, hûn nikarin doza tiştekî din lê bikin.

266. Dema mirov dev ji bazarê berde, gelo tu cezayekî wê heye?

Pirs: Piştî mirov di derbarê kirîna tiştekî de li hev kir, lê belê beriya ku ‘eqda kirîn û firotin bê fekkirin bi sedemeke mirov dev ji bazar û kirînê berde, gelo tu cezayekî ku mirov bide heye yan na?

Bersiv: Kirîn û firotin, bi gotina bikir û firoşker ku bibejin “min firot” û “min kirî” pêk tê. Ji bo duristiya bey‘ê, teslîmkirina mal ne şert e. Belbî ev, encameke ji encamê wê ye. Piştî ku bazar ango firotin pêk hat, bikir nikare bibêje ku ez nakirim. Divê ku mal teslîm bigire û li ser çi bedelî li hev kiribin bide.

Eger bi razîbûna firoşker be, bikir dikare mal vegerîne. Ji ber ku ev vegera han dibe bazareke nû, durist e ku bi bihayekî cuda li hev bikin. Û bi vî awayî hinek ji zirara firoşker jî bê telafîkirin.

[**] Prof. Dr. Servet Bayındır

267. Gelo kirîna malê hicizkirî, caiz e?

Pirs: Dînê Îslamê, di derbarê kirîn û firotina malên icizkirî de tiştekî dibêje yan na? Û gelo tu îctîhadên bi vê mijarê re têkildar in, hene?

Bersiv: Piraniya zanyarên (fuqehayên) dînê Îslamê, hicizkirina malê deyndar û firotina wî caiz dibînin. Kirîna malekî bi vî awayî jî helal e. Fuqehayan di gihîştina vê encamê de delîla xwe ya huqûqî ji kirina Pêxember (s.a.w) dema biryara îflasa Muazê kurê Cebel dide, bi rêya hicizê dest dide ser malê wî û tiştê bi firotinê tê bidestxistin di nava deyndêrên wî de belav kiriye, digirin.[363] Herwiha Hezretî 'Umer jî hiciz daniye ser malê yekî bi navê Ûseyf el-Cuhenî û malê wî daye firotin. Piştre pereyên ku jê hatiye, di navbera deyndêrên wî de belav kiriye.[364]

Pêxember (s.a.w) wiha ferman kiriye: "*Ew kesê ku qaweta wî ji bo dayîna deynê wî hebe û bi derengî bixe, helal e ku were ceza û şermezarkirin*."[365]

Îbrahîm en-Nexeî, Îbn Sîrîn, Zeydê kurê 'Elî, Ebû Henîfe, Îmam Zufer û hin zanyarên din dibêjin; malê deyndar nayê hicizkirin û bi rêya hicizkirinê nayê firotin. Lewra bi rêya hicizkirinê, malê deyndar bê riza dilê wî tê firotin û 'eqdeke bê riza firoşker ne sehîh û durist e. Li gori van zanyaran cezayê ku dê bê dayîn ev e; heta deynên xwe bide dê bê girtin, hepiskirin. Îmam Ebû Henîfe dema neduristiya wê mijarê dide xuyakirin, bi taybetî giraniya xwe dide ser vê ayetê: "**Gelî bawermendan! Di navbera xwe de malên hev bi neheqî nexwin, lê belê ji bazirganiyeke ku we bi dilê xwe li hev kiribe hûn dikarin bixwin**."[366] û hedîsa "*Malê kesê misilman, encax bi riza dilê wî helal e*."[367] wekî delîl nîşan dide.

"Encax li aliyê din, digel ku Îmam Ebû Henîfe firotina bi zorê yanî ya bi rêya heczê wekî usûl û qaydeyekî, caiz nabîne, lê dîsa jî di hin cihan de stendina mal ji

[363] Şewkanî, **Neylul-Ewtar**, V, 275-276; Ji bo agahiyên zêdetir bnh: Muslim, Musaqat, 18.
[364] Serexsî, **el-Mebsût**, XXIV, 164.
[365] Buxarî, Îstiqrad, 14.
[366] Nîsa, 4/29.
[367] Darequtnî, III, 26.

xwediyê mal bi zorê qebûl dike. Mesela: Dema cureyê malê telebkar û deyndar heman cur be, mîna deyn zêr be û li cem deyndar jî zêr hebin, wê gavê dê bi zorê jê bê stendin. Heta Ebû Henîfe ji bo telebkarên pereyan "îstihsanen"rêyeke din jî qebûl dike. Li gorî vê, li ser meselê deynê wî zêr in, lê belê li cem wî sirf zîv heye û zêr tune ye, wê demê dê dadger zîv bifiroşe û pê zêr bikire û dê bi zêrîtî bide xwediyê deyn."[368]

Caizbûn û duristiya firotina malên hicizkirî tê wateya ku kirîna wan malan jî caiz e.

268. Hukmê kirîn û firotina pisîk û kûçikan çi ye?

Pirs: Gelo firotina pisîk û kûçikan, caiz e yan na?

Bersiv: Di derbarê caizbûna kirîn û firotina pisîkan de her çar mezheban jî nêrînên erênî ragihandine. Lê belê hin hedîsên ku kirîn û firotina kûçikan qedexe dikin, hene.[369] Ji ber wan qedexeyên ku di hedîsan de derbas dibin, mezhebê Şafiî û Henbelî, firotina kûçikan caiz nabînin.

Di mezhebê Malikî de ji ber hedîseke ku di Nesaî de derbas dibe[370] firotina kûçikên nêçîrê û yên ji bo notirvaniyê, caiz dibînin. "Kûçikên ku di roja me de ji bo şopîn û rêçgerandina li pey tawanbaran û yên ji bo tesbîta bûjenên tiryakî û narkotîkê û hwd., tên bikaranîn, dikeve bin vê beşê."[371]

Di mezhebê Henefî de kûçik wekî malekî helal tê jimartin. Kirîn û firotina wî jî rast û durist e. Hedîsa ku firotina wî qedexe dike, di serê Îslamê de bûye û dibêjin

[368] Fahrettin Atar, "Haciz", **DİA,** 1996, XIV, 518-519.
[369] Buxarî, Buyû', 113; Muslim, Musaqat, 39 (1567).
[370] Nesaî, Buyû', 91.
[371] Hüsameddin Affane, **Fıkhî ve Ahlâkî Yönleriyle İslam'da Ticaret**, wergêr: Servet Bayındır, Weşanên Polen, Stenbol 2007, rp. 168.

dûvre ew hukmê han jî rabûye yanî nesix bûye. Ji ber wî hawî firotina hemû cureyên kûçikan, caiz dibînin.[372]

269. Gelo şikandina* çekan, caiz e?

Pirs: Hevalekî min bi deyn mal difiroşe û di bedêla mal de çekên piştî du-sê mehan digire. Piştre wan çekan dişikîne yanî ji bo her mehekê ji sedî şeş bi kêmasî dike neqît. Gelo karekî wiha, caiz e yan na?

Bersiv: Di "çekên bi wade" de beriya ku zemanê wê were û mirov di hemberî rêjeyeke xuyakirî ji pereyan, hûrbike û bike neqît, ev dibe muameleyeke ribewî yanî dibe "faîz". Çawa ku îro tu 90 lîreyî bistînî, piştî mehekê tu 100î bidî, dibe faîz, ev jî herwiha faîz e.

270. Firotina fêkiyên daran beriya ku kulîlkên xwe vekin

Pirs: Li hin deveran darên fêkiyan beriya ku kulîlkên xwe vekin, fêkî tên firotin. Di vê rewşê de hem xwediyê erd û hem jî yê ku fêkiyan dikire hin caran kar dikin û caran jî zirar dikin. Di fiqha Îslamê de firotina bi vî awayî digel razîbûna herdu aliyan, gelo durist e yan na?

Bersiv: Firotina bi vî awayî eger bi rêya **"'eqda selem**"ê be, caiz e.

Selem, ji firotineke pere pêşîn, lê mal piştre tê dayîn re tê gotin. Di vir de firotina selemê, ne wekî firotina bi deyn e. Di dema 'eqda selemê de divê tesbîta mîqdarê mal, taybetiyên wî, cih û tarîxa teslîmkirina wî were kirin. Firotina bi rêya selemê pere pêşin tê dayîn û tê firotin, lê hilberîn yan jî teslîma mal şûnde pêk tê. Gava 'eqda selemê li gorî şertên ku hatiye gotin pêk bê, caiz e.

'Eqda selemê ku mutabiqî şertên xwe be, pere pêşin û malê ku dê di tarîxeke pêş de bê hilberîn ji niha ve tê firotin û bedelê mal neqît tê stendin.

---

[372] Kasanî, **Bedaiu's-Sanai**', V, 143.

* Berî wadeya çekê were, mirov çeka xwe li cem yekî bi qîmetekî kêmtir hûr bike.

Îbn ‘Ebbas (x.j.q) wiha dibêje: Dema Pêxember (s.a.w) hat Medîneyê, mirovan mehsûlê xurmeyan ê du sal yan jî yê sê salên pêş, difirotin: Pêxember (s.a.w) ferman kir ku: “*Ew kesê ku tiştekî berê bifiroşe, divê ku mîqdar, pîvan û wada wê diyar bike.*[373]” [374]

271. Hikmê bazirganiya li pêşiya mizgeftan çi ye?

Pirs: Ma caiz e mirov li pêşiya mizgeftan bazirganiyê bike? Di derbarê vê mijarê de gelo tu hadîs an jî ayeteke ku tiştekî wiha qedexe bike heye?

Bersiv: Tu ayet an jî hedîseke ku bazirganiya li pêşiya mizgeftan qedexe bike tune ye. Lê belê hatiye ragihandin ku Pêxember (s.a.w) bazirganî/kirîn û firotina di hundirê mizgeftê de qedexe kiriye.[375]

Ji ber vê hedîsa ku di Tirmizî de derbas dibe û dereceya wê “**hesen xerîb e**”, hin zanyarên Îslamê danûstendina di hundirê mizgeftan de caiz nabînin. Lê belê hin alimên din ji ber ‘**illetê** di hedîsê de vê kirîn û firotinê caiz dibînin.

Nîşe: Têgeha “**hesen xerîb**” ya ku Îmam Tirmizî bikar aniye, dide xuyakirin ku ew hedîs ne sehîh û ne ji zeîf e.[376]

272. Ma rast e ku Pêxemberê me (s.a.w) dema wefat kiriye, zirxê wî di ber deynê Cihûyekî de gerew bûye?

Pirs: Li gorî tê gotin Pêxember (s.a.w) beriya ku wefat bike, zirxê xwe di berdêla deynê xwe de li ba yekî Cihû wekî gerewê datîne. Ma ev tiştê han rast e? Ger rast be jî divê em vê çawa fêhm bikin?

---

[373] Buxarî, Selem, 2.
[374] Bnh: Abdülaziz Bayındır, **Ticaret ve Faiz**, Weşanên Weqfa Suleymaniyeyê, Stenbol 2007, rp. 149.
[375] Bnh: Tirmizî, Buyû‘, 77.
[376] Bnh: İsmail Lütfi Çakan, **Hadis Edebiyatı**, Weşanên Marmara Üniversitesi İlahiyat Fakültesi, Stenbol 1985, rp. 65.

Bersiv: Di hedîsa ku ji Hezretî 'Aişeyê (x.j.q) hatiye ragihandin; Resulûllah dema wefat dike zirxê wî li ba yekî Cihû di berdêla sî sa'[*](di riwayeteke din de bîst sa') ceh de bi gerewî hatibû girtin.[377]

Wekî ku tê dîtin, ew bûyereke rast e û di pirtûkên 'ilmê hedîsê de derbas dibe. Tiştê ji vê bûyerê tê fêhmkirin jî ku danûstandina bi yên xeyrimuslim re û rehin dayîna ji bo kirîn û firotinê, ne mehzûr û qedexe ye. Belbî caiz e.

273. Hukmê beşdarbûna rêxistina Lyonessê çi ye?

Pirs: Niha rêxistinek bi navê Lyonessê tê Tirkiyê. Sîstem ev e: Endamén Lyonessê, ji cihên bi Lyonessê re peyman pêk anîne bi erzanî danûstendinê/kirîn û firotinén xwe dikin. Ên ku dibin endamê sîstemê, karteke bi navê Cashback, digirin. Mîna karta "Kiler Kart" an jî "Monay Kart". Dema mirov tiştekî dikire, wê kartê nîşanî qasedar dide û tenzîlatê qezenc dike. Ev tenzilat, rasterast bi peretî derbasî hesabê mirov dibe. Dema ez hin kesên din jî dikim endamê vê sîstemê, ji kirînên endamê xwe jî ez parekê bi dest dixim. Bi vî awayî: Dema yekî ku min ew kiriye endam tiştekî bikire ji %0.5, ê ku wî kiriye endam tiştekî bikire dîsa ji %0.5 derbasî hesabê min dibe. Dema ez tiştekî bikirim, ji %1 bi peretî li min vedigere. Endamên ku piştî wan herdu endaman tên, dema tiştekî bikirin heta bigihîjin sînorekî diyar, piştî ku li gorî hesabê pozisyona sîstema Lyonessê bê hesabkirin, bi peretî derbasî hesabê min dibe. Di vê sîstemê de endamên jêr ji kirînên endamên jor û yên jor jî ji kirînên endamên jêr, qezenc dikin. Sîstema hesabkirinê li gorî pozisyonên wan, vê pêk tîne. Lê belê, ên li jor cih girtine her dem bêhtir qezenc dikin. Di vê sîstemê de qezenckirin; li ser esasê tiştê ku ji tenzilata kirînan tê bidestxistin û di nav endaman de tê parvekirin, pêk tê. Di kirîneke bi 100 lîreyî de eger %15e tenzilat hebe, ev 15 lîreyên han: 1-Lyoness 2-Endam 3-Fona Alîkariya Zarok û Malbatan 4- Bi bacitî ji dewletê re tê belavkirin. Di sîstemê de armanc; bidestxistina tenzîlatan û -ji firmayên ku

[*] Sa', çar kulm e. Her kulm jî 432 gr e. Ev jî bi tevahî dike 1728 gr. Ango nêzî du kg me. Bnh: Muhemmed ez-Zuhrî el-Xemrawî, **Enwaru'l-Mesalik Şerhu 'Umdeti's-Salik we 'Iddeti'n-Nasik**, çapa 1em, Muessesetu'l-Kutubi's-Seqafiyye, Beyrût 2006, (jêrenota yekem) rp. 153. (amadekar)

[377] Buxarî, Cîhad, 89, Mexazî 86; Tirmizî, Buyû', 7; Nesaî, Buyû', 58.

dixwazin civakeke xerîdar a mezin pêk bînin- karkirina pereyan ji bo endamên vê sîstemê. Li gorî van agahiyan, pereyên ku ji vê sîstemê tên bidestxistin helal e yan na?

Bersiv: Di muamela ku behsa wê hat kirin, rewşa bêyî ku tu tiştek bê kirin, bi tenê ji xerîdariyê qezenc tê bidestxistin, dertê holê. Hal ew e ku Xwedê Teala di Qur'ana Pîroz de di ayeteke ku bi vê mijarê re têkildar e wiha ferman dike: "**Gelî bawermendan! Di navbera xwe de malên hev bi neheqî nexwin, lê belê ji bazirganiyeke ku we bi dilê xwe li hev kiribe hûn dikarin bixwin.**"[378] Ticaret jî guhertina mal û xizmetê bi xwe û guheretina cih an jî zemanê wî, îfade dike.

Li aliyê din, çawa ku ji nimûna metnê peymanê tê fêhmê, da ku mirov bikaribe têkeve vê sîstemê û karê bidest bixe, pir peymanên ku li dijî hev in (peymanên murekeb û dubendî) di xwe de digire û kombûna 'eqdên li dijî hev di peymanekê de di fiqha Îslamê de hatiye qedexekirin.

Unsurekî din î dike ku ev muamele mehzûr be, bêyî ku mirov karekî bike, ji xebatên hin kesên din debar û îdara xwe dike. Ya herî muhîm di asta global de ku mirov hilberîner û firoşkaran dixwe bin zorê, zirarê dide rizaya wan û ev sîstem armanca pawankirinê di hundirê xwe dihewîne.

Di encamê de di bin ronahiya van agahiyan de qinyata me: Ji aliyê fiqhî ve beşdarbûna rêxistinên (organizasyonên) wiha, ne caiz e.[**]

274. Gelo stendina kuponan caiz e yan na?

Pirs: Min ji firoşgehekê hin kinc kirîn. Li hemberî wê kirîna min, kuponê wesayîtê dan min. Gelo wesayît ji min re derkeve, helal e yan na?

Bersiv: Ji bo kupona wesayîtê, eger we perekî zêde nedabe, sirf pereyê tiştên we kiriye dabe, di vê de tu mehzûrek tune ye û nakeve bin hukmê qumarê.

---

[378] Nîsa, 4/29.

[**] Prof. Dr. Servet Bayındır

Tesbîtkirina kesên ku dê wesayîtan bi rêya pişkê kar bikin, wî karî nake qumar. Lê belê, ji bo beşdarbûna rakêşanê, eger hûn perekî zêde bidin, wê demê ew rêxistin/organizasyon dibe qumar.

275. Ma divê ku mirov hemû taybetmendiyên mal ji bikir re bibêje yan na?

Pirs: Ez di bazarê de dixebitim û karê gorefiroşiyê dikim. Hin gore lingan dişidînin û hin naşidînin. Dema ez tiştekî difiroşim, çi gore çi jî malên din, ma divê ku bi taybetî ez ji wan re vê yekê bibêjim? Ev jî heye, ne mumkin e ku ez ji hemû bikiran re taybetmendiyên mal bibêjim. Heta di hin deman de ji ber qelebalixiyê, ez bi bikiran re nikarim mijûl jî bibim. Ka ez ê çawa taybetmendiyên mal jê re bibêjim!

Bersiv: Di mal de hin standartên diyar hene. Di rewşên ku di mal de ew standart tune bin, esil ew e ku tu bikir agahdar bikî. Eger bikir mal bibîne, lê binihêre û biecibîne, ne hewce ye ku tu jê re şîrove bikî. Encax dema bikir taybetmendiyên mal ji te bipirse divê ku tu jê re bibêjî.

276. Ma firotina bi rêya "Bey'ê bil-Wefa", caiz e?

Pirs: Firotina malekî bi şertê çi dema mirov bedêla wî bide, mal dîsa yê bikir e, caiz e yan na?

Bersiv: Ev kirina han, di fiqhê de bi navê "bey'ê bil-wefa" tê naskirin. Ev kar, herçiqas wê têxin şeklê kirîn û firotinê, dîsa jî muameleyeke bi faîz e û ne caiz e.

"Bey'ê bil-Wefa, ji firotineke çi dema bedêla wê bê dayîn, firoşker malê xwe paş de vedigerîne yanî distîne re tê gotin. Ev 'eqd û peyman, ji 'eqda gerew û kirînê, pêk tê. Bi usûl û metoda ku gel dibêjin, "erd bê îcar, pere bê faîz", tê kirin. Li ser meselê, yekî îhtiyaciya wî bi 10.000 lîreyî heye; bi nisbeta %10 dikare pere bibîne, lê belê, divê vê ferqê bi usûleke ku nekeve faîzê bide. Eger erd an jî dikaneke wî ku salê 1.000 lîreyî tîne hebe, wê bi rêya "Bey'ê bil-Wefa" bi 10.000 difiroşe. Û heta pere bîne, kirê/îcara dikanê bikir distîne. Şayed pere neanî, dikan bi temamî/birastî dibe malê

bikir. Tu deynekî din li firoşker peyda nabe. Qedexe ya ku di "sefqeyekê" (bazarekê) de du bazar, dike ku ev kar bibe ji muameleyên bi faîz."[379]

Sefqe, bi wateya lêdana dest li dest e. Ên bazarê dikin, ji bo bidin nîşandan ku di bazarê de li hev kirine, wiha dikin. Qasidê Xwedê (s.a.w) hebûna du bazaran di bazarekê de qedexe kiriye.[380]

Ev qedexe, qedexebûna du 'eqdan/bazaran di bazarekê de ye. Li gorî ku Ebû Hureyre (x.j.q) radigihîne Qasidê Xwedê,di firotinekê de du firotin qedexe kiriye.[381] Û wiha gotiye: "*Kî di firotinekê de du firotinan bike, ya wê bedêla kêm bistîne yan jî dikeve faîzê*."[382]

Ji bo agahiyên berfirehtir di derbarê firotina **Bey'ê bil-Wefa** de ji kerema xwe re li çavkaniya di jêrenotê de ne binihêrin.[383]

277. Ma firotina malê ku ne di destê mirov de ye caiz e?

Pirs: Ma mirov bi rêya înternetê zêr bikire û bifiroşe û bi vî awayî pereyan qezenc bike, helal e yan na? Herwiha ji hedîsên di derbarê ticaretê de ez fêhm dikim ku malê ne di destê mirov de be, firotina wî hatiye qedexekirin. Lê belê di zemanê me de bi rêya "e-ticaretê" firotin pêk tên. Di vê muamelê de bikir û firoşker li ser înternetê hev dibînin û di hawirdorekî nîgaşî/xeyalî de dikirin û difiroşin. Ne bikir û ne jî firoşker mal nabînin. Pirê caran firoşker malê ku wê demê di destê wî de ne hazir e, difiroşe. Muameleyeke bi vî rengî gelo caiz e yan na?

Bersiv: Bi şertê ku kirîn û firotin bi pêşin be û teslîmgirtina zêr bi dest/bi qeydkirina li hesabê li Bankê be, caiz e. Lewra Pêxemberê me (s.a.w) di kirîn û firotina zêr de pêşinatî, teslîmgirtin û stendina zêr û pereyan, şert dêraye:

---

[379] Bayındır, **Ticaret ve Faiz**, rp. 70-71.
[380] Ehmedê kurê Henbel, **Musned**, I, 1398.
[381] Tirmizî, Buyû', 18.
[382] Ebû Dawûd, Buyû', 55.
[383] Bayındır, **Ticaret ve Faiz**, rp. 218-225.

"*Zêr bi zêr, zîv bi zîv, genim bi genim, ceh bi ceh, xurme bi xurme û xwê bi xwê, ji heman cureyî (yek bi yekî), wekî hev bin û bi pêşin bin dibe. Eger cureyê wan cuda bin, bi şertê ku pêşin bin, çawa bixwazin hûn dikarin bifiroşin*."[384]

Hedîsa ku firotina malê ne di dest de qedexe dike wiha ye: Ji Hakimê kurê Hazim (x.j.q): Ez hatim ba Qasidê Xwedê (s.a.w): "Yek tê cem min û malekî bi min re tune ye, dixwaze ji min bikire. Ez jî ji bazarê/sûkê mal ji bo wî dikirim. (Di derbarê vî karî de hûn çi dibêjin)" Qasidê Xwedê wiha bersiv da: "*Tiştê ku li ba te tune ye nefiroşe***.**"[385]

Di vê hedîsê de sedemê qedexebûna firotina malê ku ne di destê mirov de ye, da ku yek ji herdu aliyan mexdûr nebe. Di ticareta li ser înternetê de taybetmendiyên mal hemû tên gotin. Eger mal li gorî wan şertan dernekeve, ji bikir re îmkan û mafê vegerandina mal heye. Li aliyê din, eger firoşker mal teslîm neke, pere derbasî hesabê wî nabe û bi vî awayî xeter û mehzûra ku di hedîsê de hatibû qesdkirin dernakeve holê/nayê meydanê. Encax, eger bi hin niyetên xerab mal bifiroşe, piştî pereyê xwe tehsîl kir û mal radestîi bikiran neke, wê demê muameleyeke wiha dikeve bin hukmê vê hedîsê û dibe heram.[**]

278. Hukmê malê ku bi rêya fermî nehatibe tomarkirin û bikir jî ew teslîm negirtibe, dê çawa be?

Pirs: Bavê min mala xwe firot yekî û ji zilam wesayîtek kirî. Lê belê, mal sirf li ser kaxiz hat firotin. Yanî li Daîra Tapoyê nehat qeydkirin. Piştî ku bavê min ji dinyayê koç kir, bi rêya fermî mala firotî ji min û diya min re ma. Ev nêzî 12e salan e ku em ji mecbûrî aîdat û baca wê didin dewletê. Lewra xanî di fermîyetê de li ser me ye, encax di rastiyê de ne xaniyê me ye. Ji bo em xwe bigihînin xwediyê xanî, ev çend sal e ku em hewl didin. Hin dibêjin "ji welêt reviya ye" hin kesên din dibêjin "mirî

[384] Muslim, Musaqat, 81 (1583).
[385] Tirmizî, Buyû', 19; Ebû Dawûd, Buyû', 68; Nesaî, Buyû', 60.
[**] Prof. Dr. Servet Bayındır

ye." Ne eqreba ne jî yekî wî yê nêz heye. Em nizanin bê ka em ê çi bikin. Dayîna aîdat û bacê jî me dixe rewşeke zehmet. Eger em xanî bifiroşin, bi wî pereyî çi bikin, an jî gelo firotina me, durist e? Em bibêjin ku me firot, tiştê para me ye (ew aîdat û bacên heta niha me dane) em jê hilênin, bi yê mayî divê em çi bikin? Eger em pereyan di hesabê Bankekê de razênin, dema xwedî lê dernekeve di hundirê 10 salan de Banka Merkezî dê dest bide ser. Li ber çavan em, pereyê zilam têxin destê Banka Merkezî jî ne tiştekî baş e. Şayed, li bankê ranezînin û li ba xwe hilînin, ew jî rewşeke xeter e. Di vî halî de divê em çi bikin?

Bersiv: Di kirîn û firotinekê de wezîfa firoşker teslîmkirina mal e û ya bikir jî ku teslîm bigire. Li gorî ku ji pirsê tê fêhmê bikir, xanî/xeyrîmenqûl teslîm negirtiye. Lewra teslîmkirin û teslîmgirtina wî, bi rêya tapoyê pêk tê.

Mîna ku di pirsê de hatiye qisekirin, mirov eger bi salan dernekeve holê, malê xwe teslîm negire û lê xwedî dernekeve, digel ku lê digerin, lê belê nagihîjin wî yan jî yekî ku mafê wî yê teserufkirina di malê wî de heye û ev rewş bibe sedem ji bo mexdûriyeta firoşker, mirov dikare wiha hereket bike: Mirov 'eqdê/bazarê betal bike û pereyê ku bikir ji bo xanî dabû bi qîmeta wê çaxê muhafeze bike heta demeke muhtemel be ku bikir derkeve/bê dîtin. Piştî derbasbûna wê demê jî eger bikir neyê dîtin, li ser navê wî di rêya xêr û xêratan de dê bê xerckirin.[**]

279. Kirîn û firotina di dema nimêja înê de, li ser înternetê gelo helal e yan na?

Pirs: Bi rêya malperê 24 saetan online malên fîrma me tên firotin. Pirsa min ev e: Di dema nimêja înê de divê ku em malpera xwe bigirin an na? Eger em bigirin jî li gorî wexta nimêja kîjan bajarî divê em bigirin? Navenda fîrma me li Stenbolê ye, li ser meselê li Stenbolê me malpera xwe girt. Li Amedê yekî ji nimêja înê derketiye, ji ber ku malpera me girtiye dê nikaribe tiştekî jê bikire. Lê belê wî kesî li Amedê di wexta nimêjê de dev ji kirînê berdabû û çûbû nimêja xwe. Piştî nimêjê dixwaze

[**] Prof. Dr. Servet Bayındır

tiştekî bikire; encax ji ber ku navenda fîrmayê li Stenbolê ye di saeta derketina wî de malper dê girtî be! Divê em çi bikin?

Bersiv: Nimêja înê ne li ser şirketê, belbî li ser kesên di şirketê de dixebitin, ferz e. Ji ber vê yekê navenda şirketê li ku dibe bila bibe, ne muhîm e. Li kîjan herêmê be, dema nimêjê hat ê/ên li wê derê kar dikin, divê ku here/herin nimêja înê. Yanî li ser wî/wan ferz e.

Kirîn û firotin, di wextê nimêjê de hatiye qedexekirin. Lewra, ev dibe asteng ji bo beşdarbûna nimêja înê. Li gorî vê, ên ku naçin nimêjê, kesên ku li gorî herêma xwe yên berî (ji bo yên li rojhilat dijîn) saeta navenda şirketê nimêj dikin an jî piştî (ên li rojava dijîn) wê nimêj dikin, dema bi rêya înternetê tiştekî bikirin, tu mehzûreke wê, ji we re tune ye.

280. Ma di wextê nimêja înê de kirîna tiştekî ji kantînê caiz e?

Pirs: Ma di wexta nimêja înê de helal e ku mirov ji kantîna dibistanê tiştekî bikire yan na? Firoşkerên kantînê zilam in; lê belê ji xwe nimêj nakin. Dibêjin ku "Rêz û hurmeta me ji nêrîna herkesî re heye; encax em nimêj nakin û di dema nimêja înê de em malên xwe difiroşin." Îro li dibistanê li ser vê bûyerê pir nîqaş hatin kirin. Ez dixwazim hîn bibim bê ka gelo ev muamele mekrûh e yan jî teqez heram e?

Bersiv: Kesên ku nimêja înê li wan ferz e, ger tu sedem û uzrekî wan ê birastî tune be, çûna nimêja înê li ser wan ferz e. Encax, kesên dema herin nimêjê îhtimala ku ewlehiya civakê dê bikeve xeterê ji leşker, polis, xebatkarên agirkujiyê, notirwan/xebatkarên ewlehiyê yên hin saziyan û hwd. û kesên li cihên biçûk ên ku nimêja înê lê nayê kirin dijîn, ne ferz e ku herin nimêja înê.

Mamoste û xwendekarên ku ne bi xwestina wan, belbî ji mecbûrî dersên wan dikevin wexta nimêja înê, mirov dikare wan jî têxe bin vê beşê û bibêje ku heman hikum ji wan re jî heye.

Ji ber vê yekê ne heram e ku xwendekar di wexta nimêja înê de ji kantîna dibistanê tiştekî bikirin. Encax xebatkarên kantînê, eger ji yên ku nimêja înê li wan ferz e bin, heram e ku di wexta nimêjê de tiştekî bifiroşin.[**]

281. Xaniyê ku hêj temelê wî jî nehatiye avêtin, gelo caiz e ku mirov jê qatekî bikire?

Pirs: Beriya destpêkirina avahiyê, kirîn û firotina daîreyan caiz e yan na? Bînaya ku me temel û esasê wê jî nedîtiye, em daîreyan jê dikirin. Kirîna tiştên ne li holê, gelo caiz e yan na?

Bersiv: Eger hemû taybetmendiyên xeyrimenqûlan di projeyê de bi awayekî ku nebe sedem ji bo neheqî û lihevnekirinê were tesbîtkirin, di çarçoveya "îstisna'ê" de muameleyeke wiha caiz e.

"Îstisna', 'eqda ango peymana sparîşkirinê ye. Peymana, ji bo hilberîna malekî, bi çêker/hilberîner re ye.

Dema mirov bedêla tiştekî bi giştî yan jî qismekî jê beriya teslîmgirtinê yan jî hilberîna malekî ku dê paşê bê çêkirin bide, bihayê wî malî nîsbeten erzan dike. Malekî ku pêşin bi 100 lîreyî be, bi deyn bi 110an be, di halê ku mirov berê bi du mehan temamê bedêla wî bide, dibe ku bibe bi 90 lîreyî. Di vir de ji ber ku malek tê kirîn, mirov nikare behsa muameleyeke bi faîz bike. Belbî ev, rêyeke ji bo bidestxistina sermayekî bê faîz."[386]

282. Hukmê kirîna wesayît an jî xaniyekî, bi rêya "Emin Evim"-"Emin Otomotiv"ê çi ye?

Pirs: Bi rêya sîstema "Emin Evim" an jî "Emin Otomotiv"ê mirov xanî yan jî wesayîtekê bikire mehzûr e yan na? Ma ev sîstem dikeve bin hukmê faîzê?

[**] Prof. Dr. Servet Bayındır

[386] Bayındır, **Ticaret ve Faiz**, rp. 145-146.

Bersiv: Me di 15ê meha 12an de roja çarşemê, bi rayedarên Emin Evim/Otomotivê re li Weqfa Süleymaniye hevdîtinek pêk anî. Ji vê hevdîtinê, li gorî agahiyên ku rayedaran di derbarê bi pêşin û teslimata pêş, teslîmata di nav qewl de û teslîmkirina bi rêya pişkê, hat fêhmê ku ev her sê sîstem jî tu eleqeya wan bi muamela faîzê re tune ye. Bi vê sîstemê ku hûn bibin xwedî wesayît an jî xwedî xanî, tu mehzûreke wê tune ye. Ango caiz e.

Di Emin Otomotivê de pereyê ku di bin navê "heqê rêxistinê/organizasyonê" de ji we tê xwestin, li hemberî xizmetê ye û caiz e.

283. Gelo hukmê "Yekî ku wesayîteke modela wê 2009e ji mirov bistîne, bi şertê ku di sala pêş de yeke modela 2011 be, ji mirov re bikire" çi ye?

Pirs: Ez dixwazim ji yekî wesayîteke ku modela wê 2009e bikirim. Li hember vê, ez ê jî jê re di sala pêş de wesayîtek ji heman modelê 2011 bikirim, ma ev muamale dibe faîz an na?

Bersiv: Wesayîta ku modela wê 2011 e, ji ber ku niha taybetmendî û bihayê wê nexuyaye/ne kifş e, ev kirîn û firotin dibe fasid. Deynê wî kesî di stûyê we de sirf bihayê wesayîta wê rojê ye. Heta wê demê eger di qîmetê pere de kêmasiyek pêk were digel temamkirina wê kêmasiyê divê ku hûn deynê xwe bidin. Ji bilî vê, tu deynekî we yê din tune ye.

284. Kirîna xaniyan ji TOKİyê gelo caiz e yan na?

Pirs: Di dayîna teqsît û deynên TOKİyê de salê du caran di meha yekem û heftem de li gorî rêjeya zêdeyiya şeş mehên berê ji meaşê wezîfedaran û li gorî nisbeta ÜFE û TÜFEyê, bi rêjeya herî kêm zem dikin. Li gorî vê projeyê (grûba yên dexlên wan kêm in), kirîna xanî ji TOKİyê caiz e yan na?

Bersiv: Li gorî agahiyên ku we da, dibe ku TOKİ di vê projeyê de dixwaze xwe li hember enflasyonê biparêze. Di fiqha Îslamî de stendina ferqa enflasyonê di deynan de caiz e. Ji ber vê yekê hûn dikarin bi vê rêyê xanî ji TOKİyê bikirin.

Deyndar û deyndêr di mijara ku dê zêdeyî sirf li gorî nisbeta enflasyonê be, dikarin li hev bikin (peymanê çêkin). Û zêdeyî ya di ser vê rêjeyê de dibe faîz. Li ser vê mijarê di malpera me de nivîseke bi sernavê "İslam Fıkhı Açısından Borçlanmalarda Enflasyon Farkı/Li Gorî Fiqha Îslamê Di Deynan De Ferqa Enflasyonê" heye, hûn dikarin lê binihêrin. Nivîs di lînka jêr de ye:

http://www.suleymaniyevakfi.org/islam-iktisadi/islam-fikhi-acisindan-borclanmalarda-enflasyon-farki.html

Nîşe: Ev bersiv, çawa ku li jor di pirsê de derbas bû, ji bo beşa ku derametên wan kêm in û TOKİ bi rêjeya enflasyonê zemê dike re hatiye dayîn û ji bo projeyên wê yên din nabe bersiv.

285. Ez dixwazim wesayîtekê bikirim, da ku nekevim faîzê divê ez kîjan rêyê bişopînim?

Pirs: Bêyî ku ez têkevim muamela faîzê, dixwazim wesayîtekê bikirim. 10 hezar lîre pereyê min heye, lê belê wesayît bi 30 hezarî ye. Ji Bankên Beşdar, bêyî ku têkevim muamela faîzê bi çi awayî ez dikarim îstifade bikim? Ji bo kirîna wesayîtekê ez dikarim bi wan re peymana 20 hezarî çêbikim? Di vê rewşê de nisbeta kara ku dê ji min bixwazin eger ji faîza bankê pirtir be hukmê wê çi ye? Li aliyê din, dibe ku wesayît ne li ser navê bankê, belbî li ser navê min bê qeydkirin? Bi vî halî, ma ev muamele nabe mîna muameleyên bankên bi faîz dixebitin? Bi kurtasî, da ku nekevim faîzê, divê ez kîjan rêyê bişopînim?

Bersiv: Ya yekem: Ji saziyeke finansê bi azîna leasingê yan jî ji şirketeke leasingê hûn dikarin bikirin.

Ya duyem: Bi saziyeke finansê bi rêya murabehê (li ser esasê karkirinê/firotina bi kar) hûn dikarin peymanekê çêbikin. Di vê rewşê de eger Banka Beşdar, mulkiyeta mal derbasî ser navê xwe neke/li ser navê xwe qeyd neke, ji aliyê fiqhî ve pirsgirêk e û li hukmê peymanê bandor dike. Vê pirsgirêkê, di navbera xwe de bi rêya "peymana firotinê ya taybet" hûn dikarin bi wan bidin pejirandin û vê mehzûrê ji meydanê rakin.

Nisbeta mîqdarê karkirinê, nabe hincet ji bo çûna bankên ku li ser esasê faîzê dixebitin. Tiştê ku dê bê kirin, mirov bi wan re tam bazarê bike, da ku rêjeya kara xwe kêm bikin.[**]

286. Hukmê kirîna malên qaçax çi ye?

Pirs: Seyda, ma kirîna malên qaçax wekî mînak kirîna telefoneke qaçax guneh e?

Bersiv: Beriya her tiştî kirîna malekî qaçax, ne qanûnî ye. Bi kirineke wiha, hem xwe hem jî xeyrê xwe, hûn dixin rewşeke ne baş. Divê li vê mijarê ji aliyê mafê mirov ve, lê were mêzekirin. Li aliyê din, îro bi sîstemên ji aliyê saziyên bi vî karî re mijûl in, dikarin telefona qaçax ya ku we kiriye îptal bikin û ew telefon neyê xebitandin/bikaranîn.

Kirîna malekî qaçax, dibe sedema ku qaçaxçî malên zêdetir daxe bazarê û dibe sebebê zirarên giran ji bo bazirganên ku bi duristî kar dikin. Bi vî awayî, ev qezenc dibe qezenca bi rêya neheqiyê.

287. Ma kirîna tiştekî bi rêya muzayedeyê durist e?

Pirs: Di întenetê de hin malper hene ku bi rêya muzayedeyê malên xwe difiroşin. Wekî mînak, ji wan malperan di yekê de ji bo her teklîfeke nû qîmeta mal qirûş bi qirûş zêde dibe. Encax, da ku mirov bikaribe teklîfê bide, divê ji malperê

[**] Prof. Dr. Servet Bayındır

mafê teklîfkirinê were kirîn. Em dizanin ku hin caran mal nêzî qîmeta xwe hin caran jî pir kêmî qîmeta xwe tê firotin. Pirsa min, kirînek bi vî rengî caiz e yan na?

Bersiv: Ji ber ku teklîfdayîna ji bo kirîna malekî nabe ku biheq be, dayîn û stendina pereyan bi vê meqsedê batil e. Kesê/n ku behsa wan hat kirin û li ser înternetê malan difiroşin, meqseda wan a bingehîn ku bi vê rêyê pereyan qezenc bikin. Ji bo vê jî da ku bala mirovan bêhtir bikişînin, divê azîneyekê bikar bînin. Azîneya ku we behsa wê kir, batil e. Ango kirîna li gorî wê azîneyê ne caiz e.

Lewra Xwedê Teala wiha ferman dike:

"**Gelî bawermendan! Di navbera xwe de malên hev bi neheqî nexwin, lê belê ji bazirganiyeke ku we bi dilê xwe li hev kiribe hûn dikarin bixwin. Xwe nekujin; Bêguman Xwedê teqez ji bo we pir birehm e**."[387]

288. Hukmê kirîna diwîzan bi rêya sîstema Forexê, gelo durist e yan na?

Pirs: Ez dixwazim hukmê diwîzguhertinê /kirîn û firotina pereyan, ji bazarên navnetewî bi rêya sîstema Forexê, hîn bibim. Forex; bazareke ku Awro, Dolar, Sterlînê Înglistanê û Yenê Japonyayê tê de tên firotin. Taybetmendiya esasî di bazarê de, muamele bêyî ku pereyê neqît bête bikaranîn, tê kirin. Ji bo vê di serî de li şirketa Forexê hesabek tê vekirin û ji bo telafîkirina zirarên ku mumkin e pêk werin temînat tê razandin. Şirket, dikare bihêle ku mirov 100 qat an jî 400 qatê teminata xwe bikire û bifiroşe. Mîna ku temînata mirov 1000 dolar be, îmkana ku mirov heta 400 hezarî bikire û bifiroşe heye. Ferqa di navbera kirîn û firotinê de (spread), kar an jî zirarê derdixe meydanê. Tîcarereke bi vê usûlê helal e yan na?

Bersiv: Forex, ne kirîn û firotina pereyan/diwîzguhertinê ye. Di vê piyase û bazarê de hemû kirîn û firotin xeyalî ne. Lewra muamele bi diwîzên tune ku derbasî hesab bibin tê destpêkirin û dîsa bi diwîzên tune tê guhertin. Di vê kirîn û firotina xeyalî de kar û zirarên ku derdikevin meydanê wekî rastî bin derbasî hesabê mirov

[387] Nîsa, 4/29.

dibe. Pereyê ku li hesabê şirketê tê razandin, sirf ji bo tehsîlkirina zirarên ku mumkin e çêbibin, wekî temînatê hatiye razandin. Ê ku kar dike û tu carî zirar nake her dem şirketa Forexê ye.

Ev ne ticaret e, belbî tiştekî batil e ango ne kirînên rastî ne, belbî xeyalî ne. Qezenckirina bi vê rêyê jî heram e. Xwedê Teala wiha ferman dike:

"**Gelî bawermendan! Di navbera xwe de malên hev bi neheqî nexwin, lê belê ji bazirganiyeke ku we bi dilê xwe li hev kiribe hûn dikarin bixwin. Xwe nekujin; Bêguman Xwedê teqez ji bo we pir birehm e**."[388]

289. Karkirina pereyan bi rêya serîlêdana malperan, helal e?

Pirs: Ma karkirina pereyan ji înternetê bi vî awayî heram e: Bi serîlêdanê, puan bi pereyan tên guhertin. Li ser meselê: Peyamek elektironîk/e-mail tê hinartin, mirov dixwîne, beşdarî lêpirsîn/anketan dibe, linkên ku dide mirov wan ziyaret dike û puanan berhev dike piştre mirov wan bi pereyan diguherîne. Malper, ji nisbet û paya reklamê parekî dide mirov. Dema mirov serî li malperên peyman bi wan re hatiye çêkirin dide, reklam kar dike /bi ser dikeve û beşekî jê dide meriv. Ma karkirina pereyan bi vî awayî caiz e yan na?

Bersiv: Şirket, reklamên xwe didin malperên ku ji aliyê însanan ve pir tên ziyaretkirin. Xwediyên malperan li gorî lêdana pirbûna serdanan, pere ji şirketan distînin. Piştre, xwediyên malperan ji we re peyamên elektironîk dişînin da ku hûn serî lê bidin, eger hûn ziyaret bikin dê puan derbasî hesabê we bibin û hûn jî ziyaret dikin. Bi vî awayî, reklama şirketê pir tê ziyaretkirin. Xwediyê malperê jî ji pereyên ku kar kiriye puanan dide we.

Ev sîstem, sîstemeke ku tê de xapandina şirketa ku reklam daye, heye. Ji ber vê yekê ne caiz e ku hûn di vê sîstemê de cih bigirin û di hundirê vê çerxê de bigerin.

[388] Nîsa, 4/29.

Di dînê me de "*Ne zirardîtin, ne jî zirardayîn heye*."[389]

Xwedê Teala wiha ferman dike:

"**Gelî bawermendan! Di navbera xwe de malên hev bi neheqî nexwin, lê belê ji bazirganiyeke ku we bi dilê xwe li hev kiribe hûn dikarin bixwin. Xwe nekujin; Bêguman Xwedê teqez ji bo we pir birehm e**."[390]

[389] Ehmedê kurê Henbel, **Musned**, 1/313.
[390] Nîsa, 4/29.

DEYN

290. Ma caiz e ku mirov TL bi deyn bide û deynê xwe bi dolar an jî zêr bistîne?

Pirs: Li gorî dînê Îslamê ku mirov pereyê Tirkiyê bi deyn bide yekî û bi dolar an jî bi zêrîtî deynê xwe jê bistîne, gelo durist e yan na?

Bersiv: Di deynan de ferqa qîmetê, mirov dikare li gorî zêr, zîv û enflasyonê hesab bike. Îro zêr û zîv ji peretî derketine û bûne mîna pertalên ticaretê. Êdî ew jî qîmet distînin û hin caran erzan dibin. Mîna di mehên pêşî yên sala 1980yî de onsa (31 gr.) zêr bi 850î dolaran bû, encax di roja nehê meha sêyem ji sala 1982an de qîmetê zêr daket 335,5 dolaran. Di hundirê du salan de dema mirov daketin û erzanbûna dolaran jî bide ber çavan, dê bê dîtin ku erzanbûn û daketina bihayê zêran bêhtir e. Lê belê, pêlên zêran û daketina qîmatê wan li "Borsa"yê, ji bo demeke kin e. Zêr di dema dirêj de taybetmendiya wê ya ku qîmetê xwe biparêze heye. Ferqa ku di qîmetê pereyan de derdikeve holê, dema li gorî qîmetê zêr bê hesabkirin, dibe ku pirê caran, wê zirar û ziyanê telafî bike.

Herçiqas, li gorî rêjeya enflasyonê tesbîta ferqa kêmbûn û daketina qîmetê pereyan, rêyeke munasib be jî dîsa jî tesbîta rêjeya enflasyonê bi temamî, zehmet e.

Rêya sêyem, ku mirov pereyên biyanî yên di sûkê de derbas dibin, esas bigire. Ew jî ji ber ku pereyên kaxiz in, li gorî enflasyonê qîmeta wan dadikeve û di paralela pêlên borsayên navnetewî de radibin û dadikevin.

Di encamê de herdu alî jî li gorî çi hesab bikin jî piştî hesabdîtinê, ya baş ku li hevdu helal bikin. Lewra tesbîta ferqa erzanbûna pereyan bi giştî karekî zehmet e.

291. Zêrê ku bi deyn hatiye stendin, ma divê bi peretî yan jî bi zêrêtî were dayîn?

Pirs: Min nivîsa we ya ku di derbarê enflasyonê de xwend. Di derheqê guherîna qîmetê pereyan de pirsek di serê min de çêbû. Hûn pereyan bi hêz û qîmeta wan a kirînê dinirxînin. Ma zêr mîna mal e? Zêr jî wekî mal radibe û dadikeve. Mesela eqrebayekî min çend sal berê zêr bi deyn girtibû û niha bihayê zêr pir rabûye. Bi çi awayî divê deynê xwe bide? Nêrîna min ya şexsî, divê ku li gorî qaweta pere ya kirînê be. Lê belê di nivîsên we de zêr jî mîna mal tê jimartin. Li gorî zêr pere tê hesabkirin. Gelo vî deynî, divê ku bi heman gramî bide? Û eger zêr di destê wî de tune be, wê demê divê zêrê ku berî sê salan bi 3 milyaran bû niha bi 15 milyaran bikire û bide? Di vir de ma neheqiyek çênabe? Hal ew e ku zêr jî pere ye. Hûn dikarin vê mijarê ji me re şîrove bikin?

Bersiv: Du cur pere hene: Pereyê mal û pereyê îtibarî.

Zêr û zîv pereyê malî ne. Yanî taybetiya wan a peretî, qîmeta wan ji wan bi xwe ji xusûsiyetên wan ên madî tê; qîmeta wan li gorî gramên wan tên tesbîtkirin.

Lê belê, pereyên kaxiz ên ku di roja me de di rewacê de ne, pereyên îtibarî ne. Qîmeta wan, ne ji ber taybetiya (kaxiz in) wan e, belbî ji ber jimareyên ku ji aliyê deshilatdaran ve li ser wan tên nivîsandin (mîna du kaxizên bi heman mezinantî û hwd. li ser yekî qîmetê 10, li ser yê din qîmetê 100 hatiye nivîsandin) û ji hêza dewletê ya aborî (yanî ji xizmet û malên ku çêdikin) dertê holê.

Ji ber vê yekê dema mal bi deyn tê stendin an jî li hember mal tê deynkirin, herçiqas bihayên wan malan biguhere jî dîsa divê ku mirov wan bi heman mîqdarî bide. Lê belê qîmeta pereyên îtibarî, ji ber ku temsîla mal dike (li gorî rêjeya mal) divê ku qîmeta wan jî li gorî wan malan bê hesabkirin.

Bi vê sedemê, deynên ku ji demeke dirêj ve nehatine dayîn, tê tewsiyekirin ku ferqa enflasyonê bê hesabkirin. Şayed, zêr bi deyn hatibe stendin, divê bi heman

mîqdar û bi zêritî bê dayîn. Mîna 100 gram zêr hatibe stendin, -qîmeta zêr çi dakeve çi jî rabe- şert e ku dîsa 100 gram zêr bê dayîn.[**]

292. Ma mirov dikare doza zirara xwe li kesê ku deynê xwe di wextê wê de nede, bike?

Pirs: Min deyn da nasekî xwe. Di ser qewlê me re pir zeman derbas bû û hîn jî deynê xwe nedaye. Min pere bi deyn dabûyê û divê ku ez dîsa pereyan jê bistînim. Lê belê dema min bi deyn dayê, zêr bi 50 TL bû û niha bûye 100 TL û hîn jî zêde dibe. Çavên min ne di pereyên zêde de ye, encax dilê min jî ne rihet e. Ev kesê han divê deynê xwe çawa bide?

Bersiv: Di vir de du rê hene:

Ya Yekem: Hûn ê bi riza dilê xwe li hev bikin, deynê xwe li gorî malekî xuya – ev, dibe ku zêr, dewîz û hwd.- endeks bikin û di dema dayîna deyn de qîmeta mal ya îro bigirin ber çavan. Encax ev muamele, çênabe ku alî ango teref bi zorê bi hev bidin kirin.

Ya duyem: Ji roja qewlê we û heta roja ku deynê xwe bide, hûn ê ferqa enflasyonê hesab bikin û têxin ser deyn. Di vê beşa dawî de (duyem) riza deyndêr ne şert e, ne lazim e. Belbî macbûr e ku bide.[**]

293. Ma mirov dikare ji deynan karê bi dest bixe yan dibe faîz?

Pirs: Di Banka Beşdar de hin pereyên min ên razandî hene. Her meh, para qezenca min didin min. Hevalekî min dê xaniyekî bikire û ji min re dibêje ku "pereyên xwe yên Bankê bide min û tiştê ku ew didin te ez ê jî bidim te." Ev muamele dikeve hukmê faîzê yan na?

[**] Prof. Dr. Servet Bayındır
[**] Prof. Dr. Servet Bayındır

Bersiv: Ji dayîna deyn mirov feydeyekê bi dest bixe, faîz e. Dema hûn li Bankên Beşdar pereyên xwe radizînin hûn bi wan re peymana kar û zirarê dikin. Lê belê hevalê we peymana şirîkatiyê ji we naxwaze, belbî ji we pereyan bi deyn dixwaze. Yanî kara ku bi vî awayî ji deyn were, dibe faîz.

Eger hûn ê bi deyn bidinê, divê ku bi şertê hûn ê heman tiştî jê bigirin û li gorî ayeta 282yem ji sûreyê Beqere di hizûra du şahidan, derbasî nivîsê bikin û tomar bikin, bidin.

294. Kesê bi deyndarî bimire, ma lazim e ku xizmên wî, deynê wî bidin?

Pirs: Mêrê min endezyarê avahiyan bû. Di encama qezaya trafîkê de jiyana xwe ji dest da. Ji ber vê yekê hin projeyên wî nîvcî man. Ji hin muşteriyan bedêla karê xwe girtiye û xanî radestîi wan nekiriye û hinên din jî xanî teslîmî wan kiriye, lê belê bedêla wan nestendiye. Hin deynên mêrê min ên beriya zewacê jî hebûn û piştî wefata wî ez jê agahdar bûm. Pirsa min ya yekem: Ji ber wefata wî tu mafê însanan di stûyê wî de heye yan na? Ya duyem: Ez agahdar bûm ku bavê mêrê min digel ku hal û wextê wî baş e jî dê reda mîratê bike. Ji aliyê dînî ve ew, bi helwesteke wiha ji dayîna deyn rizgar dibin û ma mafekî wan ê wiha heye yan na? Ya sêyem: Dema mêrê min li heyatê bû min hemû zêrên xwe dabûyê. Ji ber vê yekê eger heqekî min li mêrê min mabe, divê ez çi bikim? Ez mamoste me, şayed ji niha heta teqawidê ez nîvê meaşê xwe jî di ber deynên mêrê xwe de bidim, dîsa jî deynên wî xelas nabin.

Bersiv: Bersiva pirsa we ya yekem: Bi mirinê, mêrê we ji deynên xwe xelas nabe. Mal û serweta wî ya heye dê di navbera deyndêrên wî de bê belavkirin. Mîna 100 lireyê deh kesan lê ye û malê wî yê mayî 50î lire be, her yek dikare encax nîvê deynê xwe bistîne. Ji vê pê ve doza tiştekî din nayê kirin.

Bersiva pirsa we ya duyem: Tu kes ne mecbûr e ku deynê yekî din bide. Lewra deyn derbasî zimeta mîratxweran nabe. Bi vê sedemê, ne hûn û ne jî bavê wî, ji dayîna deynên wî, ne berpirsyar in. Lê belê li gorî qanûna ku îro li Tirkiyê dimeşe,

eger hûn mîratê red nekin, deyn derbasî zimeta we dibe û divê ku hûn wan deynan bidin. Bi vî sedemî, mafê eqrebayên mêrê we heye ku reda mîratê bikin. Û herwiha hûn jî dikarin mîratê red bikin.

Bersiva pirsa we ya sêyem: Eger we hemû zêrên xwe diyarî mêrê xwe kiribe, tiştekî ku bê kirin tune ye. Na eger we bi deyn dabe, hûn jî dibin yekî ji wan deyndêran. Dema hûn heqê xwe lê helal bikin, ji deynê we xelas dibe û hûn dibin xwediyê xêra xwe.

295. Dema deyndêrê mirov bimire, divê mirov çi bike?

Pirs: Mirov deyndarê yekî mirî be, divê mirov çi bike?

Bersiv: Dema mirov wefat dike, mal û deynên wî yên li xelkê ji mîratxweran re dimîne. Kesê ji yekî mirî re deyndar be, ji wefata wî û pê de li hember mîratxwerên wî dibe deyndar. Ji ber vê yekê divê ku hûn deynê xwe bidin mîratxwerên wî.

FAÎZ

296. Ma faîz, ji ber ku navgîn e bo zilm û zordestiyê hatiye heramkirin?

Pirs: Gelo faîz, bi sedema ku navgîn e ji bo zilm û stemê yan jî sirf bi sebeb ceribandin û îmtihankirinê, hatiye qedexekirin? Mesela li vir ango li Norweçê, mirov dixwazin xanî bikirin û ji bankê pereyan dikişînin, lê belê bi faîzê. Ez dixwazim vê bûyerê bi mînakekê ji we re vebêjim. Em ferz bikin, şexsek xaniyekî diecibîne, bihayê xênî 1 milyon e, diçe bankê û pereyê xênî ji bankê bi deyn distîne. Piştre bi wade di hundirê 20 salan de dê deynê xwe bide. Her meh digel faîza wî jî 10 lîre deynê xwe dide. Xêniyê ku kiriye jixwe du qat e di yekî de kirêdar heye û ew bi xwe jî 10 lîreyan dide. Ango xwediyê malê bi pereyê ku ji kirêdarê xwe distîne deynê xwe dide. Piştî ku 20 sal dibore, bêyî ku ji berîka wî qirûşek jî derkeve dibe xwediyê xanî û dewlet jî bi sedema ku ew deyndarê bankê ye ji qezenca wî hindik bacê distîne. Ango kesê ku bi deyn pere kişandiye ji her aliyî ve di karê de xuya dike. Gelo ew rewş dîsa jî dikeve bin faîzê? Ez li vir ji însanan re dibêjim ku ev faîz e. Hûn çi dibêjin?

Bersiv: Eger Xwedê Teala tiştek qedexe kiribe, lêpirsîn û lêgerîna ka gelo çima hatiye qedexekirin, li me nakeve. Di rewşên wiha de tiştê lazim e ku were kirin, mirov serê xwe li ber fermana Xwedê Teala bitewîne. Ji ber vê yekê eger faîz hatibe qedexekirin/heramkirin, ev ne bi sedema ku navgîn e ji bo zilm û stemê, belbî bi sedema ku Xwedê Teala ev qedexe kiriye, hatiye heramkirin. Tiştên ku we behsa wê kir, dikeve bin hukmê faîzê, heram e.

297. Ma di faîzê de bi tenê rêjeya zêde û bilind heram e?

Pirs: Ji aliyê faîzê ve, ez dixwazim ferqa di navbera deynê ku ji bankê û deynê ku ji şirketekê tê stendin, hîn bibim. Faîz li gorî ku ez fêhm dikim, zêdeyiya bi pirî ya di deyn de ye. Li gorî deyn, dema rêjeyeke kêm bê stendin, ev maqûl tê qebûlkirin. Gelo Qur'ana Pîroz, piştgiriyê dide nêrîneke wiha?

Bersiv: Li gorî Qur'ana Pîroz, hemû deynên ku bi mebesta bidesxistina karê tên dayîn, faîz e; kara ku tê bidesxistin, rêjeya wê çi hindik çi jî pir çawa dibe bila bibe, faîz e.

Di ayeta 275an de ji sûreyê Beqere qedexebûn û heramiya faîzê; di ayeta 278an de pêdiviya ku divê meblaxê bi faîzî hatiye diyarkirin çi hindik çi jî pir, ji deyndar neyê girtin ango jê nayê stendin; di ayeta 279an de jî hatiye vegotin ku xwediyê deyn encax sermiyanê xwe dikare ji deyndar bistîne û stendina tiştê zêde/mayî jî dikeve faîzê.

Ji ber vê yekê di Qur'ana Pîroz de tu delîleke ku piştgiriya nêrîna sirf faîza bi rêjeyeke zêde qedexe ye, bike tune ye. Belbî hemû celebên faîzê hatine qedexekirin û heram in.[**]

298. Ma gunehê kesê ku faîzê dide û yê distîne, mîna hev e?

Pirs: Em dizanin di rişwet û bertîldayînê de hem ji bo yê dide hem jî ji bo yê distîne ceza heye. Gelo di mijara faîzê de jî ev taybetî heye? Ango "xwarina" faîzê heram e, lê belê dema mirov krêdiyê bi faîz bikişîne û bi hinan "bide xwarin" dîsa dibe heram?

Bersiv: Ji aliyê berpirsyariyê ve kesê faîzê dide û yê distîne wekî hev in. Lewra Xwedê Teala ne bi tenê faîza ku ji deyn tê bidesxistin, di heman demê de bazarên bi faîz bi xwe jî qedexe kirine.

Riwayeteke ku Ebû Zubeyr bi rêya Cabir ji Pêxember (s.a.w) radigihîne wiha ye:

"Qasidê Xwedê (s.a.w), li yên riba/faîzê dixwin, ên didin xwarin, ên ku (peymana wê) dinivîsin û yên ku dibin şahid lanet aniye û gotiye "*Ew (di vê de) wekhev in*."[391]

[**] Prof. Dr. Servet Bayındır

Ji bo riwayetên cuda -çi ji aliyê lefz çi jî ji aliyê wateyê yê ve- yên bi vê mijarê re têkildar in, ji kerema xwe li çavkaniyên di jêrenotê de ne binihêrin.[392]

Faîz, ji gunehên mezin e, Xwedê Teala emrê me dike ku em xwe ji gunehên mezin dûr bigirin û wiha ferman dike:

"**Eger hûn xwe ji gunehên mezin ên ku li we hatine qedexekirin biparêzin, Em ê li gunehên we biborin û Em ê we bixin cihekî birûmet**."[393]

"**Çi tiştên di erd û asîmanan de hene her ên Xwedê ne. Ev, da ku (Xwedê) yên nebaşî kirine wan celat bike û yên ku başî jî kirine bi ya herî rind xelat bike. Ew ên ku xwe ji gunehên mezin û (cureyên) fehşîtiyan dûr digirin; gunehên din ne tê de. Bi rastî lêborîna Xwedayê te berfireh e**."[394]

299. Gelo tehwîlên dewletê û bonoyên xezîneyê heram in?

Pirs: Ez xwendekarê zanîngehê me û di derbarê bank û meseleyên faîzê de aqlê min pir tevlihev bûye. Mesela: Îstifadekirina ji fona "b" ya ku bi mebesta karkirinê ji bankê 24 saetan tê kirîn û firotin an jî îstifadekirina ji tehwîlên dewletê û bonoyên xezîneyê yên di hin saetên kifşkirî de tên kirîn û firotin, heram e yan na? Di vê meseleyê de min pir lêkolîn kir, lê belê li gorî şert û mercên me yên îroyîn min encameke net nedît. Lewra min di navbera vê û saziyên fînansê de yên ku bê faîz dixebitin tu ferqeke xuya, nedît. Eger hûn bibêjin çima, lewra saziyên fînansê jî di bin navê krêdiyê de û bi nisbetên cuda ferqê lê bar dikin û bi deyn didin muşteriyên xwe. Di vê mijarê de eger hûn min agahdar bikin, ez ê dilşad bibim.

Bersiv: Tehwîlên dewletê û bonoyên xezîneyê, senedên faîzê yên bi deyn in. Kara ku ji van tê bidesxistin jî faîz e. Saziyên finansê li gorî rê û rêbazên xwe dixebitin, ango eger krêdiyê nedin û bi rêya ticaretê kar û qezencê bidest bixin. Lê

---

[391] Muslim, Musaqat, 19 (106/1598).
[392] Muslim, Musaqat, 19 (105/1597); Nesaî, Zîne, 25; Ehmedê kurê Henbel, **Musned**, I, 430.
[393] Nîsa, 4/31.
[394] Necm, 53/31-32.

belê eger serî li rêya ji deyn kar û qezencê bidest bixin, bidin, wê demê tu ferqa wan ji bankên ku bi faîz dixebitin namîne.

300. Faîzên ku di bankê de pêk tên, ma mirov dikare bide jar û feqîran?

Pirs: Seyda li gorî ku min di pirtûkekê de xwend, tê de dinivîse 'faîza ku di hesab de bê xwestina mirov pêk tê, mirov dikare wê bide yên feqîr.' Di pelê salnameyekê jî dinivîsî "tiştên ku xwarina wê li mirov heram e dema mirov bi hinên din bide xwarin bêhtir guneh e." Pereyên faîzê yên ku di hesabê mirov de kom bûne, gelo xerckirina wan bi vî awayî helal e yan na? Divê em bi van pereyan çi bikin? Kesê xanî bi deynê bifaîz kirî be heta dema deynê wî biqede gelo dikare pereyê xwe bi faîzê di heman bankê de razîne û faîza ku distîne di dawiya wadê xwe de ji dêvla deynê xwe bide? Eger bike jî gelo dibe ku bi sedema faîz girtiye û bi sebeba ku stendiye, du caran dikeve guneh?

Bersiv: Heram du beş in. Ya yekem jê re tê gotin **heram li 'eynîhî**; yanî ya ku heramî tê de bi xwe heye. Goştê beraz, mey/'eraq û goştê heywana mirar bi vî awayî ye. Mirov nikare van bide hinekên din. Ya din jî **heram li xeyrîhî** ye. Ev jî ya ku heramî tê de tune ye, lê belê awayê qezenckirin û bidesxistina wê heram e. Pereyên ji faîzê tên bidestxistin wiha ne. Ferqa di navbera wî pereyî û pereyê ku bi keda dest û ji xwêdanê tê bidesxistin, awa û şeklê qezenckirina wê ye. Ev jî sirf ê ku wî karî dike eleqedar dike.

Ayeta 278an ji sûreyê Beqere, ferman dike ku em faîza pêk hatiye nestînin. Lê belê bank, pereyên faîzê yên nehatine stendin nikarin li hesabê xwe vegerînin. Belbî wan pereyan di hesabekî din de kom dikin û transferî hin cihên din dikin. Bi vê sedemê faîzên bankan, dikevin bin hukmê pereyên ku xwediyê wan nediyar e. Di vê rewşê de caiz e ku mirov wê faîzê bistîne û bide feqîr û yên xwedî îhtiyac.

Hem dayîn hem jî stendina faîzê heram e. Ji ber vî sebebî ye ku divê mirov têkilî tu karê bi faîz nebe.

301. Dema mirov pereyê faîzê dide jaran, ma divê em bibêjin ku ev ê faîzê ye?

Pirs: Di bankê de pereyên ku ji faîzê hatine komkirin heye. Ji lêkolîna me ev encam derket: Pereyê faîzê, bêyî ku mirov umîd û hêviya tu xêrê jê bike, mirov dikare bide saziyeke xêrê, bide dibistanekê yan jî bide malbateke ku di zor û zehmetiyê de ye. Lê belê aliyê ku pereyan digire divê ku nizanibe ev pereyê faîzê ye. Pirsa min; terefê din dema bizanibe ku ev pereyê faîzê ye, ma ev dibe heram? Eger heram be jî çima? Kesê me pere dabûyê, me jê re gotibû ku pereyê faîzê ye û ew pir jî hewcedar bû. Lê belê, dema seydayekî got ku divê hûn nebêjin ev pereyê faîzê ye, em bêçar e man. Di vê mijarê de hûn dikarin me agahdar bikin?

Bersiv: Pereyê faîzê, ne mîna goştê beraz an jî mey/eraqê ye. Jihevqetandin û cudakirina pereyên bi rêya helal û yên bi rêya heram hatiye bidesxistin, ne pêkan e. Pereyê faîzê, sirf ji yê ku faîz kiriye re heram e. Eger ji yên din re jî heram bûna, pereyên ku di berîkên me de ji ber ku di pir rêyên xeyrî meşrû û ne di rê de hatine xebitandin, dê bikaranîna wan ji me re jî ne helal bûna.

Tiştê esasî; ku mirov faîzê negire eger mirov girtibe jî li wan vegerîne. Lê belê, di roja me de bank, nikarin faîzê qebûl bikin. Ji ber vê yekê bi awayê ku me li jor îfade kir, divê mirov wê ji destê xwe derxe.

Ê ku qebûl dike dema bizanibe ku pereyê faîzê ye, dibe ku nerihet bibe. Tiştekî din jî heye, eger were zanîn ku we faîz girtiye ji bo we jî ne baş e. Lewra divê mirov gunehê xwe veşêre. Ji ber van sedeman, eger mirov nebêje ku malê faîzê ye, hê çêtir e. Ne ku dema mirov bibêje ji yê li hember re heram dibe.

302. Da ku însan jê îstifade bikin, ma mirov dikare malê xwe têxe faîzê?

Pirs: Hevalekî min wiha dibêje: "Ji bo muhafezekirinê hinek pereyê min di bankê de heye. Ez faîza wî pereyî ji sermiyanê xwe vediqetînim û di foneke cuda de dihêlim û bi deyn didim ên xwedî îhtiyac. Dema deyndar pere li min vedigerînin,

dîsa bêyî ku ez têxim nav pereyê xwe, di heman fonê de muhafeze dikim." Gelo ev karê ku hevalê min dike, caiz e? Ez dikarim ji vê fona ku hevalê min çêkiriye, pereyan bi deyn bigirim?

Bersiv: Di vir de du karên ji hev cuda hene: Yek jê dayîna deyn bê tiştekî. Ya din jî razandina pereyan di bankê de bi faîzê. Razandina pereyan di bankê de bi faîzê, -mebest çi dibe bila bibe- mirov dike hevparê karê faîzê û ne caiz e. Lê belê, pereyên ku bi faîzê yan jî bi sedemeke din ketibe destê meriv, yekî din dikare bêfaîz wî pereyî bi deyn bigire.[**]

303. Meriv dikare deynê bavê xwe yê krêdiyê bi kara ji faîzê bide?

Pirs: Deynê bankê yê faîzê li bavê min e. Pereyê min jî di bankê de bi faîzê razandiye. Ji ber ku dayîn û stendina faîzê heram e, ez vî pereyî naxebitînim. Eger ez, bi faîza pereyê xwe, faîza deynê bavê xwe bidim, dibe guneh an na?

Bersiv: Hem razandina pereyan li bankê bi faîzê û hem jî stendina krêdiyê ji bankê bi faîz heram e. Ji vê bonê divê pereyê ku bi faîzê li bankê hatiye razandin zû bi zû were kişandin. Pereyê ku ji faîzê hatiye bidesxistin jî bê yî hêviya tu tiştekî divê li jar û feqîran û kesên ku bobelat û felaket hatine serê wan, were belavkirin.

Di navbera xwarina faîzê û dayîna deynê ku berê di stûyê mirov de heq bûye bi pereyê faîzê, tu ferq tune ye. Lê belê, eger rewşeke mîna ku hat gotin hasil bûbe, da ku mirov ji vê rewşa mehzûr xelas bibe, di serî de divê deynê bi faîz bê dayîn. Ji bo vî tiştî jî ne ku mirov faîza pereyê di bankê de bistîne, belbî divê mirov hemû pereyê xwe bikişîne da ku deyn bide. Piştre jî bi mîqdarê pereyê ku berê di ber deynê faîzê de hatiye dayîn, bi şeklê xerckirina wê di cihên munasib de mirov xwe ji bin berpirsyariyê derxe.[**]

[**] Prof. Dr. Servet Bayındır
[**] Prof. Dr. Servet Bayındır

304. Ma mirov dikare bi rêya bankê xanî bikire?

Pirs: Ez dixwazim xaniyekî bikirim. Ne ji ber îhtiyaciyê belbî da ku bibe yê min. Ji ber ku derfeta min tune ye ez bi pêşinî bikirim, ez dixwazim pirsa muameleya bankekê bikim. Ji ber ku ez bi pêşinî nakirim, banka xanî dikire û bi wade difiroşe min. Bank 40 milyarî dide û xanî dikire, ez 24 mehan her mehê 2 milyaran didim, bi giştî bi 48 milyaran li ser min dibe mal. Banka dema vê muamelê dike 860 milyonî bi mesrefî digire. Dilê min nerihet e, ji lewre min xwest ku ez bipirsim.

Bersiv: Banka, xanî nakire û nafiroşe we. Lê belê, eger bi awayê leasing an jî bi awayê kirêkirina fînansê be, wê demê dikare bikire û bifiroşe. Di zagona Mortgage de ev awayê han heye. Eger banka vî tiştî bike wê demê bêyî ku hûn têkivin faîzê, hûn dikarin bibin xwedî xanî.

305. Gelo promosyona ku bank didin memûr û karkeran, helal e?

Pirs: Ez memûrê dewletê me. Saziya me, li navçeya me ji bo razandina meaşê/mehana me ji hemû bankan dipirse û bi banka ku dê herî zêde promosyonê bide memûran peymanê datîne. Banka jî li hember razandina meaşê me di banka wan de ji bilî meaşê me perekî xuya dide me. Hin hevalên me dibêjin ku dayîna wê diyariyê heram e. Lewra banka saziyeke ku ji faîzê karê bi dest dixe. Gelo stendina pereyê ku banka li hember razandina mehana me di banka wan de durist e yan an?

Bersiv: Faîz, kara ku ji deyn tê bidestxistin. Ê ku di vî karî de berê pereyan bi deyn dide bankê û ji wî deynî kara faîzê bi dest dixe, dewlet e. Dewlet jî ji bankê dixwaze ku wî bide memûran. Ji ber vê yekê ev pere ji bo dewletê dibe faîz, lê belê ji bo we karkeran ango ji bo memûran nabe faîz. Lewra peyman ne bi we re; belbî di navbera dewlet û bankê de pêk hatiye. Ji vê bonê di stendina we de tu mehzûrek tune ye.

306. Promosyona ku bank didin, ma ne faîz e?

Pirs: Seyda, di mijara pereyê promosyona ku banka dide memûr/kardaran, we nêrînek cuda aniye û hûn dibêjin "di stendina we de tu mehzûrek tune ye." Pereyê ku ji promosyonê li kardaran tê belavkirin, encamê peymana ku saziyên dewletê bi bankan re dikin. Ango dewlet bi xwe bi bankan re peymanê çênake, vî karî ji saziyên xwe re dihêle. Banka jî pereyê min bi faîzê radizîne. Kara faîzê bi navê promosyonê li gorî rêjeyekê dide min. Seydayên me yên din jî dibêjin ku stendina vî pereyî ne durist e. Ev jî heye, banka bê sebeb sirf ji bo ku mehane were stendin qirûş û metelikekê jî ji kara xwe nade. Lewra pereyê promosyonê ku tê dayîn, ji bo memûrên ku herî kêm meaş distînin nêzî 600 lîreyî ye. Ji bo karkeran jî nêzî 2 hezar lîreyî ye. Em ferz bikin ku milyon û nîv karmend û bi qasî vî jî karker hene, eger banka ji kara xwe vî pereyî bide, ev tê wateya ku banka îflas dike. Ango banka, faîza meaşê karmendan ku bi rojane di repoyê de radizîne bi navê promosyonê yan jî bi navê diyariyê li karmendan parve dike. Ev jî li dijî hesasiyetên ku we berê di fetwayên xwe yên di mijara faîzê de dane. Hûn dikarin vê mijarê rave bikin?

Bersiv: Di serî de ji ber hesasiyeta we, em spasiya we dikin. Lê belê, dema mirov xwe digihîne biryarekê, mirov ne li cihên wekheviyê belbî li aliyên cudabûnê dihizire. Em di vê mijarê de ji vê xalê hereket dikin, gelo di navbera bankayê û karmend de tu peyman hatiye kirin an na? Faîz, kara ku ji deyn tê bidestxistin. Ji karmendan tu yekî ku îro 100 lîre dabe bankê, da ku sibê 101 lîreyî jê bistîne tune ye. Ji vê bonê ji promosyona ku tê stendin re nayê gotin kara faîzê.

307. Zemên memûran ên ku dereng tên razandin, gelo dibe faîz?

Pirs: Ez karmendê dewletê me. Mîna ku tê zanîn zem hate ser mehana me. Ji bo şeş mehên ku pêş, me mehana xwe bê zem girtiye û meaşê me digel ferqa biderengxistinê tê dayîn. Bi gişti wiha dinivîse: "Bi sedem biderengxistina dayîna zemê, karmend û muteqawidên dewletê ji bo mehên borî bi nisbeta %2,25 ferq tê dayîn." Gelo caiz e ku em vê ferqê bi kar bînin? Eger ne caiz be, divê em çi bikin?

Bersiv: Faîz, zêdeyiya ku bi sedem deyn tê stendin. Mijara ku behsa wê hate kirin, ne tiştekî wiha ye. Ji vê bonê ferqa ku dê bê dayîn. nabe faîz.[**]

308. Ma meaşê karkerên ku meaşê wan di faîzê de tê razandin heram e?

Pirs: Xwediyê kar, pereyên karkeran di bankê de radizîne û bi vî awayî ji faîzê îstifade dike. Di vê rewşê de meaşê ku karker distînin, gelo tu eleqeya wê bi faîzê re çêdibe?

Bersiv: Pereyê ku dê li karkeran were belavkirin, dema ji aliyê xwedî ve li hember feydeyekê di bankê de were razandin, bi awayê krêdiyê bê razandin, ev ji aliyê xwediyê pereyan ve ne caiz e; lê belê karker ji vê ne berpirsyar in. Meaşê ku dê bistînin helal e.

Lewra heramî di tiştan de yan ji wan bi xwe ye yan jî ji awayê bidesxistina wan derdikeve holê. Mîna mey û goştê beraz eger heramî ji tişt bi xwe be, jê re **heram li 'eynîhî** tê gotin û ji bo her misilmanî dibe heram. Lê belê, eger heramî ne ji wan bi xwe belbî bi sedem awayê bidesxistina wan be, mîna pereyê faîz û qumarê be, jê re tê gotin **heram li xeyrîhî** û pereyê ku bi vî awayî tê bidesxistin, sirf ji bo yê ku ev kar kiriye heram e. Eger ne wisa bûna dê her kesî li çavkaniya pere û malê ku digihîje destê wî bipirsiya û ji xwe karekî wiha bi tekûzî tu kes nikare bike jî.

309. Gelo em dikarin pereyên xwe di fonên bankê yên likitê de bixebitînin?

Pirs: Banka ji bo "fonên likitê" para karê dide. Ev kar jî ji berê ve ne xuya ye. mirov li rewşê binihêre û bi pereyên xwe yên di bankê de fonên likitê bikire gelo tu mehzûra wê heye?

Bersiv: Bi mebesta karkirinê kirîna fonên likitê ji bankên ku bi faîz dixebitin, ji aliyê fiqhî ve ne caiz e. Lewra di sîstema bankên wiha de pereyên di fonên wiha de tên razandin, bê îtibarkirina pîvana helal û heramiyê pere tên teqdîrkirin û parek ji

[**] Prof. Dr. Servet Bayındır

kara ku tê bidesxistin li xwediyê fonan tê belavkirin. Pereyê ku bi rêyên heram bête bidestxistin jî heram e.[**]

310. Gelo li daru'l-herbê faîz caiz e?

Pirs: Li ser înternetê çend seydayên din ên ku mîna we bersiva pirsên gel didin hene. Em hem malpera we hem jî malperên wan dişopînin. Çawa ku her pênc tiliyên dest ne wekî hev in, di bersivên we de jî hin ferq û cudahî hene. Ji vana ez dixwazim bi tenê yekê, mesela li daru'l-herbê faîzê bipirsim. Hin seyda hene, ji nêrîna ku mirov li daru'l-herbê dikare faîzê bigire, di malperên xwe de dibêjin ku misilmanên li derveyî welêt dijîn ji bo wan caiz e ku bi krêdiya bankê xanî bikirin. Heta hin deman li ser televîzyon û di rojnameyan de jî vî tiştî tînin ser zimên. Gelo sedemê vê cudabûna bersivê çi ye? Ango Xwedê dê bi awayekî teqez faîzê heram bike, lê belê ev herambûn sirf daru'l-îslamê dê di xwe de bigire û li daru'l-herbê dê ne heram be! Hûn dikarin mijara li daru'l-herbê faîzê rave bikin?

Bersiv: Di mezhebê Henefî de li gorî Îmam Ebû Henîfe û Îmam Muhemmed, misilmanekî li war û welatê xeyrimisliman (daru'l-herbê) be, dikare bi hemwelatiyê wê dewletê re kar û muameleyên bi faîz bike. Ew mirov herçiqas li wê derê misilman bûbe û hêj koçî welatê misilmanan (daru'l-îslamê) nekiribe jî.

Lê belê Îmam Ebû Yûsuf, ne di vê nêrînê de ye. Lewra xeyrimuslimekî ku ji bo hatina welatê misilmanan destûr jê re hatibe dayîn=muste'men) çawa ku nikare li vir kar û muameleyên bi faîz bike, herwiha yê misilman jî nikare li welatê wan vî karî bike.

Di mezhebê Malikî, Şafiî û Henbelî de jî faîz li her derê heram û qedexe ye. Lewra di ayet û hedîsên ku faîzê qedexe dikin de tu ferqek "mîna li daru'l-îslamê heram e, li daru'l-herbê ne heram e" nexistiye navbera wan.

[**] Prof. Dr. Servet Bayındır

Eger bixwin jî îxtilafa ku mirov heywanên mirar û goştê berêz bifiroşe xeyrimisliman û lîstina qumarê bi wan re di vir de jî derbas dibe. Li gorî Ebû Henîfe û Îmam Muhemmed, mirov dikare van jî bike.

Dema mirov nêrîna herdu aliyan vedikole, bi awayekî zelal dertê holê ku faîz bêyî ku mirov tu ferqê bide ber çavan li her derê heram û qedexe ye. Di vê mijarê de ayet û hedîs qet tu ferqê naxin nevbare daru'l-îslam û daru'l-herbê.

Di malpera me de di beşa "**Araştırmalar"** de bi sernavê "**Dâru'l-Harp'ta Faiz"** lêkolîneke me heye. Hûn dikarin delîlên herdu nêrînan û nirxandina delîlan ji vê nivîsê bixwînin.

Nivîs di lînka jêr de ye:

http://www.suleymaniyevakfi.org/islam-iktisadi/drul-harpta-faiz.html

311. Gelo tu hedîseke ku li daru'l-herbê faîzê caiz bidêre heye?

Pirs: Min bihîst ku hedîsek heye nîşan dide ku li daru'l-herbê faîz tê stendin. Gelo hedîsek wiha heye? Eger hebe jî sehîh e?

Bersiv: Tu hedîseke ku bibêje li daru'l-herbê faîz tê dayîn û stendin tune ye. Lê belê riwayeteke ku hinekên Henefî wê ji xwe re delîl digrin heye. Riwayet wiha ye:

لَا رِبَا بَيْنَ الْمُسْلِمِ وَالْحَرْبِيِّ فِي دَارِ الْحَرْبِ

"Li daru'l-herbê di navbera yê misilman û yê herbî de faîz tune ye."[395]

Îmam Zeyle'î (w. 762/1360), di pirtûka xwe ya bi navê **Nesbu'r-Raye fî Texrîci Ehadîsi'l-Hîdaye** de ji bo vê riwayetê gotiye ku "xerîb e".[396] Li gorî wî, xerîb; riwayeta ku seneda wê tune ye.[397]

[395] el-Merxînanî, **el-Hîdaye**, III, 66.

Îbn Hecerê el-Esqelanî (w. 852/1449) gotiye ku "riwayeteke wiha min nedîtiye = لم أجده"[398]

Ev riwayet di çavkaniyan de bi gotinên cuda derbas dibe.[399] Di çavkaniyên Henefiyan de rawiyê wê bi tenê ji tabiîyan Mekhûl e (w. 112/730) û bi rêya mursel (ango bêyî ku navê sehabî bibêje) hatiye îsnadkirin bi bal Pêxember (s.a.w) ve. Hedîs bi vî awayî, nabe delîl.

Gotinên Îbn Qudame (w. 620/1223) yên li jêr, mijarê xulase dike. Wî wiha gotiye:

"Hukmekî ku herambûna wê bi Qur'an, sunet û îcma'ê sabit bûbe, ne durist e ku mirov bi hedîseke mechûl a ku di pirtûkên hedîsên sehîh an musned an jî pirtûkên din ên pêbawer de derbas nabe, terk bike. Wekî din jî hedîs hem mursel e hem jî hedîs tê wateya ku Qasidê Xwedê faîz li daru'l-herbê qedexe kiriye. Lewra gotina لَا رِبَا 'faîz nabe' dibe ku bi awayê 'faîz qedexe ye' jî bê fêhmê. Lewra di ayetekê de wiha derbas dibe: 'فلا رفث ولا فسوق ولا جدال فى الحج, Di hecê de nêzbûna bi bal jinan ve, kirina gotinên ne nebaş û pevçûn, nabe.' (Bakara, 2/197)"[400]

Hûn dikarin ji çavkaniyên li jêr bi kûrebînî, mijara herambûna faîzê li daru'l-îslam û daru'l-herbê, bişopînin.[401]

---

[396] Zeyle'î 'Ebdullahê kurê Yûsuf, **Nasbu'r-Raye li Ehadîsi'l-Hîdaye**, IV, 44. Wekî din bnh: Şafiî Muhemmedê kurê Îdris, **el-Umm**, VII, 359.
[397] Bnh: Abdullah Aydınlı, **Hadis Istılahları Sözlüğü**, Weşanên Hadisevi, Stenbol 2006, rp. 101.
[398] Îbn Hecer, **ed-Diraye fî Texrîci Ehadîsi'l-Hîdaye**, II, 158.
[399] Ji bo van cudahiyan bnh: Şafiî, **el-Umm**, VII, 359; Beyheqî, **Me'rifetu's-Sunen we'l-Asar**, XIII, 272.
[400] Îbn Qudame, **el-Muxnî**, IV, 176-177.
[401] Bayındır, **Ticaret ve Faiz**, rp. 130-137; Servet Bayındır, "Din ve Ülke Farklılığının Faizin Hükmüne Etkisi", **İstanbul Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Dergisi**, 2006, jimar: 14, rp. 207-235.

312. Ji bo kişandina krêdiyê, gelo caiz e ku mirov bibe navgîn?

Pirs: Bavê min, ji bo ku deynên xwe biqedîne ji min dixwaze ku ez ji bankê krêdiyê bikişînim. Ez jî naxwazim bikişînim. Lewra di destê bavê min de derfet û îmkanên dayîna deynên xwe hene. Mîna dikare xaniyekî xwe bifiroşe. Lê belê naxwaze vê bike. Her dem dibêje ku ez ê pereyên te bidim te. Dema min got "naxêr ez krêdiyê nakişînim" ji min re got ku ez mafê xwe yê bavîtiyê li te helal nakim. Ma bi rastî jî heqê wî dikeve stûyê min? Di vê rewşê de ez çi bikim? Hûn dikarin bi min re bibin alîkar?

Bersiv: Di mijara îsyan û rabûna li ber fermana Xwedê Teala, ji ebdan re serî tewandin û îtaet nayê kirin. Bi stendina krêdiyê ji bankê bi faîz dibe ku hûn bavê xwe razî bikin, lê belê vê carê hûn îsyaniya Xwedê Teala dikin. Hewl bidin ku hûn vê yekê pê bidin fêhmkirin. Eger derfet û îmkanên we hebin hûn bi deyn pereyan bidin bavê xwe û îhtiyaciya wî ji holê rakin. Gotina wî ya ku ez mafê xwe li te helal nakim di vir de ne muhîm e. Lewra îtaeta dê û bavan di hundirê sînorên ku Xwedê Teala kişandiye pêk tê. Ji derveyî vê, di mijarên ku dibin îsyankarî û rabûna li ber fermanên Xwedê Teala, ne pêwîst e ku hûn îtaeta wan bikin. Lê belê mîna ku me di serî de jî got, eger hûn bikaribin bi rêyên helal jê re bibin alîkar, we karekî baş kiriye.

313. Hukmê ku mirov ji bo yekî krêdiyê bikişîne çi ye?

Pirs: Ez 39 salî me û bi malbata xwe re dijîm. Ez li cihekî dixebitim. Bêyî ku ez bi malbata xwe re bişêwirim, ji bo hevalekî xwe yê ku ketibû rewşeke nexweş, min ji bankê krêdî kişand. Deynên krêdiyê ew dide, hin caran dema dikeve zor û zehmetiyan jî ez alîkariya wî dikim. Malbata min bi wesîleyekê ji meseleya krêdiyê agahdar bû. Bavê min dibê "bê ku tu ji me bipirsî te çima tiştekî wiha kir" û hinekî ji min aciz bû. Ji ber vê yekê gelo rizaya dê û bavê xwe ez ê çawa bidest bixim? Ez pir bêhuzûr im.

Bersiv: Herçiqas ji bo yekî din be jî bi kişandina krêdiyê hûn bûne hevparê gunehê faîzê. Ji vê bonê divê hûn tobe bikin, Ji Xwedê Teala bexşandina xwe bixwazin û careke din ji bo yekî din be jî teqez têkilî krêdiyê mebin. Eger hûn wiha bikin Xwedê Teala dê gunehê we bibexşîne, eger hûn 'îbadetên xwe bi berdewamî bikin dê wan gunehên we bi xêran biguherîne. Xwedê Teala wiha ferman dike:

"**Ew ên ku digel Xwedê 'îbadetê ji mebûdekî din re nakin û bi neheqî ew canê ku Xwedê (kuştina) wî heram kiriye nakujin û zinayê nakin. Kî ku van bike dê (li axretê) rûbirûyî ceza bibe.**

Roja qiyametê ezabê wî dê qat bi qat zêde bibe û bi şerpezeyî her û her dê tê de bimîne. Lê belê yê ku tobe bike, bawerî bîne û karê qenc bike, ew cuda ye. Xwedê gunehên wan bi xêran diguherîne. Xwedê gunehjêbir e, dilovîn e.

Kî ku tobe bike û kar û kiryarên qenc bike, bêguman ew ê bi tobeyeke meqbûl li Xwedê vegere."[402]

Ji aliyê din ve bi sedema ku ev tişt ne karekî li hember dê û bavê we ye, ji bo vê hûn nakevin tu gunehekî din.

314. Dema mirov bo yekî krêdiyê bikişîne, guneh di stûyê kê de ye?

Pirs: Bavê min, da ku deynên xalê min bide, li ser navê xwe ji bankê krêdî kişand. Bi sedema ku dayîn û stendina faîzê herdu jî qedexe û heram in, gunehê wî karî gelo ji bavê min re yan jî ji xalê min tê nivîsandin?

Bersiv: Li gorî ku yê krêdî kişandiye bavê we ye, gunehê wê jî di stûyê bavê we de ye. Divê ku ji vê kirina xwe tobe bike û tu carên din hewl nede ku karekî wiha bike.

[402] Furqan, 25/68-71.

“**Kî di karekî baş de navcîtiyekê bike, ji wî pareke wî jî heye. Kî di karekî nebaş de navcîtiyekê bike, ji wî re jî parek heye. Xwedê li ser her tiştî desthilatdar e.**”[403]

“**Di qencî û teqwayê de arîkariya hev bikin, li ser gunehkarî û zêdegaviyê arîkariya hev mekin**.”[404]

315. Bo xelasiya ji tengasiya malî, mirov dikare ji bankê krêdiyê bikişîne?

Pirs: Em esnaf in. Vê salê ji aliyê pereyan ve em desteng in û em dixwazin krêdiyê bikişînin. Ez ji Xwedê lava dikim ku min muhtacî kişandina krêdiyê meke. Seyda divê ez çi bikim? Mixabin, bêyî ku em krêdiyê bikişînin em nikarin karê xwe serast bikin.

Bersiv: Karê bazirganiyê ne karekî hêsan e. Normal e ku pirsgirêk derkevin holê. Di serî de jî pirsgirêka pereyan. Kesê ku neketibe tengasiyê sirf ji bo kêf û şengê ranabe tiştekî bi faîzê nagire. Kesê ku li deynê bi faîz digere, jixwe ketiye zor û zehmetiyan. Lê belê digel van tiştan jî Xwedê Teala bi awayekî teqez faîz heram kiriye û yên ku bi zanebûn faîzê digrin û di vê de israr dikin wan ji yên ku li hember Xwedê û Qasidê wî îlana cengê kirine dijimêre.

Divê ku hûn her dem pirsgirêkên xwe yên malî li ber çavan bigirin û lingên xwe li gorî lihêfa xwe dirêj bikin. Li hember van zor û zehmetiyên wiha, ne rast û durist e ku yekser hûn berê xwe bidin faîzê. Hemû derfetên xwe bi kar bînin û sebir bikin. Xwedê bê erê dê rehetî û hêsaniyekê bexşî we bike. Tu carî ji aqlê xwe dernexin ku ev zor û zehmetiyên tên serê we ji bo îmtihan û ceribandina we ye.

316. Di kîjan rewşan de mirov dikare bi faîzê ji bankan krêdiyê bikişîne?

Pirs: Gelo di kîjan rewşan de mirov dikare bi faîzê ji bankan krêdiyê bikişîne?

---

[403] Nîsa, 4/85.
[404] Maîde, 5/2.

Bersiv: Krêdî, bi wateya deynê bi faîz e. Faîz jî yek ji qedexeyên dînê Îslamê yê herî giran e. Misilmanekî ku di bin şert û mercên zor de da ku nemire çawa dikare ji goştê berêz bixwe, herwiha di şertên wisa de dikare ji faîzê sûd wer bigire. Di tengezariyeke madî de ku bê serê însên, ne rast e ku mirov yekser berê xwe bide krêdî û faîzê. "Zerûreta ku heraman helal dike", ne têgeheke vezgir e ku her kes li gorî xwe şîrove bike.

Lê belê pir caran em pêrgî pirsa "Ez di zorê de me, ma ez nikarim krêdiyê bigirim?" tên.

Divê neyê jibîrkirin ku kesê ji aliyê madî ve di rehetiyê de be, jixwe bê sedem bi faîzê xwe naxe tengasiyan! Ya esas û bingehîn ku mirov di demên zor û zehmetiyan de xwe ji faîzê dûr bigire ku îmtihan û ceribandin tam di vir de dikeve dewrê. Di ayetekê de Xwedê Teala wiha ferman dike:

"**Sond be; Em ê bi hinekî ji tirsê û birçîbûnê, bi kêmkirina mal û can û kêmkirina mêweyên we, we îmtîhan bikin û mizgînê bide yên sebirkêş.**

Ew ên ku dema belayek bê serê wan, dibêjin "Em yên Xwedê ne û em ê li Wî jî vegerin."

Evên ha ji Perwerdegarê wan rehmet û dilovanî li wan dibare û yên ku li ser rêya heq rasterê bûne, her ew in."[405]

Di ayeteke din jî wiha ferman dike:

"**Gelî bawermendan! Bi sebir û nimêjê alîkariyê ji Xwedê bixwazin. Bêguman Xwedê, teqez digel sebirkêşan e**."[406]

Ji vê bonê kesê misilman li hember hemû celebên zor û zehmetiyan divê sebir bike, zêdetir bixebite û tu caran hewesa kirina heraman meke.

---

[405] Beqere, 2/155-157.
[406] Beqere, 2/153.

317. Dema banka krêdiyê dide, ma qey pereyan nafiroşe ango bazirganiyê nake?

Pirs: Tê îfadekirin ku dema ji bankayan krêdî tê kişandin, banka deyn bi faîzê dayiye û ev jî dibe heram. Lê belê dema mirov ji galeriyê bi deyn wesayîtekê dikire, ev dibe bazirganî û tê gotin ku ev helal e. Eger mirov tiştê banka difiroşe bi peretî bifikire –jixwe wisa ye- û bi rizaya dilê herdu aliyan hatiye kirin, gelo çima ji vê re nayê gotin bazirganî?

Bersiv: Bazirganî, ku mirov malekî bi malekî biguherîne. Deyn jî ku heman mal bi deyn bê guhertin. Bank, herçiqas bê gotin ku pereyan difiroşin jî di rastiya xwe de ev ne bazirganî ye; dayîna bi deyn e. Banka pereyan dide, piştî demeke xuyakirî heman pereyî û faîzê bi zêdeyî distîne. Ya girîng, ne navê kirinê ye, belbî reng û çawabûna wê ye. Hebûna wekheviyê di navbera firotina bi deyn û ya bi faîzê de nayê wateya ku ev herdu kar yek in.

"Faîz, kara deyn e. Deyn bi mislî tê dayîn. Ango yê ku 100 zêr deynê wî hebe 100 zêran dide. Li ser esasê peymana ku berê hatiye kirin, tiştê zêdeyî deyn ku tê dayîn dibe faîz. Kirîn û firotin jî bihevdayîna du malên ji hev cuda ye.

Ferqa esasî, di rewşa ku deyn di dema xwe de neyê dayîn dertê holê. Di firotina bi deyn de deynê ku di roja xwe de neyê dayîn tu tiştek lê nayê zêdekirin. Lewra ev zêdeyî dibe faîz. Li cihên enflasyonê, ji ber derengxistina deyn, stendina ferqa qîmetê ku ji pereyan çûye tu eleqeya wê bi faîzê re tune ye. Ew, da ku xwediyê deyn zirarê nebîne û deyndar jî bi neheqî qezencê bi dest nexe. Lê deynên bi faîz ne wiha ne. Ji bo tehsîlkirina deynên ku di roja xwe de nehatine dayîn ji aliyekî ve temînat dikevin dewrê û karê hicz û icrayê dimeşe li aliyê din ji bo faîzê rêjeyeke din û ji bo her roja ku dereng dimîne li ser deyn îlave tê kirin. Ev jî deyndarê ku di dayîna deynê xwe de ketiye tengasiyê, bi giştî tarûmar dike."[407]

[407] Ji bo agahiyên berfirehtir bnh: Bayındır, **Ticaret ve Faiz**, rp. 138-149.

318. Kesê mecbûrî faîzê dibe, gelo di guneh de dibe mîna yê ku faîzê dixwe?

Pirs: Di herambûna faîzê de tu guman tune ye. Lê belê dema mirov li ayetên Qur'ana Pîroz dinihêre mirov dibîne ku her gav ên ku faîzê dixwin tên sûcdarkirin û zemkirin. mirov dibêje qey Qur'an'a Pîroz, ên ku mecbûr in faîzê bidin xwarin mîna mexdûr û bindestan dinirxîne. Heta di dawiya ayeta bi mijarê re têkildar e wiha tê gotin: ""**Eger (deyndar) desteng be, heta destfirehiyê li hêviyê tê sekinandin. Eger we bizanibûna, lêborîna we ji we re hîn çêtir e.**"[408] Li hember vê, di hedîsên derbarê faîzê de sirf di riwayeteke ku ji Îbn Mesûd hatiye ragihandin bi tenê Qasidê Xwedê gotiye ku "Lanet li yê ku faîzê dixwe û yê dide xwarin be" di riwayeta ku ji Ebû Dawûd tê ragihandin "Li yê ku dibe şahid û yê ku muamelê dike jî lanet be" hatiye zêdekirin. Di rewşeke wiha de mirovê bindest ji bêçaretî mecbûr dimîne ku faîzê qat bi qat bide, wî û zordestê faîzxwer ji aliyê ketina di guneh û heramiyê de wekî hev binirxîne, gelo çiqas munasibê edl û dadmendiya Xwedê ye?

Bersiv: Xwarina faîzê ji gunehên mezin e. Tê ragihandin ku Qasidê Xwedê wiha gotiye:

"Xwe ji heft tiştên mirov dibin xeterê biparêzin. "

- Gotin: Ey Qasidê Xwedê, ew çi ne?

Got: "*Meriv şirîkan ji Xwedê çêbike, kirina efsûnê, bi sebebekî mafdar ne tê de kuştina canekî ku Xwedê kuştina wî qedexe kiriye, xwarina faîzê, xwarina malê sêwîyan, reva ji cenga li hemberî neyaran û mirov bêbextiya zinayê têxe stûyê pirekên bawermend ên bi namûs*."[409]

Xwedê Teala, ji ber ku li me ferman dike ku em xwe ji gunehên mezin dûr bigirin, xwarin û dayîna faîzê jî dikeve naveroka vê qedexeyê.

Xwedê Teala wiha ferman dike:

---

[408] Beqere, 2/280.

[409] Buxarî, Wesaya, 23; Muslim, Îman, 145 (89).

"Çi tiştên di erd û asîmanan de hene her ên Xwedê ne. Ev, da ku (Xwedê) yên nebaşî kirine wan celat bike û yên ku başî jî kirine bi ya herî rind xelat bike. Ew ên ku xwe ji gunehên mezin û (cureyên) fehşîtiyan dûr digirin; gunehên din ne tê de. Bi rastî lêborîna Xwedayê te berfireh e."[410]

Kesê faîzê dide, ê herî nêzî wî gunehê mezin e. Însan tu carî mecbûr namîne ku malê xwe bi faîzê bide, lê belê dibe ku mecbûr bimîne ku bi faîzê malekî bistîne. Ev ayeta han mîna mêzgînîyekê ye ji bo kesên wiha:

"Eger hûn xwe ji gunehên mezin ên ku li we hatine qedexekirin biparêzin, Em ê li gunehên we biborin û Em ê we bixin cihekî birûmet."[411]

Eger mirov pir mecbûr nebe divê mirov nekeve rewşên wiha.

319. Da ku deynê xwe yê Tokiyê bidim, gelo ez dikarim krêdiyê bikişînim?

Pirs: Min ji TOKİyê bi teqsîtan xanî kirî. Hêj 60 teqsîtên min jî hene. TOKİ, ji bo kesên ku hemû deynên xwe berî dema xwe bidin ji %20, ji bo yên di sê mehan de bidin ji %17 îskinto dike. Pirsa min, gelo tu mehzûrek heye ku mirov ji bankê yan jî bi navê wê yê berê ji saziyên fînansê vî pereyî temîn bike û deynê xwe bide. Li gorî ku em ji kompîtura bankayê agahdar bûn, li ser esasê peymana ku TOKİyê bi bankê re kiriye xuya dibe ku faîzê didin. Rêjeya wê jî % 3,75.

Bersiv: Hûn deynê xwe yê TOKİyê, her sal di meha Rêbendan û Tirmehê, li gorî rêjeya zêdebûna meaşê memûran ê şeş meh berê, li gorî rêjeya ÜFE û TÜFEyê ya herî kêm, didin. Ji ber ku hûn hinekî ji nirx û qîmetê pereyan ê ketiye didin hûn nakevin faîzê.

Peymana ku TOKİyê bi bankê re kiriye we eleqedar nake. Eger rewşeke cuda hebe ji kerema xwe re me agahdar bikin, da ku li gorî wê em pirsa we bibersivînin.

---

[410] Necm, 53/31-32.
[411] Nîsa, 4/31.

Da ku hûn ji îskintoya TOKİyê îstifade bikin, hûn rabin ji bankekê krêdiyê bikişînin, ev kar we dixe faîzê. Faîz jî heram e. Divê hûn xwe jê biparêzin.

320. Gelo mirov dikare bi rêya krêdiya bankê, xanî bikire?

Pirs: Gelo ez dikarim bi rêya krêdiyê bibim xwedî mal? Min ji çend seydayan pirsî, gotin ji ber ku mecbûriyet e tu dikarî bi rêya krêdiyê xanî bikirî. Lê belê dilê min nerihet e. Ji vê bonê min xwest ku ez ji we jî bipirsim. Ma hûn çi dibêjin?

Bersiv: Krêdî, bi wateya deynê bi faîz e. Faîz jî yek ji qedexeyên dînê Îslamê yê herî giran e. Kesê ji aliyê madî ve tu hewcedariya wî tune be, jixwe bê sedem bi faîzê xwe naxe tengasiyan! Ya esas û bingehîn ku mirov di demên tengasî û zor û zehmetiyan de xwe ji faîzê dûr bigire. Ji vê bonê ye ku dilê we ne aram e. Pêxember (s.a.w) di axaftina xwe ya bi Wabise re (x.j.q) vê pîvanê wiha diyar dike:

"Wabise! Ji nefsa xwe bipirse, bi dilê xwe bişêwire ("اِسْتَفْتِ قَلْبَكَ/îsteftî qelbek")! Başî, ya ku nefs û qelb pê aram dibe. Guneh jî ya ku dilê mirov pê nerihet e û dibe sedemê dudiliyê. Herçiqas însanan ji te re fetwa dabe û ya ku te kiriye rast dîtibin jî."[412]

321. Krêdiyên ku faîza wan ji sedî sifir e, caiz in?

Pirs: Hin bank kampanyayên ji sedî sifir faîz, krêdiyên bê faîz û hwd. lidar dixin. Di vir de faîz sifir e, lê belê dîsa jî bêjeya faîzê derbas dibe. Gelo ev heram e?

Bersiv: Krêdî, bi wateya deynê bi faîz e. Tu banka, xwe nade ber ku deyn bê faîz bide meriv. Bi navê mesrefê dosyayê be jî banka serî li rêya ku ji deyn karekê bi dest bixin, didin. Îro mirov 100 lîreyê bide piştre 101 lîreyî bistîne, faîz e. Tiştê ku banka di bin navê "komisyon" û "mesrefê dosyayê" distînin jî faîz e. Ev, ji xapandina gel pê ve ne tu tiştekî din e. Divê hûn bi hizir bin.

[412] Sunenî Darimî, Buyû', 2; Ehmedê kurê Henbel, **Musned**, IV/228.

322. Ma caiz e ku mirov krêdiya fêrbûnê bistîne?

Pirs: Gelo caiz e ku mirov krêdiya fêrbûnê bistîne? Ango ev dikeve ber hukmê faîzê?

Bersiv: Di malpera Saziya Krêdî û Wargehan de di derbarê dayîna deynên krêdiya fêrbûnê de ev agahiyên han cih digire:

"Deynê xwendekarên ku ji saziya krêdiya fêrbûnê girtine, ji mêjûya ku krêdiya fêrbûnê hatiye dayîn heta dema ku mezûn bibin an jî bi çi sedemê be heta mêjûya ku krêdiya wan bê birîn; li ser miqdarê krêdiya fêrbûnê, zêdebûnên Endeksa Bihayê Tiştan Bi Tomerî ya Saziya Îstatîstikên Tirkiyeyê, tê bicihanîn, bi şeklê ku ew mîqdar li ser were îlavekirin, tê hesabkirin."

Di vê rewşê de di girtina krêdiya fêrbûnê de tu mehzûrek tune ye.

323. Da ku mirov pereyan bi neqît bistîne, gelo caiz e ku mirov karta krêdiyê li cem esnafan bikar bîne?

Pirs: Seyda, gelo di huqûqa Îslamê de bêyî ku mirov kirîn û firotineke rastîn bike, mirov bi rêya karta krêdiyê xwe têxe bin deyn û ji esnafan pereyên neqît bistîne, caiz e?

Bersiv: Ev kirin, ne caiz e. Ev di bin navê kirîn û firotinê de rasterast karê faîzê ye. Lewra ji esnaf bi neqît 97 lîre tê stendin lê belê 100 lîre ji bankê re tê dayîn. Zêdeyiyeke wiha di deynan de faîz e. Lewra kara ku ji deyn tê bidesxistin, faîz e.

Dîrok, bi pir rê û mînakên faîzê yên ku di bin navê kirîn û firotinê de hatine kirin tije ye.

Di derbarê mijarê de hûn dikarin ji malpera me **www.suleymaniyevakfi.com** ji pirtûka me ya "**Ticaret Ve Faiz"ê** xwe bigihînin agahiyên hîn berfirehtir.

324. Ma caiz e ku seraf, zêr bifiroşin û yekser bikirin û li hember wê pereyan bidin?

Pirs: Ez zêrker im. Zêr dikirim û difiroşim. Carinan hîn ez zêr ji qasê dernaxim ez difiroşim. Pereyê wê didim însanan. Gelo ev kirina min caiz e?

Bersiv: Karekî wisa ne caiz e. Lewra di bazirganiya malên ku taybetmendiya wan ya peretî heye, divê mirov riayeta şertên serafiyê bike:

Di bazirganiya malên wiha de rê û rêbaza bingehîn; eger herdu mal ji yek cinsî bin divê mîqdarê wan wekî hev, dest bi dest û pêşin bin. Di halê ku cureyê herdu malan ne yek bin (mîna ku di pirsa we de derbas bû guhertina pereyan bi zêr) divê kar pêşin be, dest bi dest be û li gorî biha û qîmetê wê rojê bê kirin.[**]

325. Meriv li ser înternetê zêr bikire û bifiroşe, caiz ye an na?

Pirs: Ma mirov bi rêya înternetê zêr bikire û bifiroşe û bi vî awayî pereyan kar bike, helal e yan na?

Bersiv: Bi şertê ku kirîn û firotin bi pêşin be û teslîmgirtina zêr bi dest/bi qeydkirina li hesabê li Bankê be, caiz e. Lewra Pêxemberê me (s.a.w) di kirîn û firotina zêr de pêşinatî, teslîmgirtin û stendina zêr û pereyan, şert dêraye:

"*Zêr bi zêr, zîv bi zîv, genim bi genim, ceh bi ceh, xurme bi xurme û xwê bi xwê, ji heman cureyî (yek bi yekî), wekî hev bin û bi pêşin bin dibe. Eger cureyê wan cuda bin, bi şertê ku pêşin bin, çawa bixwazin hûn dikarin bifiroşin*."[413]

326. Di dayîna deyn de mirov karê bike gelo caiz e yan jî dibe faîz?

Pirs: Di Banka Beşdar de hin pereyên min ên razandî hene. Her meh, para qezenca min didin min. Hevalekî min dê xaniyekî bikire û ji min re dibêje ku

[**] Prof. Dr. Servet Bayındır

[413] Muslim, Musaqat, 81 (1583).

“pereyên xwe yên bankê bide min û tiştê ku ew didin te ez ê jî bidim te.” Ma ev muamele dikeve bin hukmê faîzê yan na?

Bersiv: Eger mirov bi dayîna deyn feydeyekê bidest bixe, dibe faîz. Dema hûn li Bankên Beşdar pereyên xwe radizênin hûn bi wan re peymana kar û zirarê dikin. Lê belê hevalê we peymana şirîkatiyê ji we naxwaze, belbî ji we pereyan bi deyn dixwaze. Yanî kara ku bi vî awayî ji deyn were, dibe faîz.

Eger hûn ê bi deyn bidinê, divê ku bi şertê hûn ê heman tiştî jê bigirin û li gorî ayeta 282yem ji sûreyê Beqere di hizûra du şahidan, derbasî nivîsê bikin û tomar bikin, bidin.

327. Hukmê mirov deynê karta xwe ya krêdiyê di dema wê de nede çi ye?

Pirs: Eger em deynê karta xwe ya krêdiyê di wexta wê de nedim, gelo em dibin mîna ku me faîz xwaribe?

Bersiv: Eger bi sedem bêderfetî û bêîmkaniyan we deynê karta xwe ya krêdiyê dereng razandibe, hûn ne berpirsyar in. Lê belê divê hûn hîn mehek berê baş bihizirin û hesabê xwe baş bikin da ku faîz pêk neyê.

Digel ku derfeta dayînê hebe û hûn deynê karta xwe dereng bixin, di vê rewşê de we faîz nexwariye belbî we daye xwarin. Çendî xwarina faîzê heram be her wisa danxwarina faîzê jî heram e. Pêxember (s.a.w) wiha ferman kiriye:

“*Kesê faîzê dixwe û yê dide xwarin, laneta Xwedê li wan be.*”[414]

Eger hûn bobe bikin xwe serast bikin û tu carê din têkilî karê wiha nebin Xwedê Teala dê we bibexşîne û bi ser de jî gunehên ku we kirine dê bi xêran biguherîne.

[414] Buxarî, Buyû‘, 25; Muslim, Musaqat, 105. Lenata Xwedê lê be, bi wateya wî ji rehma xwe dûr bike û qenciyan pê neke.

328. Hukmê kaskokirina otomobîlan çi ye?

Pirs: Gelo hukmê ku mirov wesayîtan kasko bike çi ye?

Bersiv: Hûn dizanin ku Kasko, sîgortaya wesayîtan e. Hûn wesayîtên xwe sîgorta bikin. Tê gotin ku di "Kaskoyê de hin kedxwarî û hwd. heye." Rast e hin şaşîtî û nerastî hene. Lê belê hewcedariyeke gelemperî jî heye. Hewl bidin ku hûn wan şaşiyan rast bikin. Bixebitin, da ku ya herî baş bikin. Ma Xwedê Teala ji me naxwaze ku em ya herî baş bikin? Bixebitin, da ku di warê sîgortayê de hûn bibin yekem. Her kes we mînak nîşan bide. Lê belê heta wê demê hûn dikarin wesayîtên xwe kasko bikin.

Niha, ên ku li hember kaskoyê dertên çi dibêjin? Tê gotin ku:

1. Kasko dişibe faîzê. Lewra mirov 100 lîreyî dide şirketa kaskoyê û dibe ku hin caran mirov 200 lîreyî jê bistîne. mirov wesayîta xwe bi 10000 lîreyî kasko dike, lê belê di encama qezayekê de di rewşa ku wesayît êdî nayê bikaranîn mirov ji kaskoyê 20-30 hezar lîreyî distîne. Ha ev dişibe faîzê.

2. Ev dişibe qumarê jî. Lewra mirov pereyan li kaskoyê radizîne, hin caran zêdetir û hin caran jî tu tiştek jê nayê stendin.

3. Di vir de bêewleyiya bi Xwedê Teala jî heye.

Di vir de divê em bala xwe bidin vî tiştî. Tu mijar, bi nihêrtina li aliyên wê yên wekhev, nayê çareserkirin. Niha misilman û kafirek werin ber hev gelo ji der ve de aliyên wan ên dişibin hevdu pir in an jî aliyên wan ên naşibin hev? Misoger aliyên dişibin hev: Herdu jî du dest, du ling du çavên wan û hwd. hene. Niha ma em li aliyên wan ên wekhev dinihêrin û ji yekî re dibêjin misilman û ji yê din re dibêjin kafir? Naxêr, em li cudahiyên di navbera wan de hene dinihêrin. Kesên ku li wekheviya tiştan dinihêrin û helwestan nîşan didin, dikevin cihê kesên ku dibêjin

"**kirîn û firotin jî mîna faîzê ye**."[415] Li gorî ku Xwedê Teala kirîn û firotin helal kiriye û faîz jî heram kiriye, tê wateya ku ev herdu ne heman tişt in. Tu kes bi şertê ku di heman demê de dê deynê xwe bide tiştekî deyn nake. Lê belê mirov bi şertê ku di heman wextê de bedêlê bide, mal/tiştekî dikire. Ha ji ber vê ferqê ye ku kirîn û firotin helal e û faîz jî heram e.

Wekî din jî divê mirov bala xwe bide vê jî. Kesekî ku dixwaze pereyê xwe di faîzê de razîne, gelo hatiye dîtin ku tu caran çûye şirketeke kaskoyê û pereyê xwe lê razandiye? Tiştekî wiha ne guncaw e. An jî yekî ku bi qumarê dilîze, -dibe ku ez qezenc bikim- tu carî radibe pereyan li kaskoyê radizîne? Ma tiştekî wiha mumkin e?

Ji ber ku mirov bi Xwedê Teala bêewle ye mirov wesayîta xwe kasko dike? Haşa di ber hiş û serê tu kesî tiştekî wisa derbas nabe! Ev, alîkariyek e. Sibê roj dema tiştek were serê min, dê alîkariya min bê kirin. Eger ez negirim dê yekî din bigire. Di vê de hêsaniyeke din jî heye: Em dibînin ku herdu ajokerên ku qeza derbas kirine bêyî ku pev biçin di aramî û sukûnetê de rûdinên. Gelo çima? Lewra şirketeke kaskoyê ku dê zirara wan bide heye, loma. Eger ne wisa bûya herdu ajokeran dê çi bikirina? Diyar e ku hin kes digel ku wesayîta wan qeza nekiriye jî mîna ku qeza kiribin nîşan didin û ji kaskoyê pereyan distînin hene. Lê belê bi nihêrtina li van helwestên şaş, hikum nayê dayîn. Li cihê ku însan lê hebe, ma pêkan e ku şaşiyên wiha pêk neyên? Ma însan li hember ayetên Xwedê Teala yên ronker di çi şaşiyan de ne?

Di encamê de di kirina kaskoyê de tu mehzûrek tune ye.

329. Bêyî ku ez têkevim faîzê, ez çawa dikarim wesayîtekê bikirim?

Pirs: Bêyî ku ez têkevim muamela faîzê, dixwazim wesayîtekê bikirim. 10 hezar lîre pereyê min hene, lê belê wesayît bi 30 hezarî ye. Ji bankên beşdar, bêyî ku têkevim muamela faîzê bi çi awayî ez dikarim îstifade bikim? Ez bi 20 hezarî, ji bo

[415] Beqere, 2/275.

kirîna wesayîtekê dikarim bi wan re peymanê çêbikim? Di vê rewşê de nisbeta kara ku dê ji min bixwazin eger ji faîza Bankê pirtir be hukmê wê çi ye? Li aliyê din, dibe ku wesayît ne li ser navê Bankê, belbî li ser navê min bête qeydkirin? Bi vî halî, ev muamele nabe mîna muameleyên Bankên bi faîz dixebitin? Bi kurtasî, da ku nekevim faîzê, divê ez kîjan rêyê bişopînim?

Bersiv: Ya yekem, ji saziyeke finansê bi azîna leasingê yan jî ji şirketeke leasingê hûn dikarin bikirin.

Ya duyem, bi saziyeke finansê bi rêya murabehê (li ser esasê karkirinê/firotina bi kar) hûn dikarin peymanekê çêbikin. Di vê rewşê de eger Banka Beşdar, mulkiyeta mal derbasî ser navê xwe neke/li ser navê xwe qeyd neke, ji aliyê fiqhî ve pirsgirêk e û li hukmê peymanê bandor dike.

Vê pirsgirêkê, di navbera xwe de bi rêya "peymana firotinê ya taybet" hûn dikarin bi wan bidin pejirandin û vê mehzûrê ji meydanê rakin.

Nisbeta mîqdarê karkirinê, nabe hincet ji bo çûna Bankên bi faîz kar dikin, dixebitin. Tiştê ku dê bê kirin, mirov bi wan re tam bazar bike, da ku rêjeya kara xwe kêm bikin.[**]

330. **Hukmê kişandina krêdiyê ji bankê, bo leşkeriya bi bedêl çi ye**?

Pirs: Di mijara bedêla ji bo leşkeriyê hin pirsên hevaline me hene. Bi sedema ku bedêla hatiye diyarkirin pir bilind e, pir heval difikirin ku krêdiyê bikişînin. Ji ber ku tu malekî tê kirîn û firotin li holê tune ye, rasterast dayîna faîzê heye. Wiha tê gotin: Di halê ku em herin leşkeriyê nexasim di mijara nimêjê de em ê pêrgî pirsgirêkan bên û dê menawiyeta me zirarê bibîne. Ên ku diçin leşkeriyê û hatine hemû vî tiştî diyar dikin. Li aliyê din, dema em neçin leşkeriyê, ji bo dayîna bedêlê leşkeriyê ketina di faîzê mewzûbehs e. Li hember van herdu rewşan, divê em tercîha kîjanê bikin?

[**] Prof. Dr. Servet Bayındır

Bersiv: Dayîna faîzê, derfetdayîna ku yek faîzê bixwe û alîkarkirin e ku fermaneke Xwedê Teala bin pê bibe. Eger tu rewşeke zerûrî tune be divê mirov nekeve rêyeke wiha. Li leşkeriyê qedexeyeke bi navê qedexeya kirina nimêjê tune ye. Kesên ku dixwazin leşkeriyê mekin û bedêl bidin, ne ku bi rêya krêdiyê belbî divê hewl bidin ku bi awa û rêyeke din bedêla leşkeriyê bidin.

331. Di navbera kara ku ji xeyrimenqûlan tê bidestxistin û ya faîzê çi ferq heye?

Pirs: Gelo mirov mala xwe yan jî xeyrimenqûlekî bi kirê bide, caiz e? Li ser meselê mirov bo salekê xanî kirê dike. Piştî ku salek derbas dibe mirov digel kirêya salekê xanî radestîi xwediyê wê dike. Dema em ji yekî bo salekê pereyan bi deyn bistînin bi heman şeklî em pereyê wî lê vedigerînin; lê belê pereyê zêde ku em didin, dibe faîz ango heram. Di vê rewşê de em ê çawa kirê û faîzê ji hev veqetînin?

Bersiv: Kirê û faîz, ji van aliyan ve ji hev diqetin:

Faîz:

Faîz, ji pere û yên mîna wê ji malên standart ku ji bo demeke diyarkirî bi deyn tê dayîn û piştre heman tişt digel zêdeyiyê were stendin re tê gotin.

Di faîzê de malê ku tê dayîn tê xerckirin. Di paş de ne heman mal belbî mislê wî/ê mîna wî di standarda wî de digel zêdebûnê tê dayîn.

Di faîzê de hemû rîsk û xetera malê ku hatiye stendin di stûyê deyndar de ye. Herçiqas mal bê dizîn, wenda bibe jî deyndar divê ku wî mîqdarî digel zêdebûnê bide.

Kirê:

Kirê, ne di malên ku tê xerckirin de belbî di malên ku ji menfaeta wan tê îstifadekirin û bi mîna xwe tên vegerandin tê kirin.

Di kirê de rewşa ku malek bi kirê bê dayîn û digel zêdebûnekê were stendin ne mewzûbehs e.

Di kirê de malê ku bi kirê hatiye dayîn û tiştê ku tê tehsîlkirin ji hev cuda ne. Ji vê bonê daxwazkirina zêde ji ya ku hatiye dayîn jixwe nayê kirin.

Malên ku tên xerckirin nabin mijar ji bo kirê. Ango pere, genim û hwd. ên ku tên xerckirin û mislê wan tên dayîn bi kirê nayên dayîn.

Ji vê bonê çi xanî çi jî erd û erse ango malên ku ji menfeata wan tê îstifadekirin û bi awayê xwe yê berê tên vegerandin, caiz e ku mirov wan bi kirê bide. Lewra di hundirê dema kirê de –ji bilî ku qesd an jî teqsîratiyek hebe- hemû rîsk û xeretên ku di encama karesat û bobelatan de dertên holê ji arîza, xesar, şewitandin, wendabûn, erdhej û hwd. ne di stûyê kirêker de belbî di stûyê xwediyê mal de ne.[**]

332. Gelo kara ku ji kirêya xeyrimenqûlan û faîzê tê bidestxistin heman tişt in?

Pirs: Hin kes dibêjin "Faîz û kirêkirin heman tişt in, ango faîz=kirê ye." Vî tiştî jî wiha rave dikin: "Tu pereyê xwe di bankê de radizênî û li hember vê, bêyî ked û xebatekê tu qezencê bi dest dixî û navê vî karî faîz e… Bi heman pereyî tu dibî xwediyê mal û mulk, bi kirê didî, ji vê jî bê ked û xebatekê tu qezencê bi dest dixî. Ji ber vê yekê ev jî dibe faîz…" Gelo rewşeke wiha heye? Ma rast e ku faîz û kirê heman tişt in?

Bersiv: Faîz, kara ku ji deyn tê bidestxistin. Deyndar, tiştê ku bi deyn girtiye xerc dike, deyndar di roja dayîna deynd de deynê xwe digel faîza wê dide. Ji vê bonê faîz, di malên ku tên xerckirin de heye.

[**] Prof. Dr. Servet Bayındır

Kirê jî ku mirov ji menfeata malekî îstifade bike û tiştekî li hember vê yekê bide xwediyê wî mal û tiştî. Kirêker malê ku kirê kiriye xerce nake; piştî ku bi kar anî paşde vedigerîne. Ji vê bonê ye ku malên tên xerckirin bi kirê nayên dayîn.

Helwesta ku mirov kirêkirinê bişibîne faîzê, ji tevlihevkirina aqlê gel -da ku hewld bide ku faîzê helal bidêre- pê ve ne tiştekî din e.

Kesên ku dixwazin di mijarên wiha de agahiyên berfirehtir bi dest bixin, dikarin pirtûka "**Ticaret ve Faiz"ê** ya ku ji weşanên "Süleymaniye Vakfı Yayınları"yê derketiye bixwînin.

333. Gelo caiz e mirov xeyrimenqûlên xwe bi kirê bide bankayan?

Pirs: Em dixwazin dikana xwe bi kirê bidin. Bankeke ku karên bi faîz dike dixwaze wê kirê bike. Gelo caiz e mirov wê bi kirê bide bankê û pereyên ku ji wir tên helal in?

Bersiv: Ne caiz e ku mirov xeyrimenqûlê xwe bi kirê bide kes an jî saziyên ku rasterast bi faîzê yan jî bi tiştên din ên xeyrî meşrû re mijûl in.

Xwedê Teala wiha ferman dike:

"**Kî di karekî baş de navcîtiyekê bike, ji wî pareke wî jî heye. Kî di karekî nebaş de navcîtiyekê bike, ji wî re jî parek heye. Xwedê li ser her tiştî desthilatdar e."**[416]

"**Di qencî û teqwayê de arîkariya hev bikin, li ser gunehkarî û zêdegaviyê arîkariya hev mekin**."[417]

Riwayeteke ku Ebû Zubeyr bi rêya Cabir ji Pêxember (s.a.w) radigihîne wiha ye:

[416] Nîsa, 4/85.
[417] Maîde, 5/2.

"Qasidê Xwedê (s.a.w), li yên riba/faîzê dixwin, ên didin xwarin, ên ku (peymana wê) dinivîsin û yên ku dibin şahid lanet aniye û gotiye 'Ew (di vê de) wekhev in."[418]

Faîz ji gunehên herî mezin e. Xwedê Teala ferman kiriye ku em xwe ji gunehên mezin dûr bigirin. Xwedê Teala wiha ferman dike:

"**Eger hûn xwe ji gunehên mezin ên ku li we hatine qedexekirin biparêzin, Em ê li gunehên we biborin û Em ê we bixin cihekî birûmet**."[419]

"**Çi tiştên di erd û asîmanan de hene her ên Xwedê ne. Ev, da ku (Xwedê) yên nebaşî kirine wan celat bike û yên ku başî jî kirine bi ya herî rind xelat bike. Ew ên ku xwe ji gunehên mezin û (cureyên) fehşîtiyan dûr digirin; gunehên din ne tê de. Bi rastî lêborîna Xwedayê te berfireh e**."[420]

Kesê xeyrimenqûlê xwe bi kirê bide saziyeke ku karê wê yê sereke faîz e, ev tê wateya ku wî kesî xwe ji gunehên mezin dûr negirtiye.

334. Teqawidiya ferdî çi ye?

Pirs: Teqawidiya ferdî çi ye? Muamela "Teqawidiya ferdî" ya heye gelo caiz e? Pratîka ku li bankên beşdar tê kirin, gelo heman tişt e?

Bersiv: Teqawidiya ferdî, teknîka rêvebirina foneke ku naverok û xulasa wê ji aliyê dînî ve tu pirsgirêkê di hundirê xwe de nagire. Ev li ser esasê ku fon bi dayînên beşdaran bên komkirin demekê were nirxandin di dawiya demê de digel kara wî malî li xwediyê wê were vegerandin, hatiye avakirin. Karger jî li hember karê rêvebirina xwe komisyonê distîne.

[418] Muslim, Musaqat, 19 (106/1598).
[419] Nîsa, 4/31.
[420] Necm, 53/31-32.

Di pratîka heyî de ji ber ku fonên tên berhevkirin di qadên bi faîz de tên bikaranîn, ne caiz e. Bankên beşdar jî ji ber ku ew jî beşeke girîng ji fonan di sertfikayên kirayên bi faîz de dinirxînin, ya ku ew dikin jî ne caiz e.

335. Sukûkên bêfaîz, ma bi rastî jî bêfaîz in?

Pirs: Sukûkên bêfaîz, bi rastî jî bêfaîz in?

Bersiv: Di salên dawî de di piyaseyên fînansê yên ku bi navê "Îslamî" tê wesifandin de têgeha sukûkê ku bi wateya sertfikaya kirê ye, belav bûye û di bin navê sertfikaya kirê ya bêfaîz, derketiye piyasayê. Hal ew e ku ev sertfika, herçiqas bi navekî cuda be jî di rastiya xwe de îbaret e ji pratîka temlîkkirina deynên bi faîz e.

Pratîka heyî, ji aliyê huqûqî û aborî ve ne muamela kirêkirinê ye. Belbî li hember xeyrimenqûlên ku bi gerew hatiye nîşandan, deyneke ku ji gel tê daxwazkirin. Meblaxê ku di bin navê bedêla kirê de tê dayîn, faîza ku soza wê ji deyndêran re hatine dayîn e. Di fiqha Îslamê de ev, bi navê "Beyu'l-îstîxlal" tê binavkirin û ev muameleya deynên bi faîz e.

BORSA

336. Ma kirîna hiseyan ji Borsayê durist e yan na?

Pirs: Gelo kirîna par û senedên hisedariyê ji borsayê, caiz e yan na?

Bersiv: Kirîn û firotina par û senedên hisedariyê yên şirketan, caiz e. Encax di roja me ya îroyîn de ji ber ku şekl û awayê xebata borsayê ne li gorî esasên rast in, deriyên borsayê ji bo qezenca neheq heta dawî vekîrî ne. Ji vê bonê kirîn û firotina par û senedên hisedariyê ji borsayê, ne caiz e.

337. Gelo di kirîn û firotina ji borsa emtiayê tu mehzûrek heye?

Pirs: "Borsa emtia"yê, ji sûk û bazara ku malên ticaretê (zêr, zîv, paxir, gaz, ceh, genim, petrol pembû, garis, şekir, qehwe û hwd.) dibin mijar ji bo kirîn û firotinê re tê gotin. Bi vî awayî: Dema di Borsa emtiayê de bihayê demir zêde dibe, di bihayê demir ê sûkê de jî guhertin çêdibe. Û di malên ticaretê yên din jî de rewş wiha ye. Ez dixawzim li ser înternetê malên emtiayê bikirim û dema bihayê wê zêde bibe bifiroşim. Pirsa min, ji aliyê dînî ve kirîn û firotina bi vî awayî ji borsayê, gelo helal e yan na?

Bersiv: Ji aliyê fiqhî ve, kirîn û firotina bi rêya "Borsa emtia"yê çawa ku hin cureyên wê yên helal hene, hin cureyên wê yên mehzûr jî hene. Encax kirîn û firotinên ji borsayên wiha, ji ber ku (li gorî îstatistikan) nêzî ji %98ê wan spekulatîf in, ev cure dikeve bin beşa ya ne caiz.

Li aliyê din, ji borsayên wiha kirîn û firotina emtiayên ku taybetiya wan a peretî heye; mîna zêr û zîv, ne caiz e. Lewra di kirîn û firotina zêr û zîv de divê ku dest bi dest be yanî bi pêşin be, encax di sîstema wan de muamele bi wade tê kirin.

Ji bilî van, malên ku di dînê me de kirîn û firotina wan nehatiye qedexekirin, kirîn û firotina wan encax bi vî awayî caiz e: Dema qewl/wade hat, divê yan mal

birastî hebe yan jî bi rêya belgeya ku temsîla wî malê di depoyê de ye dike, muamele bê kirin.[**]

[**] Prof. Dr. Servet Bayındır

ZAYIBÛNA EMANET

338. Pereyê bi emanet dema telef bibe, dê kî wî pereyî bide?

Pirs: Ji du hevalan yekî ji bo tehsîlkirinê, çekên xwe dide erkdarekî. Ê din, rojekê ji bo tehsîla çekeke xwe ya bi wade, dide hevalê xwe û ew jî çekê dide heman erkdarî. Piştî wê bi rojekê erkdar sirf wê çekê ji Bankê tehsîl dike û di dema vegera bi bal kar ve, hin kesên nenas ji erkdar pereyan bi zorê distînin û şopa xwe wenda dikin. Li gorî ku herdu heval jî ji rastiya vê bûyerê bi ewle ne, ew pereyê çûyî ji kîsî kê diçe?

Bersiv: Hevalê wî, li gorî ku çeka xwe bi erkdarê xwe daye tehsîlkirin, bi tehsîlkirina çeka (hevalê xwe) din jî bi erkdarê xwe, karekî şaş nekiriye. Ev çek di destê wî de emanet e. Li gorî ku tu teqsîratiya wî çênebûye û pere bi zorê jê hatine xesibkirin, ev pere bi giştî ji xwediyê çekê diçe.

Benda 768an ji Mecelleyê wiha ye: **Emanet nayê tezmînkirin.**

Ango emanet, di halê ku bê teqsîr û karekî ji destê emîn, telef bibe yan jî biçe, (demana wê "ضمان": eger ji misliyatan be mislê wê û eger ji qiyemiyatan be qîmetê wê) ne lazim e.

Ömer Nasuhi Bilmen, di berhema xwe ya bi navê "**Hukukı İslamiyye ve Istılahatı Fıkhiyye Kamusu**" cildê çarem rûpelê 148an de cih dide van agahiyan:

"Ji ehkamên gelemperî yên emanetan yek jê jî ku nayê tezmînkirin. Ango kesê emîn be, dema emanet telef an jî zayî bibe bêyî ku teqsîr an jî te'eddî jê çêbûbe, tezmîna wê yan jî dayîna bedela wê, ne lazim e. Ev telef û zayîbûn, ferq nake çi bi sedem tiştekî parastina jê pêkan be, mîna diziyê û çi jî parastina wê ne mumkin be mîna êgir, wekî hev in.

Hezretî Îmam ‘Elî wiha gotiye: «Kesê şivan û yê ku sond pê tê xwarin, deman/tezmîn li wan nakeve.» Heta ku xayintiya wan kifş nebe.”

Yanî kesê ku emanet di destê wî de telef bûbe, heta xayintiya wî kifş nebe, tezmîna wî malî nake.

BEŞA SÊYEM

- DAWET
- ZEWAC
- TELAQ
- EWLADGIRTIN

DAWET

339. Hukmê dawetê çi ye?

Pirs: Hukmê dawetê -li gorî dînê Îslamê- çi ye?

Bersiv: Li gorî dînê Îslamê çêkirina dawetê caiz e. Heta ji bo îlankirina zewacê lêdana daholê ji aliyê Pêxember ve (s.a.w) hatiye emirkirin. Di dema dawetê de tiştê herî girîng ku mirov xwe ji tiştên di dîn de hatine qedexekirin, biparêze. Divê ku meriv, di babeta leyîstina mêr û jinên biyanî bi hev re û acizkirina cîranan bi dengê saz û hwd. xwe dûr bigire û biparêze.

340. Li gorî Îslamê daweteke munasib divê çawa bê kirin?

Pirs: Daweteke li gorî Îslamê divê çawa bê kirin? Di dawetên me de mêr û jin bi hev re rûdinên û saz lê tê xistin. Gelo ev kirina han rast e?

Bersiv: Di merasîma dawetê de divê mirov xwe ji tiştên ku di dînê Îslamê de teqez hatine qedexekirin, xwe biparêze. Mîna mêr û jinên mehra wan li hev dibin bi hev re bilîzin û acizkirina cîranan bi rêya lêxistina saz û daholê û wekî din. Ji vê bonê divê ku mirov dawetên xwe, li cihên munasib amade bike da ku cîran û derdor pê aciz nebin. Bi van şert û mercên ku me gotin: Mirov li gorî adet û risûmatên xwe dikare dawet û şahiyên xwe li dar bixe.

341. Hukmê lêxistina daholê di dawetan de çi ye?

Pirs: Di dawetan de hukmê lêxistina daholê çi ye?

Bersiv: Tu mehzûra lêxistina sazê di dawetan de tune ye. mirov dikare di dawetên xwe de li daholê bixe. Lê belê di vir de xaleke pir girîng heye ku divê em ji bîr nekin û her gav di bala me de be. Ew jî -bi taybetî li bajarên mezin- bi kesên ku em mecbûr in bi hev re bijîn û cîranên xwe yên ku divê em ji van re baş bin û divê di jiyana civakî de bi hev re xweş derbas bikin. Ji vê bonê divê ku em wan nerihet nekin

û huzûra wan nerevînin. Bi hinceta ku em dawetê dikin, lêxistina daholê li ber deriyê xelkê û nerihetkirina wan, zêdegavî û xwarina heqê mirovan e. Eger dawet li gund be, kirina dawetê li meydana gund pêkan e. Lê belê di nava bajaran de dîtina meydanan ji bo dawetê pir ne pêkan e. Ji bo kêf û şahiyan, divê ku mirov li hin cihên munasib bigere. Bi taybetî jî divê ku mirov di vê mijarê de baldar û bihizir be.

342. Ma mirov dikare beşdarî dawetên ku tê de heramî tên kirin, bibe?

Pirs: Eqrebayên me yan jî dost û cîranên me, dawetê dikin. Di salona dawetê de mêr û jin li nav hev in û ji ber ku saz jî tê lê xistin, di çûn an jî neçûnê de dudilî bi me re çêdibe. Lê belê, em naxwazin dilê wan jî bihêlin. Ez dixwazim hîn bibim, ji aliyê dînî ve gelo divê ku em biçin an jî neçin?

Bersiv: Eger di dawetê de rewşên ku dînê me vê rast nadêre yan jî destûrê nadê hebin, divê ku hûn beşdarî wan cihan nebin. Di serî de leyîstina mêr û jinan li biyanî di heman cihî de bi çek û pergalên ne munasib, îkramkirina mey, şerab û tiştên heram li vexwendiyan ji wan rewşên qedexekirî ne. Eger di cihê dawetê de tiştekî wiha tune be, divê ku hûn beşdarî wê dawetê bibin û mafê xizm û cîrantiyê bînin cih.

Lê belê, ji bo têkiliya însên ji mirov û cîranên ku di dawetên wan de saz û mêr û jin di heman cihî de bi hev re dileyîzin, neyê birîn, beriya ku lîstik dest pê bike, mirov dikare bûkê-zavê û malbatan pîroz bike, hebe diyariya xwe pêşkêş bike û dema lîstik dest pê kir, mirov dê ji qada dawetê here. Ev jî rêyek e.

343. Ma di şevên qendîlê de dawet an jî nîşanî tê kirin?

Pirs: Min ji bo dawetê ji zû de salon kirê kiribû; lê belê roja dawetê rastî şeva Rexayibê tê. Gelo tu mehzûreke wê heye?

Bersiv: Kirina nîşanî yan jî dawetê di şeva Raxayibê de ji aliyê dînê ve, tu mehzûreke wê tune ye. Lê belê, ji vê zêdetir tiştên ku dê li salona dawetê bên kirin, girîng in.

Mêr û jinên ji aliyê dînî ve li hev heram in ango dikarin bi hev re bizewicin, li heman cihî bi awayekî vekirî bin, bi hev re bileyizin an jî dansê bikin, ev tiştê han bi tu awayî Xwedê Teala jê razî nabe. Tiştê ku divê mirov bala xwe bidê, ev e. Ji xincî vê, ku dawet rastî şeva Rexayibê yan jî şevên qendîlê bê, di vê de tu mehzûrek tune ye.

ZEWAC

344. Ma zewac di Îslamê de ferz e?

Pirs: Di dînê Îslamê de gelo zewac ferz e, yanî hatiye fermankirin? An jî sunet e li ser tercîha mirov dimîne?

Bersiv: Dînê Îslamê teşwîqa zewacê dike û li bawermendan jî ferman dike ku ezebên xwe bicewicînin. Pêxemberê me jî (s.a.w) bi zewaca xwe, ji me re bûye mînak û nimûne.

Zanyarên dînê Îslamê, di derbarê kesê ku hêza wî li ser zewacê hebe û di heman demê de tirsa ku dê bikeve zinayê jî hebe, gihîştine encama ku zewac, jê re ferz e.

Di vê mijarê de ji Pêxember (s.a.w) ev hedîsa li jêr, hatiye ragihandin:

"*Gelî xortan! Qaweta we kê ya zewacê hebe bila bizewice. Kesê ku hêz û derfeta wî ya madî tune be, bila rojiya (sunet/nafile) bigire. Lewra rojî şehwetê dişikîne.*"[421]

Ji Enesê kurê Malik (x.j.q), wiha hatiye ragihandin: Sê kes hatine mala jinên Pêxemberê me û di derheqê 'îbadeta wî de pirs kirine; ka çawa 'îbadet dike. Dema behsa 'îbadeta Pêxember ji wan re tê kirin, ew vê 'îbadeta xwe hindik dibînin. Û wiha dibêjin. "Ka em li ku û Pêxember li ku? Bêguman Xwedê gunehên Pêxemberê xwe, ên çûyî û yên bê jî bexşandine." (divê em bêhtir 'îbadetê bikin) Li ser vê, yekî ji wan got: "Êdî ez ê daîma bi şev nimêj bikim." Ê din got: "Ez ê daîma rojiyê bigirim." Ê sêyem jî got: "Ez ê jî ji jinan cuda bijîm. Ez tu carî nazewicim." Di dema xeberdana wan de Pêxemberê Xwedê ji nişka ve derket û ket hundir û wiha ferman kir:

"*Hûn in ku we wiha wiha gotine. Encax li xwe miqate bin! Bi navê Xwedê qesem dikim, ez bêhtirînê we yê ku ji Xwedê ditirsim û teqwatirînê we me. Digel wî hawî jî ez hem*

[421] Buxarî, Nîkah, 3; Muslim, Nîkah, 1.

rojiyê jî digirim û hem jî difitirim. Nimêj dikim lê dîsa jî beşeke bi şevê radikevim. Û ez bi jinan re jî dizewicim. (Rêya min a jiyanê û suneta min, ev e.) Kesê rû ji rê û suneta min bizivirîne, ne ji min e."[422]

Ebû Eyyûb (x.j.q), ji Pêxember wiha radigihîne:

"**Çar tişt ji suneta hemû pêxembaran in. Hesta şerm û fedîkirinê, bikaranîna bêhna xweş, bikaranîna darikê miswakê û zewac**."[423]

345. Ma nîkaka mut'e di Îslamê de heye yan na?

Pirs: Di derbarê nîkaha mut'eyê de nêrîna we çi ye? Birayên me yên Caferî dibêjin ku ji sûreyê Nîsa "ayeta 4 û 24an, li ser rewabûna nîkaha mut'eyê delîl in." Gelo hûn dikarin vê mijarê şîrove bikin?

Bersiv: Mut'e; peymana ku mêr li hember malê ku dide pîrekê da ku sirf ji aliyê wê yê cinsî, istifade bike re tê gotin. Bi vê yekê, herdu alî ji hev re nabin mêr û jin, di navbera wan de mijarên nefeqe, mîrat, berdan û hwd. dernakevin holê. Piştî ku ew dema hatiye diyarkirin qediya, êdî ji hev deqetin.

Tê angaştkirin ku mut'e di serdema Pêxember (s.a.w) de hatiye tetbîqkirin. Li gorî ehlisunetê, ev rewş piştre hatiye qedexekirin; encax li gorî Ce'feriyan hukmê wê hê jî berdewam e.

<u>Herdu angaşt jî nayên qebûlkirin</u>. Lewra di ayetên ku li Mekkeyê daketine de Xwedê Teala wiha ferman dike:

"**Ew ên ku fercê xwe diparêzin.**[424] **Bi tenê li hember hevser û esîrên ku di bin hakimiyeta wan de ne, lome li wan neyê kirin**."[425]

---

[422] Buxarî, Nîkah, 1; Muslim, Nîkah, 5 (1401).

[423] Tirmizî, Nîkah, 1.

[424] Di vir de pêwendiya cinsî nayê qesidkirin. Lewra ayetên bi wê wateyê, bi awayê "ên ku xwe ji cureyên fuhûşê dûr digirin" tê îfadekirin. Di vir de wate, nixumandina cihên ewret û şermê pê ve, ne tiştekî din e.

Ferc, navek e ji bo navbera herdu lingan û derdora wê; ji ewretê mêr, jin û xortan re tê gotin.[426] Mut'e ji ber ku yekî nake hevserê yê din, ayet vekirina cihê ewretê li cem wî kesî qedexe kiriye. Kesê ku vekirina cihê ewretê li cem qedexe be, teqez pêwendiya cinsî jî pê re heram e.

Ji bo xwendina tamemê nivîsê, ji kerema xwe re serî li lînka jêr bidin:

http://www.suleymaniyevakfi.org/nikah-evlilik/muta-nikahi.html

346. Hukmê hezkirina ji yekê çi ye?

Pirs: Gelo zilam dikare ji pîrekekê hez bike û di sînorên meşrû de pê re xeber bide?

Bersiv: Hezkirina zilam ji pîrekekê yan jî ya pîrekê ji zilam, ne heram e. Tiştê guneh ev e, ku zilam û pîreka ji hev re biyanî ne, bêyî ku di navbera wan de nîkah hebe, bi tena serê xwe bi hev re bimînin, bi destê hev bigirin, hevdu hemêz bikin û hwd. Bi mebesta zewacê, -bi şertê ku ne bi tenê bin- di hevnaskirin û xeberdana wan de tu mehzûrek tune ye. Ji bilî vê, hemû têkiliyên ku dê mirov têxin gunehan, heram in.

347. Di hilbijartina hevalekî/ê ji bo zewacê, divê mirov bala xwe bide çi?

Pirs: Di hilbijartina hevalekî/ê ji bona zewacê divê mirov bala xwe bide çi? Di vê mijarê de Qur'ana Pîroz kîjan pîvan, danîne?

Bersiv: Ayetên di derbarê hilbijartina yekî/yeka ji bo zewacê wiha ne:

Di zewacê de bawerî pir girîng e. XwedêTeala wiha ferman dike:

"**Heta ew îmanê neyînin bi jinên muşrik re nezewicin. Qerwaşeke bawermend ji jineke muşrik çêtir e, çendîn xweşikatiya wê we hijmetkar bihêle jî.**

---

[425] Mu'minûn, 23/5-6.
[426] Îbn Manzûr, **Lisanu'l-Ereb**, "فرج" f-r-c.

Heta ku baweriyê neyînin keçên xwe jî li mêrên muşrik mar nekin. Koleyekî bawermend ji muşrikekî çêtir e, çendîn rindiya wî we hijmetkar bihêle jî. Ew gazî êgir dikin. Xwedê jî bi destûra xwe we gazî bihuşt û lêborînê dike û ayetên xwe ji mirovan re aşkere dike, da ku aqil bigirin."[427]

Divê herdu alî jî bi namûs bin, ji xwe re bi dizî dostik negirtibin û bi çavê leyistikê li zewacê nenêrin. Xwedê Teala wiha ferman dike:

"…**Ji bilî van, ên mayî, bi şertê ku hûn bi namûs bijîn û ji zinayê dûr bin, ji we re helal in.**"[428]

Ji herdu aliyan jî divê ku yekî zina nekiribe, eger kiribe jî divê tobe kiribe û xwe tam rast û durist kiribe. Xwedê Teala wiha ferman dike:

"**Zilamê zinaker, tenê bi jineke zinaker re yan jî bi jineke muşrik re dikare bizewice. Jina zinaker jî tenê mêrekî zinaker yan jî mêrekî muşrik dikare wê mar bike. Ew li ser bawermendan hatiye heramkirin**."[429]

…

"**Lê belê ew ên ku piştî vê, tobe bikin û rewşa xwe rast û durist bikin, ew cuda ne. Vêca bi rastî Xwedê gunehjêbir e, dilovîn e**."[430]

348. Ma mirov dikare keça xwe bide yekî ku nimêj nake?

Pirs: Zewaca bi yekî/a ku nimêj nake re gelo durist e? Ango hukmekî ku zewaca bi yekî/a ku nimêj nake re qedexe bike, heye?

Bersiv: Di nav gel de nêrîna ku "serjêkiriyê kesê ku nimêj nake, nayê xwarin", "kesê ku nimêj nake mirov keça xwe nadê", heye. Lê belê tu ayet û hedîsên ku

[427] Beqere, 2/221.
[428] Nîsa, 4/24.
[429] Nûr, 24/3.
[430] Nûr, 24/5.

piştgiriya vê nêrînê bikin tune ne. Îhtimala herî zêde ku ev gotin ji aliyê kesên ku dibêjin, ê nimêj neke dibe kafir ve, hatibe gotin. Hal ew e ku dema mirov li ayet û hedîsên sehîh dinihêre, kesê ku nimêj neke -dema ferzbûna wê înkar meke û tinazê xwe pê neke- mirov nikare hukmê kafiriyê li ser tetbîq bike. Lê belê ev jî rastiyek e, kesê ku angaşta "ez misilman im" bike û nimêj meke, ew li hember fermana Xwedê di îsyankariyê de ye û gunehekî pir mezin dike. Ji vê bonê keçeke/xanimeke bawermend, ji dêvla ku bi yekî herî kêm rojê pênc caran li hember Xwedê îsyankariyê dike re bicewice, tê tewsiyekirin ku di zewacê de tercîha xortekî bawermend ê beriya her tiştî li nimêj û 'îbadetên xwe yên din miqate be, bike.

349. Temenê keçan ji bo zewacê, herî kêm divê çiqas be?

Pirs: Temenê keçikan ji bo zewacê herî kêm divê çend sal be? Li hin welatên ku bi şerî'etê tê 'emelkirin, da ku sînorê temenê zewaca bi keçên biçûk re daxin nehan, qanûnê derdixin. Keçeke neh salî mirov dikare wê bizewicîne? Eger mirov dikare li gorî çi ye ev? Şayed nikaribe jî li gorî çi mirov nikare wan bizewicîne?

Bersiv: Di temenê biçûkatiyê de mirov nikare zarokan bizewicîne. Ji bo zewacê balixbûn bi tenê ne kafî ye, belbî divê ku reşîd bin jî. Temenê reşîdbûnê jî ji ber ku li gorî herêman diguhere, dibe ku tetbîqa salên ji bo zewacê jî biguhere. Lê belê ev heye, zarokeke neh salî, ne reşîd e.

Xwedê Teala di sûreyê Nîsa ayeta 6an wiha ferman dike:

"**Sêwiyan, heta çaxa zewacê biceribînin; eger hûn hişmendiya (reşîdbûna) wan bibînin vêca malên wan bispêrine wan. (Gelî weliyan!) Bi destbelavî û ji tirsa ku sêwî zû mezin bibin û ew ê malên xwe ji we bistînin, malên wan nexwin! Bila, ê ku zengîn be xwe ji malên wan dûr bigire, yê ku xizan be jî bila bi qasî pêdiviya xwe jê bixwe. Dema we malên wan da wan, li serê du şahidan rakin. Xwedê ji aliyê hesabpirsînê ve besî we ye.**"

Li aliyê din, kesên ku zanîna wan a ku bikaribin vê ayetê digel ayeta 2 û 3an ji sûreyê Nîsa bi hev re binirxînin hebe, dê bibînin ku ji bo zewacê, temenê reşîdbûnê pêwîst e.

Li gorî vê ayetê, di dînê me çaxa zewacê, "temenê reşîdbûnê" ye. Çaxa reşîdbûnê jî bi balixbûnê dest pê dike, lê belê çaxeke wisa ye ku ji bo her kesî, ne mîna hev e. Mesela dibe ku yek, dema balix bibe di heman demê de gihîştibe çaxa reşîdbûna xwe jî. Yekî din jî digel ku di ser balixbûna wî re çend sal derbas bûbûn jî hêj negihîştibe çaxa reşîdbûnê. Ên biryara gihîştin û negihîştina temenê reşîdbûnê dê bidin, malbata mirov yanî weliyê mirov e. Ji vê bonê dînê me ragihandiye ku nîkah bê welî nayê birîn û nîkahên bi vî awayî, nîkahên nedurist dêraye.

350. Ma diya me 'Aişeyê, di neh saliya xwe de bi Pêxemberê me re zewicî?

Pirs: Kesên ateist, her dem hewl didin ku mijara, çima bawermend piştî mirina Pêxember nikarin bi pîrekên wî re bizewicin û zewaca Hezretî 'Aişeyê di temenekî biçûk de mîna pirsgirêkekê, bikar tînin. Di rewşên wiha de divê em çi bikin?

Bersiv: Di serî de di mijarên wiha de em tewsiye dikin ku hûn bi wan re nekevin nîqaşê. Lewra ew, ne ji ber ku mijarên wiha fêhm nakin, ew baweriyê nayinin! Di pirsên wiha de mebesta wan, ku eqlê kesên bawermend tevlihev bikin, wan bêçare bihêlin û wan ji îmana wan bikin. Hûn çiqas ji wan re rave bikin jî ew li gotinên we guhnadêrin.

Li gorî Qur'anê biryara, ku pîrekên Pêxemberê me (s.a.w) dayikên bawermendan e û tu kes nikare bi wan re bizewice, hatiye dayîn. Xwedê Tela wiha ferman dike:

"**Pêxember, ji bo bawermendan ji nefsa wan bi xwe jî hîn li pêştir e. Xanimên wî jî dayikên bawermendan in**."[431]

[431] Ehzab, 33/6.

"**…Ji we re qet ne helal e ku hûn Qasidê Xwedê biêşînin. Piştî wî, mehrkirina xanimên wî jî ebediyen li we heram e. Lewra ew li cem Xwedê gunehekî pir mezin e**."[432]

Herçiqas di hin çavkaniyên hedîsê de hatibe ragihandin ku dayika me 'Aişeyê dema bi Pêxember re (s.a.w) dizewice 9 salî û di dema wefata wî de 18 salî bûye,[433] lê belê di hin riwayetên cuda de di muqayesekirina rûdanên dîrokî û jêderên wan û hereketkirina ji çavkaniyên dîrokî di derbarê temenê dayika me 'Aişeyê di dema zîfafê de tesbîtên ku 18-21 sal bûye, hene. Tiştê muwafiqî Qur'anê jî ev e. Lewra Qur'an, bi zimanê gelê 'Ereban nazil bûye. Xwedê Teala wiha ferman dike:

"**Me, her qasid bi zimanê gelê wî şand, da ku ji wan re aşkere rave bike. Vêca Xwedê, kî bivê ji rê derdixe û kî jî bivê tîne rêya rast. Serdest ê karbinecih Ew e**."[434]

Di zimanê gelê 'Ereban de têgeha "**çaxa zewacê**" heye. Ev têgeh, ji bo kesê ku balix û reşîd be re tê gotin. Xwedê Teala wiha ferman dike:

"**Sêwiyan, heta çaxa zewacê biceribînin; eger hûn hişmendiya (reşîdbûna) wan bibînin vêca malên wan bispêrine wan."**[435]

Ji bo zewacê, divê mêr mehrê bide pîrekê. Ev jî li cem 'Ereban dihate tetbîqkirin. Ji vê bonê divê pîrek di rewşeke ku bikaribe mehrê qebûl bike de be. Xwedê Teala wiha ferman dike:

"**Mehra jinan bi ciwanmêrî bidin wan. Eger ew bi (rizaya) dilê xwe hinekî jê bidin we, wê çaxê bi noşîcanî bixwin**."[436]

---

[432] Ehzab, 33/53.
[433] Bnh: Buxarî, Nîkah, 38-39; Muslim, Nîkah, 70; Tirmizî, Nîkah, 18; Ebû Dawûd, Nîkah, 32; Nesaî, Nîkah, 29; Îbn Mace, Nîkah, 13.
[434] Îbrahîm, 14/4.
[435] Nîsa, 4/6.
[436] Nîsa, 4/4.

Li gorî vê, tê fêhmê ku di çanda ‘Ereban de ji bo zewacê, têgeha reşîdbûnê hebûye. Li gorî ku di wê demê de zewaca Pêxember (s.a.w) bi Hezretî ‘Aişeyê re nebûye sedem ji bo nav û nûçikan, divê ku diya me ‘Aişeyê reşîd be. Di roja me ya îro de jî keçeke reşîd bi kesê ku dixwaze re dikare bizewice.

Ji bo agahiyên berfirehtir di derbarê mijara temenê zewaca diya me Hezretî ‘Aişeyê û mijara zewicandina keçên biçûk, em tewsiye dikin ku hûn dersa me ya di lînka jêr de ye, temaşe bikin:

http://www.kurandersi.com/mukayeseli-fikih-muzakereleri/2011/cocuklarin-evlendirilmesi.html

351. Meriv dikare bi yeke ji xwe mezintir re bizewice?

Pirs: Zilam dikare bi yeke ku ji xwe mezintir re bizewice?

Bersiv: Di cudahitiya temenê bûk û zavê de tu mehzûrek şerî tune ye. Çawa dibe zilam mezin be, herwiha dibe ku pîrek jî ji zilam mezintir be. Lewra dema Pêxemberê me (s.a.w) bi diya me Xedîce re dizewice, ew 25 salî û diya me Xedîce 40 salî bûye. Mîna ku tê dîtin, di navbera temenê wan de bi giştî 15 sal ferq heye. Heta ev jî heye, ev zewaca Pêxember (s.a.w) ya yekem bû û diya me Xedîce, pîrekeke ku berê du caran zewicîbû û du zarokên wê jî hebûn.

352. Têkiliya bi nîşaniya mirov re divê çawa be?

Pirs: Divê têkiliya mirov bi nîşaniya mirov re çawa be? Da ku ez sînorên Qur’an û sunetê bin pê nekim, di vê mijarê de ez ji we alîkariyê dixwazim. Piştî salekê dê daweta me çêbibe. Di vê navberê de divê ez bi nîşaniya xwe û malbata wê re çawa biaxivim, hevdîtinê pêk bînim û hal û hereketê min divê çawa bin? Bi kirina tiştekî şaş, ez naxwazim xwe têxim bin guneh. Di vê demê de jî ez dixwazim rizaya Perwerdegarê xwe bi dest bixim.

Bersiv: Dema xwestin an jî nîşaniyê, dema ku mirov di wan de hevdu nas dike. Di vê demê de keç û kur ji ber ku ji aliyê dînê ve, ji hev re biyanî ne, nikarin di derdoreke girtî de bi hev re bimînin û hevdîtinê pêk bînin, keza nikarin bi destê hev bigirin, hevdu hembêz bikin û hevdu ramûsin.

Bi mebesta zewacê, zilam û pîrek çi rûbirû çi jî bi rêya telefonê dikarin bi hev re biaxivin. Lê belê di vê de jî hin sînor hene. Heta ku nîkah neyê birîn, hûn ji hev re biyanî ne. Ji vê bonê divê ku hûn riayeta qayde û rêgezên ehlaqî yên ku dînê me di vê mijarê de danîne, bikin.

Hûn û nîşaniya xwe, dikarin li mala wê hevdu bibînin. Bi vî awayî, hûn ê derfeta ku hem nîşaniya xwe hem jî malbata wê ji nêz ve nas bikin bi dest bixin.

Ji ber ku daweta we dê saleke din çêbibe, em, birîna nîkahê ji niha ve, li we tewsiye nakin. Lewra, mixabin nîkahên dînî, bê nîkaha fermî di halê hazir de tu encameke wê ya huqûqî tune ye û di pirsgirêkeke muhtemel de her dem keç mexdûr dibe. Dema nîşaniyê, peymaneke ku ji hev hatiye stendin û bi vê, tu mehremiyet ji holê ranabe. Lewra herdu alî jî di mijara nîkahê de dikarin fikra xwe biguherînin.

353. Bi duayên di dema nîşaniyê de nîkah tê birîn?

Pirs: Di nîşaniya me de mezinê malbatê dua kir û her kesî jî ew dua bihîst. Gelo ev dua, dikeve şûna nîkahê?

Bersiv: Di dema nîşaniyê de bi kirina duayên xêrê, nîkah nayê birîn. Lewra nîşan, îbaret e ji soz û peymana du kesên ku di navbera wan de ji aliyê dînî ve tu mehzûrek tune ye, ku dê bi hev re bizewicin. Nîşanî, amadekarî ye ji bo zewacê û da ku endamên zewacê di hundirê sînorên meşrû de hevdu nas bikin.

Nîşanî, çawa ku bi wateya birîna nîkahê nayê, herwiha ji aliyê mehremiyetê ve jî -heta nîkaheke sehîh neyê birîn-, di navbera herdu aliyan de tu guhartin dernakeve

holê. Ji vê bonê zilam û pîrekên bi nîşanî, divê ji helwestên - mîna ku mêr û jinên hev bin û li hember hev rihet bin-, xwe dûr bigirin.

354. Ma kesa/ê ku însan dê pê re bizewice, berê hatiye tayînkirin?

Pirs: Gelo yên ku mirov dê bi wan re bizewice, dema hîn di zikê diya xwe de ne, hatine kifşkirin? Hevalekî min got ku mirov hêj di zikê diya xwe de ye, tê kifşkirin û ev bi duayan jî nayê guhartin. Wî jî ev gotina han ji mamosteyekî xwe bihîstiye. Digel ewqas lêkolînan, min tiştekî wiha nedît. Ma bi rastî jî tiştekî wiha heye?

Bersiv: Eger ya ku mirov dê pê re bizewice, berê hatibûna nivîsandin û tayînkirin, wê demê di Qur'anê de fermana bi zewicandinê, dê nehata dayîn û dê behsa mijara pîrekên mehrkirina wan li mirov qedexene[437] jî nehata kirin. Gotinên bi vî awayî, ji angaşt û gotinên hin kesên ku bê delîl xeber didin pê ve, ne tiştekî din e.

Xwedê Teala mîna hemû mijaran, di mijara zewacê de jî însan serbest berdaye, da ku di encama tercîha wî de ya însan xelat bike yan jî celat bike. Eger însan, zewaceke ku Xwedê jê neqayîl e û meşrû nedêraye bike, dê rastî celatê were, lê belê, eger bi yeke ku Xwedê destûr dabe re bizewice, di vê rewşê de dê wî xelat bike. Eger her tişt ji berê ve hatibe nivîsandin û temam bûbe, wê demê serbestiya însên ya hilbijartinê namîne; ji vî aliyî ve berpirsyar nedihate girtin.

Di Qur'anê de dema behsa esasên baweriyê tê kirin mijara qederê tê de derbas nabe. Ev bawerî bi îtimada li ser hin hedîsan, derketiye holê.

355. Ma lixwekirina bûkaniyê guneh e?

Pirs: Gelo lixwekirina bûkaniyê heram e? Hin kes dibêjin, ji ber ku ne tor û adeta misilmanan e, lixwekrina wê ne caiz e.

[437] Bnh: Nîsa, 4/22-24.

Bersiv: Dawet li gorî urf û adetan tên kirin. Lixwekirina bûkaniyê jî êdî bûye adet. Bi şertê ku li gorî şert û mercên nixumandin û tesetura Îslamî be, di lixwekirina bûkaniyê de tu mehzûrek tune ye. Bi hinceta ku lixwekirina bûkaniyê ji çanda rojava hatiye, lazim nadêre ku ew tiştekî ne baş be.

356. Ma durist e ku nîkaha dînî bê xebera malbatê were birîn?

Pirs: Nîkaha dînî, gava bê destûra malbatê bê birîn, gelo dibe nîkaheke durist an na?

Bersiv: "Nîkah hem ji bo malbatê hem jî ji bo civakê, peymaneke pir girîng e. Ji vê bonê tifaqa zilam û pîrekê bi tenê li ser zewacê, ne kafî ye. Di vê mijarê de her civak, li gorî bîr û baweriyên xwe, li gorî urf û adetên xwe hin qayde danîne. Beriya Îslamê li civaka Mekkeyê, keç ji bav an jî ji weliyê wê dihate xwestin, mehra keçikê jê re dihat dayîn û nîkah dihate birîn. Îslamê jî vê tetbîqa han pejirandiye."

Ev, mijareke pir girîng e. Heta roja îro, mezhebên meşhûr (mîna Henefî, Şafiî, Malikî û Henbelî) bûne sedem ji bo hin şaşiyan û di vî warî de nêrînên ku ne muwafiqî Qur'anê ne beyan kirine. Di malpera me www.suleymaniyevakfi.org de di beşa "**Araştırmalar**" (Lêkolînan) de di derbarê vê mijarê de: "**Nikah Sözleşmesinde Velinin Yeri"** (Di Peymana Nîkahê de Cihê Welî) lêkolîneke me ya zanistî heye:

http://www.suleymaniyevakfi.org/arastirmalar/nikah-sozlesmesinde-veli.html

Vê gotarê bixwînin; di bin sî û sîwana Qur'an û suneta ku şîroveya wê ye hûn ê mijarên mîna: Nîkahên muwafiqî Qur'anê, nîkaha ku Qur'an wê rast didêre divê çawa bê birîn, cihê welî di peymana nîkahê de, gelo bê xeber û destûra welî nîkah tê birîn an na û hwd. hîn bibin.

Wekî din, em tewsiye dikin ku hûn nivîsa bi sernavê "**Velisiz Nikah**" (Nîkaha bê Welî) ya ku di lînka jêr de ye jî bixwînin:

http://www.suleymaniyevakfi.org/arastirmalar/velisiz-nikah.html

357. Ên ku sirf bi rêya fermî zewicîne, ma zinayê dikin?

Pirs: Seyda, dema dê û bavê min dizewicin, ji ber nizanibûne ku divê nîkaha dînî jî bihata birîn, sirf nîkaha xwe ya resmî çêkirine. Piştî ku çar zarokên wan çêdibin, nîkaha xwe ya dînî jî dibirin. Seyda, di vê rewşê de gelo wan zina kiriye? Û tu zirara wê digihîje min?

Bersiv: Naxêr, nayê gotin ku wan zina kiriye. Lewra di nîkahê de tiştê bingehîn, taqîbata huqûqî ya ku bi nîkaha fermî tê bidestxistin. Lê belê, di nîkaha fermî de hin unsurên ku di ya dînî de hene (mîna mehrê) kêm in. Encax ev unsurên han, ji ber ku ne bi şertên nîkahê, belbî bi encama wê re têkildar in, kesên ku sirf bi rêya fermî dizewicin nîkaha wan durist e. Piştî wê, bi rêya nîkaha dînî jî -mîna mehrê-unsurên kêm dê bên temamkirin.

358. Ma çêdibe ku nîkah bê mehr were birîn?

Pirs: Hûn dikarin di derbarê mehrê de agahiyan bidin? Nîkaha ku bê mehr were birîn gelo durist e? Di rewşeke wiha de divê mirov çi bike?

Bersiv: Zilamê bawermend, bi dayîna mehrê berpirsyar e. Ev, mafek e ji aliyê Xwedê Teala ve ji pîrekê re hatiye dayîn. Di ayeta çarem de ji sûreyê Nîsa, Perwerdegarê me wiha ferman dike:

"**Mehra jinan bi ciwanmêrî bidin wan**."

Dema zilam, li gorî usûlê mehra pîrekê nede, wê gavê pîrek dikare bi rêya dadgehê dozê veke û mehra xwe ji zilam bistîne. Heta ku mafê xwe bi dest nexe, mêrê wê li hember wê berpirsyar e, lê belê ev ne mecbûr e ku berpirsyariyên jinantiyê, bîne cih.[438]

Eger mehr, bi peymaneke ku di navbera mêr û jinê de tifaq li ser hatiye kirin an jî bi rêya nûnerên wan bi awayekî serbest bête tesbîtkirin, jê re tê gotin "mehrî

[438] Nasuhi Bilmen, **Hukukı İslamiye**, II, 167.

musemma" (mehra binavkirî.) Ji vê re tu sînor tune ye. Beşa ku biryara pêşin li ser hatiye dayîn dê pêşin be, ya mayî jî piştre dê bê dayîn. Dibe ku biryar li ser dayîna hemû mehrê bi pêşin jî hatibe dayîn. Zilam, heta beşa deynê xwe yê pêşin ji mehrê nede, mafê sûdwergitina ji pîrekê bi dest naxe. Lê belê eger pîrek destûrê bide, ew tiştekî din e. Beşa mayî jî yan bi hatina dema qewlê wan an bi berdanê yan jî bi mirinê bi giştî ji pîrekê re tê dayîn. Mîrata mêr, piştî dayîna vî deynî, dê were parvekirin.

Ji deynê mehra jina ku mêrê wê ew berdabe, zilam nikare qirûşekî jî jê kêm bike. Xwedê Teala wiha ferman dike:

"**Eger hûn bixwazin ku jinekê berdin û di şûna wê de jineke din bînin û we malekî pir dabiyê, vêca ji wî malî tiştekî nestînin. Ma hûn ê bi bêbextî û gunehkariyeke aşkere, jê bistînin?**[439]

Eger di dema birîna nîkahê de mehr nehatibe tesbîtkirin, herçiqas pîrek, di nîkahê de bi şertê bê mehriyê qayil bûbe jî nîkah durist e û mafê mehrê bi awayekî xwezayî derdikeve meydanê. Mehra ku bi vî awayî ji ber xwe ve hasil dibe, jê re tê gotin "**mehrî misil**".

Pîvan û awayê vê mehrê, bi nihêrtina pîrekeke ku hemkûfê wê, bê ka çiqas mehr stendiye, tê tesbîtkirin. Ev dengîtî/hemkûfî jî ji nav eqrebayên bavê pîrekê bi nihêrtina li taybetiyên temen, xweşikahî dewlemendî, hişmendî, dîndarî, ezebtî, bîtî, ilim, edeb, exlaqê xweş û ku zarokên wê hene-tune ne, tê tesbîtkirin.[440] Pîrekeke ku di van taybetmendiyan de hemkûfê wê be, wê ji mêrê xwe çiqas mehr stendibe, mehrî misla wê jî dibe ew.

Delîla duristiya nîkaha ku bê mehr hatibe birîn, ayeta 236an ji sûreyê Beqere ye. Di wir de Xwedê Teala wiha ferman kiriye:

---

[439] Nîsa, 4/20.
[440] Nasuhi Bilmen, **Hukukı İslamiye,** II, 119.

"**Eger, hîn ku we dest nedabe wan an jî we mehra wan diyar nekiribe, hûn jinan berdin, li ser we tu guneh tune ye. Tiştekî ku jê istifade bikin, bidin wan. Ê destfireh bila li gorî halê xwe û yê desteng jî li gorî halê xwe, dayîneke li gorî me'rûfê[441], bide wan. Ev, li ser qencîkaran, deynek e**."

Di ayetê de behsa mijara ku beriya mehra pîrekê hatibe tesbîtkirin û were berdan, tê kirin. Li gorî ku di derbarê berdanê tê xeberdan, ev tê wateya ku zewac pêk hatiye.

Di vir de divê mirov mijara mehrê û qelen/next, tevlihev neke. Qelen, heqê şîr û hwd. ji dê û bav an jî ji birayên pîrekê re tê dayîn, lê belê mehr bi giştî ji pîrekê re ye. Mehr bi giştî mafê pîrekê ye. Di mijara mehrê de tu kesekî din nikare mafekî angaşt bike. Dînê Îslamê, mehr şert dêraye û qelen jî qedexe kiriye.

Ji bo agahiyên berfirehtir di derbarê mijarê de ji kerema xwe re nivîsa ku di lînka jêr de ye bixwînin:

http://www.suleymaniyevakfi.org/arastirmalar/gunumuzde-kari-koca-ihtilafinin-sebepleri.html

359. Hukmê zêr û xişrên ku di dawet û nîkahê de tên diyarîkirin çi ye?

Pirs: Gelo hukmê zêr û xişrên ku di dawet û nîkahê de tên diyarîkirin çi ye? Ango tu mafekî pîrekê di wan de heye? An jî zilam bi destê xwe ye; bê destûra pîrekê çawa bixwaze dikare di wan de teseruf bike?

Bersiv: Di dawetê de diyarî û pereyên ku ji aliyê malbata pîrekê ve tên dayîn, diyariyên pîrekê tên hesabkirin, ên ku ji aliyê malbata zilam ve tên dayîn, dikeve ber mehrê. Ango di herdu rewşan de jî dibin malê pîrekê. Heta ku ew destûrê nede, mêrê

[441] Wateya me'rûfê; tiştê diyar û tê zanîn e. Ev zanebûn ya ji 'urf û adetan an jî ji Qur'an û Suneta Pêxember (s.a.v) tê bidestxistin. Eger ji 'urf û adetan hatibe bidestxistin divê ne li dijî Qur'an û Sunetê be. Zanebûneke wiha dîn û aqil, wê baş û rast didêrin.

wê nikare dest bidê, lê belê pîrek dikare di wan de teserufê bike. Dema sînorê nîsabê derbas bike, divê ku pîrek zekata malê xwe jî bide.

Xwedê Teala di Qur'ana Pîroz de wiha ferman dike:

"**Gelî bawermendan! Digel ku ew ne bi dilê we bin[442], ji we re ne helal e ku hûn hewl bidin da ku hûn bibin mîratxwerê pîrekan. Da ku tiştekî we daye wan, hûn ji wan bistînin zordestiyê li wan nekin; lê ku tolaziyeke aşkere bikin ew tiştekî din e. Bi wan re xweş derbas bikin. Vêca eger hûn ji wan bêzar bin, dibe ku hûn tiştekî nevên û Xwedê ji bo we xêr û bêreke pir têxê.**"[443]

360. Gelo mexduriyeta pîreka ku ne bi rêya resmî tê berdan, dê çawa were telafîkirin?

Pirs: Di encama ku pîrek ne bi rêya fermî hatibe berdan, mexdûriyeta wê dê çawa were telafîkirin? Ango ma berdaneke wiha meqbûl e û tê pejirandin?

Bersiv: Di mijara berdanê de tetbîqa belavbûyî ku îro li welatê misilmanan tê dîtin, li dijî Qur'ana Pîroz e. Di vê babetê de em tewsiye dikin ku hûn nivîsa me ya bi sernavê "Erkeğin Boşama Hakkı" (Mafê Zilam ê Berdanê) di malpera me www.suleymaniyevakfi.org de bixwînin.

Nîkahên ku bi rêya fermî hatibin birîn, herwiha divê mirov hewl bide ku bi rêya fermî bi dawî bike. Ango bi rêya fermî wan berde. Eger ne wiha be, dibe ku pisrgirêkên mezin derkevin holê. Berdana ne bi rêya fermî, eger li gorî rê û rêbazên Qur'anê be, berdan tê cih. Ango berdaneke wisa, pîrekê li mirov heram dike.

---

[442] Di ayetê de îfadeya "Digel ku ew ne bi dilê we bin" wergera bêjeya= كرها e. Ev bêje, "**hal**" e, ango rewşê dide xuyakirin. Di tefsîr û wergerên Qur'anê de ev peyv bi awayê ku bibe "**hal**" ji bo pîrekê, nirxandine û wiha wate dane ayetê: Gelî bawermendan! Ji we re ne helal e ku hûn bi kotekî bibin mîratxwerê jinan. Û ev bi du awayan şîrove kirine. Ya yekem, fehma ku pîrek mîna pertalê mîratê ye. Watedayîna bi vî awayî, tê wateya ku mirov ayetê dike tiştekî dîrokî –hatiye derbas bûye û êdî tu eleqeya wê bi îro re tune ye-. Ya din jî pîreka ku dixwaze ji mêrê xwe biqete, mirov wê bernede û li benda mirina wê bisekine da ku bi zorê bibe mîratxwerê wê. Ji ber ku Qur'anê bi rêya îftidayê mafê xweberdanê, daye pîrekê ev jî ne pêkan e. Ma ku mirov bêjeya "كرها " (kerhen) bike halê kirde, ango bike rewşa zilaman. Wergereke wiha yekîtiya di navbera ayetan derdixe holê.

[443] Nîsa, 4/19.

361. Hukmê zewaca bi zirxwişk/zirbirayan re çi ye?

Pirs: mirov dikare bi zirxwişk/zirbirayê xwe re bizewice?

Bersiv: Xwişk û biratî bi sê awayan dertê holê:

1. Xwişk û birayên heman dayikê bin

2. Xwişk û birayên heman bavî bin

3. Xwişk û birayên heman dê û bavî bin.

Meriv nikare bi yekî ji van her sê cureyan re bizewice. Ji bilî van eger zirxwişk/zirbira hebe, zewaca bi wan re durist e. Mesela bavê yekî bi navê Ehmed, dema ji bilî diya Ehmed bi yeke din bizewice û keçeke wê pîrekê ji zilamekî din hebe, Ehmed dikare bi wê keçikê re bizewice.

362. Zewaca bi yeke xeyrimuslim re çawa ye?

Pirs: Ez dixwazim bi pîrekeke bî ya xeyrimuslim re bizewicim. Gelo zewaceke wiha li gorî dînê me, durist e?

Bersiv: Neezebî/bîtiya wê, eger bi sedem sûcê zinayê be, li gorî hukmê ayeta 3yem ji sûreyê Nûr: "**Zilamê zinaker dikare tenê bi jineke zinaker re yan jî bi jineke muşrik re bizewice. Jina zinaker jî tenê mêrekî zinaker re yan jî mêrekî muşrik dikare wê mar bike. Zewaca bi vî awayî li ser ên bawermend hatiye qedexekirin**." zewaca we pê re heram e. Dîsa mîna ku di heman sûreyî di ayeta 5em de derbas dibe, eger tobe bike û xwe rast û durist bike, destûra zewaca pê re hatiye dayîn. Ayet wiha ye**: "Lê belê ew ên ku piştî vê, tobe bikin û rewşa xwe rast û durist bikin, ew cuda ne. Vêca bi rastî Xwedê gunehjêbir e, dilovîn e.**" Zilamekî misilman, dikare bi ehlikitêb ango bi pîrekeke Cihû û Fileh re bizewice. Xwedê Teala di sûreyê Maîde ayeta 5em de wiha ferman dike: "**Zewaca bi pîrekên bawermend ên bi namûs û pîrekên bi namûs ên ku beriya we, Me kitêb daye wan, ji we re helal**

in; bi şertê ku hûn mehra wan bidin wan, bi namûs bin, ji zinayê dûr bin û ji xwe re bi dizî dostikan negirin."

363. Mêrê Misilman, ma dikare bi yeke Fileh re bizewice?

Pirs: Ez pîrekeke Fileh im. Ez hurmet û rêzê nîşanî hemû dînên semawî û hemû pêxemberan didim. Hevalekî min ê misilman heye. Bi izna Xwedê, em dixwazin bizewicin. Ez dizanim ku zarokên me yên di pêşerojê de dê çêbibin, divê ku misilman bin û ez vê rewşê jî qebûl dikim. Ji bo min, bawermendiya mirov kafî ye. Lewra misilmanbûna min, bi tenê malbata wî şert didêre. Wan Qur'ana Pîroz nexwendiye û haya wan ji ayeta 5em ji sûreyê Maîde jî tune ye. Da ku em riza wan bistînin û dilê wan jî neşikînin, divê em, vê mijarê ji wan re çawa şîrove bikin? Lewra li gorî min, ji bo Qur'anê bêrûmetî û bêhurmetî ye ku ez rahêjimê û wê deynim ber destê wan.

Bersiv: Eger hûn ji wan re bibêjin ku min Qur'an xwendiye û min di ayeta 5em ji sûreyê Maîde destûreke wiha dîtiye, dê ev rewş wan dilşad bike û destûra zewaca we bidin. Eger gumanên wan dewam bikin, serî li Miftîxwaneyeke herî nêz bidin û eger di derbarê vê mijarê de ku hûn nivîsekê ji wan bistînin, dê munasib be.

Ayeta 5em ji sûreyê Maîde wiha ye:

"**Îro, ji bo we tiştên xweş û pak hatine helalkirin. Xwarinên ehlikitêban ji we re helal in û xwarinên we jî ji bo wan helal in. Zewaca bi pîrekên bawermend ên bi namûs û pîrekên bi namûs ên ku beriya we, Me kitêb daye wan, ji we re helal in; bi şertê ku hûn mehra wan bidin wan, bi namûs bin, ji zinayê dûr bin û ji xwe re bi dizî dostikan negirin. Kî ku îmanê înkar bike, bêguman kirinên wî pûç dibin; ew li axretê dibe ji yên ku xesirî ne.**"

364. Ma zewaca bi yeke/î ku zina kiribe û piştre poşman bûbe re durist e?

Pirs: Hevaleke min heye, em bi hev re mesûd û dilşad in, lê belê çend roj berê ji min re behsa hin tiştan kir. Berî min, bi yekî re 5 salan derketiye û pê re ketiye munasebeta cinsî. Dibêje ku min şaşîtî kiriye û ez poşman im. Di dîn de gelo zewaca bi yeke wiha re caiz e?

Bersiv: Însan bi xwezaya xwe, bi awayê ku meyla wî li ser gunehan be hatiye çêkirin. Dinya jî mala îmtihan û ceribandinê ye. Tiştên curbicur, ên ku însanî bikişînin bi bal gunehan û wî ji rêya rast dagerînin, dê derkevin pêşiya meriv. Di serî de "şeytan" tê. Şeytan da ku însanan ji rê derxe, heta roja qiyametê ji Xwedê Teala destûr stendiye. Ev rewş di Qur'ana Pîroz de derbas dibe:

"**Îblîs got: "Heta roja vejînê, muhletê bide min." Xwedê got: "Bêguman tu ji yên muhletdayî yî." (Îblîs) got: Ji ber ku Te ez rêwinda kirim, ez sond dixwim ku ji bo wan ez ê li ser rêya Te ya rast rûnim. Piştre ez ê ji pêş wan û ji pişt wan ve, ji rastê wan û ji çepê wan ve teqez dê bême wan û Tu yê pirên wan jî şêkirdar nebînî!"**[444]

Mîna ku di ayetê de derbas dibe, şeytan her daîm ji pêş, ji paş, ji rast û çepê mirov ve, bi ser însên de tê û bi vî awayî însanî dixe heramî û gunehkariyan. Piştre dê çawa be? Ên ku ji kirinên xwe şerm û fedî dikin û poşman dibin, dê çi bikin? Di vir de Xwedê Teala saziya poşmanî û tobekirinê aniye. Ên ku ji kirinên xwe poşman dibin, divê bi şertê ku êdî li wî karî venegerin tobe bikin, xwe bispêrin mexfîret û efûya Xwedê û Xwedê jî dê wan bibexşîne:

"**Herçî wan ên ku kiryarên nebaş kirin û piştre tobe kirin û bawerî anîn, bêguman Perwerdegarê te piştî wê pir gunehveşêr e, pir dilovîn e**."[445]

[444] E'raf, 7/14-17.
[445] E'raf, 7/153.

"Paşê, bi rastî Perwerdegarê te; ji bo yên ku bi nezanî guneh kirin, piştî hingê poşman bûn û xwe rast kirin, bêguman Perwerdegarê te piştî vê helbet pir gunehjêbir e, pir dilovîn e."[446]

"Bêguman, li cem Xwedê tobeya ku tê qebûlkirin; encax tobeya wan ên ku ji nezanîn ve gunehan dikin û piştre jî di demeke nêzîk de tobe dikin. Ha Xwedê tobeya wan qebûl dike. Xwedê zana ye, karbinecih e."[447]

"Bibêje: Gelî bendeyên min ên ku we li hemberî xwe (bi gunehan) sînor derbas kirine! Hêviya xwe ji rehma Xwedê nebirin! Bêguman Xwedê li tevekî gunehan dibore. Lewra, Ew pir gunehjêbir e, pir dilovîn e."[448]

"Bêguman Ez, ji bo wî kesê ku poşman bibe, bawerî bîne û karê qenc bike, paşê di rêya rast re here, pir bexşende û tobepejrên im."[449]

Mîna ku di ayetan de bi awayekî zelal tê dîtin, Xwedê, kesê ku ji kirinên xwe yên nebaş poşman bibe û karên qenc bike, dibexşîne. Gunehê ku we behsa wê kir, yek ji gunehên mezin ê ku Xwedê ew qedexe kiriye. Ne sirf kirina wî belbî nêzîkbûna bi bal ve jî hatiye heramkirin:

"Nêzîkî zinayê mebin. Lewra ew, karekî pir kirêt û rêyeke pir pîs e."[450]

Lê belê, dema mirov ji vê kirinê poşman bibe, tobe bike –Xwedê hez bike- ev guneh tê bexşandin. Tiştê girîng ku mirov rewşa xwe rast û durist bike û karên qenc bike. Zewaca bi yeke wiha re ji aliyê dînî ve tu mehzûreke wê tune ye.

---

[446] Nehl,16/119.
[447] Nîsa, 4/17.
[448] Zumer, 39/53.
[449] Taha, 20/82.
[450] Îsra, 17/32.

365. Pîreka ku şeva wê ya gerdekê rastî dema xwînmeha wê were

Pirs: Eger pîrekek, şeva zîfafa wê pêrgî dema dîtina xwînmeha wê were, gelo nîkaha wê ya dînî qebûl dibe, an jî piştî ku paqij bû divê careke din nîkaha wê bê birîn? Hûn dikarin min agahdar bikin?

Bersiv: Xwedê Teala di Qur'an Pîroz de wiha ferman dike:

"**Ji te, pirsa heyzê pîrekan dikin. Bibêje: Ew ezyet e. Di rojên heyzê de xwe ji wan dûr bigirin. Heta ku ew jê paqij nebin nêzîkî wan mebin. Dema tam jê paqij bûn, êdî ji cihê ku Xwedê li we ferman kiriye herin cem wan. Bêguman Xwedê ji tobekaran hez dike û ji yên pak û paqij jî hez dike**."[451]

Li gorî vê ayetê, pîrek di dema adetan de ne paqij in. Bi sedema ku yek ji şertên nimêjê paqijî ye, pîrek di wê demê de bi kirina nimêjê ne berpirsyar in. Di dema xwînmehê de qedexeya duyem jî pêwendiya cinsî ya di navbera pîrekê û zilam de ye. Ji bilî van herdu tiştan, di gava adetan de li ser pîrekê, tu tiştekî qedexekirî tune ye.

Ji bo duristbûna nîkahê, tu şertekî ku divê pîrek paqij be, tune ye. Nîkaha ku di dema nepaqijiyê hatibe birîn sehîh e û ne pêwîst e ku piştî paqijiyê careke din bê birîn.

366. Ma nîkaha yeke Şafiî û yekî Henefî dê çawa were birîn?

Pirs: Dema pîrek Şafiî be û zilam jî Henefî be, nîkaha wan dê çawa bê birîn?

Bersiv: Nîkah, ne li gorî mezheban, belbî li gorî birîna Pêxember (s.a.w), tê birîn. Wî çawa birîbe, divê misilman jî bi wî awayî bibirin. Cudabûna mezheban, di birîna nîkahê de tu cudahitiyê dernaxe holê. Di nîkahê de tiştên ku pêdivî pê heye: Du şahidên pêbawer, destûra welî, zewac li gorî me'rûfê be û mehra pîrekê ye.

[451] Beqere, 2/222.

Ji bo ahagiyên berfirehtir, ji kerema xwe li lînkên jêr binihêrin:

http://www.suleymaniyevakfi.org/arastirmalar/nikahin-denetlenmesi.html

367. Ma zewaca bi yeke qereçî re durist e?

Pirs: Gelo zewaca bi yeke qereçî re caiz e? Huqûqa Îslamê, li vê mijarê çawa dinihêre?

Bersiv: Ji bo zewacê qereçîtî, ne asteng e. Dema şertên nîkahê yên din hatibin cih, mirov dikare bi yeke qereçî re bizewice.

368. Yekî/e Sunî dikare bi yeke/î Elewî re bizewice?

Pirs: Yekî/e 'Elewî dikare bi yekî/a sunnî re bizewice?

Bersiv: Elewîtî, ne dînekî cuda yê bi serê xwe ye. Lewra ji Elewiyan hin kes hene, xwe misilman dibînin, Xwedê Teala û Pêxemberê wî nas dikin û wan qebûl dikin, fermanên ku di Qur'na Pîroz de derbas dibin dipejirînin û heta ji destê wan bê dixebitin ku wan fermanan bi cî bînin. Eger şertên pêwîst -ji bo zewacê- ên din li cih bin, tu zirar û astengekî dînî di vê zewacê de tune ye.

Eger ne wisa be, mîna ku baweriya wî bi Xwedê û Pêxemberê wî tune be, tu fermanên Xwedê Teala nas neke –belbî wan bêkêr û nepêwîst bibîne-, di derqehê Pêxember û sehabiyên (hevalên) wî, vir de wir de biaxive, ji xwe ev misilman nayê jimartin. Di derheqê kesên wiha de Xwedê Teala di sûreyê Beqere de wiha ferman dike:

"**Heta ew îmanê neyînin bi jinên muşrik re nezewicin. Qerwaşeke bawermend ji jineke muşrik çêtir e, çendîn xweşikatiya wê we hijmetkar bihêle jî. Heta ku baweriyê neyînin keçên xwe jî li mêrên muşrik mar nekin. Koleyekî bawermend ji muşrikekî çêtir e, çendîn rindiya wî we hijmetkar bihêle jî. Ew gazî**

êgir dikin. Xwedê jî bi destûra xwe we gazî bihuşt û lêborînê dike û ayetên xwe ji mirovan re aşkere dike da ku aqil bigirin.”[452]

Di malpera me www.suleymaniyevakfi.org de lêkolîneke me ya bi sernavê “**İslamiyet İçinde Alevilik**” (Di Îslamê de Elewîtî) heye. Em tewsiye dikin ku hûn wê nivîsê bixwînin. Nivîs, di lînka jêr de ye:

http://www.suleymaniyevakfi.org/arastirmalar/tarih-arastirmalari/islamiyet-icinde-alevilik.html

369. Zilamê ku jina wî bimire, kengî dikare bi yeke din re bizewice?

Pirs: Diya min 53 salî bû wefat kir, bavê min jî 55 salî ye. Seyda, bi izna Xwedê, bavê min dê bizewice. Di derbarê şert û mercên vê nîkahê de hûn dikarin min agahdar bikin? Ev zewac, divê piştî wefata diya min bi çiqasî be?

Bersiv: Ji bo bavê we -da ku bikaribe bizewice-, ne lazim e tu demeke xuyakirî bisekine. Li aliyê din, ên ku piştî mirina hevserê xwe disekinin jin in, ne mêr in. Jin, piştî ku mêrê wê mir, divê çar meh û deh rojan bisekine ango ‘iddeyê xwe bikişîne[453] û dûvre bi şert û mercên ku ji bo zewacê pêwîst in, dikare bizewice.

370. Ma zewaca bi kîjan eqrebayî re heram e?

Pirs: Zewaca bi eqrebayan re heta kîjan zikî/betnî, li mirov heram in?

Bersiv: Di dînê me de eqrebatiya ku dibe asteng ji bo zewacê: Eqrebatiya nêz, eqrebatiya bi rêya xwezûrantiyê û eqrebatiya bi rêya şîr e.

a. Eqrebatiya nêz: mirov ji eqrebayên xwe yên nêz, bi dê û dapîrên xwe, bi keça xwe û neviyên wê, xwişk/bira û zarokên xwişk û birayan û neviyên wan, bi xal-xaltîk û ap-meta xwe re nikare, bizewice.

[452] Beqere, 2/221.
[453] Beqere, 2/234.

b. Eqrebatiya bi rêya xwezûrantiyê: mirov bi diya pîreka xwe û dapîrên wê re ebediyen nikare bizewice. Herwiha pîreka ku mirov pê re ketibe şeva gerdekê, keç û neviyên wê jî li mirov heram dibin. Jinên bav û bapîrên wê, jinên kur û neviyên wê jî ebediyen li merivî heram dibin.

c. Eqrebatiya bi rêya şîr: Ê ku heta du saliya xwe ji pîrekekê şîr vexwaribe, ew pîrek û mêrê wê, zarokên wê û yên ku wê şîr daye wan, dibin eqrebayê hev ên şîr. Digel hin rewşên awarte pîrekên ku yekî misilman bi sedem eqrebatiya nêz nikare bi wan re bizewice, bi sedem eqrebatiya şîr jî nikare bi wan re bizewice. Mîna mirov bi dê, xalti, met û xwişk û birayên xwe yên şîr re nikare bizewice.

Ji bilî van, zewaca bi eqrebayên din re ji aliyê dînî ve tu mehzûreke wê tune ye.

Ayetên têkildar wiha ne:

"**Bi jinên ku bavê we, ew mehrkirine re nezewicin. Tiştê derbas bûbe êdî çûye. Lewra ew, fehşîtî û karekî kirêt e. Çi rêyeke pîs e!**

Dayikên we, keçên we, xwişkên we, metên we û xaltîkên we, keçên bira û keçên xwişkên we, dayikên we yên şîr û xwişkên we yên ji şîr, dayikên jinên we û keçhiliyên we yên di malên we de ku hûn çûne nivînên dayikên wan -êdî eger hûn neçûbin nivînên dayikên wan tu guneh li ser we nîn e - û jinên kurên we yên ji pişta we û ku hûn ji xwe re bi jinanî du xwişkan bînin cem hev, li we hatine qedexekirin. Tiştê derbas bûbe êdî çûye. Bi rastî Xwedê bexşîner e, dilovîn e.

Jinên bimêr jî li we, heram in; ji bilî (esîrên cengê) yên ku di bin destê we de ne. Ev nivîsa Xwedê ya li ser we ye. Ji bilî van, ên mayî, bi şertê ku hûn bi namûs bijîn û xwe ji zinayê dûr bigirin, ji we re helal in. Ji van a, hûn bi nîkahê ji kîjanê istifade bikin, ji mehra wan mîqdarê we li hev kiriye bidin. Piştî mehra ku

hatî kifşkirin, eger hûn bi riza dilê xwe bi awayekî din li hev bikin, li ser we tu guneh tune ye. Bêguman Xwedê zana ye, karbinecih e."[454]

371. Kurê xal û keça metê dikarin bi hev re bizewicin?

Pirs: Ji aliyê dînî ve, zewaca kurê xal bi keça metê re tu mehzûreke wê heye? Ango nîkaheke wiha durist e?

Bersiv: Eger kurê xal û keça metê, ne xwişk û birayên hev ên şîr bin, di zewaca wan de ji aliyê dînî ve, tu mehzûreke wê tune ye. Herwiha heta ku mirov nebe xwişk û birayên hev ên şîr, zarokên birayan; zarokên apan, metan, xalan û xaltîyan jî dikarin bi hev re bizewicin.

Eqrebayên ku mirov nikare bi wan re bizewice ev in:

"**Bi jinên ku bavê we, ew mehrkirine re nezewicin. Tiştê derbas bûbe êdî çûye. Lewra ew, fehşîtî û karekî kirêt e. Çi rêyeke pîs e!**

Dayikên we, keçên we, xwişkên we, metên we û xaltîkên we, keçên bira û keçên xwişkên we, dayikên we yên şîr û xwişkên we yên ji şîr, dayikên jinên we û keçhiliyên we yên di malên we de ku hûn çûne nivînên dayikên wan -êdî eger hûn neçûbin nivînên dayikên wan tu guneh li ser we nîn e -û jinên kurên we yên ji pişta we û ku hûn ji xwe re bi jinanî du xwişkan bînin cem hev, li we hatine qedexekirin. Tiştê derbas bûbe êdî çûye. Bi rastî Xwedê bexşîner e, dilovîn e."[455]

Ji bilî van, zewaca bi eqrebayên din re caiz e.

372. Hukmê zewaca neviyên birayan bi hev re çi ye?

Pirs: Îhtimala seqetiya zarokên ku dê û bavê wan eqreba ne, pir bilind e. Digel ku di Qur'anê de ji bo zewaca eqrebayan destûr hatiye dayîn jî gelo Xwedê bi vê rêyê, ne rasterast be jî ev zewac qedexe kiriye?

[454] Nîsa, 4/22-24.
[455] Nîsa, 4/22-23.

Bersiv: Ma di Qur'anê de ev nehatiye qedexekirin. Bi hezaran însan hene, digel ku dê û bavê wan eqreba ne jî tu seqetî bi wan re tune ye. Di mijara kesên ku zarokên wan bi seqetî tên dinyayê, -ka gelo di navbera wan de eqrebatiya şîr heye yan na-, nayê nihêrtin. Lêkolînên di vî warî de dema bê îtimada li ser dane û malûmatên Qur'anê bê kirin, encama ku derkeve meydanê jî teqez dê ne tatmînkar be.

373. Meriv dikare ji yekî ku ne bavê mirov e re bibêje "bavo"?

Pirs: mirov dikare ji yekî ku ne bavê mirov be re bibêje "bavo"? An jî gelo dema zilam ji bavê pîreka xwe re bibêje, "bavê min", tu mehzûreke wê heye?

Bersiv: Tu mehzûreke wê tune ye. Lewra bêjeya "bav" mîna ku ji mirov ji bavê xwe yê rastîn re dibêje, ji bo yên ku bi salên xwe mezin in û mirov hurmeta wan digire jî re tê gotin. Ango li gorî urf û adetê, dema mirov ji yekî ku di temenê bavê mirov de ye re bibêje "bavo", ev nayê wateya ku "bavê min ê rastîn e", belbî ev gotin ji bo rêz û hurmetê hatiye gotin. Ji vê bonê di gotina mêr û jinê, ji dê û bavê hev re "bavê min", "diya min" de tu mehzûrek tune ye. Tiştê Pêxember (s.a.w) qedexe kiriye ku mirov bavê xwe yê rastîn înkar bike û angaşt bike ku mirov zarokê yekî din e.

374. Ma nîkah bi henekan tê birîn?

Pirs: Zilamekî (25 salî) di hawirdoreke ne pir cidî de ji keçeke (16 salî) dipirse: "Tu bi min re nazewicî", keçik jî bersiva, "Belê, ez bi te re dizewicim" dide. Piştre zilam dibêje "Êdî, em hevserê hev in, min ev ji du kesên din re jî got." Gelo nîkaheke wiha durist e? Ne malbata keçikê, ne jî malbata zilam, heta hevalên herduyan jî haya wan ji vê tune ye. Di vê mijarê de hûn çi dibêjin?

Bersiv: Tiştê hatiye kirin, nakeve şûna nîkahê. Madem rewş wiha ye, gotina wî ya ji du kesan re tu wateya jê re tune ye. Tiştê hatiye kirin herî zêde, dibe soz û

peymandayîna ji bo zewacê. Lewra hin şertên nîkahê hene; destûra welî, rizaya keçikê, hazirbûna du şahidan. Heta ku ev şert pêk neyên, peymana nîkahê nayê cih.

375. Ma divê mirov ji îfadeya "Telaq du car in", çi fêhm bike?

Pirs: Min nivîsên we yên di derbarê berdanê de xwendin. Dema min û hevalekî xwe li ser vê meseleyê nîqaş kir, em bi hev re ketin îxtilafê. Hûn dikarin vê meseleyê hinekî vekin?

Bersiv: Xwedê Teala di ayetên pêşîn ji sûretê "Telaq" yanî sûreyê berdanê de ehkamê wê bi berfirehî bi me daye naskirin. Her berdana ku li gorî şert û mercên di wan ayetan de derbas dibe, pêk bê telaqek ango berdanek tê qebûlkirin. Lewra Xwedê Teala di sûreyê Beqera ayeta 229an ferman dike ku: "**Telaq du car in**." Lê belê di hundirê 'iddeyê de eger mêr poşman bibe dikare li jina xwe vegere. Ango jina xwe li xwe vegerîne. Xwedê Teala wiha ferman dike:

"**Eger mêrên wan lihevhatinê bixwazin, ji wan re bêhtir heq heye ku wan li xwe vegerînin**."[456]

Eger bi vî hawî jina xwe du caran berde, piştî berdana cara sêyem êdî şert û mercên vegerînê ne wekî berê hêsan in. Xwedê Teala di heman sûreyî de di ayeta 230an de wiha ferman dike:

"**Êdî eger mêr jina xwe berde, ev jin lê ne helal e heta ku ji bilî wî bi mêrekî din re nezewice. Eger wî ew berda, êdî tu guneh li ser herduyan tune ye ku dîsa li hev vegerin, eger bawerî anîbin ku dê tixûbên Xwedê bi cî bînin**."[457]

[456] Beqere, 2/228.
[457] Beqere, 2/230.

376. Di kîjan rewşan de divê mirov nîkaha xwe nû bike?

Pirs: Ez dixwazim, di derbarê nûkirina nîkahê de agahdar bibim. Di kîjan rewşan de divê nîkah bê nûkirin? Şevên înê li hin mizgeftan, mele duayê nûkirina nîkahê dide kirin. Ma ev tişt rast e?

Bersiv: Ji kesên zewicandî re tiştekî bi navê nûkirina nîkahê tune ye. Di halê domandina zewacê de nîkah nayê nûkirin. Nûkirina nîkahê bi tenê dema ku -ji berdana cara yekem an jî cara duyem- 'iddeyê pîrekê qediya be pêkan e. Ev jî hin şertên wê mîna – îcab-qebûl û îlankirin û hwd.- hene. Nîkah sirf bi kirina duayan nayê birîn. Ew tiştê ku li hin mizgeftan tê kirin, ji ayet û hedîsan tu delîleke wê tune ye.

377. Eger nîşanî were xerakirin, ma mirov dikare diyariyên xwe ji malbata keçikê bistîne?

Pirs: Keç û kur bi hev re nîşaniyê dikin, lê belê hêj nîkah nehatiye birîn. Zêr û diyariyên cuda tên kirîn û xelwet jî hasil dibe. Piştre aliyê keçê dev ji nîşaniyê berdidin. Di vê rewşê de ma zêr û diyariyên ku hatine kirîn, dê ji wan bên stendin?

Bersiv: Hediye/diyarî û zêrên di dema nîşaniyê de bi mebesta zewacê tên dayîn. Gava nîşanî hate xerakirin û mebesta zewacê ji holê rabû, diyarî û zêrên ku hatine dayîn jî dê ji wan bên stendin. Lê belê, diyariyên ku hatibin xerckirin, bedêla wan ji aliyê malbata keçikê ve nayê tehsîlkirin; tiştê hatiye xerckirin nayê xwestin. Xelweta ku piştî nîşanê bê nîkah hatiye kirin jî guneh e, ji bo vî tiştî, divê herdu alî jî tobe û îstixfar bikin.

378. Piştî nîşaniyê mirov dikare dev ji hev berde?

Pirs: Piştî ku soz hat dayîn û nîşanî hate kirin, endamên zewacê dikarin ji biryara zewacê vegerin ango poşman bibin?

Bersiv: Nîşanî îbaret e ji hin merasîm, gotin û soza ji bo zewacê ya di pêşerojê de. Dayîna soza zewacê, bi wateya biryardayîna em ê di mêjûyeke pêş de bizewicin. Ji vê bonê nîşanî û xwestin, di navbera wan de peymana nîkahê dernaxe holê. Lewra nîkah, li gorî qayde û rêbazan di hizûra şahidan de ji îfade û rizaya keç û kur, pêk tê. Ji ber ku nîşanî nakeve şûna nîkahê, dergîstî nikarin bi tena serê xwe bi hev re bimînin û dema yek ji wan bimire, nabin mîratxwerên hev. Bi kurtasî, herdu alî jî dikarin poşman bibin û ji biryara zewacê vegerin.

379. Ma lixwekirina gustîlka zewacê durist e?

Pirs: Gelo lixwekirina gustîlka zewacê caiz e? Min bihîst ku ev adet, ji çanda civakên Fileh derbasî çanda me bûye û heta min bihîst ku lixwekirina wê, bîd'et e. Gelo ev tişt rast e?

Bersiv: Hungilîska zewacê, nîşan e ku ew kes zewicandî ne. Her civak jî li gorî urf û adetên xwe, da ku zewac û nîşanîbûna xwe diyar bikin, hin nîşanan bi kar tînin. Gustîlk jî yek ji wan nîşanan e û di lixwekirina wê de tu mehzûrek tune ye.

Meriv nikare ji gustîlka zewacê re bibêje ku bîd'et e. Lewra, da ku ji tiştekî re bê gotin bîd'et, divê têkiliya wê bi mijarên baweriyê yan jî 'îbadetê re hebe. Û xuya ye ku gustîlk, tu eleqeya wê bi wan mijaran re tune ye.

380. Hukmê kirina du rek'et nimêj di şeva gerdekê de çi ye?

Pirs: Di şeva gerdekê de hukmê kirina du rek'et nimêj çi ye? Kesên ku berê nezewicîne, lê belê ne ezeb in jî bi kirina vê nimêjê, berpirsyar in?

Bersiv: Ji bilî ku hin sehabiyên Pêxember (s.a.w), bi xwe ev nimêj kirine û tewsiya kirina wê kirine, di tu çavkanî û jêderên Îslamî de tiştekî ku vê nimêjê ferman bikin tune ne. Ji ber vî hawî, em dikarin bibêjin ku ev nimêj musteheb e. Kesê ku dike çi ezeb û çi jî bî be, ferq nake. Ê ku bike, dibe xwediyê xêra xwe û yê ku neke jî tu guneh jê re tune ye. Bi kurtasî, ev nimêja hanê li ser xwestina mirov e.

381. Gelo hedîseke bi awayê "Şeva gerdekê divê zava lingên bûkê bişo" heye?

Pirs: Gelo ev hedîs, sehîh e? Qasidê Xwedê (s.a.w), dema Hezretî 'Elî û Fatîme dizewicîne, wiha gotiye: "Ey 'Elî! Wexta ku te bûk bir mala xwe, gorên wê ji piyên wê derxe. Piyê wê bişo û wê avê li çar goşeyên malê bireşîne. Ku mirov wiha bike, Xwedê Teala heftê cur feqîrî ji wê malê dûr dike. Heftê cur xêr û bereket dixe wê malê. Heftê rehmî li te dibarîne. Xêr û bereketa bûk û zavê digihîje hemû goşeyên malê. Û ew bûka hanê ji dînîtî û nexweşiyên din ewle dibe."

Bersiv: Ev gotina ku di nava gel de wekî "hedîsê" tê zanîn û di înternetê di malperên ji bo zewacê de bi piranî derdikeve pêşberî meriv, ne hedîs e; belbî "mewdû'e". Yanî gotineke derewîn e. Di kitêbên ku hedîsên "mewdû" berhev dikin de derbarê 'Ebdullahê kurê Wehb ê ku di seneda vê riwayetê de derbas dibe, wiha tê gotin; "*Li ser navê însanên emîn û ewledar derewan dike decal/derewînekî derê hanê ye," û "heta ji bilî armanca cerhkirinê (aşkerekirina rewşa wî) derbasbûna navê vî kesî di kitêban de ne caiz e*."[458]

382. Gelo xwişk û biratiya bi rêya xwînê jî heye?

Pirs: Diya min ji dilê xwe 'emeliyat bû, berî 'emeliyatê bi lezgînî 5 unîte xwîn xwestin. Bavê min jî heta ku 4 unîte xwîn dît, unîteke ji xwîna xwe dayê. Di vê rewşê de gelo dê û bavê min dibin xwişk û biyarên hev ên xwînê û ji aliyê dînî ve, tu mehzûreke wê heye?

Bersiv: Di dînê me de tiştekî bi navê xwişk û biratiya bi rêya xwînê, tune ye. Xwîna ku bavê we daye diya we, nabe sedem û asteng ji bo tu tiştekî. Xwişk û biratiya ku ji bo zewacê dibe asteng, xwişk û biratiya rastîn û ya bi rêya şîr e.

---

[458] Bnh: Îbnu'l-Cewzî Ebu'l-Ferec 'Ebdurrehmanê kurê 'Elî, **Kîtabu'l-Mewdû'at mine'l-Ehadîsi'l-Merfû'at**, thq: Tewfîq Hamdan, çapa 2yem, Daru'l-Kutubi'l-'Ilmiyye, Beyrût 2003, III, 62, jimara hedîsê: 1273; ez-Zehebî Muhemmedê kurê Ehmed, **Mîzanu'l-I'tidal**, II, 523, jimara hedîsê: 4678; Şewkanî, **el-Fewaîdu'l-Mecmû'e fi'l-Ehadîsi'l-Mewdû'e**, thq: 'Ebdurrehman el-Mu'allimî, çapa 2yem, Beyrût 1392, rp. 126, jimara hedîsê: 26-353.

383. Keçika ku ji diya min şîr vexwaribe, ma dibe xwişka min jî?

Pirs: Keça merivekî me, bi xwişka min re ji diya min şîr vexwariye. Herdu jî bi temenê xwe ji min biçûktir in. Di vê rewşê de gelo ez bi vê keçikê re dibim xwişk û birayê şîr û ez dikarim pê re bizewicim an na?

Bersiv: Li gorî dînê me, ji astengên zewacê yek jê jî eqrebatiya bi rêya şîr e. Li gorî ku wê keçikê, ji diya we şîr vexwariye, ew xwişka we ya şîr e û zewaca we, bi wê re heram e.

Ji bo agahiyên berfirehtir di derbarê mijara eqrebatiya bi rêya şîr de em tewsiye dikin ku hûn dersen me yên di lînkên jêr de ne, temaşe bikin.

http://www.kurandersi.com/konulu-kuran-sohbetleri/2009/sut-akrabaligi-1.html

http://www.kurandersi.com/konulu-kuran-sohbetleri/2009/sut-akrabaligi-2.html

384. Meriv dikare bi keçika ku bi xwişka mirov re ji heman pîrekê şîr vexwariye re bizewice?

Pirs: Pîrekek, bi zaroka/ê xwe re şîr dide zaroka/ê eqrebayekî xwe jî. Dema ev herdu zarok mezin dibin, birayê keçika ku şîr vexwariye dixwaze, bi keça pîreka -ku şîr daye xwişka wî- re bizewice. Gelo ev herdu dikarin bi hev re bizewicin?

Bersiv: Keçika ku ji pîrekê şîr vexwariye, keça wê pîrekê ya şîr e. Ji vê bonê nikare bi zarokên wê yên kur re bizewice, ango heram e. Lê belê, xwişk û birayên keça şîr, tu têkiliya wan bi pîreka şîr dayiye re tune ye. Ji ber vê yekê birayê keça şîr, dikare bi keça pîreka ku şîr dayiyê re bizewice.

385. Ma mirov dikare bi xwişka şîr ya xwişka xwe ya helal re bizewice?

Pirs: Pirsa min, hinekî tevlihev e: ‘Aişe Xanimê, bi navê ‘Elî û Osman du zarokên wê hene. Fatma xanim jî bi navê Muhemmed û Nazli du zarokên wê hene. ‘Aişe Xanimê, bi kurê xwe Osman re şîr dide kurê Fatma Xanimê. Fatma xanim jî bi kurê xwe Muhemmed re şîr dide Osmanê kurê ‘Aişe Xanimê. Ma ‘Elî û Nazli, dibin xwişk û birayên hev ên şîr? Ji bo zewaca wan tu astengek heye?

Bersiv: Muhemmedê ku ji ‘Aişe Xanimê şîr vexwariye, dibe kurê ‘Aişe Xanimê yê şîr. Osmanê ku ji Fatma Xanimê şîr vexwariye, dibe kurê Fatma Xanimê yê şîr. Di vê rewşê de Osman û Nazli dibin xwiş û birayên hev ên şîr, nikarin bi hev re bizewicin. Lê belê, ji ber ku ‘Elî û Nazli, ne xwişk û birayên hev ên şîr in, di zewaca wan de tu astengî û mehzûrek tune ye.

386. Ên ku bi sedem xwezûrantiyê ebediyen mirov nikare bi wan re bizewice kî ne?

Pirs: Min di malpera we de nivîsa di derbarê pîrekên bi rêya xwezûrantiyê li mirov heram in, xwend. Gelo piştî ku jina mirov bimire jî rewş wisa dewam dike yan na?

Bersiv: Ên ku bi rêya eqrebatiya sihriyet/zewacê “ebediyen” li mirov heram in, çar beş in:

Jina bav û bapîrên meriv. Ev zirdê û zirdapîrên mirov in. (Dê û dapîrên mirov ên helal, bi sedema eqrebatiya xwînê, li merivî heram in.)

Bûkên meriv. Ev, jina kur û neviyên mirov in. Bi jina kurê xwe yan jinên neviyên xwe re –çi hatibin berdan, çi jî bî bin- mirov nikare bizewice.

Xwesûyên meriv. Ew jî dê û dapîrên jina mirov in.

Zirkeçên ku mirov çûye nivîna diya wan.

Eger mêr jina xwe berde yan jî jina wî bimire, bi van her çar cureyên pîrekan re -tu car- nikare bizewice.

387. Meriv dikare jina xwe berde û bi xwişka wê xwe re bizewice?

Pirs: Pirsa min bi mijara ku mirov di heman demê de bi du xwişkan re bizewice re têkildar e. Ez, ayeta bi mijarê re têkildar e, dizanim. Lê belê, kesê ku jina xwe berde, gelo jê re durist e ku bi xwişka jina xwe re bizewice? Ango zewaceke wiha caiz e?

Bersiv: Li gorî ayeta 23yem ji sûreyê Nîsa, ku mirov **di heman demê** de bi du xwişkan re zewacandî be, heram e. Lê belê piştî mirinê yan jî berdanê, mirov dikare bi xwişka jina xwe re bizewice. Ji bo nîkahê, divê li benda derbasbûna 'iddeyê pîreka ku berdaye, bisekine. Dema 'iddeyê wê xelas bû, zilam dikare bi xwişka jina xwe re bizewice.[459]

Rewşa ku di pirsa we de derbas dibe, herçiqas di hin urf û adetan xweş neyê dîtin jî dînê me di vê mijarê de tu mehzûratî û qedexebûn neaniye.

388. Ma mirov dikare jina xwe ya nexweş bernede û bi xwişka wê re bizewice?

Pirs: Ez zewicandî me û du zarokên min hene. Pîreka min nexweş e. Nexweşiya wê giran e. Di wê navberê de xwişka jina min, dihat mala me û diçû û dilê min ketê. Digel ku jina min li cem min e, em dikarin bi hev re bizewicin?

Bersiv: Li gorî dînê me, heta ku hûn jina xwe bernedin, zewaca we bi xwişka jina we re heram e.[460] Lê belê, nabe ku hûn jina xwe jî di vê rewşê de bihêlin. Erê, ji ber ku jina we nexweş bû, dibe ku berpirsyariyên xwe neanîbe cih û hûn mexdûr bûbin. Ji vê bonê mafê we yê ku hûn jineke din ji xwe bînin heye. Lê belê, dema hûn wê berdin û bi xwişka wê re bizewicin, ji bîr mekin ku hûn ê bibin sedemê ku jina we

[459] Bnh: Nasuhi Bilmen, **Hukukı İslamiyye,** II, 101.
[460] Bnh: Nîsa, 4/23.

ya nexweş bêhtir bikeve. Mîna emanetekî ji cem Xwedê be we, ew stend. We peymana ku hûn ê jiyanekê –rojên xweşî û nexweşiyê- bi hev re derbas bikin, daye hev. Sebir bikin û jina xwe derman bikin.

Ji îro û pê de qederulîmkan xwe ji xwişka jina xwe dûr bigirin, da ku şeytan piyên we neşemitîne.

389. Meriv dikare bi pîreka birayê xwe yê mirî re bizewice?

Pirs: Ez li herêma Rihayê, alîkarê mudûrê dibistanekê me. Li vê herêmê, rewşeke ku pir tê dîtin heye û pirê caran ji me jî tê pirsîn. Min jî xwest ku ez ji çavkaniyê hîn bibim. Pirsa min ev e: Ma zilam, dikare bi jina birayê xwe yê mirî re bizewice?

Bersiv: Birayê mirî yê ezeb, dikare bi xanima birayê xwe yê mirî re bizewice. Ji aliyê dînî ve, tu mehzûreke wê tune ye.

Meriv di zewacê de li rizaya herdu aliyan, dinihêre. Ev, şertekî pêwîst e. Ango jina ku mêrê wê miriye yan jî birayê mirî, dema zewaceke bi vî awayî nexwazin, ji bo zewacê tu kes nikare zorê bide wan. Di vê mijarê de mirov guh nade urf û adetê. Lê belê eger hem pîrek hem jî birayê mirî bixwazin, dikarin bizewicin.

390. Di dînê me de, cih û girîngiya bekaretê çi ye?

Pirs: Di dînê me de girîngiya bekarbûnê çi ye? Eger tu girîngî û fêdeya bekarbûnê tune be, çima xerabûna wê ewqas mezin e? Ma Xwedê, çima ferqê dixe navbera mexlûqên xwe?

Bersiv: Xwedê Teala bi tu awayan ferqê naxe navbera mexlûqên xwe. Bekarbûn, encax di encama nîkaheke rast û durist, xera dibe. Rabûn û razana bê nîkah, zina ye. Zina jî karekî pir guneh û kirêt e û ji aliyê Xwedê ve teqez hatiye qedexekirin. Heta nêzîkbûna bi bal wê ve jî hatiye qedexekirin. Xwedê Teala wiha ferman dike:

"**Nêzîkî zinayê mebin. Lewra ew, karekî pir kirêt û rêyeke pir pîs e**."[461]

Bekarbûn herçiqas girîng be jî lê belê dibe ku perde/zara keçikantiyê, bi sedemên curbicur mîna bi qevzandinê, ketinê, xweavitina ji cihekî bilind û hwd. qetiyabe. Ji ber prensîba ku heta ya li dijî mirov neyê tesbîtkirin, mirov bê sûc tê hesabkirin, divê were ferzkirin ku perdeya keçikantiyê bi sedemeke wiha xera bûye û divê mijar di lehê keçikê de were nirxandina. Ne mêrê wê, ne dadgeh û ne jî tu kesekî din nikare bipirse, ka zara te bi çi sedemê xera bûye. Mafekî wiha ji tu kesî re nehatiye dayîn.

Pîreka ku bi şertê bekarbe -hinek ji mehrê jê re hatibe dayîn- piştre dema bi mêrê xwe re têkeve munasebeta cinsî, kifş bibe ku zara wê ne saxlem e, ji mehra wê tu tiştek nayê kêmkirin.[462]

Tesbîta bekarbûnê encax wiha tê kirin: Dema pîrek angaşt bike ku mêrê wê pê re ranezaye û da ku ji mêrê xwe biqete serî li dadgehê bide, dadger dê binêre; eger zilam di rewşeke ku bê dermankirin de be, ji bo dermankirinê dê salekê muhletê bidê û tembîha tedawîbûnê li zilam bike. Eger piştî salekê, pîrek dîsa angaşt bike ku hê jî mêrê wê pê re ranezaye û zilam jî vê angaştê înkar bike, dê bê nihêrtin; eger pîrek bekar be, kontrola bekarbûnê tê kirin. Ev kontrol jî li ser daxwaza pîrekê tê kirin, da ku biryara veqetandinê bê dayîn.[463]

391. Gelo mafê berdana pîreka şeva gerdekê kifş bibe ku ne bakir e, heye?

Pirs: Eger mêr, di dema zîfafê de ferq bike ku zara pîreka wî ne saxlem e yan jî qetiyaye, ma dikare daxwaza fesixkirina nîkahê bike yan na?

Bersiv: Naxêr, nikare daxwaz bike. Eger di pêşiya pîrekê (cihê şermegehê) de tiştekî ku bibe asteng ji bo têkiliyê; ji hestî, hebûna parçeyekî goşt an jî perdeya di

[461] Îsra, 17/32.
[462] Ömer Nasuhi Bilmen, **Hukukı İslamiyye ve Istılahat-ı Fıkhiyye Kâmusu**, Stenbol, 1985, II, 141.
[463] Nasuhi Bilmen, **Hukukı İslamiyye**, Stenbol 1985, II, 351.

navbera pêş û paş de ku qetandî be, ev, ji bo pîrekê dibin qusûr. Di halê ku mêr ji ber van tiştan serî li dadgehê bide, di encama tevgera dadgehê li gorî usûleke aşkere, dibe ku biryara fesixbûna nîkahê bê dayîn. Tunebûna zara pîrekê, ne ji van qusûran e. Bi sedema xerabûna zara pîrekê, mirov nikare daxwaza fesxa nîkahê bike.

392. Eger pîrek ne bakîr be, ma mêr nikare sebebê wê bipirse?

Pirs: We di fetwayeke ku di malpera xwe de wiha nivîsandiye: Bekarbûn herçiqas girîng be jî lê belê dibe ku zara keçikantiyê bi sedemên curbicur mîna bi qevzandinê, ketinê, xweavitina ji cihekî bilind û hwd. qetiyabe. Ji ber prensîba ku heta ya li dijî mirov neyê tesbîtkirin, mirov bê sûc tê hesabkirin, divê were ferzkirin ku zara keçikantiyê bi sedemeke wiha xerabûye û nirxandina mijarê divê di lehê keçikê de were kirin. Ne mêrê wê, ne dadgeh ne jî tu kesekî din nikare bipirse, ka zara te bi çi sedemê xera bûye. Mafekî wiha ji tu kesî re nehatiye dayîn. Di paragrafê de hevoka dawî, "Mafekî wiha ji tu kesî re nehatiye dayîn" bi serê min neket. Gelo di vir de tu pirsgirêk tune ye? Zilam, tiştekî wiha çawa nikare ji pîreka xwe bipirse? Eger mêr jî nepirse dê kî bipirse?

Bersiv: Bersiva ku me daye, eger hûn careke din bi hizir bixwînin, hûn ê bibînin ku tê de tu pirsgirêk tune ye. Mîna ku di wir de jî hatiye ravekirin, zara keçikantiyê dibe ku bi sedemên curbicur mîna bi qevzandinê, ketinê, xweavitina ji cihekî bilind û hwd. qetiyabe û haya keçikê jê tune be! Ji tiştê ku haya keçikê jê tune ye mirov wê bide pirsyarkirin, tê wateya ku mirov ew li felaketê qelibandiye. Ev, dişibe tesbîta sûcê zinayê. Heta ku çar zilam bi çavên serê xwe kirina zinayê nebînin, biryara zinakirinê di derheqê pîrekê de nayê dayîn. Ango dema zilamek an du zilam an jî sê zilam bibêjin ku pîrekekê zina kiriye, ev angaşta wan nayê qebûlkirin. Heta zilamê pîrekê jî dema nikaribe çar şahidan bîne, cezayê zinayê li pîrekê nayê tetbîqkirin. Ev hemî, ji ber cihê pîrekan ê di civakê de ji aliyê Xwedê ve mîna mertal û starekê ne ku ji wan re hatine danîn.

Di derbarê vê mijarê de di pirtûkên fiqhê de ev hukmê han heye:

"Pîreka ku bi şertê bekarbe –bi hinek ji mehrê pê re nîkah hatibe kirin- piştre dema bi mêrê xwe re têkeve munasebeta cinsî, kifş bibe ku ne ezeb e, divê hemû mehra ku li hev kirine bide. Lewra bekarbûn, dibe ku bi sedemên curbicur mîna bi ketinê, qevzandinê xera bûbe. Biryara ku pîrek di rewşeke baş de ye, tê dayîn." [464]

393. Ma mêr û jin dikarin bi navê hev bangî hev bikin?

Pirs: Gelo heram e ku pîrek bi navê mêrê xwe, pê re biaxive?

Bersiv: Tu hukmekî ku mêr û jinê ji xeberdana wan a bi navê hev, qedexe bike tune ye. Rewşên wiha -ên ku di derbarê wan de tu qedexebûn tune ye-, mubah e. Ango di kirina wê de ne guneh ne jî xêr heye.

Ev rewşeke bi mijara urf û adetê ve têkildar e. Ya herî munasib, di civak/kom/herêm/welatê ku bangkirina mêr bi navê wî tê şermezarkirin, mirov li gorî wan tev bigere; li cihên ku nayê şermezarkirin jî dîsa li gorî wê derê, tev bigere.

394. Ji aliyê dînî ve mafê mêr heye ku doza zarokan li jina xwe bike?

Pirs: Ji aliyê dînî ve, mafê mêr heye ku ji pîreka xwe daxwaza zarokan bike yan na? Mesela du zarok hene, mêr doza yê sêyem dike. Di vê mijarê de di dînê me de tu ferman, tewsiye yan jî şîrove hene? Ango ma di zewacê de divê pir zarokên mirov hebin?

Bersiv: Zewac, da ku mirov bibe xwedî zarok, heye. Xwedê Teala wiha ferman dike:

"**Di şevên rojiyê de çûyîna (we ya) nivînên jinên we li we hatiye helalkirin. Ew ji bo we cil in, hûn jî ji bo wan cil in. Xwedê, bi we dizane ku hûn bi xwe re îxanetê dikin, vêca Xwedê, tobeya we qebûl kir û li kêmasiyên we bihurî. Niha,**

[464] Nasuhi Bilmen, **Hukukı İslamiyye,** Stenbol 1985, II, 141, benda 457an.

hûn dikarin biçin nivîna hevserên xwe û Xwedê ji bo we çi nivîsandibe, wî bixwazin…"[465]

Îfadeya "**Xweda ji bo we çi nivîsandibe, wî bixwazin**" ku di ayetê de derbas dibe, têkiliya bi jinan re bi mebesta çêbûna zarokan ve girêdide. Ji vê bonê ne ku mafê zilam ê xwestina zarokan heye, belbî ev ji bo wî peywirek e. Ji ber vê ye ku ji Pêxemberê me (s.a.w) wiha hatiye ragihandin:

Cabirê kurê 'Ebdullah (x.j.q) dibêje, Qasidê Xwedê (s.a.w) got:

"*Ey Cabir!* (فعليك بالكيس الكيس)*Tu li xwestina zarokan miqate be.*"[466]

Di hedîseke din a ku ji Me'qelê kurê Yesar (x.j.q) hatiye ragihandin, Pêxemberê me (s.a.w) wiha gotiye:

"*…Bi pîrekên ku pir ji mêrên xwe hez dikin û pir zarokan tînin re bizewicin. Lewra ez ê di roja qiyametê de li hember umetên din bi pirbûna we şanaz bim.*"[467]

"Pîrek ku pir zarokan bînin dinyayê, çawa ku dibe wesîle ji bo bextewariya malbatê herwiha ji aliyê madî ve jî wesîleya herî mezin e ji bo pêşveçûna civaka xwe. Di vê mijarê de hin ji zanyarên roja me, wiha dibêjin:

"Di dawiya jiyana xwe ya 75 salan de ez gihîştim felsefa pêşveçûnê: Pêşveçûn, mîna darekê ye. Dara pêşveçûnê kok/rehên wê, qurmên wê, şaxên wê, pelên wê û mêweyên wê hene. Reha dara pêşveçûnê; ziman, dîn û huner e. Qurmên wê; serjimar û piraniya nifûsê ye. Şaxên wê; çalakiyên aborî yên pêşveçûnê temam dikin. Welatê ku nifûsa wî ne pir be, qurmê dara pêşveçûnê, bi pêş nakeve. Ji bo pêşveçûnê beriya şaxan, divê reh û qurm bên bihêzkirin. Di demên xwe de nivîskarên mîna A. Smith,

[465] Beqere, 2/187.
[466] Buxarî, Nîkah, 122.
[467] Ebû Dawûd, Nîkah, 3; Nesaî, Nîkah,11.

Colin Clark, Frederik Listy Myrdal bi berfirehî, girîngiya rola nifûsê ji bo pêşveçûna aborî, rave kirine…"[468]

Di dinyayê de ji 36 dewletên ku hêza wan a pêşveçûnê ya herî bilind e 25ên wan ango ji sedî 70yê wan zêdebûna nifûsa wan navinc e: (di navbera % 1-2). Lê belê ji wan, çar dewlet ango ji sedî 11 ye zêdebûna serjimara wan giran e û ji % lî kêmtir e. Di vê rewşê de di navbera hêza dewletê ya pêşveçûnê û hêza wê ya zêdebûna serjimarê de rêkeftinek bi awayê erênî heye.[469]

395. Tekiliya pir zarokî û pêşveçûnê

Pirs: We di bersiveke xwe de îfade kiriye ku çêkirina zarokan aboriyê pêşve dibe, pêşveçûnê bihêz dike û civakê bextewar dike. Gelo ji ber vê ye ku milyar û nîv (1,5) misilman birçî û jar in? Dewletên misilman ên mîna Nîjer, Nîjerya, Somalî, Sûdan, Pakîstan û Afxanîstanê hene. Gelo ji ber ku van dewletan pir zarok çêkirine ketine vê rewşê? Ji ber vê ye ku milyar û nîv misilman di bin desthilatdariya rojava de zilm û zordestiyê dibînin? Misilman di rewşeke ku ji teknîk û zanistiyê bêpar jiyana xwe didomînin û Îsraîl a ku 8 milyon e li dinyayê desthilatdariyê dike.

Bersiv: Em ê hewl bidin, da ku pirsa we bi çend xalan bibersivînin:

Di bersiva me ji we re şand de me hewl da, ku em bi ayet û hedîsan rave bikin ku zewac bi mebesta zarokçêkirinê ye.

Di bersivê de jêgira "bandorên erênî yên serjimarê li ser aboriyê", ne bersiva "çima divê zarok bên çêkirin!"e. Belbî sirf bi çavê yekî aborzan şîroveya babeta ku di ayet û hedîsan de derbas dibe ye.

Çawa ku pêşveçûna rojavayiyan ne bi sedem zarokên kêm e, herwiha misilman jî ne bi sedem çêkirina zarokên pir li paş mane! Misilman bi sedema ku wan bi gişt dev ji Qur'ana ku Xwedê Teala ew hinartiye berdane û herwiha dev ji

[468] Sabahaddin Zaim, **Türkiye'de Nüfus Meselesi,** rp. 11.
[469] Bnh: **Sünen-i Ebu Davud Terceme ve Şerhi**, VIII, 70-71.

kitêba/gerdûna ku Xwedê ew afirandiye berdane li paş mane. Qanûna Xwedê ev e, kî li gorî esas û qaydeyan bixebite, Ew ê bide wî. Misilmanên ku armanca wan hem dinya hem jî axret e, çawa zanistiya ku dê dinyaya wan xelas bike, bi dest nexistine, Qur'ana ku hem dinya hem jî axreta wan xelas dike, ji jiyana xwe dûr xistine. Lê belê rojavayiyên ku tu armanc û hedefa wan a xelaskirina axretê tune ye, kitêba Xwedê ya ku afirandiye –kaînat- xwendin, bi zanistiyê girtin û di her warî de ketin pêşiya misilmanan. Qasidê Xwedê (s.a.w), hevalên wî û bapîrên me, gelo bi sedema ku du zarok çêdikirin bûn hakimê hemû dinyayê? Wan, riayeta qayde û rêbazên ku Xwedê danîne kirin û di heman demê guh dan tewsiyeyê Wî û pir zarok çêkirin! mirov xusûsiyetên wiha girîng, di ser guhê xwe re biavêje, serkeftin û têkçûnê bi mijara zarokên pir an jî hindik girê bide, gelo çiqas rast e hûn lê bifikirin!? Ji vê bonê îro em misilman, dema em bi herdu destan bi kitêba ku Xwedê hinartiye û hem jî bi kaînatê -kitêba ku Xwedê ew afirandiye- bigirin, em ê di cîhanê de bibin mînak.

Kurtebêja gotinê, ji dêvla ku mirov çavnêriya halê cîhana Îslamê ya perîşan bike û rewşa wan binirxîne, divê em bidin pey tiştekî wisa ku em rave û nirxandinên xwe li gorî kitêba Xwedê bikin.

396. Meriv serî li "tüp bebekê" bide baş e yan bi qedera xwe qayîl bibe?

Pirs: Min nivîsa we ya di derbarê "tüp bebek"ê de xwend, lê belê min bersiva pirsa xwe tam jê negirt. Da ku em bibin xwedî zarok, ji aliyê tibbî ve tu pirsgirêka min û hevsera min tune ye. Di vê rewşê de caiz e ku em bi rêya "tüp bebek"ê bibin xwedî zarok? An jî divê em bi qedera xwe razî bibin?

Bersiv: "Tüp bebek" rêgezek e, ji bo tedawîbûnê. Ên ku nikarin bi rêyên xwezayî bibin xwedî zarok, bi şertê ku qaydeyên wê yên diyarkirî bi cih bînin, dikarin bi rêya "tüp bebek"ê bibin xwedî zarok. Di vê meseleyê de mirov tedawî nebe û bi qedera xwe razî bibe, ne mewzûbehs e. Lewra tedawîbûn jî ji pêdiviya qederê ye.

Her nexweşiya ku Xwedê Teala daye, teqez çareserî jî ji bo wê daye.

Li gorî riwayeta Usameyê kurê Şerîk, Pêxember (s.a.w) wiha gotiye: Bedewiyan gotin: Ey Qasidê Xwedê! Dema em nexweş dikevin, em serî li rêya tedawiyê bidin? Qasidê Xwedê (s.a.w) got: "*Belê, tedawî bibin. Gelî bendeyên Xwedê! Tedawî bibin. Lewra ji bo her nexweşiya ku Xwedê ew afirandiye, -ji yekê pê ve- teqez şifaya wê (rêya tedawikirina wê) jî afirandiye*." Li ser vê, dema pirsîn "Ey Qasidê Xwedê! Ew nexweşî kîjan e?" Got**:** "*Kalîtî ye*."[470]

397. Di heman demê de nîkah bi du kesan re were birîn?

Pirs: Ez ê di nêz de bizewicim, lê belê ez ji yekî din hez dikim. Eger ez bi yê ku ez jê hez dikim re nîkaha dînî bibirim û pê re xeber bidim, ez bi mêrê xwe re jî dibim nîkahkirî? Li aliyê din, ma ev dibe îxanet û pir gunehî? Lê tiştekî ku ez bikim jî tune ye. Hûn dikarin alîkariya min bikin? Ez dizanim ku ez di rêyeke şaş de me. Ez ê bizewicim, encax ez ji yê din jî pir hez dikim û ez ê bi mêrê xwe re îxanetê bikim. Rica dikim, rêyeke xelasiyê bi ber min bixin.

Bersiv: Nîkah, zewac e. Ne tiştekî şeklî ye ku -xwedênegiravî- mirov pê bi hêsanî ji xwe re bigere, bipeyive, bi destê hev bigire û bi hev re bijî. Nîkah saziyeke dînî ye û nayê îstîsmarkirin.

Pîrekek di heman demê de nikare bi du kesan re bizewice. Ma hûn nîkahê, tiştekî ji xeyrî zewacê qebûl dikin? Heta ku hûn bi mêrê xwe re nîkahkirî bin, hûn nikarin bi yekî din re bizewicin.

Hûn destûra zinakirinê ji me dixwazin. Wê gavê, bi yê ku hûn naxwazin re çima hûn dizewicin? Herin bi yê ku hûn jê hez dikin re bizewicin. Zewaca bi darê zorê nabe. Piştre, ê ku hûn ê pê re bizewicin, çi sûcê wî heye? Ew ê bi we û duristiya we bawer be û bibêje ku helaliya min e. Lê belê hûn ê bi yekî din re xweş bêş bibin.

[470] Tirmizî, Tib, 2; Ebû Dawûd, Tib, 1; Îbn Mace, Tib, 1.

Tiştê wisa çênabe. Wê gavê divê hûn bi wî zilamî re nezewicin. Eger hûn bizewicin jî divê hûn, ê din ji bîr bikin. Biryara yekî ji herduyan bidin.

Ha ev jî heye, malbata we zorê dide, da ku hûn bi yekî bê dilê xwe re bizewicin? Ji vê re bersiveke ku dînê me bide heye:

Keçeke ezeb hat cem Hezretî 'Aişeyê. Got: "Bavê min da ku cihê/meqamê xwe pê bilind bike ez bi kurê birayê xwe re zewicandim. Lê belê ev, ne bi dilê min e." Hezretî 'Aişeyê got: "Heta Qasidê Xwedê were, tu rûnê" Qasidê Xwedê hat. Keçikê rewşa xwe jê re got. Wî, di gavê de yek şand pey bavê wê ku were. Di wê mijarê de desthilatî, da keçikê. Keçikê got ku: "Ey Qasidê Xwedê! Birastî, min destûr dabû ya ku bavê min kiribû, lê belê min xwest ku ez hîn bibim; ka di vê mijarê de tu mafekî pîrekan heye yan na."[471]

398. Ma bûk mecbûr in ku xizmeta xwesû û xezûrê xwe bikin?

Pirs: Ma bûk mecbûr e ku xizmeta xwesû û xezûrê xwe bike?

Bersiv: Zarok, mecbûr e ku ziyareta dê û bavê xwe bike, hewcedariyên wan bi cih bîne û dilê wan xweş bike. Ev, peywira zarokan e. Xwedê Teala wiha ferman dike:

"Perwerdegarê te ferman kiriye ku hûn, bi tenê ji Wî re 'îbadetê bikin û bi dê û bavê xwe qenciyê bikin. Vêca eger yek ji wan an jî herdu li cem te kal bibin; ji wan re nebêje "Of" û guhnedêriya wan neke û ji bo wan gotineke xweş û germ bibêje.

Wan bixe bin perê dilovaniya xwe û bibêje: Xwedayê min! Çawa ku wan di zarokatiya min de bi dilovanî ez xwedî kirim, Tu jî li wan dilovaniya xwe bike!"[472]

---

[471] Nesaî, Nîkah, 36; Îbn Mace, Nîkah, 12; Ebû Dawûd, Nîkah, 26; Ehmedê kurê Henbel, **Musned**, VI, 136. (Metnê hedîsê ji Sunena Nesaî, hatiye giritin).
[472] Îsra, 17/23-24.

Lê belê, bûk ne mecbûr e ku li xwesû û xwezûrê xwe binihêre. Di tu ayet û hedîsan de tiştekî ku vê ferman bike, tune ye. Encax yek ji peywirên pîrekê yên li hember mêrê wê, ku ji mêrê xwe re qenc be. Pîreka ku ji dê-bav û eqrebayên mêrê xwe re nebaş be û bi wan re xweş derbas meke, tê wateya ku ji mêrê xwe jî re ne qenc e.

Wekî din jî yek ji helwestên qencî ku di dînê me de hatine tewsiyekirin, ku mirov bi yên ji xwe mezintir re xweş tevbigere. Di hedîsekê de Pêxemberê me (s.a.w) wiha gotiye:

"**Ê ku li biçûkên me rehmê neke û ji mezinên me re rêz û hurmetê nîşan nede, ne ji me ye.**"[473]

Li gorî ku ji 'Ebdullahê kurê 'Emr (x.j.q) hatiye ragihandin; Pêxember (s.a.w) wiha gotiye:

"*Ên ku rehmê dikin, Rehman jî li wan rehmê dike. (Madem wisa ye) hûn li yên erdê rehmê bikin, da ku yê li asîman e jî li we rehmê bike*."[474]

Tiştekî din jî heye, divê bûk li xwe û dayikên xwe jî bifikirin. Eger ew, di heman rewşê de bin, ka dixwestin çawa bi wan re bihata tevgerîn, divê ew jî bi xwesûyên xwe re wiha tev bigerin.

Ji vî alîyî ve, pîrekên misilman ên ku xwezûr û xwesûyên wan hewcedariya wan bi xizmetê heye, ku bi hewcedariyên wan mijûl bibin û îhtimamê nîşanî wan bidin ji aliyê dînî ve, karekî hêja kirine û xêra wan jî dê pir mezin be. Lê belê, mîna ku me di serî de jî got, di vê mijarê de tu fermaneke ku pêwîst bidêre, tune ye. Ên ku divê li dê û bavê xwe binihêrin, zarokên wan in. Di vê mijarê de zilam, divê li pîrekên xwe zorê mekin û hewcedariyên dê û bavê xwe, ji dêvla jinên xwe, ew bi

[473] Tirmizî, Bir, 15; Ebû Dawûd, Edeb, 58; Ehmedê kurê Henbel, **Musned**, 1/257.
[474] Ebû Dawûd, Edeb, 58.

xwe pêk bînin. Û pîrekên di vî warî de fedakar in, divê mêrê wan her gav wan teqdîr bikin û qîmeta wan bizanibin.

399. Ma ez mecbûr im ku li xwesûya xwe binihêrim?

Pirs: Hin pirsgirêkên min bi xwesûya min re hene. Em bi hev re derbas nakin. Ji vê bonê navbera min û mêrê min jî xera dibe. Bi tiyê xwe re ez pênc salan li cem xwesûya xwe mam. Salê çar mehan li ba min diman. Tiyê min zewicî, naxwaze dê û bavê wî li cem bin û dibêje hûn li wan binihêrin. Bê riza min, mêrê min dikare li nihêrtina wan, min mecbûr bike? Ma ez mecbûr im ku xizmeta wan bikim? Tiyê min, digel ku dê û bavê wî ne jî, wan naxwaze? Çima ez ê xizmeta wan bikim?

Bersiv: Mêrê we, ne mecbûr e ku bi diya xwe re di heman malê de be. Lê belê mecbûr e ku lê binihêre û hewcedaryên wê temîn bike. Pêkanîna hemû hewcedariyên dê û bav di stûyê zarokan de ye. Di Qur'anê de piştî baweriya bi Xwedê, beriya her tiştî qenciya bi dê û bav hatiye fermankirin. Di vê mijarê de Xwedê Teala wiha ferman dike:

"**Perwerdegarê te ferman kiriye ku hûn, bi tenê ji Wî re 'îbadetê bikin û bi dê û bavê xwe qenciyê bikin. Vêca eger yek ji wan an jî herdu li cem te kal bibin; ji wan re nebêje "Of" û guhnedêriya wan neke û ji bo wan gotineke xweş û germ bibêje.**

Wan bixe bin perê dilovaniya xwe û bibêje: Xwedayê min! Çawa ku wan di zarokatiya min de bi dilovanî ez xwedî kirim, Tu jî li wan dilovaniya xwe bike!

Perwerdegarê we, bi ya ku di dilên we de ye, baş dizane. Eger hûn qenc bin, bizanin ku Xwedê, ji bo yên ku rûyê xwe ji xerabiyan vedigerînin û berê xwe didin tobê, pir bexşîner e."[475]

[475] Îsra, 17/23-25.

"**Me li însan ferman kir ku ji dê û bavê xwe re baş bin. Lewra dayika wî, bi çi zor û zehmetiyan ew di zikê xwe de hilgirtiye. Bişîrvekirina wî jî du salan dewam dike. Me li însan ferman kir ku: Hem şêkiriya Min, hem jî şêkiriya dê û bavên xwe bikin. Veger, tenê bi bal Min ve ye.**

Eger ew zorê bidin te, da ku di derheqê ya zanîna te pê tune ye, tu ji Min re bikî hevpişk, bi gotina wan meke! Li dinyayê bi wan re xweş derbas bike. Bide rêya kesê ku berê xwe daye Min. Paşê vegera we bes bi bal Min ve ye. Wê demê ya ku we dikir, Ez ê we pê agahdar bikim."[476]

Divê hûn jî rewşa mêrê xwe fêhm bikin. Di encamê de ji hevseran yek, dema ne dilşad û bextewar be, ew mal nameşe. Divê hûn vê yekê bizanibin. Li diya xwe û xwe bifikirin, eger hûn têkevin heman rewşê, ma hûn ê diya xwe biavêjin kuçeyê? Ma hûn ê bixwazin çawa bi we re were tevgerkirin?

Hûn herdu, destên alîkariyê bidin hev. Hesab û plana ka hûn ê çawa ji hev re bibin alîkar bikin; mêrê we, li dê û bavê xwe û hûn jî li xwesûya xwe. Hûn ne mecbûr in ku di heman malê de bijîn. Eger hûn ji bo riza Xwedê Teala, pê re xweş derbas bikin û jê re bibin alîkar, li hember wî karê we, Xwedê jî dê li dinyayê maleke dilşad, jiyaneke bextewar û li axretê jî -Xwedê hez bike- dê bihuştê bike para we.

400. Xwesûya min nimêj nake, ma divê ez çawa pê re tev bigerim?

Pirs: Xwesûya min li ba min dimîne û nimêj nake. Min çend caran bi zarekî xweş jê re got, lê belê hêj jî nimêj nake. Sedemê nekirina nimêjê jî dibêje ku mîz di min nasekine. Min jî got: "Tu nimêj bike, ez ê bişom." Lê dîsa jî nebû. Ji vê yekê qet ji dilê min nayê ku ez xizmeta wê bikim û li rûyê wê bikenim. Gelo ev tiştê han ji bo min guneh e? Di vê meseleyê de divê ez çi bikim? Lava dikim, bi min re bibin alîkar?

Bersiv: Eger yekî misilman 'îbadeta xwe neyine cih, dê hesabê wê bide Xwedê. Ya li ser me jî ev e ku em ayetên têkildar jê re bixwînin.

[476] Loqman, 31/14-15.

Şîreta me li we ku hûn vê rewşa wê li xwe qebûl bikin û bi dostanî pê re tev bigerin. Rahêjin wergera Qur'anê û her roj wateya çend ayetan jê re bixwînin. Ayetên bi bawerî û 'îbadetan bi taybetî jî yên ku bi nimêjê re têkildar in, jê re bixwînin. Hêvî heye ku ew ayet lê bandor bikin û dest bi nimêjê bike. Eger dîsa jî nimêj meke, rêz û hurmeta xwe ya li hember wê biparêzin. Pêxemberê me (s.a.w) wiha gotiye:

"*Ê ku li biçûkên me rehmê neke û ji mezinên me re rêz û hurmetê nîşan nede, ne ji me ye.*"[477]

401. Ma mafê mêr heye ku li jina xwe ferman bike?

Pirs: Li gorî dînê me, mêr dikare li jina xwe emir bike? Mesela di mijara 'îbadetan de yan jî di mijarên din de dikare lê ferman bike?

Bersiv: Ji ber ku di 'îbadetan de niyet esas e, 'îbadet bi tu kesî bi zorê nayê kirin. Da ku pîrek di 'îbadetên xwe de teqsîratiyê neke divê mêr li jina xwe şîretan bike. Ev helwesteke ku xêra wê pir e.

Ji bilî mijara 'îbadetan, bi sedema ku mêr mezinê malê ye, mafê wî yê ku hin qaydeyan diyar bike, heye. Mesela kesên ku naxwaze werin mala wî, dikare ji jina xwe bibêje ku bila neyên mala min an jî li jina xwe ferman bike ku neçe filan derê.

402. Da ku ez diya xwe razî bikim, ma divê ez bi yekî bê dilê xwe re bizewicim?

Pirs: Ez mijara di Îslamê de mafê dayikê baş dizanim. Herçiqas dayik zilmê bike jî divê mirov pê re bi başî tevbigere. Ez ji diya xwe pir hez dikim û dixwazim di her tiştî de wê razî bikim. Lê belê diya min dixwaze ez bi yekî ku ez jê hez nakim re bizewicim. Dibêje ku tu pê re nezewicî, ez ji te razî nabim. Divê ez çi bikim, digel ku ez jê hez nakim jî da ku ez diya xwe razî bikim, ma divê ez pê re bizewicim? Gelo mafekî diya min ê wiha heye?

[477] Tirmizî, Bir, 15; Ebû Dawûd, Edeb, 58; Ehmedê kurê Henbel, **Musned**, I/257.

Bersiv: Dînê me, îhtimam daye mafê dê û bav û girîngiyeke mezin daye mijara nihêrtin û parastina wan. Di gelek ayetan de fermana îhsana bi dê û bav hatiye kirin. Îhsan jî bi wateya "tevgera baş û xweş e". Xwedê Teala wiha ferman dike:

"**Perwerdegarê te ferman kiriye ku hûn, bi tenê ji Wî re 'îbadetê bikin û bi dê û bavê xwe qenciyê bikin. Vêca eger yek ji wan an jî herdu li cem te kal bibin; ji wan re nebêje "Of" û guhnedêriya wan neke û ji bo wan gotineke xweş û germ bibêje.**

Wan bixe bin perê dilovaniya xwe û bibêje: Xwedayê min! Çawa ku wan di zarokatiya min de bi dilovanî ez xwedî kirim, Tu jî li wan dilovaniya xwe bike!

Perwerdegarê we, bi ya ku di dilên we de ye, baş dizane. Eger hûn qenc bin, bizanin ku Xwedê, ji bo yên ku rûyê xwe ji xerabiyan vedigerînin û berê xwe didin tobê, pir bexşîner e."[478]

"**Me li însan ferman kir ku ji dê û bavê xwe re baş bin. Lewra dayika wî, bi çi zor û zehmetiyan ew di zikê xwe de hilgirtiye. Bişîrvekirina wî jî du salan dewam dike. Me li însan ferman kir ku: Hem şêkiriya Min, hem jî şêkiriya dê û bavên xwe bikin. Veger, tenê bi bal Min ve ye.**

Eger ew zorê bidin te, da ku di derheqê ya zanîna te pê tune ye, tu ji Min re bikî hevpişk, bi gotina wan meke! Li dinyayê bi wan re xweş derbas bike. Bide rêya kesê ku berê xwe daye Min. Paşê vegera we bes bi bal Min ve ye. Wê demê ya ku we dikir, Ez ê we pê agahdar bikim."[479]

Divê mirov îhsanê ango tevgera bi qenciyê ya ku di van ayetan de derbas dibe, bi îtaeta çavgirtî tevlihev meke. Mafê diya we tune ye ku hûn bi yekî hûn jê hez nakin re bizewicin. Di vê mijarê de herî zêde, dikare li we şîret bike. Ji ber a ku dê

[478] Îsra, 17/23-25.
[479] Loqman, 31/14-15.

jiyanekê bi yê dizewice re derbas bike hûn in, di vê meseleyê de biryardayîn jî ya we ye. Divê hûn bêyî ku dilê diya xwe bişikînin bi awayekî zelal jê re rave bikin û bi şeklê ku hûn dilê wê jî xweş bikin meseleyê çareser bikin.

403. Kesê zewicandî dema pirsgirêkên wî yên cinsî hebin, gelo dikare bi yeke din re rabe û rûnê?

Pirs: Ev şeş sal e ku ez zewicandî me û zarokekî me heye. Bi jina xwe re di salên dawî di jiyana cinsî de hin pirsgirêkên me derketin holê. Jina min dibêje ku "eger tu bixwazî, tu dikarî bi pîrekên biyanî re rakevî". Jina min destûrê dide, lê belê ez dizanim ku zina heram e. Divê ez çi bikim?

Bersiv: Di vê mijarê de ne bi destûra jina we; belbî pêdivî bi izn û destûra Xwedê heye. Li gorî ku Xwedê Teala, zina bi awayekî teqez qedexe kiriye, divê ku hûn xwe jê dûr bigirin.

Eger pirsgirêkên jina we hebin, beriya her tiştî divê hûn wê tedawî bikin. Ev, pêkan e. Eger rewşa wê pak û durist nebe, di vî halî de bi rêya nîkaha bi yeke din re hûn dikarin bizewicin. Ji bo vê jî destûra weliyê wê (jina duyem) pêwîst e. Da ku zilam û pîrekek bi awayekî rewa û meşrû, bikaribin bi hev re xweş bibin (razên) şertekî wê bi tenê heye. Ew jî nîkah e. Dema li gorî qayde û rêbazên munasib be, mirov dikare bi pîrekeke din re bizewice. Ji aliyê dînî ve destûr ji we re hatiye dayîn û mafê we ji bo vê heye.

404. Jina ku peywirên xwe yên jinantiyê nayîne cih, ma mêrê wê dikare pê re îxanetê bike?

Pirs: Ev nêzî deh sala ye ku ez bi mêr im. Ez ji mêrê xwe hez dikim û zarokekî me jî heye. Mêrê min bi pîrekeke din re radibe û rûdinê. Sedemê vî tiştî jî ku ez nikarim bi mêrê xwe re rakevim. Ez li hember vî tiştî sar im, mêrê min daxwaz dike, lê belê ez naxwazim. Ji ber ku ez berpirsyariya xwe ya jinantiyê nayînim cih, mêrê

min bi min re îxanetê dike û bi hin pirekên din re radibe û rûdinê. Ev tiştê hanê rast e?

Bersiv: Çi dibe bila bibe –bi tu hincetan-, zina nayê kirin. Di jiyana mêrîtî û jinantiyê de têkiliya cinsî cihekî pir girîng digire. Kesên ku pirsgirêkên wan ên cinsî hebin, divê teqez çareser bikin. Madem hûn ji mêrê xwe hez dikin, da ku hûn pirsgirêka xwe çareser bikin divê hûn serî li bijîşkekî pispor bidin û çi ji destê we bê hûn bikin. Lewra tedawîkirina manendê van nexweşiyan ne pir zehmet e. Her nexweşiya ku Xwedê Teala daye, teqez çareserî jî ji bo wê daye.

Qasidê Xwedê Teala wiha ferman dike: Ji Usameyê kurê Şerîk (x.j.q) wiha hatiye ragihandin bedewiyan gotin: "Ey qasidê Xwedê! Dema ku em nexweş bikevin em serî li tedawîyê bidin?" Qasidê Xwedê (s.a.w) got: "*Belê, tedawî bibin. Gelî bendeyên Xwedê! Tedawî bibin. Lewra ji bo her nexweşiya ku Xwedê ew afirandiye, -ji yekê pê ve- teqez şifaya wê (rêya tedawikirina wê) jî afirandiye*." Li ser vê, dema pirsîn "Ey Qasidê Xwedê! Ew nexweşî kîjan e?" Got**:** "*Kalîtî ye*."[480]

405. Jina min bi pey yekî ket, ma ez dikarim wê vegerînim?

Pirs: Jina min çar zarokê wê hene û bi pey yekî ket. Niha jî lava dike û dibêje "were min xelas bike". Ji aliyê dînî ve divê ez çi bikim? Eger ez wê xelas bikim, gelo ez dikevim guneh? Lewra bi yekî din re nîkaha xwe ya dînî biriye. Di vê rewşê de ka ez çi bikim?

Bersiv: Heta ku hûn jina xwe bernedin, nîkaha wê ya bi yekî din re nayê qebûlkirin; ew zinayê dikin. Eger hûn bixwazin, hûn dikarin wê qebûl bikin. Hûn ê, jê daxwaza ku xwe ji tiştên wiha bi giştî dûr bigire, poşman bibe û tobe bike, bikin. Eger hûn wê qebûl bikin, -heta ku bi awayekî tam û aşkere xuya bibe ku ew ne bi hemle ye-, divê hûn pê re nekevin têkiliya cinsî.

[480] Tirmizî, Tib, 2; Ebû Dawûd, Tib, 1; Îbn Mace, Tib, 1.

406. Ji tirsa zor û zehmetiyên madî malbata min naxwaze min bizewicîne. Divê ez çi bikim?

Pirs: Seyda, ez xortekî 20 salî me. Ez û keça xizmekî min, em ji hev hez dikin, lê belê malbata min wê naxwaze. Her gav hin hincetan dikin asteng. Hinekî jî ji ber tirsa wan a madî; "em nikarin te bizewicînin". Divê ez çi bikim?

Bersiv: Xwedê Teala di Qur'ana Pîroz de wiha ferman dike:

"**Ji nîşanên hebûna Wî ye ku ji we re ji nefsa we hevjîn afirandine da ku hûn pê sebir û hedanê bibînin û di navbera we de evîn û merhemet peyda kiriye. Bi rastî di vê de ji bo civakeke ku bifikire 'îbret hene**."[481]

"**Ezebên xwe, kole û qerwaşên xwe yên munasib jî bizewicînin. Eger ew xizan bin, Xwedê ji kerema xwe dê wan dewlemend bike. Xwedê xwedanê keremeke berfireh e û zana ye**."[482]

Mîna ku di ayetê de derbas dibe, fermana zewicandina xortan, li weliyê wan hatiye kirin. Ê ku dê we bizewicîne jî malbata we ye. Ji ber vê yekê divê hûn li rewşa wan jî binihêrin. Bi malbata xwe re rûnên, hûr û kûrê rewşa xwe ji hev re zelal bikin. Ji wan re bibêje ku feqîrî nabe asteng ji bo zewacê, heta divê nebe asteng jî û gotina Xwedê Teala "**Eger ew xizan bin, Xwedê ji kerema xwe dê wan dewlemend bike**" ya ku di ayeta jor de derbas bû ji wan bixwîne. Di demeke pir kin de keçikê ji malbata wê bixwazin û dest bi amadekariya dawetê bikin. Heta daweta xwe jî sebir bikin û nekevin tu gunehan.

Pêxemberê me (s.a.w) wiha gotiye:

"*Gelî xortan! Qaweta we kê ya zewacê hebe bila bizewice. Kesê ku hêz û derfeta wî ya madî tune be, bila rojiya (sunet/nafile) bigire. Lewra rojî şehwetê dişikîne*."[483]

---

[481] Rûm, 30/21.
[482] Nûr, 24/32.

Eger hûn fermanên Xwedê û Qasidê Wî bînin cih, Xwedê jî dê kar û barê we hêsan bike.

407. Gunehên ku me beriya zewacê kirine, ger em bi hev re bizewicin tên bexşandin?

Pirs: Digel ku min zanibû heram e jî min bi hevalekî xwe re hin tişt kirin. Em li zewacê difikirin. Di zewaca xwe de gelo em ê cezayê van tiştan bikişînin? Divê em çawa tobe bikin?

Bersiv: Di dînê me de zilam û pîreka ku dikarin bi hev re bizewicin, heta ku nîkaha wan nehatibe birîn, ji hev re biyanî tên qebûlkirin. Ji ber vê yekê dostikgirtin, hevaltî û hwd. ji hemû tiştên ku mirov nêzî zinayê dikin, hatine qedexekirin. Xwedê Teala wiha ferman dike:

"**Nêzîkî zinayê mebin. Lewra ew, karekî pir kirêt û rêyeke pir pîs e**."[484]

"**Ji zilamên bawermend re bibêje: bila çavên xwe (ji heramiyê) bigirin û cihên şermegeha xwe biparêzin**…"[485]

"**Ji jinên bawermend re bibêje: Bila çavên xwe (ji heramiyê) bigirin û cihên şermegeha xwe biparêzin**…"[486]

Eger hûn soz û peymaneke teqez bidin Xwedê, tobe bikin û heta zewaca xwe hûn ji hevdu dûr bisekinin, Xwedê jî dê we bibexşîne. Xwedê Teala wiha ferman dike:

"Lê belê ew ên ku piştî vê, tobe bikin û rewşa xwe rast û durist bikin, ew cuda ne. Vêca bi rastî Xwedê gunehjêbir e, dilovîn e."[487]

---

[483] Buxarî, Nîkah, 3; Muslim, Nîkah, 1.
[484] Îsra, 17/32.
[485] Nûr, 24/30.
[486] Nûr, 24/30.
[487] Nûr 24/5.

"… **lê belê yê ku tobe bike, bawerî bîne û karê qenc bike, ew cuda ye. Xwedê gunehên wan bi xêran diguherîne. Xwedê gunehjêbir e, dilovîn e.**

Kî ku tobe bike û kar û kiryarên qenc bike, bêguman ew ê bi tobeyeke meqbûl li Xwedê vegere."[488]

408. Rast e ku pîrek ne mecbûr in şîr bidin zarokên xwe?

Pirs: Tê gotin ku pîrek ji şîrdayîna zaroka xwe, paqijkirina mala xwe û ji çêkirina xwarinê ne berpirs e. Bi rastî jî tiştekî wiha heye?

Bersiv: Şîrdayîna zarokê, erka dê ye. Xwedê Teala wiha ferman dike:

"**Bila dayik heta du salên tekûz şîr bidin zarokên xwe. Ev, ji bo yên ku dixwazin dema şîrdayînê temam bikin. Xwarin û vexwarina wan li gorî me'rûfê, li ser bavê zarok e. Li gorî hêza xwe bi tenê mirov tê binbarkirin. Divê ne dê ne jî bav bi sedem zaroka xwe zirarê bibîne**…"[489]

Mîna ku di ayetê de derbas bû, dayika ku bixwaze zaroka xwe beriya du salan bişîr vebike, vê biryarê bi tena serê xwe nikare bide; eger bi mêrê xwe re li ser vê yekê li hev bikin, di demeke pêş de jî dikare zaroka xwe bişîr vebike.

Di zewacê de hin erkên mêr û jinê yên sincî hene. Bila neyê gumankirin ku ji bo pîrekê di malbatê de tu wezîfe nehatine dayîn. Pîrek, ji karên hundir, zilam jî ji karên derve berpirsyar hatiye girtin. Dema Pêxember (s.a.w) Hezretî 'Elî û Hezretî Fatîma dizewicîne, di navbera wan de parvekirineke bi vî awayî kiriye.

409. Tu ayeteke ku behsa bişîrvekirina zarokê bike heye?

Pirs: Keça min du salî ye û hîn jî şîrê diya xwe vedixwe. Tiştê ez dixwazim hîn bibim, heta çend salan mirov dikare zarokê şîr bide?

---

[488] Furqan, 25/70-71.
[489] Beqere, 2/233.

Bersiv: Di derbarê şîrdayînê de Xwedê Teala di Qur'ana Pîroz de wiha ferman dike:

"**Bila dayik heta du salên tekûz şîr bidin zarokên xwe. Ev, ji bo yên ku dixwazin dema şîrdayînê temam bikin. Xwarin û vexwarina wan li gorî me'rûfê, li ser bavê zarok e. Li gorî hêza xwe bi tenê mirov tê binbarkirin. Divê ne dê ne jî bav bi sedem zaroka xwe zirarê bibîne. Li ser mîratxwerê (bavê zarokî) jî heman tişt heye. Eger dê û bav, bi hev bişêwirin; li hev bikin û bixwazin zarok ji şîr vekin, vêca tu guneh li ser herduyan tune ye. Eger hûn bixwazin (bi yeke din) bidin mijandin piştî ku hûn heqê wê yê diyarkirî li gorî me'rûfê bidinê, li ser we tu guneh tune ye. Ji Xwedê bitirsin û bizanin ku bi rastî Xwedê bi her tiştê ku hûn dikin bîner e**."[490]

Daraza "**Bila dayik heta du salên tekûz şîr bidin zarokên xwe. Ev, ji bo yên ku dixwazin dema şîrdayînê temam bikin**" ya di ayetê de derbas dibe, çaxa şîrdayînê bi du salan dawî kiriye. Li gorî vê, bi şertê ku mêr û jin bi hev re biryarê bigirin, pêkan e ku beriya du salan jî zarokê bişîr vekin. Lê belê, tê fêhmê ku zarokê du salên xwe qedandibe, divê êdî were bişîrvekirin.

410. Ma mêr û jin dikarin li derve bi destê hev bigirin û bimeşin?

Pirs: Di Îslamê de gelo caiz e ku mêr û jin li derve bi destên hev bigirin û bigerin?

Bersiv: Di gera jin û mêr de li derve dest bi dest ji aliyê dînî ve tu mehzûreke wê tune ye. Lê belê, Îslama ku heta di 'îbadetan de jî rêya navîn ferman dike, çiqas mêr û jin bin jî dixwaze ku li derve li hal û hereketên xwe miqate bin. Li gorî vê, ku li derve bi destên hev bigirin, tu mehzûra wê tune ye. Encax ne caiz e ku di rewşeke ku bala însanan bikişînin ser xwe, bi hev re bimeşin.

[490] Beqere, 2/233.

411. Pîrek kengî dikare xebera hemlebûna xwe ji dost û hevalan re bibêje?

Pirs: Di Îslamê de pîrekeke ku ducanî be, da ku wê xeberê bi zilamên (eqreba) -ên ku li hev helal in- an jî bi însanên din re parve bike, divê çiqasî bisekine? Ango ji bo vê tu demeke diyarkirî heye yan na?

Bersiv: Ji bo diyarkirina hemlê tu demeke xuya, tune ye. Di mijarên wiha de ya herî munasib ku mirov li gorî urf û adetên xwe tev bigere.

Pîrekek, ji zilamên biyanî re yên ku eqrebayên wê ne bi hemilbûna xwe aşkere bike mîna bibêje "ez bi hemil im" herçiqas ne guneh be jî lê belê ev tê şermezarkirin. Lewra hemil piştî çend mehan, dê bigihîje asteke ku nayê veşartin.

TELAQ

412. Berdaneke rast û durist divê ku çawa be?

Pirs: Min pîreka xwe du caran berda. Di wan berdanan de pîreka min di dema paqijiyê de bû û ez pê re ranezabûm. Herdu berdan jî di demên ji hev cuda de pêk hatin. Piştî berdanê, ne min ew ji xanî derxist û ne jî ew derket. Piştî van herdu berdanan, ez li pîreka xwe (beriya ku 'iddeyê wê xelas bibe) vegeriyam (ric'et kir). We di malpera xwe de nivîsandiye ku ji bo berdanê du şahid lazim in. Lê belê min digot qey ev ji bo berdana sêyem lazim e. Ji vê bonê, di herdu berdanan de jî min ne di hizûra şahidan de pîreka xwe berda. Pirsa min ev e: Ev berdanên han sehîh in, an na? Dema ez cara sêyem jina xwe berdim dê çawa bibe? Ji ber ku şahid tune bûn, ma herdu berdanên serî nayên qebûlkirin û dê telaqê cara yekem bê qebûlkirin? An jî dê hemû bên qebûlkirin û piştî telaqê sêyem, bêyî ku em li benda 'iddeyê bisekinin divê ku em ji hev biqetin?

Bersiv: Ne hewce ye ku hûn pîreka xwe sê caran berdin. Eger hûn dixwazin pîreka xwe berdin, divê hûn riayeta hemû şertên berdanê bikin û di hizûra du şahidan wê berdin û di dawiya 'iddeyê de bi xweşikahî ji hev biqetin. Piştre eger hûn bixwazin li hev vegerin hûn dikarin vegerin. Bi meqseda ku hûn ê cara duyem jina xwe berdin, ne durist e ku hûn lê vegerin yani ric'et bikin. Eger hûn ê li jina xwe vegerin, divê bi mebesta ku hûn ê jiyana xwe ya malbatî berdewam bikin, vegerin.

413. Hukmê berdana formalîte çi ye?

Pirs: Li dewletên Ewrûpa pir kes hene ku ji bo ji alîkariya dewletê îstifade bikin, ji bilî nîkaha dînî bi rêya fermî hev berdidin. Misilmanên ku wiha dikin divê ku mirov çawa bersiva wan bide?

Bersiv: Ev helwest, heram e. Diravê ku bi vê rêyê bi dest dixin jî heram e.

Xwedê Teala wiha ferman dike:

"**Gelî bawermendan! Di navbera xwe de malên hev bi neheqî nexwin, lê belê ji bazirganiyeke ku we bi dilê xwe li hev kiribe hûn dikarin bixwin. Xwe nekujin; Bêguman Xwedê teqez ji bo we pir birehm e**."[491]

414. Ma berdana bi sê telaqan heye?

Pirs: Berdan çawa pêk tê û berdana bi sê telaqan çawa çêdibe?

Bersiv: Xwedê Teala di ayetên pêşîn ji sûreyê "Telaq" (yanî di sûreyê berdanê de) şert û mercên berdanê bi berfirehî bi me daye naskirin. Her berdana ku li gorî şert û mercên di wan ayetan de derbas dibe pêk bê, telaqek ango berdanek tê qebûlkirin. Lewra Xwedê Teala di sûreyê Beqere ayeta 229an de ferman dike ku: "**Telaq du car in.**" Lê belê di hundirê 'iddeyê de eger mêr poşman bibe dikare li jina xwe vegere, ango jina xwe li xwe vegerîne. Xwedê Teala wiha ferman dike:

"**Eger mêrên wan lihevhatinê bixwazin, ji wan re bêhtir heq heye ku wan li xwe vegerînin**."[492]

Eger mêr bi vî hawî jina xwe du caran berde, piştî berdana sêyem êdî şert û mercê vegerînê ne wekî berê hêsan in. Xwedê Teala di heman sûreyî de di ayeta 230an de wiha ferman dike:

"**Êdî eger mêr jina xwe berde, ev jin lê ne helal e heta ku ji bilî wî bi mêrekî din re nezewice. Eger wî ew berda, êdî tu guneh li ser herduyan tune ye ku dîsa li hev vegerin, eger bawerî anîbin ku dê tixûbên Xwedê bi cî bînin**."[493]

[491] Nîsa, 4/29.
[492] Beqere, 2/228.
[493] Beqere 2/230.

415. Berdana ku ne li gorî ayetên pêşî ji sûreyê Telaq be, gelo durist e yan na?

Pirs: Pîreka ku ji aliyê mêrê xwe ve bi sê telaqan û li dijî şertên berdanê yên di sûreyê Telaq de derbas dibin were berdan, piştî ku 'iddeyê wê biqede dikare bi zilamekî din re bizewice yan na?

Bersiv: Naxêr, çênabe. Lewra berdana ku ne li gorî fermanên sûreyê Telaq be, ne di cih de ye û nabe telaq.

416. Dema şahid tune bin, telaq pêk tê yan na?

Pirs: Di halê ku du şahid tune bin gelo berdan pêk tê yan jî ev telaq ne meqbûl e?

Bersiv: Di vir de hin îctihadên cuda dibe ku bên kirin. Lê belê di nêrîna me de di rewşeke wiha de telaq pêk nayê. Ayetên ku bi vê mijarê re têkildar in wiha ne:

"Dema ew hatin dawiya 'iddeyê xwe, vêca ya bi me'rûfê[494] li wan vegerin an jî bi me'rûfê ji wan cuda bibin (û wan berdin). Ji nav xwe du kesên dadperwer bikin şahid û bila ji bo Xwedê şahdeyiyê bidin.

Ha ev, ji bo wî kesê ku bi Xwedê û roja axretê bawerî tîne, şîret e. Kî biryar û hukmên Xwedê biparêze, Xwedê dê rêyekê jê re veke.

Bi awayekî ku hizir nedikir dê rizqê wî bidê. Kî xwe bispêre Xwedê vêca Ew besî wî ye. Bêguman Xweda fermana xwe bi cih tîne. Xwedê ji bo her tiştî endazek daniye."[495]

[494] Wateya me'rûfê; tiştê diyar û tê zanîn e. Ev zanebûn ya ji 'urf û adetan an jî ji Qur'an û Suneta Pêxember (s.a.v) tê bidestxistin. Eger ji 'urf û adetan hatibe bidestxistin divê ne li dijî Qur'an û Sunetê be. Zanebûneke wiha dîn û aqil, wê baş û rast didêrin.

[495] Telaq, 65/2-3.

Ji van ayetan tê dîtin ku di berdanê de divê du şahid amade bin û ev şertekî esasî ye ku bê wî telaq pêk nayê. Lewra di berdanê de divê were peyîtandin ku pîreka hatiye berdan, ne di heyza de be, -ku ne di heyza de be jî- bi rêya îtirafkirinê yan jî bi rêyeke din bê tesbîtkirin bê ka mêrê wê pê re razaye yan na û tiştekî din jî lazim e tesbîta derbasbûn/qedandina dema 'iddeyê were kirin. Ev tesbîtên han encax şahid dikarin pêk bînin. Ji vê bonê qinyata me; eger di dema berdanê de şahid tune bin, telaq pêk nayê.

417. Ma di berdanê de şahid, di dema telaq yan dema tefrîqê de tên girtin?

Pirs: Di mijara berdanê de di derbarê hazirbûna şahidan şîroveyeke wiha tê kirin: "Mirov bêjeya "أَشْهِدُوا eşhîdû" (şahidan bigirin) ya di ayeta duyem ji sûreyê Telaq, li ser fermana telaqê ya ku di serê ayeta yekem de derbas dibe heml bike, ne guncaw e. Ji dêvla vê, ku mirov pêwîstiya hazirbûna şahidan di dema firqetê ya ku pêvajoya telaqê bi dawî dike qebûl bike, bêhtir hev digire." Nêrîna we ya di derheqê vê mijarê de çi ye?

Bersiv: Ne tiştekî rast e ku mirov ayetên bi hev re têkildar in digel hev nenirxîne, pêwendî û munasebeta di navbera wan de bi saxlemî saz neke û hewl bide ku hikum bide. Xwedê Teala desthilatdarî û otorîteyeke wiha nedaye tu kesî. Du ayetên têkildar wiha ne:

"**Elîf, Lam, Ra. Ev kitêbeke wisa ye ku ayetên wê ji aliyê Xwedayê Hekîm ê Xebîr ve muhkem hatiye dêrandin û piştre hatiye tefsîlkirin.**

Da ku hûn ji bilî Xwedê 'îbadetê ji tiştekî din re nekin. (Bibêje:) Bêguman ez ji aliyê Xwedê ve ji bo we mizgînber û hişyarker im."[496]

[496] Hûd, 11/1-2.

Dema mirov ayetên bi mijarê re têkildar in bi hev re dinirxîne, tê dîtin ku di derbarê berdanê de hin şert û peywir hene û bê hazirbûna şahidan, ew nayên cih. Li gorî vê;

Divê were peyîtandin ku jin di dema berdanê de ne di heyza de ye û di paqijiya xwe de mêrê wê pê re ranezaye. Ev jî bi tenê bi beyan û îfadekirina herdu aliyan di hizûra şahidan de guncaw e.

Kesên misilman, dema bibihîsin ku dê du kes ji hev biqetin, ji bo lihevanîna wan li ser wan ferz e ku hinên di navbera wan de hakimtiyê bikin, bişînin. Ev jî dike lazimê xwe ku mirov bi rewşê bizanibe. Xwedê Teala wiha ferman dike:

"**Eger hûn ji xerabûna navbera jin û mêr endîşe bikin, hekemekî ji xizmên mêr û hekemekî ji xizmên jinê bişînin cem wan. Eger ew lihevhatina wan bixwazin, Xwedê dê navbera wan çêke. Bêguman Xwedê zana ye, agahdar e**."[497]

Endîşe û tirs; çi ji zen û gumanê be û çi jî ji zanebûnê be ku mirov hêviya tiştekî xerab bike. Zanebûneke wiha encax bi beyan û îfadeya yên ku di derbarê bûyerê de zanebûna wan heye derdikeve holê. Ên ku mumkin e wê bizanibin jî şahid in.

418. Ji bo lihevanîna mêr û jinê, mirov kengî dikeve dewrê?

Pirs: Di nivîsa we ya telaqê de hûn dibêjin ku piştî berdana di hizûra du şahidan de heyeta hakimtiyê dikeve dewrê. Gelo ne lazim e ku di serê meseleyê de yanî ji bo lihevanînê têkevin navbera wan, da ku ji hev neqetin?

Bersiv: Ji ber ku di nivîsa me de behsa berdanê/telaqê hatibû kirin, me îfade kiribû ku divê heyeta hakimtiyê têkeve navbera wan û ev "fermana Xwedê ye."

Xwedê Teala wiha ferman dike:

[497] Nîsa, 4/35.

“**Eger hûn ji xerabûna navbera jin û mêr endîşe bikin, hekemekî ji xizmên mêr û hekemekî ji xizmên jinê bişînin cem wan. Eger ew lihevhatina wan bixwazin, Xwedê dê navbera wan çêke. Bêguman Xwedê zana ye, agahdar e**.”[498]

Ev ayet, “peywirekê” li misilmanan bar dike û wê jî bi şertê “xewf” endişe û betirsiyê girêdide.

Endîşe û tirs; çi ji zen û gumanê be û çi jî ji zanebûnê be ku mirov hêviya tiştekî xerab bike. Eger şahid tune bin guncaw e ku misilman negihîjin vê agahiyê û pênehesin. Dema zanebûn derket holê wezîfe jî dest pê dike. Eger berê agahî gihîştibe wan, bêyî ku li benda berdanê bisekinin, divê ku lijneya hakimtiyê têxin dewrê. Di vê rewşê de eger berdan pêk hatibe divê ku dîsa careke din jî heyetê bişînin.

419. Di berdana beriya zîfafê de, gelo dîsa jî şert e ku di hizûra du şahidan de pêk were?

Pirs: Di sûreyê Telaq de emrê misilmanan tê kirin ku jinan di “‘iddê” û di hizûra du şahidan de berdin. Eger telaq piştî nîkahê, lê belê beriya şeva zîfafê be, dîsa jî şert e ku di hizûra şahidan de bê berdan an na?

Bersiv: Di berdanê de hebûna şahidan şert e. Lê pîreka ku neketibe zîfafê, ji ber ku tu ‘ideyekî ku bisekine tune ye, berdana wê ya di hundirê ‘iddeyê de jî tune ye. Ango mêrê wê di hizûra du şahidan de kengî bixwaze dikare wê berde.

Xwedê Teala wiha ferman dike:

“**Gelî bawermendan! Dema we jinên bawermend li xwe mar kirin, paşê beriya hûn herin livîna wan, we ew berdan, vêca ji bo we li ser wan tu ‘ide tune ye**

[498] Nîsa, 4/35.

ku hûn li ser wan bijimêrin. Nexwe ji malê xwe qenciyekê bi wan bikin û bi awayekî rind rêya wan vekin."[499]

420. Wateya bêjeya 'idde çi ye?

Pirs: Bêjeya "'idde" ya ku pir caran di mijara berdanê de derbas dibe û bêjeya "kişandina 'ideyê" bi çi wateyê ne?

Bersiv: Bêjeya "di hundirê 'iddeyê" de bi wateya dema pîrek tê berdan ku paqij be, yanî ne di heyza de be û bi mêrê xwe re ranezabe. Pîreka ku hatibe berdan, da ku bikaribe bi yekî din re bizewice divê demeke aşkere bisekine. Ango 'iddeyê xwe bikişîne. Ji wê seknê re tê gotin " عِدَّة 'idde".

'Idde, ji bo yên dikevin heyza, dîtina sê paqijiyan e. Ji ber ku telaq di dema heyzê de pêk nayê, pîrekeke ku hatibe berdan bêyî ku bi hev re razên (munasebeta cinsî) divê ku bi tevahî sê heyz û paqijiyan bisekine. Ev jî nêzî sê heyva ye.

Di derbarê yên ku êdî nakevin heyza (ji xwîna heyzê bêhêvî bûne), yên ku nakevin heyza an jî pîrekên bi heml, wiha hatiye fermankirin:

"**Ew jinên ku ji xwîna heyzê bêhêvî bûne û ew ên ku xwîna heyzê nabînin, eger hûn di derheqê wan de ketin gumanê, 'iddeyê wan sê meh e. Ew ên ku bi heml ne 'iddeyê wan bi danîna barê wan xelas dibe. Kî biryar û hukmên Xwedê biparêze, Xwedê dê karê wî jê re hêsan bike**."[500]

Mêr, -jina wî ya ku di van rewşan de ye- kîjan gavê bixwaze dikare wê berde. 'Idde bi nisbet bal wî ve, ji dema berdanê dest pê dike.

[499] Ehzab, 33/49.
[500] Telaq,65/4.

421. Pîreka ku hatibe berdan, kengî dikare bi yekî din re bizewice?

Pirs: Pîrekeke ku ji aliyê mêrê xwe ve hatibe berdan, kengî dikare bi yekî din re bizewice? Û piştî berdanê divê çiqasî bisekine?

Bersiv: Pîreka ku hatiye berdan, da ku bikaribe bi yekî din re bizewice divê demekê bisekine û ji wê re tê gotin "'idde". Berdan divê di hundirê 'iddeyê de be û pîrek di wê gavê de di paqijiyê de be, lê belê di heman wextê de divê ku bi mêrê xwe re neketibe têkiliya cinsî.

Xwedê Teala wiha ferman dike:

"**Jinên ku hatine berdan, bi tena serê xwe mudetê sê qur'an disekinin**."[501]

Ji ber ku têkiliya cinsî di dema heyzê de qedexe ye, pîrek di wê demê de jixwe bi tena serê xwe ye. Pîreka ku di hundirê 'iddeyê xwe de hatiye berdan ji ber ku bi mêrê xwe re di heman malê dijî gotina "قُرْء qur'" tê wateya dema paqijiyê ya ku dikare pê re têkeve munasebeta cinsî.

Li gorî vê, pîreka ku dikeve heyza dema ji aliyê mêrê xwe ve hatibe berdan, divê ku sê demên paqijiyê bimîne. Ji ber ku berdana di dema heyzê de çênabe, pîrekeke ku hatibe berdan bêyî ku bi mêrê xwe re ketibe têkiliya cinsî, bi gişti sê heyz + sê paqijî divê ku bisekine. Ev jî nêzî sê mehan dewam dike. Piştî paqijiya sêyem, êdî berdan temam dibe û pîrek dikare bi zilamekî din re bizewice.

Nîkaha ku beriya derbasbûna paqijiya sêyem ango beriya temambûna 'iddê, tê birîn, ne di cih de ye û nîkaheke batil e.

Xwedê Teala di derbarê pîrekên ku ji heyza qut bûne, ên ku nakevin heyza û yên ku ducanî ne, wiha ferman dike:

[501] Beqere, 2/228.

"Ew jinên ku ji xwîna heyzê bêhêvî bûne û ew ên ku xwîna heyzê nabînin, eger hûn di derheqê wan de ketin gumanê, 'iddeyê wan sê meh e. Ew ên ku bi hemle ne 'iddeyê wan bi danîna barê wan, xelas dibe. Kî biryar û hukmên Xwedê biparêze, Xwedê dê karê wî jê re hêsan bike."[502]

Mêr, -jina xwe ya ku di wan rewşan de ye- her gav dikare berde. 'Ide bi nisbet bal wî ve, ji dema berdanê dest pê dike.

422. Gelo hikmetê pîreka ku hatiye berdan sê paqijiyan disekine çi ye?

Pirs: Em dizanin ku piştî berdanê sedemê bingehîn ji bo sekna pîrekê, da ku mirov bi hemla wê bizanibe. Ango bi heml e yan na. Di roja me de zanîna bijîşkê di hundirê 15 rojan de bi rêya dahûrandina xwîn û îdrarê dikare tesbît bike. Ji ber vê yekê gelo ne lazim e ku mirov dema 'iddeyê jî daxe 15 rojan?

Bersiv: Di ayetên bi mijara telaqê re têkildar in[503] fermana ku mudeyê berdana yekem û duyem sê qur' ango sê demên paqijiyê ne hatiye dayîn. Ayetên di sûreyê Telaq de ne wiha ne:

"Ey Pêxember! Gava hûn bixwazin jinan berdin, wan di dema paqijiya wan de berdin û 'iddeyê wan bijimêrin. Ji Perwerdegarê xwe Xwedê bitirsin. Ji bilî ku ew fehşîtiyeke aşkere bikin, wan ji xaniyên wan dernexin û bila ew bi xwe jî dernekevin. Ev tixûbên Xwedê ne. Kî tixûbên Xwedê derbas bike, bi rastî wî li xwe stemkarî kiriye. Tu nizanî; dibe ku piştî berdana jinan, Xwedê rewşeke din derxe holê.

Dema ew hatin dawiya 'iddeyê xwe, vêca ya bi me'rûfê[504] li wan vegerin an jî bi me'rûfê ji wan cuda bibin (û wan berdin). Ji nav xwe du kesên dadperwer bikin şahid û bila ji bo Xwedê şahdeyiyê bidin.

---

[502] Telaq,65/4.
[503] Talaq, 65/1-2; Beqere, 2/228-229.

Ha ev, ji bo wî kesê ku bi Xwedê û roja axretê bawerî tîne, şîret e. Kî biryar û hukmên Xwedê biparêze, Xwedê dê rêyekê jê re veke.

Bi awayekî ku hizir nedikir dê rizqê wî bidê. Kî xwe bispêre Xwedê vêca Ew besî wî ye. Bêguman Xweda fermana xwe bi cih tîne, Xwedê ji bo her tiştî endazek daniye."[505]

Ji bo kesê ku bixwaze pîreka xwe berde, mirov dikare van pîvanên ku li jor derbas bûn wiha rêz bike:

1. Divê ku berdan di hundirê 'iddeyê de be. Ango pîrek ne di heyza de be û heke paqij be jî divê ku di wê paqijiyê de pê re ranezabe.

Lewra di dema heyzê de jin dikeve hin tengasî û zehmetiyan û ji ber ku mêrê wê nikare pê re têkeve munasebeta cinsî, zilam jî bêhuzûr dibe û bi rihetî dikare jina xwe berde.

Zilamê ku di dema paqijiyê de bi jina xwe razabe, ji ber ku ji aliyê cinsî ve gihîştiye armanca xwe, dîsa bi rihetî dikare jina xwe berde. Di herdu rewşan de jî neduristiya berdaneke wiha, tiştekî xwezayî ye.

2. Divê ku zilam 'iddeyê bijimêre. Jimartina rojên ku pîreka berdayî dê di malê derbas bike, tê wateya ku zilam bi wê re di wê demê de ji nêz ve eleqedar bibe.

3. Divê ku pîrekê ji mala wê dernexe. Lewra jin û mêr di nêzî sê mehên ku dê bi hev re derbas bikin, dibe ku bi awayekî li hev bikin. Eger li hev nekin tê wateya ku pirsgirêka di navbera wan de mezin e.

4. Divê ku pîrek jî ji mal dernekeve. Lewra dema pîrek dev ji malê berde û derkeve, dê ji hev sar bibin û lihevhatina wan bêhtir zehmet dibe.

---

[504] Wateya me'rûfê; tiştê diyar û tê zanîn e. Ev zanebûn ya ji 'urf û adetan an jî ji Qur'an û Suneta Pêxember (s.a.v) tê bidestxistin. Eger ji 'urf û adetan hatibe bidestxistin divê ne li dijî Qur'an û Sunetê be. Zanebûneke wiha dîn û aql, wê baş û rast didêrin.

[505] Telaq, 65/1-3.

5. Mêr, di hundirê vê demê de yan jî piştî wê, divê ku ya bi başî lê vegere yan jî bi başî dev jê berde. Lewra zewaca bi zorê nameşe û dê ziyanê bide malbatê. Eger li gorî me'rûfê bi xweşî û başiyê ji hev biqetin, piştre bi nîkaheke din dîsa dikarin bi hev re bizewicin.

6. Çi di dema berdanê de çi jî di dema vegerê de û çi jî di dema jihevqetandinê de divê ku du kesan şahid bigirin.

Bi vî awayî misilmanên ku bi meseleyê agahdar bibin, li gorî ayeta 35an ji sûreyê Nîsa, ji bo lihevanîna wan an jî dîtina rêyên lihevanînê ji malbata zilam û pîrekê du şandeyan bişînin. Ev karên han, da ku mêr jina xwe carekê bernede.

Çawa ku tê dîtin 'ide, ne ji bo tesbîta hemlê ye. Belbî ji bo baş bê tesbîtkirin bê ka mêr û jin dikarin jiyana xwe bi hev re bidomînin an na. Eger ne wiha bûna, ji bo tesbîta hemlê derbasbûna heyzekê têr dikir. Ji vê bonê ye ku pîreka diyar e ku hemla wê tune ye jî 'ide dikişîne. Ayeta têkildar wiha ye:

"**Ew jinên ku ji xwîna heyzê bêhêvî bûne û ew ên ku xwîna heyzê nabînin, eger hûn di derheqê wan de ketin gumanê, 'iddeyê wan sê meh e. Ew ên ku bi hemle ne 'iddeyê wan bi danîna barê wan, xelas dibe. Kî biryar û hukmên Xwedê biparêze, Xwedê dê karê wî jê re hêsan bike**."[506]

Ji vê bonê ne pêkan e ku zemanê 'iddeyê dakeve binê demên ku di vê ayetê de hatiye aşkerekirin.

423. Pîreka ku di dema 'iddeyê xwe ji mal derkeve, gelo hatiye berdan an na?

Pirs: Hukmê ku zilam jina xwe ya telaqkirî/berdayî di hundirê 'iddeyê de ji malê derxe yan jî pîrek bi xwe derkeve çi ye? Lewra Xwedê Teala di sûreyê Telaq de di derbarê şertên berdanê de wiha ferman dike: "**Ji bilî ku ew fehşîtiyeke aşkere**

[506] Telaq, 65/4.

bikin, wan ji xaniyên wan dernexin û bila ew bi xwe jî dernekevin." Di vê rewşê de eger pîrek vegera bi bal malê ve qebûl neke, ev telaq dê çawa bi dawî bibe?

Bersiv: Di vê rewşê de jî telaq pêk tê. Lewra ku mirov pîreka hatiye berdan ji xanî dernexe, ew bi xwe jî jê dernekeve û ku zilam dema 'iddeyê bijimêre, ev şertên han, ne bi pêkhatina telaqê ve girêdayî ne, belbî ji bo sazkirin û çêkirina malbatê ji nû ve yanî da ku telaq pêk neyê û pîrek neyê berdan, şert in. Dema pîrek ji xanî derkeve yan jî bê derxistin û mêr û jin rabin li ba hinên din behsa nebaşî û xerabiyên hev bikin, mumkin e ku ji hev bêhtir sar bibin û yên dilxerab û zikreş bibin asteng ji bo vegera wan bi bal hev ve. Ên ku dê zirarê ji vê rewşê bibînin jî bi tenê mêr û jin e, ne tu kesên din in. Û ayeta "**Kî tixûbên Xwedê derbas bike, bi rastî wî li xwe stemkarî kiriye.**"[507], vê yekê destnîşan dike.

424. Dema mirov pîreka xwe ya berdayî ji malê derxe, telaq pêk tê? Ma ev jî ne fermana Xwedê ye?

Pirs: We di nivîseke xwe de fdiye ku pîreka hatiye berdan dema ji aliyê mêrê xwe ve ji xanî bê derxistin an jî ew bi xwe derkeve, telaq pêk tê û we ev yek ji şertên telaqê yên din, cuda girtiye. Ma ev hemû ne fermanên Xwedê ne? Şîrovekirina vê meseleyê çawa ye?

Bersiv: Di derbarê telaqê de Xwedê Teala wiha ferman dike:

"**Ey Pêxember! Gava hûn bixwazin jinan berdin, wan di dema paqijiya wan de berdin, 'iddeyê wan bijimêrin. Ji Perwerdegarê xwe Xwedê bitirsin. Ji bilî ku ew fehşîtiyeke aşkere bikin, wan ji xaniyên wan dernexin û bila ew bi xwe jî dernekevin. Ev tixûbên Xwedê ne. Kî tixûbên Xwedê derbas bike, bi rastî wî li xwe stemkarî kiriye. Tu nizanî; dibe ku piştî berdana jinan, Xwedê rewşeke din derxe holê**."[508]

---

[507] Telaq, 65/1.
[508] Telaq, 65/1.

Berdan divê di hundirê ‘iddeyê de be û pîrek di wê gavê de di paqijiyê de be. Lê belê di heman wextê de divê ku bi mêrê xwe re neketibe têkiliya cinsî.

Xwedê Teala wiha ferman dike:

“**Jinên ku hatine berdan, bi tena serê xwe mudetê sê qur’an disekinin**.”[509]

Ji ber ku têkiliya cinsî di dema heyzê de qedexe ye, pîrek di wê demê de ji xwe bi tena serê xwe ye. Pîreka ku di hundirê ‘iddeyê xwe de hatiye berdan, ji ber ku bi mêrê xwe re di heman malê dijî gotina “qur” tê wateya dema paqijiyê ya ku dikare pê re têkeve munasebeta cinsî.

Ji bilî vê, di ayeta jor de sê şertên din jî hatine jimartin. Ew jî; jimartina ‘iddê, mirov pîrekê ji xanî dernexe û ew jî ji mal dernekeve. Ên ku van şertan di ser guhê xwe re biavêje û girîngiyê nedê, xwe dixe tengasî û zehmetiyê. Lê telaq pêk tê û jina wî tê berdan. Lewra Xwedê Teala wiha ferman dike: “**Kî tixûbên Xwedê derbas bike, bi rastî wî li xwe stemkarî kiriye.**”[510]

Lewra heta dawiya ‘iddê, mafê mêr ê vegerê heye. Eger ew bi xwe ‘iddeyê nejimêre, dibe ferq neke ku dema ‘iddeyê derbas bûye û mafê wî yê vegerê ji destê wî bifilite. Eger mêr di hundirê dema ‘iddeyê de jina xwe ji xanî dernexe, çareserkirina pirsgirêkê rihet dibe. Pêkan e ku li wê rewşê bi hizir bifikire û bigihîje encameke erênî û baş.

Eger pîrek ji xanî dernekeve mumkin e ku ew jî derfeta îqnakirina mêrê xwe bi dest bixe. Li hember mêrê xwe di hundirê wê demê de ji pêwendiya cinsî pê ve tu tiştekî din lê ne qedexe ye. Ev jî dike ku îhtimama mêrê wê ya bi bal wê ve zêde bibe.

Eger mêr biryara vegerê bide û di hizûra du şahidan de vê biryara xwe bide tesbîtkirin, êdî ew qedexeya cinsî jî ji holê radibe.

---

[509] Beqere, 2/228.
[510] Telaq, 65/1.

425. Piştî berdana pîrekê dema mirov li jina xwe vegere, ma divê ku nîkaheke nû were birîn?

Pirs: Dema mirov di hundirê 'iddeyê de jina xwe vedigerîne, ne hewce ye ku mirov nîkaheke nû bibire. Wê demê, ev berdanek çawa ye? Bi gotineke din di dema ric'etê de nîkaheke nû pêwîst e yan na?

Bersiv: Di sûreyê Telaq de têgehên "telaq" û "tefrîq" û di sûreyê Beqere ayetên 229 û 231em de têgehên "telaq" û "tesrîh"ê hene. Têgeha "tesrîh"ê, di ayeta 28an ji sûreyê Ehzab di derbarê pîrekên Pêxember (s.a.w) de jî hatiye bikaranîn. Telaq, berdan; tefrîq an jî tesrîh, piştî derbasbûna 'iddeyê jihevqetandina mêr û jinê ye. Cihgirtin û pêkhatina telaqê; bi tefrîq û tesrîhê ve ne girêdayî ye. Belbî ev, karekî ji bo parastina jinan e. Eger ne wiha bûna, piştî derbasbûna 'iddê, dê pir kesan pîrekên xwe berdana û ew vegerandin bi vî awayî pir caran dubare bikirina. Negirêdana telaqê bi tefrîqê, vî deriyê han girtiye. Xwedê Teala wiha ferman dike:

"**Telaq (ya ku lêvegerîn tê de pêkan e) du car in. Êdî; yan bi qencî li cem xwe hiştin e yan jî bi rindî berdan e**."[511]

Pergala berdanê ya di Qur'ana Pîroz de, nabe ku mirov wê li gorî telaq û berdanên di qanûn û huqûqên din de hene bide ber hev, binirxîne û bibêje ku "heta nîkaheke nû neyê birîn telaqekî nû nayê cih", ev tişt li dijî pergala berdanê ya ku Qur'anê ew qebûl kiriye, ye.

426. Ma rast e ku pîreka mêrê wê miriye, heta 'iddeyê wê neqede, nikare ji mala xwe derkeve?

Pirs: Xizmekî min deh roj berê di qezayekê de çû ser dilovaniya Xwedê. Pîrekek hatiye mala wan û ji jina mirî re gotiye ku heta çar meh û deh rojan bi tu awayî tu nikarî ji mal derkevî û ev emr û fermana Xwedê Teala ye. Gelo ev tiştê ku hatiye gotin rast e yan na?

[511] Beqere, 2/229.

Bersiv: Di derbarê mijara pîrekên ku mêrê wan mirine Xwedê Teala wiha ferman dike:

"**Ew ên ku ji we dimirin û li pey xwe jinan dihêlin, ew (jin) dê bi xwe çar meh û deh rojan bisekinin. Gava dema xwe ya xwegirtinê temam kirin, di tiştê ku li gorî me'rûfê di derheqê xwe de kirine, li ser we tu guneh tune ye. Xwedê ji karên ku hûn dikin agahdar e**."[512]

Li gorî vê ayetê, pîrekên ku mêrê wan miribe divê ku çar meh û deh rojan 'iddeyê xwe bikişînin. Beriya derbasbûn û xelasbûna dema 'iddê, pîrek nikare bi kesekî re bizewice. Qedexe tenê bi vê yekê re girêdayî ye, ji bilî zewacê tu qedexeyeke din tune ye.

Pîrekên ku di dema 'iddeyê de nikarin ji malên xwe derkevin, pîrekên ku ji aliyê mêrê xwe ve hatine berdan. Ew jî -ku dev ji mala xwe bernedin- ne ku bi tu awayî ji mal dernakevin. Yanî di dema 'iddeyê xwe de ji bo temîn û dîtina kîjan hewcedariyan dibe bila bibe, dikarin ji malê derkevin.

427. Gelo 'iddeyê pîreka ku cara sêyem hatibe berdan, çiqas e?

Pirs: Di berdana sêyem ya ku li gorî Qur'anê pêk hatiye, hewce ye ku pîrek 'iddeyê xwe bikişîne yan na? Hikmetên 'iddeyê yên ku min tesbît kirine ev in: **Ya yekem**; di berdana yekem û duyem de hêviya veger û poşmaniyê û îhtimala hemlebûnê ye. **Ya duyem**; di berdana cara sêyem de îhtimala hemlebûnê û parastina namûsa pîrekê ye (lewra dema zû bi zû bizewice, mumkin e ku însan di heqê wê de nebaş bifikirin). Li aliyê din, di pirtûkên 'ilmê hedîsê de ez gihîştim agahiya ku pîrek divê piştî "xul'ê" mehekê ('ideyê xwe bikişîne) bisekine. Di vê rewşê de delîla ku pîrek ('iddeyê) nakişîne, divê ku ji aliyê yên wê angaştê dikin ve were anîn. Di vê mijarê de em alîkariyê ji we dixwazin.

[512] Beqere, 2/234.

Bersiv: Di ayetên (Telaq, 65/1-2; Beqere, 2/229) ku bi mijara berdanê re girêdayî ne, bi me dide zanîn ku 'iddeyê berdana yekem û duyem sê qur' yanî sê demên paqijiyê ne. Di ayeta "**Tu nizanî; dibe ku piştî berdana jinan, Xwedê rewşeke din derxe holê.**"[513] ji sûreyê Telaq, hikmetê 'iddeyê ji me re aşkere kiriye. Dema em ayetên di derbarê berdanê de ne (Beqere, 2/229; Telaq, 65/2) hemiyan bidin ber çavê xwe, dê were dîtin ku 'iddeyê behsa wê tê kirin, 'iddeyê "ric'î"ye yanî yê ku veger tê de heye.

Piştî berdana sêyem, ji ber ku vegera wan bi bal hev ve ne caiz e[514], di vê rewşê de ne lazim e ku pîrek sê qur'an/sê demên paqijiyê bisekine. Yeke wiha, divê ku dema paqijiyekê bisekine. Ev jî dema "istibra"yê ye yanî ji bo ku mirov bizanibe bê ka pîrek ducanî ye yan na.

Ji ber ku mijar di ayetan de pir aşkere hatiye derbirîn, hedîsên di derbarê vê mijarê -piştî berdana sêyem bê pîrek disekine yan nasekine- ji Pêxember aleyhisselam hindik hatine ragihandin. Hedîseke ku bi vê mijarê re têkildar e wiha ye:

Ebû 'Emrê kurê Hefs, ne di hizûra Fatîme de wê berdide û wekîlê wî jê re ceh dişîne. Fatîme pê qayil nabe. Lê belê wekîlê 'Emr dibêje;

Ez qesem dikim bi navê Xwedê, tu mafê te li ba me tune ye. Li ser vê yekê Fatîme tê hizûra Qasidê Xwedê û bûyerê jê re qise dike. Pêxember aleyhisselam dibêje ku: "*Li ba wî tu heqê te yê nefeqeyê tune ye*" û emrê wê dike ku li mala Ummû Şerîk 'iddeyê xwe derbas bike (temam bike). Piştre wiha dibêje: "*Ummû Şerîk pîrekeke ku her gav hevalên min diçin ziyareta wê. Tu li ba Îbn Ummî Mektûm (x.j.q) 'iddeyê xwe bikişîne, lewra ew zilamekî hafiz e (kor). Li ba wî tu dikarî çarşeva xwe dênî! dema (ji bo zewacê) tu helal bûyî ji min bibêje…*"[515]

[513] Telaq, 65/1.
[514] Beqere, 2/230.
[515] Muslim, Telaq, 36 (1480).

Wekî ku ji hedîsê tê dîtin, Pêxember (s.a.w) ji Fatîme keça Qeys re negotiye "here sê qur'an bisekine" belbî jê re gotiye "**here 'iddeyê xwe bikişîne, dema (ji bo zewacê) tu helal bûyî were ba min**."

Îbn Teymiyye di derbarê vê hedîsê de wiha dibêje:

"Di lefzên vê hedîsê de îfadeya "sê heyzan 'iddeyê bikişîne" tune ye. Li gorî ku gihîştiye me, ji aliman kesekî ku wiha gotibe tune ye. Eger ev nêrîn îcma' be, ev rast e û civaka Îslamî li ser tiştekî batil îcma' nakin. Gotina "'iddê pîreka ku cara sêyem hatiye berdan, ne sê heyzên, belbî sirf dema istibrarê ye", eger nêrîna hin zanyaran be, di vî halî de tiştekî ku vê nêrînê xwedîhêz bigerîne heye. Bi vî awayî: Dirêjiya dema 'ideyê, 'eleqeya wê bi hebûna mafê ric'etê (vegerînê) ve heye. Yanî ji vê bonê ye ku dema 'iddeyê sê heyz in. Ên ku mafê wan ê vegerê tune ye, sê demên heyzê nasekinin. Di zahirê Qur'anê de ji muwafeqeta vê nêrînê pê ve tiştekî din tune ye."[516]

Eger em vegerin ser mijara pîreka ku bi rêya "xul'ê" ji mêrê xwe qetiyaye: Ev mijar di dewama ayeta 229an ji sûreyê Beqere ya ku behsa berdanê dike, derbas dibe. Lê belê di ayetê de ev bûyer, ne bi navê xul'ê yan jî bi navê telaqê, belbî bi navê "îftidayê" derbas dibe.

Ji ber ku îftida di Qur'ana Pîroz û di suneta Pêxember (s.a.w) de telaq nehatiye hesibandin, kesê ku bi vê rêyê ji mêrê xwe qetiyabe ji bo 'iddê, ne lazim e ku sê qur'an bisekine.

Li gorî riwayeta ku ji 'Ebdullahê kurê 'Ebbas (x.j.q) hatiye ragihandin, Sabitê kurê Qeys di serdema Pêxember de (s.a.w) bi rêya xul'ê (yanî li hember bedelekî) ji pîreka xwe qetiyabû. Pêxember (s.a.w) jî ferman da, ku bila dema heyzekê 'iddeyê bikişîne.[517]

[516] Îbn Teymiyye, **Mecmû'u'l-Fetawa**, XXXII, 342.
[517] Tirmizî, Xul', 10.

Mîna ku tê dîtin, ‘iddeyê pîreka ku bi rêya îftidayê ji mêrê xwe qetiya be, dema heyzekê ye. Ev jî ji bo tesbîta hemla pîrekê ye.

428. Mêr û jina ku dev ji hev berdin, dê parvekirina mal di navbera wan de çawa bê kirin?

Pirs: Ev du meh û nîv e, ez ji mêrê xwe cuda me. Di nîqaşa li ser meseleyeke biçûk de ez berdam. Piştî berdanê heta sê rojan em di heman xaniyî de man, lê belê ev rewş li zora min çû, ez ji mal derketim û çûm mala bavê xwe. Ji wê demê heta niha mêrê min li halê min qet nepirsiye. Piştre wî biryara berdanê da û min jî du mehan hewl da, ku min bernede. Di vê navberê de ez di meha nehan de me û sirf ji bo zaroka xwe min xwest ku em li hev vegerin. Lê belê ji ber ku malbata wî min naxwaze, wî jî ez red kirim. Niha jî dibêje ku: “Ya ez ê kelmelên malê bidim an jî 6,500 TL pere bidim te û em ji hev biqetin.” Ev pere, sirf ne pereyê mehra min e. Di rewşeke wiha de ez dikarim çi bikim?

Bersiv: Hûn ê kelmelên xwe yên taybet û mehra di dema nîkahê de soza wê hatiye dayîn bigirin. Di ser de jî heta hûn hemla xwe dênin, divê ku nefeqeyê we jî bide. Piştî ji dayikbûnê jî divê ku nefeqeyê zarok bide. Ayetên ku me ji vê rewşê agahdar dikin wiha ne:

“**Bila dayik heta du salên tekûz şîr bidin zarokên xwe. Ev, ji bo yên ku dixwazin dema şîrdayînê temam bikin. Xwarin û vexwarina wan li gorî me‘rûfê, li ser bavê zarok e. Li gorî hêza xwe bi tenê mirov tê binbarkirin. Divê ne dê ne jî bav bi sedem zaroka xwe zirarê bibîne…**”[518]

“**Jinên berdayî yên ku ‘iddeyê wan temam nebûye, li gorî taqeta xwe li cihê ku hûn lê bi cih bin (wan jî) bi cih bikin. Zirarê nedin wan, da ku bi vî awayî hûn wan tengezar bikin. <u>Eger ew li halekî bin (ducanî bin), heta barê xwe deynin nefeqeyên wan bidin. Eger ew zaroka we şîr bidin ucreta wan bidin û di navbera</u>**

[518] Beqere, 2/233.

<u>xwe de bi rindî li hev bikin</u>. Eger hûn rastî tengasiyekê hatin, bila yeka din wî şîr bide.

Yê destfireh bila li gorî destfirehiya xwe nefeqe bide û yê desteng jî ji malê ku Xwedê daye wî, bila nefeqe bide. Xwedê li tu kesî zêdetirî ya ku dayê, bar lê nake. Xwedê, dê piştî destengiyê destfirehiyê peyda bike."[519]

Piştî ku zaroka we hat dinyayê, hûn dikarin bi yekî din re bizewicin. Di heman wextê de eger hûn û mêrê xwe li hev bikin, hûn dikarin bi mêrê xwe yê berê re jî bizewicin.

429. Gelo pîrek, bi gotina mêrê wê "min tu berdayî", tê berdan an na?

Pirs: Ev şeş sal e ku ez zewicandî me û kurekî min ê du salî heye. Bi hezkirin û riza dilê xwe ez bi mêrê xwe re zewicîm. Ev nêzî salekê ye ku em pir şer dikin. Di wan şeran de mêrê min sê caran got ku "**Min tu berdayî**", lê belê niha, me hemû pirsgirêkên xwe çareser kirin. Û mêrê min pir poşman bûye. Divê em çi bikin? Munasebeta me ya mêr û jinantiyê dewam dike, dilê min ne rihet e. Gelo bi vî awayî em zinayê dikin an na?

Bersiv: Nîkaheke ku bi rê û rêbazên rast û durist hatibe birîn, encax dîsa bi berdana bi rê û rêbazên rast û durist, bi dawî dibe. Mixabin agahiyên gel di vê mijarê de ne rast in. Baweriya ku pîrek bi gotina zilam ku dibêje; min tu bi sê telaqan berdayî, telaq pêk tê, yek ji wan e. Bi hêrsê û bê xwestina ji dil ku mirov sê caran bibêje "min tu berdayî" telaq nayê cih. Lewra ji bo berdanê jî hin rê û rêbaz hene. Ji ber vê, bila dilê we rihet be. Pîrek bi vî awayî nayên berdan.

430. Ma mirov dikare di hundirê 'iddeyê de jina xwe cara duyem berde?

Pirs: Li gorî Qur'anê di dema sekna 'iddeyê de telaqekî nû çêdibe yan na?

[519] Telaq, 65/6-7.

Bersiv: Di sûreyê Telaq de pîvanên berdanê hatine aşkerekirin, di sûreyê Beqere ayeta 229an de li gorî wan pîvanan, biryar û hukmê ku telaq herî zêde (ric'î) du caran heye hatiye dayîn. Ji vê bonê heta dawiya 'iddeyê pîrekê, ji telaqekî zêdetir jin nayê berdan.

Ji vê pê ve, -bi angaşta ku nêrîna mezheban e û esasgirtina wan di fetwadayînê de- bi sedema ku pirên wan ne li gorî Qur'an û suneta Pêxember (s.a.w) e, aşkere û xuya ye ku misilman li hemberî wan fetwayan ne berpirs in û divê xwe bi wan negirin.

431. Gelo mehr ji pîreka ku berî zîfafê hatibe berdan re heye?

Pirs: Eger di navbera jin û mêr de pêwendiya cinsî çênebûbe û hatibe berdan, divê ku mêr mehrê bide yan na?

Bersiv: Di berdana berî zîfafê de du rewş derdikevin pêşberî me: Ji herdu aliyan ve mehr hatibe tesbîtkirin an jî nehatibe tesbîtkirin.

Ayetên ku herdu rewşan şîrove dikin wiha ne:

"**Eger, hîn ku we dest nedabe wan an jî we mehra wan diyar nekiribe, hûn jinan berdin, li ser we tu guneh tune ye. Tiştekî ku jê istifade bikin, bidin wan. Ê destfireh bila li gorî halê xwe û yê desteng jî li gorî halê xwe, dayîneke li gorî me'rûfê, bide wan. Ev, li ser qencîkaran deynek e.**

Eger beriya ku hûn biçine nivîna wan hûn wan berdin û we mehra wan diyar kiribe, wê gavê hûn ê nîvê mehra diyarkirî bidin wan. Lê belê eger jin li mehra xwe bibore, yan jî ew ê (mêrê) ku peymana nîkahê di destê wî de ye lê bibore, ew tiştekî din e. (Gelî mêran) Eger hûn lê biborin, ew bêhtir nêzî teqwayê

ye. Di navbera xwe de qencîkariyê ji bîr mekin! Bêguman Xwedê, bi ya ku hûn dikin bîner e."[520]

Li gorî van ayetan, eger berdan berî şeva zîfafê pêk hatibe û mehr hatibe tesbît û aşkerekirin, divê ku mirov nîvê wê radestîi pîrekê bike. Lê belê eger pîrek beriya tesbîta mehrê hatibe berdan, wê demê divê ku mêr li gorî me'rûfê, malekî ku pîrek jê îstifade bike, bidê.

432. Berdana berî zîfafê

Pirs: Di nêz de min nîşaniya xwe kir, lê belê ji ber ku ez li derveyî welêt dijîm bi niyeta ku ez ê ji bo dergistiya xwe bi hêsanî vîzeyê bi dest bixim, me nîkaha xwe ya dînî û fermî birî. Me mehr û xelatên xwe jî dan, lê me dawet nekir. Bi gotineke din herdu alî jî li malên xwe ne û tu munasebeta jin û mêran di davbera me de çênebû. Lê belê piştre me biryara jihevqetandinê da. Pirsa min, mehra min dayiyê jê re dikeve yan jî ji vê pîrekê re tu mehr nakeve?

Bersiv: Di vê mijarê de Xwedê Teala wiha ferman dike:

"**Eger beriya ku hûn biçine nivîna wan hûn wan berdin û we mehra wan diyar kiribe, wê gavê hûn ê nîvê mehra diyarkirî bidin wan. Lê belê eger jin li mehra xwe bibore, yan jî ew ê (mêrê) ku peymana nîkahê di destê wî de ye lê bibore, ew tiştekî din e. (Gelî mêran) Eger hûn lê biborin, ew bêhtir nêzî teqwayê ye. Di navbera xwe de qencîkariyê ji bîr mekin! Bêguman Xwedê, bi ya ku hûn dikin bîner e**."[521]

Li gorî vê ayetê, divê ku hûn nîvê mehrê bidin jina xwe. Ev, fermana Xwedê Teala ye. Lê belê dîsa li gorî ayetê, keçik dikare ji we nestîne û wî nîvî li we vegerîne yan jî hûn, ne nîvî; temamê mehrê bidinê. Ev yeka dawî di ayetê de bi îfada "**ew bêhtir nêzî teqwayê ye**." hatiye tewsiyekirin.

[520] Beqere, 2/236-237.
[521] Beqere, 2/237.

433. Ma pîreka ku piştî nîkah û xelweta sehîh e hatibe berdan, mehr jê re dikeve yan na?

Pirs: Neh meh berê ez zewicîm. Bi pîreka xwe re bi giştî çar mehan em di heman malê de man. Mehra wê jî bazinên ku diya min dabûnê. Di navbera me de di wan çar mehan de tu munasebeta mêr û jinantiyê çênebû. Lê belê em li ser heman doşekê radiketin. Niha, ez dixwazim wê berdim. Ma tu mafê jina min ê mehrê heye yan jî ez dikarim wan bazinan jê bistînim?

Bersiv: Piştî nîkahê eger zîfaf pêk hatibe yan jî xelweta sehîh e hatibe cih, divê ku berdan li gorî şertên ku di sûreyê Telaq de derbas dibin, bê kirin. Di vî halî de pîrek dibe xwediyê mehrê bi temamî.

Di pirsa xwe de we îfade kiriye ku di navbera we de zîfaf pêk nehatiye, lê belê çar mehan we heman doşek parve kiriye, ev dibe xelweta sehîh. Xelwet, "mayina zilam û pîreka ku ne markirî bin û heta bi heta li hev ne heram bin, bi tena serê xwe, wekî têgeheke fiqhî piştî nîkahek sehîh ku mêr û jin li cihekî ku ji dîtina yekî sêyem bê destûra wan ewle bibe, bêyî ku têkilaya cinsî pêk were bi tena serê xwe bimînin re tê gotin."[522]

434. Di kîjan rewşan de pîrek dikare doza berdanê li mêrê xwe veke?

Pirs: Zewaca min heft mehan dewam kir û bi berdanê dawî bû. Min mehra xwe nedayê û heçî tiştên ku min ji eşya, xeml û xişran dabûnê min jê stendin. Di vê kirinê de min xwe nespart tu delîkeke zanyarî. Bi îfadeyek din, ev helwesta min, bi halê min ê derûnî yê wê demê bû. Sedemê ku me dev ji hev berda, ez pê hesiyam ku mêrê min bi dizî ji xwe re dostikek girtiye. Mêrê min digot ku em hevalên hev in û bersivên ne li gorî hev didan. Bi rastî, ya min jî tu delîleke min a teqez tune bû. Ango ez ne bûm şahidê meseleyê, sirf min jê guman dikir. Me doz vekir û em ji hev qetiyan. Ji aliyê dînî ve, hukmê vê kirina min çi ye? Yanî ma divê ku ez mehrê lê

[522] Orhan Çeker, "Halvet", **DİA**, 1997, XV, 384.

vegerînim û kelmelên min jê re kirîbûn ji cil, xeml û xişran ku ez jê bistînim durist e yan na?

Bersiv: Ji ber sedemeke rast û mafdar we dev ji mêrê xwe berdaye. Tiştên we stendiye ji yên ku we dayiyê, ne zêde ye. Yanî tiştên we dayiyê we stendiye. Ji vê bonê ev kirina we, dikeve bin hukmê vê ayetê:

"**Gelî bawermendan! Digel ku ew ne bi dilê we bin[523], ji we re ne helal e ku hûn hewl bidin da ku hûn bibin mîratxwerê pîrekan. Da ku tiştekî we daye wan, hûn ji wan bistînin zordestiyê li wan nekin; Lê ku tolaziyeke aşkere bikin ew tiştekî din e. Bi wan re xweş bibuhêrin. Vêca eger hûn ji wan bêzar bin, dibe ku hûn tiştekî nevên û Xwedê ji bo we xêr û bêreke pir têxê**."[524]

435. Di kîjan halan de lazim e ku mêr, mehrê bide pîrekê?

Pirs: Nîkaha dînî hatiye birîn, encax têkiliya cinsî çênebûye. Xwestin, nîşan û nîkaha resmî jî nehatiye kirin. Di rewşeke wiha de ma mehr tê vegerandin an jî ku nehatibe dayîn divê ku mirov mehrê bide yan na?

Bersiv: Di nîkaheke wiha de eger xeber û destûra malbata keçikê jê tune be (û têkiliya cinsî jî çênebûbe) ji ber ku nabe nîkah, mehr jî ne lazim e. Lê belê eger nîkah bi destûra malbata keçikê hatibe birîn û mehr hatibe tesbîtkirin, herçiqas nîkaha resmî nehatibe kirin jî divê ku hûn nîvê wê mehrê bidin keçikê. Beriya tesbîta mehrê eger keçik hatibe berdan, tiştekî ku wê jê îstifade bike, divê ku hûn bidinê.

Ayetên têkildar wiha ne:

---

[523] Di ayetê de îfadeya "Digel ku ew ne bi dilê we bin" wergera bêjeya= كرها e. Ev bêje, "**hal**" e, ango rewşê dide xuyakirin. Di tefsîr û wergerên Qur'anê de ev bêje bi awayê ku bibe "**hal**" ji bo pîrekê, nirxandine û wiha wate dane ayetê: Gelî bawermendan! Ji we re ne helal e ku hûn bi kotekî bibin mîratxwerê jinan. Û ev bi du awayan şîrove kirine. Ya yekem, fehma ku pîrek mîna pertalê mîratê ye. Watedayîna bi vî awayî, tê wateya ku mirov ayetê dike tiştekî dîrokî –hatiye derbas bûye û êdî tu eleqeya wê bi îro re tune ye-. Ya din jî pîreka ku dixwaze ji mêrê xwe biqete, mirov wê bernede û li benda mirina wê bisekine da ku bi zorê bibe mîratxwerê wê. Ji ber ku Qur'anê bi rêya îftidayê mafê xweberdanê, daye pîrekê ev jî ne pêkan e. Ma ku mirov bêjeya "كرها " (kerhen) bike halê kirde, ango bike rewşa zilaman. Wergereke wiha yekîtiya di navbera ayetan derdixe holê.

[524] Nîsa, 4/19.

"Eger, hîn ku we dest nedabe wan an jî we mehra wan diyar nekiribe, hûn jinan berdin, li ser we tu guneh tune ye. Tiştekî ku jê istifade bikin, bidin wan. Ê destfireh bila li gorî halê xwe û yê desteng jî li gorî halê xwe, dayîneke li gorî me'rûfê, bide wan. Ev, li ser qencîkaran deynek e.

Eger beriya ku hûn biçine nivîna wan hûn wan berdin û we mehra wan diyar kiribe, wê gavê hûn ê nîvê mehra diyarkirî bidin wan. Lê belê eger jin li mehra xwe bibore, yan jî ew ê (mêrê) ku peymana nîkahê di destê wî de ye lê bibore, ew tiştekî din e. (Gelî mêran) Eger hûn lê biborin, ew bêhtir nêzî teqwayê ye. Di navbera xwe de qencîkariyê ji bîr mekin! Bêguman Xwedê, bi ya ku hûn dikin bîner e."[525]

436. Ma li gorî Qur'anê, berdana bi şert durist e yan na?

Pirs: Berdana bi şert durist e yan na?

Bersiv: Berdana bi şert, mîna "Eger tu herî mala bavê xwe, min tu berdayî" û hevokên mîna wê yên ku bi pêkhatin an jî bi nepêkhatina tiştekî ve berdana pîrekê hatibe girêdan re tê gotin telaqê bi şert. Berdaneke wisa di Qur'an û suneta Pêxember (s.a.w) de nehatiye dîtin û ji vê bonê, berdaneke wiha pêk nayê!

Di berdana li gorî fermanên Xwedê Teala, divê ku di dema berdanê de pîrek ne di heyza de be û di dema paqijiyê de jî mêrê wê pê re ranezabe, di hizûra du şahidan de bê berdan, zilam dema 'iddeyê bijimêre û heta 'iddeyê pîrekê xelas bibe ji mala ku tê de dijî dernekeve.

Piştî van fermanên ku bi telaqê ve girêdayî ne, Xwedê Teala wiha ferman dike:

"…**Ev, tixûbên Xwedê ne. Zinhar wan binpê mekin! Kî ji tixûbên Xwedê derbas bibe, vêca ew stemkar bi xwe ne**."[526]

[525] Beqere, 2/236-237.
[526] Beqere, 2/229.

"…**Kî tixûbên Xwedê derbas bike bi rastî wî li xwe stemkarî kiriye**."[527]

Ji vê bonê ku mirov duristî û rastiya berdana bi şert bipejirîne, ev yek dibe binpêkirina tixûbên Xwedê Teala.

437. Berdana di gava hêrsbûnê de, gelo pêk tê yan na?

Pirs: Di dema hêrsê de min ji pîreka xwe re got ku ji niha û pê ve bê xebera min eger tu bi dê û bavê xwe re bi telefonê xeber bidî, min tu bi sê telaqan berdayî. Heta niha tiştekî wiha nekiriye, lê belê eger xwe ji bîr bike û bi wan re xeber bide jina min tê berdan an na? Bi rastî ez poşman im, gelo ji bo vegerê tiştekî ez bikaribim bikim, heye?

Bersiv: Ev şertê ku ji bo berdanê we daye pêş, şertekî batil e. Ango îtibar pê nayê kirin. Pîreka we, çi bi rêya telefonê çi jî bi rêya hevdîtinê dikare bi dê û bavê xwe re biaxive û tu mafê we tune ye ku hûn bibin asteng. Tiştê ku Xwedê Teala helal kiriye û heta qencî û başiya bi dayik û bavan ferz kiriye, hûn bi kîjan aqil û mentiqê li pîreka xwe qedexe dikin. Beriya her tiştî ji bo vê yekê, divê ku hûn tobe bikin.

Di meseleya berdanê de jî çawa ku ji bo zewacê hin şert lazim in, keza ji bo berdanê jî hin şertên din pêwîst in. Bi kurtasî bi vî awayî jina we nayê berdan.

438. Ma mafê pîrekê heye ku xwe berde?

Pirs: Di mesela îftidayê de eger jin û mêr li hev nekin û mêr di neberdanê de asê bibe, dê pîrek destûra berdanê ji kê bistîne?

Bersiv: Eger nîkaha wan a fermî hebe, dê pîrek serî li dadgehê bide. Eger ya resmî tune be, sirf nîkaha wan a dînî hebe, pîrek bi tena serê xwe nikare biryarê bide. Belbî divê ku serî li du hakimên ji aliyê zilam û pîrekê ve hatine diyarkirin, bide. Dema heyet jî gihîştin encam û baweriya ku êdî ew li hev nakin, dê mafê îftidayê ji pîrekê re were dayîn. Li gorî biryara hakiman, pîrek jî bi şertê ku mehra ji mêrê xwe

[527] Telaq, 65/1.

stendiye û temamê diyarî an jî hinekên wan lê vegerîne, dikare biryara veqetandinê bistîne. Piştî ku hakim û pîrekê biryara veqetandinê dan, êdî qebûlkirina mêr, ango riza mêr ne hewce ye.

439. Ma pîrek dikare mafê xweberdanê ji mêrê xwe bigire?

Pirs: Gelo di dema nîkahbirînê de pîrek dikare ji sê telaqan yekî ji mêrê xwe bigire û çi gava bixwaze wî bikar bîne?

Bersiv: Di pirtûkên fiqhê de derbas dibe ku mêr dikare mafê berdanê bide jina xwe. Encax Qur'ana Pîroz li hemberî vî tiştî ye. Di mezheban de mafê pîrekê yê "îftidayê" jê hatiye stendin û digel ku heqekî wan ê dayînê tune ye jî mafekî wiha dane pîrekê. Li gorî Qur'anê, telaq mafê zilam e û îftida jî mafê pîrekê ye. Yek ji wan mafan nakeve şûna yê din. Ji vê bonê, eger di dema nîkahê de mafê berdanê hatibe dayîn ji pîrekê re û wê jî ew heqê xwe bikar anîbe û xwe ji mêrê xwe berda be, ew telaq batil e. Ango berdan çênabe.

Mafê pîrekê yê îftidayê heye, ne yê telaqê. Dema pîrek biryar bide ku êdî bi mêrê xwe re nikare derbas bike, dê rayedaran ji meseleyê agahdar bike. Dema ew jî têbigihîjin ku pîrek li ser heqîyê ye, wê mafê îftidayê bidin pîrekê. Wê gavê, pîrek dê mehra ku ji mêrê xwe stendiye lê vegerîne û ji mêrê xwe biqete.

440. Ma pîrek dikare doza berdanê li zilamê ku li mala xwe ne miqate ye û erka xwe ya mêrantiyê neyîne cih, bike?

Pirs: Li gorî huqûqa Îslamê berdan çawa pêk tê? Eger mêr bê exlaq be û li malbata xwe ne miqate be, gelo pîrek dikare doza berdanê veke? Piştî berdanê parvekirina mal dê çawa bê kirin? Û malên ku piştî zewacê hatine bidestxistin dê çawa bên belavkirin? Rewşa zarokan dê çawa be û nefeqeyê wan dê were dayîn an na?

Bersiv: Li hember mêrê xwe, pîrek dikare doza berdanê veke. Nefeqeyên zarokan di stûyê bav de ye. Zarokên keç ji ber ku hewcedariya wan bêhtir bi diya wan heye, ya guncaw ku heta zewacê li ba diya xwe bimînin. Zarokên lawînî li ba bavê xwe dimînin. Pêkan e ku hûn bi awayekî din jî li hev bikin.

Di mijara mal de: Malê pîrekê, ji pîrekê re ye, yê zilam jî ji zilam re ye. Malên ku bi hevparî bikar tînin, ji zilam re ne.

441. Di meseleya îftidayê de, gelo çima pîrek divê ku mehrê li mêrê xwe vegerîne?

Pirs: Dema pîrek bi rêya îftidayê ji mêrê xwe diqete, çima tiştên ku jê girtiye, divê ku lê vegerîne? Ez hişmendiya vî karî meraq dikim.

Bersiv: Xwedê Teala ferman dike ku mirov beriya nîkahê mehra pîrekan bide wan û di dema zewacê de jî bicihanîna hemû îhtiyaciyên pîrekê xistiye stûyê zilam. Ev, ji bo zilam ji aliyê madî ve karekî pir giran e. Eger doza berdanê ji aliyê mêr ve bê kirin, zilam nikare qirûşekî jî ji mehra ku dayiye pîrekê jê bistîne. Ev, hukmê ayeta li jêr e:

"**Eger hûn bixwazin ku jinekê berdin û di şûna wê de jineke din bînin û we malekî pir dabiyê, vêca ji wî malî tiştekî nestînin. Ma hûn ê bi bêbextî û gunehkariyeke aşkere, jê bistînin?**

Digel ku hûn çûne nivîna wan û wan ji we peymaneke giran jî wergirtiye, ma hûn ê çawa ji wan bistînin."[528]

Lê, eger doza berdanê ji aliyê pîrekê ve hatibe vekirin û tu 'uzr û qebaheta mêr tune be, di vê rewşê de divê pîrek mehra ku ji mêrê xwe stendiye lê vegerîne.

Di vê mijarê de tiştekî ku neyê fêhmê tune ye. Eger ev şertê han tune bûna, dê hin pîrekan îftidayê ji xwe re bikirina rêya bidestxina mal. Bi zilamekî re dê

[528] Nîsa, 4/20-21.

bizewiciya, mehra xwe bistenda. Piştre bi rêya îftidayê jê biqetiya, bi yekî din re bizewiciya û ji wî jî mehr bistenda. Encax di îftidayê de vegerandina tiştê ku pîrekê ji mêrê xwe stendiye, ev deriyê han girtiye.

442. Pîreka ku bi rêya îftidayê ji mêrê xwe qetiya be, ma dikare dîsa pê re bizewice?

Pirs: Di dînê Îslamê de pîreka ku bi rêya îftidayê ji mêrê xwe qetiya be, ma piştre dikare bi mêrê xwe yê berê re bizewice?

Bersiv: Îftidaya[529] ku li gorî qayde û pîvanên ku di Qur'anê de derbas dibin hatibe kirin, bi şertê nîkaheke nû, pîrek dikare bi mêrê xwe yê berê re bizewice.

443. Dema pîrek doza berdanê veke, ma dê mal di navbera wan de çawa were parvekirin?

Pirs: Ji ber hin zehmetiyên min ên di kar de bi sedema ku min cihê xwe yê kar girtiye û ji aliyê aborî ve ez ketime hin arîşeyan, pîreka min dev ji mala xwe berda û çû. Ew, di nexweşxaneyekê de karê hemşîretiyê dike. Ji bo berdaneke Îslamî, divê ez çi bikim? Di fermiyetê de hîn me dev ji hev bernedaye. Digel ku min jê re got, eger tu venegerî malê ez ê te berdim, lê belê dîsa jî karê xwe ji xwe re dike hincet û venegeriya malê. Ez jî ji ber nexweşiya diya xwe, nikarim dest bi kar bikim. Du kurê me û xaniyekî ku berê me kirî bû –çaryeka pereyê wê pîreka min dabû– heye. Ji aliyê Îslamî ve parvekirina mal û rewşa zarokan divê çawa be?

Bersiv: Eger doza berdanê ji aliyê pîreka we ve bê kirin, tiştên we dayiyê hûn dikarin jê bixwazin. Lê belê eger hûn doz bikin, hûn nikarin tiştekî jê bistînin. Hûn ê di dema 'iddeyê de di heman malê de bimînin. Li gorî ku çaryeka pereyê xanî wê daye, çaryeka xanî malê wê ye. Zarok eger heft salî yan jî hîn mezintir bin û hûn ê

[529] Bi kurtasî îftida, ku pîrek mehra di dema nîkahê de ji mêrê xwe stendiye, li hember berdanê lê vegerîne.

bikaribin li wan binihêrin, ya munasib ku hûn wan bibin ba xwe. Eger rewşa dê munasib be, ew jî dikare li wan binihêre. Di herdu rewşan de jî dayik û bav kengî bixwazin dikarin zarokên xwe bibînin. Mesref û nefeqeyên zarokan bi giştî di stûyê we (bav) de ye.

444. Lîstina pîreka bi mêr li pêşberî zilamên biyanî, ma dibe sedem ji bo xerabûna nîkaha wê?

Pirs: Eger pîrekeke bi mêr di dawetê de li pêşiya zilamên biyanî govendê bigire û bilîze, gelo nîkaha wê ya dînî xera dibe yan na?

Bersiv: Lîstina pîrekan di hizûra zilamên biyanî de zirarê nade nîkaha wan. Agahiyeke bi vî awayî ne rast e. Lê belê lîstina pîrekên misilman li hember zilamên ku ji aliyê olî ve ji wan re xerîb in, teqez heram e. Lewra Xwedê Teala negotiye "zinayê mekin" belbî emr û fermana "**nêzî zinayê mebin**"[530] kiriye. Helwestên wiha xuya ye ku mirov nêzî zinayê dike. Eger lîstibe jî divê ku tobe bike û careke din karekî wiha meke.

445. Ma vekirina cihên mehrem tu bandorê li nîkaha pîrekê dike? Ango nîkaha wê betal dibe yan na?

Pirs: Pîrekeke bi mêr, gelo bi derketin û xuyabûna cihên wê yên mehrem di plajê de nîkaha wê xera dibe yan na?

Bersiv: Çi zewicandî çi jî ezeb, xuyakirin û tezîkirina cihên mehrem li hember zilamên ji aliyê dînî ve biyanî ne, heram e. Ev helwest, pîrekê dixe guneh. Lê tu eleqeya wê bi xerabûn û betalbûna nîkahê re tune ye. Ango nîkaha wê betal nake.

446. Eger mêr angaşt bike ku pîreka wî zina kiriye, divê çi bike?

Pirs: Zilamekî bi 4 şahidan serî li dadgehê dide, lê belê dîsa jî nikare îsbat bike ku jina wî zina kiriye. Di dawiyê de hakim bi wî zilamî sonda "laneta Xwedê li ser

[530] Îsra, 17/32.

min be" dide xwarin û berdana wan dipejirîne. Gelo di 'ilmê fiqhê de tiştekî wiha heye yan na? Eger hebe jî çi navî lê dikin?

Bersiv: Eger zilam, jina xwe bi angaşta ku zina kiriye sûcdar bike û nikaribe bi 4 şahidan bipeyitîne, di hizûra dadger de bi awayekî taybet dê herdu alî jî sond bixwin. Di Fiqha Îslamî de ji vê re tê gotin "lîan" ango lihevlanetanîn.

Di vê mijarê de Xwedê Teala wiha ferman dike:

"**Ji jinên we yên ku zinayê dikin, çar şahidan ji xwe (ji mêrên misilman) li ser wan rakin. Vêca eger wan li ser wan şahdeyî dan; heta ku mirina wan bê yan jî heta Xwedê ji wan re rêyeke çareseriyê veke, wan di malên wan de girtî bihêlin**."[531]

Xwedê Teala di sûreyê Nûr de wiha ferman dike:

"**Ew kesên ku zinayê biavêjin stûyê jinên xwe û ji bilî wan tu şahidên wan jî tune be, şahidiya her yekî ji wan ev e ku bi (navê) Xwedê çar caran sond bixwe ku ew ji rastbêjan e. Di cara pêncem de jî (ew dê bibêje:) Laneta Xwedê li wî be, eger ew ji derewbêjan be.**

Cezayê zinayê li dinyayê ji ser tê avêtin ku jin jî çar caran bi (navê) Xwedê sond bixwe û şahdeyî bide ku mêrê wê ji derewbêjan e. Cara pêncem jî (dê bibêje:) Xezeba Xwedê li wê bibare, eger mêrê wê ji rastbêjan be."[532]

Di vir de her sonda ku zilam "**Xwedê şahid e ku ez rast dibêjim**" dixwe, mîna şahidekî hatiye qebûlkirin. Zilam, vê sondê çar caran dubare dike û bi vî awayî hem sondên zilam dikevin şûna çar şahidan û hem jî cezayê "hedê qezfê" ango ji cezayê hedê bêbextiya zinayê, xelas dibe.

Gotina pîrekê "**Xwedê şahid e ku, mêrê min derewan dike**" mîna şahidekî hatiye qebûlkirin. Dubarekirina wê çar caran jî dikeve hukmê çar şahidan û ji cezayê

[531] Nîsa, 4/15.
[532] Nûr, 24/6-9.

zinayê xelas dibe. Bi vî awayî, şahdeyiya zilam çar caran û li hember wê şahdeyiya pîrekê dikevin ber hev. Û yeksan tên qebûlkirin.

447. Di huqûqa Îslamê de nefeqe û pêdiviyên zarokan li ser kê ye?

Pirs: Li gorî huqûqa Îslamê, zarokên ku dayik û bavên wan dev ji hev berdane, perwerde û mezinkirina wan di stûyê kê de ye?

Bersiv: Bidestxistin û temînkirina nefeqe di stûyê bav de ye. Mezinkirin û lênerîna zarokan jî mafê dê ye.

Temînkirina nefeqeyên zarokan -çi keç dibe çi jî kur-, di stûyê bav de ye. Di vî babetî de tu berpirsyariya dayikê, tune ye. Di halê ku bav tune be, wezîfa temînê di stûyê bapîr de ye, ev jî tune be di stûyê xizmên din de ye.

Eger zarok biçûk bin, heta mezin bibin û bigihîjin dema kar û xebatê, divê ku bavê wan li wan binihêre. Çespandina nefeqeyên wan dê li gorî temenê wan û dewlemendiya bavê wan, bê kirin. Eger kara bavê wan têrê bike, divê ku ji wan re xizmetkarekî jî bigire.

Zarokên keç, eger malekî wê ku têra wê bike tune be û ne bi mêr jî be, nefeqeyê wê di stûyê bav de ye. Çi ezeb dibe çi jî 'ide qedandibe ango jinebî be, ferq nake.

Mesrefên perwerdehî û hindekariya zarokan jî di stûyê bav de ye.

Kar, xebat û karê zarokan eger têrê wan neke, divê ku bav kêmasiyên wan temam bike.

Nefeqeya ku ji bo zarokan hatiye diyarkirin, li ba dê tê danîn. Eger bê tesbîtkirin ku dê nefeqe li zarokan xerc nake, ya dê nefeqe li ba yekî ewle bê dayîn û dê her sibe û êvara hindik hindik jê bigire yan jî wezîfa xerckirina nefeqeyê, dê ji yekî din re bê dayîn.

Hîdane, ku zarok ji aliyê yekî xwedîehliyet demeke aşkere ji bo mezinkirina wî bê stendin re tê gotin. Mezinkirina zarokê mafê dê ye. Lê belê ji aliyê huqûqî ve dê ne mecbûrê vê peywirê ye. Ango ji bo mezinkirin û lênerinê nayê mecbûrkirin. Lê eger yeke ku lê binihêre neyê dîtin, wê gavê dayik mecbûr e ku lê binihêre.

Piştî ku dê ji mêrê xwe bi rêya berdanê qetiya, dikare doza heqê hîdanê li mêrê xwe bike. Temîna kirêya xaniyê ku dê zarok lê bimîne di stûyê bav de ye. Eger bav tune be, xizmê wî yê herî nêz divê ku bide. Lê heke xaniyê dayikê yê taybet hebe û pêkan be ku li wê derê li zarokê binihêre, wê gavê nikare doza kirêya xanî bike.

Dema pîrek bi yekî re bizewice, mafê hîdanê ji destê wê derdikeve. Lewra di vî halî de guncawe ku li zarok heqaret bê kirin û zarok bêhuzûr bibe. Lê eger dayik, bi eqrebayekî zarok re zewicî be mîna apê wî, wê demê mafê dê dewam dike û ew heq jê nayê stendin.

Dema bi yekî biyanî re bizewice û ew kes nihêrtin û nefeqeyên zarokê qebûl bike, ne durist e ku mirov zarokan ji dê bistîne. Lewra pir caran, zirbav ji bo xatirê dayik û ji bo riza Xwedê Teala ji eqrebayên zarok baştir û çêtir lê dinihêre.

Zarokên lawînî heta bigihîjin dema ku êdî bikaribin karê xwe bikin, dê li ba diya xwe bimînin û piştî wê dê radestî bav bên kirin. Ev dem jî heta ku zarok bigihîjin temenê heft-heşt an jî neh sala ye. Di ‘emelpêkirinê de temenê heşta bingeh û esas hatiye girtin. Piştî vî temenî zarokên lawînî ihtyaciya wan bi bal mezinkirina mîna mêran ji ‘ilm û hunerê heye. Di vî babetî bav û bapîr bêhtir ehl in.

Zarokên keç, heta ku têkevin heyza an jî nêzî temenê balixbûnê bibin yanî heta ku bigihîjin temenê êdî bala zilaman dikişînin, dê li ba diya xwe bimînin. Piştî vî temenî, ji ber ku ihtyaciya wan bi parastina bav û bapirê wan heye, dê ji diya wan bên stendin.

Eger yek bixwaze ku zaroka xwe bigire û bibe cihekî din, dê dikare bibe asteng. Lewra di rewşeke wiha de mafê hîdanê tê binpêkirin. Lê çi dema ku bav bixwaze dikare zarokên xwe bibîne.

Piştî derbasbûna dema hîdanê jî dê kengî bixwaze dikare zarokên xwe bibîne. Yanî mafê mêr ê astengkirinê ji bo dîtina zarokê tune ye.

EWLADGIRTIN

448. Hukmê ewladgirtina zarokê/a hêj nû hatiye dinyayê çi ye?

Pirs: Ji aliyê Îslamî ve, hukmê ewladgirtina zaroka/ê hêj nû hatibe dinyayê çi ye? Gelo ew zarok dibe wekî zaroka mirov a rastîn û ew jî jê re dibin dayik û bav?

Bersiv: Di dema cahiliyê de li ba 'Ereban ewladgirtina zarokan, adetek belavbûyî bû û pir dihat dîtin. Zarok, mîna zarokê heman dayik û bavî dihat hesibandin. Dema ku bavê wî bimira jî dibû xwediyê mîrata mayî. Îslam ew rewşa han ji holê rakir. Xwedê Teala di Qur'ana Pîroz de wiha ferman dike:

"**…û zirkurên we jî ji we re nekirine wekî kurên we yên rastîn! Bi bavê wan gazî wan bikin. Ev, li cem Xwedê dadmendtir e. Vêca eger hûn bavên wan nizanibin, ew birayên we yên dîn û dostên we ne."**[533]

Di ola Îslamê de ewladgirtin hatiye qedexekirin. Lê mezinkikirina zarokên bêkes, pir bi xêr e. Lê belê, divê mirov pir bala xwe bide van tiştên li jêr:

1 – Divê zarok bizanibe ku ew kesên wî xwedî dikin û lê xwedî derdikevin ne dayik û bavê wî yên rastîn in.

2 – Piştî mirina wan, zarok nabe xwediyê tu mîratê, lê bi rêya wesiyetê zarok dikare pareke diyar ji mîratê bigire. Ew jî eger mîratxwerê mirî hebin divê wesiyet, ji sêyeka mal ne pirtir be.

3 – Pêwîst e ji bîr neke ku, ew yekî xerîb e û van kesan lênerîna wî dane ser xwe. Kur dibe yan jî keç dibe, tu cudatiya wan ji mirovên xerîb ên din tune ye.

Eger zarok hêj nû hatibe dinyayê were ewladgirtin û ji aliyê pîrekê ve were şîrdayîn, wê gavê pîrek dibe diya wê/î ya şîr. Di vê rewşê de xerîbtiya di navbera

[533] Ehzab, 33/4-5.

wan de herçiqas ne ji her aliyî ve be jî lê belê ji aliyê zewacê êdî tu xerîbtî di navbera wan de namîne û li hevdu heram dibin.

Xwedîderketina li zarokên bê dayik û bav û mezinkirina wan bi riayeta rê û rêbaza rast wekî ku me got, karekî pir mezin û bi xêr e. Di vî warî Pêxember (s.a.v) wiha ferman dike:

"*Ez û kesê li sêwiyekî binihêre û wî biparêze, di bihuştê de wekî tilîya şehdeyê û ya navîn em ê nêzî hev bin*.**"**[534]

449. Zarokên me çênabin ma caiz e ku em zarokekî ji xwe re bigirin?

Pirs: Zarokên me çênabin, birazîkî me heye. Em dixwazin di nufûsê de wî li ber navê xwe, tomar bikin. Heta temenekî xuyakirî, em ê behsa dayik û bavê wî yên rastîn jê re nekin. Zarok hîn deh mehî ye û piştî demekê ew ê bi xwe ji ber xwe ve, ji me re dest bi gotina bavê min û diya min bike. Gelo ev tiştê han caiz e?

Bersiv: Mezinkirin, nihêrtina li zarokên sêwî û yên bêkes û parastina mal û mulkê wan, çiqas bi xêr be, herwiha muamela nexweş bi wan re û xwarina mafên wan, ewqas guneh e.[535]

Di mijara perwerdehî û mezinkirina zarokên eqrebayên ku ji aliyê aborî ve bêhêz in ku ji bo wan bibe alîkar jî mirov dikare bi vî awayî bifikire. Lewra dema bapîrê Pêxemberê me (s.a.w) 'Ebdulmutallib wefat dike, apê wî Ebû Talib lênerîna wî digire ser xwe.

[534] Buxarî, Edeb, 24; Muslim, Zuhd, 42.

[535] Ji bo ayetên bi mijara sêwiyan re têkildar in bnh: Beqere, 2/83, 215; Nîsa, 4/6, 8, 10, 36, 127; En'am, 6/152; Îsra, 17/34; Însan, 76/8; Ma'ûn, 107/2.

Lê belê, çawa ku ewladgirtin ne caiz e, dajibîrkirina dayik û bavê zarok ên rastîn jî ne caiz e. Dînê Îslamê, ew saziya ewladgirtinê ya ku li ba 'Ereban bi awayekî belavbûyî hebû, ji holê rakiriye.

Xwedê Teala wiha ferman dike:

"**…û zirkurên we jî ji we re nekirine wekî kurên we yên rastîn! Bi bavê wan gazî wan bikin. Ev, li cem Xwedê dadmendtir e. Vêca eger hûn bavên wan nizanibin, ew birayên we yên dîn û dostên we ne."**[536]

450. Ma ji zirkur û zirkeçan re jî ji mîratê par heye?

Pirs: Pîreka ku zarokê wê çênebûbin û zarokê hewiya xwe li ber navê xwe qeyd kiribe, piştre ji mala bavê wê mîrat jê re bimîne, ji vî zarokî re jî mîrat dikeve yan na? Eger bikeve jî para wî çiqas e? An jî mîna zarokê ku bi ewladî hatibe girtin tê hesibandin?

Bersiv: Tu mafê wî zarokî di wê mîratê de tune ye. Lê eger hûn bixwazin tiştek ji mîratê bigihîje wî zarokî, bi rêya wesiyatê û bi şertê ku ji sêyeka mîratê ne pirtir be, hûn dikarin wesiyet bikin. Yê mayî ji mîratxwerên mirî re dimîne. Û ev jî heye: di dînê me de ewladgirtin, jixwe tune ye.

[536] Ehzab, 33/4-5.

BEŞA ÇAREM

- CÎHAD
- TÊKILIYA BI XEYRIMISLIMAN RE
- HEMWELATIYA DEWLETÊN EWRÛPA

CÎHAD

451. Ma Îslam dînê şer e yan jî dînê aştiyê ye?

Pirs: mirov dikare bibêje ku dînê Îslamê dînê şer û zordestiyê ye? Û gelo beşdarbûna Pêxember (s.a.w) digel pirên ceng û şeran, vê yekê nade nîşandan?

Bersiv: Têgeha Îslam, ji koka bêjeya "silm"ê ya 'Erebî hatiye çêkirin û di ferhengê de bi wateya "avakirina aştiyê", "xelasî", "serî daxistin", "teslîmbûn" û "dayîn"ê ye.

Vegotina dînê Îslamê, dînê şûr û zordestiyê ye, -bê ku mirov li sedem û encamên ceng û şerên ku Pêxember (s.a.w) kiriye bihizere-, tu esas û bingeh jê re tune ye.

Nirxandinên Muhemmed Hemîdullah ê ku di derbarê ceng û şerên Pêxember (s.a.w) berhemek nivîsandiye, pir balkêş in:

"Piştî têkoşîneke siyasî ku deh salan dewam kir û beriya ku wefat bike, wî îdara dewleteke ku nêzî du milyon metre kare bû, dikir. Ji bilî Uris, bi qasî mezinbûna Ewrûpa û zêdetir jî di vê demê de bi milyonan însan li ser wê erdnigariyê dijiyan, bi mirina 250 kesên ku di qada cengê de ji refê neyaran hatine kuştin, tê fetihkirin. Di encama wan deh salan de kuştiyên misilmanan, mirov dikare hesabê, ku di her mehekê de merivek şehîd ketiye (hatiye kuştin), bike. Hurmet û qîmeta ku ji bo xwîna însên hatiye dayîn, manandê wê di dîroka mirovantiyê de nayê dîtin."

Hamîdullah, hesabkirina jimara 250 kesên di ceng û şerên Pêxember (s.a.w) de ji neyaran hatine kuştin, bi spartina çavkaniyên dîrokî wiha rave dike:

"Li gorî Îbn Hîşam, Hezretî Pêxember (s.a.w) bi xwe li Medîneyê beşdarî 27 seferan (cengan) bûye, lê belê bi tenê di nehan de ceng pêk hatiye. Li gorî heman çavkaniyê, jimara seriyeyên ku ji Medîneyê dihatin birêvekirin, herçiqas ku pirên wan ne bi mebesteke leşkeri be jî seriyeyên di binê fermandariya sehabiyên

Pêxember (s.a.w) de yan jî yekîneyên leşkeri, 38 seriye ne. Bi sedema ku di derbarê hin ceng û seriyeyan de agahî di destê me de tune ne, jimara kuştiyên ku dê li jêr bê dayîn ne teqez in; digel vê jî di derheqê cengên wê demê de dê fikreke bi gelemperî bide me:

Ceng	Jimara dijminan	Kuştiyên dijminan	Artêşa Îslamê	Jimara şehîdan
Bedir	950	70	313	14
Uhud	3000	22	700	70
Mustaliq	200 (?)	10	30 (?)	1
Xendek	12000	8	3000	6
Xayber	20000	93	1500	15
Mu'te	100.000	?	3000	13
Fetha Mekkeyê	?	13	10.000	3
Huneyn	?	?	12.000	4
Taif (Dorpêç)	?	?	12.000	12
Bi tevahî		216		138

Jimara şehîdên ku li jor hatiye dayîn, ji bilî misilmanên ku li Recî û Bi'r Ma'ûne ku ji bo danasandina dînê Îslamê hatibûn şandin û jimara wan 44 kes bûne û bi xayintî hatine kuştin. Keza kuştiyê leşkerên ku di cenga Benî Qureyze bi dîlîtî

hatibûn bidestxistin û piştî cengê cezayê ku ji aliyê hekemê ku wan hilbijartibû û li gorî hukmê Tewratê li wan hatibû tetbîqkirin, ew jî ne tê de ne."[537]

452. Piştî hicretê, ma Misilmanan çima êrîşî karwanê Qureyşiyan kirin?

Pirs: Dibêjin piştî ku Pêxember (s.a.w) bi bal Medîneyê ve koç dike û li vir bi cih dibe, êrîşî karwanê ku diçe Mekkeyê dike û Qureyşî li ser vê yekê dest bi şerê bi misilmanan re dikin. Ev agahî gelo rast e? Di vî halî de tiştê ku xuya dike Pêxember (s.a.w) û hevalên xwe, di dema êrîşa li ser karwanê Qureyşiyan sûcdar in! Lê belê eger ev vegotinên han ne rast bin, piştî koçkirina bi bal Medîneyê ve bi kîjan sedeman misilmanan bi kafiran re ceng kirine?

Bersiv: Beriya her tiştî, dema mirov li ser mijareke dîrokî lêkolînekê bike divê ku meriv, bi tenê ne li gorî nûçekeyê belbî li gorî hemû sedem û encamên pêş û yên paşê mijarê mirov bûyerê binirxîne. Ev tişt pir girîng e.

Pêxember (s.a.w) û hevalên xwe sirf ji ber baweriya wan a dînî gef li wan dihatin kirin û mecbûr man ku dev ji welêt û hemû tiştên xwe berdin. Hinek ji wan ji bêçareyî diçin Hebeşîstanê (Etiyopya) û hin ên din jî bi bal Medîneyê ve koç dikin. Xelkê Mekkeyê bidestxistina malê misilmanan û biderxistina wan ji welatê wan nesekinîne, di heman wextê zor didan ên xwedî nufûz ji desthilatdarên Hebeşîstan û Medîneyê, da ku misilmanên penaber nehewînin.[538]

Di Qur'ana Pîroz de sînor û xetên sor ên têlilatiya bi xeyrimisliman re wiha hatiye ravekirin:

"Xwedê, qencî û edaleta bi wan ên ku ji bo dîn şerê we nakin û we ji welatê we dernaxin, li we qedexe nake. Xwedê ji edaletkeran hez dike. Xwedê li we qedexe dike ku hûn wan ên ji bo dîn şerê we kirin û hûn ji cih û warê we der

[537] Ji bo Agahiyên berfirehtir bnh: Muhammed Hamidullah**, Hazreti Peygamberin Savaşları,** çapa 4em, Weşanên Yağmur, Stenbol, 1991, rp. 21-22.
[538] Bnh: Îbn Hîşam, **Sîretû Îbn Hişam,** rp. 217 û piştî wê; Ehmedê kurê Henbel, **Musned**, IV/198.

xistin û ji bo deranîna we arîkarî kirin, ji xwe re bikin dost û arîkar. Kî wan ji xwe re bike dost û arîkar, vêca ha ew in ên stemkar."[539]

Li gorî ayetên Qur'ana Pîroz, di têkiliya misilmanan bi xeyrimisliman re sê xetên sor hene:

Ji bo dînê me bi me re şer bikin,

Me ji welatê me derînin,

Arîkariya wan kesên ku me ji welatê me derdixin, bikin.

Û aşkere ye ku xelkê Mekkeyê ev her sê xetên sor hemû bin pê kiribûn.

Musliman jî dema bi bal Medîneyê ve koç kirin, da ku ji aliyê aborî ve wan têxin bin tecrîdê, nedihiştin ku karwanên Qureyşiyan di herêma ku dibin desthilatdariya wan de ye derbas bibin û bi vî awayî ango bi qedexekirina derbasbûna karwanê Qureyşiyan, misilmanan bi heman helwestê bersiva ehlê Mekkeyê didan.[540]

Ji ber vê yekê riwayetên ku dibêjin misilmanan li Medîneyê êrîşî karwanê Qureyşiyan kir, ji aliyê huqûqa şer ve tiştekî normal e û divê normal bê dîtin jî.

453. Ma kuştina neyarên dînê Îslamê caiz e?

Pirs: Ji kesê misilman re kuştina kesên ku bi devkî yan jî bi nivîskî dev diavêjin Îslamê, ango dijminên dînê Îslamê, misyoner û yên nahêlin ku jinên bawermend serê xwe binixumînin, caiz e yan na?

Bersiv: Xwedê Teala di Qur'ana Pîroz de wiha ferman dike:

"Xwedê, qencî û edaleta bi wan ên ku ji bo dîn şerê we nakin û we ji welatê we dernaxin, li we qedexe nake. Xwedê ji edaletkeran hez dike. Xwedê li we

[539] Mumtehîne, 60/8-9.
[540] Bnh: Hamidullah, **Hazreti Peygamberin Savaşları**, rp. 56.

qedexe dike ku hûn wan ên ji bo dîn şerê we kirin û hûn ji cih û warê we der xistin û ji bo deranîna we arîkarî kirin, ji xwe re bikin dost û arîkar. Kî wan ji xwe re bike dost û arîkar, vêca ha ew in ên stemkar."[541]

Li gorî ayetê, ên ku sê xetên sor bin pê kirine, dê bi wan re herb bê kirin. Ango dema raste rast li hember me şer bikin, me ji warê me derxin an jî arîkariyê bidin wan. Ji bilî van, tu kesê kafir nayê kuştin. Rewşên ku we di pirsa xwe de rave kiriye, dikeve bin hukmê vê ayetê:

"**Hûn ê di mal û canê xwe de werin ceribandin. Misoger hûn ê ji wan ên ku beriya we kitêb ji wan re hatiye dayîn û ji wan ên ku ji Xwedê re hevpişkan çêdikin, pir gitinên birenc bibihîzin. Eger hûn sebir bikin û xwe biparêzin, vêca ha ew bi rastî ji karên mikûm î giran in.**"[542]

Li hember gotinên nexweş û li hember heqaretan, divê mirov bi sebir, tedbîr û bi biryar be. Ji bilî van helwestan, tu rêyeke din nahatiye nîşandan.

454. Ma Elmanya daru'l-herb e û pîrekên wan jî dikevin bin hukmê qerwaşan?

Pirs: Gelo Elmanya daru'l-herb e yan daru'l-kufr e? Li gorî vê, mirov dikare li Elmanyayê huqûqa qerwaşan tetbîq bike yan na?

Bersiv: Elmanya welatekî ku peymana aştiyê pê re hatiye kirin. Ango "daru'l-sulh" e û bi milyonan kesên misilman dikarin dînê xwe lê bijîn û 'îbadetên xwe lê bikin. Lewra daru'l-sulh, ji welatên ku peymana aştiyê bi wan re hatiye kirin re tê gotin. Lê belê eger daru'l-herb jî bê jimartin, bi tu awayî huqûqa qerwaşan lê nayê tetbîqkirin. Lewra Qur'an, hemû têkiliyên cinsî heta ya bi qerwaşan re jî dema bê nîkah be, qedexe dike.

---

[541] Mumtehîne, 60/8-9.
[542] Alî Îmran, 3/186.

Em tewsiya ku hûn pirtûka nivîskar Ali Rıza Demircan ya bi navê "**Kur'ân ve Sünnet Işığında Cariyeler ve Sömürülen Cinsellikleri**" ya di derbarê nêrîna dîn, di mijara sîstema qerwaşiyê de bixwînin.

Li aliyê din, ji bo agahiyên berfireh di derbarê mijarê de ji kerema xwe serî li navnîşanên jêr bidin:

http://www.fetva.net/goruntulu-fetvalar/peygamberimiz-doneminde-savas-esirleri-kolelestiriliyor-muydu.html

http://www.fetva.net/goruntulu-fetvalar/peygamberimiz-doneminde-savas-esirleri-kolelestiriliyor-muydu.html

455. Di êrîşbirina li ser Lîbyayê, divê helwesta kesê misilman çawa bûna?

Pirs: Mîna ku hûn jî dizanin, di van rojan de bi biryara Welatên Yekbûyî, li hember Libyayê êrîşek tê lidarxistin. Tê gotin ku dewletên misilman jî herçiqas ne yekser be jî arîkariyê didin vê biryarê. Di vir de bi lezgînî hewcedarî bi nêrîna zanyarekî heye. Seyda, pirsa min ev e: Cihekî ku daru'l-îslam be, herçiqas ji aliyê diktatorekî zordest jî bê îdarekirin, di êrîşbirina li ser dewleteke misilman, caiz e ku kesên misilman arîkariyê bidin xeyrimisliman? Di Qur'an û riwayetên ku ji Pêxember (s.a.w) hatine ragihandin, gelo ji bo tiştekî wiha tu mînak heye?

Bersiv: Piştî ku li hember desthilatdarên welatê Libyayê, li pirê deran pêlên serhildanê rû dan, rayedarên welêt tedbîrên tund girtin û helwestên di asta komkujiyê de nîşan dan. Welatên Yekbûyî, di serî de welatê Libyayê ku ji aliyê petrolê dewlemend e ji bo balafiran qada qedexekirî îlan kir û bi pêşengiya dewleta Emerîka bi balafiran êrîş birin ser Libyayê û ev jî bû sedem ji bo mirina pir kesên din. Ev biryara ku li ser daxwaziya dewletên "Yekdestiya 'Ereban" ya ku di civîna wan a li Misrê hate stendin, ji aliyê misilmanan ve bi tu awayî nayê pejirandin. Di rewşeke wiha de tiştê ku divê bihata kirin, ku mirov ew li hev bianina û aştî di navbera wan saz bikirana. Lewra Xwedê Teala wiha ferman dike:

"Eger ji bawermendan du kom şerê hev bikin, wan li hev bînin. Eger yek ji wan êrîşî a din bike, heta ku li hukmê Xwedê venegere hûn şerê koma ku êrîş kiriye bikin. Eger (ji êrîşkariya xwe) vegere, êdî bi edaletî nava wan çêkin û bi dadî hikum bikin. Bêguman Xwedê ji dadperweran hez dike. Bi rastî bawermend ji hev re bes bira ne. Nexwe navbera birayên xwe çêkin û ji Xwedê bitirsin da ku rehmet li we bê kirin."[543]

Di şûna ku mirov fermana Xwedê Teala bîne cih, mirov rabe tiştê ku Xwedê qedexe kiriye bike, bi rastî jî rewşeke pir xemgîn e. Di mijara têkiliya bi xeyrimisliman re Xwedê Teala wiha ferman dike:

"Ey Pêxember! Tu ji Xwedê bitirse û bi gotina kafir û munafiqan meke. Bêguman Xwedê zana ye, xwedîhikmet e.

Bide pey wehya ku ji cem Xwedayê te ji te re hatiye. Bêguman Xwedê ji ya ku hûn dikin agahdar e. Xwe bispêre Xwedê. Ji wekîltiyê ve, teqez Xweda besî te ye."[544]

[543] Hucurat, 49/9-10.
[544] Ehzab, 33/1-3.

TÊKILIYA BI XEYRIMISLIMAN RE

456. Ma di teblîxê de pîvan çi ye?

Pirs: Di van deman de hin misilman angaşt dikin ku oldarên ehlikitêb yên ku karên baş dikin, herçiqas bi Hezretî Muhemmed baweriyê neyînin jî dibe ku têkevin bihuştê. Ji bo vê angaşta xwe jî ayeta 162an ji sûreyê Beqere delîl tînin. Min li ser nêrînên we yên di vê mijarê de lêkolîn kir. Hûn dibêjin, da ku kesên wiha bikevin cenetê, divê ku teblîxa Qur'anê negihîştibe wan. Ez, mebesta we ji teblîxa Qur'anê meraq dikim. Ma pêwîst e ku bi berfirehî û bi awayekî kûr û hûr ji wan re bê ravekirin, an xwendina ayetên Qur'anê carekê bi tenê be jî kafî ye? Di vî zemanî de digel ku gihiştina bi bal hemû agahî û zanyariyan ve bi rêya kanalên medyayê bi awayekî hêsan pêkan e. Ez hebûna hin însanên ku hêj hayê wan ji Îslamê çênebûye fêhm nakim. Piştî êrîşa 11ê Îlonê, baweriya ku kesên dînê Îslamê hîn jî nebihîstine hene, gelek zehmet e. Eger hin kes, piştî nûçeyên di medyayê de derdikevin û dînê Îslamê bi awayê terorî didin nîşandan û digel vê jî misilman dibin û hinên din jî digel heman nûçe û xeberan rû dizivirînin, wê demê ma ev nabe pirsgirêka wan bi xwe? Ev însanên han bi sedema ku nûçe û xeberên neyînî di derbarê Îslamê de digirin, mirov dikare bifikire û ferz bike ku hîn teblîx negihîştiye wan û ji vê bonê dibe ku têkevin cenete? Di vê de pîvan çi ye?

Bersiv: Di Teblîxê de pîvan, ayetên Qur'anê bi zimanê ku fêhm dike bixwîne yan jî bibihîze. Kesên ku bi zimanê fêhm dikin, Qur'an nexwendibin an jî nebihîstibin, teblîx hîn negihîştiye wan. Agahdarbûna di derbarê Îslamê de bi rêya medyayê, ne kafî ye. Heta hûn dikarin gelekên seyda, xoce û hafizên ku Qur'anê jiber dixwînin jî tevlî bikin. Ev, ew kes in ku her roj Qur'anê dixwînin û nizanin ka çi dixwînin, ji xwe re dibêjin "divê wateya wê nizanibe, fêhm neke…" Belê, kesên wiha ji xweparastina ji şirkê û ji kirina rastiyên (fitrî) gerdûnî (mîna dadwer, rastgo be û hwd.) û ji xwedûrkirin û nekirina qedexeyên gerdûnî (mîna derew, zina, dizî û hwd.) berpirsyar in. Pîvan ev e.

457. Berpirsyariya kesên ku teblîxa Qur'anê negihîştibe wan çi ye?

Pirs: Berpirsyariya kesên ku teblîxa Qur'anê negihîştibe wan çi ye?

Bersiv: Berpirsyariya vî kesî, ku ji Xwedê Teala re hevpar û hevpişkan çêneke û bi rastiyên ku dizane 'emel bike. Her kes bi çavnêriya ku dike, hebûna Xwedê û yekîtiya Wî, mîna ku bi çavên xwe dîtibe û bi destên xwe girtibe têdigihîje û vî tiştî li hember Xwedê Teala îtiraf dike. Xwedê Teala wiha ferman dike:

"**Dema Xwedayê te ji pişta ademiyan zuriyeta wan girt û ew li ser wan kirin şahid (û ji wan re got): "Ma Ez ne Perwerdegarê we me?" Hemûyan gotin: "Belê, em şahdeyiyê didin Tu Perwerdegarê me yî." Ev, da ku roja qiyametê hûn nebêjin em ji vê bêhay bûn.**

Yan jî da ku hûn nebêjin: Bav û bapîrên me ji Xwedê re hevpişk çêkiribûn. Em jî nifşekî ku di pey wan re hatibûn. Ma êdî ji ber kiryara rêşaşan Tu yê me helak bikî? Ha bi vî awayî Em ayetên xwe bi berfirehî aşkere dikin, da ku ew vegerin."[545]

"**Girtina zuriyetê ji pişta ademiyan**", girtina tovê ku zuriyet pê dewam dike. mirov bi wê dikeve çaxa balixbûnê û digihîje temenekî ku êdî zarokên mirov çêbibin. Însan di dema zarokatiya xwe de li Xwedê Teala digere. Di vê mijarê de ji derdora xwe gelek pirsan dike. Di dawiyê de bi gîştî têdigihîje ku Xwedê Teala heye û Yekta ye. Bi delîl û nîşanên ku tên pêşberî wî, mîna ku Xwedê Teala jê pirsîbe "**Ma Ez ne Perwerdegarê te me**?" Wî jî bi biryereke vebirî gotibe, "**Belê, ez şahdeyiyê didim tu Perwerdegarê min î**."

Meriv li derdora xwe çiqas çavnêriyê bike, dê rewşên mîna vê dubare bibin. Ji vê bonê her meriv, têdigihîje ku Xwedê heye û Yekta ye. Qebûl dike ku di her tiştî de ji Xwedê re deyndar e û lazim e li ser ku ji Wî re bendeyiyê bike.

---

[545] E'raf, 7/172-174.

Piştî vê, mirov yan rasterast an jî ne yekser, ji Xwedê re bendeyiyê dike. Bendetiya yekser bo kesê ku doza pêxemberekî negihîştibê, mirov li gorî qanûnên Xwedê Teala yên di xwezayê de danîne ango li gorî rastiyên gerdûnî (marûfê) ên ku li her derê rast tên qebûlkirin tev bigere. Ha ev, ên li ser rêya rast in.

Hinên din jî li gorî rastiyên xwe tev digerin; pêşanî û ewlewiyetê didin berjewendiyên xwe û bi piranî didin şopa bav û bapîrên xwe. Herçiqas nekeve serê wan jî li dijî dernakevin.

Gerdûn, berhema ku Xwedê Teala ew afirandiye; tiştên ku pêxemberan aniye jî berhem û pirtûkên ku Wî ew hinartine. Nirxên gerdûnî û zanistî ji berhema ku Xwedê Teala afirandiye tên girtin. Di berhem û pirtûkên hinartiye de jî qanûn û zagonên wan, veşartî ne. Ji pirtûkên Xwedê nusxeya herî dawî Qur'an e. Xwedê Teala wiha ferman dike:

"**Bêguman Me tu, digel heqiyê (bi Qur'anê) mizgînber û hişyarker şandî. Tu miletek tune ye ku hişyarkerek ji bo wan nehatibe.**"[546]

Li gorî ku ji her milet û gelî re qasidek hatiye şandin, pêkan e ku mirov di bingeh û esasên her ol û dînên heyî de teblîxa qasidekî bibîne. Lê belê însanan, piştî pêxemberan di lêanîna wî dînî li gorî xwe, serfiraz bûne. Di serî de lijneyeke ji zilamên dîn pêk anîne, piştre ew kirine heyinên rûhanî ku berî Xwedê Teala -bê tu şert û mercî- ji wan re serî tê tewandin. Zilamên dîn jî hem ji bo ku xwe bikin kesên pîroz hem jî da ku xwestinên xwe mîna daxwazên Xwedê Teala nîşan bidin, ev heyînên han li cem Xwedê kesên mîna xwedîrûmet nîşan dane û gotine ku divê mirov bi navgînî û rêya wan, xwe bigihîne Xwedê Teala.

Ne pêkan e ku ev doz û angaşta han tu esas û binyadek jê re hebe. Ne ji ber ku ev rast in, belbî bi bandora derdor û pevneşopiyê, mirov xwe bi van baweriyan digire. Bi vî awayî pêwendî û eleqeya wan a bi Xwedê Teala re xera dibe. Dibin

[546] Fatir, 35/24.

kesên ku azadiya xwe firotine van kes û saziyan. Bi sedema ku di çêkirina hevpişkan ji Xwedê re tu kes nikare uzur û hinceteke mafdar ji xwe re bibîne, roja qiyametê dê nikaribin vê gotinê bibêjin:

"**Bav û bapîrên me ji Xwedê re hevpişk çêkiribûn. Em jî nifşekî ku di pey wan re hatibûn. Ma êdî ji ber kiryara rêşaşan Tu yê me helak bikî?**"[547]

Pêxemberan ji mirovan re gotine ku "**Ji bilî Xwedê ji tu kesî re bendeyiyê nekin**." 'Îbadetkirina ji bilî Xwedê re tê wateya ku mirov ji bilî Wî re bibe dîl û bende. Ev jî azadiya mirov ji holê radike.

Xulasa dîn, bawerî ye. Bingeh û binyada baweriyê jî ku mirov ji dil qebûl bike. Ango bi dil tesdîq bike. Tesdîqa bi dil jî bi tenê Xwedê û kesê bawer dike dizane. Cihê ku mirov herî zêde tê de azad e, ev der e. Ji vê bonê çi ji bo pejirandin çi jî bo mandelkirina baweriyekê be, zor li mirov nayê kirin. Lewra Xwedê Teala wiha ferman dike:

"**Di dîn de zordarî tune ye![548] Bi rastî serwextî (ya di dîn de) ji rêşaşiyê hatiye kifşkirin. Naxwe kî ku Taxûtî înkar bike[549] û bi Xwedê baweriyê bîne, teqez wî xwe bi qulpa saxlem (û asê) girtiye ku qetandin jê re nîn e. Xwedê bihîzer e, zana ye**."[550]

Erka herî esasî ji bo kesê ku teblîxa pêxemberekî negihîştibê, ku hewl bide û têbikoşe da ku bi tenê ji Xwedê re bibe bende. Xwedê Teala wiha ferman dike:

---

[547] E'raf, 7/173.

[548] Xulasa dîn, bawerî ye. Bingeha baweriyê qebûlkirina ji dil ango tesdîqkirina bi qelb e. Rastdêrana dil jî bi tenê mirov û Xwedê pê dizane. Ew der, cihê herî azad e bo meriv. Ji vê bonê li tu kesî kotekî nayê kirin bo pejirandin an jî mandelkirinê. 'Îbadet jî bi zorê nabe. Lewra di 'îbadetan de niyet şert e. Cihê niyetê jî dil e. Niyeta ku ji dil neyê kirin ne meqbûl e. Ji ber ku niyet bi zorê nayê pêkanîn, 'îbadet jî nayê kirin.

[549] Li ber ên ji rê derketine, serî natewîne.

[550] Beqere, 2/256.

"**Bêguman Xwedê şirkê nabexşîne, ji bilî vê ji bo kesê ku bexşandin heq kiribe, wî dibexşîne**."[551]

Delîl û nîşanên hebûn û yekîtiya Xwedê li her derê bê jimar in, lê ji hevpar û hevpişkan re tu delîl tune ne. Loma kesê ku aqil û ramanê xwe bikar tîne, tu carî nakeve vê herî û avzêyê. Kesê fikir û ramanê xwe bikar nayine, herçiqas perwerdehiyeke baş ya Îslamî dîtibe jî nikare xwe ji pîsî û qirêja şirkê rizgar bike. Lewra "(Xwedê) wê pîsiyê diavêje ser wan ên ku aqilê xwe bi kar nayînin."[552] Ji vê bonê çi teblîx gihîştibe mirov çi jî negihîştibe, gunehê ku Xwedê Teala nabexşîne, gunehê şirkê ye.

458. Gelo kirinên xeyrimisliman ên baş, dê çawa be? Ma dê fêdeyê bide wan?

Pirs: Ez dixwazim mijara kesên xeyrimuslim li gorî jiyana xwe bi bihuştê bên xelatkirin an jî bi dojehê bên celatkirin, bipirsim. Ango xeyrimuslimê ku başî kiriye û yê nebaşî kiriye, ma dê wekhev bin?

Bersiv: Pîvana xelatkirina bi bihuştê û celatkirina bi dojehê, bawerî û îman e. Kesê Xwedê Teala mandel bike, jê re hevparan çêbike -kî dibe bila bibe-, hemû karên wî yên baş vala diçin û bi tu awayî dê nekeve bihuştê. Ayeta bi mijarê re têkildar wiha ye:

"…**Kî ku îmanê înkar bike, bêguman kirinên wî pûç dibin; ew li axretê dibe ji yên ku xesirî ne**."[553]

"**Çi kesê jiyana dinyayê û xemla wê bixwaze, Em ê bêkêmasî, beranberî karên wan li dinyayê bidin wan û li dinyayê tiştek li wan nayê kêmkirin, lê belê ji**

[551] Nîsa, 4/48.
[552] Yûnus, 10/100.
[553] Maîde, 5/5.

bo wan li axretê ji êgir pê ve tiştekî din tune ye û ya ku wan li dinyayê kir berhewa çû û hemû karê ku wan kir pûç û betal bû.”[554]

“Ew ên ku ayetên Me û hatina axretê derew dêran, kirinên wan pûç bûne. Ma ji kirinên ku wan (li dinyayê) dikirin pê ve ew li gorî çi têne cezadan.[555]

“Ne layiqî muşrikan e ku ew mizgeftên Xwedê ava bikin, digel ku ew bi xwe jî şahdehiya bi kufrê li ser xwe didin. Kar û kiryarên wan pûç bûne, ew ê her û her di êgir de bimînin.”[556]

“Bibêje: Ew ên ku di karê xwe de herî zêde ziyan kirine, ma em ji we re bibêjin?

Ew ên ku kar û xebata wan li jiyana cîhanê pûç bûye. Hal ev e wan hizir dikir ku ew karekî qenc dikin.

Ji ber ku wan, ayetên Perwerdegarê xwe û çûna hizûra Wî mandel kirin; xebata wan bêhude çûye. Vêca roja qiyametê Em ji bo wan tu teraziyê danayinin.

Ev wisa ye. Bi sedem ku wan bawerî neanî cezayê wan dojeh e. Wan tinazên xwe bi ayet û qasidên Min kirin.”[557]

“Sond be, bi bal te û bi bal pêxemberên beriya te ve jî ev rastî hatiye wehîykirin: Eger tu ji Xweda re şerîkan çêbikî, karên te dê pûç bibin û tu dê bibî ji yên xesirî.

Naxêr, tu bes ‘îbadeta Xwedê bike û bibe ji spasdaran.”[558]

“Herçî ew ên ku kafir bûne, riswatî û şermezarî ji wan re be. Xwedê kirinên wan pûç kirine.

---

[554] Hûd, 11/15-16.
[555] E‘raf, 7/147.
[556] Tewbe, 9/17.
[557] Kehf, 18/103-106.
[558] Zumer, 39/65-66.

Ev jî ji ber ku wan ji tiştên ku Xwedê (ew) nazil kirine hez nekirine. Xwedê jî 'emelên wan pûç kirine."[559]

"**Bêguman ew ên ku bawerî neanine û rêya Xwedê li ber xelkê girtine û piştî ku hîdayet ji wan re diyar bûye, dijraberiya pêxember kirine, ew ê tu zirarekê negihînin Xwedê. Xwedê, dê kirinên wan pûç bike**."[560]

Lê belê, çi dibe bila bibe kesê ku teblîxa Pêxember negihîştibê, dema baweriya wî bi Xweda û bi roja axretê hebe û tu hevpar ji Xwedê Teala re çênekiribe û piştî vê karên baş kiribe, mafê ketina bihuştê dê bidest bixe.

459. Meriv dikare ji xeyrimuslimê ku ji mirovahiyê re tiştên bi feyde kiriye re rehmê bixwaze?

Pirs: Bi sedem kar û tevgereke zanistî kiriye, gelo mirov dikare ji kesê xeyrimuslim re dua bike û bibêje "Xwedê jê razî be." Wekî din jî tê gotin ku karê kesên xeyrimisliman -ên ji mirovahiyê re bi feyde ne-, li cem Xwedê Teala tu nirxek ji wan tune ye. Gelo ev rast e?

Bersiv: Kesên ku mirov bizanibe ne li ser îmanê jiyana xwe ji dest dane, ne durist e mirov ji wan re rehmê bixwaze. Ev li gorî ayeta jêr hatiye qedexekirin. Xwedê Teala wiha ferman dike:

"Ji Pêxember û bawermendan re ne durist e ku ji bo muşrikan lêborînê bixwazin -çendî ew xizmên wan jî bin- piştî ku ji wan re diyar bû ku ew xelkê dojehê ne."[561]

Duaya ji xeyrimuslimên ku ji bo mirovahiyê karên bi feyde kirine, ku mirov hîdayet û rasterêbûna wan bixwaze. Ango mirov dikare ji bo wan wiha dua bike: "Xwedê hîdayetê bike nesîbê wî/wan."

---

[559] Muhemmed, 47/8-9.
[560] Muhemmed, 47/32.
[561] Tewbe, 9/113.

460. Kesên, ne ji malbateke misilman tên dinyayê ma bextreş in?

Pirs: Elhemdûlîllah, em ji malbeteke misilman hatine dinyayê û ji vê bonê me dînê Îslamê jî qebûl kiriye. Lê kesên ne misilman tên dinyayê, gelo neheqiyek li wan nayê kirin?

Bersiv: Naxêr, neheqî li wan nayê kirin. Lewra, pir tiştên ku em jê berpirsyar in, ew jê ne pirsyar in. Tiştên ku ew jê berpirsyar in; ji Xwedê Teala hevpişk û hevparan çênekin û tiştên ku xweza û fitreta însên wan baş dibîne, bikin. Tiştên xerab û nebaş jî dibînin, nekin. Lê belê ji tiştên ku encax ji pêxemberekî tên hînkirin, ne berpirsyar in. Gava doz û dawa pêxemberekî gihîşt wan, divê bidin pey wê dozê.

461. Ma Filehan diya me Meryem jî ji xwe re kirine îlah?

Pirs: Di ayeta 116an ji sûreyê Maîde, tê ragihandin ku Hezretî Meryem jî îlah hatiye gerandin. Tiştê ku ez dizanim Fileh, sirf ji Hezretî Îsa re bendeyiyê dikin. Gelo bera ku Hezretî Meryem kirine îlah kîjan e?

Bersiv: Filehan di sala 431ê di Konsîla Efesê de ev biryar girtine:

"Îsa, kesayeta xwe bi bedeneke ku bi ruhê xwedan aqil hatiye vejinandin kiriye yek û bûye însan. Dayik Meryem jî bi wateya xwe ya rastîn Dayika Xwedê ye."[562]

Xuya ye ku dayika Xwedê jî -haşa-dê xweda be!

Li gorî Katolîkan, "Dayiktiya wê neqediyaye. Bi navgîniya wê ya ku dubare dibe, diyariyên ku bextewariya ebedî garantî dike, hîn jî berdewam e. Di Kilîseyê de ji dayika Meryemê re dibêjin parêzger, alîkar, ya bi bal alîkariyê ve dibeze, ya navberiyê dike."[563]

[562] **Katolik Kilisesi Din Ve Ahlak İlkeleri**, wergêr: Dominik Pamir, Stenbol 2000, paragraf: 467.
[563] **Katolik Kilisesi Din ve Ahlak İlkeleri**, paragraf: 969.

Ew bi van gotinên xwe, Meryemê dikin îlah/xweda. Xwedê Teala dê rojekê wiha bibêje:

"**Ey Îsayê kurê Meryemê! "Ma te ji mirovan re got ku min û dayika min di navbera xwe û Xwedê de du îlah wergirin?" (Îsayê kurê Meryemê) dê wiha bibêje: "Haşa! Ez Te ji hemû kêmasiyan pak didêrim. Ya ji min re ne durist be, ne heqê min e ku ez bibêjim. Eger min ew gotibe, bêguman Tu pê dizanî. Tu ya di dilê min de dizanî û ez ji nihêniyên Te tu tiştî nizanim. Bêguman her Tu yî zanayê bi ya nediyar û nihênî. Bi tenê tiştê ku Te emrê min pê kir, min ji wan re got: ku ji Xwedayê ku Perwerdegarê min û Perweredegarê we ye bi tenê re bendetiyê bikin. Heta ku ez di nav wan de bûm, ez li ser wan zêrevan bûm. Çi gava Te ez mirandim, êdî Tu li ser wan çavdêr bû. Jixwe Tu li ser her tiştî bîner î.**"[564]

462. Meriv dikare bi Fileh û Cihûyan re hevkariyê bike?

Pirs: Digel ku Xwedê Teala di ayetan de her tişt rave kiriye, da ku kar û barê mirov ên cîhanê birêve biçin, bigihîje armanc û hedefên xwe, mirov dikare bi Cihû û Filehan re hevalbendiyê bike? Ji bo xweşekiyan mirov dikare fetwayê bide? Di derbarê rewşa misilmanên ku xwe bi bombeyan dikujin de hûn çi bersivê didin?

Bersiv: Bi Cihû û Filehan re hevalbendî tê kirin. Tu ayet û hedîseke ku vê yekê qedexe bike tune ye. Pêxemberê me (s.a.w) dema tê Medîneyê, bi danîna peymanê bi Cihû û muşrikan re -bi hev re- derfeta birêvebirina bajêr bi dest dixe.

Fetwadayîna bo xweşekiya hin kesan, tê wateya ku mirov dînê Xwedê ji arzû û hewesên xwe re bike alet. Ji lewre berpirsyariya vê jî pir giran e.

Fedakirin û xwekujiya kesê misilman bi rêya xwebombekirinê, helwesteke ku kitap û sunet wê rast nadêre. Fetwayên ku di vî warî de hatine dayîn, tu piştekeke saxlem ji wan re tune ye. Ev tiştek e, lê nîşandana van kesên -ku dîn û warê xwe

[564] Maîde, 5/116-117.

diparêzin- wekî teroristan tiştekî din e. Helwesta nîşandan û dîtina wan mîna teroristan, bi tu awayî nayê pejirandin.

463. Ma Cihû, ji zikmakî lanetkirî ne?

Pirs: Ma Cihû ji zikmakî lanetkirî ne? Ango zarokên Cihûyan ji zikmakî di ziyanê de ne?

Bersiv: Tiştekî bi navê bi awayê lanetkirî ji dayikbûnê tune ye. Lewra berpirsyarî ji dema balixbûnê dest pê dike. Beriya vê demê, ji aliyê olî ve mirov ne berpirsyar e. Lê belê tercîh û hilbijartina mirov ya piştî balixbûnê, dê diyar bike ka mirov musteheqê rehmê yan jî lanetê ye. Dema mirov li ser ayetên di derbarê lanetê de ne hûr bifikire, dê bibîne kesên lanet li wan bariya ye – ku pirê wan ji Cihûyan in-, ew lanet ne ji zikmakî belbî bi sedem kirinên wan li wan bariyaye. Evê ayeta han, vê yekê dide nîşandan:

"Ji zaroyên Îsraîl ew ên ku kafir bûne, li ser zimanê Dawûd û Îsayê kurê Meryemê lanet li wan hatiye barandin. Ev jî bi sedem ku (li ber fermana Xwedê) serî hildan û zêdegavî dikirin."[565]

Mîna ku ji vê ayetê tê fêhmê, tu kes ji zikmakî bi awayê lanetkirî nayê cîhanê. mirov dema digihîje çaxa balixbûnê, eger tercîha xwe di aliyê kufrê de bikar bîne, ha wê gavê laneta Xwedê lê dibare.

Xwedê Teala wiha ferman dike:

"**Bêguman ên ku ew ayetên Me hinartine û ew rêya rast a ku piştî Me di vê kitêbê de ji mirovan re aşkere kir vedişêrin, Xwedê li wan lanetê dibarîne û yên lanetkar jî lanetê li wan dibarînin.**

Tenê wan ên ku tobe kirin, xwe sererast kirin û ew aşkere kirin ji lanetê xelas bûne. Ez tobeya wan qebûl dikim û Ez im her yê tobepejrên, yê dilovîn.

[565] Maîde, 5/78.

Bêguman ew ên ku kafir bûne û li ser kufrê mirine, laneta Xwedê, firîşte û mirovan tev li ser wan e!

Ew ê heta bi hetayê di nav lanetê de bimînin. Ne ezab ji ser wan tê sivikkirin ne jî li rûyê wan tê nêrîn."[566]

Li gorî vê ayetê, kesê ayetên Xwedê Teala veşêre çi misilman çi jî ji dînekî din be, duçarî laneta Xwedê dibe.

464. Ma divê em bijartina Cihûyan ya li ser aleman çawa fêhm bikin?

Pirs: Xwedê Teala di çend ayetan de xwe bi awayê "Perwerdegarê alemê" diwesifîne. Lê belê di ayeta 47an ji sûreyê Beqere bangî Cihûyan dike û wiha ferman dike: "Gelî zaroyên Îsraîl! Qenciya Min a ku Min li we kiribû bînin bîra xwe. Min hûn (demekê) di ser aleman re girtibûn." Gelo îfadeya aleman ya di "Perwerdegarê alemê" û "aleman" ya ku di vê ayetê de derbas dibe heman tişt e. Ma rast e ku Cihû di ser her kesî û her tiştan de hatine girtin?

Bersiv: Alem, ji kok û jêderka "ilm"ê hatiye avakirin. Ev bêje bi wateya rêç û şopa ku hebûna tiştekî nîşan dide, elamet û îşaretê ye. Her tiştê ku hebûna Afirîndêr dide nîşandan, alem e. Ji ber vê yekê "**Perwerdegarê alemê**" bi wateya "**Perwerdegarê hemû heyinan**"e.

Bêjeya alemê ya di ayeta 47an de ji sûreyê Beqere ya di derbarê Cihûyan de derbas dibe, mebest jê cureyê mirovan e. Gotina "**Min hûn di ser aleman re girtibûn**", tê wateya ku Xwedê ji nav hemû însanan bi şandina kitêb û pêxemberan ew hilbijartin û ew di ser aleman re girtin. Ne ku ev îfade tê wateya ya ku heta qiyametê ew di ser her tiştî û her kesî re hatine girtin.

[566] Beqere, 2/159-162.

465. Cihûyê ku dixwaze bibe misilman, ma divê pêşî bibe Fileh?

Pirs: Min bihîst ku Cihûyê dixwaze bibe misilman divê berê bibe Fileh û piştre bibe misilman. Gelo ev tişt rast e? An jî yekser dikare bibe misilman?

Bersiv: Ev tiştê han, teqez ne rast e. Çi Cihû be, çi mensûbê dînekî din be heta çi jî bêdîn û ateîst be, kesê biryar da di heman gavê de û yekser dikare bibe misilman. Gotina divê di serî de bikeve dînekî din û piştre bibe misilman, tu esil û binyadek jê re tune ye.

466. Ma Tewrat hatiye guhertin?

Pirs: Cihû, li gorî ayetên 43-44an ji sûreyê Maîde angaşt dikin ku Tewrat nehatiye guhertin. Em jî nikarin bersiva wan bidin digel ku em dizanin di hundirê Tewratê de di derheqê pêxemberan de hin tiştên ku nayên qebûlkirin hene. Di vê babetê de hûn çi dibêjin?

Bersiv: Ayetên 43-44an ji sûreyê Maîde nadin îfadekirin ku Tewrat bi gişt hatiye parastin. Ayetên têkildar wiha ne:

"**Digel ku Tewrat li cem wan e û hukmê Xwedê tê de heye, ew çawa te dikin hekem û dûvre pişta xwe didinê! Ev, ne kesên bawermend in. Bêguman Me Tewrat nazil kiriye. Tê de serwextî û ronahî heye. Pêxemberên ku radestî Xwedê bûne, di nav Cihûyan de bi wê hikum didan. Zana[567] û zahidan jî bi tiştên ji kitêba Xwedê hatibû parastin hikum didan. Ew li ser vî hukmî şahid bûn. Ji xelkê netirsin; ji Min bitirsin. Ayetên Min bi nirxekî hindik nefiroşin. Kî bi ya ku Xwedê nazil kiriye hikum nede, vêca ew her kafir bi xwe ne**."[568]

[567] Ji tu mirovî re - piştî ku Xwedê kitêb, hikmet û pêxemberî dayê- ne pêkan e ku ji mirovan re bibêje: "Dev ji Xwedê berdin û ji min re bibin bende!" Lê belê (ji wan re dê wisa bibêje:) "Bi sedem hûn kitêbê didin hînkirin û wê dixwînin, sirf ji (Xwedê) re bibin bende." (Alî Îmran, 3/79).
[568] Maîde, 5/43-44.

Eger mirov bala xwe bidê, di ayeta 43an de "**hukmê Xwedê tê de heye**", di ayeta 44an de "**tê de serwextî û ronahî heye**" hatiye fermankirin. Ev herçiqas hatibe guhertin jî dîsa jî didin nîşandan ku di Tewratê de hîn jî hin hukmên ku hatine parastin hene. Îfadeyên mîna vê di ayeta 46an de di derbarê Încîlê de jî hatine bikaranîn. Lê belê ji bo temamê Qur'anê "**ew rêberê hîdayetê ye**", "**ew ronahiyek e**" hatiye fermankirin.[569] Ev îfade û yên berê ne mîna hev in. Ayetên din ên didin zanîn ku kitêbên berê hatine tehrîfkirin vê yekê rave dikin.

Xwedê Teala di pir ayetan de Cihû vexwandine bal ku ehkamên Tewratê bi cih bînin, lê wan xwe nedaye ber vê yekê. Lewra eger Cihû bi wateya rastîn ehkamên Tewratê bi cih bînin, divê ku bi Qur'anê û bi Pêxemberê me (s.a.w) bawerî bînin. Xwedê Teala wiha ferman dike:

"**Bibêje: Gelî yên ehlikitêb! <u>Hûn ne li ser tu tiştî ne heta ku hûn birastî û duristî Tewratê, Încîlê û ji tiştê ku ji cem Perwerdegarê we ji we re hatiye hinartin (Qur'anê) bicih neyinin</u>. Sond be, Qur'ana ku ji cem Perwerdegarê te ji te re hatiye şandin, dê kufr û çavsoriya pirên wan zêde bike. Nexwe tu ji bo wan xemgîn mebe."**[570]

Ev ayetên han jî didin nîşandan ku ne sirf bi Tewratê, belbî divê bi kitêb û pêxemberê me jî baweriyê bînin. Eger wisa nekin, ew ne li ser rêya rast û hîdayetê ne. Xwedê Teala wiha ferman dike:

"**Gotin: "Bibin Cihû yan jî Fileh, hingê hûn ê bi ser rêya rast ve bibin." Bibêje: "Naxêr, em ê bidin pey dînê Îbrahîm ku ew ji baweriyên xelet parastî bû û ew ne ji muşrikan jî bû."**

Bibêjin: "Me bi Xwedê û bi ya ku ji me re hatiye hinartin, bi ya ku ji Îbrahîm, Îsmaîl, Îshaq, Yaqûb û neviyên wî re û bi ya ku ji Mûsa û Îsa re û bi ya

[569] Bnh: Nîsa, 4/174; Maîde, 5/15.
[570] Maîde, 5/68.

ku ji pêxemberên din re ji cem Xwedayê wan hatiye hinartin, bawerî anî. Em tu ferqiyê naxin navbera yekî ji wan û em ji Xwedê re radest bûne."

Eger ew jî mîna we bawerî bînin, vêca ew hatine ser rêya rast. Na! Eger ew berê xwe biguherînin, ew her di rêşaşiyê de ne. Êdî Xwedê li hember wan besî te ye. Yê bihîzer ê zana her Ew e."[571]

Qur'ana Pîroz li ser Tewrat û Încîlê ya îroyîn xwediyê gotina dawîn e û ji bo wan pîvan e. Eger hukmên di wan de bi yên di Qur'anê de li hev bên û muwafiq bin, em ê wan qebûl bikin. Lê belê eger li dijî yên Qur'anê bin em wan nagirin. Ayeta ku serdestiya Qur'anê li hember kitêbên din dide ragihandin wiha ye:

"**Me kitêb (Qur'an) bi bal te ve bi heqî hinart ku ew ji bo kitêbên beriya xwe rastdêr e û li ser wan çavdêr e. Êdî li gorî tiştê ku Xwedê hinartiye di navbera wan de hikum bide. Di şûna heqiya ku ji te re hatiye nede dûv hewesên wan. Me, ji bo her yekî ji we şerî'et û rêbazek daniye. Eger Xwedê bixwesta**[572] **dê hûn tev bikirina yek umet. Lê belê da ku bi tiştê ku daye we, we biceribîne. Nexwe di qenciyê de pêşbirkê bikin. Vegera we hemûyan bi bal Xwedê ve ye. Ew ê ji ya ku hûn tê de bi hev ketibûn, we agahdar bike**."[573]

467. Digel ku lanet li Cihûyan hatiye barandin çawa dibin hêzeke navnetewî?

Pirs: Li gorî ayeta 64an ji sûreyê Maîde, ji aliyê Xwedê Teala ve lanet li Cihûyan hatiye barandin. Lê belê îro Cihû li welatê Pêxemberê me, hem jî wekî hêzeke navnetewî di nava dewletên 'Ereban de dewleta xwe damezirandine. Li gorî ku soz û wada Xwedê Teala heta qiyametê ye, divê em vê rewşê û ayeta ku behsa wê hate kirin, çawa bidin ber hev?

---

[571] Beqere, 2/135-137.
[572] Bi zorê.
[573] Maîde, 5/48.

Bersiv: Lanet; bi wateya vederkirin, nifir, ‘ezab, dûrbûna ji rehma Xwedê, xezeb û xişim û hwd. tê. Ji zaroyên Îsraîl ên ku kafir bûne û li ser zimanê pêxemberên mîna Dawûd û Îsa (a.s) û hwd. lanet li wan hatiye barandin, dide nîşandan ku ew ji rehma Xwedê dûr in.

Dûrbûna ji rehma Xwedê herçiqas bandora xwe li vê dinyayê nîşan bide jî lê bandora wê ya rastîn di axretê de dê derkeve holê. Lewra Xwedê di vê dinyayê de yên ku li gorî rê û rêbazên xebatê tev digerin bi serkeftinê wan xelat dike. Eger ew sirf jiyana dinyayê bixwazin, Xwedê dê xwestinên wan ên dinyayê bide wan, lê di axretê de dê wan mehrûm bihêle. Xwedê Teala wiha ferman dike:

“Ê ku dinyayê bixwaze, ji bo kesê ku Em bivên a ku em bixwazin Em ê bi lez bidinê. Piştre jî Em ê wî riswa û qewitî têxin dojeha ku dê têkevê.

Ê ku axretê bixwaze û bawermend be û lezê li kirina karê wê bike, vêca xebata wan tê qebûlkirin.

Em ji dayîna Xwedayê te didine tevan; yên ku cîhanê dixwazin û yên ku axretê jî dixwazin. Dayîna Xwedayê te li ser wan nehatiye birîn.”[574]

Ayetên têkildar ên di derbarê ku Cihû îro li hemû cîhanê xwedî hêz in jî hene. Lê belê, tê îfadekirin ku bi sedem kirinên wan ên xerab ew ê dûçarî ezabekî pir cansoj bibin. Ayetên têkildar wiha ne:

“**Me di kitêbê de ji zaroyên Îsraîl re ev biryar da (ragihand): Hûn ê du caran li ser erdê xerabî û tevdanê derxin û bêguman hûn ê bi serkeftineke mezin bi ser kevin.**

Vêca dema çaxa (cezadana) cara pêşî hat, Me hinek bendeyên xwe yên xwedanhêz û dijwar bi ser wan de şandin, vêca ew ketin heta nav mala. Ev, sozeke misogerbûyî bû.

[574] Îsra, 17/18-20.

Paşê li hemberî wan dîsa Me serkeftin da we û bi serwet û zarokan Me piştgiriya we kir û Me hûn kirin pir bi hêz.

Êdî eger hûn qenciyê bikin hûn ji bo xwe dikin û eger hûn xerabiyê jî bikin hûn li xwe dikin.

Dema çaxa (cezakirina) cara paşîn hat, da ku rûyê we reş bikin û çawa ku cara pêşîn ketibûn Mizgeftê dîsa wisan dê biçin û çi tiştên bi dest bixin dê tarûmar bikin.”[575]

Tiştê ku di ayetê de behsa wê tê kirin ya yekem ji aliyê artêşa ku di bin fermandariya Qralê Babîlê Nebuqadnezzar II (Buxtunnasr) di sala 587 beriya zayînê, ya duyem jî ji aliyê serdarê Bîzansê Tîtus ve di sala 70yî piştî zayînê de hatiye pêkanîn. Rewşa piştî vê jî ev ayeta han wê xulase dike:

“**Hêvî heye ku Perwerdegarê we li we rehmê bike. Eger dîsa hûn (li xerabiyê) vegerin, Em ê jî (li cezakirina we) vegerin. Me dojeh ji bo kafiran kiriye girtîgeh û zîndan**.”[576]

468. Ma guneh e ku mirov pesnê yekî xeyrimuslim bide?

Pirs: Ma mirov ji mamosteyekî xeyrimuslim re bibêje “hûn mamosteyekî baş in”, guneh e yan na?

Bersiv*:* mirov dikare wiha bibêje. Ango tu gunehê wê tune ye. Hedîsa ku ji Pêxemberê me (s.a.w) hatiye ragihandin: “*Başê ‘Ereban, ên ku mîna di dema cahiliyê de bi xêr bûn di dema Îslamiyetê de jî bi xêr in*”[577] dide nîşandan ku mirov ne misilman be jî dikare karên baş bike.

[575] Îsra, 17/4-7.
[576] Îsra, 17-8.
[577] Bnh: Buxarî, Enbiya, 8, 14, 19, Menaqib, 1, 25, Tefsîr, Yûsuf 1; Muslim, Fedail 168, (2378); Ehmedê kurê Henbel, **Musned**, II/257, 260, 391.

Ji vê bonê piştî ku Xwedê Teala behsa Cihû û Filehên ku kitêb ji wan re hatiye dayîn dike, wiha ferman dike: "**Ji her umetekê re qibleyek heye ku ew berê xwe didinê. Naxwe, ji bo qenciyê bi hev re pêşbaziyê bikin. Hûn li ku dibin bibin, Xwedê dê we tevan kom bike (bîne heşrê). Bêguman Xweda li ser her tiştî qadir e."**[578] Û emrê bawermendan dike ku di hemû tiştên baş û bi xêr de bi wan re pêşbaziyê bikin.

Wekî din jî dema Yûsuf (a.s) behsa xwendê xwe yê hêj misilman nebûye dike, wiha pesnê wî dide: "**Bêguman ew xwendê (sergêrê) min e, qedrê min rind girtiye**."[579]

Ev hemû didin nîşandan ku însan eger ne misilman be jî dema karê baş bike, kesê misilman dikare pesnê wî bide û wî teqdîr bike. Di vê yekê de tu guneh tune ye.

469. Meriv dikare diyariyan bide yên xeyrimuslim?

Pirs: Gelo mirov dikare diyariyan bide kesên xeyrimuslim?

Bersiv: Xwedê Teala wiha ferman dike:

"**Xwedê, qencî û edaleta bi wan ên ku ji bo dîn şerê we nakin û we ji welatê we dernaxin, li we qedexe nake. Xwedê ji edaletkeran hez dike. Xwedê li we qedexe dike ku hûn wan ên ji bo dîn şerê we kirin û hûn ji cih û warê we derxistin û ji bo deranîna we arîkarî kirin, ji xwe re bikin dost û arîkar. Kî wan ji xwe re bike dost û arîkar, vêca ha ew in ên stemkar.**"[580]

Li gorî ayetên Qur'ana Pîroz, di têkiliya misilmanan bi xeyrimisliman re sê xetên sor hene:

Ji bo dînê me bi me re şer bikin,

[578] Beqere, 2/148.
[579] Yûsuf, 12/23,
[580] Mumtehîne, 60/8-9.

Me ji welatê me derînin,

Arîkariya wan kesên ku me ji welatê me derdixin, bikin

Kesê van xêz û bendan binpê bike, em nikarin bi wan re dostaniyê bikin. Lê, xeyrimuslimên ne wiha bin, mirov dikare bi wan pêwendî û têkalitiyên baş pêk bîne û tiştan jî diyariyî wan bike.

Ji bo agahiyên berfirehtir nivîsa di lînka jêr de ye bixwînin:

http://www.suleymaniyevakfi.org/arastirmalar/musluman-olmayanlarla-iliskiler.html

470. Xeyrimuslimên ku li welatê misilmanan dijîn, dê li gorî çi werin darizandin?

Pirs: Kesên ehlikitêb, di rewşa ku cizya xwe bidin, dikarin li welatê misilmanan bijîn û dema ku dozeke bi wan ve girêdayî pêk were li gorî kitêba wan hikum û biryar tê dayîn. Lê, ji bilî van, gelo yên kafir jî mafê wan ê jiyana li welatê misilmanan heye? Eger mafê wan hebe, di karên wan ên dadgehî de dê çi esas û bingeh bê girtin? Eger mafê wan tune be, ma dê ji welêt bên dûrkirin, an jî dê bi wan çi were kirin? Dîsa jî eger mafê wan ê mayinê tune be, ma ev nabe îmtiyazek ji bo ehlikitêban?

Bersiv: Tu îmtiyazeke ehlikitêban ji kafirên din tune ye. Lê belê ev, di dîrokê de her gav bi awayekî şaş hatiye fêhmkirin. Di vê mijarê di malpera me www.kurandersi.com de agahiyên berfireh hene. Ji lînkên jêr hûn dikarin dersên ku me di derbarê kesên muşrik û yên ehlikitêb de kirine, temaşe bikin:

http://www.kurandersi.com/konulu-kuran-sohbetleri/2009/ehli-kitap.html

http://www.kurandersi.com/konulu-kuran-sohbetleri/2009/ehli-kitap-ve-musrikler.html

http://www.kurandersi.com/mukayeseli-fikih-dersleri/2009/ehli-kitap-ve-musrikler-1.html

http://www.kurandersi.com/mukayeseli-fikih-dersleri/2009/ehli-kitap-ve-musrikler-2.html

Di derbarê têkiliya bi kesên kafir re em tewsiye dikin ku hûn di malpera me **www.suleymaniyevakfi.org** de di beşa "**Araştırmalar"** de nivîsa bi sernavê (**Müslüman Olmayanlarla İlişkiler" (Têkiliya bi Xeyrimisliman re)** bixwînin

http://www.suleymaniyevakfi.org/arastirmalar/musluman-olmayanlarla-iliskiler.html

Kesên ku mensûbê dînekî din bin, di mijarên ku bi huqûqa taybet re têkildar e, eger huqûq û qanûneke wan hebe dê li gorî wê bên darizandin. Eger tune be, li welatê misilmanan bi awayekî pêdivî divê ku li gorî huqûqa Îslamê bên darizandin. Di doz û dawayên gelemperî de û di dozên bi misilmanan re divê biçin dadgehên Îslamî.

471. Rewşa misilmanê ku mafê yekî xeyrmuslim xwaribe dê çawa be?

Pirs: Ez dixwazim di derbarê mafê kesên xeyrimuslim de bipirsim. Di demên ku hîn haya min ji dînê min tune bû, min heqê îbadan xwar. Piştî ku Xwedê Teala ez anîm ser rêya rast, min dînê xwe nas kir. Lê belê dibêjin ku "mafê kesê kafir lê nayê vegerandin û ew ê îmana te ji te bistîne" Ev çawa çêdibe seyda? Eger ez li ser îmanê bimirim, ma yê kafir jî bi sedema ku mafê wî li ser min heye dê îmana min ji min bistîne û têkeve bihuştê û ez ê jî ebedî di dojehê de bimînim? Hûn dikarin vê yekê ji min re rave bikin?

Bersiv: Di serî de pêwîst e em bibêjin, ji ber ku hemû "bendeyên" Xweda ne, ji aliyê mafan ve di navbera kesên misilman û yên xeyrimuslim de tu ferq û cudahî tune ye. Mirovê misilman çawa riayeta maf û huqûqa birayên xwe yên misilman

dike, herwiha divê li maf û huqûqa yên xeyrimuslim jî miqate be û zêde hişyar be da ku heqê wan bin pê neke.

Eger em werin ser bersiva pirsa we: Kesên kafir bi tu awayî nakevin cenetê. Lê belê eger mafê yekî wiha li ser we hebe û li dinyayê we di nav xwe de li hev helal nekiribe, li axretê dê heqê xwe ji we bistîne. Ev tişt, wî ji dojehê dernaxe, lê li gorî rewşa heqê wî dibe ku we têxe cehenemê. Encax gotina ew ê "îmana" we ji we bistîne ne rast e. Ji vê bonê hûn ê bi awayê ebedî di dojehê de nemînin.

472. Kesên xeyrimuslim, ma çima nikarin têkevin Mekkeyê?

Pirs: Sedemê ku kesên xeyrimuslim nikarin têkevin cihên pîroz ên mîna Mekke û Medîneyê çi ye? mirov însanên bi sedema ku ne misilman in ji war û cihê ku bi navê Mala Xwedê tê wesifandin dûr bixe, gelo rast e? Ma di Qur'ana Pîroz de li ser vê yekê tu ferman heye?

Bersiv: Xwedê Teala sirf li muşrikên ku li Pêxemberê me û li misilmanan zordarî kiribûn da ku ji Mekkeyê derkevin, ketina Mekkeyê qedexe kiriye. Lê, ji ber ku ayet ji pêwendiyên wan hatine birîn, hin encamên gelek şaş derketine holê. Yek ji wan şaşiyên han jî angaşta ku kesên xeyrimuslim nikarin têkevin Mekke û Medîneyê.

Ayeta ku çûna kesê xeyrimuslim li bal Mekkeyê qedexe dike ev e:

يَا أَيُّهَا الَّذِينَ آمَنُواْ إِنَّمَا الْمُشْرِكُونَ نَجَسٌ فَلاَ يَقْرَبُواْ الْمَسْجِدَ الْحَرَامَ بَعْدَ عَامِهِمْ هَذَا وَإِنْ خِفْتُمْ عَيْلَةً فَسَوْفَ يُغْنِيكُمُ اللّهُ مِن فَضْلِهِ إِن شَاء إِنَّ اللّهَ عَلِيمٌ حَكِيمٌ

"**Gelî bawermendan! Bêguman ew muşrik, pîs in; vêca piştî vê salê (sala nehê hicretê) bila nêzî Mizgefta Heramê nebin. Eger hûn ji xizaniyê bitirsin, vêca**

eger Xwedê ferman bike ji kerema xwe dê we dewlemend bike. Bêguman Xwedê ʿElîm e, Hekîm e.”[581]

Gotina “ew muşrik= الْمُشْرِكُونَ” ya di ayetê de derbas dibe, ew muşrikên ku di serê sûreyê Tewbe de behsa wan hatiye kirin. Tê xwestin ku cezayekî hemtayê sûcê ku kirine ji wan re bê dayîn. Ayeteke têkildar wiha ye:

وَأَخْرِجُوهُم مِّنْ حَيْثُ أَخْرَجُوكُمْ

“**Ji cihê ku hûn jê derxistine, hûn jî wan derxin**.”[582]

Di heyama ku muşrikan zor didan Pêxemberê me da ku ji Mekkeyê veder bibe, ew wiha hatibûn hişyarkirin:

وَإِن كَادُواْ لَيَسْتَفِزُّونَكَ مِنَ الأَرْضِ لِيُخْرِجوكَ مِنْهَا وَإِذًا لاَّ يَلْبَثُونَ خِلافَكَ إِلاَّ قَلِيلاً سُنَّةَ مَن قَدْ أَرْسَلْنَا قَبْلَكَ مِن رُّسُلِنَا وَلاَ تَجِدُ لِسُنَّتِنَا تَحْوِيلاً

“**Da ku te ji vî welatî (Mekkeyê) derxin, nêzîk bû ku ew te ji cihê te bikin. Eger te derxin, piştî te, ew jî dê li wir pir nemînin. Ji bo pêxemberên Me yên ku beriya te Me ew şandin, rêç û adetê Me, ev bû. Di rêç û adetê Me de tu yê tu guherînekê nebînî**.”[583]

Piştî fetha Mekkeyê, heta 15 mehan kesî dest neda muşrikên ku peymana bi misilmanan re girêdabûn şikandin. Lê piştre hat îlankirin ku ji bo ji Mekkeyê derkevin 4 meh demeke zêdeyî ji wan re hatiye dayîn. Eger dernekevin li ku bên dîtin dê bên kuştin. Ayeta têkildar wiha ye:

[581] Tewbe, 9/28.
[582] Beqere, 2/191.
[583] Îsra, 17/76-77.

"Ev ji aliyê Xwedê û Qasidê Wî ve bêrîbûneke ji bo wan muşrikên ku we bi wan re peyman daniye. Çar mehên din jî di vî welatî de bigerin. Agahdar bin, bêguman hûn nikarin Xwedê neçar bihêlin. (Lê) Xwedê kafiran riswa dike.

Ev agahdariyek e ji Xwedê û Qasidê Wî, di vê cejna mezin (cejna heciyan) de bi bal tevekî xelkê ve ku Xwedê û Qasidê Wî ji muşrikan bêrî ne. (Gelî muşrikan) Eger hûn tobe bikin vêca ew ji we re çêtir e. (Na) eger hûn berê xwe vegerînin, bizanin ku hûn ê Xwedê bêçare nehêlin. (Resûlê min!) Mizgîniya ezabekî dijwar bide wan ên ku kafir bûne!

(Ev agahdarî) Ji bilî wan muşrikên ku we bi wan re peyman daniye, paşê ji peymana xwe tiştek kêm nekirine û li hemberî we di ser tu kesî re nehatine, vêca peymana wan, heta wextê diyarkirî biparêzin. Bêguman Xwedê ji yên teqwadar hez dike. Vêca dema (çar) mehên birûmet[584] derbas bûn, êdî li ku derê hûn rastî wan muşrikan[585] bên, wan bikujin. Wan bigirin, wan dorpêç bikin û li hemû zêrevangehan li wan çavdêrîyê bikin. Vêca eger wan tobe kir, bi rengê pêdivî nimêj kirin û zekata malê xwe dan, êdî rêya wan vekin. Bêguman Xwedê gunehveşêr e, dilovîn e. Eger yekî ji muşrikan xwe avête bextê te, ewlehiyê bidê, da ku gotina Xwedê bibihîze, piştre wî bigihîne ewlegeha wî. Wiha bike; lewra ew miletekî nezan in."[586]

Ji bo muşrikên ku peymana xwe neşikandine, tu qedexeyeke wiha nehatiye danîn. Lê yên ku peymana xwe şikandine ji bo demekê be jî dîsa nikarin têkevin Mekkeyê. Ev tişt, xuya ye ku dê li aboriya Mekkeyê bandorê bike. Evê ayeta han jî balê dikişîne ser vê yekê:

---

[584] Daxuyaniya jor, di meha Zilhiccê ya duyem ji mehên heram, hatiye kirin. Di vir de mebest ji (mehên heram) ne ev mehên tu tên zanîn, belbî çar mehên ku di ayeta duyem de derbas dibe. Sedemê ku navê heram lê hatiye danîn, ji ber ku di wan mehan de kes nikare dest bide wan muxateban.

[585] Muşrikên ku peymana xwe şikandine.

[586] Tewbe, 9/1-6.

"Gelî bawermendan! Bêguman ew muşrik, pîs in; vêca piştî vê salê (sala nehê hicretê) bila nêzî Mizgefta Heramê nebin. Eger hûn ji xizaniyê bitirsin, vêca eger Xwedê ferman bike ji kerema xwe dê we dewlemend bike. Bêguman Xwedê ʿElîm e, Hekîm e."[587]

Mîna ku tê dîtin qedexeya çûna Mekkeyê, bi yên ku Pêxemberê me û misilman ji Mekkeyê derxistine û piştre peymana ku dane şikandine re têkildar e. Lê, ayet di dîrokê de ji cih û pêwendiyên xwe hatine birîn û ayet di têkiliyên misilmanan bi xeyrimisliman re di her qadê de li zemîneke şaş hatine bicihkirin. Mîna Îmam Malik dibêje ku çi Mescidu'l-Heram dibe çi jî mizgeftên din, kesê xeyrimuslim qedexeye ku biçe wan. Li gorî Îmam Şafiî jî kesê xeyrimuslim bi taybetî jî ji Mescidu'l-Heramê tê menkirin. Ji vê bonê eger serokê dewleta Îslamê li Mekkeyê be û qasidek ji muşrikan bê, divê ku li derveyî herêma Heramê bê pêşwazîkirin û qebûlkirin. Lê belê li gorî Îmam Ebû Henîfe, xeyrimuslim, li Mekkeyê ji kirina hec û 'umreyê hatine qedexekirin. Gotina "**Bila nêzî Mizgefta Heramê nebin.**" Bi wateya bila "Hec û 'umreyê mekin." Ango hatine qedexekirin ku têkevin hundirê Heramê, Mekkeyê, 'Erefeyê, Muzdelîfe û hwd. û di hecê de bi misilmanan re menasikên hecê bikin. Ji ber vê yekê destûra wan bo çûna mizgeftên din û tiştên ku eleqeya wan bi hecê re tune ye, tê dayîn.[588]

Di têkiliya misilmanan bi xeyrimisliman re ayeta bingehîn ev e:

"Xwedê, qencî û edaleta bi wan ên ku ji bo dîn şerê we nakin û we ji welatê we dernaxin, li we qedexe nake. Xwedê ji edaletkeran hez dike. Xwedê li we qedexe dike ku hûn wan ên ji bo dîn şerê we kirin û hûn ji cih û warê we der xistin û ji bo deranîna we arîkarî kirin, ji xwe re bikin dost û arîkar. Kî wan ji xwe re bike dost û arîkar, vêca ha ew in ên stemkar."[589]

---

[587] Tewbe, 9/28.
[588] Bnh: Elmalılı Muhammed Hamdi Yazır, **Hak Dini Kur'an Dili**, tefsîra ayeta 28an ji sûreyê Tewbe.
[589] Mumtehîne, 60/8-9.

Li gorî ayetên Qur'ana Pîroz, di têkiliya misilmanan bi xeyrimisliman re sê xetên sor hene:

Ji bo dînê me bi me re şer bikin,

Me ji welatê me derînin,

Arîkariya wan kesên ku me ji welatê me derdixin, bikin.

Di derbarê têkiliya bi xeyrimisliman re hûn dikarin li navnîşanên jêr jî binihêrin:

473. Ma xeyrimuslim an jî keşe dikarin ayînên xwe di mizgeftê de bikin?

Pirs: Ma durist e ku kesên xeyrimuslim an jî keşe bikevin mizgeftên me û ayînên xwe bikin?

Bersiv: Di çavkaniyên siyerê (dîroka jiyana pêxember) de derbas dibe ku Filehên Necranê yên ku ji bo hevdîtina bi Pêxemberê re (s.a.w) hatibûn -jimara wan şêst bû- li mizgefta Pêxemberê me ayîn û 'îbadeta xwe kirine. Muhemmed Hemîdullah vê bûyerê di jêgirtina ji Îbn Hîşam wiha radigihîne:

"Filehên Necranê, Ebû Hariseyê kurê 'Elqeme yê ku di rewşa serok û pîskoposê Midras a (dibistan û dadgeh) wan de bû, alîkarê wî 'Ebdul-Mesîh di bin rêvebiriya serokê karwanê El-Eylem de şandeyeke ku ji şêst kesî pêk dihat şandine Medîneyê. Çavkaniya me di derbarê vê mijarê de pir agahiyan bi hûre kûrî dide: Kincên wan û hêştirên wan li ehlê Medîneyê pir bandor kiribû; piştî nîvro di demên dawî de li Mizgefta Nebî derketin hizûra Muhemmed (s.a.w). Piştre xwestin ku ayînên xwe yên taybet bikin; bi vê mebestê Qasidê Xwedê (s.a.w) derket derve û mizgeft bi wan ve berda: "Di dema ayînê de berê xwe dan aliyê rojhilat."[590]

[590] Hamidullah, **İslam Peygamberi**, I, 619-620, paragraf: 1022.

Li gorî ku Pêxember (s.a.w) mizgefta xwe ji wan re hiştiye da ku ayîn û ‘îbadeta xwe bikin, tê fêhmê ku di vê de tu mehzûrek tune ye.

474. Ma rûxandina malperên ku heqaretê li dînê me dikin, durist e?

Pirs: Gelo durist e mirov malperê dewletên ku neyarê dîn û welatê mirov in, hack bike? Bi tu awayî em dizî û mafê însanan naxwin. Mebesta me, heta ji dest me bê em dînê xwe û welatê xwe biparêzin.

Bersiv: Divê em li hember kesên bi rêya malperan li dîn û welatê me heqaretan dikin, têbikoşin. Lê belê rêya vê ne ku em malperan hack bikin, lewra fikra me, karekî wiha mîna mirov kulman li bayê de. Mîna ku hûn jî dizanin eger ew malper bên hack kirin dîsa jî dê wekî kuvarkê zêde bibin. Ji vê bonê ji dêvla ku em demên xwe bi van tiştan re derbas bikin, divê em malperên xwe hem ji aliyê naverok û hem jî ji aliyê teknîkî ve bi hêz bikin, hewl bidin ku têkoşîn û mucadeleya xwe bi şeklê fikr û ramanî bidin.

475. Ji bo xizmetên dînî mirov dikare ji xeyrimisliman alîkariyan kom bike?

Pirs: Da ku di xizmetên Îslamî de werin bikaranîn, ma mirov dikare ji xeyrimuslimekî pere yan jî malekî bigire? Ji bo îmar û avakirina cihên ku tê de ilim-‘irfan û Îslam tê hînkirin, cihên ku tê de perwerdehiya zanyariyên Îslamê tê kirin, mirov ji ehlikitêban alîkariyan bigire gelo caiz e?

Bersiv: Ji bo avakrina mizgeft an jî bo xizmetên Îslamî yên din mirov li nav welatiyên xeyrimuslim bigere û ji wan alîkariyan bixwaze, ne tiştekî rast e. Ev, dibe ku wan mecbûrî alîkariyê bidin dînekî ku baweriya wan pê tune ye bike û xwe di bin zor û zextê de his bikin. Lê belê, eger ne ji ber tu zor û zextê, belbî bi riza dilê xwe bidin, wê demê di qebûlkirina alîkariyên wan de çi ‘eynî çi jî neqdî, tu mehzûrek tune ye.

476. Ma xwarina goştê heywanên ku Cihû û Fileh serjê dikin, helal e?

Pirs: Xwarina goştê heywanên ku Cihû û Fileh serjê dikin, gelo helal e?

Bersiv: Heywanên ku bi destê Cihû û Filehan hatine serjêkirin, tên xwarin. Jixwe di goştê masiyan de tu usûl û qayde tune ye. Misilmanên li Medîneyê jî di vê yekê de ketine şek û gumanê û ji Pêxemberê me (s.a.w) ev tişt pirsîne:

"Milet ji me re goşt tîne, em nizanin di dema serjêkirinê de ka besmele (navê Xwedê li ser) anîne yan na, divê em çi bikin?"

Qasidê Xwedê (s.a.w) wiha bersiv dide: **"***Hûn navê Xwedê li ser bibêjin û bixwin***"** [591]

477. Hukmê xwarina nêçîrên xeyrimisliman çi ye?

Pirs: Xwarina masiyên ku ji aliyê xeyrimisliman ve hatine nêçîrkirin gelo heram e? Di xwarina wan de tu mehzûrek heye yan na?

Bersiv: Di xwarina masî û heywanên avî yên ku ji aliyê kesên xeyrimuslim ve hatine nêçîrkirin de tu mehzûrek tune ye.

Xwedê Teala, 'eksî heywanên bejî helalbûna heywanên ku di avê de dijîn û xwarinên ku li vê derê ne, bê tu îstisnayan wiha radigihîne:

"**Nêçîra deryayê û xwarina wê, -bo debara we û kesên rêwî- ji we re helal hatiye gerandin**…"[592]

Îfadeya "**nêçîra deryayê**" ya ku di ayetê derbas dibe, jîndarên avî yên ku sax in û bi daf û kemînê tên girtin ji masi û hwd., "xwarina wê" jî xwarin û tiştên ku di deryayê de dimirin û derdikevin rûyê avê an jî av wê diavêje qerax û kersaxê, nîşan dide.

[591] Buxarî, Seyd, 21, Buyû' 5, Tewhîd 13; Muwetta, Zebaih, 1; Ebû Dawûd, Edahî, 19; Nesaî, Dehaya, 39.
[592] Maîde, 5/96.

Tê ragihandin ji Qasidê Xwedê (s.a.w) ku wî li ser pirsa ji ava deryayê wiha bersiv daye:

"*Ava deryayê paqij e; mirarê wê jî helal e.*"[593]

Li gorî vê ayet û hedîsê; ê ew girtiye yan jî derxistiye kî dibe bila bibe, çi bi saxîtî çi jî bi mirîtî hatibe bidestxistin berî tevan masî û hemû heywanên ku di deryayê de dijîn helal in.

[593] Ebû Dawûd, Teharet, 41; Tirmizî, Teharet, 52; Nesaî, Teharet, 46; Îbn Mace, Teharet, 38.

HEMWELATIYA DEWLETÊN EWRÛPA

478. Eger mirov bibe hemwelatiyê dewletên Ewrûpa, rast e ku mirov ji dîn derdikev?

Pirs: Ji bo ku em bikaribin bibin hemwelatiyê deweletên Ewrûpa hem bi devkî hem jî bi nivîskî ji me, peyman û soz digirin; bi me sond didin xwarin ku em ê li hember qanûn û zagonên wê dewletê yan jî li hember kralên wan, îxanetê nekin û sadiq bin. Eger ku em îmze nekin derfeta ku em bibin hemwelatî, ji holê radibe. Hin kes hene dibêjin, îmzekirin û sondxwarin li ser van tiştan dibe sedem ji bo kufr û derketina ji dîn. Hûn dikarin vê mijarê bi berfirehî û bi delîlan ji me re şîrove bikin?

Bersiv: Xwedê Teala di derbarê vê meseleyê de wiha ferman dike:

"**Bila mumin, dev ji bawermendan bernedin û kafiran ji xwe re nekin dost û piştevan. Kî vê bike, bila tu hêviyê ji Xwedê neke. Lê ku hûn ji bo xwe ji wan bistirênin ew xem nake. Xwedê we ji xwe, bi xwe dide tirsandin û veger bi bal Xwedê ve ye**."[594]

Hûn dev ji welayeta -dostanî û piştevaniya- misilmanan bernadin û welayeta –dostanî û piştevaniya- kafiran ji xwe re hilnabijêrin. Belbî bi vê helwestê, hûn ji xwe re stargehekê bi dest dixin.

Xwedê Teala di derbarê hilbijartina kafiran wekî dost û piştevan hukmê xwe wiha beyan dike:

"**Xwedê, qencî û edaleta bi wan ên ku ji bo dîn şerê we nakin û we ji welatê we dernaxin, li we qedexe nake. Xwedê ji edaletkeran hez dike. Xwedê li we qedexe dike ku hûn wan ên ji bo dîn şerê we kirin û hûn ji cih û warê we derxistin**

[594] Alî Îmran, 3/28.

û ji bo deranîna we arîkarî kirin, ji xwe re bikin dost û arîkar. Kî wan ji xwe re bike dost û arîkar, vêca ha ew in ên stemkar."[595]

Ew dewlet destêdirêjiya dînê we nakin. Lewra pergala wan dewletan dihêle ku mirov çawa bawer bike bijî. Li aliyê din, ew qedexeyên ku di ayetan de derbas dibin jî wan ew bi xwe nekirine. Di encamê de angaşta ku tê kirin "**mirov ji dîn derdikeve**" bê bingeh e.

Dewlet yan jî welatê ku hûn lê dijîn, eger henek û tinazê xwe bi dînê we bikin, wê demê ne duriste ku hûn bibin hemwelatiyê wê dewletê. Xwedê Teala wiha ferman dike:

"**Gelî bawermendan! Hûn wan kesên dînê we ji xwe re kirine tinaz û pêlîstok, ji wan ên ku beriya we kitêb ji wan re hatiye dayîn û ji yên ku kafir in, ji xwe nekin dost û piştevan. Eger ku hûn birastî xwedanbawer in, ji Xwedê bitirsin.**"[596]

479. Serîlêdana li dadgehên xeyrî Îslamî ji bo bidestxistina mafê xwe, ma mirov ji dîn derdixe?

Pirs: Kesê li derveyî welêt dijî gelo wê pirsgirikên xwe yên bi xeyrimisliman re çawa çareser bike? Hin kes dibêjin ku mirov dema serî li dadgehên **taxûtê** yanî yên ne Îslamî bide, mirov ji dîn derdikeve û ayeta 60em ji sûreyê Nîsa wekî delîlê pêşkêş dikin. Di vî halî de divê em çi bikin û pirsgirêkên xwe çawa çareser bikin?

Bersiv: Ew ayetên ku behsa wan tê kirin wiha ne:

"**Ma tu li wan ên ku dibêjin: Qaşo me bi ya ku ji te re hatiye hinartin û bi ya ku ji yên beriya te re hatiye hinartin, bawerî anî, nanihêrî ku ew dixwazin li ber taxûtî mehkeme bibin. Hal ew e ku ferman li wan hatibû kirin ku wê înkar bikin. Şeytan jî dixwaze wan bi şaşiyeke mezin ji heqiyê dûr bixe.**

[595] Mumtehîne, 60/8-9.
[596] Maîde, 5/57.

Gava ji wan re tê gotin: De werin ber ya ku Xwedê hinartiye û werin ber Qasidê Wî, tu wan dibînî ku ew berê xwe tam ji te vedigerînin.

Êdî ma tu çawa li wan şaş namînî? Gava musîbetek bi sedema kirinên wan ên nebaş tê serê wan, di cih de têne cem te bi Xwedê sond dixwin ku me her başî û lihevhatin xwestiye!

Ew ên ha, Xwedê bi ya di dilê wan de dizane, êdî guhê xwe nede wan, li wan şîret bike û ji wan re di kûrayiya nefsa wan de gotineke bibandor bibêje.

Çi Qasidê ku Me şandiye her ji bo ku bi destûra Xwedê bi gotina wî were kirin. Eger gava wan neheqî li xwe kirin, bihatana cem te û bexşandina xwe ji Xwedê bixwestana û Qasid jî bexşandina wan ji Xwedê bixwesta, wan dê bidîta ku Xwedê tobepejrên ê dilovîn e.

Naxêr! Sond bi Xwedayê te, heta ku ew di lecên (xirecirin) nav xwe de te nekin hekem û paşê ji biryara te re di dilên xwe de tengaziyariyekê jî nebînin û bi giştî derbest nebin, wan bawerî neaniye."[597]

Dema mirov bi kûrahî li van ayetan bihizire bi hêsanî tê dîtin ku ew ayet, ne wekî ku tê angaştkirin di derbarê serîlêdana li dadgehên li welatên xeyrimuslim in. Da ku mirov bikaribin heqê xwe bi dest bixin û bikaribin mafê xwe biparêzin, mirov dikare serî li dadgehên derveyî welatê misilmanan jî bide.

480. Hukmê firotina meyê li welatên xeyrimuslim çi ye?

Pirs: Ez li welatê Ewrûpa li Elmanyayê li dikanek biçûk dikandariyê dikim. Pirsa min: hukmê firotina mey û şerabê, li welatekî xeyrimuslim çi ye?

Bersiv: Cihê ku hûn lê dijîn, welatekê xeyrimuslim jî be, ne durist e ku hûn meyê bifiroşin. Lewra fermanên Xwedê Teala li gorî welatan naguherin! Tiştekî ku li welatekî heram be, li hin cihên din nabe helal. Lewra heram li her derê heram e.

[597] Nîsa, 4/60-65.

Ji bilî vê, Xwedê Teala dema ku behsa tiştên mirovan serxweş dikin bi awayekî taybet negotiye "**wan venexwin**" "**bikarnînin**" belbî bi awayekî gelemperî "**xwe ji wan dûr bigirin**" îfade kiriye.

Xwedê Teala wiha ferman dike:

"**Gelî bawermendan! Bêguman mey (şerab), qumar, peykerên çikandî û falên bi zar pîs in, ji karê şeytên in. Nexwe xwe ji wan dûr bigirin, da ku hûn serfiraz bibin**."[598]

Wateya **xwe ji wan dûr bigirin,** yanî bila di navbera we û wan de qonaxek hebe. Kesê ku meyê venaxwe, lê belê di dikana xwe de wê difiroşe yan jî tiştên ku di hedîsê de hatine qedexekirin bike û bifiroşe, ew kes fermana "**jê dûrketinê**" neaniye cih û qedexeyên Xwedê û Qasidê Wî, binpê kiriye.

Hedîseke ku ji Enes (x.j.q) hatiye ragihandin wiha ye:

"Pêxemberê Xwedê Teala, di tiştên ku mirov serxweş dikin, li deh kesan lanet kiriye: "**Ê diguvêşe, ê dide guvaştin, ê vedixwe, ê hildigire, ê dide hilgirtin, ê têne ber mirov, ê difiroşe, ê pereyê wê dixwe, ê dikire û dide kirîn**."[599]

Di bin ronahiya van ayet û hedîsan de divê ku kesê misilman li her derê li hember helal û heraman baldar û bihizir be û fermanên Xwedê Teala bi cih bîne.

481. Hukmê dayîna ruşwetê li welatên xeyrimuslim çi ye?

Pirs: Li dewleteke xeyrimuslim hukmê dayîna bertîlan çi ye? Mîna rişwetdayîna ji bo trafîkê. Şayed ku mirov bertîlan nede, dê cezayekî qat bi qat li mirov bê birîn.

Bersiv: Ew kesê ku bi vîzeyê derbasî dewletekê bibe, wateya wê ku wî, pergal û nîzama wî welatî qebûl kiriye. Ji ber vê yekê ew kes dikeve bin hin berpirsyarî û

[598] Maîde, 5/90.
[599] Tirmizî, Buyû', 59.

pêwîstiyan. Pergala trafîkê, pergaleke hem civakî hem jî ferdî ye. Kesê misilman jî divê li gorî vê pergala gerdûnî bimeşe. Û derketina li dijî wê pergalê ne layiqî mirovê misilman e. Di dawiyê de divê ku hûn li gorî pergala civakî biçin. Eger hûn nerin, cezayê ku li we tê birîn divê ku hûn bidin û li tu hinceta negerin. Çûna li dijî pergalê, tê wateya ku we, cezadayîn qebûl kiriye.

BEŞA PÊNCEM

- CIN
- DUA
- XURAFE
- EFSÛN

CIN

482. Gelo lêxistina cinan heye?

Pirs: Gelo lêxistina cinan heye? Eger hebe, mirov dikare xwe çawa jê rizgar bike?

Bersiv: Lêxistina cinan, mîna ku kehreba bi mirov bigire. Cin, bi awayên curbicur mirovan dixin bin bandora xwe. Ew rastiyeke ku tê de tu şik û guman tune ye. Cin jî mîna me însanan, heybernî bi aqil û bi bîr in. Bêşek ji cinan ên ku karê wan herî xerabî û nebaşî ye hene û em ji vê beşê re dibêjin şeytan. Em nikarin wan bibînin, lê belê ew dikarin me bibînin. Heta dikarin têkevin dirûvan, awayê xwe biguherînin û têkevin eşkal û celebnî ku em wan bibînin. Ji bo ku mirov bikaribe xwe ji zirara wan biparêze baweriyeke xurt, samîmîyet û biryardarî têrê dike.

483. Cin dikarin têkevin xewna meriv?

Pirs: Gelo cin di xewê de tên meriv? Hin caran em xewnên pir ne xweş dibînin û em nikarin tu duayan jî bixwînin. Ev tiştê han, gelo bi sedem cinan e?

Bersiv: Cin dikarin têkevin xewna meriv. Lewra Xwedê Teala, hemû derfet û îmkan dane şeytan da ku bikaribe însanan bixirîne û wan têxe rêyên şaş. Şeytan çawa ku dikare têkeve sûretê şêx û alimekî, keza ji bo hin tiştan telqînî mirov bike -da ku mirov xwe bi yekî wiha ve girê bide-, dikare têkeve xewna însan. Da ku mirov têxe guneh, guneh li ber çavên mirov bixemilîne yan jî mirov bitirsîne û ji bo tiştên mîna van, dikare têkeve xewna meriv. Bûyera ku di pirsa xwe de we behsa wê kiriye, têkiliya wê bi cinan re tune ye. Rewşeke wiha dibe ku bi sedema ku mirov westiyayî ye, ji şaşîtiyeke di gera xwîna di rehan de yan jî ji dayîn û stendina rêyên di nefesê de pêk hatibe.

484. Gelo hemû nexweşiyên derûnî bi sedema cinan e?

Pirs: Ma her nexweşî û nerihetiyên ku em dijîn ji cinan e? Cudahiyên di navbera nexweşiyên derûnî û nerihetiya cinan de çi ye?

Bersiv: Ne heq e û ne jî guncaw e ku mirov hemû nerihetiyên ku bi însên re derdikevin holê, bi cinan ve girê bide. Di heman demê de em vê jî înkar nakin ku cin bi rastî jî huzûra mirovan xera dikin û wan nerihet dikin. Ji bo xelasiyê jî rola bixwebaweriyê pir girîng e. Bi rêya xwendin û telqînên derûnî û keza bi rêyên tedawiya li ba pispor û doktoran jî mumkin e ku mirov, bixwebaweriya xwe bi dest bixe û ev bibe sedem ji bo şifayê.

485. Gelo zanyar çima hebûna cinan qebûl nakin?

Pirs: Zanistiyên dînî û yên modern (mîna bijîjk) li dijî hev xuya dikin. Ji ber baweriya xwe em bi cinan îmanê tînin. Dibe ku neqebûlkirina hebûna cinan, wekî bertekî li hember fikir û ramanên serdema çaxa navîn be? Lewra em dinazin ku di vê serdemê de bi hinceta ku cin ketiye nava wan, hin kes bi saxîtî hatine şewitandin an jî îşkence li wan hatiye kirin. Pêşketinên ku paşê li rojava rû dan, di mesaba berteke ku li hember fikir û ramanên bêvac û nehevgirtî yên di civaka filehan de bûn. Ji vê bonê zanist ji xwe re kirine xweda. Zanyarên ku li welatê me înkara cinan dikin, hûn dikarin çawa rave bikin? Ew jî di paralela yên beriya xwe de ne yan na?

Bersiv: Peyva Çaxa Navîn, gotineke ku ji bo dema tarî ya ku li Ewrûpayê hatiye jiyîn re tê bikaranîn. Di wê serdemê de ji misilmanan jiyanek pêşketî û bextewar hebû. Misilmanan di wê demê de ne hebûna cinan înkar dikirin û ne jî hemû nexweşiyên xwe yên derûnî bi wan ve girê didan. Wan rêya navîn ji xwe re di jiyanê de bingeh girtibûn. Ne diketin îfrat û ne jî tefrîtê. Bandora cinan li ser mirovan heye. Lê belê ne hewce ye ku mirov vî tiştî li ber çavên xwe pir mezin bike. Bandora cinan, bi agahiyên ne rast ewqas di çavê xwe mezin kirine ku cin bi xwe jî ji ser xwe çûne.

Ên ku înkara cinan dikin, ev helwesta wan, wekî berteke derûnî li dijî wan bêsînorî, îfrat û tefrîta ku di derbarê cinan hatiye gotin, derketiye holê û tê kirin.

Xwedê Teala wiha ferman dike: **"Bêguman kemîn û hîleya şeytanî qels e."**[600]

486. Ma vampîr hene?

Pirs: Ma xwînmij ango vampîr hene?

Bersiv: Peyva xwînmij ango vampîr: Ji afrîdên ji teref însanan ve tê gumankirin ku xwînê dimijin re tê bikaranîn. Tiştekî wiha, ne pêkan e û tu carî jî çênabe.

487. Ji bo xelasiya ji bandora cinan, divê mirov çi bike?

Pirs: Ji bo rizgarî û xelasiya ji bandora cinan, divê mirov kîjan dirûd û duayan bixwîne?

Bersiv: Mirov, piştî nimêjan, beriya xewê di nav nivînan de û sibehan dema mirov ji xewê radibe, sûreyê Feleq û Nas bixwîne, mirov dê ji şerê wan ewle bibe û tu wê xerabiya wan negihîje mirov. Divê her gav, ev rastiya han li ber çavên mirov be ku: Ji Xwedê Teala pê ve, ne tu kes û ne jî tu tişt nikare mirov biparêze. Bi tenê mirov xwe bispêre Xwedê Teala. Lewra Ew e, yê ku mirov ji her tiştî diparêze û bila ji vê rastiyê tu guman nekeve dilê meriv.

488. Ma cin jî ji ehkamên Qur'anê berpirsyar in?

Pirs: Di Qur'ana Pîroz de behsa komek ji cinên ku li Qur'anê guhdarî kirine, tê kirin. Bi kurtasî ma cin jî ji umeta Pêxemberê me (s.a.w) ne? Û Qur'an û ehkamê wê ji cinan re jî şerî'et û dîn e?

Bersiv: Ji erkên Qasidê Xwedê Teala ya herî bingehîn ragihandin, danezanîn û hînkirina dîn e. Li gorî ayetên ku di serê sûreyê "Cin" de derbas dibin, Qasidê

[600] Nîsa, 4/76.

Xwedê, dîn bi cinan nedaye zanîn û dîn teblîxî wan nekiriye. Belbî di wî sûreyî de behsa komek cinên ku li Qur'ana Pîroz guhdêrane tê kirin.

Ayetên sûreyê Cin wiha ne:

"**Bibêje: Ji min re hatiye wehîkirin ku komek ji cinan (li Qur'anê) guhdarî kirin, gotin: Bi rastî me li Qur'aneke balkêş guhdarî kir. Berê mirovî dide rêya rast, vêca me jî bawerî pê anî û em tu kesî ji Perwerdegarê xwe re nakin hevpişk**"[601]

Eger ev bûyer ji aliyê Xwedê Teala ve bi Pêxember (s.a.w) nehatibana danezanîn, dê hayê wî jê tunebûna.

Ayetên li jêr mijara me bêhtir zelal dikin.

"**Dema Me berê komek cin dabû te, da ku li Qur'anê guhdarî bikin. Vêca dema ji bo ku li Qur'anê guhdarî bikin amade bûn; (ji hev re) gotin: Huş bibin, li Qur'anê guhdarî bikin! Çi dema (xwendina) Qur'anê temam bû; bi hişyarkerî li gelê xwe vegeriyan.**

Wiha gotin: Ey gelê me! Bêguman me li kitêbeke wisa guhdarî kir ku ew piştî Mûsayî hatiye hinartin, ew kitêbên beriya xwe rast didêre, mirovan gazî heqiyê dike û bi bal rêyeke rast ve rasterê dike.

Ey gelê me! Bersiva dozdarê (dînê) Xwedê bidin, baweriyê pê bînin, Xwedê jî dê li gunehên we bibore û we ji ezabekî dijwar biparêze.

Kesê ku bersiva dozvanê (dînê) Xwedê nede, bila bizanibe ku ew nikare li ser erdê Xwedê naçar bihêle; ji Xwedê pê ve ji bo wan tu xwedî û piştevan tune ye; ew ên ha di rêşaşiyeke aşkere de ne."[602]

---

[601] Cin, 72/1-2.
[602] Ehqaf, 46/29-32.

Ji civaka cinan re jî Qasid hatine şandin. Lê belê, çawa ku ji însanan re Pêxemberê benîbeşer hatine şandin, qasidê wan ji wan in. Yanî ew jî cin in. Xwedê Teala wiha ferman dike:

"**Gelî civaka cin û mirovan! Ma ji nav we, qasidên ku ayetên min ji we re digotin û we ji pirgîhatina vê rojê hişyar dikirin, nehatin? Dê bibêjin em li ser nefsa xwe dibin şahid. Lê belê jiyana dinyayê ew xapandin û li ser kafiriya xwe, ew bi xwe dibin şahid**."[603]

Erka Pêxember (s.a.w) ji bilî teblîxa dîn, hînkirina hikmetê[604] û nimûnebûna wî[605] ye. Lê belê di tu ayetan de nayê dîtin û qisekirin ku Pêxember (s.a.w), ev erka xwe li hemberî cinan aniye cih.

Kitêba Xwedê Teala Lewhî Mehfûz e[606]: Mirov, cin û melayiket hemû li hemberî hukmê vê kitêbê berpirsyar in. Bihîstina komek ji cinan li xwendina Qur'anê ji devê Pêxember (s.a.w), lazimî wan dêraye ku ew jî baweriyê bi Qur'anê bînin.

489. Ji bo xweparastina ji cinan, ma gotina bêjeya "destûr" şert e?

Pirs: Min bêjeya "destûr", ya ku ji zarokatiya xwe ve ye -bê ku ez wateya wê bizanibim- bi kar dianî. Encax min wateya wê meraq kir û min dît ku bi wateya "rêdan", "musade" û hwd. tê. Çaxa em derbasî qedemgehê dibin, dema hurikên nan li cihekî bikeve, bê 'ilmê me dema bê eciqandin an jî dema em ava germ li cihekî dirêjin da ku cin û hwd. zirarê nedin me, em dibêjin destûr. Di rewşeke wiha de gelo em destûr û iznê ji wan dixwazin?

Bersiv: Ji bo rewşên wiha di çavkaniyên me de tu agahiyeke ku pêwîstiya bikaranîna vê bêjeyê îfade bike, tune ye. Pêxemberê me (s.a.w) dema biçûna qedemgehê, dema êvaran têketa nav nivînên xwe û di demên din de ji bo

[603] En'am, 6/130.
[604] Bnh: Beqere, 2/129; Alî Îmran, 3/164; Cumu'e, 62/2.
[605] Ehzab, 33/21.
[606] Bnh: Zuxruf, 43/3-4; Burûc, 85/21-22.

xweparastina ji şerên cinan, pêşî "eûzû أَعُوذ" dixwend piştre sûreyên Feleq û Nas dixwendin û xwe dispart Xwedê Teala. Riwayeta bi vê yekê re têkildar e wiha ye:

Qasidê Xwedê (s.a.w) ji bo cin û nezerê (dirûdên curbicur dixwendin) û xwe dispart Xwedê. Piştî ku (sûreyên Feleq û Nas nazil bûn) ev herdu sûre esas girtin û dev ji yên din berda.[607]

Diya me Hezretî 'Aişeyê (x.j.q) vedibêje ku: "Pêxember (s.a.w) her şev dema dikete nav nivînên xwe, pif dikir destên xwe (sûreyên) Feleq, Nas û Qulhûwellah (Îxlas) dixwendin, destên xwe di rû û laşê xwe didan û vî tiştê han sê caran dubare dikir. Dema ku nexweş biketa jî fermana kirina heman tiştan ji min dikir."[608]

Li gorî ku ji Enesê kurê Malik (x.j.q) hatiye ragihandin, Qasidê Xwedê dema bixwesta biçe qedemgehê wiha digot:

"*Xwedayê min! Ji şeytanên nêr û mê û ji hemû pîsî û nebaşiyan, ez xwe dispêrim Te.*"[609]

490. Ma şeytan dikare têkeve dirûv û eşkalan û xwe nîşanî însanan bide?

Pirs: Ma di vê dinyayê de Şeytan di sûretê ajal, însan an jî di sûretekî din de dikare xwe nîşanî mirov bide yan na?

Bersiv: Mîna hemû heyberên rûhanî, mijara ku Îblis ango şeytan xwe nîşanî însanan dide yan na, di derbarê wê de gengeşî hene. Pirên zanyaran dibêjin ku ew, heyîneke letîf e û di sûretên curbicur dikare xwe nîşanî însanan bide. Ev alimên han, bûyerên ku şeytan xwe nîşanî Hezretî Adem (aleyhisselam), Hezretî Îbrahîm (aleyhisselam), Hezretî Mûsa (aleyhisselam) û Hezretî Muhemmed (s.a.w) ên ku di

[607] Tirmizî, Tib, 16; Îbn Mace, Tib, 33.
[608] Buxarî Fedailul-Qur'an 14, Tib, 39, De'awat, 12; Muslim, Selam 50; Tirmizî, De'awat, 21; Ebû Dawûd, Tib, 19.
[609] Buxarî, Wudû', 9, De'awat, 14; Muslim, Heyz, 122- (375); Ebû Dawûd, Teharet, 3; Tirmizî, Teharet, 4; Nesaî, Teharet, 17; Îbn Mace, Teharet, 9; Ehmedê kurê Henbel, **Musned**, III/99, 101.

Qur'an û hedîsan de derbas dibin û bûyera ku şeytan di rêya cenga Bedrê de xwe di sûretê Suraqeyê kurê Malik nîşan dayiye, cesaret daye wan û piştre ji wan qetiyaye[610], wekî delîl nîşan didin.

Lê belê dîtina şeytên li ser sûretê wî yê rastîn bi tu awayî ne pêkan e.

Li hember vê yekê, di ayetekê de Xwedê Teala îşaret dike ku şeytan û koma xwe, însanan dibînin:

"**Bêguman şeytan û êla xwe we dibînin û hûn wan nabînin**…"[611**]

[610] Bnh: Enfal, 8/48.
[611] E'raf, 7/27.
[**] Dr. Osman Demir

EFSÛN

491. Sêhr çi ye?

Pirs: Sêhr çi ye?

Bersiv: Efsûn ango sêhr çavgirêdan, dek û hîlebazî ye. Ev jî ji ber ku -sedema heqîqî ya di tiştan de veşartî-, bi awayekî din tê xeyalkirin. Ji ber ku efsûngerî dibe sedem ji bo ditîna tiştên rast bi awayekî şaş û yên şaş mîna ku rast bin; xeyalê wekî rasteqîn û rasteqînê jî wekî xeyalê dide nîşandan, tiştekî kirêt û xerab e.

Mesela; Hezretî Mûsa (s.a.w) dema wekî mûcizeyekê gopalê xwe diavêje dibe marekî mezin. Li hemberî vê bûyerê Fîrewn, bangî sêhrbazên xwe dike û alîkariyê ji wan dixwaze. Sêhrbazan jî çavê gel boyax kirine û ew tirsandine[612], ben û gopalên avêtine mîna ku baz bidin, dane nîşndan.[613]

Li gorî di hin tefsîran de hatiye ragihandin sêhrbazan, roviyên mihan tije civa kirine, dema ji jor ve dihat girtin mîna gopal û dema ji navê ve pê bihata girtin mîna ben xuya dikir û wan, ew rovî avêtine ser qûma germ. Dema civa di hundirê roviyan de ji ber germa zêde diliviya rovî, mîna mar xwe badidan. Mirovên ji bo ditîna maran hatibûn li hember wî dîmenî ditirsiyan û mîna marên ku bibezin, ew didîtin.

Dema Hezretî Mûsa gopalê xwe diavêje, gopal marên sêrhbazan dadiqultîne û ji ber ku yên ku li vir hazir in, di serî de sêhrbaz têdigihîjin ku ya Hezretî Mûsa ne efsûn e, derin secdeyê û baweriyê bi Hezretî Mûsa tînin.[614]

Di xwezayê de qanûnên ku em pê nizanin pir in. Hin kes dibe ku hin qanûnan hîn bibe û bi wan li însanan bandorê bike. Mesela; li cihên ku televîzyon bi tu awayî nayê zanîn, pêkan e ku mirov bi weşana televîzyonê wan têxe bin bandorê. Rê û rêbazên ku ji bo sêhrê tên bikaranîn, bi îcad û pêşketinên nû, dibe ku biguherin.

---

[612] E'raf, 7/116.
[613] Taha, 20/66.
[614] E'raf, 7/120.

Bi rêya cinan jî mumkin e ku sêhr bê kirin. Mesela; yekî ku têkiliya wî bi cinan re hebe, da ku însên têxe bin bandora xwe, agahiyan di derbarê kesê ku tê cem ji cinekî bistîne û jê re bibêje. Her dem mumkin e mirov, hin kesên ku dibêjin "Bê ku ez tiştekî biaxivim navê min derxist, ez çi karî dikim, têkiliyên min ên bi hevalên min û hwd." û qîmeteke zêde bidê û têkeve bin bandora wî, bibîne hene.

Karê ku sêhrbaz dikin, ji ber ku rastiya mijarê ji mirovan vedişêrin û xwe însanên xwedî hêzên awarte û mezin didin nîşandan û dixwazin mirovan bi vî awayî bixin bin bandora xwe, karekî heram e. Di heman demê de ji ber ku hêz û qaweteke ku Xwedê Teala nedabe tu kesî û mirov bibêje ew hêz û qewet bi min re heye; didin nîşandan ku ew jî dikarin hin cureyên ji desthilatdariya ku ji taybetiyên Xwedê Teala ne bikin, bi vê yekê dikevin şirkê. Yanî di wan cureyan de xwe hevparê Xwedê Teala dibîne.

492. Gunehê kesên sêhrê dikin û yên didin kirin çi ye?

Pirs: Di dînê Îslamê de gunehê kesê ku sêhrê dike û yê dide kirin çi ye?

Bersiv: Sêhr, ji gotin û kirinên bi rê û rêbazên ku yên li hember wan in pê nizanin, bi intibaya ku mirov xwedîhêz û qeweteke awarte ye, da ku bandorê li însanan bike û qezenca ne li rê bidest bixe re tê gotin. Ji ber ku esasê wê li ser derawan tê avakirin, bi rêya sêhrê tu encam nayê bidestxistin. Xwedê Teala wiha ferman dike: "**Sêrbaz li ku dibe bila bibe bi ser nakeve**."[615]

Kesê sêhrbaz, bi intibaya ku qewet û hêzeke wî ya awarte heye, xwe dike Xweda. Pêxemberê me (s.a.w) wiha gotiye: "**Kî sêhrê bike, ew dikeve şirkê**."[616]

Ên dibêjin ku em agahiyên pêşerojê dizanin jî hene. Pêxemberê me (s.a.w) di derbarê wan de wiha gotiye:

[615] Taha, 20/69.
[616] Nesaî, Tehrîm, 19.

"*Kesê ku here ba kahinekî (ê ku agahiyê pêşerojê dide) û tiştekî bipirse û gotina wî rast bidêre, heta çil rojî nimêja wî qebûl nabe***.**"[617]

Mebest ji neqebûlbûna nimêja wî heta çil rojî, yanî heta çil rojî xêra nimêjê jê re tune ye. Ne ku divê piştre wan nimêjan ji nû ve bike.

493. Ma ji bo betalkirina sêhrê divê mirov çi bike?

Pirs: Ji bo betalkirina sêhrê, gelo divê ku mirov here cem sêhrbazekî yan divê çi bike?

Bersiv: Sêhr, bandoreke giran ya derûnî li ser mirovan peyda dike. Betalkirina sêhrê jî tê wateya ya rakirina wê bandorê. Ji bo wê jî mirov naçe ba sêhrbaz. Tiştê dê bê kirin, kirina karên ku baweriya mirov dê li mirov vegerîne. Di vê mijarê de xwendina Qur'anê digel fêhmkirin û hizirîna wateya ayetên wê, dê bandoreke erênî li mirov peyda bike.

494. Ji bo xelasiya ji bandora sêhrê divê mirov çi bike?

Pirs: Dibêjin sêhreke ku li malbata min hatiye kirin, li min jî bandorê dike. Ji bo vî tiştî divê mirov çi bike?

Bersiv: Sêhr, bandoreke giran ya derûnî li ser mirovan peyda dike. Betalkirina sêhrê jî tê wateya ya rakirina wê bandorê. Ji bo wê jî mirov naçe ba sêhrbaz. Tiştê wê bê kirin, kirina karên ku baweriya mirov dê li mirov vegerîne. Di vê mijarê de xwendina Qur'anê digel fêhmkirin û hizirîna wateya ayetên wê, dê bandoreke erênî li mirov peyda bike.

Tiştên mîna sêhrê, însanan bêhuzûr û dilê wan nerihet dike. Ji vê bonê însan dixwaze dilê xwe rihet bike. Ji taybetmendiyeke Qur'ana Pîroz e ku herçiqas bê xwendin însan bêhtir aram û bihizûr dike. Lewra ew ji bo însanan rehmet û şîfa ye:

[617] Muslim, Selam, 125 (2230).

"**Gelî mirovan! Ji cem Xwedayê we, ji bo we şîretek, ji dilan re şîfayek û ji bo bawermendan jî rêber û rehmetek hatiye**."[618]

"**Em ji Qur'anê hin ayetên wisa dişînin ku ew ji bawermendan re şîfa û rehmet in û ew li zaliman, ji ziyanê pê ve tu tiştî zêde nake**."[619]

Navekî Qur'anê yî din jî "zikr"e:

"**Bêguman Me zikir (Qur'an) hinartiye û teqez Em bi xwe jî dê wê biparêzin**."[620]

Xwedayê ku Qur'ana Pîroz bi "zikir" wesifandiye, radigihîne ku dil encax bi xwendina wî zikrî huzûr û aramiyê dibîne:

"**(Ew) ên ku bawerî bi Xwedê anîn û dilên wan bi bîranîna (zikrê) Xwedê rihet û aram in. Agahdar bin, dil bes bi zikr û bîranîna Xwedê rihet û aram dibin**."[621]

Xwendina Qur'anê mîna ku di van ayetan de îşaret bi bal ve hat kirin, mirov dixe aramiyê, dibe şîfa û sedem ji bo dilrihetiyê. Ji vê bonê kesê misilman divê ku her dem Qur'anê digel fêhmkirin bixwîne û tiştên jê hîn dibe di jiyana xwe bîne cih, da ku li hember hemû xerabî û sêhran, jê re bibe sîper û parêzer.

495. Ma rast e ku li Pêxemberê me (s.a.w) sêhr hatiye kirin?

Pirs: Tê ragihandin ku li Pêxember (s.a.w) sêhr hatiye kirin û heta sûreyê Feleq bo vê nazil bûye. Gelo ev tişt rast e yan na? Eger rast be, digel ku Pêxember di bin parastin û stara Xwedê Teala de ye, sêhrê çawa bandor lê kiriye? Bandora sêhrê ma ewqas bi hêz e?

---

[618] Yûnus, 10/57.
[619] Îsra, 17/82.
[620] Hicr, 15/9.
[621] Re'd, 13/28.

Bersiv: Mîna ku tê zanîn, ji bo kuştina Pêxember (s.a.w) pir dek û dolab hatine lidarxistin. Xwedê Teala her gav Qasidê xwe ji wan dek û dolaban rizgar kiriye. Mîna ku di şerê Xeyberê de bi rêya jehrdayînê xwestine ku Pêxember (s.a.w) bikujin.

Sêhra ku behsa wê tê kirin jî yek ji wan komployan e. Çawa ji yên din xelas bûbe dîsa ji wê jî xelas bûye. Eger bûyera ku li Pêxember (s.a.w) sêhr hatiye kirin û sûreyên Feleq û Nas di derbarê wê de daketine rast be, wê demê pêdiviya xwendina van sûreyên han ji bo xelasiya ji bandora sêhrê ji bo kesên ku sêhr li wan hatiye kirin re dibe delîl.

496. Gelo însan çima diçin ba sêhrbaz û remildaran?

Pirs: Gelo ziyaretkirina mirovan ku pêl bi pêl diçin cem sêhrbazan, ji ber qelsiya baweriya wan e?

Bersiv: Dema mirov ji Xwedê Teala re nebe bende, dê mirov li kesên ku ji wan re bendetiyê bike bigere. Ên ku ji Xwedê Teala re nebûne bende li ber deriyê sêhrbazan çirvîtka diavêjin. Ji ber ku jimara van însanan zêde ye, kiryarên sêhrbazan jî her dem zêde ne.

497. Hukmê vekirina fala stêrkê çi ye?

Pirs: Remil û falên stêrkê di dînê me de caiz e yan na?

Bersiv: Bi kurtasî tiştên ku bi rimildariyê tê navdayîn ji nihêrtin û vekirina remil û falan, dînê me teqez ew qedexe kirine. Kesên ku bi van tiştan re mijûl in, angaşt dikin ku ew bi pêşerojê dizanin. Bi rêya tinaz û henekan be jî divê mirov xwe jê dûr bigire.

Ne însan, ne melek û ne jî qasidên Xwedê Teala bi xeybê nizanin. Xwedê Teala wiha ferman dike:

"**Bibêje: Ji bilî Xwedê, yên li erd û asîmanan tu kes ji wan, xeybê nizane**."[622]

Ev ayetên han bi taybetî di derbarê ferişteyan de ne. Xwedê Teala wiha ferman dike:

"**Birastî Me însan afirandiye û Em bi ya ku nefsa wî jê re dibêje dizanin û Em ji rahjiyana (şahdamara) wî jî bêhtir nêzîkî wî ne**. **Li rast û çepê însên du peywirdarên rûniştî hene ku her hal û hereketên wî dinivîsin. Însan çi bibêje, her li balê çavdêr û amadekarek heye.**" [623]

Yanî, Xwedê Teala bi tiştê di dilê mirov derbas dibe jî dizane, Lê belê firîşte bi tenê bi tiştên ku ji devê mirov dertên dizanin. Di derbarê ku cin jî bi xeybê nizanin Xwedê Teala wiha ferman dike:

"… **bi destûra Perwerdegarê te, ji cinan jî yên ku li ber destê Suleyman rêncberiyê bikin, Me xistibûn bin emrê wî. Ji wan kî ji fermana Me derketaya vêca Me dê azara agirê sincirî pê bida tehmkirin.**

Wan ji Suleyman re ji kele, peyker, cifniyên mîna hewzan û dîzên cihgirtî yên bixwesta çêdikirin. Gelî malbata Dawûd! Xwedayê xwe bişêkirînin, teqez ji bendeyên Min (yên) şukirdar kêm in!

Êdî dema ji bo Suleyaman Me mirin heq kir, bes kurmikê ku gopalê wî dixwar mirina wî ravayî wan kir. Vêca dema ku ew kumişî ser erdê, ji cinan re diyar bû ku eger bi nependiyê bizanibûna, ewqasî di wê keftelefta riswaker de nediman."[624]

Pêxember jî encax bi tiştên ku Xwedê Teala bi rêya wehyê hînî wan dike dizanin. Xwedê Teala wiha ferman dike:

---

[622] Neml, 27/65.
[623] Qaf, 50/16-18.
[624] Sebe', 34/12-14.

"Bibêje: Ez ji we re nabêjim ku xezîneyên Xwedê li cem min in û ez bi xeybê dizanim û ez ji we re nabêjim ku ez firîşte me jî. Bes ez didime pey a ku ji min re tê hinartin. Bibêje: Erê ma yê kor û yê biçav wekhev in? Ma qey hûn nafikirin."[625]

"Bibêje: Ji ya Xwedê xwestibe pê ve, ez nikarim tu fêdeyê û zirarê bidim xwe jî. Eger min bi ya nependî zanibûya min ê hê bêhtir qencî bikira û ji ya bi zirar û ziyan jî min ê xwe bidaya paş. Ji bo miletekî ku bawerî bîne, ez her hişyarker û mîzgînber im."[626]

[625] En'am, 6/50.
[626] E'raf, 7/188.

XURAFE

498. Wesiyeta Şêx Ehmed, ma rast e yan jî xurafe ye?

Pirs: Di "Wesiyeta" ku li ser navê xetîbê Mizgefta Medîneya Munewwer Şêx Ehmed, hatiye weşandin de dibuhure ku "ji hefteya borî heta vê hefteyê 16.ooo kes mirine û temamê wan jî bihuştî ne. Di nêz de Îsa aleyhisselam dê dakeve, qiyamet dê rave û hwd." Qaşo Pêxemberê me, di xewnê de jê re gotiye. Kesê ev wesiyet dît û xwend, divê ku bigihîne hemû misilmanan. Di vê babetê de hûn çi dibêjin? Ma ev tiştên han, rast in?

Bersiv: Wesiyeta ku li ser navê Şêx Ehmed hatiye weşandin, ji serî heta binî derew, lêanînin û li dijî rêgez û dustûra dînê me ne. Armanca nivîsên bi vî awayî ew e ku gel bi tiştên vala û nelazim mijûl bikin û wan ji 'îbadetan dûr bixin. Ev, lênanînên neyarên dîn ên di nav me de ne. Li ku derê bên dîtin, divê ku bên îmha kirin.

Lewra kesê ji kirina gunehan poşman bibe, lêborîn û bexşandinê ji Xwedê bixwaze, herwekî ku wî qet guneh nekiribe. Gotina ku tobe qebûl nabin, dibe sebebê ku kesên gunehkar, bêhtir noqî nebaşî û gunehan bibin. Xwedê Teala, mizgînî daye ku ji kesê bixwaze re -ji bilî şirkê- dibe tevekê gunehên wan bibexşîne.[627]

Zanîna agahiyên xeybî û nepenî; ji rabûna qiyametê ku dê kengî biqewime û hwd. bi tenê li cem Xwedê Teala ye, Ew bi tenê dizane.

Bidestxistina xêran, ne ku mirov berê xwe bide 'îbadetan û ji gunehan tobe bike, belbî bi zêdekirina kaxizekî basît, rasterast li dijî rêbaz û prensîbên dînê me ye.

Di malpera me de di derheqê wesiyeta Şêx Ehmed de nivîsek me heye. Em tewsiye dikin ku hûn wê nivîsê ji lînka jêr bixwînin:

[627] Bnh: ayetên sûreyê Nîsa, 48 û 116.

http://www.suleymaniyevakfi.org/yazilar/seyh-ahmedin-vasiyetnamesi-efsanesi.html

499. Piştî birîna nîkahê derketina der bi şev, ma bêqidoşiyê çêdike?

Pirs: Gotina "Piştî birîna nîkahê derketina mêr û jinê bi şev, dibe sebebê bêoxiriyê" gelo xurafe ye yan jî qedexe/tewsiyeyeke ku di dînê me de heye?

Bersiv: Şowmî û bêoxirî, di tu tiştî de tune ye. Baweriyên bi vî rengî, ji zen û gumanên milet derdikevin holê. Baweriya ku bêqidoşî û bêoxirî di deng/xwendina kund, reyîna seg, pisîka reş di pêşiya mirov de bibore, derbasbûna di bin derenca de, qevaztina di ser ava bi sabûn, mirov roja sêşemê dest bi kar bike yan jî derkeve rêwîtiyê, nêrîna li neynikê bi şev an jî jêkirina neynokan û hwd. de heye, batil e. Ango tu esil jê re tune ye. Gotina "Piştî birîna nîkahê derketina mêr û jinê bi şev, dibe sebebê bêoxiriyê" jî yek ji wan gotinan e.

Di derbarê şowmî û bêoxiriyê de Pêxemberê me (s.a.w) wiha kerem kiriye:

"*Bêoxirî/bêqidoşî tune ye. Ya herî rind ku bi qencî were nirxandin*."[628]

500. Nêrîna li wêneyê mirî ma ezab dide mirî?

Pirs: Em dibihîsin ku nihêrtina li wêneyê mirî, azarê didê. Gelo rastiya vê heye?

Bersiv: Tiştekî wiha tune ye. Ev, bi tevahî lêanîn û derew e. Însan, bi sedema kirinên şaş ên li dinyayê hatine kirin bi tenê, dê ezab bibînin. Ji ber ku kişandina wêne ne yek ji wan e, nihêrtina li wêneyê miriyan, ezab nade wan.

[628] Buxarî, Tib, 44.

501. Ma nimêjeke bi navê nimêja gorê heye?

Pirs: Tê gotin ku piştî her nimêjê, divê du qam nimêj bê kirin. Hin kes ji vê re nimêja şukr/spasiyê jî dibêjin. Ji nimêja ku piştî eşayê tê kirin re jî dibêjin nimêja gora nûr. Piştî mirinê ew nimêj dê gora mirov bi nûr bike. Ma ev tiştên han rast in?

Bersiv: Nimêjeke bi navê nimêja gorê yan jî goranûr, tune ye. Lewra 'îbadet, bi nessê ango bi ayet û kirinên Pêxemberê me sabit dibin. Divê ku îtibar bi xurafeyên wiha -yên ku ne Xwedê Teala ji însanan daxwaz kiriye û ne jî Pêxemberê me tewsiye kiriye-, neyê kirin.

502. Pîreka bi hemil gava porê xwe kur bike, ma zarokê/a wê dê temenkin be?

Pirs: Tê gotin ku kurkirina por ji bo pîrekên ducanî, ne durist e. Eger kur bikin jî zaroka ku biwelide dê temenkin be. Ma ev tişt çiqas rast e?

Bersiv: Di dînê me de çi bo mêran çi jî bo jinan, tu delîlek ku kurkirina por qedexe bike tune ye. Tiştê we bihîstiye, ji xurafeyeke ku di nava civakê de digere, pêk tê. Ji bo pîrekan, ne kurkirina por, belbî ku porê xwe nîşanî kesên biyanî bidin hatiye qedexekirin. Piştî ku ev yeka han li ber çavan hat girtin, bo pîrekê -çi ducanî be çi jî ne ducanî be- tu pirsgirêk di kurkirina por de tune ye.

503. Ma pîrek dikarin biçin serdana goran?

Pirs: Pîrekên ducanî eger biçin serdana goran di cihekî zaroka ku dê çêbibe dê deq derkeve. Ma tiştekî wisa, ango rastiya vê yekê heye?

Bersiv: Di serdana gorî û goristinê de ji bo pîrekên ducanî, ji aliyê dînî ve tu zirarek tune ye. Tiştê we bihîstiye, xurafe ye. Tu esl û binyadek jê re tune ye. Guhê xwe nedin tiştên wiha û pê îtibar nekin.

Tiştê mehzûr, helwesta ku li hember ê di gorê de tê nîşandan. Lewra ji bo kesê ku di gorê de ji xwestina bexşandina wî ji Xwedê Teala pê ve, tu tiştekî din nayê kirin.

504. Ma çilê zarokan heye?

Pirs: Mesela çilê zarokan, gelo xurafe ye? Ma şûştin û rakirina xuslê bo pitikan heye?

Bersiv: Tiştê ku bi navê çilê zarokê tê zanîn, tore û kevneşopiyek e. Di dînê me de tiştekî bi vî rengî tune ye.

Rakirina xuslê jî bo nimêjê lazim e. Ji ber ku kirina nimêjê li ser pitik an jî zarokên ku hêj negihîştine çaxa bilûxê, ne ferz e, rewşeke ku xuslê ji bo wan pêwîst bike, tune ye. Ew, bi tenê bo paqijiyê, ne ji bo tiştekî din tên şûştin.

505. Divê mirov çi bike ji navika zarokê?

Pirs: Ma divê mirov çi bike ji navika zarokê? Di nava gel de baweriya ku cihê lê tê veşartin, dê bandorê li zarokê bike, heye.

Bersiv: Navika zorakê, eger cihekî munasib were dîtin, tê veşartin. Eger neyê dîtin mirov dê têxe nav potekî, kîsikekî û biavêje sergo. Baweriya di nav gel de belav bûye ku; cihê navika zarokê lê hatiye veşartin, dê bandorê lê bike, tu esl û kokek jê re tune ye. Taybetmendiyên zarok yên rewiştî û exlaqî, bi perwerde û çavdêriya ji malbat û hawirdorê bidest dixe, pêk tê. Malbat berî navika zarokê, divê ku bifikirin ka dê zarokên xwe çawa perwerde bikin.

506. Ma rast e ku nîkahên di meha Seferê de tên birîn, temenkin in?

Pirs: Tê gotin ku birîna nîkaha dînî û fermî di meha Seferê de ne baş e. Ma li ser vê yekê hukmekî dînî heye? Dibêjin ku zewaca wan ne bi xêr û bêr e. Gelo tiştekî wiha di Qur'anê de heye?

Bersiv: Hemû tiştên ku di derbarê bêqidoşî û bêoxiriya meha Seferê de tên gotin, ji baweriyên pûç ên dema Calihiyê ne. Di dînê me tu cihek ji wan re tune ye.

"Bi sedema ku meha Seferê di heyama Cahiliyê de meha bêqidoşiyê dihate pejirandin, kirina 'umreyê di vê mehê de ji gunehên mezin dihat jimartin. Herwiha tê fêhmê ku baweriyên çewt ji zewaca ku di vê mehê de were kirin dê emirkin be, karên ku tê de hatibe destpêkirin dê bê encam an jî bi xerabî dê dawî lê bê di Îslamê de jî hebûna xwe berdewam kiriye. Hedîsa ku zêhniyeta Cahiliyê ya di derbarê meha Seferê de red dike[629] zêdetir bi awayê qedexekirina tetbîqa nesî (paşdexistin-pêşdexistina mehan) ku meha Seferê ji mehên heramê bê hesibandin, hatiye şîrovekirin; lê belê siyaq û sîbaq îmkanê dide ku bi awayê batiliya baweriyên şaş ên ku bi vê mehê re girêdayî ne jî were fêhmê."[630]

507. Rast e ku bazirganiya di roja aşûreyê de bereketê zêdetir dike?

Pirs: Dibêjin ku bazirganiya di roja aşûreyê de bereketê pirtir dike. Ma ev yeka han rast e?

Bersiv: Di derbarê ku bazirganî û danûstendina di roja aşûreyê de dê bereketê bîne, ên ku di wê rojê de desmêj bigirin heta salekê dê nexweş nekevin de tu ayet, hedîs, gotinên sehabî yan jî tabiiyan tune ye. Ev baweriyên ku di nav gel de belav bûne, tu mesnedek ji wan re tune ye. Ji ber vê, tu qîmeteke wan a dînî jî tune ye.

Di Beyheqî û Teberanî de hedîseke ku kesê di roja aşûreyê de ji malbata xwe re comerd be, Xwedê jî dê heta salekê bi comerdî pê re tev bigere, tê ragihandin. Hemû senedên vê riwayetê bi rêyên zeîf hatine neqilkirin. Herçiqas Îmam Suyûtî bibêje ku "*temamê van rêyên zeîf piştgiriyê didin hev û hedîsê bi hêz dikin*" jî Îmam Zerkeşî di

[629] Buxarî, Tib, 19; Ebû Dawûd, Tib, 24.
[630] M. Kamil Yaşaroğlu, "Safer", **DİA**, 2008, XXXV, 451.

derheqê vê riwayetê de wiha gotiye "*eslê wê tune ye, ev gotina Muhemmedê kurê Munteşir e.*"[631]

Eger zeîf be jî encama ku danûstendina di vê rojê de bereketê bêhtir dike, ji vê hedîsa ku hatiye neqilkirin nayê derxistin.

Riwayeteke manend wiha ye:

"Xwedê, rojîgirtina rojekê ji salê li zaroyên Îsraîl ferman kir ku ew jî roja aşûreyê ye. Ew jî roja dehê Muherremê ye. Wê rojê rojî bigirin û ji malbata xwe re destfireh bin. Lewra Xwedê wê rojê poşmaniya Adem qebûl kiriye."

Lê ev riwayet mewdû'/derew e.[632]

Di Ansîklopediya Dîyanetê di benda "Âşûrâ"yê de ev zanyariyên han cih digirin:

"Di heqê fezîleta rojîgirtina di roja aşûreyê de hedîsên sehîh hene, lê di derbarê kirinên mîna serşûştina di wê rojê de kilkirina çavan, xemilkirin, hinekirin, pîrozkirina hev, çêkirina (xwarina) aşûreyê, dayîna sedeqeyê, serdana mizgeftan û hwd. de tu riwayeteke sehîh tune ye. Pirê metnên tên angaştkirin ku hedîs in, di rastiya xwe de ne hedîs in, bêhtir muhtemel e ku ji kevneşopiya Cahiliyê û adetên Cihûyan hatibin. Lewra tu qeydeyeke ku Qasidê Xwedê û hevalên wî li gorî van adetan tevgeriyane, tune ye. Mesela, riwayetên bi awayê "*Kesê roja aşûreyê çavê xwe kil bike, helak nabe*", "*Kesê roja aşûreyê serê xwe bişo, wê salê nexweş nakeve*" di pirtûkên serdemên dawîn de cih girtine û li gorî gotina Îbn Teymiyye babetên bi vî rengî, ji aliyê Nasibiyên ku ji Ehlê Beytê buxz dikin, hatiye lêanîn."[633]

---

631 Bnh: 'Eliyyu'l-Qarî, **el-Esraru'l-Merfu'e**, rp. 345-346, jimara hedîsê: 532; Muhemmedê kurê 'Ebdurrehman es-Sexewî, **el-Meqasidu'l-Hesene**, thq: Muhemmed Osman el-Huşt, çapa 4em, Beyrût 2002, rp. 504-505, jimara hedîsê: 1193; Îsmaîlê kurê Muhemmed el-'Eclûnî, **Keşfu'l-Xefa**, çapa 3yem, Beyrût 1988, II, 283-284, jimara hedîsê: 2642.

632 Bnh: Şewkanî, **Fewaidu'l-Mecmu'e,** rp. 96, jimara hedîsê: 283.

633 Yusuf Şevki Yavuz, "Âşûrâ", **DİA,** 1991, IV, 25.

508. Ma rast e ku pir bûyerên girîng di roja aşûreyê de qewimîne?

Pirs: Di xutbeya rojeke înê de hate gotin ku roja aşûreyê, roja ku Hezretî Yûnus tê de ketiye zikê masî, roja jidayikbûna Hezretî Îbrahîm û roja rizgariya wî û hwd. ji bûyerên mezin di vê rojê de qewimîne. Tiştê ku ji zarokatiya min tê bîra min; piştî ku Hezretî Nûh ji keştiyê dadikeve û xwarinên xwe yên mayî dixin ser hev û pê xwarinê (aşûreyê) çêdikin. Mesela ku ewqas bûyerên mezin di heman rojê de qewimîne, gelo rast e?

Bersiv: Di derbarê bûyerên tê angaştkirin ku di roja aşûreyê de pêk hatine, çawa ku ne tu ayet ne jî tu hedîs hene, tu zanyariyeke ku ji aliyê dîrokî ve wan bûyeran rast bidêre jî tune ye. Di Ansîklopediya Îslamî ya Dîyanetê de bi vê mijarê re eleqedar, ev agahiyên han cih digirin:

"Di derbarê jêderka aşûreyê de nêrînên ku çavkaniyan diyar kirine tomarkirina wan di du xalan de pêkan e:

1. Aşûre, roja ku Hezretî Mûsa û gelê xwe ji zordestiya Fîrewn rizgar bûne û gelê Cihû bi rojîgirtina wê rojê berpirsyar hatine girtin. Li gorî vê nêrîna ku bêhtir ji aliyê zanyarên rojhilatnas ve tê pejirandin, aşûreya ku misilman wê pîroz qebûl dikin û tê de rojî digirin, xwe dispêre kelepora Cihûyan.

2. Aşûre, ji Hezretî Nûh û vir de di temamê dînên Samî de hebûye û di dewra Calihiyê de jî ji Hezretî Îbrahîm ve di nava 'Ereban de rojeke girîng hatiye dîtin û tê de rojî hatiye girtin. Ev nêrîna han, xwe dispêre riwayetên ku ji Hezretî 'Aişeyê û 'Ebdullahê kurê 'Umer hatine ragihandin.

Di bara jêderka aşûreyê de ji bilî van herdu raveyan xeberên ku di hin pirtûkên dîrok, hedîs û fiqhê de cih digrin vê rojê, wekî roja ku tobeya Hezretî Adem hatiye qebûlkirin, roja ku Hezretî Yûnus ji zikê masî derketiye, roja ku Hezretî Mûsa û Îsa hatine cîhanê, roja ku desthilatdarî ji Hezretî Suleyman re hatiye dayîn, roja ku poşmaniya Hezretî Dawûd hatiye pejirandin, roja ku ji aliyê Xwedê ve temînata ku

hemû gunehên Pêxember dê bên bexşandin hatiye dayîn û di wê rojê de ji Mekkeyê bi bal Medîneyê ve koç kiriye, tewsîf dikin.

Lê mixabin, ji aliyê zanistî ve çawa ku derfeta rastderxistina van tiştan tune ye, çewtiya hinekan jî li holê ye. wekî mînak hicreta Hezretî Pêxember, ne di 10ê Muherremê de belbî di 12ê meha Rebîulewwelê de pêk hatiye. Riwayetên ji bilî vê jî ji Îsrailiyatan tên qebûlkirin."[634]

509. Şûştina destan bi axê ma dibe sedema feqîriyê?

Pirs: Di pirtûka "Mızraklı İlmihal" de şûştina destan bi çiravê yek ji sedemên feqîrî û jarîtiyê hatiye nîşandan. Ma tiştekî wiha heye? Wekî din jî ma çivara di vir de çi ye?

Bersiv: Çirav ji heriya ku di hundirê wê de unsûrên organîk ên curbicur hene, bi piranî jî bi kîl, tarî û mizeloqî ye re tê gotin. Raveya ku ev dibe sebebê jarîtiyê, şîroveya nivîskarê "Mızraklı İlmihali" ye. Tu ayet û hedîsek ku vê rast bidêre tune ye.

Di pirtûka İbrahim Hakkı Erzurumî ya bi navê "**Marifetname**" de jî şewitandina qalikên sîr û pîvazê, malaştina malê bi şev, birêdeçûna li pêşberî kesên bi temen ji mirov mezintir, spartina seyara derî, rûniştina di nava derî de piştî kirina nimêja sibehê, mirov zû ji mizgeftê derkeve, her sibeh mirov zû biçe bazarê, mirov ji bazarê dereng vegere malê, pêçandina şaşikê rûniştî, vemirandina fanûs û mûmê bi nefesê, razana di mala bê derî de bi tenê û hwd. mîna sedemên feqîriyê hatiye nîşandan.[635]

Tu eleqeya van tiştan û rastiyê -çi ji dûr çi jî ji nêz-, bi hev re tune ye.

---

[634] Şevki Yavuz, "Âşûrâ", **DİA,** IV, 25.

[635] Erzurumlu İbrahim Hakkı, **Marifetname**, sadekirina ji Osmanî: Faruk Meyan, Weşanên Bedir, Stenbol 1980, rp. 836-837.

510. Peydakirina 7 peykerên fîlan di malê de ma oxiriyê tîne?

Pirs: Dibêjin ku "peydakirina 7 fîlan di mal de siûd û oxiriyê tîne." Gelo rastiya vê heye? Bioxiriya 7an rast e; lê peydakirina heft peykerên fîlan di malê de ji min re tewş tê. Hûn dikarin me agahdar bikin?

Bersiv: Baweriya peydakirina heft peykerên fîlan ku dê ji însanran re oxir bîne, ji xurafeyekê pêk tê. Ne ji dûr ne jî ji nêz ve tu eleqeya wê û dînê me bi hev re tune ye. Divê ku mirov îtibarê bi agahiyên bi vî rengî neke.

511. Xidirellez çi ye? Ma tu girîngiyeke wê di dînê me de heye?

Pirs: Xidirellez çi ye? Gelo di pîrozkirina vê rojê de tu pirsgirêk heye? Wê rojê tiştinan dixin ber koka gulan û daxwaza hin tişta dikin. Ma ev, batil e yan na?

Bersiv: Baweriya ku di roja xidirellez de vexwarina ava gul û çîçekên beyar û çolan dê şifayê bide nexweşan, bi fikra ku di şeva xidirellez de dê nûr li ser hemû avan bibare û kesê di wê şevê de bikeve avê, dê li hemberî temamê nexweşiyan xwe biparêze, di wê şevê de xwarin û vexwarinên li malê devê wan vekirî bên hiştin, nivînsandina daxwaziyên xwe di kaxizekê de û danîna wan li ber koka darên gulan û hwd. di dînê me de tu cihek ji wan re tune ye. Ev, ji kevneşopiya gel e.

Zanyariya dîrokî ya di derbarê vê de jî bi kurtasî wiha ye:

"Xidirellez, îbaret e ji navê Xidir û Îlyas ê ku di devê gel de ev şekil girtiye. Koka wê xwe dispêre dema berî Îslamê ji Asya Navîn, Rojhilata Navîn û cejnên havînê yên Anatolyayê, li dora têgeha Xidir an jî Xidir û Îlyas şeklekî dînî girtiye û bûye cejna gel. Navenda vê cejnê bi taybetî jî di nava Tirkên Anatolya û Balqan, Qirim, Iraq û Sûriyê de li gorî salnameya Gregoryen ya ku îro tê bikaranîn di 6ê Gulanê de tê pîrozkirin.

Di nav gel de baweriya ku roja xidirellez, roja ku Xidir û Îlyas pêxember ên ku namirin yek li bejê, ê din li deryayê dijî alîkariya yên di tengasiyê de ne dikin û salê carekê tên cem hev, heye.

Tirkan 6ê Gulanê, piştî ku hatin Anatolyayê yan jî bi îfadeyeke gelempertir piştî ku hatin Rojhilata Navîn, nas kirin. Lewra li cem Filehên Rojhilat kulta Ezîz Yorgî (Aya Yorgi, Hagios Georgios, Saint George) di vê rojê de dihate pîrozkirin. Ev kulta ku li cem Filehên Rojhilat cihekî wê yê girîng hebû, bi borîna demê re bi kulta Xidir-Îlyas re bû yek û bi vî awayî di 6ê Gulanê de li Rojhilata Navîn û Balqanan jî di encama hevbandoriya Fileh û misilman piştî ku kulta Ezîz Yorgî û ya Xidir-Îlyas ketin nav hev, hat pîrozkirin."[636]

512. Gelo di kirina Wefqê de tu mehzûrek heye yan na?

Pirs: Wefq çi ye? Gelo di kirina Wefqê de tu mehzûrek heye yan na?

Bersiv: Wefq (اَلْوَفْقُ); cureyekî ji tilsimên ku mirov herf, jimar, gotin, esmayê husna, ayet û sûreyan li gorî pergalekê di hundirê çargoşeyekê de binivîse û pê li wateyên yên veşartî bigere.

Wefq, ku mirov herfên ebcedê, li ser esasê qîmeta wan a jimarî, cuda û bi awayên ku nayên fêhmê mirov wan çêbike û duayan bi jimar û bi şeklên endaze û geometrik binivîse.

Wefq di ferhengê de bi wateya "hevsaz, lêhatî, munasib"e; ev, xwe dispêre fikra -komek ji Hurûfiyan- dema herf bi tenê yan jî di halê ku bi hev re bin taybetiyên wan (xewas) hene û eleqeya wê bi fikra ku herf û jimar wateyên efsûnî di xwe de digirin, heye.

[636] Bo zanyariyên berfirehtir bnh: Ahmet Yaşar Ocak, "Hıdrellez", **DİA,** 1998, XVII, 313-315.

Tu bingeheke wê ya olî û zanyarî tune ye. Di dema ‘Ereban ya cahiliyê de nîsbeten agahî di derbarê wefqê de hebû û tê texmînkirin ku ji welatê Hindîstan û Sebiîyan derbasî erdnigariya Îslamê bûye.

Kesên ku vî karî dikin, piştre dibêjin ku em ji vê şîfa, derman û rêyên xelasiyê bi dest dixin. Tiştên wiha di dînê me de tu cih jê re tune ye. Teqez divê mirov xwe jê dûr bigire. Ji bo agahiyên berfirehtir binihêrin: İlyas Çelebi, “Vefk”, **DİA**, 2012, XLII, 605-607.

513. Ma rûniştina di nav derî de guneh e?

Pirs: Dibêjin ku rûniştina di nav derî de guneh e. Ma delîla vî tiştî heye? Çi ji aliyê dînî çi jî ji aliyê manewî ve ma tu pirsgirêk tê de heye?

Bersiv: Tu neseke (ayet û hedîs) ku rûniştina di nav derî de qedexe bike tune ye. Di dînê me de tu esl û binyadek ji vê baweriya xurafeyî re tune ye.

DUA

514. Ma rast e ku dua, bê selat û selamdayîna li ser Pêxember (s.a.w) qebûl nabin?

Pirs: Di beriya duakirinê de gelo şert e ku mirov selat û selaman li Pêxember (s.a.w) bîne? Tê gotin ku eger neyên dayîn, duayên mirov nagihêjên bal Xwedê Teala. Gelo rastiya vî tiştî heye?

Bersiv: Piştî nimêjan an jî çi dema ku mirov dê ji xwe re dua bike, ne şert e ku mirov hemdê Xwedê Teala bike û selat û selaman li Pêxemberê me (s.a.w) bîne, belbî ev, tewsiye û şîretek e. Hedîseke ku ji Qasidê Xwedê hatiye rahigandin wiha ye:

Li gorî ku ji Fudaleyê kurê Ubeyd (x.j.q) hatiye ragihandin, wî wiha gotiye: Qasidê Xwedê (s.a.w) li mizgeftê rûniştîbû, zilamek hat nimêj kir û piştre wiha dua kir: "**Ey Xwedayê min! Min bibexşîne û li min rehmê bike (bila dilê te bi min bişewite).**" Li ser vê Qasidê Xwedê got: "**Ey kesê ku nimêj kir! Te lez kir. Dema te nimêj kir û tu rûniştî, bi awayê ku layiqî Xwedê ye hemdê wî bike, piştre selat û selam li min bîne, piştre duayê ku tê bikî, bike**." Piştî wî, yekî din nimêj kir. Piştî nimêjê hemdê Xwedê kir û selat û selam li Pêxember anîn û tu tiştekî din nekir. Li ser vê, Qasidê Xwedê (s.a.w) jê re wiha got: "**Ey kesê ku nimêj kir! Dua bike, da ku dua bê qebûlkirin.**"[637]

Kesên dibêjin ku dua bê selat û selamên li ser Pêxember (s.a.w), bi bal Xwedê Teala ve bilind nabin û nayên qebûl kirin, vê hedîsa li jêr ji xwe re dikin delîl:

Li gorî ku ji 'Umerê kurê Xettab (x.j.q) hatiye ragihandin, wî wiha gotiye: "Dua di navbera erd û asîmanan de disekine, heta ku li ser Pêxember (s.a.w) selawat neyên dayîn, ji wî duayî tu tişt bi bal Xwedê ve bilind nabe."[638]

---

[637] Tirmizî, De'awat, 65.
[638] Tirmizî, Selat, 352.

Mubarekfûrî yê ku hedîsên Sunena Tirmizî şîrove kiriye, dibêje: "Ji ber ku ev ne gotina Pêxemberê me ye; belbî gotina Hezretî 'Umer e û bi sedem Ebû Qurra el-Esedî yê ku di zincîra senedê de derbas dibe mechûl e/nenas e, hedîs zeîf e."[639]

Xwedayê me wiha ferman kiriye: "**Hûn ji Min bixwazin, Ez ê jî bersiva we bidim. Bêguman ew ên ku ji bo 'îbadetkirina min xwe mezin didêrin, dê rezîl û ruswa têkevin dojehê**."[640] Mîna ku ji ayetê tê dîtin, beriya duakirinê behsa hemd û sena û selat û selamê nehatiye kirin.

Xwedê Teala bi awayekî aşkere bi me daye hînkirin, dê mirov çawa jê alîkariyê bixwaze. Ayet wiha ne:

"**Gelî yên ku bawerî anîne! Bi sebir û nimêjê alîkariyê ji Xwedê bixwazin. Bêguman Xwedê, teqez digel sebirkêşan e**."[641]

"**Dema bendeyên Min pirsa Min ji te bikin; bêguman Ez pir nêzîkî wan im. Ez bersiva banga gazîkerî dema bangî Min bike, didim. Êdî bila evdên Min jî bersiva Min bidin û bila bi Min bawerî bînin da ku ew bi ser rêya rast ve bibin**."[642]

"**Navên herî spehî (Esma'ul-Husna) ji bo Xwedê ne. Nexwe bi wan navan ji Xwedê daxwazê bikin..."**[643]

"**Bi dizî, bi zarezar û lakelak li ber Xwedayê xwe bigerin. Bêguman Xwedê ji sînorbihêran hez nake."**[644]

"**Gotinên xweş û rind her bi bal Wî ve bilind dibin û kar û barên qenc (salih) wan gotinan bilind dikin."**[645]

---

[639] el-Mubarekfûri, **Tuhfetu'l-Ahwezi,** Qahire 2001, II, 357, şîroveya hedîsa 486.
[640] Mu'min,40/60.
[641] Beqere, 2/153.
[642] Beqere, 2/186.
[643] E'raf, 7/180.
[644] E'raf, 7/55.
[645] Fatir, 35/10.

Li gorî ku ‘emelê rind û salihê ku di ayeta paşîn de derbas dibe, sirf ji selat û selaman pêk nayê, em dikarin bibêjin hedîsa ku li jor derbas bû, bi vê ayetê re li hev nake.

515. Hûn dikarin di derbarê îstixareyê de min agahdar bikin?

Pirs: Îstixare çawa tê kirin? Gelo nimêj û duaya îstixareyê heye? Û xewna piştî îstixareyê tê dîtin ‘emel pê tê kirin an na?

Bersiv: Îstixare di wateya, xwestina başî û xêrê ji Xwedê Teala di karê ku mirov serî lê dide. Ango îstixare di encamê de dua û xwestinek e. Xwedê Teala di Qur’ana Pîroz de hînî me kiriye-dê mirov çawa dua bike-. Pêxember (s.a.v) jî di jiyana xwe de di vî warî de ji me re bûye nimûne û mînak. Xwedê Teala wiha ferman dike:

“**Gelî bawermendan! Bi sebir û nimêjê alîkariyê ji Xwedê bixwazin. Bêguman Xwedê, teqez digel sebirkêşan e**.”[646]

Ji Cabir (x.j.q) wiha tê ragihandin:

“Qasidê Xwedê (s.a.v) wekî ayeteke ji Qur’anê be, di hemû karên xwe de îstixare hînî me dikir û wiha digot: “Dema yekî ji we niyeta kirina tiştekî kir, bila ji xeyrî nimêja ferz du rek'et sunet bike û wiha dua bike:

“Ya Rebbî! Ez ji Te ji zanebûn û hêza Te xêrê hêvî dikim. Ji lutfa Te ya mezin daxwaz dikim. Bêguman qaweta Te digihîje her tiştî, qaweta min tune ye. Tu dizanî lê belê ez nizanim. Tu hemû karê veşartî û nepenî dizanî. Xwedayê min! Eger ev kar ji bo dînê min, jiyana min, dawiya karê min, ji roja min an jî ji pêşeroja min re bixêr be, Tu ji min re teqdîr û muyeser bikî û piştre ji min re pîroz bikî. Eger ku ev kar ji bo dînê min, jiyana min, dawiya karê min, ji roja min an jî ji pêşeroja min re nebaş be ne

[646] Beqere, 2/153.

bixêr be, min ji wî karî û wî karî jî ji min dûr bixe. Li ku dibe bila bibe her dem a bi xêr ji min re teqdîr bike û min bi wê xêrê qayil bike."[647]

"Ji fuqefayê malikiyan Îbnu'l-Hac el-'Ebderî dibêje: Îstixare ji vê pêk tê. Û wiha berdewam dike, bi armanca nîşangirtinê û elamet dîtinekê, ew bi xwe yan jî kesekî din ji bo wî têkeve xewê, ji navê kesan an jî rojan oxirê hêvî bike, helwestên bi vî şeklî û serî lêdana li van**, bîd'et e."**[648]

Tu têkiliya xewnê û îstixareyê bi hev re tune ye. Mîna ku mirov rengê spî yan jî rengê kesk bibîne bi xêrê, rengê reş û sor bibîne bi nebaşiyê şîrove bike, tu bingeh jê re tune ye. Lewra îstixare wekî ku me li jor jî got: Xwestin û daxwaziya tiştê baş û bi xêr ji Xweda Teala ye û tu eleqeya wê bi xewnan tune ye.

Îstixare bûyereke ferdî ye û îbaret e ji: Piştî ku mirov hemû hewldan, lêgerîn û şêwrên xwe temam bike, dua ji Xwedayê bike ku ya baş û bixêr di emrê wî de teqdîr bike. Piştre mirov rizgar û serbest e. Ku bivê wê bike û nevê wê neke. Ango îstixare, tu girêdana wê ya pêwîst û teqez tune ye.

516. Ma mirov dikare bibêje: "Ya Rebbî! Tu bi xatirê filankesê… " duayê min qebûl bikî?

Pirs: Ji bo qebûlbûna duayên me, em dikarin di duayên xwe de wiha bibêjin: "Ya Rebbî! Ji bo xatirê Pêxember an jî ji ber xatirê filan dostê xwe, Tu duayê me qebûl bikî."

Bersiv: Duayên bi vî awayî, di mîna Mewlida Süleyman Çelebi de tê dîtin. Lê dua bi vî awayî nayê kirin. Ji ulemayê Henefiyan Îbn Ebu'l-Îzz wiha dibêje:

"Ne caiz e ku mirov tiştekî ji Xwedê Teala pê ve ji bo qebûlbûna dua bike navgîn û sedem... Kesê ku navgînan dixe duayên xwe dixwaze wiha bibêje: "Filankes

[647] Buxarî, Tehecud, 25, De'awat, 49, Tewhîd, 10; Îbn Mace, İqame, 188; Ehmedê kurê Henbel, **Musned**, III/344
[648] Salim Öğüt, "İstihâre", **DİA,** 2001, 2001, XXIII, 334.

ji bo ku ebdê Te yê baş û salih e, Tu yê duayê min qebûl bikî." Lê ka çi pêwendî di nava wê xwestinê û salihtiya yê din de heye. Ev, di dua û xwestina ji Xwedê Teala de sînor nenaskirin e!

Xwedê Teala di ayetekê wiha ferman dike:

"**Bi dizî, bi zarezar û lakelak li ber Xwedayê xwe bigerin. Bêguman Xwedê ji sînorbihêran hez nake**."[649]

Ev dua û yên mîna wê piştre hatine derxistin. Ji Pêxember (s.a.v), sehabî, tabiîn û Îmaman tiştekî wiha nehatiye ragihandin. Xwedê Teala ji hemiyan razî be. Ev dua, encax di tilsimên ku kesên cahil an jî hin peyrewên terîqetê nivîsandine de tê dîtin.[650]

517. Rast e ku sehabiyekî kor, Pêxemberê me ji xwe re kiriye wesîle û dua kiriye?

Pirs: "Sehabiyekî ku di çavên wî de hin nerihetî hebûye, tê cem Pêxember û dibêje: "Ey Qasidê Xwedê! Ji bo tenduristiya min ji Xwedê Teala lava bike." Pêxember jî wiha bersiva wî dide: "Eger tu bixwazî ez ê dua bikim an jî sebir bike, ev ji te re bi xêrtir e." Zilamî got: "Dua bike." Li ser vê yekê Qasidê Xwedê jê re dibêje desmêj bigire û wiha bibêje: "Ey Xwedayê min! Ez bi xatirê Pêxemberê Te yê rehmetê Muhemmed, berê xwe didim Te û ji Te dixwazim. Ji bo bicihanîna wê daxwaziya min ez bi te, berê xwe didim Xwedê Teala. Ey Xwedayê min! Pêxemberê rehmetê, ji bo şifaya min bike navgîn. "Zilam tiştê ku jê re hat gotin, kir û piştî demekê çavên wî rihet bûn." Gelo ev hedîs rast e? Eger rast be, ma nabe delîl ji bo wesîleya di duayan de?

---

649 E'raf 7/55.

650 'Elîyê kurê Muhemmedê kurê Ebu'l-Îzz ed-Dimeşqî, **Şerhu'l-'Aqîdeti't-Tehawiyye,** Beyrût 1408/1988, I, 295-297.

Bersiv: Di pirtûka me ya bi navê "**Kur'an Işığında Tarikatçılığa Bakış**", -bi pirsa we re girêdayî - ev agahiyên han derbas dibin:

Şêx efendî – Tu hebûna wesîleyê qebûl nakî. Di derbarê hebûna wê de delîla me heye. Çavên zilamekî kor dibin, tê ba Muhemmed (s.a.w) û ji bo xwe, jê duayê dixwaze. Ew jî dibêje:

"Desmêj bigire, du rek'et nimêj bike û wiha dua bike: "Ey Rebbê min! Ez Qasidê Te, ji xwe re dikim navgîn û ji Te şifayê dixwazim."

Wî zilamî digel vî duayî got: "Ey Rebbê min! Pêxemberê xwe, ji min re bike mehdervan. "Ev hedîseke sehîh e. Eger tu vê hedîsê qebûl nekî, em jî te qebûl nakin.

Bayındır – Ev hedîs, di Tirmizî, Îbn Mace û Musned a Ehmedê kurê Henbel de derbas dibe.

"Zilamekî ku çavên wî kor in, tê cem Muhemmed (s.a.w) û wiha dibêje:

– 'Ji Xwedê dua bike, bila şifayê bide min.' Qasidê Xwedê dibêje ku:

– 'Eger tu bixwazî, ez dua bikim an jî li ser rewşa xwe sebir bike, çêtir e.

' Zilam dibêje:

– 'Dua bike'.

Muhemmed (s.a.w) emrê wî dike ku xweşik desmêj bigire, du rek'et nimêj bike û wiha dua bike:

'Ey Xwedayê min! Ez ji Te dixwazim, digel Pêxemberê rehmetê Muhemmed, ez berê xwe didim Te.'

Ya Muhemmed! Ji bo pêkhatina vê pêdiviya min, bi te re ez berê xwe didim Xwedê. Ey Rebbê min! Wî di derheqê min de bike mehdervan."[651]

Wateya gotina "…Wî di derheqê min de bike mehdervan…" "duayê wî yê di derbarê min de qebûl bike. "Lewra mehdervanî, çûna bi yekî re ji bo alîkariyê û xwestina tiştekî ye.[652]

Zilam, ji Pêxember hevaltiya di dua de xwestiye, Pêxember jî ji bo duakirinê soz daye û xwestiye ku pê re wiha dua bike:

اللهم إني أسألك وأتوجه إليك بنبيك محمد نبي الرحمة

"Ey Xwedayê min! Ez ji Te dixwazim, digel Pêxemberê rehmetê Muhemmed, ez berê xwe didim Te."

Herfa cerrê ya di serê bêjeya "Nebî" de ye, dibe ku mirov xwe pê şaş bike. Ev herf, wateya "îlsaq"ê dide. Îlsaq, bi wateya zeliqandin û mirov tiştekî bike parçeyê tiştekî din. Ji vê bonê wateya duayê ya rast mîna ku li jor hatiye nivîsandin.

Eger ne wisa be wate, dê bibe li dijî vê ayetê:

"**Bibêje: Ji ya Xwedê xwestibe pê ve, ez nikarim tu fêde û zirarê bidim xwe jî**..."[653]

---

[651] Tirmizî, De'awat, 119, jimara hedîsê: 3578. Tirmizî di dawiya hedîsê wê nîşeyê dide: "Ev hedîseke hesen, sehih xerîb e. Em hedîsê sirf bi vî awayî dizanin; Îbn Mace, Îqametu's-Selat, 189, jimara hedîsê: 1385; Ehmedê kurê Henbel, **Musned**, IV/138.

[652] Raxib el-Isfahanî, **el-Mufredat**, شفع.

[653] E'raf, 7/188. (**Jêder:** Abdülaziz Bayındır, **Kur'an Işığında Tarikatçılığa Bakış,** çapa 6em, Weşanên Weqfa Suleymaniyeyê, Stenbol 2010, rp. 22-24).

518. Ma di dua de divê mirov herdu destên xwe bide ber hev an ji hev veqetîne?

Pirs: Di dema duakirinê de hin kes destên xwe vedikin, hin kes jî herdu destên xwe didin ber hev. Gelo, tu bingeh û esas ji berhevkirina destan re heye? An jî ev tiştekî ku piştre derketiye?

Bersiv: Li gorî agahiyên ku me ji çavkaniyên pêbawer bi dest xistine, Pêxemberê me (s.a.w) di dema duakirinê de destên xwe bi aliyê jor ve bilind kirine. Lê belê tu agahiyên bê ka destên wî bi hev ve yan ji hev veqetiyayî bûne, nayên dayîn. Herçiqas riwayeta ku di kitêba bi navê **Mu'cemu'l-Kebîr** ya Teberanî de derbas dibe ya ku ji 'Ebdullahê kurê 'Ebbas (x.j.q) tê ragihandin ku "Pêxember (s.a.w) di wexta duakirinê de destên xwe dane ber hev û wiha dua kiriye." hatibe riwayetkirin jî lê belê di heman wextê de Hafiz el-Îraqî dibêje ku ev hedîs zeîf e.[654]

Bi dilekî rihet em dikarin bibêjin ku, di wexta duakirinê de tu emrekî teqez û girêdar ji Qasidê Xwedê (s.a.w) tune ye.

519. Di hin duayan de gelo çima mirov berê destên xwe dide jêr?

Pirs: Dema duayê "Rebbena atîna" tê xwendin, hin kes di "weqina 'ezabe'n-nar" de destên xwe berevajî dikin. Gelo di derbarê vê kirinê de tu hedîseke rast heye?

Bersiv: Di hin duayan de ku mirov berê kefa destên xwe bide erdê, riwayet hene. Yek ji wan, dua baranê ye.

Enesê kurê (x.j.q) wiha radigihîne:

"Pêxember (s.a.w) dua baranê kiriye û bi pişta destê bi bal asîmanan ve îşaret kiriye."[655]

Îmam Newewî yê ku vê hedîsê şîrove dike, wiha dibêje:

[654] Hafiz el-Îraqî, **Texrîcu Ehadîsi'l-Îhya**, I, 256.
[655] Muslim, Selatu'l-Îstisqa, 6 (896).

"Ji ulemayên me (Şafiî) û hinek ji ulemayên din, gotine ku di duayên ku ji bo rabûna belayan mîna xelayê tê kirin, rakirina dest û pişta destên mirov li jor be; ji bilî van, dema mirov daxwaziya tiştekî bike ku berê kefa destên mirov li asîmanan be, sunet e."[656]

Bi vê mijarê re girêdayî, di **Musned** a Îmam Ehmedê kurê Henbel de riwayeteke wiha cih digire:

Pêxember (s.a.w) dema tiştek ji Xwedê Teala bixwesta berê kefa destên xwe dida jor. Lê belê, dema xwe ji tiştekî biparasta pişta destên xwe dida jor.[657]

Heysemî, herçiqas bibêje ku seneda vê sehîh e jî[658] bi sedem Îbn Lehî'a yê ku di zincîra hedîsê de ye, qelsiya vê hedîsê hatiye ragihandin.[659]

520. Hukmê ku mirov piştî duakirinê destên xwe bi ser çavên xwe bixe çi ye?

Pirs: Di duayên piştî nimêjê yan jî di demên din de tên kirin, hukmê ku mirov destên xwe bibe ser çavên xwe çi ye?

Bersiv: Li gorî ku ji 'Umerê kurê Xetab (x.j.q) hatiye ragihandin, wî wiha gotiye:

"Pêxember (s.a.w) dema ji bo duakirinê destên xwe radikirin heta ew bi ser çavên xwe nedana ew danedixistin xwarê. "Muhemmedê kurê Musena di riwayeta xwe de wiha dibêje: "Heta ew bi ser çavên xwe nedana ew danedixistin xwarê"[660]

Tirmizî yê ku ev hedîs riwayet kiriye, agahiyek wiha dide:

---

[656] Newewî, **Şerhû Sahîhi Muslim**, VI, 190, şîroveya hedîsa 896an.
[657] Ehmedê kurê Henbel, **Musned**, IV/56.
[658] Bnh: el-Heysemî 'Eliyê kurê Ebûbekir**, Mecme'u'z-Zewaid**, Daru'l-Kutubi'l-Ilmiyye, Beyrût 1988, X, 168.
[659] Bnh: Şewkanî, **Neylu'l-Ewtar**, IV, 10.
[660] Tirmizî, De'awat, 11.

Ev hedîs, **sehîh xerîb e**. Bi rêya Hemmadê kurê Îsa pê ve nayê naskirin. Ji xeyrî vî tu kesî din riwayet nekiriye. Ev kesê han, hedîs hindik riwayet kirine. Hin kesan ji vî riwayet kirine. Henzeleyê kurê Sufyan di derheqê wî de gotiye ku ew mirovekî siqe ye, yanî bawerî pê tê.

Ji ulemayên hedîsê Îbn Hecerê el-Esqelanî di kitêba xwe ya bi navê **Bulûxu'l-Meram** de dibêje ku: Di Sunen a Ebû Dawûd û di hin çavkaniyên din ên hedîsê de ji 'Ebdullahê kurê 'Ebbas (x.j.q) hedîseke din mîna vê hedîsê hatiye riwayetkirin, dema ku temamê van riwayetan bi hev re bên nirxandin, em dikarin bibêjin hedîs, hesen e.[661]

Di bin ronahiya van agahiyan de mirov dikare bibêje ku piştî duakirinê, sunet e ku mirov destên xwe bi ser çavên xwe bixe.

521. Hukmê ku mirov piştî her duayî bibêje "el-Fatîhe" çi ye?

Pirs: Hukmê ku mirov piştî her duayî bibêje el-Fatihe çi ye? Di mizgeftan de piştî duaya xwarinê kesê ku dua dike, bi gotina el-Fatiheyê duaya xwe bi dawî dike. Ma ev tiştekî sunet e? Ango Pêxember (s.a.w) tiştekî wiha kiriye?

Bersiv: Li gorî ku em dizanin, ev tiştê han sirf li ba me heye. Ev kirina han, xwe naspêre ne ayet û ne jî tu hedîsên Pêxember (s.a.w).

522. Ma rast e ku bêjeya "Amîn" ji Cihûyan derbasî çanda Misilmanan bûye?

Pirs: Bêjeya "amîn" ya ku piştî Fatiheyê yan jî duayan, em bi kar tînin, tê çi wateyê? Di hin çavkaniyan de derbas dibe ku ev bêje, ji koka "amen"ê tê û navê xwedayekî kevn ê Cihûyan e. Gelo tu rastiyek ji vê re heye? Û bi çi sedemê piştî Fatihayê, em dibêjin amîn?

[661] Bnh: Îbn Hecer, **Bulûxu'l-Meram**, Babu'z-Zîkr we'd-Dua, jimara hedîsan: 1582-1583.

Bersiv: Gotina amîn sunet e. Ev tişt, ji aliyê Pêxember (s.a.w) ve hem hatiye kirin û hem jî hatiye tewsiyekirin. Hedîsên bi mijarê re têkildar in wiha ne:

Ebû Hureyre (x.j.q) wiha dibêje: "Qasidê Xwedê (s.a.w) kerem kir ku: "**Dema îmam got amîn, hûn jî bibêjin amîn. Lewra amîna kê rastî amîna firîşteyan were, hemû gunehên wî yên derbas bûyî tên bexşandin**." Îbn Şihab dibêje ku: Qasidê Xwedê (s.a.w) digot amîn."[662]

Riwayeteke din a ku di Sehîha Buxarî de derbas dibe wiha ye:

"**Dema qarî (xwendevan) got amîn, hûn jî bibêjin amîn. Lewra firîşte jî dibêjin amîn. Amîna kê rastî amîna firîşteyan were, hemû gunehên wî yên derbas bûyî, tên bexşandin."**[663]

Muslimanên li çavkaniyan dinihêrin û dibêjin ku ev bêje ji Îsrailiyatan hatiye, gelo çima bi van agahiyên ku li jor di çavkaniyan de derbas dibin, îtibar nakin. Çêderka bêjeyê bê ka ji kîjan zimanî tê, çi girîngiya wê heye? Bikaranîna wê ji aliyê Pêxemberê me (s.a.w), ji bo kesê misilman, ma ne kafî ye?

Ji bo bersiveke manendê vê ji kerema xwe re serî li lînka jêr bidin:

http://www.fetva.net/goruntulu-fetvalar/sumer-kitabeleri-ve-dinler-arasindaki-iliskiyi-nasil-degerlendiriyorsunuz.html

Ji bo agahiyên berfirehtir di derbarê koka bêjeya amîn de û wateyên wê de ji kerema xwe re li çavkaniya ku di navnîşana jêr de ye binihêrin:

http://www.islamansiklopedisi.info/dia/pdf/c03/c030032.pdf

[662] Buxarî, Ezan, 112; Muslim, Selat, 72, (410); Muwetta, Selat, 44, (1, 87); Ebû Dawûd, Selat, 172; Tirmizî, Selat, 185; Nesaî, Îftitah 34, 35; Îbn Mace, Îqamet, 14.
[663] Buxarî, De'awat, 63.

523. Hukmê duakirina bi hev re di Îslamê de çi ye?

Pirs: Di Îslamê de cihê duakirina bi hev re, bi civakî çi ye? Li 'Erefeyê, duayê piştî xwarinê, di duayên piştî nimêjan… Eger hûn min agahdar bikin, ez ê bextewar bibim.

Bersiv: Di rewşên ku delîlek şer'î hebe, mîna di duayê qunût û duayê baranê de tu mehzûrek tune ye.[664] Lewra di van cihan de delîleke şer'î heye ku mirov dikare xwe bispêre wan. Ji ber vê yekê mirov dikare di wan rewşan de bi hev re dua bike. Ji xeyrî van cihan, wekî duakirina piştî nimêjê, piştî veşartina mirî, li 'Erefeyê û duakirina piştî xwarinê, ji Pêxemberê me (s.a.w) di vî warî de tu tetbîq û riwayet nehatine ragihandin. Ya baş û rastir ku mirov ne bi hev re, belbî bi tenê duayê xwe bike.

524. Gelo durist e ku mirov dua ezanê, digel cemaetê li mizgeftê bi hev re bixwîne?

Pirs: Di duayê ezanê de ya baş ku mirov bi hev re dua bike yan jî her kes bi serê xwe duaya wê bixwîne?

Bersiv: Di duayê ezanê de tiştê muwafiqî suneta Pêxember (s.a.w), her kesê ku dengê ezanê biçê, bi tena serê xwe duayê wê bixwîne.

Ji Pêxember (s.a.w) hatiye ragihandin ku dema muezzin ezan dixwend wî jî gotinên wî dubare dikirin û piştî ku ezan xelas dibû duayê ezanê dixwend.[665]

Li hember vê bi tu awayan nehatiye ragihandin ku wî bi cem'etî bi civakê dua daye xwendin.

---

[664] Mîna di qunûta nimêja sibehê û pazdehê dawî di meha Remezanê de li gorî Şafiîyan û di nimêja witir de li gorî Henefiyan û di duayê baranê de tu zirara xwendina dua bi hev re/civakî, tune ye.
[665] Bnh: Buxarî, Ezan, 8.

525. Ma tu esil ji duayê "Kenzu'l-'Erş" û duayê "Qedeh"ê re heye?

Pirs: Hûn dikarin di derbarê duayê "Kenzu'l-'Erş" û duayê "Qedeh"ê de agahiyê bidin? Gelo xwendina van duayan rast e?

Bersiv: Duaya Kenzu'l-'Erş û Qedehê, duayekî ku ne di dema Pêxember (s.a.w) û ne jî di dema sehabeyan de tune bûye. Ev, di demên pir paş de derketine holê û bi hin jimarên curbicur û bi sozan, bi mubalexeyan hundirê wê hatiye dagirtin. Ji dêvla van duayan, divê ku mirov bi duayên ku di ayet û hedîsan de hatine tewsiyekirin digel hînkirina wateya wan û bi wan ji Xwedê Teala re dua bike.

Ji bo dîtina duayên ku ji Pêxember (s.a.w) hatine ragihandin, em dikarin pirtûka Îmam Newewî ya bi navê "**el-Ezkar**" (Duayên ji Pêxemberê me), tewsiya bikin.

526. Hûn dikarin di derbarê Cewşenê de agahiyan bidin?

Pirs: Hukmê bixwevekirin cewşen, berbejin an jî tiştên mîna wan, di Îslamê de çi ye?

Bersiv: Cewşen, bêjeyeke ji zimanê Farisî tê û di ferhengê de bi wateya "zirx" û "cilên cengê" ye. wekî têgehekê -di çavkaniyên Şî'a de-, navekî hevpar e ji bo metnê du duayên ji hev cuda ku bi Cewşenî Kebîr (Cewşena mezin) û Cewşenî Sexîr (Cewşena biçûk) tên naskirin û bi rêya ehlibeyt bi bal Pêxember (s.a.w) ve, tê spartin.[666]

Cewşen di esasê xwe de ne di çavkaniyên Ehlisunet de, belbî di yên Şî'a de tê dîtin. Ev duayê tê angaştkirin ku ji Pêxemberê me (s.a.w) hatiye riwayetkirin, di tu pirtûkên hedîsê de derbas nabe. Riwayetên ku dibêjin Pêxemberê me, ew xistiye stûyê xwe yan jî bi stûyê sehabeyan ve daye daliqandin, yek ji wan jî ne rast e.

[666] Mehmet Toprak, "Cevşen", **DİA**, 1993, VII, 462.

"Qismek ji Cewşenî Kebîr di nessan de derbas dibe, ji aliyê wateya û naverokê ve ji metnekî ku ji hin bêje û hevokên ku mirov bi wan bi bal Xwedê Teala ve dua û munacatê dike pêk tê û tê dîtin ku duakirina bi metnên wisa ji aliyê jiyana olî ve, heq dike ku mirov wan tewsiye bike û di spartina wan bi bal Xwedê Teala ve, tu mehzûrek tune ye. Lê belê, ya ku bi navê Cewşenî Kebîr tê zanîn û ji Mûsa el-Kazim bi jor de bi rêya Îmaman bi bal Pêxember ve tê spartin û mîna hedîsê tê riwayetkirin ya nêzî paz deh rûpelan e, rastiya wê ne pêkan e. Lewra ev metnê han, ne mîna bûyereke, hikayeke ku tê zanîn an jî bûyereke dîrokî ku tê vegotin, ne mîna metnên ku di zihna însên de bi hêsanî tên girtin, bi awayekî cuda her bêje û hevokên vê bi diqeteke mezin bên jiberkirin û dubarekirin, girtina ji Pêxember û riwayetkirina wan, mirov dikare bibêje ku ne pêkan e. Ji ber ku ev dua di kuliyatên hedîsê yên Ehlisunet de nabore, di heman demê de tunebûna wê di kutubê erbe'e çavkaniyên sereke yên Şî'a de û sirf hebûna wê di hin kulliyatên dua yên asta duyem de piştgiriyê dide vê nêrînê."[667]

Dua, ne ji bo ku mirov wê têxe stûyê xwe, belbî ji bo ku mirov pê li ber Xwedê bigere û lava bike tê hînkirin û nivîsandin. Di hundirê Cewşenê de zikir û duayên xweş hene. Lê belê, baweriya bi xurafeyan û ji bo hêviya tiştên tu esil û fesil ji wan re tune ne, mirov wan bixwîne û bi xwe re bigerîne, ne caiz e.

Di dua de tiştê bingehîn, ne ku mirov wê têxe stûyê xwe, belbî divê ku mirov bi awayekî xalis li ber Xwedê Teala bigere. Pêxemberê me jî (s.a.w) wiha kiriye. hedîsên têkildar wiha ne:

Li gorî ji Ebû Se'îd (x.j.q) hatiye ragihandin, wî wiha gotiye:

"Qasidê Xwedê (s.a.w) ji bo parastina ji nezerê û xerabiya cinan, xwe dispart Xwedê û dua dixwendin. Dema sûreyên Feleq û Nas ên bi navê sûreyên

[667] Toprak, "Cevşen", **DİA**, VII, 463.

muewwîzeteyn, daketin, dev ji duayên berê berda û dest bi xwendina van herdu sûreyan kir."[668]

Hezretî 'Aişeyê (x.j.q) vedibêje:

"Pêxember (s.a.w) her şev dema dikete nav nivînên xwe, pif dikir destên xwe (sûreyên) Feleq, Nas û Qulhûwellah (Îxlas) dixwendin, destên xwe di rû û laşê xwe dida û vî tiştê han sê caran dubare dikir. Dema ku nexweş biketa jî fermana kirina heman tiştan ji min dikir."[669]

527. Wateya duayê "la hewle wela qûwwete îlla billahîl aliyyîl ezîm" çi ye?

Pirs: La hewle wela qûwwete îlla billahîl aliyyîl ezîm, tê çi wateyê?

Bersiv: Wateya vî zikrê hanê wiha ye: "Tevdê hêz û qawetan bi alîkariya Xwedayê mezin, tê bidestxistin"

Gava însan vî duayî dixwîne mîna ku bibêje "Xwedayê min! Ji Te pê ve tu piştgirê min tune ne û bêyî alîkariya Te ez nikarim di tu karî de serkeft û serfiraz bibim." Û bi vî awayî qelsiya xwe îtiraf dike.

528. Gelo duakirina di nav xwarinê de sunet e?

Pirs: Gelo duakirina di nava xwarinê de sunet e? Û tu caran Pêxemberê me, di nava xwarinê de dua kiriye?

Bersiv: Em di pirtûkên hedîsê de ji riwayetên bi mijara me re têkildar in, rastî tu hedîseke bibêje ku Pêxemberê me (s.a.w), di nava xwarinê de dua kiriye, nehatin. Wî, di destpêka xwarinê de digot bismillah û gotina wê jî şîret dikir. Di rewşên ku bê jibîrkirin jî digot ku di nav xwarinê yan jî di dawî de hûn dikarin bibêjin. Encax dua xwarinê, piştî ku xwarin diqediya dikir. Riwayetên bi mijarê re têkildar in, wiha ne:

---

[668] Tirmizi, Tib, 16; Îbn Mace, Tib, 33.

[669] Buxarî, Fedailu'l-Qur'an, 14, Tib, 39, De'awat, 12; Muslim, Selam, 50; Tirmizî, De'awat, 21; Ebû Dawûd, Tib, 19.

Hezretî ʻAişeyê (x.j.q) dibêje ku Qasidê Xwedê (s.a.w) wiha gotiye:

"**Dema yekî ji we xwarin xwar, bila bibêje, bîsmillahîrrahmanîrrehîm. Eger di destpêka xwarinê de ji bîr bike, dema hat bîra wî, bila bibêje, di serî û dawî de bîsmillah**."[670]

Ji Umeyyeyê kurê Mahşî (x.j.q): "Rojekê Qasidê Xwedê rûniştîbû, yekî li balê xwarin dixwar û bismillah negotibû. Xwarina xwe xelas kir, lê pariyekî wî yê herî dawî mabû û dema ew avêt devê xwe got: "Bîsmillah di serî û dawî de." Li ser vê yekê Qasidê Xwedê keniya û piştre got: "Şeytan nedisekinî bi vî zilamî re dixwar. Dema zilam navê Xwedê got, şeytan tiştê xwaribû, bi vereşînê avêt."[671]

Li gorî ku ji Ebû Umame (x.j.q) hatiye ragihandin, Qasidê Xwedê dema sifra xwe rakira wiha digot:

"*Ey Xwedayê me! Em bi hestên pak, bi hemdên bê jimar ên ku kêm nabin û zêde dibin û ji hizûra Te venagerin û qebûl dibin, hemdê Te dikin*."[672]

Li gorî ku ji Muazê kurê Enes (x.j.q) hatiye ragihandin, Qasidê Xwedê (s.a.w) wiha gotiye:

"*Kesê ku piştî xwarinê wiha bibêje: Hemd ji Xwedayê ku ev xwarin da min, -bê ku tu hêz û qaweta min a li encamê bandor bike-, ev kir para min, hemû gunehên wî tên bexşandin*."[673]

529. Ma ji bo şeva gerdekê tu duayekî taybet heye?

Pirs: Gelo ji bo şeva gerdekê, tu duayekî taybet heye?

---

[670] Ebû Dawûd, Et'ime, 15; Tirmizî, Et'ime, 47.
[671] Muslim, Eşrîbe, 103; Îbn Mace, Dua, 19; Ebû Dawûd, Et'ime, 15; Ehmedê kurê Henbel, **Musned**, III/344.
[672] Buxarî, Et'ime, 54. Wekî din bnh: Ebû Dawûd, Et'ime, 52; Tirmizî, De'awat, 55; Îbn Mace, Et'ime, 16.
[673] Ebû Dawûd, Lîbas, 1; Tirmizî, De'awat, 56. Wekî din bnh: Îbn Mace, Et'ime, 16.

Bersiv: Li gorî hedîseke ku ji ‘Ebdullahê kurê Mesûd (x.j.q) hatiye riwayetkirin, Pêxember (s.a.w) wiha gotiye:

“(Şeva dawetê) dema bûk diçe cem zavê, zava radibe ji bo nimêjê, bûk jî li pişt wî sef digire û bi hev re du rek‘et nimêj dikin. Piştre zava wiha dua dike:

اَللّٰهُمَّ بارِكْ لِي فِي أَهْلِي وَبارِكْ لِأَهْلِي فِيَّ

اَللّٰهُمَّ ارْزُقْهُمْ مِنِّي وَارْزُقْنِي مِنْهُمْ

أَللّٰهُمَّ اجْمَعْ بَيْنَنا ما جَمَعْتَ فِي خَيْرٍ وَفَرِّقْ بَيْنَنا إِذا فَرَقْتَ إِلى خَيْرٍ

Xwendina wê:

Ellahumme barik lî fî ehlî we barik li ehlî fiyye

Ellahumme’r-zuqhum minnî we’r-zuqnî mînhum

Ellahumme’c-me‘ beynena ma ceme‘te fî xeyrîn we ferrîq beynena îza fereqte îla xeyrîn.

Wateya wê:

“*Ya Rebbê me! Bereketê têxe navbera min û jina min.*

Ya Rebbê me! Bila pîreka min ji min û ez jî ji wê sûd wergirim.

Ya Rebbê me! Heta em bi hev re bin me di başiyê de bigire û dema Te, em ji hev qetandin jî li ser xêrê biqetîne.”[674]

Ev riwayet, ji ber hin kesên ku di zincîra seneda wê de hene, zeîf e. Lê belê, riwayeta ku di Teberanî de derbas dibe û ji vê hîn saxlemtir e, ev dua ne ji Pêxember (s.a.w); belbî mîna şîretekê ji ‘Ebdullahê kurê Mesûd, tê ragihandin.[675]

[674] el-Heysemî, **Mecme‘u'z-Zewaid**, IV, 291-292.

530. Di duayên xwe de em jî mîna Pêxember dikarin daxwaziya "refîqî e'la" bikin?

Pirs: Di çavkaniyên hedîsê yên sehîh de derbas dibe, beriya ku Pêxember (s.a.w) wefat bike di dawa pîreka xwe de ji Xwedê Teala "Refîqî e'la" daxwaz kiriye. Em di duayên xwe de dikarin vî duayî bikin? An jî "refîqî e'la" mîna "Meqamê mehmûd", ne ji bo me ye, belbî ji Pêxemberê me (s.a.w) re ye?

Bersiv: Li gorî hedîsên bi mijarê re têkildar in, Pêxemberê me (s.a.w) di dema sikratê de bi vî awayî dua kiriye:

"*Ey Xwedayê min! Min têxe nav zumreya Refîqî e'la!*" (اَللَّهُمَّ ... وَأَلْحِقْنِي بِالرَّفِيقِ الْأَعْلى)[676]

Da ku em jî têkevin nav wê zumreyê, tu mehzûrek tune ye ku em jî heman duayî bikin.

531. Ma ji bo teseturê tu duayekî ku mirov bike heye?

Pirs: Gelo dua tesetur/xwenixamtinê heye? Ango kesê ku xwe digire divê kîjan duayî bike?

Bersiv: Di dînê me de tu duayeke taybet ji bo teseturê tune ye. Encax eger mirov nû dest bicihanîna fermana Wî ya teseturê/xwenixumandinê kiribe, ji bo sebat û îstiqrara li ser vê 'îbadetê, dewama pêkanîna vê fermanê ji bo riza Wî û di vê mijarê de hêz û sebatê bide meriv, hûn dikarin jê daxwaz bikin. Ango çiqas ji destê we bê, hûn dikarin ji Xwedê Teala re dua bikin.

---

[675] el-Heysemî, **Mecme'u'z-Zewaid**, IV, 292.

[676] Buxari, Merda, 19, Fedailu's-Sehabe, 5, Mexazî, 83, 84; Muslim, Selam, 46 (2191).

BEŞA ŞEŞEM

- CIL Û BERG
- TÊKILIYA BI EQREBAYAN RE
- JIYANA MALBATÎ
- JIYANA CINSÎ

CIL Û BERG

532. Ma jin çima xwe dinixumînin?

Pirs: Ma sedemê ku pîrek xwe dinixumînin çi ye?

Bersiv: Mîna faîzê di tesetura pîrekan de jî sedemê esasî û bingehîn, fermana Xwedê Teala ye. Lê belê, ji bo aramî û sikûneta dil, mirov dikare li hin sebeb û sedemên din jî bigere. mirov dikare hinan ji wan wiha rêz bike.

a) Pîrek meyl û mereqa wan a ku laş û bedena xwe nîşan bidin heye û zilam jî meraq û meyla wan a ku li bedena pîrekan binihêrin heye. Ev jî dibe ku bibe sedem ji bo li hevdu nihêrtin û bi hev re axaftinê. Axaftin jî hîn pêşdetir here û helwestên nelirê û xeyrî exlaqî derxe holê. Belavbûna zinayê û xerabûna nesl û nifşan, her gav ji bêtewşî û tunebûna ahengekê di munasebet û têkiliya zilam û pîrekê bi hev re dertê meydanê. Berg û xwenixumandin, di têkiliya di navbera zilam û pîrekê de aheng û dengeyekê pêk tîne. Bi vî awayî, cihê ku pîrek dikare nîşanî zilaman bide û cihên ku zilam dikarin ji pîrekan lê binihêre dê dakeve pîvaneke herî kêm.

b) Hin zilamên bê exlaq ku gotin û peyvan diavêjin pîrekan rastiyeke ku nayê înkarkirin. Ji ber ku xwenixumandin giraniyekê dide pîrekan, zilamên wiha dê nikaribin cesaret bikin ku peyvan biavêjin wan û pîrek jî bi vî awayî derfeta ku bikaribin bi hêsanî bigerin dê bidest bixin.

533. Ma divê pîrek xwe çawa binixumînin?

Pirs: Li gorî dînê Îslamê divê pîrek kuderên xwe binixumînin, hûn dikarin bi delîlan me agahdar bikin?

Bersiv: Pîrekek, li pêşberî zilamên ku zewaca bi wan re ebedî heram e ji bavê xwe, kalê xwe, apê xwe, birayê xwe, zarokên xwişk û birayên xwe, kurê xwe, zarokên kur û keça xwe, xezûrê xwe û kurê zilamê xwe yê ji pîrekeke din e û mêrê keça xwe yanî zavê xwe dikare porê xwe, stûyê xwe, sînga xwe, destên xwe, lingên

xwe heta binê çokê veke. Li cem zilamên mîna van, divê ku nava xwe, pêsîrên xwe, pişta xwe û ji çokê heta navika xwe binixumîne.

Pîrek, li ba zilamên ku di navbera wê û wan de herambûna zewacê ya ebedî tune ye, bi tenê dikare rû û destên xwe vekirî bihêle. Li gorî vê, pîrekeke misilman çawa divê ku li hember zilamên biyanî -ji bilî rû destên xwe- hemû endamên xwe binixumîne, herwiha li hember kurê apê xwe, xalê xwe, kurê xaltî û meta xwe yan jî mêrê xwişka xwe ji zilamên ku di navbera wê û wan de tu eqrebatiya xwînê yan jî xezûrantiyê tune ye bi tenê dikare rû û destên xwe vekirî bihêle. Pîrekeke misilman divê wiha helwest nîşan bide. Ev, li serê ferz e. Xwedê Teala di ayeta 31em ji sûreyê Nûr wiha ferman dike:

"**Ji jinên bawermend re bibêje: Bila çavên xwe (ji heramiyê) bigirin û cihên şermegeha xwe biparêzin, ji beşa ku xuya dike pê ve -ew ne tê de ye- bila xeml û zîneta xwe dernexin der. Bila çarikên xwe berdin ser sîngên xwe. Bila xişrên xwe ji bilî mêrên xwe, bavên xwe, xezûrên xwe, kurên xwe, kurên mêrên xwe, birayên xwe, biraziyên xwe, xwarziyên xwe, jinên digel xwe, dîlên ku di bin destên wan de ne, ji mêran jî ew ên ketî ku tu pêdiviya wan bi jinan nemaye yan jî ew zarokên ku hêj negihane ku dilê wan biçe deverên veşartî yên jinan, nîşanî tu kesî din nedin. …**"[677]

Xişrên pîrekan, morî û taca por, guhar, kil û boyaxên serçav, ristik û gerdena stû, di milan de bazin û di destan de gustîl û hine, di piyan de xelxal û xişrên din in. Ferz e ku pîrek cihê van xişran dernexe holê û wan deran binixumîne. Lê belê vekirina poz bo nefesdayîn û stendinê, bo axaftinê jî vekirina dev, ji bo hev naskirinê vekirina serçav û bo girtinê jî vekirina destan hewceyî ye. Ev derên han, ji beşa ku tê xuyakirin hatiye jimartin. Ji vê bonê, vekirina serçav û destan li hember zilamên biyanî ne heram e. Herwiha bi normali endamên xwe yên ku tên xeml û xişirkirin jî dikare rê xizmên xwe yên ku yek bi yek di ayetê de derbas bûn, bide.

[677] Nûr, 24/31.

Lêdana lingan jî helwesteke ku pîrek wê dikin da ku bala mêran bikişînin ser xwe. Ev jî, yan awayê birêdeçûna xwe biguherînin an jî ku lingên xwe li erdê bidin da ku dengê xeml û xişrê wan bê bihîstin.

Bo agahiyên berfirehtir ji kerema xwe re nivîsa bi sernavê "Başörtüsü ve Örtünme" ya di lînka jêr de ye bixwînin:

http://www.suleymaniyevakfi.org/arastirmalar/basortusu-ve-ortunme.html

534. Ma divê mêr di kincan de bala xwe bidin çi?

Pirs: Dema derpê li min be û li deverekê rûnêm jorê çonga min xuya dike. Jorê çongê ewret û cihê şermgehê ye… Ma ku xuya bike mirov pê dikeve guneh?

Bersiv: Di Qur'ana Pîroz de çi ji bo mêran û çi jî bo jinan fermana ku nirînên xwe kontrol bikin û cihên ewret û şermgeha xwe bigirin hatiye kirin. Xwedê Teala li mêran wiha ferman dike:

"**Ji zilamên bawermend re bibêje: Bila çavên xwe (ji heramiyê) bigirin û fercên xwe biparêzin**…"[678]

Ferc, ji navbera herdu lingan û derdora wê; ji ewretê mêr û jinan re tê gotin. Ev jî ji navikê heya biniya çokan e. Ev dera han, ji hevjîna mirov pêve tu kes nikare bibîne.

Di halê ku we derpê li xwe kiribe, we cihê şermgeha xwe nixumandiye. Normal e ku di dema birêdeçûn, rûniştin yan jî di dema hûn karekî bikin ku jorê çoka we xuya bike.

Kincê ku we li xwe kiriye ne tenik be -bi awayê ku bedena we di bin ve xuya bike- û ne pir teng be kafî ye.

[678] Nûr, 24/30.

535. Hukmê ku pîrek servekirî û bi derpê bixebitin çi ye?

Pirs: Pîrekên ku li kargeh û fabrikayan servekirî û bi derpê dixebitin hene. Lewra Ewrûpa wihaye, şert û mercên wê yên jiyanê zor û zehmet in. Hukmê ku mirov bi vî awayî bixebite û pereyan bicivîne çi ye?

Bersiv: Pîrek, ji bilî xizmên wê yên ku zewaca bi wan re qedexe ye, li hember zilamên din, divê ku xwe bigire. Rû, ji destan heta zendê û ji lingan jî heta guzekê ne tê de ye. Lewra di dema kar û xebatê de vekirina dest û rû hewceyî ye. Qezenca bi rêya xebatê çi mêr dibe çi jî jin dibe divê her kes bike. Di hedîsekê de wiha derbas dibe: "*Gera li rêya kesba qezencê li ser mêr û jina misilman ferz e***.**"[679] Lewra her misilman da ku bikaribe peywir û wezîfeyên xwe bi cih bîne, divê ku qezenc û karekî wî hebe.

Ne caiz e ku pîrek endamekî wê yê ku divê bê girtin veke û bixebite. Xebata bi vî awayî heram e. Lê belê qezenca ku bi vê rêyê bi dest dixe, ji ber ku di ber kedê de tê bidestxistin ne heram e. Ango ji ber ku servekirî xebitiye dibe gunehkar, lê ji bo vê yekê, tiştê ji vî karî bi dest dixe heramî tevlî nabe.

Eger em werin ser mijara lixwekirina pantolon; eger derpê di şekl û awayê şerwal de be bi awayê ku endamên wê xuya nekin, dikare li xwe bike. Lê lixwekirina derpê û kincên ku dê endamên wê tê de xuya bike, mekrûh e.[680]

536. Hukmê lixwekirina çarşevê çi ye?

Pirs: Ma di dînê me de lixwekirina çarşevê ferz e?

Bersiv: Di dînê me de li hember zilamên biyanî, ji bilî ser çav û herdu destan ferz e ku pîrek temamê bedena xwe bigirin. Dema ji mala xwe dertên û diçin derve, divê ku cil û libasekî wan binixumîne lixwe bikin. Ev kinc û cilê derveyî divê ku bi hêsanî nixumandina wê pêk bîne. Pîrekeke misilman çawa dikare xwe bi çarşevê

[679] Teberanî, **Mu'cemu'l-Ewsat**, 9/277-278.

[680] 'Ebdullhemîd Şîrwanî, Îbn Qasim Şîhabuddîn Ehmedê kurê Qasim el-'Abbadi, **Hawaşî 'ala Tuhfeti'l-Muhtac bi-Şerhi'l-Minhac**, el-Mektebetu'l-Îslamiyye, Stenbol, II, 112.

binixumîne, herwiha bi mantoyê fireh û hwd. jî dikare xwe bigire. Ne şert û pêwîst e ku çarşevê lixwe bike.

Bo agahiyên berfirehtir ji kerema xwe re nivîsa bi sernavê **Başörtüsü ve Örtünme** ya di lînka jêr de jî bixwînin:

http://www.suleymaniyevakfi.org/arastirmalar/basortusu-ve-ortunme.html

537. Bêjeya "celabîb"ê, ma bi wateya çarşevê ye?

Pirs: Bêjeya "celabîb" ya ku di Qur'anê (33/59) de derbas dibe, ma bi wateya çarşevê ye?

Bersiv: Bêjeya "Celabîb" pirjimara "Cîlbab"ê ye.

Cîlbab di ferhengê de bi wateya;

Kiras/Îşlik.

Cilekî fireh e bo jinan, ji çarşevê biçûktir e,

Li gorî hinan çar e ku li welatê me jê re ferace tê gotin.

Li gorî hin zimanzanan bi wateya çarika serî ye.

Li gorî vê, ya munasib, mirov bibêje ku bêjeya "Celabîb"ê ya di Qur'anê de derbas dibe, her cil û bergê derveyî yên ku armanc û mebesta xwegirtinê pêk tîne. Digel vê jî mirov dikare bipejirîne û bibêje ku ji nav cil û bergên derveyî yên ku jin lixwe dikin ya herî baş çarşev e. Lê, pîrekên ku ji bilî çarşevê bi hin cilên din xwe digirin, wan jî emr û fermana Xwedê Teala pêk aniye.

Wekî din jî tê gotin ku cilên derveyî ji xeyrî çarşev û yên mîna wê, ji manto û hwd. "Herçiqas fireh bin jî ji ber ku moda Fileh û Cihûyan e, ji teseturê nayê qebûlkirin." Lê belê, di Îslamê de tu modeleke xuya û vebirî bo cilan tune ye. Piştî ku

munasib be bo xwegirtinê, herçiqas moda Filehan be jî bo teseturê têr dike. Lê, ya herî baş ku mirov li gorî çand û kevneşopiya Îslamî xwe bigire.

Di encamê de di Îslamê modeleke kifş û xuya ji bo cilan tune ye. Ya girîng ew e ku pîrek, li gorî emr û fermana dînê me, xwe bigire.

538. Lixwekirina çarşevê, ma tundrawî ye?

Pirs: We nivîsiye ku lixwekirina çarşevê ne şert e… Wê demê, lixwekirina çarşevê ma tundrawî ye? An jî çima divê ku rengê çarşevê reş be? Li ser vê yekê, gelo tu delîlek heye?

Bersiv: Çarşev, ne elamet û nîşana tundrawiyê ye. Ji pîrekên bawermend, kî bixwaze dikare wê lixwe bike. Reşbûna rengê çarşevê, çandek e. Li welatên misilmanan çarşev, reş, qehweyî û hwd. bi reng û neqşên curbicur in. Wan jî rengê reş ji xwe re hilbijartine.

539. Ma lazim e ku pîrek bi peçeyê rûyê xwe bigirin?

Pirs: Ma divê ku pîrek rûyê xwe bi peçe yan jî bi tiştekî mîna wê bigirin? An jî ku bi tenê endam û porê xwe binuxmîne têr dike?

Bersiv: Ne lazim e ku pîrek ser çavê xwe bi peçe û tiştê mîna wê bigire. Di ayeta 52yem de ji sûreyê Ehzab, li Pêxember (s.a.w) wiha xitab tê kirin:

"**Piştî van, êdî ji te re ne helal e ku tu hin jinên din bînî (mahr bikî) yan jî tu wan (berdî û) bi hin ên din re bizewicî; çendî spehîtiya wan li xweşa te biçe jî**…"

Ev ayet dide nîşandan ku ser çavê pîrekê tê dîtin; lewra însan, encax dema ku ser çavê pîrekê bibîne li xweşa wî diçe.[681]

Rojekê 'Umerê kurê Xetab (x.j.r) li ser xutbeyê wiha dibêje: "Bi hizir bin, mehra pîrekan zêde nekin." Li ser vê, pîrekeke esmeri hinarik sor dikeve nav xeberdanê û

[681] Ebû Bekir el-Cessas, **Ehkamu'l-Qur'an**, Daru'l-Kitabi'l-Arabî, Beyrût 1335, III, 316.

wiha dibêje: "Ev, gotina te ye yan te ji Pêxember (s.a.w) bihîstiye?" Em di kitêba Xwedê Teala de tiştê li dijî gotina te, dibînin. Xwedê Teala wiha ferman kiriye:

"**Eger hûn bixwazin ku jinekê berdin û di şûna wê de jineke din bînin û we malekî pir dabiyê, vêca ji wî malî tiştekî nestînin**…"[682]

Hezretî 'Umer (x.j.r) hinekî şaş dimîne û wiha dibêje: "Her kes ji 'Umer fêhmbertir e; heta pîrekên di malên xwe de jî …"

Li gorî hatiye gotin ku pîrekeke esmeri hinarik sor, tê wateya ku ser çavê wê vekirî bûye.

540. Ma divê ku pîrek bi şev di dema razanê de xwe bigirin?

Pirs: Bi şev di dema razanê de ma ferz e ku pîrek xwe bigirin? Lewra min bihîstiye ku firîşte bi şev dadikevin û nûrê belav dikin. Eger porê pîrekê vekirî be vedigerin. Ma ev, rast e?

Bersiv: Ji vê angaştê re tu delîlek tune ye. Di derbarê xwegirtina pîrekê de dema di odeyekê de bi tenê be yan jî bi mêrê xwe re be, tu fermanek tune ye. Pîrek, bi cilê ku pê rihet e, dikare razê.

Pîreka ku aqil balix be, bi tenê, dema li cem zilamên ku ji aliyê dînî ve jê re biyanî ne û dema ku wê nimêj bike, divê endamên xwe yên ewret in bigire.

541. Derbarê dersên avjenî û werzîşê li dibistanên Elmanyayê

Pirs: Em bi malbatî li Elmanyayê dijîn. Keçeke min a 9 salî heye. Li dibistanên li Elmanyayê dersa avjeniyê mecbûrî ye, bi tu awayî jê muaf nayên girtin. Rewşa birayên me yên li wê derê dijîn jî wiha ye. Li gori dînê me, zarokên me yên keç heta kîjan temenî dikarin beşdarî dersa avjeniyê bibin? Eger hûn bi awayekî berfireh li ser vê mijarê lêkolînekê bikin û me pê agahdar bikin, em ê dilşad bibin.

[682] Nîsa, 4/20.

Bersiv: Di derbarê pirsa we de ji Enstîtuya Zanyariyên Îslamî ya li Elmanyayê, me van agahiyên li jêr bidest xistin:

Di Dibistanên Elmanyayê de Dersa Avjeniyê yan jî Werzîşê

Daxuyaniya Gelemperî

"Ji bo têgihîştina pergala hîndekariyê li Elmanyayê, divê ku pergala eyaletê ya ku ji 16 eyaletan pêk tê, bê fêhmkirin. Her eyalet dikare ji hev cuda tev bigere. Mesela di dersa avjenî yan jî werzîşê (ango bedenparêzî) de dikarin biryarên cuda bidin. wekî mînak eyaleta Baverya û Baden-Württemberg, di Dibistana Navîn de di dersa avjenî û werzîşê de xwendekarên keç û kur ji hev diqetînin. Ev biryar, da ku xwendekarên keç li hember lawan lawaz nekevin, hatiye stendin. Wekî din divê ku em vê jî bibêjin: Zagona tu dibistanekê, xwendevanan mecbûr nake ku keç û kur bi hev re dersê bibînin.

Xwendekarên misilman

Di derbarê dersa avjenî yan jî werzîşê de eger weliyê wan dil bikin û dibistan jî bikaribe organize bike (mîna mamoste, dem û cih hebe), pêkan e ku xwendekarên keç û kur ji hev bên veqetandin. Di derbarê vê mijarê de biryara dadgehê (Bundesverwaltungsgerichtsurteil sa25.8.1993 – 6 C 891 zu OVG Münster, 15.11.1991 -19 a 2198/91) ya di sala 1993 hatiye dayîn, a ku ji bo hemû eyaletan girêdar e, heye. Lê belê ev biryar, bi tenê ji bo xwendekarên ku gihîştine temenê balixbûnê ye. Xwendekarên ku di asta dibistana seretayî de ne, (bi gelemperî) ji ber ku negihîştine çaxa balixbûnê, biryara (VG Düsseldorf, Aktenzeichen 18 K 74/05) a ku di sala 2005 de ji dadgehê hatiye dayîn, wan mecbûr dike ku beşdarî dersê bibin.

Nêrîna Me Di Vê Mijarê De

Eger dê yan jî bavekî misilman di vê mijarê de ji me alîkariyê bixwaze, em di serî de di çarçoveya biryarên dadgehê de wan agahdar dikin û em îfade dikin, bi

sedema ku dibistan saziyên dewletê ne û mamoste jî memûrên wê ne, divê ku girêdayî bi van biryaran bin. Eger zarok hîn xwendekarê dibistana seretayî be, divê ku beşdarî dersê bibe û li hember dadgehê derfeta ku (dozê) qezenc bike, tune ye, lê eger xwendakarê dibistana navîn an jî lîseyê be (gihîştibe çaxa balixbûnê), an serî lê bide da ku xwendekarên keç û kur ji hev cuda dersê bigirin an jî li ser esasê biryara dadgehê ya sala 1993 hatiye stendin, xwendekar ji dersê muaf bê girtin. Di vir de tiştê ku divê mirov bala xwe bidê, mirov îsbat bike ku xwendekar (mesele ya keç) şerm dike ku bi mayo derkeve hember xwendekarên kur û ji ber vê yekê ji aliyê derûnî ve bêhuzûr dibe. Lê belê ev, ji bo xwendekarê asta seretayî derbas nabe.

Hûn jî mîna ku di vê nivîsê de hatiye diyarkirin, dikarin tev bigerin.

Nîşe: Em spasiya Serokê Komela Îslamî Ya Elmanya Bakur (BİG), Birêz Ramazan Uçar ê ku nivîsa li jor gihande me, dikin.

542. Pîrek, li cihê ku ew û mêrê xwe bi tenê bin, ma dikare bi mayo têkeve avê?

Pirs: Ez pîrekeke girtî me, ango min xwe nû girtiye. Ez ê bi mêrê xwe re biçim tatîlê. Li cihekî bi tenê ku ji min û hevserê min pê ve tu kesekî din tune be li kenarê deryayekê, ku serê min vekirî be û mayo li min be, gelo tu mehzûreke wê heye? Li cihekî ku ez û wî bi tenê bin, bi vî awayî ez dikarim têkevim avê? Diya min got ku "Jixwe Xwedê Teala dibîne û firîşte jî dibînin, tiştekî wiha ne durist e." Ji ber ku fikr û ramanê min tevlihev bûne, ez alîkariyê ji we dixwazim.

Bersiv: Eger hûn bikaribin derfeta ku ji mêrê we pê ve tu kesekî din we nebîne bidest bixin, hûn dikarin bi mayo têkevin avê. Lê belê, ji ber ku ev ne karekî hêsan e, divê hûn pir bi hizir bin.

Divê hûn vê jî bizanibin ku tu cihekî Xwedê Teala nebîne tune ye! Lê ev rewş nake lazimî xwe ku pîrek her gav girtî be. Pîrek li hember zilamên biyanî divê ku xwe bigire. Ji bilî van, dibe li cem bavê xwe, zarokên xwe, birayên xwe û xezûrê xwe

ser, mil û lingên xwe jî heta çokê vekirî bin. Li cem hevserê xwe jî tu devereke ku divê bigire tune ye. Digel ku Xwedê Teala li wê derê jî wan dibîne!

543. Ma tiştekî rast e ku pîrek bi xizmên xwe yên zilam re xeber nede?

Pirs: Li derdora me hin pîrek hene ku bi tî yan jî xizmên xwe yên zilam re qe naaxivin û dibêjin ku xeberdana bi wan re guneh e. Heta hinek ji wan bi tu awayî xwe nîşanî xizmên xwe yên zilam nadin. Seyda ma divê wiha were kirin? An jî ev, ji teqwedariyê ye? Ya herî girîng jî di dema Pêxemberê me (s.a.w) de têkiliya di navbera mirov û eqrebayan de çawa bû?

Bersiv: Xwedê Teala di Qur'ana Pîroz de wiha ferman dike:

"(Resûlê min!) Ji zilamên bawermend re bibêje: Bila çavên xwe (ji heramiyê) bigirin û cihên şermegeha xwe biparêzin. Lewra ev, ji bo wan çêtir e. Bêguman Xwedê ji ya ku ew dikin agahdar e.

Ji jinên bawermend re bibêje: Bila çavên xwe (ji heramiyê) bigirin û cihên şermegeha xwe biparêzin, ji beşa ku xuya dike pê ve -ew ne tê de ye- bila xeml û zîneta xwe dernexin der. Bila çarikên xwe berdin ser sîngên xwe. Bila xişrên xwe ji bilî mêrên xwe, bavên xwe, xezûrên xwe, kurên xwe, kurên mêrên xwe, birayên xwe, biraziyên xwe, xwarziyên xwe, jinên digel xwe, dîlên ku di bin destên wan de ne, ji mêran jî ew ên ketî ku tu pêdiviya wan bi jinan nemaye yan jî ew zarokên ku hêj negihane ku dilê wan biçe deverên veşartî yên jinan, nîşanî tu kesî din nedin. Bila (bi tepînî) lingên xwe li erdê nedin ku êdî xişrên wan ên veşartî werin zanîn. Gelî bawermendan! Tev bi bal Xwedê ve tobe bikin da ku hûn serfiraz bibin."[683]

Li gorî van ayetan pîrek dikare li cem zilamên ku li jor behsa wan hat kirin, rûnê û serê xwe veke. Ji bilî van, li cem birayên zilamê xwe yan jî li cem xizmên zilam ên din, pîrek nikare cihên xwe yên mehrem vebike. Lê ne qedexe ye ku bi wan

[683] Nûr, 24/30-31.

re biaxive û selamê li wan bike. Dema girtî be, dikare derkeve pêşberî wan. Bi şertê ku çarçoveya xwegirtinê neyê binpêkirin, xeberdana bi zilamên ji bilî yên ku li jor navê wan derbas bûn, ne qedexe ye. Tiştê hatiye qedexekirin ev e, ku pîrek di cihekî girtî de bi wan re bi tena serê xwe bimîne. Hedîseke ku bi mijarê re têkildar e wiha ye:

"**Ez, çûna bi bal pîrekeke ku mehremek pê re tune be, li we qedexe dikim."** Li ser vê gotinê pîrekekê ji Ensariyan pirsî: **"**Ya Qasidê Xwedê! **(Di derheqê eqrebayên ji bilî bav û lawan de tu nabêjî çi?)"** Qasidê Xwedê wiha bersiv da: **"Xelweta (sekna) bi wan re mirin e**."[684]

Pîrek dikare li cihekî girtî bi zilamên biyanî re -bi şertê ku bi wan re bi tena serê xwe nemîne- bimîne û xizmeta wan bike. Di derbarê vê mijarê de ji serdema Pêxember (s.a.w) tetbîqek, bi rêyeke sehîh wiha hatiye ragihandin:

"Sehlê kurê Se'd (x.j.q) wiha gotiye: Dema ku Ebû Useyd es-Se'îdî zewicî, Pêxember û hevalên wî jî bi bal xwarina dawetê vexwendin. Ya ku xwarin çêkiribû û danîbû ber wan ji Ummû Useyd ya nû zewicîbû pê ve ne keseke din bû. Wê, ji êvarê ve di beroşek ji kevir xurme şil kiribûn, piştî ku Pêxember (s.a.w) xwarina xwe qedand pîrekê bi destê xwe, wê şîra han îkramî Pêxemberê me dike, bi vî awayî îkramî wî dike û pê dide vexwarin."[685]

Ebû Hezim (x.j.q) wiha gotiye. "Min ji Sehlê kurê Se'd bihîstiye**:** Ebû Useyd es-Se'îdî, Pêxember (s.a.w) dawetî xwarina daweta xwe kir. Wê rojê pîreka wî ya ku hêj bûka nû bû, xizmeta wan dikir… "[686]

[684] Buxarî, Nîkah, 112; Muslim, Selam, 8 (2171).
[685] Buxarî, Nîkah, 78.
[686] Buxarî, Nîkah, 79.

544. Di hevdîtina bi xizmên xwe yên nêz re divê mirov bala xwe bide çi?

Pirs: Di hevdîtina xizmên nêz de hin caran pirsgirêk dertên holê. Gelo di hevdîtina di navbera xizmên nêz ên mêr û jin, pîvana Îslamî çi ye? Mesela bûkek, bi cil û bergên munasib dikare derkeve pêşberî tîyên xwe? Wekî din jî mebest ji gotina Pêxember (s.a.w) "Hemw mirin e" çi ye?

Bersiv: Pêxemberê me (s.a.w) di hedîseke xwe de wiha gotiye:

"*Ez, çûna bi bal pîrekeke ku mehremek pê re tune be, li we qedexe dikim*." Li ser vê gotinê pîrekekê ji Ensariyan pirsî: **"**Ya Qasidê Xwedê! **(**Di derheqê eqrebayên ji bilî bav û lawan de tu nabêjî çi?)" Qasidê Xwedê wiha bersiv da: **"***Xelweta (sekna) bi wan re mirin e*."[687]

Bêjeya "hemw"ê ya ku di metnê hedîsê de bi 'Erebî derbas dibe, ji xizmên mêr ên zilam re tê gotin. Mîna tî (birayên mêr) zarûyên apê wî û hwd.

Di hedîseke din de wiha derbas dibe: "*Ji niha pê ve, bila tu zilam bi tenê derbasî ba pîrekekê nebe. Eger yek du hazir bin dikare*."[688]

Eger ku em herdu hedîsan bi hev re binirxînin, em ê bibînin ku çûna bi bal pîrekeke di odeyekê de û bi tenê, hatiye qedexekirin. Xelweta (sekna bi tenê) digel eqrebayên mêrê pîrekê jî ji ber ku pêkan e bêhtir bibe sedem ji bo fitne û hin xeteran, Qasidê Xwedê Teala gotiye ku: "*Xelweta (sekna) bi wan re mirin e*." Pîrek dema li gorî fermanên Xwedê Teala xwe nixumandibe û ne li cihekî girtî be yan jî bi hebûna kesekî sêyem, dikare bi wan eqrebayan re hevdîtinê pêk bîne.

545. Ma di Îslamê de "mezinbûna mîna xwişk û birayan" heye?

Pirs: Pirsa min di derbarê mehrem û nemehreman de ye. Mîna kesên wekî xwişk û birayan di heman malê de dijîn wekî zarokên apan… digel ku em dizanin

[687] Buxarî, Nîkah, 112; Muslim, Selam, 8 (2171).
[688] Muslim, Selam, 8 (2173).

mara wan li hev dibe jî li cem wan rihet tev digerin û meseleya nebikaranîna çarikê wekî tiştekî normal dibînin. Gelo di Îslamê de "jiyan û mezinbûna mîna xwişk û birayan" heye? Di vî warî tu hedîs an jî ayet heye?

Bersiv: Pîrekên bawermend li cem kê dikarin serê xwe vekin, bi ayetê hatiye daxuyandin. Xwedê Teala wiha ferman dike:

"**Ji jinên bawermend re bibêje: Bila çavên xwe (ji heramiyê) bigirin û cihên şermegeha xwe biparêzin, ji beşa ku xuya dike pê ve -ew ne tê de ye- bila xeml û zîneta xwe dernexin der. Bila çarikên xwe berdin ser sîngên xwe. Bila xişrên xwe ji bilî mêrên xwe, bavên xwe, xezûrên xwe, kurên xwe, kurên mêrên xwe, birayên xwe, biraziyên xwe, xwarziyên xwe, jinên digel xwe, dîlên ku di bin destên wan de ne, ji mêran jî ew ên ketî ku tu pêdiviya wan bi jinan nemaye yan jî ew zarokên ku hêj negihane ku dilê wan biçe deverên veşartî yên jinan, nîşanî tu kesî din nedin. …**"[689]

Tebîra "**jiyan û mezinbûna mîna xwişk û birayan**"di dînê me de tune ye. Ev, însanan ji ber xwe ve afirandine. Digel ku Xwedê Teala di Qur'anê de diyar kiriye ku hemû bawermend bira ne, bi tiştê li jor borî ferman li me kiriye. Pêxemberê me (s.a.w) jî biraziyê xwe 'Elî (x.j.q) di mala xwe de mezin kiriye, lê piştre bi keça xwe Fatîme (x.j.q) re zewicandiye. Zarokên apan ên ku di navbera wan de qedexeya zewacê tune be, mezinbûna wan mîna xwişk û birayan çênabe. Di mijarên wiha de divê mirov bi hizir be.

546. Xwendekareke keç, ma dikare li mala mamosteyekî mêr dersê bigire?

Pirs: Ez jineke bîst û du salî me. Ez diçim mala mamosteyekî bi jin û xwediyê pênc zarokan e û dersê jê digirim. Li malê bi piranî jin û zarokên wî jî li cem me ne. Gelo dersgirtina ji mamosteyekî mêr li cihekî wiha, durist e?

Bersiv: Xwedê Teala di derbarê jinan de wiha ferman dike:

[689] Nûr, 24/31.

"**Ji jinên bawermend re bibêje: Bila çavên xwe (ji heramiyê) bigirin û cihên şermegeha xwe biparêzin, ji beşa ku xuya dike pê ve -ew ne tê de ye- bila xeml û zîneta xwe dernexin der. Bila çarikên xwe berdin ser sîngên xwe. Bila xişrên xwe ji bilî mêrên xwe, bavên xwe, xezûrên xwe, kurên xwe, kurên mêrên xwe, birayên xwe, biraziyên xwe, xwarziyên xwe, jinên digel xwe, dîlên ku di bin destên wan de ne, ji mêran jî ew ên ketî ku tu pêdiviya wan bi jinan nemaye yan jî ew zarokên ku hêj negihane ku dilê wan biçe deverên veşartî yên jinan, nîşanî tu kesî din nedin. …**"[690]

Li gorî vê, pîrek dikare li cem zilamên ku li jor behsa wan hat kirin, rûnê. Ji bilî van, herçiqas xizmên wê bin jî biyanî tên qebûlkirin û ji vê bonê li cem wan nikare cihên xwe yên mehrem veke û bi tu awayî nikare bi wan re bi tena serê xwe bimîne. Lê belê li cihên vekirî û ne bi tenê, ne qedexe ye ku bi wan re biaxive û selamê li wan bike. Bi awayekî girtî dikare derkeve pêşberî wan jî.

Hedîseke ku ji Pêxemberê me hatiye ragihandin wiha ye:

"*Ji niha pê ve, bila tu zilam bi tenê derbasî ba pîrekekê nebe. Eger yek du hazir bin dikare*."[691]

Çawa ku divê misilman ji heramiyê birevin, herwiha divê ku xwe ji rêyên mirov dibin heramiyê jî biparêzin. Dema Xwedê Teala bi taybetî jî gunehê mezin qedexe dike ferman dike ku "**nêzî wan nebin**" û "**ji wan dûr bimînin**."

Di derbarê zinayê de Xwedê Teala wiha ferman dike:

"**Nêzîkî zinayê mebin. Lewra ew, karekî pir kirêt û rêyeke pir pîs e**."[692]

---

[690] Nûr, 24/31.
[691] Muslim, Selam, 8 (2173).
[692] Îsra, 17/32.

Li gorî vê, di dema dersê de teqez divê ku jin an jî zarokên mamosteyê we hazir bin. Ne caiz e ku hûn û mamoste di odeyekê de bi tenê bimînin û jê dersê bigirin.

Bersiveke me ya bi awayê vîdeoyê di lînka jêr de heye, em tewsiye dikin ku hûn wê temaşe bikin:

http://www.fetva.net/goruntulu-fetvalaar/bir-kadinin-erkek-hocadan-ozel-ders-almasi-caiz-midir.html

547. Kesê ferzbûna teseturê mandel bike ma ji dîn derdikeve?

Pirs: Di Îslamê de xwegirtin, bo pîrekan ferz e. Înkarkirina bizanebûn gelo mirov ji dîn derdixe? Kesên wiha mandel dikin ma guneh e ku mirov wan hişyar meke?

Bersiv: Însan, dibe ku her gav nikaribin hemû emr û fermanên Xwedê Teala bi cih bînin. Kesên wisa dikin gunehkar in. Hin însan jî bi sedem cahilî û nezaniya xwe, di serî de li ser van emr û fermanan nîqaş û gengeşiyê dikin û dibe ku li gorî fikr û ramanên xwe haşa nerast jî bibînin. Ji ber vî karê wan ê ku bi cahilî û nezanî dikin, dibin gunehkar, lê ji dîn dernakevin. Lê belê, digel ku rastî ji wan re bê gotin ango di vê meseleyê de cahilî û nezaniya wan ji holê were rakirin, kesê ku emr û fermanê Xwedê Teala neecibîne, înkar û mandel bike, dibe kafir.

Em tewsiye dikin ku hûn mijara Adem û Îblîs ya ku di Qur'anê de çend caran dubare dibe, bixwînin. Adem (s.a.w), Xwedê Teala pir baş nas dikir. Xwedê, her tişt hînî wî kiribû. Ji vî aliyî ve Xwedê Teala mamostetiya wî kiribû. Xwedê Teala, li Adem bi tenê tiştek qedexe kiribû: Ku mêweyê darekê nexwe. Lê wî, ew qedexe binpê kir. Heta vir, di navbera kirina wî û ya Şeytên de tu ferq tune ye. Lewra şeytan jî fermaneke Xwedê Teala bi cih neanîbû; ji Adem re secde nebûbû. Yekî fermana Xwedê Teala bi cih neanîbû, yê din fermana wî binpê kiribû. Ferqa di navbera wan de piştre derket holê. Şeytan di biwara rastiya kirina xwe de înad kir, xwe qure kir û

kafir bû. Adem jî şaşiya kirina xwe fêhm kir, pêre tobe kir û bexşandina xwe xwest û hat bexşandin.

Hûn, ên ku bi vî awayî tev digerin hişyar bikin, erka xwe ya berpirsyariyê bînin cih. Ji bilî vê, tu berpirsyariyeke we ya din tune ye.

548. Gelo hukmê razana digel zarokên xwe yên balix re çi ye?

Pirs: Ji aliyê dînî û derûnî ve, gelo hukmê ku dayik zarokên xwe yên mezin têxe hemêza xwe û bi wan re razê çi ye? Ji bo vê pirsa min bibexşînin, lê ev rastiyek e. Ez bi xwe wekî perwerdekarekî xwedî bawerî, vê bûyerê tiştekî bi sosret dibînim.

Bersiv: Ne caiz e ku dayik, zarokên xwe yên gihîştine çaxa balixbûnê têxe hemêza û bi wan re razê. Ji ayetên li jêr tê fêhmê –heta bi zarokên temen biçûk re jî– ne munasib e ku mirov di heman odeyê de razê. Xwedê Teala wiha ferman dike:

"**Gelî bawermendan! Bila dîlên ku di bin destên we de û ew ên ku ji we hêj balix nebûne; beriya nimêja spêdeyê (fecrê), dema nîvro wexta ku hûn cilên xwe datînin û piştî nimêja eşayê, sê caran ji we destûrê bixwazin. Ew, sê demên ku hûnên kifş bin. Piştî van deman, ku hûn biçin cem hev, ne ji we re ne jî ji wan re tu guneh tune ye. Wiha bikin; Xweda ji we re van ayetan aşkere dike. Xwedê zana ye, karbinecih e.**

Dema zarokên we balix bûn, çawa yên berî wan destûr dixwestin, bila ew jî destûrê bixwazin. Wiha bikin. Xweda ji we re ayetên xwe aşkere dike. Xwedê zana ye, karbinecih e."[693]

Destûrxwestina zarokên ku gihîştine çaxa balixbûnê her cara ku diçin odeya ku dayik û bavê wan lê ye, da ku wan tazî nebînin. Razana bi hev re hê ji vê jî zêdetir e. Ji vê bonê diya ku hûn behsa wê dikin, divê di cih de dev ji razana bi zarokên xwe yên balix bûne berde.

[693] Nûr, 24/58-59.

549. Ma di girêdana krawatê de tu mehzûrek heye?

Pirs: Gelo tu mehzûrek di girêdana krawatê de heye? Hûn dikarin vê yekê di çarçoveya qedexeya şibandina bi Cihû û Filehan, şîrove bikin?

Bersiv: Îfadeya "Xwe neşibînin Cihû û Filehan" ya ku di hedîsên Pêxemberê me de (s.a.w) derbas dibe, ne di mijara cil û bergan de ye, belbî di warê bicihanînên olî de ye.

Di Qur'an û sunetê de ji bo bawermendên mêr û jin tu tîpekî xuya bo cil û bergan, nehatiye diyarkirin. Her misilman, li gorî urf û çanda ku tê de dijî cilan li xwe dike. Bi tenê divê ku ev cil cihên ewretê mirov veşêrin û ne tenik bin bi awayê ku bedena mirov bidin xuyakirin. Lixwekirina cil û bergên ku êdî bûne **nîşan** mîna cilê Papazan an jî Xaxaman, ne durist e. Lewra kesê wan cilan lixwe bike, dide nîşandan ku dixwaze bibe mîna wan. Lê krawat, çakêt û derpê ne nîşana cil û bergên tu dînî ne. Ji vê bonê tu mehzûrek tune ye ku mirov wan li xwe bike.

550. Gelo ez dikarim ristika bi nîşana xaçê, têxim stûyê xwe?

Pirs: Gelo ez dikarim ristika bi nîşana xaçê, têxim stûyê xwe?

Bersiv: mirov nikare nîşana xaçê bi xwe ve bike. Lewra xaç, nîşana ola Filehan e. Mirovê misilman, bi çi niyet û mebestê dibe bila bibe, nikare nîşana olekî din bi xwe ve bike.

Di serdema Pêxemberê me de (s.a.w) dema ku Ediyê kurê Hatem, diçe cem Pêxemberê me û di stûyê wî de xaçeke ji zêr heye, Pêxemberê me jê re dibêje: "*'Ediy! Wî pûtî biavêje*."[694]

Di heman demê de divê ev hedîsên Pêxemberê me jî neyên jibîrkirin:

"**Kî xwe bişibîne miletekî, êdî ew ji wan e**."[695]

[694] Tirmizî, Tefsîru'l-Qur'an, 10.

“**Ji me, kî xwe bişibîne hinên din, ew ne ji me ye**.”[696]

551. Ma divê pîrek çarika xwe çawa girê bidin?

Pirs: Sergirtin, li ser pîrekan ferz e, lê sînorê wê çi ye? Mesela, ma divê ku teqez çarika wê sînga wê jî bigire? Gelo kafî ye ku bi tenê ser û stûyê xwe bigire? Di dema me de însan pir bala xwe nadin teseturê. Wê gavê ma ewqas însan li dijî fermanên Qur’anê dijîn? Hûn dikarin di van mijaran de agahiyan bidin?

Bersiv: Di sûreyê Nûr ayeta 31em de bi taybetî girtina serî hatiye fermankirin û hatiye diyarkirin ku serî dê çawa bê girtin.

“**Bila çarikên xwe berdin ser sîngên xwe**….”[697]

Di demên berê de pîrekan cil û bergên berstû vekirî lixwe dikirin, stû û sîng dihatin dîtin. Bi vê fermanê ji wan hatiye xwestin ku bi beşekî ji çarika xwe qirik û berstûyê xwe bigirin.

Ji ber ku stû, qirik û gerden hatine nixumandin, ne hewce ye ku bi çarika xwe careke din wan deran binixumîne. Lê belê eger cilekî teng lixwe kiribe û sînga wê xuya bike, divê bi tiştekî mîna çarik û hwd. wan derên xwe binixumîne û veşêre.

552. Pîrekeke misilman ma dikare werzişê bike?

Pirs: Ez pîrek im û dixwazim beşdarî çalakiyên werzişê bibim. Ma tu mehzûreke wê heye? Ango guneh e ku ez beşdar bibim?

Bersiv: Pîrek dikarin beşdarî çalakiyên werzişê bibin. Lê divê ku li cil û bergên xwe miqate bin û bi mêran re di heman cihê de werzişê mekin. Li holeke ku bi tenê jin lê bin, pîrekeke misilman bi dilekî rihet dikare werzişê bike.

---

[695] Ebû Dawûd, Lîbas, 4.
[696] Tirmizî, Îsti’zan, 7.
[697] Nûr, 24/31.

553. Ma durist e ku mirov di saloneke ku mêr û jin tevlihev in werzişê bike?

Pirs: Ez bo werzişê diçim holekê, lê mêr û jin heman holê parve dikin. Ango hewz û qada werzişê yek e… Pîrek, mîna ku li ber deryayê bin bi mayo û cilê binî ne… di qada werzişê de jî mil û piyên wan vekirî ne. Di rewşeke wiha de gelo tu mehzûrek dînî yan jî heramî heye?

Bersiv: Di qadeke ku pîrekên cihên wan ên ewret ji derve ne, ne caiz e ku mêr werzişê bikin. Xwedê Teala wiha ferman dike:

"Ji zilamên bawermend re bibêje: Bila çavên xwe (ji heramiyê) bigirin û cihên şermegeha xwe biparêzin. Lewra ev, ji bo wan çêtir e. Bêguman Xwedê ji ya ku ew dikin agahdar e." [698] Li aliyê din jî Pêxemberê me (s.a.w) bi gotina xwe ya "*Zinaya çavan, nihêrtin e*"[699], bal kişandiye ser ku divê mirov li heramiyê nenihêre. Di dawiyê de wekî ferdeki misilman, divê ku mirov xwe ji cihên wiha dûr bigire.

554. Ez 14 salî me û dixwazim xwe bigirim. Divê ez çawa tev bigerim?

Pirs: Ez dixwazim xwe bigirim, lê malbata min dibêje ku tu ji bo vê, hêj biçûkî. Ez 14 salî me û bo dayîna vê biryarê bi min, ez ne biçûk im. Eger bê rizaya malbata xwe serê xwe bigirim, dizanim ku dê bertek li min bê kirin. Di rastiyê de ez vê yekê di serê xwe de pir mezin nakim, lê ditirsim ku dilê malbat û xizmên min ji min bimîne. Ez çend caran bi wan re axivîm, lê min tu encameke erênî negirt. Divê ez çi bikim?

Bersiv: Keçeke misilman, dema balix bibe, divê ku êdî xwe bigire. Ji wê demê û pêde li hember hemû ferman û qedexeyên dînî, berpirsyar e. Piştî vî temenî, ne raste ku dê û bavê we di babeta fermanên dînî de ji we re qedexeyan deynin. Lê divê hûn vê rewşê bi awayekî spehî ji wan re rave bikin. Divê hûn ayetên di derbarê girtinê de ji wan re bixwînin û hûn ji wan re rave bikin ku ev ayet xitabî hemû jin û

[698] Nûr, 24/30.
[699] Buxarî, Îsti'zan, 12.

keçên balix bûne dike. Herwiha ji wan re bibêjin ku di bicihanîna fermanên Xwedê Teala de divê ku dê û bav alîkariya zarokên xwe bikin.

Eger ew, li dijî vê derkevin jî di derbarê mijara fermanên Xwedê Teala de divê hûn biryareke vebirî nîşan bidin. Dema biryardariya we bibînin, bi borîna demê re dê têbigihîjin û we teqdîr bikin.

Wekî din jî em tewsiye dikin ku hûn ayetên 13-19an ji sûreyê Loqman bi dê û bavê xwe re bixwînin. Lewra di wir de ayetên di derbarê ku dê û bav di mijarên mîna vê de divê çawa tev bigerin, hene.

555. Mêrê min, daxwaza vekirinê li min dike. Divê ez çi bikim?

Pirs: Ev du sal in min xwe girtiye û ez nimêj dikim. Ez li Elmanyayê dijîm. Di serî de mêrê min ji girtina min, nerihet nedibû, lê piştre da ku ez xwe vekim zor da min. Dibe ku li pêşberî hevalên xwe yên Elman, ji min fedî dike. Ez di ber xwe didim, lê li hember vê tundiyê hin caran êdî taqeta min namîne. Dibêje ku "eger tu xwe venekî ez ê te berdim." Ez dizanim ku vekirin guneh e. Lê ez nizanim ka ez çi bikim. Hûn dikarin bi min re bibin alîkar?

Bersiv: Girtin, fermana Xwedê ya diyar e. Tu sedem, terkkirina fermana Xwedê Teala pêwîst nake. Di dînê me de di mijarên ku îsyaniya Xwedê ye, ji mexlûqan re îtaet nayê kirin. Sebir bikin û di ber xwe bidin û her gav ji mêrê xwe re vebêjin ku girtin, fermana Xwedê Teala ye. Eger ji ber vê yekê we berde, ji Xwedê ya hîn baştir û çêtir bixwazin. Hûn ê bibînin, di derbarê we de dê hîn çêtir bibe. Di ayetekê Xwedê Teala wiha ferman dike:

"**Eger jinek ji mêrê xwe, meyla bi bal yeka din ve yan jî ku dê berê xwe jê vegerîne, endîşe bike, li ser wan tu guneh tune ye ku ew di navbera xwe de sulhekê bikin. li hev hatin, çêtir e. Jixwe di nefsan de kumreşî li kar e (hazir) e. (Gelî mêran!) Eger hûn bi wan re xweş derbas bikin û xwe biparêzin; vêca Xwedê ji ya ku hûn dikin teqez agahdar e.**

(Gelî mêran!) Hûn çi qasî bixwazin jî dîsa nikarin di navbera jinan de dadmendane tev bigerin; naxwe bi gişti meyla xwe nedin yekê û ya din jî wekî girêdayî be (li holê) nehêlin. Eger hûn li hev bên û xwe biparêzin, teqez Xwedê gunehbexş e, dilovîn e.

Eger jin û mêr dev ji hev berdin, Xwedê ji nîmetên xwe yên pir dê herduyan jî dewlemend bike. Xwedê comerd e, karbinecih e."[700]

556. Digel hemû hişyariyên bavê min, eger dîsa jî ez serê xwe vekim, gelo ji wî re jî guneh heye?

Pirs: Di 15 salîya xwe de bi bandora lîseyê min dest bi girtina serê xwe kir. Lê çiqas temenê min mezin bû, min ferq kir ku ez vê navêm. Ramanê min û bavê min di vê de li dijî hev in. Ew vekirina min naxwaze; lê belê ev helwesta wî bandorê li kesayeta min dike, jiyana min serûbinî hev dike. Pirsa min ev e: Digel ku bavê min, min hişyar dike jî eger ez serê xwe vekim, gelo ji wî re jî gıneh heye?

Bersiv: Digel hişyarî û îkazên bavê we eger hûn serê xwe vekin, gunehê vê ji we re ye, ne ji bavê we re ye. Di dînê me esas û prensîba şexsîbûna sûcan heye. Kî sûc bike, ceza li wî tê birîn. Ji vî aliyî ve bav, dê hişyariyên xwe bike, hedîs û ayetên bi girtinê re têkildar in dê bixwîne û bide xwendin. Piştî vê, êdî li we dikeve. Eger hûn bixwazin hûn ê fermana Xwedê pêk bînin û serê xwe bigirin, eger hûn bixwazin jî hûn ê li hember emrê Xwedê derkevin û serê xwe negirin.

Hûn dibêjin ku: "Çiqas temenê min mezin bû, min ferq kir ku ez vê navêm." Kesê misilman, ne ku canê wî dixwaze karekî dike, belbî bi sedema ku Xwedê Teala xwestiye dike. Bendîtî ev e. Tiştê mirov dibe kufrê jî ne ku mirov axretê înkar dike, belbî mirov dinyayê di ser axretê re bigire. Xwedê Teala wiha ferman dike:

[700] Nîsa, 4/128-130.

"… Ji kafiran re ezabekî dijwar û giran heye. Ew ên ku jiyana dinyayê ji ya axretê bêhtir hez dikin û hewl didin ku rêya Xwedê xwar nîşan bidin û jê dûr dikevin. Ew di nav rêşaşiyeke dûr de ne."[701]

557. Mijara xwegirtinê gelo çima di nav şertên Îslamê de nehatiye diyarkirin?

Pirs: Gelo çima di nav şertên Îslamê û 32 ferzan de mijara xwegirtinê nehatiye diyarkirin?

Bersiv: Babetên di nav gel de bi awayê "şertên Îslamê", "şertên îmanê" tên naskirin, divê baş bên fêhmkirin. Kelîmeya şahdeyê, kirina nimêjê, girtina rojiyê, dayîna zekatê û çûna hecê esas û bingehên dînê Îslamê ne. Ji lewra encama ku "ji bilî van tiştan tu şertên Îslamê yên din tune ne" dernakeve! Kirina başiyê bi dê û bav, mirov rastgo be, fermana bi başî û qenciyê û bi paşdexistin û nehya ji nebaşiyê, kirina cîhadê di rêya Xweda de û dûrketina ji zina û faîzê û hwd. ma gelo ne ji şertên Îslamê ne? Kesê van tiştan qebûl neke, mandel bike ji Îslamê dertê. Ji ber vê yekê, divê ku mirov tu ferq û cudatiyê nexe navbera emr û fermanên Xwedê. Xwedê Teala wiha ferman dike:

"…**Erê ma niha hûn bi hinekî ji kitêbê bawerî tînin û hinekî jî mandel dikin? Ma cezayê kesên ku ji we wisa bikin çi ye, di jiyana vê cîhanê de her riswatî ye!? Roja qiyametê jî ew ê bi bal ezabê herî dijwar ve bên vegerandin. Xwedê ji tiştên ku hûn dikin qet ne bêxeber e**."[702]

Xwegirtin jî ji fermana Xwedê ya vebirî ye. Kesê vê bi zanebûn înkar bike, ji dîn derdikeve. Lê, kesê ku fermaneke biçûk be jî neecibîne yan jî înkar bike, herwiha dîsa ji dîn derdikeve.

---

[701] Îbrahîm, 14/2-3.
[702] Beqere, 2/85.

558. Dema em li pîrekên vekirî mêze bikin, gelo kî dibe sûcdarê eslî?

Pirs: Di roja me ya îroyîn de em dibînin ku pîrekên pir vekirî hene. Heta yên ku vê yekê şor dikin, cilên teng, dêr û etekên teng û hwd. lixwe dikin jî hene. Em zilam bixwazin nexwazin, çavên me bi alî wan ve dişemite. Lê, di vê de mîna yê ku dinihêre gelo rola yên ku mirov tehrîk dikin jî tune ye?

Bersiv: Di ayeta 30em ji sûreyê Nûr, Xwedê Teala li mêran ferman dike ku li heramiyê nenihêrin, di ayeta 31em de jî li jinan ferman dike ku pîrek jî li heramiyê mêze nekin û xeml û xişrên xwe li hember zilamên biyanî veşêrin.

"Ji zilamên bawermend re bibêje: Bila çavên xwe (ji heramiyê) bigirin û cihên şermegeha xwe biparêzin. Lewra ev, ji bo wan çêtir e. Bêguman Xwedê ji ya ku ew dikin agahdar e.

Ji jinên bawermend re bibêje: Bila çavên xwe (ji heramiyê) bigirin û cihên şermegeha xwe biparêzin…"[703]

Pîreka ku xwe veke, bi sedema ku vê fermana Xwedê Teala pêk neaniye, dikeve guneh. Zilamên ku li pîrekên xwe wiha girêdane binihêre, wan jî qedexeya Xwedê Teala ya nihêrtina li heramiyê bin pê kirine. Ango herdu jî dibin gunehkar. Di vir de ne hewce û pêwîst e ku zilam jinan tawanbar bikin an jî jin mêran sûcdar bikin. Dema hin pîrek xwe vebikin, ev rewş maf û heq nade mêran ku li wan mêze bikin. Divê evê hedîsa ku ji Pêxemberê me (s.a.w) hatiye ragihandin jî neyê jibîrkirin:

"*Zinaya çavan, nihêrtin e.*"[704]

559. Gelo pîrek dikare li ba bapîrê xwe servekirî bimîne?

Pirs: Keçeke hijdeh salî, gelo dikare li cem bapîrê xwe serê xwe veke?

Bersiv: Xwedê Teala di Qur'ana Pîroz de wiha ferman dike:

[703] Nûr, 24/30-31.
[704] Buxarî, Îsti'zan, 12.

"Ji jinên bawermend re bibêje: Bila çavên xwe (ji heramiyê) bigirin û cihên şermegeha xwe biparêzin, ji beşa ku xuya dike pê ve -ew ne tê de ye- bila xeml û zîneta xwe dernexin der. Bila çarikên xwe berdin ser sîngên xwe. Bila xişrên xwe ji bilî mêrên xwe, bavên xwe, xezûrên xwe, kurên xwe, kurên mêrên xwe, birayên xwe, biraziyên xwe, xwarziyên xwe, jinên digel xwe, dîlên ku di bin destên wan de ne, ji mêran jî ew ên ketî ku tu pêdiviya wan bi jinan nemaye yan jî ew zarokên ku hêj negihane ku dilê wan biçe deverên veşartî yên jinan, nîşanî tu kesî din nedin. …"[705]

Li gorî vê ayetê, pîrek dikare li cem zilamên ku behsa wan li jor hate kirin, rûnê, serê vebike. Bi sedema ku bapîr, di şûna "**bav**" de ye, pîrek dikarin li cem bapîrên xwe jî bi awayekî servekirî bimînin.

560. Ma bûk dikare li cem xezûrê xwe servekirî bimîne?

Pirs: Gelo bûk dikare li cem xezûrê xwe servekirî bimîne?

Bersiv: Jineke bawermend, li hember zilamên ku ji aliyê dînî ve jê re biyanî ne, divê ku serê xwe bigire. Dema li cem jinan be yan jî li malê li cem bavê xwe, birayên xwe, ap an jî xalê xwe, li cem xezûrê xwe yan jî dema ku bi tenê be, ne lazim e ku serê xwe bigire.

561. Gelo bûk dikare li cem xezûrê xwe yê nehelal servekirî be?

Pirs: Pîrekek dizewice. Diya mêrê wê û bavê wî dev ji hev berdane û herdu jî bi hinên din re zewicîne. Di vê rewşê de gelo pîreka ku zewiciye dikare li cem xezûrê xwe yê nehelal servekirî bimîne?

Bersiv: Xezûrê pîrekê, bavê mêrê wê ye. Xezûrê wê yê nehelal, xezûrê rastîn nayê qebûlkirin. Ji vê bonê bûk, nikare li cem wî servekirî bisekine.

[705] Nûr, 24/31.

562. Gelo keçik dikare li cem zirbirayên xwe serê xwe veke?

Pirs: Piştî wefata diya min, bavê min zewaca xwe ya duyem kir. Zarok û neviyên xort ên dêmariya me hene. Gelo mehremetiya di navbera me û wan de çi ye? Ma ez dikarim li cem wan servekirî bim?

Bersiv: Li gorî urf û adetan herçiqas ew zirbirayên we bên jimartin jî lê ji aliyê dînî ve ew ji we re helal in û hûn jî li wan helal in. Ji vê bonê ne caiz e ku hûn servekirî li cem wan bisekinin.

563. Ma mêr, ji sergirtina jina xwe berpirsyar e?

Pirs: Pîreka ku ser û berê wê vekirî be, gelo ji ber vê yekê li axretê mêrê wê jî dê ceza bikişîne?

Bersiv: Di dînê me de esas û prensîba şexsîbûna sûc heye. Ango kî sûc bike, ceza lê tê birîn. Ji ber vê yekê zilamê ku bi yeke servekirî re zewicandî be, di demên munasib de dê jina xwe hişyar bike. Ayet û hedîsên bi xwegirtinê re têkildar in, jê re bixwîne û pê bide xwendin. Tiştê mayî li pîrekê dikeve. Ger bixwaze dê xwe bigire, ji gunehkariyê xelas bibe; bixwaze jî xwe nagire, dê bibe gunehkar. Bo vê yekê mêr, nikare zorê bide jina xwe.

564. Dema xwendina Qur'anê de ma lazim e ku pîrek serê xwe bigirin?

Pirs: Di dema xwendina Qur'anê de ma divê ku pîrek serê xwe bigirin? Ango ma pîrek dikarin servekirî Qur'anê bixwînin?

Bersiv: Naxêr! Ne lazim e ku pîrek serê xwe bigirin. Pîrek, bi tenê li pêşberî zilamên biyanî û di dema kirina nimêjê de divê ku serê xwe bigirin. Dema li cem jinan bin an jî li malê li ba mêrê xwe, zarokên xwe, bavê xwe, xezûrê xwe, birayên xwe û li cem biraziyên xwe bin, ne lazim e ku serê xwe bigirin.

Di derbarê dema mirov dê Qur'ana Pîroz bixwîne de Xwedê Teala wiha ferman dike:

"**Çi dema te dest bi xwendina Qur'anê kir, vêca xwe bi Xwedê ji şeytanê recîm biparêze**"[706]

Li gorî vê ayetê, çi zilam dibe çi jî pîrek, dema mirov dê Qur'ana Pîroz bixwîne bi tenê ji mirov tê xwestin ku mirov xwe bi Xwedê ji şeytên biparêze. Ji bilî vê, tu fermaneke din tune ye. Ji ber vê yekê ye ku pîrek dikarin servekirî jî Qur'anê bixwînin. Tu ayet an jî hedîseke ku di dema xwendina Qur'anê de sergirtinê emir an jî tewsiye bikin tune ye.

Pîrek, di dema xwendina Qur'anê de eger pêrgî secdeya tîlawetê bên, dikarin wê jî servekirî bikin. Di vê de tu mehzûrek tune ye. Lewra secdeya tîlawetê ne di hukmê nimêjê de ye, servekirî tê kirin. Saziya fetwa û lêkolînên zanistî **el-Lecnetu'd-Daîme**[707] jî wiha bersiv daye.[708]

565. Pîrek dikarin servekirî tizbiyê bikişînin?

Pirs: Ma çiqas rast û durist e ku em servekirî tizbiyê bikişînin?

Bersiv: Di tizbî kişandinê de sergirtin ne hewce ye. Pîrek, bi tenê li pêşberî zilamên biyanî û di dema kirina nimêjê de divê ku serê xwe bigirin. Heta di dema xwendina Qur'anê jî de ne şert e ku pîrek serê xwe bigirin.

566. Gelo zirkurê pîrekê dibe mîna kurê wê yê rastîn?

Pirs: Gelo zirkurê pîrekê dibe mîna kurê wê yê helal? Dikare li cem servekirî bimîne? Ma nîkaha wan li hev tê birîn?

---

[706] Nehl, 16/98.
[707] Bnh: Heyet, **el-Lecnetu'd-Daime**, VII, 263, jimara fetwayê: 13376.
[708] Bnh: Yahya Şenol, "Fetvalar", **Kitap ve Hikmet Dergisi**, Rêbendan-Adar 2015, sal: 2, jimar: 8, rp. 54-55.

Bersiv: Xwedê Teala di sûreyê Nûr ayeta 31em de wiha ferman dike:

"**Ji jinên bawermend re bibêje: Bila çavên xwe (ji heramiyê) bigirin û cihên şermegeha xwe biparêzin, ji beşa ku xuya dike pê ve -ew ne tê de ye- bila xeml û zîneta xwe dernexin der. Bila çarikên xwe berdin ser sîngên xwe. Bila xişrên xwe ji bilî mêrên xwe, bavên xwe, xezûrên xwe, kurên xwe, kurên mêrên xwe, birayên xwe, biraziyên xwe, xwarziyên xwe, jinên digel xwe, dîlên ku di bin destên wan de ne, ji mêran jî ew ên ketî ku tu pêdiviya wan bi jinan nemaye yan jî ew zarokên ku hêj negihane ku dilê wan biçe deverên veşartî yên jinan, nîşanî tu kesî din nedin. …**"[709]

Di wergera ayetê de eger hûn bala xwe bidin cihê ku binê wê xêzkirî ye, hûn ê bibînin ku pîrek dikarin li cem kurên mêrê xwe ango li cem zirkurên xwe jî servekirî bisekinin.

Di sûreyê Nîsa de ayeta 22yem Xwedê Teala wiha ferman dike:

"**Bi jinên ku bavê we, ew mar kirine re nezewicin, tiştê derbas bûbe êdî çûye. Lewra ew, fehşîtî û karekî kirêt e. Çi rêyeke pîs e!**

Li gorî vê zewaca dêmarî û zirkuran ebediyen li hev heram e.

567. Ma rast e ku diya me Reyhane serê xwe negirtiye?

Pirs: Tê gotin ku ji pîrekên Pêxemberê me, diya me Reyhane serê xwe nedigirt. Gelo ev tişt, rast e?

Bersiv: Diya me Reyhane ya ku ji qebîla Benî Qureyze bi dîlîtî hatiye girtin, li gorî hin riwayetên zeîf, tê gotin ku cariye maye û misilman nebûye. Lê di rastiyê de ji pîrekên Pêxemberê me (s.a.w) yên ne misilman bin tune ne. Jixwe li gorî ayeta 25em ji sûreyê Nîsa û ayeta 221em ji sûreyê Beqere, heram e ku mirov cariyeke xeyrimuslim bi hewîtî bîne ser yeka misilman.

[709] Nûr, 24/31.

Diya me Reyhane, li ser daxwaza Pêxemberê me (s.a.w) misilman bûye, pê re zewiciye û Pêxembrê me, li hemberî mehra wê jî ew azad kiriye.[710]

Wekî din jî li gorî ayeta 59em ji sûreyê Ehzab, ne pêkan e ku ji pîrekên Pêxemberê me, serê tu yekê ji wan vekirî be. Hem jî di ayetê de bêyî ku tu ferq û cudatiyê têxe navbera yên azad û neazad, tê fermankirin ku "**Ey Pêxember! Ji xanimên xwe re ji keçên xwe re û ji pîrekên bawermendan re bibêje: Bila bedena xwe bi perdepoşiyên xwe binixumînin**." Ji vê bonê eger em qebûl bikin ku diya me Reyhane ne azad bûye; belbî cariye maye, dîsa jî bi tu awayî ne pêkan e ku em riwayeta di derheqê wê de hatiye ragihandin ku wê gotiye "ez naxwazim serê xwe mîna jinên azad bigirim", qebûl bikin.

Di enacamê de diya me Reyhane, mîna xanimên Pêxemberê me (s.a.w) yên din, ew jî misilman bûye û wê jî mîna wan serê xwe girtiye.

568. Li gorî mezhebê Şafiî, ma divê ku pîrek dest û rûyê xwe jî bigirin?

Pirs: Di mezhebê Şafiî de gelo di derveyî nimêjê de dest û rûyê jinan jî ewret tê hesibandin? Ango pîrekên ku Şafiî ne, divê dest û rûyê xwe jî binixumînin? Eger hûn li gorî mezhebê Şafiî bibersivînin ez ê dilşad bibim.

Bersiv: Li gorî mezhebê Şafiî, di nimêjê de ji bilî dest û rû hemû deverên pîrekê ewret tên jimartin. Di derveyî nimêjê de digel dest û rû, nihêrtina li tevekê bedena wê heram e. Lê dîsa jî ne şert e ku rûyê xwe binixumîne. Bo muayenê dikare nîşanî bijîşk, bo îfadedayînê dikare nîşanî dadger û bo kirîn û firotinê jî dikare nîşanî bikir an jî firoşker bide.[711]

569. Ma di dema xwarinê de jî divê ku pîrek serê xwe bigirin?

Pirs: Bi mebesta nîşandana rêz û hurmetê ji bo nîmetê, gelo -ji aliyê dînî ve- di dema xwarinê de jî divê ku pîrek serê xwe bigirin?

---

[710] Bnh: Hayati Yılmaz, "Reyhâne bint Şem'ûn", **DİA**, 2008, XXXV, 42.
[711] Günenç, **Büyük Şafii İlmihali**, rp. 85.

Bersiv: Jineke bawermend, li hemberî zilamên ku ji aliyê dînî ve jê re biyanî ne û di dema kirina nimêjê de divê ku serê xwe bigire. Ji bilî vê, ne lazim e ku serê xwe bigire.

Nîşandana rêz û hurmetê ji bo nîmetê; bi bîranîn û spaskirina yê ku ew daye û ku mirov îsraf meke çêdibe. Ji vê bonê girtina serî tu eleqeya wê bi nîşandana rêz û hurmetê ya li hemberî nîmetan tune ye.

570. Ma durist e ku pîrek biçin hemama jinan?

Pirs: Ma durist e ku pîrek, biçin hemama pîrekan?

Bersiv: Pîrekên ku diçin hemamê bi sedem îhtimala ku pêkan e ewretê hev bibînin, divê ku pir bi hizir bin. Xwedê Teala wiha ferman dike:

"**Ji zilamên bawermend re bibêje: Bila çavên xwe (ji heramiyê) bigirin û fercên xwe biparêzin**…"[712]

"Ji jinên bawermend re bibêje: Bila çavên xwe (ji heramiyê) bigirin û fercên xwe biparêzin…"[713]

Ferc, ji bo derdora pêş û paşê zilam û jinan e re tê gotin ku ew jî ji çokê heta navikê ji bedena însên e. Pîrekek, çi bi dilbijînî çi jî bê dilbijînî be, nikare ji çokê heta navikê li bedena pîrekeke din binihêre. Pîrek, ji mêrê xwe pê ve nikare wî cihî nîşanî kesekî/keseka din bide. Ji vê bonê pîrek li ku dibe bila bibe, divê ku ji çokê heta navika xwe, binixumîne. Ev li ser wê ferz e.

Di çûna hemamê de bo pîrekan, bi şertê ku ji çokê heta navika xwe nîşanî tu pîrekên din nedin û pîrekên din jî wî cihî nebînin, tu mehzûrek tune ye.

[712] Nûr, 24/30.
[713] Nûr, 24/31.

TÊKILIYA BI EQREBAYAN RE

571. Bavê ku kafir be, gelo tu mafê wî li ser zarokên wî yên misilman heye?

Pirs: Bavê min baweriya wî bi Xwedê Teala tune ye. Ji ber ku diya min pîrekeke misilman bû, ew berda û bi pîrekeke din re zewicî û ji wê zarokekî wî çêbû. Diya min bêyî ku tu tiştekî madî jê bixwaze, berdan qebûl kir. Niha, ne em wî dibînin û ne jî ew me dibîne û dilê me li hember wî sar e. Di dînê me de çi li hemberî wî û eqrebayên wî û çi jî li hemberî kurê wî yê ji pîreka din, tu mesûliyeteke me ya olî heye? Ango mafên ku ji dê û bav re hatiye dayîn, ji wî re jî heye yan na?

Bersiv: Diya we, ji ber ku hatiye berdan ji aliyê jinantiyê ve li hemberî mêrê xwe yê berê, tu erkeke wê ya olî tune ye. Lê belê hûn kurê bavê xwe ne û kurê wî yê din jî birayê we yê ji bav e. Şayed bavê we dijmintiya dîn jî bike, heram e ku hûn têkiliyên xwe jê bibirin. Hûn çi hez bikin û çi jî hez nekin, dema ku feqîr bin wekî zarok û birayekî, nefeqeyên wan di stûyê we de ye. Ev helwest û rewş, ji bo ku dilê bavê we bi misilmantiyê germ û nerm bibe jî pir muhîm e.

Xwedê Teala di Qur'ana Pîroz de wiha ferman dike:

"**Eger dê û bav, bi te re têbikoşin da ku ya tu pê nizanî ji Min re bikî şerîk, wê çaxê tu bi gotina wan meke! Li dinyayê bi wan re xweş derbas bike û tu bide rêya kesê berê xwe daye Min. Paşê vegera we bes bi bal Min ve ye. Wê çaxê ya ku we dikir Ez ê we pê agahdar bikim**."[714]

"**Hay ji Xwedayê ku hûn bi navê wî tişta ji hev dixwazin hebin û hay ji pêkanîna mafê xizman jî hebin**."[715]

"Ji Xwedê re bendeyiyê bikin û qet tiştekî jê re nekin hevpar. Li dê û bav û xizmên xwe, li sêwî û belengazan, li cîranên nêzîk û yên dûr, li hevalên ba xwe, li

[714] Loqman, 31/15.
[715] Nîsa, 4/1.

rêwî û yên di bin destê we de ne, qenciyê bikin. Xwedê ji yê xwedbîn û qure hez nake." [716]

"**Mafê xizm, xizan û rêwiyan bide, lê îsrafê meke**."[717]

572. Meriv dikare têkiliyên xwe ji eqrebayên xwe bibire?

Pirs: Bavê min mirovekî pir bi 'irn û 'înad e. Bi eqrebayan re li hev nake, ji wan xeyidiye û bi wan re xebernade. Rewş gihîştiye asteke ku êdî bi kurê xwe re jî xeber nade. Ez dixwazim ku bavê min misilmantiya xwe bê kêmasî bijî, mafan bin pê neke û bi her kesî re xweş derbas bike. Dibêje ku eger hûn bi eqrebayan re xeber bidin û hûn wan ziyaret bikin ez heqê xwe li we helal nakim. Ez çawa dikarim ji vê pirsgirêkê xwe xelas bikim?

Bersiv: Di serî de ayetên di derbarê mu'amela xweş bi eqrebayan re nîşanî bavê xwe bidin. Şîrove bikin, bê ka Xwedê Teala û Qasidê Wî çiqas îhtimam dane vî karî. Eger dizane bixwîne bila ew bi xwe bixwîne û eger nizanibe hûn jê re bixwînin û ew jî bila guh bidêre. Digel wan tiştan eger seydayekî ku ew jê hezdike û wî diecibêne hebe, bila ew jî mijarê jê re şîrove bike. Dîsa jî ji ya xwe venegere, hûn dilê wî nehêlin û bi xweşî pê re derbas bikin. Lê belê têkiliyên xwe jî ji xizmên xwe nebirin. Ew nexwaze jî hûn eqrebayên xwe ziyaret bikin û li halê wan bipirsin. Û tu heqê bavê we tune ye ku bibêje "**Ez heqê xwe helal nakim**". Lewra Xwedê Teala wiha ferman dike:

"**Eger dê û bav, bi te re têbikoşin da ku ya tu pê nizanî ji Min re bikî şerîk, wê çaxê tu bi gotina wan meke! Li dinyayê bi wan re xweş derbas bike û tu bide rêya kesê berê xwe daye Min. Paşê vegera we bes bi bal Min ve ye. Wê çaxê ya ku we dikir Ez ê we pê agahdar bikim**."[718]

---

[716] Nîsa,4/36.
[717] Îsra, 17/26.
[718] Loqman, 31/15.

"**Hay ji Xwedayê ku hûn bi navê wî tişta ji hev dixwazin hebin û hay ji pêkanîna mafê xizman jî hebin**."[719]

"**Mafê xizm, xizan û rêwiyan bide, lê îsrafê meke**."[720]

Sehabiyek dipirse: Ey Qasidê Xwedê! "Ez qencîyê bi kê bikim", Qasidê Xwedê wiha bersiv dide: "*Qencîkirina bi diya xwe, bavê xwe, xwişkên xwe, birayên xwe û yên li pey wan tên, erka te ye*."[721]

Di hedîseke din Qasidê Xwedê wiha dibêje: "*Kesê ku baweriya wî bi Xwedê û roja qiyametê heye, bila îkrama mêhvanê xwe bike. Kesê ku baweriya wî bi Xwedê û roja qiyametê heye, bila bi eqrebayên xwe başiyê bike. Kesê ku baweriya wî bi Xwedê û roja qiyametê heye, bila ya tiştekî bi feyde bibêje yan jî xebernede*."[722]

573. Di rojên cejnê de ma divê mirov biçe serdana kê?

Pirs: Di rojên 'îdê de gelo divê kesên mezin herin ziyareta biçûkan, an biçûk herin serdana mezinan?

Bersiv: Li gorî adetê, yên biçûk ziyareta mezinên xwe dikin. Lê belê ji ber sedemên curbicur an jî ne ji ber tu sedemî, eger ên biçûk neçin ziyareta mezinên xwe û ev rewş bibe sedem ji bo rabûna têkiliyên eqrebatiyê -mixabin rewş îro ew e-. Divê ku yên mezin sirf ji bo razîbûna Xwedê Teala serdana eqrebayan dewam bikin. Yanî yên biçûk ziyaret bikin.

Di rewşeke wiha de heta ji dest bê, divê ku mirov hemû eqrebayên xwe ziyaret bike û têkiliyên xwe ji wan nebire. Û divê ku ayet û hedîsên li jêr ji mirov re bibin rê û rêber:

---

[719] Nîsa, 4/1.
[720] Îsra, 17/26.
[721] Buxarî, Edeb, 25.
[722] Buxarî, Edeb, 85; Muslim, Îman, 74-75.

"Ji Xwedê re bendeyiyê bikin û qet tiştekî jê re nekin hevpar. Li dê û bav û xizmên xwe, li sêwî û belengazan, li cîranên nêzîk û yên dûr, li hevalên ba xwe, li rêwî û yên di bin destê we de ne, qenciyê bikin. Xwedê ji yê xwedbîn û qure hez nake."[723]

"**Mafê xizm, xizan û rêwiyan bide, lê îsrafê meke**."[724]

Di hedîseke ku ji Ebû Hureyre (x.j.q) hatiye ragihandin, Qasidê Xwedê wiha gotiye: "*Kesê ku baweriya wî bi Xwedê û roja qiyametê heye bila îkrama mêhvanê xwe bike. Kesê ku baweriya wî bi Xwedê û roja qiyametê heye bila bi eqrebayên xwe başiyê bike. Kesê ku baweriya wî bi Xwedê û roja qiyametê heye bila ya tiştekî bi feyde bibêje yan jî xebernede*."[725]

Li gorî ku ji Ebû Hureyre (x.j.q) hatiye ragihandin zilamek dibêje:

"Ey Qasidê Xwedê! Eqrebayên min hene. Ez ziyaretiya wan dikim, ew bi ser min de nayên. Ez başiyê bi wan dikim, ew nebaşiyê bi min dikin. Ez bi nermahî û xweşikî bi ber wan ve diçim, lê belê ew bi tundî bi alî min ve tên."

Li ser vê, Qasidê Xwedê (s.a.w) wiha dibêje:

"*Eger tu li gorî gotina xwe bî, mîna ku te qûma germ di gewriya wan de berdabe. Heta ku tu di kirinên xwe wiha dewam bikî, alîkariya Xwedê, bi te re ye.*"[726]

Ji 'Ebdullahê kurê 'Emrê kurê 'As (x.j.q) hatiye ragihandin ku Pêxemberê Xwedê wiha gotiye:

"*Dema mirov li hember başiyên xizman bi heman başiyê bersiv bide, ew ne muhafeze û lênihêrtina li eqrebayan e. Mirovê ku li xizmê xwe miqate ye, dema ku têkiliyên xwe jê bibirin jî ew, başiya xwe ya bi wan re berdewam dike*."[727]

---

[723] Nîsa, 4/36.
[724] Îsra, 17/26.
[725] Buxarî, Edeb, 85; Muslim, Îman, 74-75; Herwiha binihêrin Buxarî, Nîkah 80, Edeb 31, Riqaq 23; Ebû Dawûd, Edeb, 123; Tirmizî, 50; Îbn Mace, Edeb, 4.
[726] Muslim, Bir, 22.

574. Hukmê xeberdana pîrekê bi zilamên biyanî re çi ye?

Pirs: Xeberdana pîrekê bi birê mêrê xwe re heram e an na? Ma di serdema Pêxember (s.a.w) de têkiliyên xizman bi hev re çawa bû?

Bersiv: Xwedê Teala di Qur'ana Pîroz de wiha ferman dike:

"Ji zilamên bawermend re bibêje: Bila çavên xwe (ji heramiyê) bigirin û cihên şermegeha xwe biparêzin. Lewra ev, ji bo wan çêtir e. Bêguman Xwedê ji ya ku ew dikin agahdar e.

Ji jinên bawermend re bibêje: Bila çavên xwe (ji heramiyê) bigirin û cihên şermegeha xwe biparêzin, ji beşa ku xuya dike pê ve -ew ne tê de ye- bila xeml û zîneta xwe dernexin der. Bila çarikên xwe berdin ser sîngên xwe. Bila xişrên xwe ji bilî mêrên xwe, bavên xwe, xezûrên xwe, kurên xwe, kurên mêrên xwe, birayên xwe, biraziyên xwe, xwarziyên xwe, jinên digel xwe, dîlên ku di bin destên wan de ne, ji mêran jî ew ên ketî ku tu pêdiviya wan bi jinan nemaye yan jî ew zarokên ku hêj negihane ku dilê wan biçe deverên veşartî yên jinan, nîşanî tu kesî din nedin. Bila (bi tepînî) lingên xwe li erdê nedin ku êdî xişrên wan ên veşartî werin zanîn. Gelî bawermendan! Tev bi bal Xwedê ve tobe bikin da ku hûn serfiraz bibin."[728]

Li gorî van ayetan, pîrek dikare bi zilamên ku behsa wan hat kirin re rûnê û serê xwe jî veke. Yanî nenixumîne. Ji bilî wan pîrek, li ba birên mêrê xwe û eqrebayê wî ji zilaman, nikare cihên xwe yên mehrem veke! Lê belê xeberdana bi wan re selamdayîn û selamstendina ji wan, ne qedexe ye û bi şeklekî nixumandî dikare derkeve pêşberî wan. Xebernedana ji binî ve, selamnedayîn û selamnestendin îşaretên tundî û îfrata di dîn de ye. Bi şertê riayetkirina nixumandina rast û durist, ji bilî wan zilamên ku behsa wan di ayetê de hat kirin, pîrek dikare bi wan re xeber jî

[727] Buxarî, Edeb, 15; Herwiha binihêrin Ebû Dawûd, Zekat, 45; Tirmizî, Bir, 10.
[728] Nûr, 24/30-31.

bide. Tiştê hatiye qedexekirin ku pîrek bi zilamekî xerîb re bi tenê û di cihekî girtî de bisekine yan jî rûnê. Hedîseke ku bi vê mijarê re têkildar e wiha ye:

Pêxemberê me (s.a.w) wiha gotiye:

"*Ez, çûna bi bal pîrekeke ku mehremek pê re tune be, li we qedexe dikim*." Li ser vê gotinê pîrekekê ji Ensariyan pirsî: **"**Ey Qasidê Xwedê! (Di derheqê eqrebayên ji bilî bav û lawan de tu nabêjî çi?)" Qasidê Xwedê wiha bersiv da: **"***Xelweta (sekna) bi wan re mirin e.*"[729]

Bi şertê ku ne li cihekî girtî û bi tenê be, pîrek dikare li derdoran bi zilamên xerîb re bisekine û dikare ji wan re xizmetê jî bike. Di derbarê vê mijarê de ji serdema Pêxember (s.a.w), bi rêyeke sehîh wiha hatiye ragihandin:

"Sehlê kurê Se'd (x.j.q) wiha gotiye: Dema ku Ebû Useyd es-Se'îdî zewicî, Pêxember û hevalên wî jî bi bal xwarina dawetê vexwendin. Ya ku xwarin çêkiribû û danîbû ber wan ji Ummû Useyd ya nû zewicîbû pê ve ne keseke din bû. Wê, ji êvarê ve di beroşek ji kevir xurme şil kiribûn, piştî ku Pêxember (s.a.w) xwarina xwe qedand pîrekê bi destê xwe, wê şîra han îkramî Pêxemberê me dike, bi vî awayî îkramî wî dike û pê dide vexwarin."[730]

Ebû Hezim (x.j.q) wiha gotiye. "Min ji Sehlê kurê Se'd bihîstiye**:** Ebû Useyd es-Se'îdî, Pêxember (s.a.w) da'wetî xwarina daweta xwe kir. Wê rojê pîreka wî ya ku hêj bûka nû bû, xizmeta wan dikir… "[731]

575. Ma zewaca bi kîjan eqrebayan re li mirov heram e?

Pirs: Zewaca bi eqrebayan re heta kîjan zikî/betnî, li mirov heram in?

[729] Buxarî, Nîkah, 112; Muslim, Selam, 8 (2171).
[730] Buxarî, Nîkah, 78.
[731] Buxarî, Nîkah, 79.

Bersiv: Di dînê me de eqrebatiya ku dibe asteng ji bo zewacê: Eqrebatiya nêz, eqrebatiya bi rêya xwezûrantiyê û eqrebatiya bi rêya şîr e.

Eqrebatiya nêz: mirov ji eqrebayên xwe yên nêz, bi dê û dapîrên xwe, bi keça xwe û neviyên wê, xwişk/bira û zarokên xwişk û birayan û neviyên wan, bi xal/xaltîk û ap/meta xwe re nikare, bizewice.

Eqrebatiya bi rêya xwezûrantiyê: mirov bi xwesî/diya pîreka xwe û dapîrên wê re ebediyen nikare bizewice. Herwiha pîreka ku mirov pê re ketibe şeva gerdekê, keç û neviyên wê jî li mirov heram dibin. Jinên bav û bapîrên wê, jinên kur û neviyên wê jî ebediyen li mirov heram dibin.

c- Eqrebatiya bi rêya şîr: Ê ku heta du saliya xwe ji pîrekekê şîr vexwaribe, ew pîrek û mêrê wê, zarokên wê û yên ku wê şîr daye wan, dibin eqrebayê hev yê şîr. Digel hin rewşên awarte pîrekên ku yekî misilman bi sedem eqrebatiya nêz nikare bi wan re bizewice, bi sedem eqrebatiya şîr jî nikare bi wan re bizewice. Mîna mirov bi dê, xaltî, met û xwişk û birayên xwe yên şîr re nikare bizewice.

Ji bilî van, zewaca bi eqrebayên din re ji aliyê dînî ve tu mehzûreke wê tune ye.

Ayetên têkildar wiha ne:

"**Bi jinên ku bavê we, ew mehrkirine re nezewicin, tiştê derbas bûbe êdî çûye. Lewra ew, fehşîtî û karekî kirêt e. Çi rêyeke pîs e!**

Dayîkên we, keçên we û xwişkên we, metên we û xaltîkên we, keçên bira û keçên xwişkên we, dayikên we yên şîr û xwişkên we yên ji şîr, dayikên jinên we û keçhiliyên we yên di malên we de ku hûn çûne nivînên dayikên wan -êdî eger hûn neçûbin nivînên dayikên wan tu guneh li ser we nîn e - û jinên kurên we yên ji pişta we û ku hûn ji xwe re bi jinanî du xwişkan bînin cem hev, li we hatine qedexekirin. Tiştê derbas bûbe êdî çûye. Bi rastî Xwedê bexşîner e, dilovîn e.

Jinên bimêr jî li we heram in; ji bilî (esîrên cengê) yên ku di bin destê we de ne. Ev nivîsa Xwedê ya li ser we ye. Ji bilî van, ên mayî, bi şertê ku hûn bi namûs bijîn û xwe ji zinayê dûr bigirin, ji we re helal in. Ji van a, hûn bi nîkahê ji kîjanê istifade bikin, ji mehra wan mîqdarê we li hev kiriye bidin. Piştî mehra ku hatî kifşkirin, eger hûn bi riza dilê xwe bi awayekî din li hev bikin, li ser we tu guneh tune ye. Bêguman Xwedê zana ye, karbinecih e."[732]

576. Gelo mirov ji nebaşî û xerabiyên dê-bavê xwe, mesûl e yan na?

Pirs: Ma Xwedê Teala ji ber şaşî û nebaşiyên dê û bavan, ceza dide zarokan? Eger ku mirov nikaribe bibe asteng ji bo nebaşiyên wan, divê zarok çi bikin?

Bersiv: Di dînê Îslamê de prensîb û esasê ku "**her kes ji kirinên xwe berpirsyar e**" heye. Li gorî vî esasî, dema ku yek karekî qedexe bike, gunehê wî di stûyê wî de ye û tu eleqeya wî bi yekî din re tune ye. Ango tu kes ji kar, guneh û şaşîtiyên mirovên din, ne berpirsyar e. Xwedê Teala wiha ferman dike:

"**Yan jî ma ew ji ya ku di suhûfên Mûsa de hatine nivîsîn xeberdar nebûye?**

Û ji ya Îbrahîmê wefadar?

Birastî tu gunehkar barê gunehê tu kesê din hilnagire.

Ji însên re ji kar û kiryarê wî pê ve tiştekî din jê re tune ye.

Birastî jî ew ê kar û kiryarê xwe paşê bibîne.

Piştre Xweda dê bedêla kar û kiryarên wî bêkêmasî bide wî.

Bêguman vegera dawîn bi bal Xwedayê te ve ye.

Bêguman Ew e yê ku ken û girîn dane.

[732] Nîsa, 4/22-24.

Bêguman Ew e yê ku mirin û jiyan dane."[733]

"**Kî ku hîdayet (rasterê) bibe, vêca bêguman ew ji bo xwe rasterê bûye. Kî jî têkeve delaletê (ji rêya rast derkeve) êdî bêguman ew li xwe zirarê dike. Tu gunehkar, gunehê kesekî din hilnagire. Heta Em qasidekî neşînin Em tu kesî nadin ezab**."[734]

Ji ber vê yekê hûn li hember şaşîtiyên dê û bavê xwe, ne mesûl in. Lê belê heta ku ji destê we bê û bi zimanekî xweş divê ku hûn wan hişyar bikin, da ku şaşîtiyan nekin. Dema ku qaweta we negihîştê jî hûn nabin mesûl. Lewra Xwedê Teala di Qur'ana Pîroz de wiha ferman dike:

"**Xwedê her kesî bes li gorî hêza wî, wî binbar dike**."[735]

577. Hukmê xeberdana pîrekê bi tiyê xwe re çi ye?

Pirs: Di hedîsekê de Qasidê Xwedê Teala dibêje ku "*Hemw mirin e*". Li gorî vê hedîsê, di hevdîtinên bi zilaman re divê ku pîrek xwe çawa binixumîne. Lewra ev mijar, di hin deman de wekî pirsgirêkeke civakî derdikeve pêşiya mirovan. Ma xelweta (sekna bi tenê) bi kê re û bi çi awayî durist e? Ango mebest ji gotina "*Hemw mirin e*" divê ku çawa bê fêhmkirin an jî were şîrovekirin?

Bersiv: Pêxemberê me (s.a.w) di hedîseke ku jê hatiye ragihandin de wiha gotiye:

"*Ez, çûna bi bal pîrekeke ku mehremek pê re tune be, li we qedexe dikim***."** Li ser vê gotinê pîrekekê ji Ensariyan pirsî: **"**Ya Qasidê Xwedê! (Di derheqê eqrebayên ji bilî bav û lawan de tu nabêjî çi?)" Qasidê Xwedê wiha bersiv da: **"***Xelweta (sekna) bi wan re mirin e*."[736]

---

[733] Necm, 53/36-44.
[734] Îsra, 17/15.
[735] Beqere, 2/286.
[736] Buxarî, Nîkah, 112; Muslim, Selam, 8 (2171).

Wateya gotina "hemw" ya ku di metnê hedîsê de bi 'Erebî derbas dibe, eqrebayên mêr ên zilam in. Mîna birayê mêr, zarokên apên wî û hwd.

Di hedîseke din de wiha derbas dibe: "*Ji niha pê ve, bila tu zilam bi tenê derbasî ba pîrekekê nebe. Eger yek du hazir bin dikare*."[737]

Eger em herdu hedîsan bi hev re binirxînin, em ê bibînin ku çûna bi bal pîrekeke di odeyekê de û bi tenê, hatiye qedexekirin. Xelweta (sekna bi tenê) eqrebayên mêrê pîrekê jî ji ber ku pêkan e bêhtir bibe sedem ji bo fitne û hin xeteran, Qasidê Xwedê Teala gotiye ku: "*Xelweta (sekna) bi wan re mirin e*." Pîrek, dema li gorî fermanên Xwedê Teala xwe nixumandibe û ne li cihekî girtî be yan jî bi hebûna kesekî sêyem, dikare bi wan eqrebayan re hevdîtinê pêk bîne.

578. Ma mêr dikare nehêle ku jina wî biçe serdana dê-bavê xwe, an na?

Pirs: Ma mêr dikare nehêle ku pîreka wî biçe serdana dê û bavê xwe, an na? Mafê mêr yan jî malbata mêr di qedexekirina tiştekî wiha de heye? Li aliyê din, ma durist e ku jin, bê destûra zilamê xwe ji mala xwe derkeve û here serdana mala bavê xwe?

Bersiv: Berdewamkirina têkiliya eqrebatiya bi xizman re fermana Xwedê Teala ye. Lewra Xwedê Teala di sûreyê Nîsa de wiha li me şîret dike:

"**Hay ji Xwedayê ku hûn bi navê wî tişta ji hev dixwazin hebin û hay ji pêkanîna mafê xizman jî hebin**."[738]

"Ji Xwedê re bendeyiyê bikin û qet tiştekî jê re nekin hevpar. Li dê û bav û xizmên xwe, li sêwî û belengazan, li cîranên nêzîk û yên dûr, li hevalên ba xwe, li

[737] Muslim, Selam, 8 (2173).
[738] Nîsa, 4/1.

rêwî û yên di bin destê we de ne, qenciyê bikin. Xwedê ji yê xwedbîn û qure hez nake."[739]

"**Mafê xizm, xizan û rêwiyan bide, lê îsrafê meke**."[740]

Sehabiyek dipirse: "Ma ez qenciyê bi kê bikim ya Resûlellah?!" Pêxember (s.a.w) wiha bersiv dide: *"Qencîkirina bi diya xwe, bavê xwe, xwişkên xwe, birayên xwe û yên li pey wan tên, erka te ye*." [741]

Di hedîseke din da Pêxember (s.a.w) wiha ferman dike:

"*Kesê ku baweriya wî bi Xwedê û roja qiyametê heye, bila îkrama mêhvanê xwe bike. Ew kesê ku baweriya wî bi Xwedê û roja qiyametê heye, bila li xizmên xwe qenciyê bike. Ew kesê ku baweriya wî bi Xwedê û roja qiyametê heye, bila tiştê bi feyde û bi xêr bibêje yan jî bila xebernede***."**[742]

Di derbarê mijara me de hukmê ku di pirtûkên fiqhê de derbas dibe wiha ye:

"Mêr, bi şertê ku li mala wî ranezên û ji hefteyê carekê be, hatina dê û bavê jina xwe nikare qedexe bike. Eger ku ew neyên, jin dikare rojên înê here serdana wan yan jî serdana zaroka/ê ku ji mêrê wê yê berê û tu mafê mêr tune ye ku jina xwe ji wî mafî mehrûm bike. Ku mirov ziyareta wan neke, dê bibe sedem ji bo dûrketin û qelsbûna têkiliyên xizman. Ji vê bonê ne caiz e ku mirov qedexe bike."[743]

Peyva "**roja înê**" divê ku bi wateya mêr herî kêm, heftê carekê destûra pîreka xwe bide, bê hêfmkirin. Ev destûr jî ne şert e ku teqez roja înê be. Di herî dawî de mafê tu kesî tune ye ku di rêya mafê ku Xwedê Teala daye mirovan de bibe asteng û li wan qedexe bike.

---

[739] Nîsa,4/36.
[740] Îsra, 17/26.
[741] Buxarî, Edeb, 25.
[742] Buxarî, Edeb, 85; Muslim, Îman, 74-75.
[743] Nasuhi Bilmen, **Hukukı İslamiyye,** II, 165, paragraf: 562.

JIYANA MALBATÎ

579. Gelo mirov dikare li ba dê-bavê xwe, ji zarokên xwe hez bike?

Pirs: Keçeke min a sê mehî heye. Çawa ku min berê ji zarokên birayê xwe hez dikir û ew maçî dikirin, ez ji keça xwe jî wiha hez dikim û wê maçî dikim. Dê û bav, an jî hinên din, dibêjin ku hezkirina ji zarokan li ba bav, bêhurmetî û bêedebî ye. Ev tişt di dînê me de heye yan na? Ma ne durist e ku mirov li ba bavê xwe, ji zarokên xwe hez bike û wan hembêz bike?

Bersiv: Di dînê me de hukmekî ku hezkirina zarokan li ba dê û bavan qedexe bike, tune ye! Çavkaniya van tiştên ku tu behsa wan dikî, adet û kevneşopîyên berê ne. Divê ku tu rewşa rast bi nermahî û xweşikî ji wan re şîrove bikî û ji wan re behsa hezkirina Pêxemberê me (s.a.w) ya ji zarokan bikî.

580. Tiştên ji zarokan re tên diyarîkirin, bav an jî welî dikare tê de teseruf bike an na?

Pirs: Dema tiştek ji zarokekî ne aqil û balix re bê hediyekirin, gelo durist e ku mirov wî/wê, diyarî zarokekî din bike? Yanî sînorên teserufkirina di malê zorok de çi ne?

Bersiv: Weliyê zarokên ku negihîştine çaxa ruşda xwe, dikare li ser navê wî teseruf bike. Rêgez û qayde di rewşên wiha de ev e:

Welî, bi şertê ku li berjewendiyên zarokê miqate be, dikare di mal de teseruf bike. Di mijara ku hatiye pirsîn de mahiyet û qîmeta diyariyê ya madî muhîm e. Eger malekî bi qîmet be û di hediyekirina wî de dê zarok zirarê bibîne, teserufeke wiha di malê wî de ne caiz e. Lê belê, eger ji aliyê madî ve tu qîmeteke wî/ê ya bilind tune be

û dema ji yekî din re bê hediyekirin, nabe sedem ji bo zirareke madî ya pir, welî dema munasib bibîne dikare tê de teseruf bike.[**]

581. Hukmê pîrozkirina roja jidayikbûnê çi ye?

Pirs: Di Îslamê de hukmê pîrozkirina rojbûyinê çi ye?

Bersiv: "Pîrozkirinên rojbûyinê, divê ku ji aliyê armanca pîrozkirina wê û encamên ku jê dertên, bê nirxandin. Di pîrozkirinê de eger armanc sirf, jidayikbûna yekî/ê be, an jî ji bo ku gihîştiye wî temenî kêfxweşiya xwe bi yên derdora xwe re parve bike; li hev kom bibin û demeke xweş bi hev re derbas bikin, bi şertê ku li gorî pîvanên meşrû bê kirin, mirov dikare bibêje ku maqûl û caiz e. Lê belê, wekî kêf û şahiyên sersalê, ger ev şahiyên han dilbijandina çanda biyanî û unsûrên teqlîdkirinê tê de serdest bin û di pîrozkirinê de mirov derkevin dervê pîvanên meşrû, jixwe wê mehzûr be."[744]

[**] Prof. Dr. Servet Bayındır

[744] H. Yunus Apaydın, **Diyanet İlmihal: II, İslam Ve Toplum**, rp. 483.

JIYANA CINSÎ

582. Beriya têkiliya cinsî, ma xwendina tu duayekî ku hatibe tewsiyekirin heye?

Pirs: Beriya ku mirov bikeve nav nivîna pîreka xwe, gelo xwendina duayekî ku ji Pêxemberê me (s.a.w) hatibe tewsiyekirin, heye?

Bersiv: Di derbarê ku mirov beriya biçe nav nivîna pîreka xwe, ji Pêxemberê me (s.a.w) hedîseke wiha hatiye ragihandin:

"*Ji umeta min dema yekî xwest ku xwe nêzî pîreka xwe bike*" û bibêje:

بِاسْمِ اللهِ اَللّهُمَّ جَنِّبْنا الشَّيْطانَ وَجَنِّبِ الشَّيْطانَ ما رَزَقْتَنا

(Xwendina wê: Bismîllah. Ellahumme cennîbne'ş-şeytane we cennibî'ş-şeytane ma rezeqtena.)

Wateya wê: "*Bi navê Xwedê, Xwedêyo! Şeytan ji me û tiştê ku tê bidî me, dûr bixe.*

Û ji vê zarokek ji wan re bê dayîn, şeytan nikare tu zirarekê bide wî zarokî."[745]

583. Hukmê masturbasyonê çi ye?

Pirs: Hukmê masturbasyonê çi ye?

Bersiv: Di kitêba Deylemî ya bi navê "**el-Fîrdews bi Me'surî'l-Xitab**" de hedîsa, "*Xwedê, roja qiyametê li rûyê heft zumreyan nanihêre. Yek ji wan jî yên ku bi destê xwe re nîkahê dikin (masturbasyonê dikin*.)"derbas bibe[746], wekî din ev hedîs di berhema "**Keşfu'l-Xefa**" ya 'Eclûnî[747] de jî derbas dibe.

[745] Buxarî, Bedu'l-Qelq, 11, De'awat, 55, Tewhîd 13; Muslim, Nîkah, 116 (1434); Ebû Dawûd, Nîkah, 44-45; Tirmizî, Nîkah, 8; Îbn Mace, Nîkah, 27; Ehmedê kurê Henbel, **Musned**, I/217.
[746] Beyrût 1986, II, 332,
[747] Beyrût 1988, I, 448, jimara hedîsê: 1462.

Lê belê di derheqê vê gotinê de Îbn Cewzî wiha dibêje:

"Ew hedîsa ku bi bal Pêxember (s.a.w) ve tê nisbetkirin, ne hedîseke sehîh e. Wekî din Hessan û Meslemeyê ku di zincîra riwayetê de derbas dibin, mechûl in**."**[748] Ango nayên naskirin, nenas in.

Di derbarê masturbasyonê de ji ber ku tu delîlên teqez, yekser û rasterast tune ne, em nikarin bibêjin ku heram e. Encax em dikarin bibêjin ku mekrûh e. Tu cudatî di navbera yên ezeb û yên zewicandî de jî tune ye. Lê belê alimên ku dibêjin mekrûh e, bi piranî, vî hukmî di bara ezeban de rave dikin.

584. Gelo masturbasyon heram e yan mekrûh e?

Pirs: mirov dê çawa ji belaya masturbasyonê xelas bibe?

Bersiv: Masturbasyon ne heram e, belbî mekrûh e. Encax divê ku mirov wî tiştê nebaş, pir neke. Lewra dibe ku bibe sedema gelek nexweşiyan û derî li pêşiya wan veke. Ji bo xelasiya ji vê nexweşiyê, dermanê sereke zewac e. Lê belê mîna ku tê zanîn, li welatê me zewaca di temenê 19-20 de pir zehmet e. Wê gavê, ma ku mirov heta zewacê, rojiyê bigire. Bêguman rojî ji aliyê perwerdehiya nefsê ve roleka xwe ya pir girîng heye.

Hezretî 'Aişeyê (x.j.q) dibêje Pêxemberê me (s.a.w) wiha ferman kiriye:

"*Gelî xortan! Qaweta we kê ya zewacê hebe bila bizewice. Kesê ku hêz û derfeta wî ya madî tune be, bila rojiya (sunet/nafile) bigire. Lewra rojî şehwetê dişikîne*."[749]

Di vê navberê de pêwîst e ku, em dua û sebrê îhmal nekin. Eger alîkariya Xwedê Teala tune be serkeftin tu carî ne pêkan e. Ji bo alîkariya Wî jî du tişt wekî şert û merc derdikevin pêşiya me. Sebir û nimêjkirin:

Xwedê Teala wiha ferman dike:

---

[748] Îbnu'l-Cewzî, **el-'Ilelu'l-Mutenahiye**, Pakîstan 1981, II, 144, jimara hedîsê 1046.
[749] Buxarî, Nîkah, 3; Muslim, Nîkah, 1.

"**Gelî bawermendan! Bi sebir û nimêjê arîkariyê bixwazin. Bêguman Xwedê, digel sebirkêşan e**."[750]

Eger ev şert û merc werin cî, mirov dê bigihîje daxwaziyên xwe.

585. Eger masturbasyon mekrûh be, ma çima piştî kirina wê ez ewqas nerihet dibim?

Pirs: Piştî ku ez masturbasyonê dikim, bi piranî ez xwe nebaş his dikim û poşman dibim û nerihetiyên min ên derûnî çêdibin. Eger ev karê han mekrûh be, gelo çima ev tişt ewqas ezab dide min?

Bersiv: Tiştekî ku mekrûh be, dide nîşandan ew tişt ne li gorî fitret ango xwezaya însên e. Şayed ku ne mekrûh bûna, dê tu nerihetî di hundirê we de peyda nebûna.

586. Ma guneh e ku mirov lêvên jina xwe ramûse?

Pirs: Gelo ramûsandina mêr û jina zewicandî ji lêvan ve, guneh e yan na?

Bersiv: Ramûsandina mêr û jinê ji lêvan ve tu mehzûreke wê tune ye. Heta belbî beriya têkiliya cinsî, ev helwest û yê mîna vê, sunetê mueked hatine qebûlkirin.[751]

Di navbera mêr û jinê de têkiliya ku teqez qedexe ye, munasebeta anal (ji paş ve) û dema ku pîrek di xwînmehê yan jî di çilan de be.

587. Hukmê nêzîkatiye bi bal pîrekê ve bi rêya "oral" ji dev çi ye?

Pirs: Hukmê nêzîkayiya bi bal pîrekê ve bi rêya oralê (ji dev ve) çi ye?

---

[750] Beqere, 2/153.

[751] Bnh: 'Ebdurreûf el-Munawî, **Feydu'l-Qedîr Şerhu'l-Camii's-Saxîr**, çapa 2yem, Daru'l-Ma'rife, Beyrût 1972, V, 90, şerha riwayeta 6536an.

Bersiv: Di Îslamê de tu hukmekî ku xwe bi vê mijarê ve bigire, tune ye. Lê belê karekî wiha li dijî fitret û xwezaya însanê ku fitreta wî saxlem mabe û xera nebûbe. Ji vê bonê mekrûh e.

Dema hûn ayetên 222-223an ji sûreyê Beqere bixwînin, hûn ê bibînin ku nêzîkayiya bi rêya anal/ji paş ve, ne caiz e. Hedîsên Pêxember (s.a.w) ên têkiliya analê qedexe dikin, divê ku bi vî awayî bên nirxandin. Çûna bi bal pîrekê ve bi rêya oralê/ bi rêya dev, -herçiqas nehatibe tewsiyekirin jî- dîsa jî ne cureyekî ji têkiliya ji pêş an jî ji paş de ye. Eger wekî hev bûna, çawa ku di têkiliya analê de hatiye, teqez dê di vê mijarê de jî ji Pêxember (s.a.w) qedexeyeke bihata.

Delîla alimên ku vî karî xweş nadêrin, tirs û endîşeya ku dê bibe sedem ji bo nerihetî û nexweşiyan.

Ji ber ku di vê mijarê de tu ness (delîlek ji ayet û hedîsê ku teqez qedexe bike) tune ye, dibêjin ku mekrûh e. Mekrûh, ne mîna heram e. Lewra heram tiştê ku di qedexebûna wê de biryareke teqez hatibe dayîn.

588. Di têkiliya oral de eger avik ji mêr neyê, ma lazim e ku xusla xwe rake?

Pirs: Di têkiliya oral de eger avik ji mêr neyê ma divê xusla xwe rake?

Bersiv: Di têkiliyeke wiha de dema ku tiştek ji mirov neyê, ne pêwîst e ku mirov xusla xwe rake. Lê belê însanê ku xwezaya wî paqij e dê vî tiştî, karekî kirêt û ne xweş bibîne. Ji vê bonê divê ku mirov xwe ji helwesteke wiha dûr bigire.

589. Mêr û jin, ma dikarin ewretê hev bibînin?

Pirs: Jin û mêrên zewicandî dikarin li ewretê hev binihêrin?

Bersiv: Çi jin dibe çi jî mêr, her yek ji wan dikare ewretê yê din bibîne. Behzê kurê Hakim (x.j.q) ji bapîrê xwe radigihîne:

"Min pirsî: Ey Qasidê Xwedê! Ma divê em ewretê xwe li hemberî kê binixumînin?" Qasidê Xwedê wiha bersiv da: "*Ji cihê ku jin û cariya te dikarin bibînin pê ve, yê mayî ji laşê xwe binixumîne***.**" Di nava însanan de hukmê ewret çiye? Divê mirov heta ku derê binixumîne: "*Heta tu dikarî, nehêle kesek cihê ewretê te bibîne*." Dema ez bi tena serê xwe bim çi bikim: "*Xwedê, yê herî layiq e ku mirov jê fedî û heya bike*"[752]

Wekî ku ji vê hedîsê tê fêhmkirin, di nava jin û mêr de tu nixumandin û mehremiyet tune ye. Di encamê de heta cihê ewretê giran jî tê de jin û mêr dikarin her derê hevdu bibînin.

590. Ma di dînê me de, munasebeta bi pîrekê re ji paş ve teqez hatiye heramkirin an na?

Pirs: Ma têkiliya cinsî ji paşde di nava mêr û jinê de heram e yan na?

Bersiv: Jiyana cinsî ya di navbera mêr û jinê de bi hin sînoran hatiye sînorkirin. Yek ji encama bingehîn ji bo jiyana cinsî ya ku Qur'ana Pîroz îfade kiriye, domandina nesil û zuriyeta însên e. Û awayê munasebata cinsî jî bi şert û mercê ku cihê jê zarok çêdibin ji jinan, hatiye serbestkirin û rêyên din hatine qedexekirin. Xwedê Teala wiha ferman dike:

"**Ji te, pirsa heyzê pîrekan dikin. Bibêje: Ew ezyet e. Di rojên heyzê de xwe ji wan dûr bigirin. Heta ku ew jê paqij nebin nêzîkî wan mebin. Dema tam jê paqij bûn, êdî ji cihê ku Xwedê li we ferman kiriye herin cem wan. Bêguman Xwedê ji tobekaran hez dike û ji yên pak û paqij jî hez dike**.

Jinên we ji bo we <u>zevî</u> ne, vêca we çawa xwest wisa herin zeviyê xwe û ji bo pêşeroja xwe amadekariyê bikin. Ji Xweda bitirsin û bizanin ku hûn ê teqez herin hizûra Wî. Mizgîniyê bide bawermendan."[753]

[752] Tirmizî, Edeb, 39; Îbn Mace, Nîkah, 27.
[753] Beqere, 2/222-223.

Têgeha "zevî" ya ku di ayetê de derbas dibe, di wateya cihê ku hilberî û zad jê tê hilgirtin e. Lê belê munasebata cinsî ya ji paş de ji ber ku tu encamê nade, hatiye qedexekirin. Li gorî van ayetan têkiliya cinsî ya bi jinan re encax di rêya ku Xwedê Teala beyan kiriye ango di rêya normal de ye.

Dema ku em li hedîsên di derbarê vê mijarê de hatine gotin, dinihêrin, em dibînin ku Pêxember (s.a.w) munasebeta bi vî awayî qedexe kiriye, heram dêraye.

Çend hedîsên bi vê mijarê re têkildar in wiha ne:

"*Kesê ku bi jina xwe re ji paş ve têkeve munasebeta cinsî, ew ji rehmeta Xwedê, dûr dikeve*."[754]

"*Ji paş ve bi jinên xwe re nekevin munasebeta cinsî, Xwedê ji gotina rastiyê, şerm nake*."[755]

"*Xwedê, ew jin û mêrê ku ji paş ve nêzî hevdu dibin, bi nezera rehmê li wan nanihêre***.**"[756]

"*Munasebeta cinsî ya mêran bi jinan re ji paş ve, Lûtîtiya biçûk e*."[757]

Ne layiq e ku mirovekî misilman rabe dev ji emrê Xwedê Teala berde û bi rêya qedexekirî nêzîkatiyê li jina xwe bike. Ev helwesta, tu carî bi însanekî misilman nakeve. Şayed şaşîtiyek ji yekî peyda bû jî divê tobe bike û careke din dubare neke.

591. Hukmê girêdana lûleyên malzarokê çi ye?

Pirs: Gelo caiz e ku mirov lûleyên malzarokê girê bide?

[754] Ebû Dawûd, Nîkah, 45, Ehmedê kurê Henbel, **Musned**, II/444.
[755] Tirmizî, Reda', 12.
[756] Tirmizî, Rada', 12; Îbn Mace, Nîkah, 29.
[757] Ehmedê kurê Henbel, **Musned**, II/182.

Bersiv: Girêdana lûleyên malzaroka pîrekê ji ber ku karekî li dijî xwezaya însên e, ne caiz e. Tiştê caiz ew e ku mirov rê û rebazên din ên ji bo kontorolkirina bihemlebûnê bi kar bîne.

592. Da ku zarok çênebin, ma bikaranîna sîstema "vazektomi"yê caiz e?

Pirs: Da ku zarok çênebe, gelo caiz e ku mirov serî li rêya "vazektomi"yê bide yan na? Vazoktemi, sterilizasyoneke cerahî ye ku li ser zilam tê tetbîqkirin, da ku bi rêya 'emeliyatê derbasbûna hucreyên spermên zilam ji gun bi bal cihên ku hatine depokirin bi awayekî mayinde xera bike re tê gotin.

Bersiv: Ev karê ku di zimanê tibê de jê re vazektomi tê gotin, ji ber ku li dijî xwezaya însên e, ne caiz e. Li aliyê din, ev rêya han ji ber ku di rêyên kanalan de zirareke mezin çêdike, vegerandina lûleyen bi bal rewşa wan a berê ve pir zehmet e.

Da ku zarok çênebin, rêya caiz ku mirov 'ezil ango mirov avika xwe berî der ve bide yan jî prezervatifê bi kar bîne, ne ku mirov serî li tiştên ku di laşê însên de 'emeliyatê pêwîst bigerîne, bide.

593. Hukmê "kurtaj" ango jiberxwekirina zarokê çi ye?

Pirs: Hukmê jiberxwekirina zarokê (kürtaj) çi ye? Ma tu qistas û sînorekî wê yê xuya heye yan na? Pîreka min bi hemla xwe şeş mehî ye û di encama testên ku hatin kirin de di zarokê de pirsgirêkeke girîng derket holê. Bijîjk dibêjin ku divê heml bê bidawîkirin. Û vedibêjin ku eger neyê bidawîkirin, dê li ser dayikê xeter be. Di vê rewşê de eger mirov hemlê ji ber bike, ji aliyê dînî ve tu mehzûreke wê heye yan na?

Bersiv: Eger di halê ku uzrek hebe mîna ku tenduristiya dayikê dê têkeve xetereke mezin, ji dêvla mirov dê û zarokê bi hev re wenda bike, ku mirov bi tenê zarokê feda bike, caiz e. Encax bi vê mebestê bi tenê, mirov dikare zarokê ji ber xwe bike. Ji bilî vê, çawa ku heram e mirov zarokeke çêbûyî bikuje, keza jiberkirin jî wisa heram e.

Bi hinceta ku zarok nexweş, bikêmasî, bi uzur, gêj an jî temenkin dê çêbibe, ne caiz e ku mirov mudaxeleyî cenînê bike û dawiyê li jiyana wê bêne. Di vî warî de di asta baweriya bi zanistiya genetik û rêbaza ultrasonografi, hin nîqaş hene. Lewra di roja me ya îroyîn de hin cenînên ku bi rêya ultrasonografi tesbîta ku dê bi 'uzur werin dinyayê û ku bi zarokê re hin nexweşiyên heyatî hene, tê kirin, Lê belê ji ber xwe nagirin û dema ku tên dinyayê jî tê dîtin ku tu tiştekî wan tune ye. Gelek dadparêz jî bûne şahidê vê rastiyê.

Di encamê de ji serê hemlbûnê ve, heta ku zerûreteke teqez û li rê tune be, ne caiz e ku mirov bi rêya jiberxwekirinê dawiyê li jiyana cenînê bîne. Tesbîtkirina uzrekî di zarokê de nabe sedemeke meşrû ji bo vî karî. Sirf dema jiyana dayikê têkeve xeterê, dibe uzur û sedemeke biheq û lirê ji bo jiberxwekirinê.

Di lînka jêr de tezeke Lisansa Bilind bi navê "**İslâm Hukukunda Cenine Müdahalenin Hükmü**" ya ku me bi xwendekarekî xwe, daye amadekirin heye. Em tewsiye dikin ku hûn delîlên bi vê mîjarê re têkildar in, ji wê tezê bixwînin.

http://www.suleymaniyevakfi.org/fitrat-ve-tip-arastirmalari/kurtaj-ve-cenin.html

594. Gelo caiz e ku mirov bi rêya "Tüp bebek" bibe xwedî zarok?

Pirs: Ji aliyê Îslamî ve hukmê ku mirov bi rêya zarokê lûleyan "Tüp bebek" bibe xwedî zarok çi ye?

Bersiv: Biryara Komiteya Bilind ya Karên Dînî (Din İşleri Yüksek Kurulu) ya ku di derbarê zaroka lûleyan de "Tüp bebek" û em jî wê qebûl dikin, li jêr e:

Ji ber sedemê qusûrek ji zilam an jî ji pîrekê, dema bi rêya normal ne pêkan be ku pîrek bi hemil bibe;

Hêk û sperma ku dê berê wê bê girtin, divê ku herdu jî ji mêr û jina zewicandî be, ango divê yek ji wan jî ne yê kesên xerîb be;

Hêka ku berê wê hatiye girtin, ne di malzaroka pîrekeke biyanî de, belbî divê di malzaroka xwe de (ango pîreka xwediyê hêkê de) pêş de biçe;

Ev karê han, divê ji aliyê tibê ve were tesbîtkirin ku dê li ser wan çi dê û bav; çi jî zarokê/a dê were dinyayê ji aliyê madî, rûhî û eqlî ve tu bandoreke neyînî çênebe;

Bi van şertan**, pîrekên zewicandî yên bi ku rêya normal bi hemil nabin û nikarin bibin dayik, dema bi rêyên tibî yên curbicur bi hemil bibin, ji aliyê hukmên Îslamî ve tu mehzûreke wê tune ye.**

Eger mirov bi rêya hêka pîrekeke xerîb an jî bi rêya spermên zilamekî ne mêrê wê be, bi hemilbûna pîrekekê bi dest bixe, ji ber ku hestên mirovantiyê rencîde dike û bi sedema ku unsurên zinayê di xwe de dicivîne, ne caiz e.

595. Gelo durist e ku pîrekeke biyanî, zaroka mirov di malzaroka xwe de hilgire?

Pirs: Di halê ku malzaroka pîrekê tune be, mirov bi rêya hêkên pîrekê û spermên mêr bi awayekî çêkirî bigihîne hev û bide pîrekeke xerîb, da ku bi vî awayî bibe xwedî zarok, caiz e yan na?

Bersiv: Ne caiz e ku meriv, bi rêya hilgirtina zarokê di malzaroka pîrekeke xerîb de bibe xwedî zarok. Lewra Xwedê Teala biryar û fermana ku diya zarokê ya ku zarok aniye dinyayê, daye. Xwedê Teala wiha ferman dike:

"**Ji we, ên ku jinên xwe dişibênin dayikên xwe, jinên wan ne dayikên wan in. Dayikên wan tenê ew ên ku ew welidandine. Bi rastî ew, gotineke derew û dûrî heqiyê dibêjin. Bêguman Xwedê lêbuhêr û gunehveşêr e**."[758]

Xwedê Teala di gelek ayetên din de jî balê dikişîne ser ku pîrek zaroka xwe di malzaroka xwe de hildigire.[759] Di roja me ya îroyîn de jî lêkolînên zanistî û bijîşkî

[758] Mucadele, 58/2.
[759] Ji bo ayetên têkildar bnh: Loqman, 31/14; Ehqaf, 46/15.

didin nîşandan ku zaroka di malzaroka diya xwe de ye, ji xwarin û vexwarina dayikê bigirin hemû hal û hereketên wê dibe ku li ser zarokê bandor bikin.

Li aliyê din, di vê mijarê de di mêjûya 05.01.2002 biryareke Komiteya Bilind ya Karên Dînî (Din İşleri Yüksek Kurulu) ya Dîyanetê heye. Em jî beşdarî wê qerarê dibin.

NÎŞE: Ji bo kesên ku dixwazin agahiyên berfirehtir bi dest bixin, em tewsiya xwendina gotareke zanistî ya **"**Ülfet Görgülü, "**Taşıyıcı Annelik-Fıkhi Bir Bakış**", **İslam Hukuku Araştırmaları Dergisi**, 2010, jimar: 15, rp. 197-208.**"** dikin.

Meriv dikare ji kovara "**İslam Hukuku Araştırmaları**" an jî ji malpera "**İSAM Kütüphanesi**", xwe bigihîne vê gotarê.

596. Di demên hebilbûna pîrekê de, pêwendiya cinsî qedexe ye yan na?

Pirs: Ma di dema hemilbûna jinan de têkiliya cinsî caiz e û tu qedexebûnek li ser vê yekê heye yan na?

Bersiv: Tu hukmên ku di dema avisiyê de pêwendiya cinsî qedexe bike tune ne. Wextên ku têkiliya cinsî di wan de qedexe ne wiha ne: Wextê bênêmijiya jinan ango xwînmehê, çilê piştî welidandinê, wexta ji bo hec û 'umreyê dikevin îhramê û wexta îtikafê ne.

Ji bo têkiliya cinsî di dema hamilbûnê de beriya her tiştî, gotina doktorekî pispor esas e. wekî ku tê zanîn, têkiliya cinsî heta demên dawî jî ne zirarê dide pîrekê û ne jî dide zaroka ku di nava wê de ye. Di van rewşan de tu zirar û qedexebûn tune ye.

Lê belê ji bo demên herî dawî eger doktor bibêje ku pêwendiya cinsî dê zirarê bide pîrekê yan jî bide zarokê, wê gavê ji aliyê dînî ve jî dûrketina ji helwesteke wiha

pêwîst e. Lewra di dînê me de rêgez û distûrek wiha heye: "*Ne zirarê bide, ne jî zirarê bibîne*."[760]

597. Ma pêwendiya cinsî di rojên cejnê de heram e?

Pirs: Di rojên cejnê de çûna bi bal nivîna pîrekan ve, gelo qedexe ye yan na?

Bersiv: Di rojên cejna Remezanê, Qurbanê û şeva înê yan jî şevên mubarek ên meha Remezanê, ne qedexeye ku mêr û jin herin nav nivînên hev. Belbî di rojên heyza pîrekê yan jî piştî ku zarok tê dinyayê; di dema çilê wan de, di demên ji bo hec û 'umreyê dikevin îhramê û di demên îtikafê de çûna bi bal nivînên wan ve qedexe ye. Ji bilî wan deman, tu rojên taybet ku di wan de pêwendiya cinsî qedexe be, tune ne.

598. Pîreka ku zaroka wê ji ber çûye, kengî dikare bi mêrê xwe re razê?

Pirs: Hemla min du hefte û nîv bû û ji ber min çû. Li gorî dînê me, ez kengî dikarim bi mêrê xwe re razêm?

Bersiv: "Dema zarokeke ku dest û piyên wî diyar bûbe ji ber pîrekê here, nîfas (çilê) wê pîrekê dertê holê û bi piranî deh an jî pazdeh rojan xwîn dewam dike. Lê belê ji bo jiberçûna zarokeke ku hîn ezayên wî diyar nebûbe nîfas çênabe; xwîna ku tê dîtin jî xwîna xwînmehê tê hesibandin. Piştî ku xwîn sekinî hûn ê serê xwe bişon û jiyana xwe ya jin û mêrantiyê dewam bikin. Eger xwîn di hundirê dema xwe ya normal de nesekine, dibe xwîna îstihazê (xwîna ji der xwînmehê)."[761]

Pîreka ku xwîna îstihazê jê were, di rojên xwe yên ku dengî rojên paqijiyê tên, dikare bi mêrê xwe re razê. Lê belê xwîn, ji bo pêkhatina enfeksiyonê û xwedîkirina wê cihekî baş tê qebûlkirin. Di rewşên wiha de divê ku mirov li paqijiyê miqate be. Ji bo vê yekê bijîjk pêşniyar dikin ku mêr prezervatifê bi kar bînin an jî şermgeha xwe baş paqij bikin.

---

[760] Îbn Mace, Ehkam, 17; Muwetta, Aqdiye, 31; Ehmedê kurê Henbel, **Musned**, V/327.
[761] Nasuhi Bilmen, **Büyük İslam İlmihali**, "Nifas Haline Ait Meseleler", paragraf: 118.

599. Gelo heram e ku mirov behsa jiyana xwe ya cinsî bike?

Pirs: Gelo guneh e ku pîrek di navbera xwe de behsa jiyana xwe a cinsî bikin?

Bersiv: Ne caiz e ku pîrekên bi mêr (keza zilamên bi jin) behsa tiştên xwe yên mehrem bikin. Ango ne caiz e ku behsa jiyana xwe ya cinsî ya bi mêrê xwe re bikin. Pêxemberê me (s.a.w) wiha gotiye:

"**Bêguman, yek ji wan însanên ku di roja qiyametê de li ba Xwedê cihê wan herî ne xweş û pîs e, kesê ku bi pîreka xwe re rabe û rûnê piştre, sirê wê belav bike**."[762]

"**Bêguman, roja qiyametê li ba Xwedê ji yên di bara emanetan de îxaneta heri mezin kirine yek jê jî piştî ku jin û mêr bi hev re rabûn û rûniştin, ku mêr sirê jinê îfşa bike.**"[763]

Qasidê Xwedê di rojeke ku mêr û jin li cem hev bûn, berê xwe da zilaman û got:

"*Ji we tu kesekî dema ku bixwaze bi pîreka xwe re rakeve, derî li ser xwe digire û xwe bi potekî dinixumîne, heye?* "

Wan jî gotin "belê." (Qasidê Xwedê xebardana xwe domand):

Got "*Piştre (ew kes) piştî vî karî, li civakekê rûdinê û dibêje ku min îro bi pîreka xwe re wiha wiha kir?* "

Wan jî deng dernexistin. (Qasidê Xwedê) piştî demekê berê xwe da pîrekan û got:

"*Ji we jî yên sirên mîna vî (ji kesên din re) bibêje hene?*"

[762] Muslim, Nîkah, 123 (1437.
[763] Muslim, Nîkah, 124; Ebû Dawûd, Edeb, 32; Ehmedê kurê Henbel, **Musned**, III/69.

Wan jî deng nekir. Li ser vê yekê, qîzeke ciwan li ser çongeke xwe rûniştû da ku dengê wê zelaltir bê bihîstin û wê bibîne serê xwe bi aliyê Qasidê Xwedê ve dirêj kir û got:

"Ey Qasidê Xwedê! Zilam jî û pîrek jî vî tiştî dibêjin." Qasidê Xwedê jî got:

"*Hûn dizanin ev tişt dişibe çi? Ev, mîna ku li rê şeytanek li şeytanekî rast were, di halê ku milet li wan dinihêrin pê re têkeve pêwendiya cinsî (…)* "[764]

Mîna ku di van hedîsan de derbas bû, tiştê di navbera mêr û jinê de derbas dibin, mirov rabe ji kesê sêyem re bibêje, guneh û heram e.

600. Zilam, dema şîrê pîreka xwe vexwe ma eqrebatî di navbera wan de çêdibe?

Pirs: Hevaleka min ya bi hemil dema bi mêrê xwe re leyistiye mêrê wê gotiye ku "Şîr, ket devê min." Hevala min tirsiyaye, ji yekî pirsiye gelo tu mehzûreke dînî heye. Wî jî gotiye ku "Rewşeke biguman e, dibe ku tu bi mêrê xwe re bibî xwişka şîr." Bi rastî jî tiştekî wiha mumkin e? Ma mêr û jin bi tiştekî wiha dibin xwişk û birayên hev ên şîr?

Bersiv: Çêbûna rewşên wisa di navbera mêr û jinan de tiştekî normal e. Ji vê bonê di navbera wan de xwişk û biratiya şîr dernayê holê.

Da ku eqrebatiya şîr derkeve holê divê ku pîrek zarokeke ji 0 heta 2 salan bi mebesta xwedîkirinê şîr bidê. Di hedîsekê de wiha hatiye ragihandin:

"*Eqrebatiya şîr, encax bi şîrdayîna di hundirê du salan de pêk tê*."[765]

Ji ber vê yekê di rewşeke wisa de mêr û jin nabin xwişk û birayên hev ên şîr.

[764] Ebû Dawûd, Nîkah, 48-49.
[765] Buxarî, Nîkah, 21.

Riwayeteke ku di Muwetta Îmam Malik de derbas dibe û bi vê mijarê re têkildar e wiha ye:

Zilameki, ji Ebû Mûsa el-Eş'erî (x.j.q) pirsî: "Min sînga pîreka xwe mêt û şîr çû nava min (hukmê vê çi ye)?" Ebû Mûsa dema got "Li gorî vê, ew pîrek li te heram bû ye." 'Ebdullahê kurê Mesûd (x.j.q) ji zilam re got ku "Dêhna xwe bidê, bê ka çawa fetwa da." Ebû Mûsa dema got: "Di vê babetê de ka tu nabêjî çi?" Îbn Mesûd got ku "(Tiştê ku heramiyê derdixe holê) mêtin encax di hundirê du salan de be." Li ser vê yekê Ebû Mûsa got: "Heta ku ev alimê mezin di nav we de be, tu tiştekî ji min nepirsin."[766]

[766] Muwetta, Reda', 14.

BEŞA HEFTEM

- **FETWA**
- **HEDÎS**
- **HEZRETÎ ÎSA**

FETWA

601. Fetwa çi ye?

Pirs: Cara yekem min serî li malpera we da. Bi wesîleya pirtûkeke Seydayê Abdülaziz min xwest ez serî li malpera we bidim. Di malpera we de beşa "Fetwayan" bala min kişand û min hinekî lê nerî. Di hin mijaran de we fetwa dane. Ji dêvla fetwayan, eger we tewsiye binivîsandana gelo dê ne baştir ba? Ma ji bo fetwadayînê hebûna lijneyekê ne pêwîst e? Eger heyeta we hebe jî gelo vê desthilatdariya han kê daye we? Lewra em di dewleteke Îslamê de (ji aliyê rêvebirinê) najîn. Ji bo fetwadayînê, ma hebûna welatekî ku hukmê Îslamê lê dimeşin, ne lazim e? Eger hûn min agahdar bikin ez ê şad bibim.

Bersiv: Fetwadayîn, di mijareke olî û huqûqî de ragihandina nêrînê ye. Ji vê bonê hewcedarî bi hebûna dewleteke Îslamî tune ye. Kesên fetwayan didin (muftî) seyda ne û nêrînên xwe radigihînin. Kesên ku nêrînên wan mentiqî û hevgirtî bibînin dê li gorî wan nêrînan tev bigerin, eger nebînin dê ji muftiyekî din bipirsin û li gorî fetwaya wî 'emel bikin û tev bigerin.

Her roj çi bi rêya telefonê çi jî bi rêya înternetê ji çar aliyên dinyayê bi dehan pirs ji Weqfa Suleymaniye tên kirin. Ev pirsên han, -li gorî mijara xwe- ji aliyê heşt zanyarên ku her yek di qada xwe de pispor e ve tên bersivandin. Bersivên ku tên amadekirin, ji aliyê Abdülaziz Bayındır ê ku 21 salan li Muftîxaneya Stenbolê Serokatiya Heyeta Fetwayan kiriye ve tên kontrolkirin û ji têkildaran re tên şandin. Ne hemû pirsên ku hatine bersivandin belbî yên ku munasib hatine dîtin, di malpera me de tên weşandin. Fetwayên ku di malpera me de tên weşandin, daxuyaniya di derbarê nav û paşnav û navnîşana e-postayê û hwd. ji tiştên ku bi nasnameya pirsyar ve têkildar e cih nagire.

602. Gelo di navbera misilmanên cîhanê yekîtiyek di fetwadayînê de heye?

Pirs: Gelo hemû misilmanên cîhanê di heman mijarê de her gav heman hukmî didin? Ango ma di navbera misilmanên cîhanê di mijara fetwayan de yekîtiyek heye? Gelo rêya rast ez ê ji kîjan zanyarî bigirim û çawa hîn bibim?

Bersiv: Di vê mijarê de ku her kes biryareke hevbeş bide ne mumkin e. Lewra fetwa, di rewşên ku di ayet û hedîsan de hukmekî aşkere tune be, tê dayîn. Di vê rewşê de li dijî xwezaya tiştan e ku hemû zanyar biryareke hevbeş bidin. Çawa yên ku fetwayên rast didin hene, herwiha yên ku fetwayên şaş didin jî dê hebin. Ji aliyê mirov ve tiştê pêwîst ku mirov lêkolînê bike. mirov dê delîlên kesên fetwayan didin bipirse û li gorî delîlên wan yekê hilbijêre.

603. Em êdî nizanin em ê bi kîjan fetwayê emel bikin. Divê em çi bikin?

Pirs: Seyda, min beşeke mezin ji fetwayên we vekola. Bawer bikin, ji fetwayên berê yên ku min xwendibûn êdî min endîşe kir. Niha fikra min tevlihev bûye. Ez çi bikim, ma ez tiştên ku berê min xwendibûn bi giştî ji serê xwe biavêjim? Hûn çi dibêjin?

Bersiv: Eger hûn delîlên tiştên berê bizanibin û ji we re rast û saxlem tên, hûn dikarin li ser wan dewam bikin. Lê belê eger tiştên ku hûn ji malpera me dixwînin li ser delîlên saxlem hatibin avakirin, divê hûn wan qebûl bikin. Lewra peywira we ku hûn bidin pey rastiyan.

604. Fetwayên ku seyda didin, gelo çima ne mîna hev in?

Pirs: Hin fetwayên we bi fetwayên hin seydayên din re li hev nakin. Jixwe fetwayên her seydayî ji fetwayên ên din cuda ne! Çima hûn heman tiştî nabêjin? Di vê rewşê de em ê li gorî kîjan fetwayê ‘emel bikin? Ma li gorî ya ku bikeve serê meriv? Eger em şaş bikin jî gelo em mesûl in, gunehê wê di stûyê kê de ye?

Bersiv: Divê hûn ne li gotinê binihêrin; belbî divê hûn li awa û şeklê gotinê binihêrin. Mîna di bersiva kesên ku dibêjin "caiz e" li delîlên wan binihêrin. Piştre li delîlên kesên dibêjin "ne caiz e" binihêrin… Delîlên kê bihêztir û saxlemtir bin, li gorî wê hûn ê tev bigerin. Eger hûn vê nekin û hûn ya ku ji we re xweş tê hilbijêrin, hûn dibin mesûl.

605. Xetera fetwadayîna kesên ne ehil

Pirs: Kesên bêqabiliyet eger hêza "fetwadayînê" di xwe de bibînin, gelo dê çawa bi encam bibe?

Bersiv: Di mijarên dînî û tenduristiyê de pir kes xwe rayedar dijimêrin. Hal ew e ku di van mijaran de tewsiyeyên şaş, hem dinya mirov hem jî axreta mirov reş û tarî dikin. mirov nikare serî bi vê rewşê re derxe, lê belê ev, ne tiştekî ji meqamê bijîşkan kêm dike û ne jî kesên di fetwadayînê de xwedî qabiliyet in bê kar dihêle. Lewra kesên xwedîaqil baş dizanin dê serî li kê bidin.

606. Meriv bê zanebûn fetwa bide

Pirs: Hukmê, di mijarên ku zanebûna mirov pê tune ye mirov fetwa bide û berê însanan bide rêya şaş çi ye?

Bersiv: mirov herçiqas bikaribe însanan bixapîne jî mirov nikare xwe bixapîne. Dema di mijarên ku tê de ne pispor in, fetwa didin, dizanin ku sûc kirine. Ji ber ku Xwedê Teala di dinyayê de azadî û serbestiya çûna dojehê daye her kesî, kesên wiha dê bixwazin hinekên din jî bi xwe re bibin.

607. Hin însan Îslamê li gorî roja me dinirxînin. Di vê mijarê de hûn çi dibêjin?

Pirs: Hin kesên meşhûr û navdar, di mijarên dînî de hikum didin, angaşt dikin ku em Îslamê li gorî roja xwe dinirxînin. Li gorî ku fetwayên we jî li dijî wan hukman e, kî ji we li dawiya çaxê ye?

Bersiv: Ji ber her kes çaxê li gorî xwe diwesifîne, ne girîng e ku mirov li pêş an jî li paş be. Ya girîng ku mirov di helwestên xwe de li gorî fermanên Xwedayê ku hemû çaxan afirandine, tev bigere.

608. Ma di mijarên dînî de kî ehil e bo dayîna fetwayan?

Pirs: Di mijarên Îslamî de kî dikare fetwayan bide?

Bersiv: Fetwadayîn, di mijareke olî û huqûqî de ragihandina nêrînê ye. Ji vê bonê divê mirov bi gelemperî çavkaniyên dînê Îslamê ji Qur'ana Pîroz, gotinên Pêxember (s.a.w) û mijarên ku sehabeyan li ser tifaq kirine, bizanibe. Di mijara ku fetwaya wê tê dayîn, divê mirov ji nêrînên zanyarên dînê Îslamê jî sûd wer bigire. Digel van hemû tiştan, rewşa taybet ya kesê ku pirsê dike û şert û mercên ku tê de ye jî girîng e. Di dawiyê de kesê ku fetwayê dide, divê ku qabiliyeta wî ya nirxandina mijaran hebe.

609. Ji aliyê Îslamî ve gelo di navbera fetwa û teqwayê de tu ferq heye?

Pirs: Ji aliyê berpirsyariya jiyandina Îslamê ve, gelo di navbera fetwa û teqwayê de tu ferq heye. Gelo di dîroka Îslamê de jiyana Îslamî li gorî teqwayê di kîjan demê de derketiye holê?

Bersiv: Di dema Pêxember (s.a.w) de ferqa teqwa û fetwayê bi wateya îroyîn tune bû. Pêxember (s.a.w) kîjan rastbûya ew dikir; sehabeyan ew dişopandin. Kesê ku pirsgirêkeke wî hebûya ji Pêxember dipirsiya û li gorî fetwaya ku distend 'emel dikir. Ango di vê demê de fetwa û teqwa heman tişt bûn. Lê belê bi derbasbûna demê re piştî ku jiyana zuhd û tesewufê li cîhana Îslamê desthilatdar bû, ferq di navbera fetwa û teqwayê de çêbû. Muteswifan terka tiştên ku Xwedê Teala li wan helal kiribûn mîna fezîletê qebûl kirin û angaşt kirin ku ev ji teqwayê ye û ketin rêyeke şaş. Ji vê bonê tiştekî bi navê teqwa û fetwayê tune ye.

HEDÎS

610. Hukmê ‘emelkirina bi hedîsa zeîf çi ye?

Pirs: Ma ‘emelkirina bi hedîsa zeîf caiz e?

Bersiv: Hedîsên ku di berhem û pirtûkên hedîsê de cih digrin û bi navê “sehîh”, “zeîf” tên nirxandin, ne li ser esasê ka gelo wateya wan hedîsan bi Qur’anê re çiqas li hev dike; belbî li gorî kesên di zincîra riwayetê de derbas dibin, sehîh an jî ne sehîh hatine binavkirin.

Hedîsa ku navê “sehîh” lê hatiya kirin, dibe ku li gorî seneda wê û zanyarê ku di pirtûka xwe de cih daye wê hedîsê, sehîh be, lê li gorî zanyarekî din ne sehîh be. Ji ber vê yekê ye ku divê pîvana sereke her gav Qur’an be. Ango eger hedîsek herçiqas ji aliyê senedê ve sehîh be jî lê wateya wê rasterast li dijî Qur’anê be, divê ‘emel pê nayê kirin. Herwiha bi hedîsa ku seneda wê zeîf xuya dike lê wateya wê muwafiqî Qur’anê ye, ‘emel tê kirin. Lê di berhemên hedîsê de di mijara ‘emelkirina bi hedîsên zeîf de li ser vê yekê pir ranewestine. Tiştê di wan de hatiye behskirin, di babetê hin kirin û ‘îbadetên di Qur’anê de derbas nabin û bi rêya hedîsên zeîf hatine ragihandin ka ‘emel bi wan tê kirin an na? Bi rastî jî tiştên ku Subhî Salih di vê mijarê de gotine pir balkêş in: Em tewsiye dikin ku hûn bixwînin:

“Gotina **“’Emelkirina bi hedîsên zeîf di meseleya fedailu’l-‘emal (kirina karên baş) de caiz e”** her kes radibe û rûdinê dibêje. Bi vê gotinê, hedîsên ku di riwayeta wê de sistayî hatiye kirin û hemû hedîsên ku li gorî wan ne sehîh in dixin bin vê beşê û bi vî awayî digel ku tu esasekî sabit û saxlem tune ye jî gelek prensîban li ser dîn zêde dikin. Ev gotin, digel ku bi sed salan di ser re derbas bûye jî ji dubarekirina gotina zanyarên ‘ilmê hedîsê yên herî navdar mîna Ehmedê kurê Henbel, ‘Ebdurrehmanê kurê Mehdî û ‘Ebdullahê kurê Mubarek pê ve ne tu tiştekî din e. Gotina van her sê Îmamên mezin wiha ye: “Dema me di mesela helal û heram

de tiştek riwayet bikira, em gelek dijwar û di mijara fedail û yên mîna wê de em musamehakar tev digeriyan."

Gotina van Îmaman bi duristî nehatiye fêhmkirin. Çawa ku di nêrîna me de li hemberî hedîsa "sehîh", hedîsa zeîf cih digire, herwiha mebesta wan ji gotina "em pir dijwar tev digeriyan" jî ne tiştekî ku wiha dijraberî hev be. Tevgera wan a bi tedbîr di riwayetkirina hedîsên di derbarê helal û heram de tê wateya ku wan encax bi hedîsên di merteba herî bilind de cih girtine îhticac kirine û ew derece jî hedîsên ku di dema wan de ji aliyê her kesî bi awayê "sehîh" hatine navdayîn. Dema tiştekî ne bi helal û heram ve belbî bi fedailan ve têkildar bû riwayet bikirina, hewcedarî bi tevgera bi tedbîr û bi tenê hedîsên sehîh riwayet bikin, nedîtin. Li dijraberî vê, hedîsa "**hesen**" ya di bin dereceya sehîhê de tê qebûlkirin di zemanê wan de hîn wekî termekî nedihat zanîn. Herçiqas hedîsa hesen di piştî wan de ji aliyê dereceyê ve di ser hedîsên zeîf re bê dîtin jî di îstilaha pêşiyan de wekî beşeke ji hedîsên zeîf dihate pejirandin. Eger mirov gotina van Îmaman di fedailu'l-'emal de bi awayê duristiya riwayetkirina hedîsên di bin mertebeya yên sehîh de ne, fêhm bikira, dê dubarekirin û neqla gotina wan a "di fedailu'l-'emal de 'emelkirina bi hedîsên zeîf caiz e" ji wan re xweş nehata.

Di vir de guman tune ye ku -di çarçoveya dîn de- hedîsên zeîf bi tu awayî nabin esas ji bo hukmekî şer'î yan jî fezîleteke exlaqî; lewra guman, li hemberî rastiyê tu tiştekî îfade nake. Mîna ehkaman, fezîlet jî ji bingehên dînî yên sereke ne. Ji ber vê yekê ne durist e ku ev prensîb di binyadeke pûç de li ber kendalekî ku wê perçeperçe bibe, were avakirin.

Di derbarê îmkana riwayetkirina hedîsên zeîf di mijara fedailu'l-e'mal de şertên ku yên musamehakar tev digerin herçiqas pir bin û munasib bin jî ji ber sedemê ku em ê bibêjin em vê qebûl nakin. Mîna ku tê zanîn ev şertên han sê heb in:

1. Hedîsa ku tê ragihandin divê ne pir zeîf be.

2. Divê ji Qur'an û sunetê xwe bispêre eslekî.

3. Divê ne muxalifî delîleke ji xwe bi hêztir be.

Em riwayetkirina hedîsa zeîf –digel van şertan jî-, qebûl nakin.

Di destê me de çi di mesela hukmên şer'î û çi jî di mijara fedailan de be, gelek hedîsên sehîh û hesen hene ku hewcedariyê bi yên din nahêle. Bi tu awayî –digel pirbûna van şertan jî- baweriya me bi sabitbûna hedîsên zeîf nayê. Eger wiha bûna, ma me tu carî jê re digot zeîf? Di encamê de em dikin nakin nikarin xwe ji gumana di derbarê hedîsên zeîf de rizgar bikin. Jixwe di dîn de tiştên ne yeqînî bin tu qîmetek ji wan re tune ye."[767]

611. Ma çend hedîs ji Pêxemberê me hatine ragihandin?

Pirs: Min di nivîsekê de xwend ku di dema Ebû Bekir de bi tenê 500 hedîs hebûne û ji ber vê yekê jî hedîsên di ser vê jimarê de mewdû' in, ango derew in. Li gorî vê, gelo ev 500 hedîs kîjan in? Ma di vî warî de tu xebat û lêkolînek hatiye kirin?

Bersiv: Mustafa Karataş ê ku di derbarê jimara hedîsan de doktora xwe kiriye û vê xebata xwe çap kiriye, gihîştiye encama; ne pêkan e ku mirov bibêje jimara hedîsên di dema Pêxember de (s.a.w) dihatin riwayetkirin ji 5.000an (ne pênc sed, pênc hezar) pirtir bûne. Ev jimar jî ji bo hedîsên ku nehatine dubarekirin, hatiye dayîn. Li gorî qenaet û baweriya Karataş, di pirtûkên bi navê "Kutubê Tis'e"[768] neh kitêbên hedîsê yên navdar, digel hedîsên dubarekirî nêzî 10.000an, tevî gotinên sehabî û tabiiyan ên nehatine tekrarkirin 30.000in. Piştre bi riwayetên cuda û

[767] Subhî es-Salih, **Hadis İlimleri ve Hadis Istılahları**, wergêr: M. Yaşar Kandemir, çapa 4em, Weşanxane Ankara 1986, rp. 177-180.

[768] **Kutubê Tis'e**: Buxarî, Muslim, Tirmizî, Ebû Dawûd, Îbn Mace, Nesaî, Darimî, Muwetta, Musned a Ehmedê kurê Henbel.

tekraran zêdeyiyek di jimara hedîsan de pêk hatiye û di sedsala 3yem ya hicrî de ev jimar, gihîştiye 1.500.000î.[769]

Di derbarê xebateke ku 5.000 hedîsên di serdema pêşîn de tesbît kiribe û ew ji aliyê "sehîh", "zeîf" û "mewdû'" nirxandibin, tu agahiyeke me tune ye.

612. Ma însanan bi kîjan mebestan hedîs lêanîne?

Pirs: Gelo hûn dikarin di derbarê sedemên lêanîna hedîsan de (gotina li ser navê Pêxember bi derewan) agahiyê bidin? Ma însanan bi çi mebestê hewcedarî bi lêanîna hedîsan dîtine?

Bersiv: mirov dikare sedemên lêanîna hedîsan bi giştî di bin van sernavan de tomar bike:

1) Lêanîna hedîsan bo berjewendiya deste û grûban. Mîna: Riwayetên Xedîr-i Xum û yên di derheqê Îmametê de, riwayetên li leh û 'eleyhê Emewî û 'Ebasiyan de, riwayetên di derbarê Mehdîyetê de û hwd.

2) Lêanîna hedîsan ji hişkebawerî û teasûba mezhebî ji aliyê hin pêgirên mezhebên fiqhî û kelamî: Mîna riwayetên qeza-qeder, ka Qur'an mexlûq e yan na û gelek riwayetên ku mezhebê Şafiî, Henefî û mezhebên din dipesinîne yan jî rexne dikin.

3) Lêanîna hedîsan bi hestê nijadperestî. Mîna: Riwayetên di leh û 'eleyhê gelên 'Ereb, Tirk û Farisan de.

4) Hedîsên ku ji aliyê dijminên Îslamê ve biqestî hatine lêanîn.

5) Lêanîna hedîsan bi daxwaza xizmeta dîn. Mesela: Bi mebesta teşwîqkirina xwendina Qur'anê riwayetên curbicur ên di derbarê fezîleta Qur'anê de û riwayetên bi meqseda dilbijandina zuhd û 'îbadetê hatine lêanîn.

[769] Mustafa Karataş, **Rivayet Tekniği Açısından Hadislerin Artması ve Sayısı**, teza doktorayê ya neçapbûyî, Stenbol 1998, rp. 230-231.

6) Lêanîna hedîsan bi sedem berjewendiyên şexsî. Mîna: Bo bidestxistina malê dinê, lêanîna hedîsên di derbarê ku mirov xwe nêzî desthilatdar û yên xwedî nufûz bike, xwe bi wan xweş bike û ji wan bexşîşan bigire.

Ji bo bidestxistina zanyariyên rast û berfirehtir di vê mijarê de em dikarin vê çavkaniya han tewsiye bikin:

M. Yaşar Kandemir, **Mevzû Hadisler: Menşe'i, Tanıma Yolları**, Tenkidi, Marmara Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Yayınevi, İstanbul, 2009.

613. Hûn dikarin di derheqê berhemên ku hedîsên mewdû' berhev kirine, agahiyan bidin?

Pirs: Gelo hûn dikarin di derbarê berhemên li ser hedîsên mewdû' hatine nivîsandin de agahiyê bidin?

Bersiv: Zanyarên 'ilmê hedîsê bi azîneyên curbicur riwayetên mewdû' (derewîn) berhev kirine û bi navê "**Mewdû'at=Hedîsên Derewîn**" (الموضوعات): berhem û pirtûkên hedîsê telîf kirine. Bi saya van berheman, kesên di qada 'ilmê hedîsê de ne pispor bin jî bi hêsanî dikarin hedîsên mewdû', nas bikin.

Em dikarin van berhemên ku piraniya wan bi zimanê 'Erebî hatine nivîsandin ên sereke wiha rêz bikin:

el-Meqdîsî (w. 507/1113): **Tezkiretu'l-Mewdû'at,**

el-Cuzekanî (w. 543/1148): **el-Ebatil we'l-Menakir we's-Sihah we'l-Meşahîr,**

Ebu'l-Ferec Îbnu'l-Cewzî (w. 597/1200): **Kitabu'l-Mewdû'at mine'l-Ehadîsi'l-Merfû'at,**

Celaleddîn es-Suyûtî (w.911/1505): **el-Lealî'l-Mesnû'a fi'l-Ehadisi'l-Mewdû'e,**

Îbn Arrak (w.963/1556): **Tenzîhu'ş-Şerî'ati'l-Merfû'a 'ani'l-Exbari'ş-Şenî'ati'l-Mewdû'e,**

el-Fettenî (w. 986/1578): **Tezkiretu'l-Mewdû'at fi'l-Ehadîsi'l-Merfû'at,**

'Eliyyu'l-Qarî (w.1014/1605): **el-Esraru'l-Merfû'e fi'l-Exbari'l-Mewdû'e: el-Mewdû'atu'l-Kubra,**

eş-Şewkanî (w. 1250/1832): **el-Fewaidu'l-Mecmû'e fi'l-Ehadîsi'l-Mewdû'e,**

el-Leknewî (w. 1304/1886): **el-Asaru'l-Merfû'e fi'l-Exbari'l-Mewdû'e,**

Hin berhemên ku bi vê mijarê re eleqedar in û bi zimanê Tirkî hatine nivîsandin wiha ne:

M. Yaşar Kandemir: **Mevzû Hadisler: Menşe'i, Tanıma Yolları, Tenkidi,**

Harun Ünal: **Uydurma Hadisler** (Weşanên Mirac), 6 cild; **Mevzûât (Mevzû Hadisler)** (Weşanên Basiret),

Sadık Cihan: **Uydurma Hadislerin Doğuşu ve Sosyo-Politik Olaylarla İlgisi**

Ali el-Kârî: **Uydurma Olduğunda İttifak Edilen Hadisler**, Wergêr: Halil İbrahim Kutlay,

İbn Kayyim el-Cevziyye: **Uydurma Hadisleri Tanıma Yolları** (**el-Menaru'l-Munîf fi's-Sehîh we'd-Deîf)**, Wergêr: Hanifi Akın,

Abdülfettah Ebû Gudde: **Sened ve Metin Yönüyle Mevzu Hadisler**, Wergêr: Enbiya Yıldırım.

614. Ma li gorî Ebû Henîfe, di Kutubê Sitte de tu hedîsên li dijî Qur'anê bin hene?

Pirs: Tê gotin ku Îmam Ebû Henîfe, hedîsa "Kesê misilman dema zinayê bike, ew bê îman zinayê dike. Ango di wê gavê de îman jê tê stendin." bi hinceta ku "li dijî Qur'anê ye" qebûl nake. Gelo ev tişt rast e?

Bersiv: Belê ev gotin rast e. Îmam Ebû Henîfe, di berhema xwe ya bi navê **el-'Alim we'l-Mute'ellim** ya ku bi bal wî ve tê spartin de vê hedîsa ku di Tirmizî û Ebû Dawûd de derbas dibe, bi hinceta ku "li dijî Qur'anê ye" red dike. Em ê ji wê berhemê beşa têkildar li jêr neqil bikin. Em tewsiye dikin ku hûn wê bixwînin:

Xwendekar (Ebû Muqatil): Hûn di derbarê kesên hedîsa "Kesê bawermend dema zinayê dike, mîna ku kirasê wî ji serê wî derdikeve, îmana wî jî dertê. Piştre dema tobe dike îmana wî lê vedigere."[770] riwayet dikin de çi dibêjin? Eger hûn vê rast bidêrin, tê wateya ku we prensîbên Xariciyan (Xaricî, desteyeke hizir dike ku 'emel parçeyekî ji îmanê ye û angaşt dike ku kesê gunehê mezin bike, dibe kafir) qebûl kiriye. Eger hûn ji nêrînên wan di gumanê de bin, hûn ê di prensîbên Xariciyan de jî ketibin gumanê û dê were wateya ku hûn ji rastiya we gotiye vegeriyane. Eger hûn gotina rawiyan derew bidêrin, ew ê jî we bi derewdêrandina gotina Pêxember (s.a.w) tewangbar bikin. Lewra wan ev hedîsa han, heta bigihîje Pêxember (s.a.w) ji mirovên muteber ragihandine.

Zanyar (Ebû Henîfe): Derewdêrandin, bi tenê ji bo kesê bibêje: "Ez gotina Pêxember (s.a.w) derew didêrim." Lê belê eger bibêje: "Ez bi temamê gotinên Pêxember (s.a.w) baweriyê tînim. Lê wî negotiye xerabiyê bikin û li dijî Qur'anê jî tevnegariyaye", ev gotina han tê wateya ku wî kesî tesdîqa Pêxember û Qur'anê kiriye; Qasidê Xwedê ji tevgera li dijî Qur'anê pak dêraye. Eger Pêxember (s.a.w) li dijî Qur'anê tev bigere û ji ber xwe ve tiştên ji bo Xwedê neheq in lê bîne, Xwedê dê

[770] Ebû Dawûd, Sunet, 15; Tirmizî, Îman, 11.

hêz û qaweta wî jê bistenda û rahjiyana wî hilbiqetanda. Lewra ev babeta ha di Qur'anê de wiha tê ragihandin:

"**Eger pêxember li ser (navê) Me hin gotin lêbianîna. Teqez Me yê ew bi xurtî bihingavta. Piştre Me yê dilreha wî biqetanda. Ji we tu kesî jî dê nikaribûya ji bo wî berevanî bikira**."[771]

Pêxemberê Xwedê, li dijî kitêba Xwedê dernakeve. Kesê dijatiya kitêba Xwedê dike jî jixwe nabe pêxemberê Xwedê. Vê xebera (riwayet) ku wan ragihandiye, li dijî Qur'anê ye. Lewra Xwedê di Qur'ana Pîroz de di ayeta "**Jin û mêrê zinaker**…"[772] de wesfê îmanê ji mêr û jina zinaker ranekiriye. Herwiha di ayeta "**Ji we ew ên ku zinayê dikin, herdu jî**…"[773] de jî Xwedê bi qeyda "**ji we**", ne kesên Cihû û Fileh, belbî yên misilman qesd dike. Wê gavê dema mirov yekî ku hedîseke li dijî Qur'ana Pîroz radigihîne înkar bike, ev nayê wateya ku mirov Pêxember (s.a.w) red kiriye yan jî ew tekzîb kiriye. Belbî ev tê wateya mirov wî kesê ku ya ne rast li ser navê Pêxember (s.a.w) ragihandiye, red kiriye. Ev töhmet, ne ji Pêxember (s.a.w), belbî li yê ku radigihîne tê kirin. Her tiştê Pêxember (s.a.w) gotiye me bihîstibe yan jî nebihîstibe li ser ser û çavê me cihê wê heye. Me bi temamê wan bawerî aniye, em şahdeyiyê didin ku ew, mîna Qasidê Xwedê gotine. Herwiha em şahdeyiyê didin ku Pêxember (s.a.w) ferman bi ya ku Xwedê qedexe dêraye nekiriye û li pêşberî tiştê Xwedê ragihandina wê bi bal bendeyên xwe ve xwestiye jî nebûye asteng. Dîsa em şahdeyiyê didin ku ew di temamê karê xwe de li gorî fermana Xwedê tevgeriyaye û tu tiştekî nû (bid'et) dernexistiye holê. Tiştê ku Xwedê negotibe jî bi bal Xwedê ve nespartiye. Ji ber vê ye ku Xwedê Teala wiha ferman dike: "**Kî bi gotina Qasid bike, teqez wî bi gotina Xwedê kiriye…**"[774]

---

[771] Haqqe, 69/44-47.
[772] Nûr, 24/2.
[773] Nîsa, 4/16.
[774] Nîsa, 4/80; Bnh: İmam-ı Azam'ın Beş Eseri, wergêr: Mustafa Öz, çapa 2yem, Weşanên İFAV, Stenbol 1992, "**el-Âlim ve'l-Müteallim**", rp. 24-25.

615. Ma nusxeya destnivîsa Buxarî bi xwe heye, wenda ye, an nayê zanîn?

Pirs: Gelo nusxeya destnivîsa Buxarî (nivîskar bi xwe) heye, wenda bûye yan heye lê nayê zanîn? Bi qasî ku me bihîstiye destnivîsa nivîskar bi xwe tune ye û nusxeyên heyî jî xwendekarên wî jê girtine û nivîsîne. Ma em şaş dizanin? Eger hûn vê yekê ji me re rave bikin em ê dilşad bibin. Herwiha di derbarê jiyana wî ya malbatî de jî tu zanyarî tune ne. Gelo zewiciye, zarokên wî hene? Herçiqas mesela zewaca wî, -çi di leh çi jî di eleyhê wî de- ji bo gihiştina biryarekê di derbarê wî de nabe piştek jî bi tenê em dixwazin nas bikin?

Bersiv: Berhemên ku kurtejiyana rawiyên hedîsê dikin mijar ji bo xwe, bi gelemperî cih didin aliyên wan ên ku rasterast bandorê li riwayetê dikin, mîna fêrbûna wan a hedîsê, seydayên wan, xwendekarên wan, berhemên wan û ehliyeta wan a ragihandinê (rewşa wan a cerh û te'dîlê). Zanyariyên di derbarê malbatê de mîna zewaca wan û jimara zarokên wan, ji ber ku rasterast bi mijara riwayetkirina hedîsê re ne têkildar e, li serê nayê rawestin. Ne bi tenê ji alimên hedîsê yên mîna Buxarî û Muslim, herwiha Îmamên mezheban ên ku pir navdar in jî vî aliyê jiyana wan nayê zanîn. Ji ber vê sedemê agahiyên me yên di derbarê malbata Buxarî de ne zêde ne. Lê di derheqê seydayên wî (mîna Îbn Mende (w. 395/1005) di **Tesmiyetu Şuyuxi'l-Buxarî** de 309 seydayên wî daye danasandin), rêwîtiyên wî yên di rêya hedîsê de, xwendekarên wî, berhemên wî, eslê wî, mêjûya jidayikbûn û wefata wî û hwd. ji zanyariyên ku eleqeya wan bi riwayetkirina hedîsê ve heye, bi awayekî berfireh tê zanîn.

Destnivîsa nivîskar ya el-Cami'u's-Sehîh negihiştiye roja me. Destnivîsên Sehîha Buxarî yên di roja me de hene, xwe dispêrên destnivîsa ku ji aliyê 'Elîyê kurê Muhemmedê el-Yunînî (w. 701/1301) ve ji ber destnivîsa Firebrî yê ku ji

xwendekarên Buxarî yên navdar e, hatiye amadakirin. Tê ragihandin ku Fîrebrî nusxeya xwe du caran ji seydayê xwe Buxarî bihîstiye.[**]

Nîşe: Ev nota li jêr ji Elmanyayê ji aliyê xwendevanekî ku me dişopîne hatiye hinartin:

Fîrebrî (w. 320/932)) ji pênc xwendekarên navdar ên Îmam Buxarî ye. Wî, ji Buxarî ev berhem girtiye, ji wî Hemewî (w. 381/991), ji wî Dawûdî (w. 467/1074), ji wî Ebu'l-Waqt (w. 553/1158), ji wî Îbnu'l-Letî (w. 635/1237), wî jî ragihandiye Yunînî.

616. Ma di Qur'anê de di derbarê zewaca pîrik û nevî de, tu hukim tune ye?

Pirs: Seydayek dibêje ku "Qur'ana Pîroz bê hebûna hedîsan nayê fêhmê" vê mînakê tîne: "Xwedê di Qur'anê de kesên zewaca bi wan re qedexe ye yek bi yek jimartiye û diyar kiriye ku zewaca bi yên ji bilî wan helal e. Lê di vî halî de ma zewaca bi diya bav (pîrik) re gelo helal e? Nexwe bê hebûna hedîsan, Qur'an bi rêk û pêk nayê fêhmê?" Hûn jî beşdarî vê nêrînê dibin an jî rastiya vê bûyerê çi ye?

Bersiv: Bêguman di fêhmkirina Qur'anê de hedîs cihekî girîng digirin. Lê belê angaşta ku li jor tê kirin, ji serî heta binî berevajîkirina meseleyê ye. Lewra yên vê yekê diavêjin holê ew bi xwe jî baş dizanin ku ji bêjeya "**aba=**آباء" ango "**bavan**" ya di Qur'anê de dibuhure hem bavê meriv, hem bavê bavê mirov (bapîr/kalik), bavê wî (bavê kalikê meriv) ango hemû bavanê mirov bi jor ve (di zimanê fiqhê de usûl) tên qesdkirin. Di ayeta 22yem ji sûreyê Nîsa jî hatiye fermankirin "**Bi jinên ku bavê we, ew mar kirine re nezewicin.**" Ev, çawa ku zewaca bi jinbavê re qedexe dike, herwiha zewaca bi jina kalikê mirov re jî heram dike. Li gorî vê, pîrika wî ya ku bapîrê wî ew mar kiriye jî dikeve beşa jinên ku zewaca bi wan re qedexe ye. Jixwe ev babet di

[**] Prof. Dr. Hüseyin Hansu

pirtûkên fiqhê de jî wiha tê ravekirin. wekî mînak di derbarê vê mijarê de di pirtûka sereke ji mezhebê Henefî **el-Îxtiyar** de ev zanyariyên han hene:

"Jinên ku ji teref bav û bapîr ve hatine berdan, çiqas bi jor ve here jî (ji aliyê dê û bav), li ser kur û neviyan heram in. Lewra Xwedê Teala wiha ferman dike: "**Bi jinên ku bavê we, ew mar kirine re nezewicin.**"[775]

Nedîtina yekîtî û hevgirtina ku di navbera Qur'an û Sunetê de heye, di fêhmkirin û tetbîqkirina dîn de bûye sedemê şaşîtî û zehmetiyên ku dawî li wan nayên. Ji van şaşîtiyan ên herî mezin jî qebûla ku Sunet, wehya xeyrî metlû ye (ango sunet jî mîna Qur'anê ye, lê ev heye ku nayê xwendin), pejirandina ku Qur'an û Sunet du çavkaniyên ji hev cuda ne û nêrîna ku Sunet, hakim e li ser Qur'anê.

Em tewsiye dikin ku hûn nivîsa me ya di derbarê têkiliya Qur'an û Sunetê de ya bi sernavê **Kur'an'a ve Geleneğe Göre Kitap ve Hikmet** ya di malpera me de hatiye weşandin ji lînka jêr bixwînin:

http://www.suleymaniyevakfi.org/kutsanan-gelenek-ve-kuran/kitap-ve-hikmet.html

617. Kesê di axirzeman de 'îbadetên hindik bike, ma dê xelas bibe?

Pirs: Ma hûn dikarin di derbarê vê hedîsê de agahiyan bidin? "Wê demek bê; misilmanên wê gavê, eger 'îbadetên hûn dikin, dehyeka wê bikin dê ji ezabê roja axretê rizgar bibin." Hedîsek wiha heye? Ma ev yek, dê mirovan kasûl û zexel neke?

Bersiv: Riwayeta ku behsa wê tê kirin wiha ye:

Li gorî ku Ebû Hureyre (x.j.q) radigihîne, Qasidê Xwedê (s.a.w) wiha kerem kiriye:

[775] Mewsilî, **el-Îxtiyar li Te'lîli'l-Muxtar**, III, 85.

"*Hûn di demeke wisa de ne ku kesê ji we dev ji dehyeka tiştê pê hatiye fermankirin berde, dê helak bibe. Piştre dê zemanekî wiha were ku kesê di wê gavê de dehyeka tiştê pê hatiye fermankirin bike, dê rizgar bibe*."[776]

Tirmizî di derheqê vê hedîsê de wiha gotiye:

"Ev hedîs, **xerîb e**. Em dizanin ku ev riwayet, Nu'eymê kurê Hemmad bi tenê ji Sufyanê kurê Uyeyne ragihandiye."

Hedîsa xerîb, ya ku rawiyê wê, di cihekî yan jî di çend cihan de ji seneda wê, bûbe yek.

Nu'eymê kurê Hemmad ê ku di zincîra riwayeta vê hedîsê de cih digire, ji aliyê gelek rexnegirên hedîsê ve, wekî kesekî **zeîf** û hedîsên **munker** radigihîne tê zanîn û di riwayetên xwe de gelek caran şaş dibe û ji ber vê yekê wan tevlihev dike, tê danasandin. Riwayetên vî kesî nabin ku mirov bike delîl û hin kesan gotine ku wî bi armanca parastina sunetê hedîs jî lêanîne.[777]

Mîna ku tê dîtin, hedîs ji aliyê senedê ve zeîf e. Wekî din jî nabe ku mirov bi angaşta zeman xerab e, şaşîtî yan jî zexelî û tiraliya xwe bin palas bike. Xwedê Teala wiha ferman dike:

"**Ez qesem dikim bi dema ku tê û diherike.**

Mirov her di ziyanê de ne.

Lê yên ku bawerî anîn, karên qenc kirin û li ser heqî û sebrê şîret li hev kirin, ew ne tê de ne."[778]

---

[776] Tirmizî, Fîten, 79.

[777] Bnh: Ali Çelik, "Nuaym b. Hammâd", **DİA**, 2007, XXXIII, 219. Ji bo zanyariyên berfirehtir di derheqê Nu'eymê kurê Hemmad de bnh: ez-Zehebî Muhemmedê kurê Ehmed, **Siyeru E'lami'n-Nubela**, çapa 4em, X, 595-612, jimara rêzê: 209.

[778] 'Esr, 103/1-3.

618. Duayê Cewşenê ji aliyê ‘ilmê hedîsê ve, çawa tê nirxandin?

Pirs: Gelo metnê duaya bi navê “Cewşen” tê zanîn, ji aliyê ‘ilmê hedîsê ve çawa tê nirxandin?

Bersiv: Adnan Yeniay, di xebata xwe ya Lîsansa Bilind ya bi sernavê “**Cevşen Duasının Hadis İlmi Açısından Kritiği**” de di beşa “Sonuç=Encam” de encamên ku di bara Cewşenê de bidest xistine wiha rêz dike:

1. Duayê cewşenê, ne di çavkaniyên hedîsê yên Ehlisunet, ne jî di yên Şi‘a de cih digire.

2. Riwayetên di derheqê fezîleta duayê cewşenê de hatine ragihandin, li dijî ruhê Îslamê ye. Gotina ku dema duayê cewşenê bê xwendin an jî mirov bi xwe veke fezîleta ku behsa wê tê kirin, dê pêk were, ji aliyê zanistî ve rast xuya nake.

3. Di derheqê duayê cewşenê de hin riwayetên ku ne li gorî aqil û mentiqê ne, hene.

Wek mînak; li gorî riwayetê, tê angaştkirin ku Cibrîl ji Pêxemberê me daxwaz kiriye ku vî duayî hînî kafiran neke. Lê belê li berevajî riwayeta ku tê angaştkirin duayê cewşenê, ji ber ku bi awayekî ji her kesî re diyar derbasî literaturê bûye, veşartina wî duayî êdî ne pêkan e. Ji vê rewşê jî tê zanîn Cibrîl tiştekî wiha ji Pêxemberê me re negotiye.

4. Di dema Pêxemberê me û sehabeyan de bi tenê ji Xwedê hêvî dikirin, hizir dikirin ku pêbawerî û parastin bi Wî ye. Ji bilî Xwedê tu tiştekî ku hêvî jê bihata kirin, pêbawerî û parastin pê çêbûbe, nedihat hizirkirin. Dema li suneta Pêxember jî bê nihêrtin, xuya dike ku bi tenê îtimada li ser Xwedê heye. Mesela Hezretî Pêxember fêrî sehabiyên xwe kiriye ku dema qeytanên pêlava wan biqete, wê jî jê bixwazin.

5. Di vî duayê bi bal Pêxemberê me ve tê spartin de tê gotin ku dê Qasidê Xwedê, sehabeyan û kesê dua dixwîne biparêze. Lê belê ewqas îşkenceyên li

Pêxember û sehabeyan hatine kirin, çîleyên kêşandine û birînên di cengan de dîtine li meydanê ne. Madem duayê cewşenê dê Qasidê Xwedê û sehabeyan biparêze, gelo çima Hezretî Pêxember û sehabeyan da ku ji îşkence û çîleyan rizgar bibin, ev dua nexwendin? Hal ev e ku eger duayê cewşenê ji Hezretî Pêxember re hatibûna û erka parastina ku behsa wê hatiye kirin pêk bianiya, hem Hezretî Pêxember dê ev dua bixwenda, hem jî dê tewsiya xwendina wê li sehabeyan bikira. Lê ji ber ku rewşeke wiha tune ye, derdikeve holê ku duayê cewşenê jî ne ji Qasidê Xwedê ye.

6. Angaşta ku duayê Cewşenê ya bi zimanê Farisî bi wateya mertal e -ji Pêxemberekî ku bi zimanê 'Erebî wehiy jê re hatiye- ne di çavkaniyên yekem ne jî di yên duyem de heye.

Ji ber sedemên ku me li jor rêz kirin, rastiya riwayeta metnê ku nêzî pazde rûpelan e û wekî hedîsê bi bal Pêxember ve tê spartin, xuya dike ku ne pêkan e. Temamê duayê Cewşenê ne ji Pêxember e, herçiqas hin beşên wê, hevokên wê mîna hedîs û ayetê were wesifandin jî diyar e ku temamê wê ne ji Pêxemberê me ye."[779]

619. Hedîsa "Zanayên umeta min, mîna pêxemberên Zaroyênîsrail in"

Pirs: Gelo hedîsa "Zanyarên umeta min, mîna pêxemberên Zaroyênîsrail in" sehîh e?

Bersiv: Ev gotina ku wekî hedîsê tê zanîn, di nav gel de pir navdar e. Lê belê zanyarên 'ilmê hedîsê yên mîna Darimî, Zerkeşî û Îbn Hecerê el-Esqelanî, gotine ku ev gotin bê esl û binyad e. Suyûtî û Zerkeşî jî dibêjin ku tu esl jê re tune ye. Hin aliman jî diyar kirine ev gotin, di tu pirtûkên muteber de cih negirtiye.[780]

---

[779] Adnan Yeniay, Cevşen Duasının Hadis İlmi Açısından Kritiği, **Cumhuriyet Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Sosyal Bilimler Enstitüsü**, teza lîsansa bilind, 2008, Şêwirmend: Enbiya Yıldırım, rp. 70-71.

[780] Bnh: es-Sexewî, **el-Meqasidu'l-Hesene**, rp. 340; jimara hedîsê: 702; 'Eliyyu'l-Qarî, **el-Esraru'l-Merfû'e fi'l-Ehadîsi'l-Mewdû'e (el-Mewdû'atu'l-Kubra)**, thq: Muhemmed Lutfi es-Sebbax, çapa 2yem, Beyrût 1986, rp. 247; jimara hedîsê: 298; Şewkanî, **el-Fewaidu'l-Mecmû'e**, rp. 286; jimara hedîsê: 897.

Herwiha ji alimên hedîsê Hafiz el-Îraqî jî gotiye ku ev gotin, bê esl e û tu senedeke wê tune ye.[781]

620. Ma hedîsa "Kesê nîşangêriyê hîn bibe û biterikîne, ne ji me ye" sehîh e?

Pirs: Di derheqê nîşangêriyê de hedîsekê bala min kişand. Ez dixwazim hîn bibim ka gelo rast e yan ne rast e. Hedîs wiha ye: "Kesê nîşangêriyê hîn bibe û paşê biterikîne, ne ji me ye." (Muslim, 'Îmaret 169; Ebû Dawûd, Cîhad 23). Ma divê em vê hedîsê çawa fêhm bikin?

Bersiv: Xwedê Teala di Qur'ana Pîroz de li misilmanan ferman kiriye ku li hemberî neyarên xwe her gav amade bin. Wî wiha emir kiriye:

"**(Gelî bawermendan) çiqas ji destê we bê, ji hêz û hespên girêdayî li hember wan (dijminên xwe), amade bikin. Hûn ê bi wê, dijminê Xwedê, dijminê xwe û hin dijminên din jî ku hûn bi wan nizanin, lê belê Xwedê bi wan dizane, çavtirsandî bikin. Çi tiştê ku hûn di rêya Xwedê de xerc bikin, (bêkêmasî) xêra wê dê ji we re bê dayîn û qet neheqî li we nayê kirin**."[782]

Pêxemberê me (s.a.w), bêjeya "hêz" ya di vê ayetê de dibuhure, bi awayê **avêtin** (tîr), **nîşangêrî** şîrove kiriye.[783]

Ev hedîs û yên mîna vê, fezîleta hînbûna nîşangêriyê û bi armanca cihadê bikaranîna çek û hemû celebên nîşangêriyê teşwîq dike. Ji ber vê yekê hînbûna hemû celebên çekên nûjen ên roja me, heta bikaranîna balafir û wesayîtên agirî jî dikevin bin vê biryarê. Herwiha bizavên werzîşî yên mîna siwarî û awjeniya ku bo cengê bi feyde ye, nîşangêrî û cureyên pehlewaniyê û hwd. jî wiha ne.[784]

---

[781] Bnh: el-Munawî, **Feydu'l-Qedîr**, IV, 384.
[782] Enfal, 8/60.
[783] Bnh: Muslim, 'Îmaret, 167 (1917).
[784] Ahmed Davudoğlu, **Sahih-i Müslim Tercüme ve Şerhi**, İmaret, şîroveya hedîsa 1917an.

Dema em bi ayeta li jor derbas bû li ser hedîsa ku we behsa wê kir bihizirin, tê fêhmê ku Pêxemberê me xwestiye ku misilmanan li hemberî neyaran her gav hişyar bihêle û wan amade bigire.

Temamê hedîsê wiha ye:

Muhemmedê kurê Rumhê kurê Muhacir ragihandiye me. (Got ku) Leys, ji Harisê kurê Ye'qûb, wî jî ji 'Ebdurrehmanê kurê Şumase ragihandiye me ku Fukeymî Lehmî ji Uqbeê kurê Amir re gotiye ku:

- Digel ku tu pîr î jî tu di navbera van herdu hedefan de diçî û tê. Ev ji bo te, giran e. 'Uqbe vê bersivê dide: Eger gotina min ji Qasidê Xwedê bihîstiye tunebûna, min tehemmula vî karî nedikir. Haris dibêje ku: Li ser vê yekê min ji Îbn Şumase pirsî:

- Ew çi ye?

- Got ku Pêxember (s.a.w) ferman kiriye: "*Kesê nîşangêriyê hîn bibe û paşê biterikîne, ne ji me ye. An jî bi rastî jî wî îsyan kiriye*."[785]

Ên vê hedîsa han şîrove kirine gotine ku ev hedîs diyar dike ku piştî hînbûna nîşangêriyê, jibîrvekirina wê bi sebeb îhmal û dilxaviyê pir mekrûh e.[786]

Hevoka "*ne ji me ye*" ya ku di hedîsê de dibuhure, ne bi wateya ji dîn derdikeve; belbî bi wateya "ew ne di rêya me de ye", "wî bi fermana me 'emel nekiriye." Ango ev tê wateya, kesê dev ji van karan berde û jibîr bike wî fermana Xwedê ya ku divê her gav amade bin bi cih neaniye.

Mîna ku tê dîtin dema ayet û hedîs bi hev re bên fêhmkirin, hevsazî û hevkariyekê derdixin holê.

[785] Muslim, 'Îmaret, 169 (1919).
[786] Bnh: Davudoğlu, **Sahih-i Müslim Tercüme ve Şerhi.**

621. Ma gotina "Quretiya li hemberî quretiyê sedeqe ye" hedîs e?

Pirs: Li gorî ez dizanim, gotina "Quretiya li hemberî kesê xwe qure dike, sedeqe ye" hedîsa Cenabê Pêxember e. Lê min çavkaniya wê nedît. Ma ev gotin bi rastî jî hedîs e?

Bersiv: Gotina "Quretiya li hemberî kesê xwe qure dike, sedeqe ye." (اَلتَّكَبُّرُ عَلَى الْمُتَكَبِّرِ صَدَقَةٌ et-tekebburû 'ele'l-mutekebbirî sedeqetun), di nav gel de meşhûr e, lê belê ne hedîs e.

Ev gotin bi awayê, "Quretiya li hemberî kesê xwe qure dike, 'îbadet e", "Quretiya li hemberî kesê xwe qure dike, xêr e, karekî rind e."[787] jî navdar e.

Kesê bawermend, xwe li hemberî tu kesî qure nake. Lê belê ew "…**li hemberî bawermendan bi rêz, li hemberî kafiran serbilind in. Di rêya Xwedê de cîhadê dikin û ji lomê lomekaran jî natirsin**. …"[788] Jiserxweçûn û qurebûn tiştek e; sekna li hemberî neheqî û kafiran bi serpiraz û serbilindî tiştekî din e. Lewra mirovê misilman divê ku her gav û li her derê, rêz û şerefa xwe biparêze.

622. Ma gotina "Di hezkirina xwe de bi endaz be, di buxza xwe de bi endaz be", hedîs e?

Pirs: Ez dixwazim di derbarê gotineke ku pir caran di we'zan de em dibihîzin, bipirsim: "Ê tu jê hez dikî, bi endaz jê hez bike, dê rojekê bibe neyarê te; razê te derxe derve. Ê tu jê diqehirî jî bi endaz biqehire, dê rojekê bibe dostê te; tu yê ji gotinên xwe fedî bikî." Gelo ev gotin, hedîs e? Eger hedîs be jî ma hûn dikarin çavkaniya wê diyar bikin?

Bersiv: Li gorî ku ji Ebû Hureyre (x.j.q) hatiye ragihandin, wî wiha gotiye:

---

[787] Bnh: 'Eliyyu'l-Qarî, **el-Esraru'l-Merfû'e**, rp. 175, jimara hedîsê 142; el-'Eclûnî, **Keşfu'l-Xefa**, I, 313, jimara hedîsê: 1011.
[788] Maîde, 5/54.

"**Di hezkirina (yarê/a) xwe de bi endaz be, dibe ku rojekê bibe neyarê te. Ji yê ku tu buxz dikî jî bi endaz biqehire, dibe ku rojekê bibe dostê te**."[789]

Tirmizî: "Ev hedîs, xerîb e (ango hedîsa ku rawiyê wê, di tebeqeyek an jî çend tebeqeyên senedena wê de bûbe yek.) Em wê bi tenê bi vê senedê û bi vî awayî dizanin. Ji bilî ya ku Eyyub bi rêya Hesenê kurê Ce'fer, bi senedeke din jî hatiye ragihandin. Hedîsa ku wî bi seneda ji rêya 'Elî ragihandiye, zeîf e. Riwayeta sehîh ya vê hedîsê, riwayeta ku bi rêya 'Elî bi awayê mewqûf (gotina ku nagihêje Pêxember, belbî li Sehabî disekine) hatiye ragihandin e."

Ev riwayet, dema bi ayeta li jêr bê nirxandin, bêhtir dibe watedar:

"**Qencî û xerabî nabin wekhev. Tu xerabiyê bi helwesta herî spehî, dûr bixe. Wê çaxê (tu dê bibînî) ku kesê di navbera te û wî de neyartiyek heye, wa bûye dostekî germ û nêzîk**."[790]

623. Ma hedîsa "Xêr di pereyên ku bo çêkirina avahiyê tên xerckirin, tune ye" sehîh e?

Pirs: Her tiştê bo nefeqe hatibe dayîn, herwekî di rêya Xwedê de hatibe xerckirin. Lê yên ji bo avahiyê hatine xerckirin ne tê de ye, di van de xêr û bêr tune ye. Gelo hedîseke bi vî awayî heye? Eger hebe jî divê em wê çawa fêhm bikin?

Bersiv: Li gorî riwayeta ji Enesê kurê Malik (x.j.q) hatiye ragihandin, Pêxemberê me (s.a.w) wiha kerem kiriye:

"*Hemû tiştên tên xerckirin, di rêya Xwedê de tên hesibandin, ango ji mirov re dibin xêr, bi tenê di xerckirinên xanî û avahiyan de xêr tune ne*."[791]

---

[789] Tirmizî, Bir we's-Sila, 60.
[790] Fussîlet, 41/34.
[791] Tirmizî, Sifetu'l-Qiyame, 40.

Tirmizî, di derbarê vê riwayeta ku di pirtûka xwe de cih dayiyê de dibêje ku **xerîb e**. Ango hedîs bi vî halê xwe, **zeîf** e. Encax manendê vê hedîsê, lê bi riwayeteke sehîh di Buxarî de wiha dibore:

Qeysê kurê Ebî Hazim wiha gotiye: Em ji bo serlêdana nexweşiyê çûn cem Hebbab (kurê Eret). Hebbab, (nava xwe) bi heft cihan dax dabû. Di vê serlêdana me de Hebbab wiha got:

- Hevalinên me yên berê ku (di dema Pêxember de wefat kirin) û çûn, hebûn. Dinyayê tu tiştek (ji bextewariya wan a axretê) kêm nekiribû. (Lewra di dinyayê de di tengasî û tunebûnê de jiyan.) Em jî: (Bi sedem fitûhatan) gihîştin ewqas destfirehiyê ku îro ji bilî em wê di axê de (çêkirina koşkan), tu cihekî din nabînin ku xerc bikin. Eger Pêxember (s.a.w), temenî û daxwazkirina mirinê li me qedexe nekiribûna, teqez min ê (ji ber azara vê nexweşiyê) daxwaza mirinê bikira!

(Qeys got ku:) Piştî demekê, em careke din jî çûn serdana Hebbab. Ew, bi lêkirina dîwarekî xwe mijûl bû. Ji me re got ku:

- Misilman, di hemû înfaq û xerckirinên xwe de dibe xwedî xêr, bi tenê di xerckirina malê ku dixe nav vê axê nabe xwedî xêr."[792]

Zanyarên 'ilmê hedîsê yên ku ev hedîs şîrove kirine, diyar kirine ku avahiya di çêkirina wê de xêr hasil nabe, "**avahî/xaniyê ku hewcedariya mirov pê tune ye**."[793]

Ev jî tê wateya ku, malê di avakirina xanî û avahiya ku hewcedarî pê heye, bê xerckirin, dikeve bên hukmê înfaqê û ji mirov re xêr tê hesibandin.

624. Hedîsa "'Eşereyê Mubeşşer", divê çawa were fêhmkirin?

Pirs: Di pirtûkên hedîs û siyerê de zanyariya ku Pêxemberê me, mizgîniya bihuştê daye hin sehabeyan, cih digire. Mesela, "'Eşereyê Mubeşşer" wekî têgehekê ji

[792] Buxarî, Merda, 19.
[793] Bnh: Îbn Hecer, **Fethu'l-Barî**, XXI, 243, şîroveya hedîsa 5672an; el-'Eynî, '**Umdetu'l-Qarî**, XVII, 359.

bo deh kesên ku bi bihuştê hatine mizgîndayîn, tê bikaranîn. Ji bilî van deh sehabeyan, riwayetên di derbarê ku pir sehabiyên din jî mizgîniya cenetê ji wan re hatiye dayîn, hene. Gelo ev zanyarî û hedîsên han, sehîh in? Ma pêkan e ku hêj însan li jiyanê ye, mizgîniya bihuştê jê re bê dayîn?

Bersiv: Di pirtûkên hedîsê de di derbarê ku Pêxemberê me (s.a.w), mizgîniya bihuştê daye hin sehabeyan, hedîs hene.[794] Divê ku mirov digel ayetên li jêr, li ser van hedîsan bihizire.

"**Ji muhacir û ensariyan ew ên ku pêşî misilman bûne û ew ên ku bi rindî dane pey wan, Xwedê ji wan razî bûye û ew jî ji Xwedê razî bûne. Xwedê ji bo wan, bihuştên ku di nav wan de çem diherikin û ew ê heta bi hetayê li wan bimînin, amade kirine. Serkeftin û rizgariya mezin ha ev e.**"[795]

Li gorî vê ayetê, kesê ku li jor behsa wan hatiye kirin, bi bihuştê hatine mizgîndayîn. Lê belê ev mizgînî, ne mizgîneyeke "bê şert û merc e." Ango wekî ku ji wan re wiha hatibe gotin "*heta hûn rewşa xwe ya niha hûn li ser in bidomînin yanî heta hûn wê neguherînin, hûn bihuştî ne*." Rewşeke mîna vê em di van ayetên ku behsa wesfên bilind ên diya me Meryem dike de jî dibînin.

"**Rojekê firîşteyan wiha gotin: Ey Meryem! Xwedê tu bijartî, tu pak û paqij kirî û tu di ser hemû jinên vê çaxê re girtî. Ey Meryem! Tenê ji Xwedayê xwe re 'îbadetê bike; here secdeyê û digel rukû'keran rukû' bike**."[796]

Her wekî ku tê dîtin, piştî Xwedê Teala radigihîne ku Wî, diya me Meryem bijartiye, ew kiriye bendeyeke pak û paqij û ew di ser pîrekên dema wê re girtiye, lê ferman kiriye ku serî ji Perwerdegarê xwe re dêne, biçe secdeyê û digel rukû'keran rukû' bike. Ango ragihandiye ku dewamkirina van wesfên bilind, bi bicihanîna van fermanan ve girêdayî ye.

---

[794] Bnh: Muslim, Fedailu's-Sehabe, 28; Tirmizî, Menaqib, 26; Ehmedê kurê Henbel, **Musned**, I/187, 188.
[795] Tewbe, 9/100.
[796] Alî Îmran, 42-43.

Ji vî alîyî ve, mizgîniya bi bihuştê ya Pêxemberê me daye hin sehabeyan, ne bi awayê ku teqez ew ê têkevin cenetê, belbî mizgîniya ku heta rewşa xwe ya baş û rind neguherînin, bi destûra Xwedê Teala, ew ê bibin bihuştî. Ev mizgînî, ne ji bo wan bi tenê ye; belbî ji bo hemû kesê ku bawerî aniye û karê qenc kiriye. Evê ayeta han, vê rewşê bi awayekî zelal diyar dike:

"**Ên ku bawerî tînin û karên qenc dikin, ew çêtirînê mexlûqan in. Mukafata wan li cem Perwerdegarê wan, bihuştên Ednê ne ku di nav wan de çem diherikin. Heta bi hetayê ew ê di wan de bin. Xwedê ji wan razî bûye, ew jî jê razî bûne. Ha ev, ji bo kesê ku ji Perdegarê xwe ditirse**."[797]

625. Ma Pêxemberê me di bihuştê de dê bi diya me Meryem re bizewice?

Pirs: Seydayekî bi rûmet di beşeke ji we'za xwe de anî ziman ku Cenabê Pêxemberê me, dê di bihuştê de bi diya me Meryem re bizewice. Wekî delîl jî behsa hedîsekê kir. Gelo tu rastiya vê heye?

Bersiv: Di çavkaniyên mîna Teberanî de di derbarê ku Pêxemberê me (s.a.w) di cenetê de dê bi diya me Meryem, bi jina Fir'ewn ya bawermend Asiye û xwişka Mûsa aleyhisselam Gulsum re bizewice, hin hedîs hatine ragihandin. Lê belê zanyarên 'ilmê hedîsê diyar kirine ku dereceya wan zeîf e û ji lewra nabin ku bibin delîl.[798]

Xeberên wiha yên ku behsa rewş û halên axretê ji bihuşt-dojehê dikin, divê ku teqez xwe bispêrin hedîsên sehîh. Di mijarên wiha de îtibar bi hedîsên wiha zeîf nayê kirin.

626. Ma razana ber êvarê, bi zirar e?

Pirs: Ma razana di navbera esir û êvarê de bi zirar e? Tê gotin ku hedîseke bi vê meseleyê re eleqedar, heye. Hûn dikarin agahî bidin?

---

[797] Beyyîne, 98/7-8.
[798] Bnh: el-Heysemî, **Mecmeu'z-Zewaid**, IX, 218.

Bersiv: Di pirtûkên hin zanyarên ‘ilmê hedîsê de ji yên mîna Îbn ‘Ediy, Îbn Hibban, Ebû Nu‘eym, Îbnu’s-Sanî û ‘Eclûnî hedîseke wiha tê ragihandin:

“**Kî ku piştî esir razê û eqlê xwe winda bike, ne li yekî/tiştekî din, bila bi tenê loma li xwe bike**.”

Îbn Raheweyh û Se‘danî, di derheqê Xalidê kurê Qasim ê ku di seneda vê hedîsê de derbas dibe, gotine ku ew “**derewkar e**”. Îmam Buxarî û Nesaî gotine ku “**metrûk e**”, Îbn Hibban jî gotiye ku “**nivîsandina hedîsa wî, ne durist e**”.

Di riwayeteke din ya vê hedîsê de bi sedema ku di seneda wê ‘Ebdullah Îbn Lehî‘a heye, ji aliyê zanyarên hedîsê ve, ew jî zeîf hatiye qebûlkirin.[799]

Hin aliman xwe spartine vê hedîsa zeîf û gotine ku razana piştî esir mekrûh e. Sparteyeke din ya van aliman jî zanyariya ku xewa piştî esir ji aliyê tenduristiyê ve bi zirar e. Car caran di çapemeniyê de jî nûçeyên di derheqê ku vê razana han dibe ku zirarê bide bedena meriv, cih digirin. Wekî mînak, ji wan nûçeyan yek jê wiha ye:

“Di saet 22: 00 de tansiyon û jimarên hilavêtina dil kêm dibe, piştî saet 04: 00 tansiyon û hilavêtinên dil dest bi zêdebûnê dike. Di navbera saet 15: 00 û 18: 00 de digihîje asta herî bilind. Lewre di wexta esrê de dema ku tansiyon û hilavêtinên dil di asteke bilind de ne û şane di dereceya herî zêde metabolizma dibin, divê mirov nekeve xew. An jî dê bibe vexwendin û dawetiye bo tansiyona bilin û nerihetiya dil.”[800]

---

[799] Bnh: el-Heysemî, **Mecmeu’z-Zewaid,** XV, 116; Îbnu’l-Cewzî, **Kitabu’l-Mewdû‘at**, II, 263; Ebu’l-Hasen ‘Elîyê kurê Muhemmedê kurê Arrak el-Kinanî, **Tenzîhu’ş-Şerî‘ati’l-Merfû‘e ‘ani’l-Exbari’ş-Şenî‘ati’l-Mewdû‘e**, thq: ‘Ebdullwehhabê kurê ‘Ebdulletîf, ‘Ebdulllah Muhemmed es-Siddîq, çapa 2yem, Daru’l-Kutubi’l-‘Ilmiyye, Beyrût 1981, II, 290, jimara hedîsê: 30; Şewkanî, **el-Fewaidu’l-Mecmû‘e,** rp. 216; jimara hedîsê: 649.

[800] Ev beş, rasterast ji Dr. Aslan Mayda hatiye neqilkirin. Bnh: İbrahim Işık, **Din ve Bilim Açısından Uyuma Vakitleri,** Tefekkür Dergisi, sal: 2006, jimar: 8, http://www.tefekkurdergisi.com/Yazi-Bilim_ve_Din_Acisindan_Uyuma_Vakitleri-333756.html

627. Hûn dikarin hedîsa "cihê xeflet lê hatiye serê mirov biguherînin", rave bikin?

Pirs: Hûn dikarin hedîsa "Eger xefletê hûn li cihekî girtin, cihê xwe biguherînin." (Ramûzu'l-Ehadîs, 2-249/7), rave bikin?

Bersiv: Li gorî ku tê ragihandin, Qasidê Xwedê û hevalên xwe di vegera ji cenga Xeyberê, li cihekî qonax vedigirin. Ji ber ku nobedarê wan Bîlal (x.j.q) di xew de dimîne, nimêja sibehê li Pêxemberê me û hevalên wî diçe. Li ser vê yekê Pêxemberê me ji hevalên xwe re dibêje: "*De heydê rabin, cihê ku xafilî gihaye we biguherînin*" û li Bilal ferman dike, ew jî ezanê dixwîne, qamet dike û Pêxemberê me li pêşiya wan nimêj dike."[801]

Tê neqilkirin ku Îmam Qurtubî di derheqê vê hedîsê de wiha gotiye:

"Di derbarê fermana bi guhertina cih de zanyaran îxtilaf kirine ku gelo bi tenê ji bo cihê ku bûyer lê qewimiye yan jî çi cihê ku mirov lê xafil bibe jî derbas dibe. Wekî din, di derheqê guherîna cih de ku gelo xasî bi Pêxemberê me ye yan jî çi kesê xafil bibe, ji bîr bike û di xew de bimîne jî di hundirê xwe de digire de jî îxtilaf kirine. Îmam Xezalî, ji vê hedîsê bi rê ketiye û gotiye ku kirina nimêjê li cihê ku bûyer lê qewimiye mekrûh e. Îmam Subkî jî gotiye ku di vê meseleyê de li dijî Xezalî derketine."[802]

Herwiha Mehmûd Muhemmed Xettab es-Subkî, di revakirina vê hedîsê de wiha gotiye: "Ev hedîs, dibe delîl bo rewabûna guherîna cihê ku tê hizirkirin ku şeytan lê ye."[803]

---

[801] Ebû Dawûd, Selat, 11.
[802] Bnh: Muhemmed Zekeriyayê kurê Yehya el-Qandehlewî, **Bezlu'l-Mechûd**, Beyrût b. m., III, 253.
[803] Subkî, **el-Menhelu'l-'Ezib Şerhû Sunenî Ebî Dawûd**, IV, 27.

628. Ma hemû pêxemberan şivantî kirine?

Pirs: Hedîsa "Tu pêxemberekî ku şivantî nekiribe tune ye" gelo sehîh e? Li gorî vê, ma Dawûd û Suleyman pêxember ên ku fermandar bûn jî şivantî kirine?

Bersiv: Li gorî hedîseke ku Ebû Hureyre (x.j.q) radighîne, Qasidê Xwedê wiha kerem kiriye:

- "*Her pêxemberê ku Xwedê Teala ew şandine, helbet wan şivantiya dewaran kirine*."

Li ser vê yekê sehabeyan pirsî:

- Ma te jî kiriye?

Pêxemberê me wiha kerem kir:

- "*Belê. Min ji ehlê Mekkeyê re bi qerarîta (bi ucret), şivantiya pez kiriye*."[804]

Mîna ku tê dîtin, hedîs di Buxarî de dibuhure, sehîh e. Di hedîsê de nehatiye ragihandin ku tu pêxemberek ji vê hatine îstisnakirin. Heta şarihê hedîsên Buxarî, Îbn Hecer di berhema xwe ya bi navê **Fethu'l-Barî** de di riwayeteke ku xwe dispêre Nesaî, bi awayekî zelal diyar dike ku Mûsa û Dawûd aleyhiselam, şivantî kirine.[805]

629. Gelo hedîsa kenza mexfî (gencîneya veşartî), sehîh e?

Pirs: "Ez gencîneyeke veşartî bûm. Min xwest Ez bêm zanî û naskirin û lewra Min însan afirandin. Ma ev, hedîseke qutsî ye?

Bersiv: Ev gotin, di nav ehlê tesewufê de bi awayê "kenza mexfî (gencîneya veşarî) tê zanîn." Vê, rasterast wiha îfade dikin:

"*Ez gencîneyeke veşartî bûm, Min hez kir bêm zanîn, da ku bêm zanîn Min mexlûqat afirandin*."

[804] Buxarî, Îcare, 2.
[805] Bnh: Îbn Hecer, **Fethu'l-Barî**, X, 4, "Kitabu'l-Îcare", babê duyem, şîroveya hedîsa 2262yan.

"*Ez gencîneyeke veşartî bûm, Min hez kir bêm zanîn, bo Ez bêm zanîn min xelk afirnadin. Bi vî awayî Min xwe bi wan da zanîn, wan jî Ez nas kirim, zanîn.*"

Ji ehlê tesewufê yên bawer dikin ku hedîs bi rêya keşfê tê riwayetkirin, xwe spartine vê gotina Muhyeddîn Îbn 'Erebî: "Ev hedîs ji aliyê keşfê ve rast e, lê ji aliyê neqlê ve ne sabit e" û ev pir mezin dêrane. Lê belê gotineke ku di 'ilmê hedîsê de sabit nebûbe, tu qîmet jê tune ye. Ji lewra muhedisan di derbarê vê gotinê de ev daxuyanî dane: "Ne ji gotinên Pêxember e", "ne sehîh ne jî zeîf tu senedeke wê heye", "derew e", "tu eslek jê re tune ye."[806]

Di tesewufê de termê keşfê hem bi wateya "*zanîna hin tiştên nepenî yên ku li pişt perdê ne û di ser aqil re ne*" û hem jî bi wateya "*temaşakirina teceliyên Xwedê*", hatiye bikaranîn. Li gorî ehlê tesewufê bi rêya keşfê dîmenê bihuşt û dojehê, herwiha Firîşteyan tên dîtin. Dema ku ruh digihê asteke tam saf û perdeya zeman û mekan radibe, mirov xwe digihîne zanîna di derbarê bûyerên çûyî û yên dê bên. Ehlê tesewufê çawa ku bi îtimada li ser keşfê Qur'an rave kirine, gotine ku me bi rêya keşfê rastiya hedîsekê yan jî hin hedîsên ku li gorî alimên hedîsê ne sehîh e, tesbît kirine. Lewra Îsmaîl Heqqî Bursewî, dema li ser hedîsa "*Ez gencîneyeke veşartî bûm* …" rawestiyaye, gotiye ku herçiqas ev hedîs ji aliyê riwayetê ve ne sabit be jî ji aliyê keşfê ve rast e. 'Ebdullezîz ed-Debbax, di derbarê rastî û nerastiya pir hedîsan de bi rêya keşfê biryar daye. Şah Weliyullah Dehlewî, hedîsên mizgînber ên ku di xewna xwe de ji Hezretî Pêxember bihîstine di **ed-Durru's-Semîn** de riwayet kirine. Evê nêrîna ehlê tesewufê, ji aliyê alimên hedîsê ve hatiye redkirin. Nêrîna wan ew e ku tesbîtkirina hedîsekê ka gelo aidî Pêxember e yan na, bi îtimada li ser keşfê, ne pêkan e."[807]

Bo kesên ku mijarên; di tesewufê de cihê keşfê, di keşfê de şaşîtî pêk tê yan na, pêwendiya keşfê bi xeybê re û hwd. meraq dikin, digel nivîsa Prof. Dr. Süleyman

[806] Bo agahiyên berfirehtir bnh: Ahmet Yıldırım, **Tasavvufun Temel Öğretilerinin Hadislerdeki Dayanakları,** Weşanên TDV, Enqere 2000, rp. 98-99.
[807] Süleyman Uludağ, "Keşf", **DİA,** 2002, XXV, 315-317.

Uludağ ya ku di Ansîklopediya Dîyanetê de dikarin gotara Prof. Dr. Reşat Öngören ya bi navê "Bir Bilgi Kaynağı Olarak Tasavvufta Keşfin Değeri" jî bixwînin. Ji vê navnîşanê: İstanbul Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Dergisi, jimar: 5, Sal: 2002, İstanbul-2002, rp. 85-96 mirov dikare xwe bigihînê.

630. Hedîsa "Jiyana min û mirina min jî ji we re bi xêr e", sehîh e?

Pirs: Di pirtûkeke ku min xwend de hedîseke wiha derbas dibû. Li gorî ku Bezzar ji 'Ebdullahê kurê Mesûd ragihandiye Pêxemberê me wiha kerem kiriye: "Jiyana min bo we bi xêr e. Gava ez bimirim, mirina min jî dîsa bo we bi xêr e. Kar û 'emelên we, tên pêşberî min. Eger xêrê bibînim, hemd dikim, eger nebaşî û xerabiyê bibînim, bexşandina we ji Xwedê dixwazim." Hedîseke wiha ma heye, hebe jî gelo sehîh e?

Bersiv: Hedisa ku hûn behsa wê dikin, di berhema Heysemî ya bi navê **Mecme'u'-Zewaid** de dibore. (Bnh: IX, 24) Heysemî diyar kiriye ku Bezzar ev hedîs riwayet kiriye û kesên/rawiyên di seneda wê de derbas dibin, sehîh in ango tu pirsgirêk di derheqê wan de tune ye.

Ev hedîs, bi sened û metnên cuda di berhemên mîna **Mizanu'l-I'tidal** (1/651) ya Zehebî, **Texrîcu'l-Îyha** (4/182) ya Îraqî, **Xesaisu'l-Kubra** (2/281) ya Suyûtî û **Keşfu'l-Xefa** (1/368-369, jimara hedîsê: 1178) ya 'Eclûnî û hwd. jî cih girtiye.

Herçiqas ji wan -mîna li jor borî- ên gotibin ku "*seneda wê sehîh e*" hebin jî ev hedîs, ji aliyê piraniya alimên hedîsê ve, "*zeîf*" hatiye qebûlkirin. Ji alimên hedîsê yên serdema dawî Nasiruddîn el-Elbanî gotiye ku temamê terîq/rêyên vê hedîsê "zeîf"in, heta hinek jê mewdû' ango derewîn in.[808]

[808] Nasiruddîn el-Elbanî, **es-Silsiletu'd-Deîfe**, 2/406.

631. Ma dibe ku însan, bêhemdî ketibe şirkê?

Pirs: Di hedîseke ku min xwend de Pêxemberê me duayekî wiha dike: "Ey Xweda! Eger bi nezanî min ji Te re hevpar çêkiribin, ez xwe davêjim bexşandina Te. Ey Xweda! Bi zanebûn min şerik ji Te re çêkiribin, dîsa xwe davêjim dergahê Te." Ji vê hedîsê encama dibe ku mirov bi nezanî jî ji Xwedê şerîk/an çêbike, derdikeve. Hûn dikarin di bara vê hedîsê agahiyan bidin?

Bersiv: Di çend berhemên hedîsê de di derbarê ku Pêxemberê me (s.a.w) duaya li jor borî hînî hin sehabiyên xwe kiriye, hin riwayet hene. Lê belê hema çi bigire di seneda temaman de pirsgirêk heye.[809] Ji ber vê yekê ev hedîs, ji aliyê senedê ve **zeîf** e.

Lê belê di sûreyê Hucurat de yên dengê xwe/fikra xwe bi ser ê/ya Pêxember dixin, ji aliyê Xwedê ve bi vî awayî, "**bêyî ku haya wan ji wan çêbibe 'emelên wan dê pûç bibin"**,[810] hatine tehdîtkirin.

Nexwe li gorî vê ayetê hin caran însan bêyî ku haya wî jê hebe, ji ber kirinên xwe yên şaş dibe ku karên xwe pûç û betal bike. Li gorî Qur'anê, gunehê ku temamê karan betal dike, gunehê herî mezin, şirk e.[811]

Ji vî aliyî ve hedîsa we behsa wê kir, herçiqas seneda wê zeîf be jî bi vê ayetê re hevsaz e.

632. Ma sedeqe temen dirêj dike?

Pirs: Hûn dikarin hedîsa sedeqe 'emir dirêj dike, rave bikin?

Bersiv: Xwedê Teala di Qur'ana Pîroz di qiseta Hezretî Nûh û gelê wî de wiha ferman dike:

---

[809] Bnh: el-Heysemî, **Mecme'u'z-Zewaid,** X, 223-224.
[810] Bnh: Hucurat, 49/2.
[811] Bhn. Maide, 5/5; En'am, 6/88; Hûd, 11/16; Zumer, 39/65.

"**Me Nûh ji gelê wî re şand; da ku beriya ezabekî cansoj bi ser wan de bê gelê xwe hişyar bike û wan bitirsîne. Nûh got: Gelî miletê min! Bi rastî ez ji bo we hişyarkerekî aşkere me. Ku hûn 'îbadeta Xwedê bikin, hay ji ferman û qedexeyên Wî hebin û bi gotina min bikin. Xwedê jî dê li gunehên we bibore û heta demeke navlêkirî dê jiyana we dirêj bike. Eger we bizanibûna bi rastî jî gava ew dema navlêkirî hat ew nayê bipaşdexistin.**"[812]

Mebest ji "dema navlêkirî", ecelê însan ê ku ji aliyê Xwedê ve hatiye teqdîrkirin. Di ayetê de Hezretî Nûh, di mijara vegera bi bal Xwedê ve berî ku ezab bê, gelê xwe hişyar dike. Nexwe eger berê xwe nedin Xwedê, dê ezab bi ser wan de were û berî bigihên ecelê ku ji wan re hatiye diyarkirin, ji aliyê Xwedê ve dê dawî li jiyana wan were anîn. Ji vê û gelek ayetên din tê fêhmê ku eger fermanên Xwedê neyên pêkanîn, Xwedê ecelê ku daye însên kin dike. Lê eger însan emr û fermanên Xwedê bi cih bîne, Wî razî bike dê heta "dema navlêkirî" ya ku bo wî hatiye nivîsandin, bijî.

Pêxemberê me (s.a.w) di hedîseke xwe de wiha dibêje: "**sedeqe, belayan paş de dixe**." Bi rêya dayîna sedeqeyan kesê karên ku Xwedê jê razî ye bike, ji qedexeyên Wî xwe dûr bigire, dê ji ezabê Wî jî rizgar bibe, emîn bibe. Ango heta "dema navlêkirî" ya ku bo wî hatiye diyarkirin, dê bijî. Hedîsa ku we behsa wê kir jî divê wiha bê nirxandin. "Sedeqe 'emir dirêj dike." Ango li berevajî kirinên ku dibin sedemê kinbûna 'emir, derfetê dide ku heta dawiya temenê ku jê re hatiye tayinkirin, bijî.

Bo ahagiyên berfirehtir di mijara kinbûna temen bi kirinên şaş, em tewsiye dikin ku hûn beşa "**Ecelin Kısalması**" (Kinbûna Ecel) ji pirtûka me "**Kur'an Işığında Doğru Bildiğimiz Yanlışlar**" ya ku di malpera me de ye bixwînin.

http://www.suleymaniyevakfi.org/arastirmalar/ecelin-kisalmasi.html

[812] Nûh, 71/1-4.

633. Meseleya Se‘lebe gelo rast e, an jî çîrok e?

Pirs: Hedîsa bi navê hedîsa Se‘lebe, gelo sehîh e? Gava tê ba Pêxemberê me û dibêje “ji min re dua bike bila mal û mulkê min çêbibin.” Pêxemberê me jî jê re dua dike û piştî ku dua qebûl dibe, Se‘lebe gelekî dewlemend dibe. Piştre dema Pêxemberê me memûrên zekatê dişîne balê, Se‘lebe xwe nade ber dayîna zekatê. Lê belê dûvre poşman dibe û digel ku dixwaze zekatê bide jî êdî Pêxemberê me jê qebûl nake. Piştî wefata Pêxemberê me, Se‘lebe zekata xwe dibe ku bide Hezretî Ebû Bekir, wî jî qebûl nekiriye, piştî wefata wî, biriye ba Hezretî ‘Umer wî jî qebûl nekiriye. Piştî ku şaşiya xwe nas kiriye û poşman bûye, ma bi rastî jî pê re wiha tev geriyane? An jî ev gotin, ji hîkaye û çîrokan pêk tê?

Bersiv: Di gotara bi sernavê “**Sa’lebe Kıssasıyla İlgili Rivayet Üzerine Sened ve Metin Esaslı Tahliller”** ya Dr. Kadir Paksoy ya ku di kovara Yeni Ümit de hatiye weşandin, bi vê mijarê re eleqedar bi kurtasî ev zanyariyên han cih digirin:

“Li gorî îfadeyên zanyarên hedîsê, hedîsa Se‘lebe ji aliyê senedê ve riwayeteke gelekî zeîf, bi ‘illet û munker e.

Îbn Hezm dibêje ku hedîsa Se‘lebe ya ku bi rêya Mu‘anê kurê Rifa‘e, ‘Elîyê kurê Yezîd û Qasim hatiye ragihandin riwayeteke batil e û tu esil jê re tune ye. Herwiha dibêje ku ji aliyê sebebê nuzûlê ve jî ayetên 75-77an ji sûreyê Tewbe bi gelemperî di bara kesên munafiq de ye, ji ber vê yekê tu têkiliya wan ayetan bi Se‘lebe re tune ye.

Îbnu’l-Esîr, diyar kiriye ku qiseya Se‘lebe ne sehîh e yan jî bi şubhe ye ku di derheqê Se‘lebeyê beşdarî cenga Bedrê bûye.

Zehebî, dibêje ku hedîsa Se‘lebe munker e.

Îraqî û Heysemî bal kişandine ser hedîsa Se‘lebe ya ku Teberanî neqil kiriye û gotine ku ev hedîs, bi sedem rawiyê hedîsê ‘Elîyê kurê Yezîd ê metrûk, zeîf e.

Ebdulfettah Ebû Xudde dibêje, digel ku riwayeta hedîsa Se'lebe bi îllet û munker e, lê belê bêyî ku îşaret bi bal ve bê kirin bi taybetî jî ji aliyê alimên tefsîrê ve hatiye neqilkirin.

Hedîsa Se'lebe, li gorî van nirxandin û rexneyên aliman gelek zêde zeîf, bi îllet, munker, heta bê esl û derew e. Taybetiyên di naveroka riwayeteke wiha de diborin, teqez nabe delîl. Heta ne rewa ye ku riwayetên wiha bên neqilkirin jî.

Di riwayetê de dibore ku digel Se'lebe poşman dibe û zekata xwe tîne, lê ji aliyê Qasidê Xwedê ve û ji aliyê xelîfeyên wî ve nayê qebûlkirin. Redkirina kesê ku zekata xwe aniye, di serî de li dijî pratika Qasidê Xwedê ye û piştre jî li dijî ya Xelîfeyên Reşîd e. Bi taybetî jî gava li tevger û stratejiya Qasidê Xwedê ya li hemberî munafiqan bê nihêrtin, dê bê dîtin ku munafiqiya wan nedaye rûyê wan û heta ji munafiqên navdar yekî mîna Îbn Selûl bi sebir îdare kiriye.

Wekî din jî li gorî pratîka Qasidê Xwedê û xelîfeyên pêşîn, ji yên xwedî derfet zekat tê stendin, eger hewcedarî hebe mijara zordariyê jî dikeve rojevê. Di ser de jî di halê ku biryara xelîfeyê yekem Hezretî Ebû Bekir ya li hemberî kesên zekat nedidan û îlana cengê li dijî wan bûyereke diyar e, jixwe ne pêkan e ku zekata kesên ji riza dilên tînin bê redkirin.

Bi vê îtibarê reda Se'lebe, ne bi pratîka Qasidê Xwedê yê ku hukmên Îslamê bi cih tîne, ne jî bi pratika xelîfeyên wî yên ku peyrewên suneta wî ne, li hev dike. Temamê van daneyan didin nîşandan ku hedîsa Se'lebe ji aliyê metnê/naverokê ve gelek nakokiyan di xwe de dicivîne."[813]

634. Hedîsa bihuşt di bin piyên dayikan de ye

Pirs: Hedîsa bihuşt di bin piyên dayikan de ye, ma hedîseke mezwû' ango derew e?

[813] Kadir Paksoy, "Sa'lebe Kıssasıyla İlgili Rivayet Üzerine Sened ve Metin Esaslı Tahliller", **Yeni Ümit Dergisi**, jimar: 70, 2005.

Bersiv: Li gorî vegotina Muawiyeyê kurê Cehîme; Cehîme (x.j.q) tê hizûra Pêxember (s.a.w) û jê re dibêje: "Ey Qasidê Xwedê! Ez dixwazim beşdarî xezwê/cengê bibim, hatime ku di vê meseleyê bi we re bişêwirim." Qasidê Xwedê jê dipirse: "*Ma dayika te heye?*" Gava ku dibêje "Erê heye." Ew wiha kerem dike: "*Wê gavê jê meqete. Lewra bihuşt di bin piyên wê de ye.*"[814]

Herwekî ku tê dîtin hedîs di Kutubê Sitte[815] de dibore. Lê belê ji alimên hedîsê Hakim diyar dike ku ev hedîs, mudterib e.[816]

Hedîs, herçiqas ji aliyê senedê ve zeîf be jî lê xuya dike ku wateya vê rast/sehîh e. Lewra dema em li Qur'anê dinihêrin em dibînin ku di gelek ayetan de piştî baweriya bi Xwedê Teala, kirina qenciyê bi dê-bav hatiye fermankirin. Ji ber vê yekê rêya ku diçe bihuştê, di ber wan re derbas dibe.

***Hedîsa Mudterib**: Hedîsa ji aliyê yekî yan çend kesan ve hatibe ragihandin û di metin an jî di seneda wê de hin cudahî hebin ku di navbera wan de îmkana cem' û telîfê tune be.

635. Gotina "Ez kurê du qurbaniyan im", gelo hedîs e?

Pirs: Min di hikayekê de xwend ku kalê Hezretî Muhemmed li ser dîtina xewnekê dixwaze bavê wî gorî bike. Rast e ku Pêxember (s.a.w), Hezretî Îsmaîl jî qesd kiriye û gotiye "Ez kurê du qurbaniyan im."

Bersiv: Ev riwayet, di çavkaniyên siyerê de yên ku behsa jiyana Hezretî Pêxember dikin û di hin berhemên hedîs û tefsîrê de dibore. Lê belê ev riwayet di tu berhemeke ku bi "Kutubê Sitte" tên navkirin de derbas nabe.

Di berheman de riwayetek, ji devê Pêxemberê me bi xwe "**Ez kurê du qurbaniyan im**", ya din ji aliyê yekî Bedewî ve dema xîtabî Pêxembrê me dike bi

[814] Nesaî, Cihad, 12.
[815] Kutubê Sitte: Bi wateya Şeş Berhemên Sereke yên hedîsê ye.
[816] Bnh: el-'Eclûnî, **Keşfu'l-Xefa,** I, 335, jimara hedîsê: 1078.

awayê "**Ey kurê du qurbaniyan!**" cih digirin. Aliman diyar kirine ku riwayeta duyem saxlem e û dibêjin me tesbît nekiriye ku riwayeta yekem ji aliyê Pêxemberê me ve hatiye gotin.[817]

636. Ma nimêj servekirî tê kirin?

Pirs: Di lêkolîna we ya bi sernavê "Başörtüsü ve Örtünme" de we cih daye hedîsa "**Xwedê, nimêja pîreka ku ketiye heyza/xwînmehê encax bi çarikê, qebûl dike**."[818] Gelo dereceya sihet/rastiya vê hedîsê çi ye? Eger sehîh be, ma ji vê yekê encama ku pîreka di heyza de ye dikare nimêj bike, dernakeve?

Bersiv: Hedîsa ku di Ebû Dawûd de dibore "**Xwedê, nimêja pîreka ku ketiye heyza/xwînmehê encax bi çarikê, qebûl dike**." bi du rêyan hatiye ragihandin. Yek jê **mewsûl** e (ango di seneda wê de tu qutbûn tune ye) ya din jî **mursel** e (hedîsa ku tabiîn behsa sehabî neke û riwayet bike).[819]

Bi gotina "**pîreka ku ketiye heyza**" jî "**pîreka ku gihîştiye çaxa heyzê**" hatiye qesdkirin. Bo derxistina encama ku "pîreka di heyza de ye dikare nimêj bike", divê ku hevoka "fî eyyami heydiha" ango di rojên heyzê de hebe.[820] Lê belê di hedîsê de îfadeyeke wiha tune ye. Ji vê bonê divê ku bi awayê "pîreka ku gihîştiye çaxa heyzê" were fêhmkirin.

637. Ma divê em hedîsa "Ê ku bi pîreka xwe re herî rind tev digere, ez im" çawa fêhm bikin?

Pirs: Di hedîseke ku Sunena Nesaî de dibore, Pêxemberê me wiha kerem kiriye: "Muslimanê herî rind, yê ku bi pîreka xwe re xweş tev digere. Di we de yê ku bi pîreka xwe re herî rind tev digere, ez im." Gelo di vê hedîsê de Pêxemberê me

[817] Bnh: 'Eclûnî, **Keşfu'l-Xefa**, I, 199, jimara hedîsê: 606.
[818] Ebû Dawûd, Selat, 85, jimara hedîsê: 641.
[819] Bnh: Xelîl Ehmed es-Seharenfûrî, **Bezlu'l-Mechûd fî Helli Ebî Dawûd,** Beyrût b.m, IV, 305, Babu'l-Mer'eti Tusallî bi xayrî Ximarin.
[820] Bnh: Xettabî, **Mealimu's-Sunen** (Çapa bi Sunena Ebû Dawûd re), Selat 85, şîroveya hedîsa 641.

xwestiye ku bibêje yê bi jina xwe re herî baş muamele dike ez im, an jî xwestiye umûmî behs bike? Ma hûn dikarin vê hedîsê rave bikin?

Bersiv: Pêxember (s.a.w) di her mijarê de bo me nimûne û mînak e. Xwedê Teala wiha ferman dike:

"**Birastî ji bo we, di Resûlê Xwedê de ji bo wî kesê ku (qenciya) Xwedê û roja axretê hêvî dike û zikrê Xwedê jî pir dike, mînak û nimûneyeke spehî û kamil heye**."[821]

Dema em hedîsa ku we behsa wê kir bi vê ayetê re binirxînin, derdikeve holê ku Pêxemberê me, di tevgera bi jinan re jî mînaka herî baş e, bo me. Pêxemberê me, bi vê hedîsê hemû misilman qesd kirine, lê di heman gavê de herwekî ku gotibe "tevgera rind a bi jinan re ji min hîn bibin."

638. Hedîsa di derheqê bîata bi îmamê zeman re

Pirs: Ma di derheqê kesên ku bîatê nedin Îmamê dema xwe û bimirin ku dê li ser mirina cahiliyê bimirin, hedîsek heye?

Bersiv: Belê, hedîseke wiha heye. Di Sehîha Muslim de bi awayê "*Kesê bê bîat bimire, (bi mirineke) mîna mirina cahiliyê dimire*."[822] dibore. Ev jî di derheqê kesên ku serokê umeta Îslamê yê ku "bi tifaqa temamê misilmanan" hatiye hilbijartin nas nakin, hatiye gotin. Ne ji bo yê ku ji aliyê çend kesan ve yan di nav desteyeke sîyasî yan jî dînî de hatiye hilbijartin û bi navê "emîr", "xelîfe" û "emîrul'-muminîn" hatiye navkirin.

Ev hedîs, bi armanca ku misilmanan ji xetera tefrîqeyê hişyar bike, hatiye gotin. Rê û rêbaza yekta bo rizgariya ji vê tefrîqê û dubendiyê jî kombûna li dora Qur'anê ye. Xwedê Teala wiha ferman dike:

---

[821] Ehzab, 33/21.
[822] Muslim, Îmaret, 58 (1851).

"Ya ku ew dibêjin, Em baş pê dizanin. Tu li ser wan ne zordest î (ku bi zorê wan bînî îmanê). Tu bi vê Qur'anê, kesê ku ji ezabê Min bitirse, şîret bike."[823]

"**Hûn gişt xwe bi benê Xwedê (Qur'anê) bigirin û ji hev parçe mebin**."[824]

"**Bêguman ev rêya Min e, rêya rast û durist e. Bidin pey wê û nedin dûv rêçikên din, vêca ew ê we ji rêya Xwedê biqetînin. Xwedê bi vanan ferman li we dike, da ku hûn xwe biparêzin**."[825]

639. Ma hedîsa "di demên zor de alîkariyê ji miriyan bixwazin", sehîh e?

Pirs: Ma hedîseke bi vî awayî "Dema hûn di karê xwe de şaş man, alîkariyê ji miriyên di goran de bixwazin" heye? Vê hedîsê hem bo duristiya xwestina alîkariyê ji miriyan hem jî bo li ser meşrûbûna rabiteyê, dikin delîl.

Bersiv: Pêgirêdayiyên hin terîqetan riwayetên li jêr dikin delîl û dibêjin "di vê meseleyê de hedîs heye" û bi vî awayî xwestina alîkariyê ji ehlê goran meşrû didêrin:

إِذا تَحَيَّرْ تُم فِي ٱلأُمُورِ فاَسْتَعِينُوا بِأَهْلِ ٱلْقُبُورِ

إِذا أَعْيَتْكُمْ الأُمُورُ فَعَلَيْكُمْ بِأَهْلِ الْقُبُورِ ، أَوْ فاَسْتَعِينُوا بِأَهْلِ ٱلْقُبُورِ

"Dema hûn di karê xwe de şaş man, alîkariyê ji miriyên di goran de bixwazin"

Lê belê mîna ku Îbn Teymiyye jî diyar kiriye "Bi tifaqa alimên ku hedîsên Pêxemberê me baş dizanin, ev gotin, derew e, iftirayeke li ser Pêxemberê me ye. Tu kesekî ji alimên hedîsê ev bi hedîsî riwayet nekirine. Di tu berhemeke pêbawer de cih negirtiye.[826] Ji aliyê yekî ku deriyê şirkê vekiriye, bi derewîn hatiye gotin."[827]

---

[823] Ehqaf, 50/45.
[824] Alî Îmran, 3/103.
[825] En'am, 6/153.
[826] Îbn Teymiyye, **Mecmû'u'l-Fetawa**, I, 356.
[827] Îbn Teymiyye, **Mecmû'u'l-Fetawa**, XI, 293.

Ji bo bidestxistina agahiyên berfirehtir di derbarê vê gotina ku di berhema 'Eclûnî ya bi navê **Keşfu'l-Xefa**[828] de dibore, em tewsiye dikin ku hûn beşên têkildar ji pirtûka me ya **Kur'an Işığında Tarikatçılığa Bakış**[829] bixwînin.

640. Ma di derbarê hezkirina ji Pêxember tu hedîsek heye?

Pirs: Hedîseke bi vî awayî "Kesê ku min ji dê, bav, xwişk-bira û ji temamê însanan zêdetir hez neke, ne bawermendê rast e." heye. Ma ev hedîs rast e? Divê em çawa wê fêhm bikin?

Bersiv: Xwedê Teala di Qur'ana Pîroz de wiha ferman dike:

"**(Resûlê min!) Bibêje: Eger bavên we, kurên we, birayên we, jinên we, eşîra we, malê ku we bi dest xistiye, ticareta ku hûn ji zirarkirina wê ditirsin û xaniyên ku hûn ji wan xweş in, li cem we, ji Xwedê, ji Pêxemberê Wî û ji cîhada di rêya Wî de şîrîntir û xweştir bin, vêca çavlirê bin heta Xwedê fermana xwe (bi ezabê ji we re) bîne. Xwedê, civaka jirêderketî teqez nayîne ser rêya rast**."[830]

"**Pêxember, ji bo bawermendan ji nefsa wan bi xwe jî hîn li pêştir e. Xanimên wî jî dayikên bawermendan in**."[831]

Qasidê Xwedê jî (s.a.w) wiha kerem kiriye:

"*Ez qesem dikim bi Xwedayê ku canê min di destê Wî de ye, tu yek ji we nabe ku bawerî anîbe heta min ji bavê xwe û zarokên xwe jî zêdetir hez neke*."[832]

Li gorî ku ji Enesê kurê Malik (x.j.q) hatiye ragihandin Pêxember (s.a.w) wiha kerem kiriye:

---

[828] I, 85, jimara hedîsê: 213.
[829] Abdülaziz Bayındır, **Kur'an Işığında Tarikatçılığa Bakış**, Weşanên Weqfa Suleymaniyeyê, Stenbol 2007, rp. 12-14.
[830] Tewbe, 9/24.
[831] Ehzab, 33/6.
[832] Buxarî, Îman, 7.

"Sê tişt hene ku ew di kê de hebin wî te'ma îmanê kiriye:

1. Hezkirina ji Xwedê û Qasidê Wî ji her tiştî bêhtir.

2. Hezkirina mirov ji bo Xwedê.

3. Vegera bi bal kufrê ve piştî ku Xwedê ew jê rizgar kir, mîna ku mirov biavêjin nav agir, wisa nebaş û xeter bibîne."[833]

Mîna ku tê dîtin, hedîs û ayetên di bara hezkirina ji Pêxember (s.a.w) bi giştî hev digirin. Bo mirovê misilman, hezkirina ji Xwedê û ji Qasidê Wî, beriya her tiştî tê.

641. Li gorî hedîsan, mirovê herî qenc kî ye?

Pirs: Di hin hedîsan de îfadeyên "ji we yê herî baş, ê ku Qur'anê hîn bibe û bide hînkirin", "herî qencê we, mirovê ku exlaqxweş be" û hwd. hene. Di vê rewşê de mirovê herî rind gelo kî ye?

Bersiv: Zanyarên hedîsê, hedîsên ku we behsa wan kir wiha nirxandine; ew bersiv, li gorî rewşa kesên ku pirs ji Pêxemberê me (s.a.w) kirine, hatine dayîn. wekî mînak, ji sehabiyekî ku ji dê û bavê xwe re ne baş bûye, gotiye ku "Ji we yê herî baş, ê ku ji dê û bavê xwe re baş e", ji yekî ku nimêjên xwe di wexta wan de nedikir re "Ji we yê herî baş, ê ku nimêjên xwe di wexta wan dike" û ji yekî ku di exlaqê wî de qelsî hebûne re jî gotiye ku "Ji we yê herî baş, ê ku ji aliyê exlaq ve herî baş be." Ango li gorî rewşa xwediyê pirsê, bersivên ji hev cuda dane wan.

642. Ma rast e ku di her sed salî de mucedidek tê?

Pirs: Hin kes dibêjin ku serê her sed salî alimek tê û di mijarên olî de alîkariya mirovan dike. Gelo ev rast e? Eger ev rast be, em ê çawa bizanibin? Bi awayekî

[833] Buxarî, Îman, 9, 14, Îkrah 1, Edeb, 42; Muslim, Îman, 67.

zelaltir, em ê çawa nas bikin bi rastî jî kî alim e û kî jî hîlekar e? Eger rast be jî çavkaniya vê çi ye, ango em ji ku dizanin di serê her sed salî alimek tê?

Bersiv: Di Sunena Ebû Dawûd de riwayeta hedîseke wiha cih digire:

"Ebû 'Elqeme got; li gorî ku ez dizanim, Ebû Hureyre (x.j.q) radigihîne ku Qasidê Xwedê wiha kerem kiriye: "*Di serê her sed salî de Xwedê, bo vê umetê yekî (mucedid) ku dînê wan nû bike dişine*."[834]

Hedîs zeîf e. Ebû 'Elqeme gotiye "Li gorî ku ez dizanim, Ebû Hureyre (x.j.q) ev hedîs ji Qasidê Xwedê ragihandiye." Nexwe, ew ji vê, ne ewle ye.

Li gorî ku Qur'an û Suneta Pêxemberê me (s.a.w) li holê ye, kesê were gelo dê çi nû bike? Wekî din jî li gorî ku yê dîn nû dike dê Xwedê wî bişîne, divê ku nîşaneke wî hebe. An jî mirov dê çawa wî nas bike. Rewşa dîn ya nû dê li gorî çi bê diyarkirin û çawa bê fêhmkirin? Ji lewre di mijareke wiha girîng de hedîseke zeîf nabe ku bibe delîl. Nêrîna me ew e ku ev hedîs, nabe ku bibe delîl.

643. Ma hedîseke wiha "Kesê ji Xwedê sebrê bixwaze, wî bela xwestiye" heye?

Pirs: Qasidê Xwedê, ji yekî ku ji Xwedê sebir û tebatê dixwaze re dibêje ku: "Ma tu ji Xwedê belayê dixwazî? Pêşî xweşiyê bixwaze." Ez dixwazim bipirsim ka gelo ev hedîs sehîh e? Ger sehîh be jî divê em çawa fêhm bikin?

Bersiv: Hedîs di Tirmizî de wiha derbas dibe:

Li gorî ku ji Muazê kurê Cebel (x.j.q) hatiye ragihandin, wî wiha gotiye: Pêxember (s.a.w) ji zilamekî bihîst ku wiha dua dike: "Xwedayê min! Ez ji Te, tamamê nîmetê dixwazim." Li ser vê yekê Qasidê Xwedê wiha jê pirsî: "*Temamê nîmetê kîjan e.*" Zilam got: "Min duayek kir û bi sedem vî duayî, ez hêviya xêrê dikim." Qasidê Xwedê jî got ku: "*Çûna bihuştê û rizgariya ji dojehê, temamê nîmetê ye*."

[834] Ebû Dawûd, Melahim, 1.

Dîsa Qasidê Xwedê bihîst ku zilamek dibêje "Ya Zelcelali we'l-îkram!" Li ser vê wiha got: "*Deriyê duayê li ber te vebû, daxwaziya xwe bibêje*."

Herwiha Pêxember (s.a.w) bihîst ku zilamek dibêje: "Xwedayê min! Ez ji Te sebir û tebatê dixwazim" Pêxember got ku: "*Te ji Xwedê bela (tengasî) xwest. Ji Xwedê xweşî û afiyetê bixwaze***.**"[835]

Tirmizî di dawiya vê hedîsê diyar kiriye ku ev hedîs, "hesen"e. "Hedîsa hesen, herçiqas ji aliyê hifz û zebta rawiyan ve di bin ya sehîh de be jî bi îtibara şertan di asta ya sehîh de ye."[836]

Eger em vegerin ser mijara ka divê ev hedîs çawa were fêhmê: Şîrovegerên ku ev hedîs rave kirine, gotine ku sebir encax di demên zor û zehmet de pêk tê, ji lewre gava mirov ne di rewşek wiha de be û ji Xwedê wiha "Xwedayê min! Sebrê bide min" lava bike, ev dê were wateya "Xwedayê min! Min têxe rewşeke zor û zehmet da ku sebir bikim."

Bi vê hedîsê re eleqedar di şerha Tirmizî **Tuhfetu'l-Ehwezî** de ev rave cih digire:

"Te ji Xwedê bela (tengasî) xwest, lewra sebir piştî tengasiyê tê. Ji Xwedê xweşiyê bixwaze, lewra bergeh û naveroka vê gelek fireh e. Lewra her kes nikare di hemberî bela (tengasiyan) de sebir û tebatê nîşan bide."

Evê gotina Pêxemberê me jî ji bo rewşên beriya hatina belayan e. Piştî ku bela û musîbet qewimî, daxwaziya sebrê tê kirin û ev ayeta han jî "**Xwedayê me! Bi ser me de sebrê birijîne…**"[837] vê yekê nîşan dide.[838]

---

[835] Tirmizî, De'awat, 94.
[836] Subhî es-Salih, **Hadis İlimleri ve Hadis Istılahları**, rp. 129.
[837] E'raf, 7/126.
[838] el-Mubarekfûrî, **Tuhfetu'l-Ehwezî,** Qahire 2001, IX,. 44, şîroveya hedîsa 3527.

644. Ma gotina "Limêj, mîraca kesê bawermend e" hedîs e?

Pirs: Ma gotina "Limêj, mîraca kesê bawermend e" hedîs e? Eger hedîs be jî gelo sehîh e?

Bersiv: Gotina "Limêj, mîraca kesê bawermend e" herçiqas ji aliyê maneyê ve rast be jî di çavkaniyên hedîsê de cih negirtiye û wekî gotineke ji Pêxember (s.a.w) nehatiye tesbîtkirin.

Ev gotin, di tefsîra Fexruddîn Razî û ya Alûsî de dibore. Razî, herçiqas vê gotinê bi awayê hedîsê neqil bike jî lê diyar nekiriye ku ji kê ragihandiye û di kîjan çavkaniyê de derbas dibe.[839]

Pêxemberê me (s.a.w) di hedîsekê de diyar kiriye ku bende, di halê secdeyê de herî zêde nêzî Xwedê ye. Ev, bi awayê bawermendê ku nimêj dike manen gihîştiye mîracê, hatiye şîrovekirin.

Ebû Hureyre (x.j.q) dibêje: Qasidê Xwedê (s.a.w) ferman kiriye ku:

"*Bende, herî zêde di halê secdeyê de nêzî Xwedê dibe. Nexwe, di secdeyê de gelek dua bikin*."[840]

Ev hedîs, hukmekî rast e ku ji vê ayetê "…**Ji Xwedayê xwe re here secdeyê û xwe nêzî Wî bike!**"[841] hatiye derxistin.

645. Ma gotina "Em ji cîhada biçûk hatin bal ya mezin" hedîs e?

Pirs: Ma gotina "Em ji cîhada biçûk hatin bal ya mezin. Cîhada mezin, têkoşîna bi nefsê re ye." hedîs e yan na?

---

[839] Bnh: Fexruddîn Razî, **et-Tefsîru'l-Kebîr,** I, 226; Alûsî, **Rûhu'l-Meanî,** X, 453, Tefsîra ayeta 74an ji sûreyê Tewbe.
[840] Muslim, Selat, 215, (482); Ebû Dawûd, Selat, 152.
[841] 'Eleq, 96/19.

Bersiv: Di derbarê vê gotina tê angaştkirin ku Pêxemberê me (s.a.w) di vegera ji cenga Tebûkê gotiye, Îbn Hacer el-'Esqelanî dibêje ku "Ev, gotineke ku di devê kesan de belav bûye, lê (ne gotina Pêxemberê me) ya Îbrahîmê kurê Ebî Eble ye."

'Eliyyu'l-Qarî, diyar kiriye ku ev hedîs di berhema Îmam Xezalî ya bi navê "**Îhyau 'Ulûmiddîn**" de derbas dibe, Hafiz el-Îrakî yê ku hedîsên pirtûka "Îhya"yê nirxandine jî gotiye ku Îmam Beyheqî ev hedîs, bi nota "**seneda vê hedîsê zeîf e**" ragihandiye.[842]

Îbn Teymiyye di derbarê vê de gotiye ku: "Eslê wê tune ye. Tu alimekî ku gotin û kirinên Pêxemberê me rind dizane, hedîseke wiha ranegihandiye. Cîhada li hemberî kafiran ji 'emelên herî mezin e."[843]

Cîhad, bi wateya ked û xebatkirinê ye. Ev têgeheke gelekî berfireh e. Di xwe de têkoşîna bi çek, cengê jî dihewîne. Lê belê nayê wateya cengê bi tenê. Di Qur'anê de bêjeya di wateya cengê de "qîtal/muqatele" ye. Evê ayeta li jêr delîla herî mezin e li ser ku cîhad bi tenê ne wateya cengê ye:

"**Nexwe bi gotina kafiran meke û bi Qur'anê li hemberî wan cîhadeke mezin bike!**"[844]

Cîhada bi Qur'anê, nayê wateya ku mirov Qur'anê bi awayê çek bikar bîne. Ya jê tê fêhmê ku di têkoşîna li hemberî kafiran de mirov bi Qur'anê û bi awayê muwafiqî Qur'anê tev bigere.

Cîhad, navê tiştên ku divê kesê misilman bo dînê xwe li her der û gavê bike. Cenga li hemberî neyaran ne bûyereke wisa ye ku her gav were pêşberî meriv. Lê belê mirovê misilman, her dem di têkoşînê de ye. Ji lewre divê ku mirov peywirên

---

[842] 'Eliyyu'l-Qarî, **el-Esraru'l-Merfû'e**, rp 211, jimara hedîsê: 211. Wekî din bnh: 'Eclûnî, **Keşfu'l-Xefa,** I, 424-425, jimara hedîsê: 1362.
[843] Îbn Teymiye, **Mecmû'u'l-Fetawa,** XI, 197.
[844] Furqan, 25/52.

xwe bi awayê "cihada biçûk" û "cihada mezin" neke du beş, divê girîngiyê bide herduyan û bizanibe ku heta ji dest mirov were lazim e mirov xebat bike.

646. Ma ji bilî xanî, cil, nan û avê mafê însên di tu tiştekî din de tune ye?

Pirs: Di Sunena Tirmizî beşa Zuhdê de (bi jimara 2341) hedîsek wiha dibore: Li gorî ku ji Osmanê kurê Effan (x.j.q) hatiye ragihandin Qasidê Xwedê (s.a.w) wiha kerem kiriye: "Zaroyê Adem, ji maleke ku tê de rûnê, kincekî ku bedena wî bistirîne, nan û avê pê ve mafê wî di tu tiştekî din de tune ye." Tirmizî bo vê hedîsê gotiye ku "hesen sehîh e". Divê em vê hedîsê çawa fêhm bikin? Divê em rasterast bigirin, an jî divê em bawer bikin ku ev gotineke mecazî ye Pêxemberê me (s.a.w) gotiye da ku heta mumkin be mirov bi malê hindik qinyata xwe bîne?

Bersiv: Di hedîsa ku di Tirmizî beşa Zuhdê 30an de derbas dibe, maleke ku tê de rûnê, cilekî ku canê mirov bistirîne, nan û av ji bo însan wekî tiştên herî zerûrî û mafên wî yên xwezayî hatine diyarkirin.

Alimên ku ev hedîs şîrove kirine gotine ku mesref û xerckirinên di rêya bidestxistina van hewceyiyên zerûrî de tên dayîn, nabin mîna xerckirinên din. Lewra xerckirinên din mirov dixe bin bar û berpirsyariya zekat û sedeqeyê, lê xaniyekî ku bi malekî helal hatibe qezenckirin, cil, nan û av nakeve ber zekat û sedeqeyê.[845]

Herwiha deyndarên ku nikarin deynê xwe bidin, evan malên wan nayên hicizkirin.

647. Gotina "Ne di erd û asîmanan de, lê di dilê bendeyê xwe yê bawermend de bi cih dibim" hedîs e?

Pirs: "Ez di erd û asîmanan de bi cih nabim, lê di dilê bendeyê xwe yê bawermend de bi cih dibim." Ev bi sala ye ku vê hedîsê hînî me dikin. Di serê pêşî

[845] el-Mubarekfûrî, **Tuhfetu'l-Ehwezî,** Qahire, 2001, VI, 213, jimara hedîsê: 2341.

de hestên mirov pê zîz dibe û tê gumankirin ku ev dilşadî ye bo însan. Ma bi rastî jî ev hedîs e?

Bersiv: Ev gotina ku bi awayê hedîsê tê zanîn, tu eslê wê tune ye. Ev gotin, di berhema Îmam Xezalî ya bi navê **Îhyau 'Ulûmiddîn** de jî derbas dibe. Hafiz Îraqî yê ku hedîsên wê berhemê texrîc kirine gotiye ku "min tu esil jê re nedîtiye."

Îbn Teymiyye jî gotiye ku ev ji Îsraliyyatan e (ango ji çanda Cihûyan derbas bûye) û tu senedeke wê ya bide zanîn ku ji Pêxemberê me hatiye, tune ye.[846]

Mîna ku hat dîtin, ev gotina ku di nav însanan de wekî hedîsê tê zanîn, qîmetê wê ya hedîsî tune ye. Ji ber vê yekê ne durist e ku mirov vê gotinê herwekî ku hedîs be bi awayê "*mîna ku di hedîsekê de dibore …*" vebêje.

648. Ma hedîsa "Wê hin derewîn derkevin û bibêjin ku dev ji hedîsê berde, li Qur'anê binêre." sehîh e?

Pirs: Riwayeteke wiha li ser înternetê digere: "Wê rojek bê. Dema hedîsek min bê gotin, wê hin kes biderewînin û bibêjin ku 'Resûlê Xwedê wiha nabêje, dev ji hedîsê berde, li Qur'anê binêre' derkevin." Ma ev hedîs sehîh e?

Bersiv: Riwayeta ku Ebû Ye'la texrîc kiriye û bi bal Hezretî Pêxember ve hatiya îsnadkirin wiha ye:

"*Wê roj bê. Gava hedîsek min ji yekî ji we re bê gotin ew ê, li cihê rûniştina xwe paldayî wiha bibêje: Resûlullah tiştekî wiha nabêje. Tu dev ji hedîsê berde, ji min re ji Qur'anê delîl bîne*."[847]

Ev riwayet, bi sebeb rawiyê hedîsê Yezîdê kurê Eban er-Reqaşî yê ku di seneda wê de derbas dibe, zeîf hatiye qebûlkirin.[848]

---

[846] Sexewî, **el-Maqasidu'l-Hesene**, rp. 438, jimara hedîsê: 990; 'Eliyyu'l-Qarî, **el-Esraru'l-Merfû'e**, rp. 301, jimara hedîsê: 423; 'Eclûnî, **Keşfu'l-Xefa**, II, 195, jimara hedîsê: 2256.
[847] Ebû Ye 'la, **Musnedu Ebî Ye'la**, III, 346.

Ji aliyê ‘ilmê hedîsê ve, hedîseke wiha nabe delîl.

Hedîsên sehîh jî biryar û hukmên ku Pêxemberê me ji Qur’anê derxistine. Heyeteke pispor encax dikarin bizanibin ka ew ji kîjan ayetan hatine derxistin. Ji ber vê yekê gotinên bi awayê “Qasidê Xwedê tiştekî wiha nabêje. Dev ji hedîsê berde; li Qur’anê binêre”, teqez şaş in. Ji ber ku herî baş û çêtir Pêxemberê me ji Qur’anê fêhm dike, pisporê vî karî jî dibe ew. Ew, tiştên ku jixwe di Qur’anê de hene lê em bi hêsanî nikarin bibînin, nîşanî me dide. Ji vî aliyî ve em hewcedarê mînaktiya wî ne. Ji lewre gotina “hewcedarî bi hedîsan tune ye, Qur’an bi tenê têrî me dike”, ji bilî ku vê rastiyê înkar bike bi kêrî tu tiştekî din nayê.

649. Ma hedîsa “Temenê umeta min, 1.500 salî derbas nake.” sehîh e?

Pirs: Gelo hedîsek bi vî awayî “ ‘Emrê vê umetê dê hezar salî derbas bike; lê dê negihîje hezar û pênc sed salî” heye?

Bersiv: Di çavkaniyên hedîsê de hedîsek bi vî şeklî tune ye. Ev riwayet, di berhema Îmam Suyûtî ya bi navê **el-Hawî** piştî cih daye gelek riwayetên di mijara qiyamet û ‘emrê dinyayê de –ji aliyê alimên hedîsê ve hatiye diyarkirin ku pirê wan “derew” û “zeîf” in-, bi şeklê nirxandin û encamderxistinê cih digire. Îfadeyên Îmam Suyûtî wiha ne:

...أولاً الذي دلت عليه الآثار أن مدة هذه الأمة تزيد على ألف سنة ولا تبلغ الزيادة عليها خمسمائة سنة

“Berî her tiştî ev riwayetên han, nîşan didin ku temenê vê umetê dê ji hezar salî bibore; lê nagihîje hezar û pênc sed salî.”[849]

Ev îfade, angaşta zanîna bi wextê rabûna qiyametê di xwe de dihewîne. Xwedê Teala di vê mijarê de wiha ferman dike:

---

[848] Bnh: Heysemî, **Mecme‘u’z-Zewaid**, I, 155.

[849] Bnh: Suyûtî, **el-Hawî li’l-Fetwa**, Daru’l-Kutubi’l-‘Ilmiyye, Beyrût 2000, II, 82.

"Ji te pirsa qiyametê dikin; ka kengê ye û dê kengê biqewime? Ji wan re bibêje: Bêguman zanîna wê bes li cem Perwerdegarê min e. Ji Wî pêve tu kes nikare dema hatina wê aşkere bike. Ew roj, li ser erd û asîmanan giran tê. Ew ê ji nişka ve bi ser we de bê. Ew (qiyametê) ji te dipirsin her wekî ku tu wê zanibî. Ji wan re bibêje: Zanîna wê bes li nik Xwedê ye, lê belê pirên mirovan nizanin."[850]

"Ew, pirsa qiyametê ji te dikin ka kengî dê rabe? Ma tu çi jê dizanî heta ku pirsa wê ji te dikin! Bi rastî zanîna wê bes li ba Perwerdegarê te ye."[851]

"Însan pirsa qiyametê ji te dikin, ka kengî ye? Bibêje: Zanîna wê bes li cem Xwedê ye. Ma tu çi dizanî, dibe ku qiyamet nêzîk be jî."[852]

Mîna ku tê dîtin, Xwedê Teala bi awayekî vekirî û vebirî diyar dike ku ji Wî pêve tu kes bi wextê rabûna qiyametê nizane.

650. Ma gotina "Saeteke bi tefekkur, ji 'îbadeta sunet ya salekê bi xêrtir e" hedîs e?

Pirs: Ma hedîseke bi şeklê "Saeteke bi tefekur, ji 'îbadeta nafîle ya salekê bi xêrtir e" heye? Eger hebe jî gelo sehîh e?

Bersiv: Ev riwayet, di çavkaniyan de wiha dibore:

تفكر ساعة خير من عبادة سنة

"Saeteke bi tefekkur, ji 'îbadeta salekê bi xêrtir e."

'Eliyyu'l-Qarî yê ku di berhema xwe cih daye vê riwayetê, diyar kiriye ku ev, ji gotina Serî es-Seqetî ye.[853]

---

[850] E'raf, 7/187.
[851] Nazî'at, 79/42-44.
[852] Ehzab, 33/63.
[853] Bnh: 'Eliyyu'l-Qarî, **el-Esraru'l-Merfû'e,** rp. 175.

Hin alimên hedîsê jî gotine ku ev riwayet, "derew"e.[854]

Di encamê de hedîsek bi vî awayî tune ye.

651. Ma hedîsa "Xewa kesên alim, ji 'îbadeta nezanan bi xêrtir e" sehîh e?

Pirs: Ma hedîseke bi vî awayî "Xewa kesê alim, ji 'îbadeta yê nezan bi xêrtir e" heye? Ger hebe jî ma sehîh e?

Bersiv: Riwayet wiha ye:

"نوم العالم خير من عبادة الجاهل"

"Xewa kesê alim, ji 'îbadeta yê nezan bi xêrtir e."

Ev peyv, di çavkaniyên hedîsê de ne mîna riwayeteke ku bi bal Pêxemberê me (s.a.w) hatibe spartin, ne jî ji gotinên mezinan wekî peyva sehabî û tabiîyan derbas dibe.

Di çavkaniyan de di derbarê riwayeta "Xewa kesê alim" de tê gotin ku tu esl û bingeh jê re tune ye.[855]

652. Ma Îmam Nesaî, alimekî hedîsê yê pêbawer e?

Pirs: Seyda, ma Îmam Nesaî alimekî hedîsê yê pêbawer e?

Bersiv: Nesaî, nivîskarê "es-Sunen"ê ya ku yeka ji Kutubê Sitte (şeş berhemên hedîsê) ye. Ji nivîskarên Kutubê Sitte, ji aliyê tarîxê ve yê herî dawî ye û di sala 303/ 915 de wefat kiriye.

Îmam Nesaî, hem alimekî hedîsê hem jî rexnegirê hedîsê ye û gelek berhemên wî hene. Hatiye diyarkirin ku berhema wî ya ku hêj negihîştiye me ya bi navê **el-Cerh we't-Te'dîl**, ya ku di derbarê pêbaweriya rawiyên hedîsê de girîng e.[856]

[854] Bnh: Suyûtî, **el-Leali'l-Masnû'e**, II, 276; Şewkanî, **el-Fewaidu'l-Mecmû'e**, rp. 251.
[855] Bnh: 'Eliyyu'l-Qarî, **el-Esraru'l-Merfû'e**, rp. 374, jimara hedîsê: 567.

Lê ev heye, pêbawerî û ewlebûna Nesaî, nayê wateya ku temamê hedîsên ku wî di "**es-Sunen**"ê de neqil kirine, sehîh in. Her riwayet, divê ku sened û metnê wê li gorî rêbaza 'ilmê hedîsê were rexnekirin û digel temamê hedîsên din ên têkildar bi temamiya Qur'an-Sunetê bên nirxandin.

653. Kitêba 'Eclûnî ya bi navê Keşfu'l-Xefa, ma çavkaniyeke ewle ye?

Pirs: Ma berhema 'Eclûnî ya bi navê Keşfu'l-Xefa, çavkaniyeke pêbawer e?

Bersiv: Berhema Îsmaîlê kurê Muhemmed el-'Eclûnî (w. 1167/1749) ya bi navê **Keşfu'l-Xefa**, di derbarê riwayetên ku di nava gel de bi awayê hedîsê belavbûne de ye. Ev berhem, bi mebesta diyarkirina riwayetên di nav gel de meşhûr in ka kîjan ji wan hedîsên sehîh in, kîjan riwayetên derewîn in, kîjan wecîze ne, kîjan gotinên pêşiyan e û kîjan gotinên bi hikmet in, hatiye nivîsandin. Ev berhem bi giranî, xwe dispêre kitêba Şemseddîn es-Sexewî ya bi navê **el-Meqasidu'l-Hesene**.

Tê dîtin ku 'Eclûnî, riwayetên ku ji aliyê hin aliman ve mewdû' (derewîn) hatine qebûlkirin parastiye, angaşt kiriye ku ev zeîf an jî hesen lixeyrihi ne, hin caran jî bi çavkaniyeke ku riwayet tê de dibore bi tenê îktifa kiriye û carinan jî digel ku nêrînên aliman ên di derbarê riwayetê de parve kiriye lê biryareke teqez diyar nekiriye. Çawa ku di hin gotinan de diyar kiriye ku ne hedîs in an jî dudiliya xwe nîşan daye gotiye ku wateya wan rast in, herwiha batiliya naveroka hin riwayetan jî vegotiye. Digel van hemûyan jî di berhemê de dubareyên bêhemdî, riwayetên ku nehatine nirxandin û gotinên ku di derheqê wan de hedîs in-ne hedîs in biryar nehatiye dayîn û xwestiye ku werin lêkolînkirin jî hene.[857]

Di encamê de ji bo hedîsan, berhema **Keşfu'l-Xefa** ne çavkaniyeke sereke ye. Heta ku riwayetek di çavkaniyên sereke yên hedîsê de neyê teyidkirin, nabe ku bê gotin "Ev, di Keşfu'l-Xefa"yê dibore û wê bi tenê çavkanî nîşan bide.

---

[856] Bo agahiyên berfirehtir bnh: M. Yaşar Kandemir, "en-Nesâî", **DİA,** 2006, XXXII, 563-565.
[857] Bnh: Bünyamin Erul, "Keşfü'l-Hafa", **DİA**, 2002, XXV, 320-321.

654. Gotina "Li ser miriyên xwe sûreyê Yasînê bixwînin.", ma hedîsa Pêxember e?

Pirs: Baş e li ser miriyan Qur'an, nayê xwendin. Lewra tu feydaya wê ji kesê mirî re tune ye. Lê hedîsa "Li ser miriyên xwe sûreyê Yasînê bixwînin", ma nabe delîl li dijberî vê? Ango ma nabe lazim ku em sûreyê Yasînê bixwînin? Divê em li hemberî vê hedîsê çawa tev bigerin?

Bersiv: Riwayeta ku bi bal Pêxember (s.a.w) tê spartin wiha ye: "Li ser miriyên xwe Yasînê bixwînin اقرءوا { يس } على موتاكم."[858]

Ji aliyê gelek alimên hedîsê ve hatiye diyarkirin ku ev riwayet zeîf e. Ebû Bekir Îbnu'l-Erebî radigihîne ku Îmam Darequtnî di derbarê vê riwayetê de wiha gotiye: "Îsnada vê hedîsê zeîf e, metnê wê mechûl e, di vê mijarê hedîseke sehîh tune ye. "[859]

Hedîsên zeîf jî di mijarên dînî de nabin delîl.

Mustafa Özel di gotara xwe ya zanistî ya di derbarê xwendina Qur'anê li ser miriyan, gihîştiye van encaman:

1- "Di derbarê xwendina Qur'anê li ser miriyan, ne yekser ne jî nerasterast di Qur'anê de tu agahiyek tune ye.

2- Di çavkaniyên hedîsê yên meqbûl û muteber de jî yên ku gotinên Pêxemberê me tomar kirine, hedîseke sehîh/saxlem ku rasterast vê mijarê bigire tune ye. Hema çi bigire temamê hedîsên ku di çavkaniyan de diborin, zeîf in an jî mewdû' (derewîn in). Li ser vê meseleyê hedîsa yekta ya ku di kitêbên hedîsê yên sehîh de dibore, hedîsa ku di Ebû Dawûd û Îbn Mace de ya ji aliyê Me'qilê kurê Yesar di derbarê xwendina sûreyê Yasîn de hatiye riwayetkirin, heye. Di delalet/îfadeya vê

[858] Ebû Dawûd, Cenaiz, 24; Îbn Mace, Cenaiz, 4.
[859] Îbn Hecer, **et-Telxîsu'l-Xebîr,** II, 244-245. Wekî din jî bnh: Mizzî, **Tuhfetu'l-Eşraf**, VIII, 465; Îbnu'l-Qettan, **Beyanu'l-Wehm we'l-Îlhami'l-Waqi'eyn fî Kitabi'l-Ehkam,** V, 49.

hedîsa ku di çavkaniya yekem de bi daçeka ‘ela (على), di ya duyem de jî bi hokera mekanî “’inde (عند)” bi wateya cih hatiye, pirsgirêk heye.

3- Ev tetbîqa ku di serdema Îslamî ya pêşî de tune bû, herî zêde, xwe dispêre pratîkên ku di dirêjiya dîrokê de derketine holê. Ev, dibe ku ji ber hin sedemên derûnî yên civakî hatibe meydanê. Herî kêm mirov dikare bihizire ku ev, ji aliyê misilmanan ve mîna şêweyekî dewamkirina têkilatiyê ye bi dîndarên ku bi bal axretê ve dişînin û navgîneke ji bo nîşandana rêzdariyê li hemberî wan, nirxandine.”[860]

655. Ma hedîsa “Receb meha Xwedê ye, Şe‘ban meha min e, Remezan jî meha umeta min e” sehîh e?

Pirs: Di lêkolîna we ya bi sernavê “Recep Ayı Hakkında Uydurulmuş Hadisler/Hedîsên di derbarê meha Recebê de hatine lêanîn” de hatiye diyarkirin ku Îbn Qeyyim el-Cewzî, Îmam Suyûtî û Şewkanî di derheqê peyva “Receb meha Xwedê ye, Şe‘ban meha min e, Remezan jî meha umeta min e.” de gotine ku “mewdû‘/derewîn e.” Pirsa min, ‘Eclûnî di derheqê vê hedîsê de çi dibêje? Lewra li mizgeftan ev gotin bi awayê hedîsê tê daliqandin û berhema wî ya Keşfu’l-Xefa jî mîna çavkanî tê nîşandan. Ji kerema xwe re hûn dikarin vê bibersivînin?

Bersiv: Mîna ku di nivîsa borî de jî hatiye aşkerekirin ‘Eclûnî jî wekî Îmamên din di berhema xwe ya bi navê **Keşfu’l-Xefa** de cih daye vê riwayetê û diyar kiriye ku Deylemî û hinên din ev bi awayê merfû (hedîsa ku zincîra seneda wê digihîje heta Pêxember) ji Enes ragihandine; lê Îbnu’l-Cewzî, di kitêba **el-Mewdû‘at** de cih daye vê riwayetê.[861]

---

[860] Mustafa Özel, “Ölünün Ardından Kur’an-ı Kerim Okunmasının Dini Dayanakları”, **İslam Hukuku Araştırmaları Dergisi**, jimar: 7, Avrêl 2006, rp. 484-485.

[861] Bnh: ‘Eclûnî, **Keşfu’l-Xefa**, I, 423-424, jimara hedîsê: 1358. Wekî din bnh: Îbnu’l-Cewzî, **Kitabu’l-Mewdû‘at**, II, 47-48.

Herçiqas aşkere negotibe jî ji vê derê tê fêhmê ku herwekî ev jî di baweriya ku ev hedîs mewdû'/derewîn e.

Ji bo bidestxistina agahiyên berfireh di derbarê rastiya riwayetên mîna "*Receb meha Xwedê ye, Şe'ban meha min e, Remezan jî meha umeta min e*." "*Nebî nebî hûn ji şeva îna yekem ya meha Recebê xafil bibin. Lewra ew şev, şeva ku firîşte jê re dibêjin Rexaib*.", "*Kesê ku di meha Recebê de rojî bigire û çar rek'et nimêj bike û di rek'eta yekem ya vê nimêjê de sed carî Ayete'l-Kursî, di rek'eta duyem de jî sed carî sûreyê Îxlas bixwîne, ew kes, heta ku cihê xwe yê li bihuştê nebîne, namire*." û hwd. em tewsiye dikin ku hûn lêkolîna/nivîsa di lînka jêr de ye bixwînin.

http://www.suleymaniyevakfi.org/kandil-geceleri/recep-ayi-hakkinda-uydurulmus-hadisler.html

656. Ma Xwedê Teala, şêwirmendên şelaf museletî ser rêvebirên ku ji wan hez nake, dike?

Pirs: Ev peyva belavbûyî "Xwedê Teala, şêwirmendên rastbêj dike nesîbê rêvebirên ku ji wan hez dike, yên ji wan hez nake jî hinên şelaf û qeşmer dike para wan." ya ku ji aliyê gelek însanan ve wekî hedîsê tê zanîn, ma hedîs e? Hûn dikarin di vê mijarê de me agahdar bikin?

Bersiv: Di çavkaniyan de riwayeteke ku bii wateya ya we li jor behs kiriye, bi vî awayî dibore:

إِذَا أَرَادَ اللَّهُ بِالأَمِيرِ خَيْرًا جَعَلَ لَهُ وَزِيرَ صِدْقٍ إِنْ نَسِىَ ذَكَّرَهُ وَإِنْ ذَكَرَ أَعَانَهُ وَإِذَا أَرَادَ اللَّهُ بِهِ غَيْرَ ذَلِكَ جَعَلَ لَهُ وَزِيرَ سُوءٍ إِنْ نَسِىَ لَمْ يُذَكِّرْهُ وَإِنْ ذَكَرَ لَمْ يُعِنْهُ

Diya me 'Aişeyê (x.j.q) radihandiye ku Pêxember (s.a.w) wiha gotiye:

"*Gava Xwedê bo serok/rêvebirekî, xêrê bixwaze, alîkarekî rastbêj (diaxive û karê rast dike) didiyê. Eger ew (karekî pêwîst) jibîr bike (alîkar, karê hatiye jibîrkirin) dixe bîra wî. Ger were bîra serok (alîkar, di bara pêkanîna wî karî de) dibe alîkarê serok.*

Eger Xwedê, tiştekî din di derheqê wî de xwestibe, alîkarekî nebaş (cir nexweş) dike para wî. Ger (karekî divê bê kirin) jibîr bike, (wezîr vî karî) naxe bîra wî. Eger (ev kar ji ber xwe de) were bîra wî (wê gavê ev alîkar di kirina wî îşî de) nabe alîkar pê re."[862]

657. Ma kesên li kilamên stranbêjên jin guh bidêrin, dê paxir bê berdan guhê wan?

Pirs: Ma hedîseke bi vî awayî "Kesê ku li cem stranbêjekê rûnê û kilam an jî stranekê jê bibihîse, roja qiyametê dê paxirê helandî berdin guhê wî." heye? Ger hebe jî ma sehîh e?

Bersiv: Di hin çavkaniyan de ev riwayet wiha dibore:

من جلس إلى قينة يسمع منها صب في أذنيه الآنك يوم القيامة

"Kesê ku li ba stranbêjekê rûnê û jê kilamekê bibihîse, dê roja qiyametê paxir berdin guhê wî."[863]

Ev riwayeta ku di çavkniyên hedîsê yên sehîh de nabore, ji aliyê zanyarên 'ilmê hedîsê ve bi awayê "**mewdû'/derewîn**" hatiye nirxandin. Herwiha hatiye tomarkirin ku ji alimên hedîsê yên mezin Îmam Ehmedê kurê Henbel jî di derbarê vê riwayetê gotiye ku "**batil**"e.[864]

Ji ber vê yekê bi spartin û îtimada li ser vê riwayeta ku tu esl û binyadek jê re tune ye, mirov nikare bibêje ku kesê li dengê stranbêjekê guh bidêre, dê roja qiyametê paxir berdin guhê wî.

---

[862] Ebû Dawûd, Xerac, 4; Nesaî, Bey'et, 33; Ehmedê kurê Henbel, **Musned**, VI/70.
[863] Îbnu'l-Erebî, **Ehkamu'l-Qur'an**, III, 525.
[864] Bnh: Îbnu'l-Cewzî, **el-'Ilelu'l-Mutenahiye**, Daru'l-Kutubi'l-'Ilmiyye, Beyrût 1403, II, 786.

658. Ma hedîsa "Kesê suneta min îhya bike, xêra sed şehîdî jê re heye" sehîh e?

Pirs: Ma ev hedîsa "Di gava xerabûna umeta min de kesê xwe bi suneta min bigire, xêra sed şehîdî jê re heye." sehîh e?

Bersiv: Ev riwayeta ku di çavkaniyên sehîh ên hedîsê de nabore, di hin jêderan de bi neqla ji sehabiyên mîna Îbn 'Ebbas û Ebû Hureyre cih digire:

مَن تَمَسَّكَ بِسُنَّتِي عِندَ فَسادِ أُمَّتِي فَلهُ أَجْرُ مِائَةِ شَهيدٍ

"*Kesê ku di gava xerabûna umeta min de xwe bi rêçika min bigire, xêra sed şehîdî jê re heye***."**

اَلْمُتَمَسِّكُ بِسُنَّتِي عِنْدَ فَسَادِ أُمَّتِي لَهُ اَجْرُ شَهِيدٍ

"*Kesê ku di gava xerabûna umeta min de xwe bi rêçika min bigire, xêra şehîdekî jê re heye***."**[865]

Di derbarê van riwayetan de ji aliyê alimên hedîsê ve hatiye diyarkirin ku seneda wan "zeîf" û kesên ku di zincîra senedê de jî diborin "mechûl" (ango nenas in).[866]

Mebest ji peyva "rêçik"ê ya ku di riwayetên jorîn de dibore, rêya ku Pêxember (s.a.w) şopandiye. Ango rêya Qur'anê ye, rêya Îslamê ye. Ji ber vê yekê ne ku bi tenê di demên zor û zehmetiyan de belbî divê ku em her gav xwe bi wê rêyê ve bigirin da ku em rizgar bibin.

---

[865] Teberanî, **el-Mu'cemu'l-Ewset**, V, 315, jimara hedîsê: 5414; Munawî, **Feydu'l-Qedîr**, VI, 339, jimara hedîsê: 9171.

[866] Bnh: Îbn 'Ediy, **el-Kamil fî Du'afai'r-Rical**, Daru'l-Fikr, Beyrût 1998/1409, II, 327; Îbn Hecer, **Lisanu'l-Mîzan**, Muessesetu'l-'Ilmiyye li'l-Matbû'at, Beyrût 1986/1406, II, 246.

659. Ma hedîsek bi vî awayî "Ji ber sê tiştan ji 'Ereban hez bikin" heye?

Pirs: Ma riwayeta ku qaşo Pêxemberê me gotiye "Ez 'Ereb im, zimanê axaftina bihuştê jî 'Erebî ye" sehîh e?

Bersiv: Di hin jêderên hedîsê de riwayetek bi vî awayî dibore:

أحبوا العرب لثلاث لأني عربي والقرآن عربي وكلام أهل الجنة عربي

"Ji ber van sê tiştan ji 'Ereban hez bikin: Lewra ez 'Ereb im, Qur'an bi 'Erebî ye û axaftina bihuştiyan bi 'Erebî ye**."**[867]

Hatiye destnîşankirin ku Ehmedê kurê Henbel di derbarê vê riwayetê de gotiye ku "**zeîf e**", 'Uqeylî gotiye "**munker e**" û "**eslê wê tune ye**" û Zehebî jî gotiye ku "**mewdû'/derewîn e**".

Ji bo ahagiyên berfirehtir û nirxandinên alimên hedîsê çi ji bo van îfadeyan çi jî di derbarê rawî û terîqên/rêyên riwayetên din de binihêrin: Heysemî, **Mecme'u'z-Zewaid**, X, 25; Zehebî, **Telxîsu Kitabi'l-Mewdû'at**, I, 92; Suyûtî, **el-Leali'l-Mesnû'e**, I, 404-405; Fettenî, **Tezkiretu'l-Mewdû'at**, I, 112; Îbn Arrak, **Tenzihu'ş-Şerî'e,** II, 30-31; Şewkanî, **el-Fewaidu'l-Mecmû'e**, rp. 413; 'Eclûnî, **Keşfu'l-Xefa**, I, 54-55.

Ji aliyê din ve di derbarê ka dê xeberdana ehlê cenetê bi kîjan zimanî be, ne di Qur'anê de ne jî di sunetê de tu delîlek heye. Ji ber vê yekê ne rewa ye ku mirov li ser esasê vê riwayeta ku li jor borî di derbarê vê mijarê de xeber bide.

660. Hedisa "Kesê çar rek'et sunetên berî nîvro neke, mehdervaniya min nagihîjê" sehîh e?

Pirs: Di hedîseke ku di berhemên fiqhê de wiha derbas dibe: "Kesê ku çar rek'et sunetên berî nimêja nîvro terk bike, mehdervaniya min nagihîjê" (Bnh: Îbn Abidîn, 2/14). Gelo hedîs sehîh e?

[867] Hakim, **el-Mustedrek**, IV, 87; Beyheqî, **Şu'ebu'l-Îman**, III, 34.

Bersiv: Mîna ku we jî diyar kir, ev riwayet ne di çavkaniyên hedîsê de bêhtir di yên fiqhê de derbas dibe. Riwayeta tê diyarkirin ku Pêxembrê me gotiye wiha ye:

مَنْ تَرَكَ الْأَرْبَعَ قَبْلَ الظُّهْرِ، لَمْ تَنَلْهُ شَفَاعَتِي

"Kesê ku çar rek'et sunetên berî nimêja nîvro terk bike, mehdervaniya min nagihîje wî kesî**.**"[868]

Îmam Zeyle'î di berhema xwe ya bi navê **Nesbu'r-Raye** ya ku hedîsên di **el-Hîdaye** ya ku ji çavkaniyên sereke yên mezhebê Henefî ye vedikole, cih daye vê riwayetê; ew bi awayê "xerîbun cidden" wesifandiye û behsa tu rawiyekî di zincîra riwayetê de nekiriye.[869]

Îbn Hacer el-'Esqelanî jî di berhema xwe ya bi navê **ed-Diraye** de ya ku hedîsên pirtûka **el-Hîdaye** vedikole di derbarê vê riwayetê de gotiye ku: "Min ew (çavkaniya wê) nedîtiye."[870]

Herwiha hatiye neqilkirin ku Îmam Newewî jî gotiye: "Eslê vê riwayetê tune ye."[871]

Bi kurtasî di enacamê de ev riwayet ji aliyê 'ilmê hedîsê ve, ne pêkan e ku mirov wê bike delîl.

Ya mirov jê berpirsyar e, kirina nimêjên ferz in. Kesê nimêjên sunet bike, dibe xwedî xêr; lê kesê neke jî pê nakeve gunehkariyê.

661. Ma hedîsa "Ez hatime şandin da ku exlaqê xweş temam bikim" sehîh e?

Pirs: Ma hedîsa "Ez hatime şandin da ku exlaqê xweş temam bikim" sehîh e? Û di Qur'anê tu rastiya vê heye?

---

[868] Bnh: el-Merxînanî, **el-Hîdaye**, Weşanên Kahraman, Stenbol 1986, I, 72.
[869] Bnh: Zeyle'î, **Nesbu'r-Raye**, II, 162.
[870] Bnh: Îbn Hecer, **ed-Diraye,** I, 205.
[871] Fettenî, **Tezkiretu'l-Mewdû'at**, I, 48.

Bersiv: Hatiye ragihandin ku Qasidê Xwedê (s.a.w) wiha gotiye:

"*Ez hatime şandin, da ku exlaqê xweş temam bikim*."[872]

Hedîsvanan gotine ku ev riwayet, ji aliyê azîneyên hedîsê ve tu pirsgirêk tê de tune ye û îsnada wê (yên ku ev gotin riwayet kirine) hesen e.

Xwedê Teala di Qur'ana Pîroz de di derbarê Pêxemberê me wiha ferman kiriye:

"**Bêguman tu li ser exlaqekî gelek mezin î**."[873]

"**Birastî ji bo we, di Resûlê Xwedê de ji bo wî kesê ku (qenciya) Xwedê û roja axretê hêvî dike û zikrê Xwedê jî pir dike, mînak û nimûneyeke spehî û kamil heye**."[874]

Ji bo nîşandana ka gelo rewişta Pêxember (s.a.w) çi bûye û çawa bûye, ev riwayeta ku ji diya me 'Aişeyê (x.j.q) hatiye ragihandin gelekî girîng e:

Zilamekî pirsî: "Ey dayika bawermendan! Tu dikarî ji me re behsa exlaqê Qasidê Xwedê, bikî?" Wê jî wiha pirsî û got: "Ma tu qet Qur'anê naxwînî?" Piştî ku zilamî bersiv da ku: "Teqez ez dixwînim." 'Aişeyê jî got ku: "Exlaqê wî, (exlaqê) Qur'anê bû."[875]

Qur'ana Pîroz, kitêba Xwedê ya dawî ye. Esas û bingehên exlaq û 'îbadetê yên tê de ne, tu carî ne kêm ne jî zêde dibin. Di ayeta ku herî dawî nazil bûye de Xwedê Teala wiha ferman dike: "**Îro, Min dînê we ji bo we kemiland. Min qenciya xwe li ser we temam kir…**"[876] Di hedîsa borî de jî babeta sereke ku tê destnîşankirin ev e. Pêxemberê me yê ku ev kitêb jê re hatiye dayîn, ew kiriye rêberê jiyana xwe, li gorî

[872] Muwetta, Husnu'l-Xulq, 8; Ehmedê kurê Henbel, **Musned**, II/381.
[873] Qelem, 68/4.
[874] Ehzab, 33/21.
[875] Muslim, Selatu'l-Musafirîn, 139 (746).
[876] Maîde, 5/3.

exlaqên tê de ne tev geriyaye, temamê exlaqên xweşik di keseyeta wî de hatine meydanê û ji lewre di her mijarê de bo bawermendan mînak hatiye nîşandan.

662. Ma di derheqê hibekirina xêra sûreyê Îxlas de tu hedîsek heye?

Pirs: Di televîzyonê de seydayekî behsa hedîseke wiha kir: "Dema hûn di gorisatanekê de diborin, eger hûn 11 caran (sûreyê) Îxlas bixwînin bi qasî jimara kesên di wê goristanê de dê gunehên we bên bexşandin." Ma bi rastî jî hedîseke wiha heye?

Bersiv: Metnê riwayeta têkildar wiha ye:

من مر على المقابر فقرأ فيها إحدى عشرة مرة : {قل هو الله أحد} ثم وهب أجره للأموات؛ أعطي من الأجر بعدد الأموات

"Kesê di goristanan de bibore û 11 caran sûreyê Îxlas bixwîne û xêra wê hîbeyî miriyan bike, bi qasî jimara miriyan xêr jê re tên nivîsandin."

Riwayeteke wiha di çavkaniyên hedîsê yên pêbawer de cih nagire.

'Eclûnî, di berhema xwe ya bi navê **Keşfu'l-Xefa** de dibêje ku ev riwayet, di pirtûka Rafiî ya bi navê **Tarix** de dibore; lê belê di derbarê rastiya riwayetê de tu agahiyan parve nake.[877]

Ji muhedisan Fettenî, di berhema xwe ya ku hedîsên mewdû'/derewîn tê de civandiye, diyar kiriye ku ev riwayet "mewdû'" ango derewîn e.[878]

Piştî diyar bû ku ev riwayet ji aliyê senedê ve mewdû' ye, ne pêkan e ku ji aliyê wateyê ve rast be. Lewra di derbarê îmkana xwendina Qur'anê û hibekirina xêra wê bo giyanê miriyan, tu ayet û hedîsek sehîh tune ye.

[877] Bnh: 'Eclûnî, **Keşfu'l-Xefa**, II, 282.
[878] Bnh: Fettenî, **Tezkiretu'l-Mewdû'at**, rp. 220.

663. Ma gotina "Hezkirina welêt, ji îmanê ye" hedîs e?

Pirs: Ma gotina "Hezkirina welêt, ji îmanê ye" hedîs e? Ger hedîs be jî gelo sehîh e?

Bersiv: Riwayeta "Hezkirina welêt, ji îmanê ye", di berhema 'Eliyyu'l-Qarî ya bi navê **el-Esraru'l-Merfû'e** de dibore. Wî, di derbarê vê riwayetê de ragihandiye ku Zerkeşî gotiye: "Ez bi ser vê riwayetê venebûme", Sefewî gotiye: "Ew riwayet ne sabit e" û Sexewî jî gotiye ku: "Ez bi ser vê riwayetê ve venebûme, lê belê wateya wê sehîh e." Herwiha 'Eliyyu'l-Qarî diyar dike ku hinekan gotine ku ev riwayet, ji gotinên selefa ye.

Lê belê 'Eliyyu'l-Qarî, gotina Sexewî ya "Wateya vê riwayetê sehîh e" red kiriye û wiha gotiye: Gotina "Wateya vê riwayetê sehîh e" xerîb e! Lewra tu têkilî di navbera îman û hezkirina welêt de tune ye." Wekî din jî wî diyar kiriye ku hezkirina welêt ya di riwayetê de derbas dibe ger di derbarê bawermendan bi tenê de be, dibe ku bê pejirandin; encax ev, bo kesên xeyrimuslim bi tu awayî nabe nîşana baweriyê. Wî dîsa gotiye ku pêkan e ji peyva "welêt" ya di hedîsê de dibore "Mekke", "Bihuşt" an jî "Vegera bi bal Xwedê ve" hatibe qesdkirin.[879]

'Eclûnî jî di berhema xwe ya bi navê **Keşfu'l-Xefa** cih daye vê riwayetê û ragihandiye ku: "Saxanî di derheqê vê riwayetê de gotiye ku **derew e**, Sexewî jî gotiye ku: Ez bi ser (vê riwayetê ve) venebûme; lê belê wateya riwayetê sehîh e."[880]

Muhemmed Lutfî es-Sebbax yê ku berhema 'Eliyyu'l-Qarî ya bi navê **el-Esraru'l-Merfû'e** tehqîq kiriye, ev riwayet wiha nirxandiye:

"… Ev hedîs ne sehîh e, **derew e**. Ger em li gorî şert û bûyerên roja me li îfadeyên metnê vê ya ku wekî hedîsê tê pêşkêşkirin binihêrin, em ê bibînin ku tu şek û guman tune ye ku ev batil e û derewîn e. Di serdema me de neyarên dînê Îslamê,

[879] Bnh: 'Eliyyu'l-Qarî, **el-Esraru'l-Merfû'e,** rp. 189-191, jimara hedîsê: 164.
[880] Bnh: 'Eclûnî, **Keşfu'l-Xefa,** rp. 346-347, jimara hedîsê: 1102.

vê riwayetê bi mebesta civakê bi gişti ji dîn bixin û da ku civakeke bi dilê xwe saz bikin û teqdîm dikin. Bi vî awayî dixwazin ku fikr û ramana "nişt îmanperwerî" û "nijadperestiyê" bi hêz bikin. Ya rast ev e ku, welatê eslî bo kesê misilman, bîr û baweriya wî ye…"[881]

Di bin sî û sîwana van agahiyan de diyar e ku riwayeta "Hezkirina welêt ji îmanê ye", ne gotina Hezretî Pêxember e, ango tê fêhmê li ser navê wî hatiye lêanîn. Lê belê ev nayê wateya ku hezkirina welêt tiştekî çewt e. Hezkirina mirov ya ji welêt ne tiştekî şaş e û tu mehzûrek tê de tune ye. Lê ev tiştek e û ku mirov angaşt bike û bibêje ku ev hedis e tiştekî din e. Di vir de tiştê esas û bingehîn ku xwestine bibêjin ev e: Ev riwayet, ne ji gotinên Hezretî Pêxember e ango ne hedîs e û hezkirina welêt, ne ji nîşanên îmanê ye.

664. Ma hedîsa kesê qurbanê serjê neke bila nêzî mizgefta me nebe, sehîh e?

Pirs: Ma hedîsa di derbarê qurbanê de ya ku em gelek caran di xutbe û we'zan de dibihîzin: "Kesê derfeta wî hebe û qurbanê serjê neke, bila nêzî mizgefta me nebe" gelo sehîh e?

Bersiv: Riwayeta têkildar wiha ye:

مَنْ وَجَدَ سَعَةً فَلَمْ يُضَحِّ فَلَا يَقْرَبَنَّ مُصَلَّانَا

"Kesê ku derfeta wî hebe û qurbanê serjê neke, bila nêzî nimêjgeha me nebe."[882]

Beyheqî û ji muhedisên Henefiyan Îmam Zeyle'î, di berhemên xwe de ev riwayet bi awayê "mewqûf" ango ne mîna gotina Hezretî Pêxember, belbî bi şeklê spartina bi bal sehabeyan ve ragihandine.[883]

---

[881] Bnh: 'Eliyyu'l-Qarî**, el-Esraru'l-Merfû'e,** rp. 191, jêrenot: 2.
[882] Îbn Mace, Edahî**,** 2; Ehmedê kurê Henbel, **Musned**, II, 321; Hakim, **el-Mustedrek**, II, 422.
[883] Beyheqî, **es-Sunenu'l-Kubra**, II, 260; Zeyle'î, **Nesbu'r-Raye,** IV, 207.

Hin muhedisan jî seneda vê riwayetê rexne kirine û diyar kirine ku "zeîf e".[884]

Ji ber vê yekê ev riwayet ji aliyê senedê ve ne sehîh e û ji lewre nabe delîl bo hukmê 'îbadeta qurbanê.

665. Ma di bara bikaranîna gopal de tu hedîsek heye?

Pirs: Hin kes dibêjin ku hilgirtin û bikaranîna gopal sunet e. Ma Pêxemberê me, bi vê ferman kiriye? Bi rastî jî bikaranîna gopal sunet e? Ma di derbarê vê yekê de hedîs hene?

Bersiv: Di derbarê hilgirtin û bikaranîna gopal de di hin pirtûkan de ev riwayetên han cih digirin:

"*Hilgirtina gopal, nîşana kesên bawermend e, suneta Pêxemberan e.*"

"*Paldana li ser gopal, rêçika Pêxemberan e.*"

"*Kesê bihigêje çil saliya xwe û dar negire destê xwe, ew dibe asî.*"

Lê belê ev riwayet, di tu jêderên pêbawer de nabore û li gorî daxuyaniya muhedisan, tu esl û binyadek ji wan re tune ye. Hatiye diyarkirin ku hin rawiyên (mîna Yehyayê kurê Haşim el-Xassanî) ku di zincîra senedê de derbas dibin jî bi lêanîna hedîsan namdar in.[885]

'Eliyyu'l-Qarî gotiye ku ji ber ayetên 17-18 ji sûreyê Taha û bi sedema ku Qasidê Xwedê car caran bi gopal geriyaye, wekî tiştekî ne xerab lê hatiye nêrîn.

Ayetên têkildar wiha ne:

"**Ey Mûsa! Ew çi ye di destê te yê rastê de?"**

---

[884] Bnh: Bûsirî, **Misbahu'z-Zucace**, III, 222; Ebu'l-Ferec Îbnu'l-Cewzî, **et-Tehqîq**, II, 161.

[885] Bnh: Deylemî, **Kitabu Firdewsi'l-Exbar**, thq: Fewwaz Ehmed Zumerlî, Muhemmed Mu'tasim Billah el-Bexdadî, Daru'l-Kitabi'l-'Arabî, Beyrût 1986, II, 147, jimara hedîsê: 2750; 'Eliyyu'l-Qarî, **el-Esraru'l-Merfû'e**, rp. 179, jimara hedîsê: 147.

"(Mûsa) Got: Ew, gopalê min e. Ez xwe dispêrimê û ez pelên daran ji pezê xwe re pê diweşînim û ji bo min hin pêdiviyên din jî pê hene."

Di dewama ayetan de derbas dibe ku Xwedê Teala, li Mûsa ferman dike ku gopalê xwe biavêje erdê, gava gopal dikeve rûyê erdê pêre dibe mar. Ango darekî hişk û zûwa, bi awayekî mucîze di serî de dibe mar, piştre jî dîsa vedigere rewşa xwe ya berê. Ji ber vê yekê di ayetan de bi tu awayî agahiyên di lehê fezîleta bikaranîna gopal de cih nagire, lewra di wan de behsa rewşeke awarte, behsa mucîzeyekê tê kirin.

Rast e ku Qasidê Xwedê, piştî ku temenê wî mezin bûbû car caran gopal bikar dianî. Lê belê ev sunetiya bikaranîna gopal nade nîşandan. Lewra ev; mîna xwarin xwarina wî, vexwarin, lixwekirina kinc û cilan ji helwestên wî yên beşerî ne. Hukmê van tiştan jî îbahe/helalbûn e. Ango misilman, di kirin û nekirine van tiştên ku Pêxember kirine de serbest in.

666. Ma hedîsa "Roja qiyametê ez ê berî her kesî têkevim bihuştê" sehîh e?

Pirs: Ma dereceya siheta hedîsa "Roja qiyametê ez ê berî her kesî têkevim bihuştê" çi ye?

Bersiv: Riwayeta bi şeklê "Roja qiyametê ez ê berî her kesî têkevim bihuştê", di berhema Îmam Suyûtî ya bi navê **Cami'u'l-Ehadîs** (hedîsên: 5666 û 5667) û Heysemî ya bi navê **Mecme'u'z-Zewaid** (Fiten, hedîsa 12547) de derbas dibe.

Heysemî, îfade kiriye ku Muawiyeyê kurê Wahib ê ku di zincîra senedê de dibore, nas nake. Gava em di bin sî û sîwana Qur'anê de lê binihêrin, xuya dibe ku ev riwayet, ne sehîh e. Lewra Xwedê Teala, li Pêxemberê me (s.a.w) ferman kiriye ku wiha bibêje:

"**Bibêje: Ez ne pêşîvanê qasidan im. Ez nizanim dê çi bi min û çi bi we jî bê kirin. Ez tenê didim pey wehya ku ji min re hatiye. Ez bes hişyarvanekî aşkere me**."[886]

Mîna ku di ayetê de hatiye diyarkirin, Qasidê Xwedê îfade kiriye ku nizane ka dê çawa tevger pêre bê kirin. Li gorî vê xuyaye ku gotina "Roja qiyametê ez ê berî her kesî têkevim bihuştê" ne pêkan ku ji aliyê Pêxember (s.a.w) ve hatibe gotin.

[886] Ehqaf, 46/9.

HEZRETÎ ÎSA

667. Ma Îsa aleyhisselam dê careke din were dinyayê?

Pirs: Tê gotin ku nêzî rabûna qiyametê, Îsa aleyhisselam careke din dê were dinyayê. Gelo Hezretî Îsa dê ji asîmanan dakeve yan jî ruhê wî dê di yekî ser rûyê erdê de diyar bibe?

Bersiv: Li gorî Qur'ana Pîroz, Îsa aleyhisselam ne sax e, Xwedê Teala ruhê wî girtiye:

"**Xwedê got: Hey Îsa! Bêguman Ez ê te bimirînim û Ez ê te rakim cem xwe. Ez ê te ji yên kafir pak û paqij bikim. Û ew ên ku dane pey te, heta roja qiyametê Ez ê wan bi ser ên kafir bixim. Piştre, vegera we bi bal Min ve ye. Di bara ya ku hûn bi hev ketine de Ez ê di navbera we de hikum bikim**."[887]

"(Îsa dê bêje:) Bi tenê tiştê ku Te emrê min pê kir, min ji wan re got: ku ji Xwedayê ku perwerdegarê min û perweredegarê we ye bi tenê re bendetiyê bikin. Heta ku ez di nav wan de bûm, ez li ser wan zêrevan bûm. Çi gava Te ez mirandim, êdî Tu li ser wan çavdêr bû. Jixwe Tu li ser her tiştî bîner î."[888]

Di ayeteke din de Xwedê Teala radigihîne ku pêxemberê xwe Îsa aleyhisselam ji destê Cihûyan rizgar kiriye. Lewra dixwestin ku wî li çarmixê bixin.

"**Bi sedema ku digotin: "Bêguman me pêxemberê Xwedê, Îsayê kurê Meryemê Mesîh kuşt." Hal ev e ku wan ew nekuştiye, ne jî ew li çarmixê daye. Lê belê (kuştî) ji wan re hat şibandin. Bêguman ew ên ku ketine îxtîlafê, derbarê (kuştina) wî de biguman in. Ji gumanê pêştir qet zanîna wan bi tiştekî din tune ye.**

[887] Alî Îmran, 3/55.
[888] Maîde, 5/117.

Bi rastî jî wan ew nekuştiye. Xwedê ew hildaye cem xwe. Xwedê serdest e, karbinecih e."[889]

Gelek alimên Îslamê, ji îfadeya "**Xwedê ew hildaye cem xwe**" ya ku di vê ayetê de dibore, angaşt kirine ku Îsa aleyhisselam nemiriye. Li gorî wan, Xwedê Teala bi qudreta xwe ew hildaye cihê wî yê taybet li ezmanên manewî, beriya qiyametê dê dîsa wî bişîne rûyê erdê. Lê Xwedê Teala di herdu ayetên ku li jor borîn de bi awayekî zelal diyar kiriye ku Îsa aleyhisselam miriye. Wekî din jî di ayeta yekem de îfadeya "**Ez ê te rakim cem xwe**", piştî "**Ez ê te bimirînim**" tê. Ango "**Ez ê te bimirînim û Ez ê te rakim cem xwe**".

Mîna ku ji vê ayetê tê fêhmê Xwedê Teala, gava ecelê Îsa aleyhisselam hatiye ew mirandiye û ruhê wî rakiriye cem xwe.

Hedîsên ku hatina Îsa aleyhisselam beriya rabûna qiyametê radigihînin hene. Hedîsek jê wiha ye:

"**Ez bi Xwedayê ku ruhê min di destê wî de ye qesem dikim ku Îsayê kurê Meryemê, dê wekî serwerekî dadwer dakeve nav we, wê xaçê bişikîne, beraz bikuje, cizyê rake, ji Îslamê pê ve tu tiştekî din qebûl neke. Dewlemendî dê gelek pir bibe ku tu kes êdî dê lê nenihêre. Lê belê secdeyek, dê ji dinyayê û ji yên tê de bi xêrtir be**."[890]

Mijara sereke di vê û yên mîna vê hedîsê de ev e: Îsa û Mehdî dê werin û misilmanên ku di nav zehmetî û buhranan de li hev gêj bûne, rizgar bikin. Heta di hedîseke din zêdeyiyeke wiha derbas dibe: "**Çawa firaqa avê bi avê tije dibe, rûyê erdê jî dê bi aştiyê tije bibe. Yekîtiya dînan dê pêk were û êdî ji Xwedê bi tenê re dê bendetî were kirin**."[891]

---

[889] Nîsa, 4/157-158.
[890] Buxarî, Enbiya, 50; Msslim, Îman, 71; Tirmizî, Fiten, 54.
[891] Îbn Mace, Fiten, 33.

Eger mirov bala xwe bidê kuştina beraz, şikandina xaç, rakirina cizya ku ji xeyrimisliman tê girtin û her kesî bike misilman ji tiştên tê angaşkirin ku Îsa aleyhisselam gava dîsa were dinyayê dê bike, tu mînakeke wê di Qur'anê tune ye. Wekî din jî peywira ku însanan bi darê zorê bikin misilman ji tu pêxemberî nehatiye dayîn. Erka wan, bi tenê ragihandin e. Xwedê Teala wiha ferman dike:

"**Wezîfeya Pêxember, tenê ragihandina peyama Xwedê ye**."[892]

"**Eger Xwedayê te bixwesta, çiqas kesên li ser erdê hene dê hemûyan bawerî bianîna. Erê ma tu yê li mirovan kotekiyê bikî, da ku baweriyê bînin?**"[893]

"**Di dîn de zordarî tune ye![894] Bi rastî serwextî (ya di dîn de) ji rêşaşiyê hatiye kifşkirin. Naxwe kî ku Taxûtî înkar bike[895] û bi Xwedê baweriyê bîne, teqez wî xwe bi qulpa saxlem (û asê) girtiye ku qetandin jê re nîn e. Xwedê bihîzer e, zana ye**."[896]

Gelek alimên Îslamê, bi sedema ku ev hedîs di Kutubê Sitte (şeş berhemên hedîsê yên navdar) diborin, qebûl kirine. Desthilatiya amadekarên (Buxarî, Muslim, Ebû Dawûd, Nesaî, Tirmizî, Îbn Mace) van berheman, di rexnekirina van riwayetan de bûye asteng.

Hedîsên bi vî şeklî, çiqas seneda wan sehîh bin jî ev angaştên han ji aliyê metnê ve bi Qur'anê re yekgirtiyekê pêk nayinin. Lewra di Qur'ana Pîroz de hatiye ragihandin ku pêxember mizgînber û hişyarker in:

---

[892] Maîde, 5/99.
[893] Yûnus, 10/99.
[894] Xulasa dîn, bawerî ye. Bingeha baweriyê qebûlkirina ji dil ango tesdîqkirina bi qelb e. Rastdêrana dil jî bi tenê mirov û Xwedê pê dizane. Ew der, cihê herî azad e bo meriv. Ji vê bonê li tu kesî kotekî nayê kirin bo pejirandin an jî mandelkirinê. 'Îbadet jî bi zorê nabe. Lewra di 'îbadetan de niyet şert e. Cihê niyetê jî dil e. Niyeta ku ji dil neyê kirin, ne meqbûl e. Ji ber ku niyet bi zorê nayê pêkanîn, 'îbadet jî nayê kirin.
[895] Li ber ên ji rê derketine, serî natewîne.
[896] Beqere, 2/256.

“**Tu, bi tenê hişyarker î. Bêguman Me tu, digel heqiyê (bi Qur’anê) mizgînber û hişyarker şandî. Tu miletek tune ye ku hişyarkerek ji bo wan nehatibe**.”[897]

“**Eger ew berê xwe jê vegerînin, bizanibe ku Me tu li ser wan wekî çavdêr neşandiyî. Erka te, bes ragihandin e. …**”[898]

“**Eger Xwedayê te bixwesta, çiqas kesên li ser erdê hene dê hemûyan bawerî bianîna. Erê ma tu yê li mirovan kotekiyê bikî da ku baweriyê bînin?**”[899]

Baweriya bi hatina Îsa aleyhisselam beriya qiyametê, kirine mijareke baweriyê. Halbukî alimên vê angaştê dikin, dibêjin ku bawerî bi hedîsên ahad nayên diyarkirin. Hedîsên ku hatina Îsa aleyhisselam radigihîn jî ahad in.

Di encamê de divê ku misilman dev ji hêviya ku “çawa be dê Îsa were û dinyayê xelas bike” berdin û bo Îslamê bi temamê hêz û qaweta xwe kar û xebatê bikin. Lewra Xwedê Teala wiha ferman dike:

“**Bêguman, heta miletek ya li cem xwe neguherîne, Xwedê, ya ku daye wî miletî naguherîne.**”[900]

“**Ji însên re ji kar û kiryarê wî pê ve tiştekî din jê re nîn e**.”[901]

668. Ma divê em ayeta 159an ji sûreyê Nîsa ya di bara Îsa aleyhisselam de çawa fêhm bikin?

Pirs: Gelo mebest ji cînavka “ه” (wî/ew) ya ku di sûreyê Nîsa ayeta 159an de derbas dibe çi ye? Lewra hin kes wê cînavkê dikin delîl ji bo hatina Hezretî Îsa berî rabûna qiyametê.

---

[897] Fatir, 35/23-24.
[898] Şûra, 42/48.
[899] Yûnus, 10/99.
[900] Re‘d, 13/11.
[901] Necm, 53/39.

Bersiv: Kesên dibêjin ku Hezretî Îsa dê dîsa were, cînavka "ﻩ" (wî/ew) bi bal Îsa alyehisselam vedigerînin. Li gorî vê nêrînê cînavk, wî nîşan dide. Di zimanê 'Erebî de cînavk ê/a herî nêz nîşan dide, da ku yê/ya dûr nîşan bide hewcedarî bi qerîneyekê heye. Ya nêzî cînavkê, bêjeya ehlikitêb e. Dema cînavk bi bal wê ve vegere, ev wate derdikeve holê:

"**Ji yên ehlikitêb tu kes nîn e ku berî mirinê, bi Îsa baweriyê neyine**."

Di vir de meqsed ji yên ehlikitêb, Cihû ne. Ev jî tê wateya ku ew, heta bimirin dê di derbarê Îsa aleyhisselam de bigihîjin qenaetekê. Ango her Cihû berî mirina xwe dê pê baweriyê bîne.

Baweriya wan a pê, nayê wateya ku dê vê baweriyê bijîn. Dema hûn bi kûrbînî li Qur'anê binihêrin, hûn ê bibînin temamê kafiran li ser tiştên ku divê pê baweriyê bînin bi borîna demê re qenaeteke tam bi wan re çêdibe. Ji ber ku piştre li gorî wê tevnagerin, nikarin xwe li pêşberî Xwedê Teala biparêzin. Lewra dewama ayetê vê yekê îsbat dike: "**Roja qiyametê dê li ser wan, bibe şahid.**" Eger hîn qinyata ku Îsa aleyhisselam Pêxember e bi wan re çênebûbe bimirin, wê gavê ev di aleyhê wan de nabe hincet. Lewra tu kes, ji tiştê zêdeyî hêza xwe berpirsyar nayê girtin.

Tu qerîneyeke ku vegera vê cînavkê bi bal Îsa aleyhisselam ve pêwîst bike jî tune ye. Li berevajî vê yekê, asteng heye. Ev jî ev e: Eger Îsa aleyhisselam dê berî rabûna qiyametê dîsa sax bibe, piştre jî temamê ehlikitêb dê pê bawer bikin; wê gavê divê temamê ehlikitêban jî ji nûve sax bibin da ku pê baweriyê bînin. Lewra ayet dide nîşandan ku dê tu yek ji wan jî paşde nemînin. Eger bê gotin, bi tenê yên ku di gava saxbûna wî de dê pê baweriyê bînin, ev tê wateya ku yên berî vê jiyane bê baweriya pê mirine. Ev qerîneyeke girîng e ku dibe asteng bo vegerandina cînavkê bi bal Îsa aleyhisselam ve.

669. Ma Hz. Îsa, ji nesla Hz. Îshaq tê?

Pirs: Çend roj berê di bernameyeke televîzyonê de we got ku Hezretî Îsa, ji nesla kurê Hezretî Îbrahîm, Hezretî Îshaq tê. Lê, Hezretî Îsa, ma bê bav nehatibû dinyayê? An jî Hezretî Meryem, ji nesla Hezretî Îshaq e?

Bersiv: Diya me Meryem ji nesla Harûn aleyhisselam e. Ew jî ji nesla Îshaq aleyhisselam e. Xwedê Teala wiha ferman dike:

"**Ey xweha Harûn! Bavê te ne mirovekî xerab bû û dayika te jî ne pîrekeke dawpîs û nebaş bû**."[902]

Gotina "**xweha Harûn**", şêwazeke îfadekirinê ye li cem 'Ereban tê bikaranîn; bo nîşandana ku ew, ji nesla Harûn e.[903]

Di sûreyê Meryem de piştî behsa Îsa aliyhisselam behsa çend pêxemberên din jî tê kirin û wiha tê fermankirin:

"**Ha evên ha, ew ên ku Xwedê nîmet daye wan; ji pêxemberên ku ji kinêsa Adem in û ji yên ku Me ew digel Nûh (li keştiyê) siwar kirin û ji kinêsa Îbrahîm û Îsraîl (Yaqûb) û ji yên ku Me ew anîne ser rêya rast û Me ew bijartine. Dema ayetên (Xwedayê) Rehman ji wan re tên xwendin (ji tirsa Xwedê) bi girî diçin sicûdê**."[904]

Ha ev ayet jî dide nîşandan ku Îsa aleyhisselam ji nesla Hezretî Îshaq tê.

670. Divê em ayeta "Îsa, ji bo qiyametê zanînek e", çawa fêhm bikin?

Pirs: Di derbarê Îsa aleyhisselam de Xwedê Teala di ayetekê de wiha ferman dike: "Bêguman ew, ji bo qiyametê zanînek e. Nexwe derbarê wê de nekevin gumanê

---

[902] Meryem, 19/28.
[903] Ev nêrîna han di tefsîra Îbn Kesîr de wekî nêrîna 'Elîyê kurê Ebî Telha û Suddî hatiye dayîn. Bnh: Îbn Kesîr, thq: Seyyid Muhemmed Seyyid, Wecih Muhemmed Ehmed, Mustefa Fethi 'Ebdullhekim, Seyyid Îbrahim Sadiq. Qahire 1426/2005, V, 233.
[904] Meryem, 19/58.

û li dû Min werin. rêya rast û durist, ev e." (Zuxruf, 43/61) Em dikarin bibêjin ku ev ayet, nîşaneke vekirî ye li ser hatina Hezretî Îsa beriya rabûna qiyametê. Lewra Îsa aleyhiselam, berî daketina Qur'anê bi şeş qirnan jiyaye. Ji ber vê yekê em nikarin jiyana wî ya pêşîn "bo qiyametê zanînek e" ango nîşana qiyametê fêhm bikin. Wateya ku ayet bi bal ve îşaret dike, Hezretî Îsa di axirzeman de ango di demên berî rabûna qiyametê de careke din dê were ser rûyê erdê û ev jî dê bibe nîşaneke qiyametê. (Ya rasttir her Xwedê dizane)

Bersiv: Xwedê Teala di ayeta li jor borî radigihîne ku Îsa aleyhiselam, ji bo qiyametê zanînek e. Bo têgihîştina vê yekê, divê em li afirandina Îsa aleyhisselam binihêrin. Hezretî Îsa, bê bav hatiye dinyayê. Xwedê Teala diyar dike ku afirandina wî, mîna afirandina Adem aleyhisselam e.

"**Bêguman li cem Xwedê, rewşa Îsa wekî rewşa Adem e. Xwedê ew ji axê afirand, piştre jê re got: "Çêbibe!" Vêca ew jî çêbû**."[905]

Adem aleyhisselam ji axê hatiye afirandin. Dayika wî tune bû. Gelo çima Xwedê Teala ew, bi Îsa mînand. Lewra ax, mîna Meryemê jê re dayiktî kiribû. Aliyê herduyan ê wekhev, ku bê bav hatibûn dinyayê. Roja qiyametê rabûna însanan ji goran jî dê wiha pêk were. Ango bê bav, lê ji axa ku wesfê dayikê di xwe de digire. Îsa aleyhisselam ji vî aliyî ve, zanînek e bo qiyametê. Xwedê Teala, ji bo kesên ku vejînê qebûl nakin, wê ne mumkin dibînin, mînaka Hezretî Îsa aniye. Afirandina Îsa çawa çêbûbe, ya Adem jî wiha bûye; ji lewre vejîna we jî dê wiha çêbibe.

Mîna ku tê dîtin ayet, behsa ku dê Îsa aleyhisselam berî rabûna qiyametê careke din were, nake.

671. Ma Hz. Îsa wefat kiriye yan ketiye xewê?

Pirs: Di ayetên di derbarê Îsa aleyhisselam de bêjeyên "muteweffîke" û "teweffeytenî" yên ku ji koka wefat/mirinê hatine çêkirin, derbas dibin. Ev bêje, di

[905] Alî Îmran, 3/59.

hin ayetan de bi wateya "mirandinê", "girtina ruh", di hin ayetan de jî (mîna ayeta 60an ji sûreyê En'am) bi wateya "Xwedê mirov bixe xew", "razanê" hatiye bikaranîn. Ji ber vê yekê hin kes angaşt dikin û dibêjin ku Îsa aleyhisselam nemiriye, lê hatiye razandin û beriya rabûna qiyametê dê bê hişyarkirin û bi bal dinyayê ve were şandin. Gelo hûn bersiva vî tiştî çawa didin?

Bersiv: Xwedê Teala wiha ferman dike:

"**Xwedê got: Hey Îsa! Bêguman Ez ê te bimirînim û Ez ê te rakim cem xwe. Ez ê te ji yên kafir pak û paqij bikim. Û ew ên ku dane pey te, heta roja qiyametê Ez ê wan bi ser ên kafir bixim.[906] Piştre, vegera we bi bal Min ve ye. Di bara ya ku hûn bi hev ketine de Ez ê di navbera we de hikum bikim**."[907]

Koka wefatê, wefa (وفى)ye. Wefa, di zimanê 'Erebî de bi wateya "gihiştina tiştekî bi temamî" ye. Mirandin (توفى); "dan temamkirina kar e". Ji ber ku di gava mirin an jî xewê de tu karekî ku ruh bike namîne, Xwedê, wî ji bedenê vediqetîne. Ji lewre însan du caran wefat dike; yek gava ku dikeve xewê, ya din jî di gava mirinê de. Xwedê Teala wiha ferman dike:

"**Xwedê, nefsên ku çaxa mirina wan tê distîne û yên nemirîne jî di xewê de (wan distîne). Vêca ya ku Xwedê li serê bi mirinê hikum kiribe digire, ya din jî heta demeke navlêkirî wê berdide (bedenê).**"[908]

Em ji vê ayeta li jêr dizanin ku wefata Îsa alyehisselam, mirina wî ye:

"(**Xwedê rojekê dê wiha bibêje:) Ey Îsayê kurê Meryemê! "Ma te ji mirovan re got ku min û dayika min di navbera xwe û Xwedê de du îlah wergirin?" (Îsayê kurê Meryemê) dê wiha bibêje: "Haşa! Ez Te ji hemû kêmasiyan pak didêrim. Ya**

[906] Ên ku dane pey Îsa, ne ew Filehên ku wî kurê Xwedê Teala dihesibînin û bi vî awayî dibin muşrik. Belbî ew Mislimanên ku wî pêxemberê Xwedê qebûl dikin.
[907] Alî Îmran, 3/55.
[908] Zumer, 39/42.

ji min re ne durist be, ne heqê min e ku ez bibêjim. Eger min ew gotibe, bêguman Tu pê dizanî. Tu ya di dilê min de dizanî û ez ji nihêniyên Te tu tiştî nizanim. Bêguman her Tu yî zanayê bi ya nediyar û nihênî. Bi tenê tiştê ku Te emrê min pê kir, min ji wan re got: ku ji Xwedayê ku Perwerdegarê min û Perweredegarê we ye bi tenê re bendetiyê bikin. Heta ku ez di nav wan de bûm, ez li ser wan zêrevan bûm. Çi gava Te ez mirandim, êdî Tu li ser wan çavdêr bû. Jixwe Tu li ser her tiştî bîner î."[909]

Îfadeya "**Çi gava Te ez mirandim**" ya ku di ayetê de derbas dibe, dide nîşandan ku Îsa aleyhisselam ne di xew de ye, belbî miriye.

672. Ma ruhê Hz. Îsa yan jî bedena wî hatiye bilindkirin?

Pirs: Ez dixwazim di bara rakirina Îsa aleyhisselam de bipirsim. Di ayeta 55an ji sûreyê Alî Îmran û ayeta 158an ji sûreyê Nîsa tê derbas dibe ku Îsa aleyhisselam bi bal Xwedê ve hatiye bilindkirin. Ev, bilindkirina bedenê ye yan jî giyanê wî hatiye bilindkirin?

Bersiv: Ya hatiye bilindkirin ne beden e, giyan e. Ruhê her miriyê bawermend tê bilindkirin. Ên nayên bilindkirin, giyanê kesên kafir in. Xwedê Teala wiha ferman dike:

"**Bêguman ew ên ku bi ayetên Me bawerî neanîne û xwe mezin dîtine, deriyên asîmanan li wan venabin û heta ku hêştir di qulika derziyê re derbas nebe jî ew nakevin bihuştê. Her wisa em gunehkaran ceza dikin**."[910]

Ruhê Îsa aleyhisselam jî hatiye bilindkirin. Di ber sikratê de gotina Pêxemberê me (s.a.w) ya dawî, ev bûye:

"*Ey Xwedayê min! Min têxe refîqî e'la…*" ango "Ez dixwazim di cihê herî bilind ji cenetê de bim."[911]

[909] Maîde, 5/116-117.
[910] E'raf, 7/40.

Ruhê şehîdan jî dê di baxçe û bostanên bihuştê de bin. Bo vê yekê ka em li sûreyê Yasîn binihêrin:

"Di vê navê de ji dûrî wî bajarî zilamek bi bez hat û got: Hey gelê min! Bidin pey van qasidan!

Bidin pey van ên ku li ser rastiyê ne û tu heqdestî (ucretê) ji we naxwazin.

(Zilam) Got: Ma çi li min qewimiye ku ez 'îbadeta wî Xwedayê ku ez afirandime nekim? Jixwe hûn ê bi bal ve bên vegerandin.

Erê ma ez ê ji bilî Xwedê, (ji xwe re) îlahekî din bigrim? Eger Rehman ji bo min zirarekê bixwaze, mehdervaniya wan dê fêdeya tiştekî nede min. Ew qet nikarin min rizgar jî bikin.

Wê çaxê ez di rêşaşiyeke aşkere de me.

Bêguman min bawerî bi Xwedayê we anî; vêca li min guhdarî bikin.

(Zilam kuştin) Jê re hat gotin: "Têkeve bihuştê!" Got: "Xwezî gelê min ev bizanibûya;

ku Xwedayê min ez xefirandime û ez gerandime ji yên ku qencî li wan bûye."[912]

Ruhê temamê bawermandan dê di baxçeyên bihuştê de bin. Xwedê Teala wiha ferman dike:

"**Ew ên ku di rewşeke baş de bin û firîşte ruhê wan distînin (ji wan re) dibêjin: "Silav li ser we be! Ji ber kar û kiryarên ku we kirine de herin bihuştê.**"[913]

---

[911] Buxarî, Mexazî, 84.
[912] Yasîn, 36/20-27.
[913] Nehl, 16/32.

Ceneta di vir de ne ev bihuşta ku li axretê dê biçinê. Lewra di tu ayetên têkildar de nayê gotin ku dê her û her tê de bin. Ev, ceneta gorê, ango baxçeyek ji baxçeyên bihuştê ye.

Beden Nayê Bilindkirin, Dê Bibe Ax

Di Qur'anê di derheqê bedenê de wiha tê fermankirin:

"**Hûn ê li ser erdê bijîn, lê bimirin û hûn ê jê bên deranîn**."[914]

"**Me hûn ji axê afirandine, Em ê we lê vegerînin û careke din jî Em ê we jê derînin**."[915]

Pêxember, ji van ayetan nehatine îstisnakirin.

Ji ber ku Xwedê Teala bo Îsa aleyhisselam gotiye "**Ez ê te ji yên kafir pak û paqij bikim.**"[916], bedena wî radestî neyarên wî nekiriye. Bûyereke mîna vê, di dema Pêxemberê me (s.a.w) de qewimiye. Wî, deh kes bi dîdevanî peywirdar kiriye û Asimê kurê Sabit jî kiriye fermandarê wan.

Li girekî biçûk di navbera Usfan û Mekkeyê de ji aliyê sed tîravêjan ve tên dorpêçkirin, digel Asim heft kesên din tên kuştin, sê kes jî dîl tên girtin.

Ji ber ku Asim di cenga Bedrê de girerigekî Qureyşiyan kuştiye, Mekkiyên ku ji bûyerê agahdar dibin zilamên xwe dişînin da ku ji bedena wî parçeyekî bidest bixin. Lê belê Xwedê, moz li ser bedena wî kiriye mîna sihê, ew parastine û ew ên ku hatine parçeyekî ji bedena wî bigirin serfiraz nebûne.[917]

673. Ma Hz. Îsa di zarokatiya xwe de bûbû pêxember?

Pirs: Ma Hezretî Îsa di dema zarokatiya xwe de pêxember bû?

---

[914] E'raf, 7/25.
[915] Taha, 20/55.
[916] Alî Îmran, 55.
[917] Bnh: Buxarî, Mexazî, 28.

Bersiv: Ji axaftina Îsa aleyhisselam bi awayê mucîze di zarokatiya xwe di dergûşê de û ji gotina wî ya "**Got: Ez bendeyê Xwedê me. Wî kitêb daye min û ez kirime pêxember**." **(**قَالَ إِنِّي عَبْدُ اللَّهِ آتَانِيَ الْكِتَابَ وَجَعَلَنِي نَبِيًّا**)**[918], tê fêhmkirin ku di zarokatiya xwe de ji bo pêxemberiyê hatibû hilbijartin. (Herwiha li ayeta 110an ji sûreyê Maîde jî binihêrin.)

674. Ma bi rastî Hz. Îsa di dergûşê de xeber daye?

Pirs: Di ayeta 29an ji sûreyê Meryem, dema ji diya me Meryem hin pirsan dikin, ew bi bal kurê xwe Îsa ve îşaret dike, da ku jê bipirsin. Li ser vê yekê gelê wê gotin: "**Em ê çawa bi zarokekî dergûşê re bipeyivin?**" Hin seyda vî tiştî bi awayê kinaye "Ew hîn zarokê do ye, ma em ê bi zarokê dergûşê re bibin muxateb" fêhm dikin û dibêjin ku bi rastî Îsa aleyhisselam di wê gavê de, ne zarok bû, belbî navsere bû. Gelo ramana we di derbarê vê nêrînê de çi ye?

Bersiv: Çewtî û şaşiya nêrîna ku îfadeya di ayeta 29an ji sûreyê Meryem "**zarokekî dergûşê**" (فِي الْمَهْدِ صَبِيًّا) derbas dibe, mecaz/kiyane ye û di wê gavê de Îsa aleyhisselam mezin bûye, ji ayetên din ên bi mijarê re têkildar in derdikeve holê. Ayetên têkildar wiha ne:

"**Dema firîşteyan got: Hey Meryem! Xwedê bi gotineke ji cem xwe mizgîniyê dide te ku navê wî Mesîh; Îsayê kurê Meryemê ye. Hem li dinyayê, hem jî li axretê rûmetdar û ji yên nêzî Xwedê ye. Îsa, di dergûşê de û di navseretiyê de jî bi mirovan re dê bipeyive û ew ê bibe ji salihan**."[919]

[918] Meryem, 19/30.
[919] Alî Îmran, 3/45-46.

"Wê rojê Xwedê dê bibêje: Ey Îsayê kurê Meryemê! Ew qencî û kerema ku Min li te û dayika te kiribû bîne bîra xwe. Min bi Canê Pak (Cibraîl) piştgiriya te kir. Tu di dergûşê de û piştî tu mezin bûyî jî bi mirovan re dipeyivî…"[920]

Di van herdu ayetên dawî de hatiye diyarkirin ku Îsa aleyhisselam hem di zarokatiya xwe de hem jî piştî ku mezin bibe ango di "dergûş û navseretiyê de" dê bi muxatebên xwe re bipeyive. Îfadeya ku di ayeta yekem de (Alî Îmran, 3/45-46) dibore ji aliyê firîşteyan ve, ya duyem jî (Maîde, 5/110) rasterast ji aliyê Xwedê Teala ve hatiye gotin û di vê de tu rewşa heqaret û biçûkdîtinê jî tune ye.

Ev jî dide nîşandan ku îfadeya di ayeta "**Gotin: Em ê çawa bi zarokekî dergûşê re bipeyivin?**" (قَالُوا كَيْفَ نُكَلِّمُ مَنْ كَانَ فِي الْمَهْدِ صَبِيًّا)[921] de dibore, ne mecazî ye, belbî bi wateya heqîqî ye.

[920] Maîde, 5/110.
[921] Meryem, 19/29.

BEŞA HEŞTEM

- **TEDAWIYA BI RÊYA BIOENERJIYÊ**
- **XWEKUJÎ**
- **AJAL**
- **MUDAXELEYA GENAN**
- **HEVZAYENDÎ**
- **ASTENGDAR**

TEDAWIYA BI RÊYA BIOENERJIYÊ

675. Gelo dermankirina bi rêya bioenerjiyê, mumkin e?

Pirs: Bioenerjî mîna ku hûn jî dizanin, ji azîneyeke ku însan ji bo tedawî û dermankirinê, wê li xwe bar bikin û dest bikaranîna bioenerjiyê dikin re tê gotin. Tê gotin ku însanan ji hin nexweşî û nerihetiyan xelas dike û dibe wesîle ji bo şifaya wan. Gelo ikaranîna vî tiştî di dînê me de caiz e? Û di halê ku mirov vê vejenê li xwe bar bike îhtimala ku bibe sihr û efsûn heye yan na?

Bersiv: Sihr, ji derew û îftirayên ku mirov sedemên rasteqîn û heqîqî yên bûyerekê veşêre û aşkere neke da ku bandorê li mirovan bike û berê wan bide rêyên şaş, pêk tê. Bi wê rêyê dermankirin ne pêkan e. Eger bi rêya bioenerjiyê mumkin be ku mirov fêdeyê bibîne û hin nexweşî û nerihetî bi wê rêyê bên dermankirin, di bikaranîna wê de tu mehzûr tune ye. Lewra esil di tiştan ku mubah ango helal bin. Ji bo herambûna wê delîl lazim e, di mijara bioenerjiyê de jî tu qedexe tune ye.

676. Ma bikaranîna kevirên bi şîfa, guneh e?

Pirs: Kevirekî bi navê "Qristal Kuars" heye. Birayê min her roj wî dixe destê xwe û dibêje "Min niyet anî ji bo tiştê di dilê xwe de û ji bo şifayê" piştre li kevir dinihêre û wiha dibêje: "Ez bextewar im, ez bihuzûr im, pereyê min pir hene, ez dewlewmend im" û hwd. Kesê kevir dabû birayê min, jê re gotibû ku "kevirê Qristal Kuarsê her roj têxe destê xwe û wî bi gotinan 'eyar bike." Û gotiye ku "Dema tiştên tu dixwazî, mîna ku çêbûbe tu ji kevir re bibêjî gotinên te dê pêk werin." Mesela: Eger tu wesayîtê bixwazî, bibêje "wesayita min heye." Hukmê xwestina tiştekî bi vî awayî çi ye?

Bersiv: Kevirên mirov bawer dikin ku şifayê didin, di bikaranîna wan tu mehzûrek tune ye. Wekî azîneyeke dermankirinê durist e ku mirov wê qebûl bike. Lê

belê ‘eyar û bernameckirina keviran, di dînê me de tu cih jê re tune ye. Tiştên ku mirov dixwaze çêbibin, ji keviran re bibêje û mirov ji wê, li benda encamdayînê bisekine, ev tişt li dijî dînê Îslamê ye.

Dema mirov li ayetên Qur’ana Pîroz dinihêre, çi yên ku dinyayê dixwazin û çi jî yên ku axretê dixwazin, tê dîtin ku divê ji bo xwesitinên xwe xebatê bikin. Ev, qanûna Xwedê Teala ye. Xwedê Teala di vî babetî de tu ferq nexistiye navbera misilman û kafiran. Xwedê wiha ferman dike:

“Ê ku dinyayê bixwaze, ji bo kesê ku Em bivên a ku em bixwazin Em ê bi lez bidinê. Piştre jî Em ê wî riswa û qewitî têxin dojeha ku dê têkevê.

Ê ku axretê bixwaze û bawermend be û lezê li kirina karê wê bike, vêca xebata wan tê qebûlkirin.

Em ji dayîna Xwedayê te didine tevan; yên ku cîhanê dixwazin û yên ku axretê jî dixwazin. Dayîna Xwedayê te li ser wan nehatiye birîn.”[922]

“**Kî nîmetê dinyayê bixwaze, Em ê wê bidinê; kî jî yê axretê bixwaze Em ê wê bidinê û Em ê spasdaran xelat bikin**.”[923]

“**Çi kesê jiyana dinyayê û xemla wê bixwaze, Em ê bêkêmasî, beranberî karên wan li dinyayê bidin wan û li dinyayê tiştek li wan nayê kêmkirin, lê belê ji bo wan li axretê ji êgir pê ve tiştekî din tune ye û ya ku wan li dinyayê kir berhewa çû û hemû karê ku wan kir pûç û betal bû**.”[924]

“**Kî qezanca axretê bixwaze, Em ê qezanca wî jê re zêde bikin. Kî jî deskeftiyên dinyayê bixwaze, Em ê ji wê tiştekî bidinê û li axretê jê re tu parek tune ye**.”[925]

---

[922] Îsra, 17/18-20.
[923] Alî Îmran, 3/145.
[924] Hûd, 11/15-16.
[925] Şûra, 42/20.

"Hin mirov hene ku dibêjin: 'Xwedayê me! Li dinyayê bide me.' Rewş ev e ku di axretê de ji bo wî tu par tune ye.

Hin jî hene ku dibêjin: 'Xwedayê me! Li dinyayê qenciyê û li axretê jî qenciyê bide me û me ji azara êgir biparêze.'

Evên hanê! Ji bo her yekî ji wan ji tiştên ku bi dest xistine parek heye. Teqez hesabdîtina Xwedê pir bilez e."[926]

"Ji însên re ji kar û kiryarê wî pê ve tiştekî din jê re tune ye.

Ew ê kar û kiryarê xwe paşê bibîne.

Piştre Xweda dê bedêla kar û kiryarên wî bêkêmasî bidê."[927]

"Çi mêr be çi jin, kî karekî qenc bike û bawermend be, teqez Em ê jiyaneke xweş bikin para wî û Em ê xelata wan bi spehîtirîn a ku dikin, bidin wan."[928]

[926] Beqere, 2/200-202.
[927] Necm, 53/39-41.
[928] Nehl, 14/97.

XWEKUJÎ

677. Hukmê întihar/xwekujiyê çi ye?

Pirs: Gelo hukmê întihar/xwekujiyê çi ye? Ma kesê xwe bikuje, dibe dojehî?

Bersiv*:* Întihar, xwekujî ye. Xwedê Teala bi awayekî teqez ev qedexe kiriye û ferman kiriye ku **"xwe nekujin."**[929]

Kesên ku li hemberî pirsgirêkan ditengijin, hêvî û baweriya xwe winda dikin û tu rêyekê ji bo çareseriyê nabînin, dibe ku berê xwe bidin întiharê. Kesê misilman, ne pêkan e ku têkeve rewşeke wisa. Xwedê Teala wiha ferman dike:

"… **Hêviya xwe ji rehma Xwedê qut nekin. Lewra ji desteya kafir pê ve tu kes hêviya xwe ji rehma Xwedê nabire**."[930]

Di sûreyê Hicr de ev gotinên han ji devê Hezretî Îbrahîm derdikevin:

"… **Qey ji rêşaşan pê ve kî hêviya xwe ji rehma Xwedê dibire?**"[931]

Di ayeteke din de wiha tê fermankirin:

"**Însan, ji xwestina xêrê qet naweste. Lê belê eger xerabiyek bi ser de bê di cî bêzar dibe, hêviya xwe winda dike**."[932]

Ebû Hureyre (r.j.x) radigihîne ku Qasidê Xwedê (s.a.w) wiha gotiye:

"*Kî xwe ji serê çiyayekî biavêje û întihar bike, ew, di agirê dojehê de her xwe diavêje. Heta bi hetayê li ser vê rewşê dewam dike. Kî bi vexwarina jehrê xwe bikuje, di agirê dojehê de jehra wî di dest de ye û vedixwe. Heta bi hetayê wiha didomîne. Kî bi parçeyekî ji hesin întihar*

[929] Nîsa, 4/29.
[930] Yûsuf, 12/87.
[931] Hicr, 15/56.
[932] Fussîlet, 41/49.

*bike, di agirê dojehê de hesinê wî di dest de û her li xwe dixe. Heta bi hetayê wiha dewam dike***."**[933]

Ebû Hureyre, ev hedîs jî ji Qasidê Xwedê ragihandiye:

"*Kesê bi rêya xeniqandinê xwe bikuje, di dojehê de jî xwe dixeniqîne. Kesê bi rêya têbirina tiştekî întihar bike, di agirê dohejê de jî wî tiştî di xwe re dike. Kesê xwe ji bilindahiyê avêtibe, di dojehê de jî xwe ji jor ve diavêje*."[934]

Sehlê kurê Se'd (x.j.q) wiha radigihîne:

"Resûlê Xwedê aleyhiselam, rastî muşrikan hat û bi wan re ceng kir. Qasidê Xwedê paşve vekişiya, bera din jî vekişiya. Di nav hevalên Qasidê Xwedê de yek hebû ku bi tena serê xwe dabû pey dijmin û bi şûrê xwe li wan dida. Hate gotin ku karê wî îro kir, tu kesî ji me nekir.

Qasidê Xwedê got ku: "*Lê belê ew, dojehî ye*." Yekî got ku: Ez ê her wî bişopînim. Piştre pêre derket. Ew li ku sekinîbe, ew jî li wir sekinî. Gava lez kir jî wî jî pêre lez kir. Zilam, derbeke giran xwar. Da ku zû bi zû bimire şûrê xwe danî erdê û serê şûr jî danî nav herdu pêsîrên xwe. Paşê bi temamê hêza xwe, xwe bi ser şûr de avêt û întihar kir. Zilam hat hizûra Qasidê Xwedê û got ku: "**E**z şahdeyiyê didim ku bi rastî jî tu qasidê Xwedê yî."

Qasidê Xwedê got: "*Çi bi te hatiye?"*

Zilamî gotina xwe wiha berdewam kir: "Berî çendekî zilamekî ku te gotibû ew dojehî ye hebû. Herkes li hemberî vê rewşê matmayî mabûn. Min gotibû ku ez ê vê rewşê diyar bikim. Min da pey wî. Bi derbeke giran birîndar ket. Xwest ku wextekê berî wextekê bimire. Destikê şûr danî erdê, serê wî jî xist nav herdu pêsîrên xwe. Piştre bi temamê hêza xwe, xwe bi ser şûr de avêt û xwe kuşt."

[933] Buxarî, Edeb, 44, 73, Tib 56; Muslim, Îman, 175, 177; Tirmizî, Îman, 16, Tib 7.
[934] Buxarî, Cenaiz, 83.

Li ser vê yekê Qasidê Xwedê wiha got:

"*Dibe ku yek di nav însanan de helwestên ku mîna ew bihuştî be nîşan bide, lê belê di rastiyê de ew dojehî ye. Yekî din jî dibe ku di nav însanan de helwestên ku mîna ew dojehî be nîşan bide, lê bêlê di rastiyê de ew bihuştî ye*."[935]

[935] Buxarî, Mexazî, 38.

AJAL

678. Heywanên zirarê didin însanan, ma divê ku bên kuştin?

Pirs: Ma ajalên zirarê didin însanan, divê ku bên kuştin?

Bersiv: Bi rastî jî eger dê heywan zirarê bide meriv, da ku xwe biparêze mirov dikare wê heywanê bikuje. Lê belê eger heywan zirarê nade meriv, sirf bi gotina "ev ajal bo însan bi zirar e" nayê kuştin; ev kirin, guneh e.

679. Ma xesandina heywanên kedî durist e?

Pirs: Ji aliyê dînî ve, gelo hukmê eqîmkirina pisîkên kedî yên ku li malan tên xwedîkirin çi ye? Di vê mijarê de ma tu fetwa heye? Pisîka li malê tê xwedîkirin, dixwaze derkeve dervê xanî û ji ber pirsgirêkên derdorê rastî xeterên curbicur tê. Lê di heman halî de bi xesandinê jî rewşa wê ya siruştî tê xerakirin. Di dînê me de bo vê mijarê, ma çi biryar hatiye dayîn?

Bersiv: Ajalên ku xesandin, dê tu fêdeyê nede wan û heta dê zirarê jê bibînin, ne durist e. Lê rewşa pisîk û heywanên kedî yên ku li malan tên xwedîkirin, cuda ye. Lewra heywanên ji vî celebî, dema bi ajalên ne ji hawirdora xwe re kom dibin, dibe ku bi nexweşiyên celeb celeb bikevin û ev nexweşî bibe sedemê kurtbûna temenê wan. Stewrkirin ji bo heywanên bi vî awayî, ji zirarê bêhtir fêdeyê pêk tîne û heta tê gotin ku temenê wan dirêj jî dike. Ji ber vê yekê heywanên wiha, li gorî rêgeza "rakirina zirarên ku mumkin e were serê wan û pêkanîna fêdeyê bo wan", divê ku xesandin caiz be.

MUDAXELEYA GENAN

680. Ji bo tayînkirina cinsiyetê ma mirov dikare di genan de mudaxele bike?

Pirs: Di teknîkên ku nû pêşve dikevin bi rêya mudaxeleya li ser hin genan xebatên ji bo guhertina zaroka ku dê çêbibe tên kirin. Tê angaştkirin ku bi saya vê xebatê mêr û jin, li gorî daxwaza dilê xwe dê bikaribin bibin xwedî keç an jî kur. Li gorî dînê me kar û xebateke wiha gelo durist e?

Bersiv: Ev, mîna xebateke ku ahenga xwezayî xera dike xuya dike. Xebatên însanan ên ku ahenga xwezayî xera dikin her gav bi encamên bi zirar û ziyan bi dawî bûne. Di Qur'ana Pîroz de wiha hatiye fermankirin:

"**Birastî Me her tişt bi pîvan afirandiye**."[936]

Eger pîvan û aheng xera nebe, dê her tişt bedew û xweşik bimîne. Xwedê Teala wiha ferman kiriye:

"**Ew Xwedayê ku her tişt bedew afirandiye û afirandina însên jî ji heriyê dest pê kiriye.**

Piştre zuriyeta wî ji dilopek ava lawaz çêkiriye.

Piştre dirûv dayê; durist kir û ji ruhê xwe pif kirê. Ji we re guh, çav û dil çêkirin. Dîsa jî hûn çiqas hindik dişêkirînin."[937]

Bi tenê beşer dikarin ahenga xwezayî biguherînin. Ji wan pê ve tu mexlûqên din dikarin tiştekî wiha bikin. Di ayetê de wiha tê fermankirin:

"**Ji ber tiştên ku mirovan bi destên xwe kirin, xerabî li bej û deryayê xuya bûye, Ev, da ku hinekî ji ya ku kirin bi wan bide tamkirin, dibe ku ew (ji kirinên xwe) vegerin.**"[938]

---

[936] Qemer, 54/49.
[937] Secde, 32/7-9.

Mîna ku tê zanîn Xwedê Teala du rê dane pêşiya mirovan. Yek jê ku mirov li gorî rêbaz û qanûnên Îlahî helwestan nîşan bide, ya din jî ku mirov berê xwe bide helwestên nelirê. Ji ber ku aferînerê xwezayê Xwedê Teala ye, hemû tiştên ku em dibêjinê "Qanûnên xwezayî" qanûneke îlahî ye.

Xwedê Teala, destûr daye Şeytan ku li dijî qanûnên îlahî propagandayê bike. Di ayetê de wiha tê fermankirin:

"**Şeytan got: … ez ê li wan ferman bikim, vêca ew ê afirandina Xwedê biguherînin**."[939]

Ji ber van sedeman, guhertina cinsiyeta zarokê û bidestxistina îmkana ku mêr û jin li gorî daxwaza dilê xwe bibin xwedî kur an jî keç bi rêya mudaxelekirina di genan ji aliyê ku dibe wesîleya xerabûna ahenga xwezayî, durist nayê dîtin.

"**Serweriya erd û asîmanan her ji Xwedê re ye. Ew çi bivê wê diafirîne. Ew kê bivê keçan û kê jî bivê lawan didiyê. Yan jî kur û keçan cêwî dide wan. Kê jî bivê bernegir dihêle (ne kur ne jî keç jê re çêdibin). Bêguman Ew zana û kara ye**."[940]

[938] Rûm, 30/41.
[939] Nîsa, 4/119.
[940] Şûra, 42/49-50.

ASTENGDAR

681. Ma di Qur'anê di derbarê çêbûna bi qusûr de, tu agahî hene?

Pirs: Gelo di Qur'ana Pîroz de di derbarê çêbûna ji dayikê bi kêmasî/seqetî, tu ayet hene?

Bersiv: Di Qur'ana Pîroz de di vê mijarê de rasterast tu ayet tune ne. Lê belê, dema mirov li ayetên jêr bihizire û hûr bifikire, ji bo îmtihana jiyana cihanê bal tê kişandin ser hin seqetî û kêmasiyên bedenî; encax ev kêmasî mîna qusûran nayên qebûlkirin. Lewra Xwedê Teala, seqetî û kêmasiyên bedenî ji korî, kerîtî û hwd. mîna qusûrên rastîn qebûl nake; belbî qusûrên rastîn ku mirov li hember heqiyê bi zanebûn koritî û kerîtiyê bike. Xwedê Teala wiha ferman dike:

"**Sond be; Em ê bi hinekî ji tirsê û birçîbûnê, bi kêmkirina mal û can û kêmkirina mêweyên we, we îmtîhan bikin û mizgînê bide yên sebirkêş**."[941]

"… **Lê birastî, ne ku çav kor dibin, lê belê dilên ku di sîngan de ne, kor dibin**."[942]

Li aliyê din di Qur'anê de ji bo kesên xwedî seqetî û qusûrên bedenî pir hêsanî hatine nîşandan. Ayetên têkildar wiha ne:

"**Li ser lawaz û nexweşan, li ser ew ên ku tu tiştî nabînin ku ji bo cîhadê xerc bikin tu guneh nîn e, bi şertê ku bi Xwedê û Qasidê Wî re rast bin. Ji yên xwedî qencî tu gazin nayê kirin. Xwedê bi xwe gunehjêbir e, dilovîn e**."[943]

"**Li ser ê kor, li ser ê kulek û li ser ê nexweş tu zehmetî tune ye."**[944]

---

[941] Beqere, 2/155.
[942] Hec 22/46.
[943] Tewbe, 9/91.
[944] Nûr, 24/61. Ango kiryarên ku ew nikaribin bikin li wan nayêne barkirin; û ji ber nekirina wan nabin gunehkar.

"**Li ser koran tu guneh tune ye, li ser seqetan tu guneh tune ye û li ser nexweşan jî tu guneh tune ye. Kî bi gotina Xwedê û Qasidê Wî bike, Xweda dê wî bixe bihuştên ku di binê wan de çem diherikin. Kî jî li paş bimîne, Xwedê dê bi ezabekî dijwar û xemnak wî ceza bike**."[945]

682. Kesê kor, gelo dikare li pêşiya cemaetê îmamtiyê bike?

Pirs: Kesê kor di halê ku ehliyet û zanebûna wî hebe, dikare bi îmamtî li pêşiya însanan nimêj bike?

Bersiv: Kesê kor, dema ehliyet û zanebûna wî ya ji bo nimêjê hebe, di îmamtiya wî ya li pêşiya mirovan tu mehzûrek tune ye. Pêxember (s.a.w) dema biçûna derveyî Medîneyê, ji bo wekîlî û nimêjkirinê, ji sehabeyan 'Ebdullahê kurê Ummî Mektûm yê kor li şûna xwe dihişt. Ji Henefiyan hin zanyar hene ku îmamtiya kesê kor, mekrûh dibînin. Ew, sedemê vî tiştî wiha rave dikin; ji ber ku kesên kor çavên wan nabîne, îhtimala ku kincên wan nepak û paqij bin heye.

Li gori mezhebê Şafiî, di majara îmatiyê de tu ferq di navbera kesên kor û yên bîner de tune ye. Li gorî mezhebên Malikî û Henbelî jî îmamtiya kesên kor caiz e; encax ji ber nîşandana ehemiyetê ji aliyê paqijiyê ve, ên saxlem ango bîner tên tercîhkirin.[946]

Ango korên ku li kincên wan nepaqijiyên ku bibin sedem ji bo neduristbûna nimêjê tune be û ehliyeta wan a ji bo nimêjkirina bi îmamtî hebe, dikarin li pêşiya mirovan nimêjê bikin û tu mehzûrek tê de tune ye.

[945] Fetih, 48/17.
[946] Ahmet Özel, "A'mâ", **DİA**, 1989, II, 554.

683. Ma pîrek dikare serê apê mêrê xwe yê seqet bişo, an na?

Pirs: Cîranekî me, xwest ku ez bipirsim: Apê mêrê wê seqet e û ew lê dinihêrin. Pîrek jî mecbûr e ku serê apê mêrê xwe bişo û kincên wî lê bike. Gelo ev tişt guneh e?

Bersiv: Apê mêrê wê, ji aliyê dînî ve jê re xerîb e. Ji ber vê yekê ne caiz e ku pîrek serê wî bişo û kincên wî lê bike. Ev karên ha, ne pîrek belbî divê mêrê wê bike û pîrek jî bi kar û îhtiyaciyên nexweş ên din re mijûl bibe.

684. Seqetên ku nikarin tu karî bikin, dikarin pereyê xwe di faîzê de bixebitînin?

Pirs: Yekî ku rewşa wî ya madî nebaş e, tu kareke wî ya sabit jî tune ye û ji ber ku seqet e jî nikare tu kar û xebatekê bike, miqdarek pereyê wî heye. Ev kesê ha, gelo ji bo debara jiyana xwe, dikare pereyê xwe bi faîzê di Bankekê de razîne û faîzê bigire?

Bersiv: Di dînê me de faîz, ji bo her misilmanî bi awayekî teqez, hatiye qedexekirin. Seqetî, betalî, fêhmnekirina ji tîcaretê û rewşên mîna wan, faîzê rewa û meşrû nadêrin û nabin sedem ji bo ku mirov faîzê bistîne, bigire.

Xwedê Teala wiha ferman dike:

"Ên ku ribayê dixwin, tevgera wan mîna tevgera kesê ku şeytan ketibe hundirê wî û bi aqlê wî lîstibe. Ev, bi sedem ku dibêjin 'kirîn û firotin jî her wekî selefê ye'. Hal ev e ku Xwedê kirîn û firotin helal kiriye û selef jî heram kiriye. Êdî ji vêga û pê de ji kê re ji cem Xwedayê wî şîretek were û ew dev ji selefê berde, vêca tiştên berê bûne jê re ne û karê wî spareyî Xwedê ye. Kî dîsa li selefê vegere, ha ew ehlê êgir in û heta hetayê dê tê de bimînin.

Xwedê selefê kêm dike û sedeqeyan jî zêde dike. Xwedê ji hemû nankorên gunehkar hez nake.

Bêguman ew ên ku bawerî anîn û karên rind kirin, bi duristî û berdewamî nimêj kirin û zekat dane, ji wan re li cem Perwerdegarê wan xelata wan heye û ne tirs li ser wan heye û ne jî ew xemgîn dibin.

Gelî bawermendan! Ji Xwedê bitirsin. Eger birastî hûn xwedanbawer in ji selefê çi mabe dev jê berdin.

Eger hûn vê nekin bizanin ku; ji aliyê Xwedê û Qasidê wî ve li hemberî we şerekî dijwar heye. Eger hûn poşman bibin, jê vegerin, vêca sermiyanê we her ji we re ye; ne hûn zilmê bikin û bila li we jî zilm neyê kirin."[947]

Eger mirov bi xwe nikaribe pereyê xwe di ticaretê de bixebitîne, bi kesên ku mirov bi wan ewle ye yan jî bi saziyên finansê yên ku faîzê nakin -li ser hevpariya kar û zirarê-, mirov dikare hevpariyên curbicur pêk bîne û pereyê xwe bide xebitandin.

[947] Beqere, 2/275-279.

HEVZAYENDÎ

685. Gelo Îslam li mijara hevzayendiyê çawa dinihêre?

Pirs: Gelo nêrîna dînê Îslamê li hevezayendbaziyê (lîwatayê) çawa ye?

Bersiv: Di Îslamê de hevezayendbazî hatiye qedexekirin. Di Qur'ana Pîroz de hatiye diyarkirin ku gelê Lût Pêxember (s.a.w) hevezayendî kirine û ev karê wan bi rengdêra "fahşîtiyê-karê xerab"[948] hatiye wesifandin. Lût Pêxember, demeke dirêj gelê xwe hişyar dike, da ku dev ji vî karê pîs û xerab berdin. Lê belê wan lê guhnedêrane û karê xwe yê fehşîtiyê dewam kirine. Li ser vê, Xwedayê Mezin jî kevir bi ser wan de barandine û bajarê wan serûbin kiriye.[949]

686. Hukmê jiyana hevzayendiyê -sirf ji aliyê hestî ve- çi ye?

Pirs: Ez merivekî hevezayend im. Ez hevdeh salî me û meyla min li ser mêran e. Lê belê, ez ji malbeteke oldar têm û ez bi xwe jî oldar im. Di vê mijarê de ez bi bijîşkan re şêwirîm û ji min re gotin ku hevezayendiya te naguhere. Di lêkolînên ku min jî kirine de ez fêr bûm ku hevezayendî tiştekî genetik e û di şert û mercên îroyîn ên bijîşkê de nayê guhertin. Lê belê tiştê ez meraq dikim: Eger di temamê emrê xwe de ez bi xwe karibim û nekevim tu têkiliya cinsî gelo ev ji min re dibe guneh? Û eger ez nekevim tu pêwendiya cinsî, sirf ez têkiliyeke hestî bijîm, dibe guneh? Ji niha ve, ez spasiya we dikim. Rica dikim, pêdiviya min bi arikariyê heye. Ez bawer im di vê mijarê de pêdiviya pir însanên ku di rewşa min de jî bi arikariyê heye.

Bersiv: Ji ber ku hûn mêr in, hewl bidin ku mîna mêran tev bigerin. Xwedê Teala têkiliya cinsî ya mêran bi mêran re qedexe kiriye û di derbarê gelê Lût ên ku ev kar dikirin wiha ferman kiriye:

---

[948] E'raf 7/80-81.
[949] Hûd, 11/82.

"Me Lût jî bi qasidî hinart; wî ji gelê xwe re wiha got: "Ma hûn wê pîsîtiya ku tu gelên beriya we nekiriye, dikin?

Hûn jinan dihêlin û bi dilbijênî bi mêran re radizên. Bi rastî hûn civakeke ji serxweveçûyî ne."

Bersiva gelê wî bi tenê ev bû; wan ji welatê xwe derxin. Lewra ew mirovine ku xwe pak didêrin!

Vêca Me Lût û malbata wî rizgar kirin; jina wî ne tê de ew bû ji helakbûyiyên li paş man.

Me baranek bi ser wan de barand. Vêca de binêre ka encama gunehkaran çawa bû!"[950]

Tiştê ji we tê xwestin, heta ji destê we were ku hûn berpirsyariya mêrantiyê ya ku li we hatiye barkirin, bînin cih û ji Xwedê Teala alîkariyê bixwazin. Ji tiştên ku hêza we nagihêjê jî hûn ne berpirsyar in. Ango ji ber ku meyla we li ser jinan tune ye, hûn bi yekê re nezewicin, hûn nakevin bin tu mesûliyetê.

687. Bi şermezarî dinivîsim, ez hevzayend im. Lava dikim alîkariya min bikin?

Pirs: Ez li Elmanyayê dijîm û bavê du zarokan im. Ev heft sal e ku ez zewicandî me û bi şermî dinivîsim, ez hevezayend im. Min kir û nekir ez ji hestên xwe reha nebûm. Meyla min sirf li ser zilaman heye. Ji vê bonê min guneh kirin, tobe jî kir, êdî hew ji destê min tê, ez nikarim tiştekî bikim. Tiştek min dikişîne wê derê. Lê belê, ez pir ditirsim. Lewra herî dawî mirin heye û em ê bi bal Xwedayê Mezin ve vegerin. Di parvekirina derdê xwe bi we re ez bawer im dê feydeyek hebe. Ez bist û heşt salî me. Ez merivekî saf im û dilê min pak e. Eger ev hest bi min re tunebûna, ez ê bibûma merivekî qenc ku bi dînê xwe ve girêdayî. Dibe ku jiyana min a bi hevsera

[950] E'raf 7/80-84.

min re ne zor be, encax jiyana bi wê re tu zewqê jî nade min. Ez di gunehekî pir mezin, rêyeke neder de me. Mixabin ez bûm gey. Min hinekî lêkolîn kir, êdî ez naxwazim vî karî bikim. Vê carê ez pir bi vîn im, ez ê dev ji her tiştî berdim. Guneh û zinayên ku min kirine, min pir didin tirsandin. Di vir de şîretên we li min çi ne? Xwedayê Mezin di derbarê geyan de nabêje çi? Seyda, jiyana bi vê rewşê li min pir giran tê, ez zehmetiyê dikêşim. Alîkariya min bikin, ez li ber salên bi jan û êş bikevim, an jî ku min ewqas guneh kirin, ez li ber wan bikevim? Ez ê çawa û bi çi rûyî biçim cem Xwedayê xwe. Eger ku ne guneh bûna ez ê bi zilamekî re bijayama. Ne nexweşiyek e ku mirov bibêje dê bi dermanan derbas bibe. Însanên wiha divê çi bikin? Lava dikim, alîkariya min bikin.

Bersiv: Birayê me yê birêz,

Tevdên gunehan mîna kişandina cixarê ji mirov re dibin xûy. Şeytanên ji însan û cinan vê xûyê, mîna tiştekî xwezayî û siruştî didin xuyakirin. Tiştê te ji xwe re kiriye xûy, îro li dinyayê pir belav bûye. Dezgehên weşan û çapemeniyê, di hundirê hewldayînekê de ku vî karî mîna ku tiştekî normal be bidin nîşandan. Baweriya bi van propagandayan, li xweşa te jî diçe. Lê belê, ne bi vê, belbî divê tu li gorî fermanên Xwedê bijî û bi gotinên Wî baweriyê bînî. Di ayetên di derbarê gelê Lût ên ku ev kiryar ji xwe re kiribûn xûy, bihizire:

“Lût got: Erê ma ji alemê hûn diçin ba zilaman?

Û ew jinên ku Xwedê ji we re afirandine jî hûn dihêlin. Naxêr, belkî hûn civakeke tixûbbihêr in!

Wan jî got: Ey Lût! Eger tu ji vê (doza xwe) venegerî bêguman em ê te ji nav xwe derxin!

Lût jî got: Bêguman ez ji vê kirina we ya kirêt pir dikeribim.

Xwedayê min! Min û malbata min ji ya ku ew dikin rizgar bike.

Vêca, Me ew û malbata wî tev rizgar kirin.

Ji bilî pîrejinekê; ew di nav ên mayî de ma.

Piştre Me yên din birin helakê.

Me baranek bi ser wan de barand. Vêca barana yên hatibûn hişyarkirin, çi pîs baran bû!

Bêguman di vê de 'îbretek heye, lê pirên wan dîsa bawerî nayinin.

Bêguman Perwerdegarê te, desthilat e, dilovîn e."[951]

"Me Lût jî bi qasidî şand. Ji gelê xwe re got: Digel ku hûn dizanin jî ma hê jî hûn fehşîtiyê dikin?

Ma hûn di şûna jinan de bi şehwetî diçin bal mêran? Naxêr, belkî hûn civakeke cahil in!

Bersiva gelê Lût her ev bû: Malbata Lût ji welatê xwe derxin. Lewra ew mirovine ku xwe paqij didêrin!

Vêca, Me ew û malbata wî rizgar kirin, ji bilî jina wî; lewra Me ew gerand ji yên ku di ezab de man.

Me baranek bi ser wan de barand. Vêca barana yên hatibûn hişyarkirin, çi pîs baran bû!"[952]

"Lût ji gelê xwe re wiha got: Bi rastî hûn fehşîtiyeke wisa dikin ku beriya we ji alemê tu kesî ew nekiriye?

[951] Şu'era, 26/165-175.
[952] Neml, 27/54-58.

Erê ma hûn diçin cem zilaman, hûn rêyan dibirin û di civînên xwe de bêtoretiyê dikin! Bersiva gelê wî tenê ev bû: Eger bi rastî tu rastbêjî, de ka ezabê Xwedê ji bo me bîne!

Lût got: Xwedayê min! Li hemberî vê civaka jirêderketî arîkariya min bike.

Gava ku qasidên Me mizgînî (ya çêbûna kurekî) ji Îbrahîm re anîn (jê re wiha) gotin: Em ê gelê vî welatî (gelê Lût) helak bikin. Lewra gelê wî stemkar in.

Îbrahîm ji qasidan re got: Ma ne Lût tê de ye! Qasidan got: Em bêhtir dizanin ka kî tê de ye. Misoger em ê Lût û malbata wî rizgar bikin, ji bilî jina wî; ew bi yên li paş mane re ye.

Dema qasidên Me hatin cem Lût, ew ji taqet ket û bi hatina wan xemgîn bû. Qasidan jê re gotin: Metirse û xemgîn mebe! Bêguman em ê te û malbata te rizgar bikin, lê belê jina te, ew ê digel yên li paş mayine bimîne.

Em ê, bi sedem jirêderketina wan bi ser xelkê vî welatî de ezabekî (dijwar) ji esmên bînin xwarê.

Sond be, Me ji wî gundî ji bo miletekî ku bifikire nîşaneke aşkere hêştiye."[953]

"Me Lût jî bi qasidî hinart; wî ji gelê xwe re wiha got: "Ma hûn wê pîsîtiya ku tu gelên beriya we nekiriye, dikin?

Hûn jinan dihêlin û bi dilbijênî bi mêran re radizên. Bi rastî hûn civakeke ji serxweveçûyî ne."

Bersiva gelê wî bi tenê ev bû; wan ji welatê xwe derxin. Lewra ew mirovine ku xwe pak didêrin!

[953] 'Enkebût, 29/28-35.

Vêca Me Lût û malbata wî rizgar kirin; jina wî ne tê de ew bû ji helakbûyiyên li paş man.

Me baranek bi ser wan de barand. Vêca de binêre ka encama gunehkaran çawa bû!"[954]

"Dema qasidên Me hatin cem Lût, ew ji taqet ket û bi hatina wan xemgîn bû û got: Ev, rojeke dijwar e.

(Gelê wî) bi lez hatin cem, hê berê jî wan karên kirêt dikirin. Got: Ey gelê min! Ha va ne keçên min, ew ji bo we paqijtir in. Ji Xwedê bitirsin û li pêşberî mêvanên min, min fedîkar nekin! Ma di nav we de zilamekî aqilmend tune ye?

Gotin: (Ey Lût!) Tu dizanî ku tu hewceyiya me bi keçên te tune ye û tu dizanî ku em çi jî dixwazin.

(Lût ji wan re) Got: Xweziya li hember we hêzek min hebûye yan jî min xwe biavêta ber keleheke asê û xurt.

(Firîşteyan wiha) Gotin: Ya Lût! Em qasidên Perwerdegarê te ne. Ew qet nikarin destên xwe bidin te. Di demeke şevê de digel xelkê xwe bi rê kevin. Bila ji we, tu kes li paş xwe venegere. Ji bilî pîreka te. Lewra ew ezabê ku dê bê serê wan, teqez dê bê serê wê jî. Bêguman civanê helaka wan spêde ye, erê ma spêde ne nêzîk e?

Vêca çi dema fermana Me (bi cezadana wan) hat, Me gundê wan serûbinî hev kir û Me kevirên ji heriya pehtî bi ser wan de barandin…

ji cem Xwedayê te ve nîşankirî bûn û ew ji stemkaran jî ne dûr in."[955]

"Gava qasid hatin cem malbata Lût.

[954] E'raf, 7/80-84.
[955] Hûd, 11/77-93.

(Lût ji wan re) Got: Bi rastî hûn civakeke nenas in.

Jê re gotin: Na; em bi wî ezabê ku miletê te di hatina wî de gumandar in, hatine cem te.

Me, rastî ji te re aniye, teqez em rastbêj in.

Jê re gotin: Di wextekî şevê de malbata xwe derîne rê, tu jî li dûv wan here. Zinhar bila ji we, tu kes li paş xwe nenihêre! Herin wî cihê ku fermana we pê hatiye kirin.

Me ji Lût re biryara vî karî ragihand: Ku ew ê di çaxê sibehê de ji binî ve werin qutbirkirin.

Xelkê bajêr hatin û ji kêfxweşiyê mizgînî dane hev.

(Lût ji wan re) Got: Evên ha, mêvanên min in. Zinhar min fedîkar dernexin!

Ji Xwedê bitirsin, min riswa mekin!

Jê re gotin: Erê ma me ji te re negotibû, têkilî karê xelkê me be?

(Lût, ji wan re) Got: Eger hûn dixwazin, va ne keçên min.

Bi jiyana te sond be; ew di nav serxweşiyê de bi sergêjane diçûn û dihatin.

Di çaxê hilhatina rojê de wê qîra dijwar ew hingaftin.

Êdî Me welatê wan serûbinî hev kir û Me bi ser wan de kevirên ji heriya pehtî barandin.

Bêguman di vê de ji bo yên ku 'îbret digirin, nîşan hene.

Kavilên wî welatî, hê jî li ser rêyekê dimînin.

Bêguman di vê de ji bo bawermendan, nîşan hene."[956]

Birayê birêz,

Eger tu tobe bikî, ango bi biryareke teqez vegerî û dev ji van karan berdî, ne sirf tu xwe serast dikî, belbî gunehên ku heta niha te kirine jî dê bi xêran li te vegerin. Lê belê, divê ku tu li ser biryara xwe bisekinî, ji cihên ku ew karên kirêt tên kirin û ji wan ên ku dikin jî xwe dûr bigirî.

Xwedê Teala wiha ferman dike:

"**Çi tiştên di erd û asîmanan de hene her yên Xwedê ne. Ev, da ku (Xwedê) yên nebaşî kirine wan celat bike û yên ku başî jî kirine bi ya herî rind xelat bike. Ew ên ku xwe ji gunehên mezin û (cureyên) fehşîtiyan dûr digirin; gunehên din ne tê de. Bi rastî lêborîna Xwedayê te berfireh e**."[957]

Ev kesên ha bê tu zor û zehmetiyê dê têkevin bihuştê. Xwedayê Mezin wiha ferman dike:

"**Bêguman ew ên ku berê peymana herî rind Me ji bo wan daye, ew ji dojehê dûr in. Ew qîjîna wê jî nabihîzin, di nava nîmetên ku dilê wan bibijê de her û her dimînin. Tirsa mezin jî (ya roja qiyametê) wan xemgîn nake. Firîşte wan pêşwazî dikin (û ji wan re dibêjin:) Ha ev e, ew roja we ya ku peymana wê ji we re hatibû dayîn**."[958]

Kesên digel ku gunehên mezin kirine, lê belê, tobe kiribe û xwe serast kiribe ew jî dikevin vê beşê. Xwedayê Mezin wiha ferman dike:

[956] Hicr, 15/61-77.
[957] Necm, 53/31-32.
[958] Enbiya, 21/101-103.

"Bendeyên Rehman… Ew ên ku digel Xwedê 'îbadetê ji mebûdekî din re nakin û bi neheqî ew canê ku Xwedê (kuştina) wî heram kiriye nakujin û zinayê nakin. Kî ku van bike dê (li axretê) rûbirûyî ceza bibe.

Roja qiyametê ezabê wî dê qat bi qat zêde bibe û bi şerpezeyî her û her dê tê de bimîne. Lê belê yê ku tobe bike, bawerî bîne û karê qenc bike, ew cuda ye. Xwedê gunehên wan bi xêran diguherîne. Xwedê gunehjêbir e, dilovîn e."[959]

688. Herçiqas zor û zehmet bû jî êdî min dev ji gaytiyê berda

Pirs: Seyda, min bersiva pirsa xwe ya di derbarê hevezayendiyê de xwend. Xwedê Teala ji we razî be. Li aliyê din, we pirs û bersiva wê di malpera xwe de parve kiriye. Belbî bala hinekan bikişîne, min jî ev pirs û bersiva wê ji hemû hevalên xwe yên gey re şand. Herçiqas zor û zehmet bû jî min dev ji karê kirêt berda. Min şîretên we, hemû bi cih anîn. Navnîşana xwe ya MSNê girt, karta telefona xwe şikand û min pêwendiyên xwe bi hemû hevalên xwe re birî. Xwedê bê erê, bi derbasbûna demê ez ê hînî vê rewşê bibim. Min dest bi nimêjê jî kir. Seyda, çi gava ez hatim bîra we, ji min re dua bikin. Bi rastî jî we bersiva pirsa min, pir xweş daye. Xweziya hin kesên din ên mîna we zana hebûna, da ku geyan hişyar bikirina! Bi vî awayî, dê pir kesan jiyana xwe ya axretê xelas bikirana. Ya min, ji duakirina ji bo hevalên xwe pê ve tu tiştekî din ji destê min nayê! Di nav wan de însanên pir baş jî hene. Tevdên wan, di serî de li pey evîn û hezkirinê ne, piştre dikevin rêyên nebaş. Careke din ez pir pir spasiya we dikim. Xwedê ji we razî be.

Bersiv: Birayê me yê birêz,

Beriya her tiştî, ji bo vê rêya pîroz û mubarek ku hûn ketinê, em we Pîroz dikin. Xwedê Teala dost û arîkarê we be. Naskirina şaşîtiya karên ku we dikirin û poşmaniya we, nîşana pakîtî û safîbûna dilê we ye.

[959] Furqan, 25/68-70.

Kirina gunehan, însên ji dîn dernaxe. Ya girîng ew e ku mirov bi gunehên xwe bizanibe, ji wan poşman bibe û li ser gunehan israr meke.

Xwedê Teala di derbarê kesên ji gunehên ku berê kirine, poşman bûne û tobe dikin, wiha ferman dike:

"Ew ên ku dema gunehekî mezin î kirêt dikin an jî li xwe zilmê dikin, Xwedê di bîra xwe tînin, vêca ji Xwedê lêborîna gunehên xwe dixwazin. Ji Xwedê pê ve kî dikare gunehan bibexşîne? Ew, bi zanebûn li ser kirinên xwe yên nerind jî rikdarîyê nakin.

Xelata wan li cem Rebbê wan lêborîn e û bihuştên ku di nav wan de çem diherikin û ew heta hetayê tê de dimînin. Xelata xebatkaran çiqas rind e!"[960]

"Ew ên ku bawerî bi ayetên Me tînin, dema bên cem te, ji wan re bibêje: Silav li ser we be, Xwedayê we li ser xwe merhemet misoger kiriye; bêguman ji we, ew kesê bi nezanî nerindiyekê bike, piştî wê tobe bike û xwe rast û durist bike, bêguman Xwedê gunehjêbir e, dilovîn e."[961]

"**Herçî wan ên ku kiryarên nebaş kirin û piştre tobe kirin û bawerî anîn, bêguman Perwerdegarê te piştî wê pir gunehveşêr e, pir dilovîn e**."[962]

"**Paşê, bi rastî Xwedayê te ji bo yên ku bi nezanî guneh kirin, piştî hingê poşman bûn û xwe rast kirin, bêguman Xwedayê te piştî vê helbet gunehjêbir e, dilovîn e**."[963]

"**Bêguman Ez, ji bo wî kesê ku poşman bibe, bawerî bîne û karê qenc bike, paşê di rêya rast re here, pir bexşende û tobepejrên im**."[964]

---

[960] Alî Îmran, 3/135-136.
[961] En'am, 6/54.
[962] E'raf, 7/153.
[963] Nehl, 16/119.
[964] Taha, 20/82.

"Gelî bawermendan! Ji dil û can bi bal Xwedê ve tobe bikin. Hêvî heye ku Rebbê we li gunehên we bibore û we bixe bihuştên ku di nav wan de çem diherikin. Ew roja ku Xwedê, Pêxember û bawermendên digel wî riswa nake..."[965]

Kîjan guneh hatibe kirin bila hatibe kirin, çi dema însan bi rastî tobe bike, Xwedê Teala gunehên wî yên berê, jê dibe. Ev fermana Xwedayê ku em afirandine, me dijîne û gava ecelê me bê, dê me bimirîne û piştre dê me vejîne. Eger bi rastî we ji kirinên jiyana xwe ya li paş maye tobe kiribe, êdî divê hûn wan tune bihesibênin. Niha li pêşiya xwe binihêrin û hesabê ka hûn ê çawa helwestên rast û tekûz derxin holê, bikin.

Niha karê sereke, ku hûn wergera Qur'ana Pîroz hêdî hêdî digel naskirina wateya wê, çend caran bixwînin. Xwendina Qur'anê bê fêhmkirin, tu fêdeyê nade însên. Xwendina ayetekê bi tenê digel fêhmkirinê, ji xwendina pir rûpelên bê mana, bi xêrtir e. Dema hûn ji bo fêrbûna wê hewl bidin, hûn ê bibînin ku Xwedê Teala alîkariya we dike û di demeke kurt de hûn ê pir bi pêş de biçin. Dema hûn dilê xwe ji Qur'anê re vekin, Xwedê Teala jî dê fêhmkirina Qur'anê li ser dilê we veke. Bi vî awayî, hûn ê bi çavên serê xwe bibînin ku divê hûn çi bikin û xwe ji çi biparêzin.

Piştre jiyana Pêxemberê me (s.a.w) hîn bibin, têkoşîna wî, ezm û sebra wî, dê hêz û qawetê bide we.

Di vê navberê de nimêjên xwe bi tekûzî bikin. Dema hûn pênc wext nimêja xwe bikin, dê ev we ji gunehan biparêze û bibe sedem û wesîle ji bo bexşandina gunehên we.

Di dawiyê de em tewsiya dikin ku hûn sohbetên Qur'anê yên ku di navnîşana www.kurandersi.com de ne bişopînin.

Emanetî Xwedê bin.

---

[965] Tehrîm, 66/8.

689. Ez çawa dikarim dev ji hevzayendiyê berdim?

Pirs: Di malpera we de min pirsa hevalekî hevzayend, xwend. Ez bist û çar salî me û bi min jî re heman hest heye. Gelo wî kesî dev ji wî karî berda? Eger berdabe ka çawa dev jê berdaye, ez dixwazim hîn bibim. Ez rica dikim di vê mijarê de bi min re bibin alîkar.

Bersiv: Wî hevalê ku ji me pirsîbû, careke din bi me re nekete pêwendiyê. Lê belê, di peyama xwe ya dawî de sozê ku heta ji destê wî were dê riayeta tiştên ku me di bersiva xwe de aşkere kiribûn bike, dabû.

Ev, karê vîn û biryareke tekûz, karê sebrê ye. Kar, çiqas giran be jî dema însan biryara kirin an jî nekirinê bide, dê serfiraz bibe. Ji bo kesê ku bixebite, ji aliyê Xwedê Teala ve garantiya serkeftin û encamgirtinê, hatiye dayîn. Ew wiha ferman dike:

"**Çi mêr be çi jin, kî karekî qenc bike û bawermend be, teqez Em ê jiyaneke xweş bikin para wî û Em ê xelata wan bi spehîtirîn a ku dikin, bidin wan.**"[966]

"**Ji însên re ji kar û kiryarên wî pê ve tiştekî din jê re nîn e. Bi rastî jî ew ê kar û kiryarê xwe paşê bibîne. Piştre Xweda dê bedêla kar û kiryarên wî bêkêmasî bide wî**."[967]

Eger mîna wan hestan bi we re jî hebin, tiştên ku di wê bersivê de derbas bûn, heman tişt ji we jî re derbas dibin. Hûn bi tenê bixwazin dev jê berdin. Da ku Xwedê Teala ji we re bibe alîkar, dua bikin. Hûn ê bibînin ku hûn serkeftî bûne.

Wekî din jî em tewsiye dikin ku hûn bi bijîşkên pisporê wî karî ne re hevdîtinê pêk bînin û di vê mijarê de ji wan alîkariyê bixwazin. Herçiqas di nava gel û di medyayê de bê gotin ku "tiştên wiha dermankirina wan tune ye, Xwedê wiha afirandiye", ev gotin teqez ne rast in. Eger Xwedê derdek dabe, teqez dermanê wê jî daye. Riwayetek ku ji Pêxemberê me (s.a.w) hatiye ragihandin wiha ye:

[966] Nehl, 16/97.
[967] Necm, 53/39-41.

Li gorî riwayeta Usameyê kurê Şerîk wiha gotiye: Bedewiyan gotin: Ey Qasidê Xwedê! Dema em nexweş dikevin, em serî li rêya tedawiyê bidin? Qasidê Xwedê (s.a.w) got:

"*Belê, tedawî bibin. Gelî bendeyên Xwedê! Tedawî bibin. Lewra ji bo her nexweşiya ku Xwedê ew afirandiye, -ji yekê pê ve- teqez şifaya wê (rêya tedawikirina wê) jî afirandiye*." Li ser vê, dema pirsîn "Ey Qasidê Xwedê! Ew nexweşî kîjan e? " Got**:** "*Kalîtî ye*."[968]

[968] Tirmizî, Tib, 2; Ebû Dawûd, Tib, 1; Îbn Mace, Tib, 1.

ÇAVKANÎ

TEFSÎR:

Alûsî, **Rûhu'l-Meanî.**

Cessas, **Ehkamu'l-Qur'an**, Daru'l-Kitabi'l-Arabî, Beyrût 1335.

Hamdi Yazır, Elmalılı Muhammed, **Hak Dini Kur'an Dili,**

Îbn Kesîr, **Tefsîru'L-Qur'an**, thq: Seyyid Muhemmed Seyyid, Wecih Muhemmed Ehmed, Mustefa Fethi Ebdulhekim, Seyyid Îbrahim Sadiq. Qahire 1426/2005.

Îbnu'l-'Erebî, Muhemmedê kurê 'Ebdullah, **Ehkamu'l-Qur'an**, Darû Îhyai'l-Kutubi'l-'Erebiyye, 1376/1957.

Maturîdî Ebû Mensûr Muhemmedê kurê Muhemmedê, **Te'vîlâtü'l-Kur'ân**, thq: Hatice Boynukalın, Daru'l-Mîzan, Stenbol 2006.

Muqatilê kurê Suleyman, **Tefsîrû Muqatil**, thq: Ehmed Ferîd, Beyrût 1424/2002.

Razî, **et-Tefsîru'l-Kebîr**.

HEDÎS, USÛLU'L-HEDÎS Û TEBEQAT

'Ebdurreûf el-Munawî, **Feydu'l-Qedîr**, çapa 2yem, Beyrût 1972.

'Eclûnî Îsmaîlê kurê Muhemmed, **Keşfu'l-Xefa,** çapa 3yem, Beyrût 1988.

'Eliyyu'l-Qarî, **el-Esraru'l-Merfû'e fi'l-Ehadîsi'l-Mevdû'e (el-Mewdû'atu'l-Kubra)**, thq: Muhemmed Lutfi es-Sebbax, çapa 2yem, Beyrût 1986.

'Eynî, '**Umdetu'l-Qarî**.

'Ezimabadî Muhemmedê kurê Emîr 'Elî, **'Ewnü'l-Ma'bûd.**

Abdullah Aydınlı, **Hadis Istılahları Sözlüğü**, Weşanên Hadisevi, Stenbol 2006.

Ahmed Davudoğlu, **Sahih-i Müslim Tercüme ve Şerhi**.

Beyheqî, **Me'rifetu's-Sunen we'l-Asar**.

Beyheqî, **es-Sunenu'l-Kubra**.

…, **Şu‘ebu’l-Îman**.

Bûsirî, Ehmedê kurê Ebûbekr, **Misbahu’z-Zucace fî Zewaidi İbn Mace**.

Buxarî, Muhemmedê kurê Îsmaîl, **Sehîhu’l-Buxarî.**

Çakan, İsmail Lütfi, **Hadis Edebiyatı**, Weşanên Marmara Üniversitesi İlahiyat Fakültesi, Stenbol 1985.

Darimî, ‘Ebdullahê kurê ‘Ebdurrehman, **Sunenu’n-Darimî (Musnedu’Darimî).**

Deylemî, **Kitabu Firdewsi’l-Exbar**, thq: Fewwaz Ehmed Zumerlî, Muhemmed Mu‘tasim Billah el-Bexdadî, Daru’l-Kitabi’l-‘Arabî, Beyrût 1986.

…, **el-Fîrdews bi Me’surî’l-Xitab,** Beyrût 1986.

Ebû Dawûd, Suleyman kurê Eş‘es, **Sunenu Ebî Dawûd.**

Ehmed kurê Henbel, **Musned.**

Elbanî, Nasiruddîn, **es-Silsiletu’d-Deîfe**.

Fettenî, **Tezkiretu’l-Mewdû‘at**.

Hafiz el-Îraqî, **Texrîcu Ehadîsi’l-Îhya**.

Hakim, **el-Mustedrek**.

Heysemî ‘Eliyê kurê Ebubekir, **Mecme‘u’z-Zewaid**, Daru’l-Kutubi’l-Ilmiyye, Beyrût 1988.

Îbn ‘Ediy, **el-Kamil fî Du‘afai’r-Rical**, Daru’l-Fikr, Beyrût 1998/1409.

Îbn Hecer Ehmed kurê ‘Elî, **ed-Diraye fî Texrîci Ehadîsi’l-Hîdaye**.

…, **Fethul-Barî Şerhû Sehîhi’l-Buxarî.**

.., **Bulûxu’l-Meram.**,

…, **et-Telxîsu’l-Xebîr.**

…, **Lisanu’l-Mîzan**, Muessesetu’l-‘Ilmiyye li’l-Matbû‘at, Beyrût 1986/1406.

Îbn Mace, Muhemmedê kurê Yezîd, **Sunenu Îbn Mace.**

Îbnu'l-Cewzî, Ebu'l-Ferec 'Ebdurrehmanê kurê 'Elî, **el-'Ilelu'l-Mutenahiye**, Daru'l-Kutubi'l-'Ilmiyye, Beyrût 1403. Herwiha çapa Pakîstan 1981.

…, **Kitabu'l-Mewdû'at mine'l-Ehadîsi'l-Merfû'at,** thq: Tewfîq Hamdan, çapa 2yem, Daru'l-Kutubi'l-Ilmiyye, Beyrût 2003.

…, **et-Tehqîq.**

Îbnu'l-Qettan, **Beyanu'l-Wehm we'l-Îlhami'l-Waqi'eyn fî Kitabi'l-Ehkam,**

Kinanî, Ebu'l-Hasen 'Elîyê kurê Muhemmedê kurê Arrak, **Tenzîhu'ş-Şerî'ati'l-Merfû'e 'ani'l-Exbari'ş-Şenî'ati'l-Mewdû'e**, thq: Ebdulwehhabê kurê Ebdulletîf, Ebdullah Muhemmed es-Siddîq, çapa 2yem, Daru'l-Kutubi'l-Îlmiyye, Beyrût 1981.

Malik, Malik kurê Enes, **Muwetta.**

Mizzî, **Tuhfetu'l-Eşraf**.

Mubarekfûrî, **Tuhfetu'l-Ehwezî,** Qahire 2001.

Muslim, Muslimên kurê el-Heccac, **Sehîhu Muslim.**

Necati Yeniel, Hüseyin Kayapınar (amd), **Sünen-i Ebu Davud Terceme ve Şerhi**, Weşanxana Şamil, Stenbol 1989.

Nesaî, Ehmedê kurê Şu'yb, **Sunenu'n-Nesaî.**

Newewî, **Şerhû Sahîhi Muslim**.

Qandehlewî, Muhemmed Zekeriyayê kurê Yehya, **Bezlu'l-Mechûd**, Beyrût bê mêjû.

Sexewî, Muhemmedê kurê Ebdurrehman, **el-Meqasidu'l-Hesene**, thq: Muhemmed Osman el-Huşt, çapa 4em, Beyrût 2002.

Seyyid Sabiq, **Fiqhu's-Sunne**, çapa 12em, Muessesetu'r-Risale, Beyrût 1996.

Subhî es-Salih, Hadis İlimleri ve Hadis Istılahları, wergêr: M. Yaşar Kandemir, çapa 4em, Weşanxane Enqere 1986,

Subkî, Mehmûd Muhemmed Xettab, **el-Menhelu'l-'Ezib Şerhû Sunenî Ebî Dawûd**,

Suyûtî, **el-Leali'l-Masnû'e**.

Şewkani, Muhemmedê kurê 'Elî, **el-Fewaidu'l-Mecmû'e fi'l-Ehadîsi'l-Mewdû'e**, thq: Ebdurrehman el-Mu'allimî, çapa 2yem, Beyrût 1392.

Taberanî, **el-Mu'cemu'l-Ewset**.

Tirmizî, Ebû Îsa Muhemmed, **Sunenu Tirmizî.**

Xelîl Ehmed es-Seharenfûrî, **Bezlu'l-Mechûd fî Helli Ebî Dawûd,** Beyrût b.m.

Xettabî, **Mealimu's-Sunen** (Çapa bi Sunena Ebû Dawûd re).

Zehebî, Muhemmedê kurê Ehmed, **Mîzanu'l-I'tidal**,

…, **Telxîsu Kitabi'l-Mewdû'at.**

…, **Siyeru E'lami'n-Nubela**, çapa 4em.

Zeyle'î, 'Ebdullahê kurê Yûsuf, **Nasbu'r-Raye li Ehadîsi'l-Hîdaye**.

FIQIH Û USÛLU'L-FIQIH:

Apaydın, H. Yunus, **Diyanet İlmihal: II, İslam Ve Toplum.**

Bilmen, Ömer Nasuhi, **Büyük İslam İlmihali**, Stenbol 1986.

…, **Hukukı İslamiyye ve Istılahatı Fıkhiyye Kamusu**, Stenbol 1985 û herwiha çapa Stenbol l967.

'Ebdulhemîd Şîrwanî, Îbn Qasim Şîhabuddîn Ehmedê kurê Qasim el-'Abbadi, **Hawaşî 'ala Tuhfeti'l-Muhtac bi-Şerhi'l-Minhac**, el-Mektebetu'l-Îslamiyye, Stenbol.

Günenç, Halil, **Büyük Şafii İlmihali,** çapa 2yem, Weşanên Hilal.

Îbn Abidîn Ehmedê kurê 'Ebdulxenê,, **Reddu'l-Muxtar**, Stenbol 1984. Herwiha çapa Stenbol 1307an û çapa Matbaa-i Amire.

Îbn Hecer el-Heysemî, **Tuhfetul-Muhtac bi Şerhîl-Minhac**.

Îbn Nuceym. Zeynuddînê kurê Îbrahim, **el-Behru'r-Raiq**.

Îbn Qeyyim el-Cewzî, Î**'lamu'l-Muweqqi'în**, Beyrût 1986.

Îbn Qudame, 'Ebullahê kurê Ehmed, **el-Muxnî**,

Îbn Teymiye, **Mecmû'u'l-Fetawa.**

Îbnu'l-Humam, Kemaluddîn Muhemmed, **Şerhû Fethi'l-Qedîr**, Beyrût.

Kasanî, Ebûbekrê kurê Mesûd **Bedaiu's-Sanai' fi Tertibi'ş-Şerai'**.

Merxînanî, 'Elî kurê Ebûbekrê **el-Hîdaye Şerhû Bidayetî'l-Mubtedî**, Stenbol 1985. Herwiha çapa Weşanên Kahraman, Stenbol 1986.

Mewsillî, 'Ebdullahê kurê Mehmûdê kurê Mewdûd, **el-Ixtiyar**, Beyrût 1395/1975.

Newewî, Yehyayê kurê Şeref, **el-Mecmû' Şerhu'l-Muhezzeb li'ş-Şîrazî**.

Reşîd Riza, **Fetawa**.

Sehnûn, 'Ebdusselamê kurê Se'îd, **el-Mudewwenetu'l-Kubra**.

Serexsî, Şemsuddîn Muhemmedê kurê Ehmedê, **el-Mebsût**.

…, **Usûl**.

Suyûtî, **el-Hawî li'l-Fetwa**, Daru'l-Kutubi'l-'Ilmiyye, Beyrût 2000.

Şafiî, Muhemmedê kurê Îdris, **el-Umm**.

Wehbe ez-Zuheylî, **el-Fiqhu'l-Îslamî we Edilletuh**, çapa 3yem, Dimeşq 1409/1989.

Xemrawî, Muhemmed ez-Zuhrî, **Enwaru'l-Mesalik Şerhu 'Umdeti's-Salik we 'Iddeti'n-Nasik**, çapa 1em, Muessesetu'l-Kutubi's-Seqafiyye, Beyrût 2006.

Xereşî, Muhemmedê kurê 'Ebdullah, **Şerhû Muxteseri Xelîl**.

Xetîb eş-Şirbînî, Muhemmedê kurê Ehmed, **Muxnî'l-Muhtac**.

Yalovalı Ali Murteza (ed), **İlaveli Mecmua-i Cedîde**, Stenbol 1326-1329.

Zekiyyuddîn Şa'ban, **İslam Hukuk İlminin Esasları (Usûlü'l-Fıkh)**, wergêr: İbrahim Kafi Dönmez, TDVY, Enqere 1996.

Zihni Efendi, Mehmet, **Nimet-i Îslam**.

MUXTELIF

Affane, Hüsameddin, **Fıkhî ve Ahlâkî Yönleriyle İslam'da Ticaret**, wergêr: Servet Bayındır, Weşanên Polen, Stenbol 2007

Bayındır, Abdülaziz, **Kur'an Işığında Doğru Bildiğimiz Yanlışlar,** çapa 3yem, Weşanên Weqfa Suleymaniye, Stenbol 2007.

..., **Ticaret ve Faiz**, Weşanên Weqfa Suleymaniye, Stenbol 2007.

…, **İslâm Muhâkeme Hukûku (Osmanlı Devri Uygulaması)**, Weşanên Weqfa Suleymaniyeyê, Stenbol 1437/2015.

…, **Kur'an Işığında Tarikatçılığa Bakış**, Weşanên Weqfa Suleymaniyê, Stenbol 2007.

Ebû Zehra, **el-Cerîme we'l-'Uqûbe fi'l-Fiqhi'l-Îslamî.**

Ebu'l-Îzz ed-Dimeşqî, 'Elîyê kurê Muhemmedê, **Şerhu'l-'Aqîdeti't-Tehawiyye,** Beyrût 1408/1988.

el-Qasimî, Cemaluddîn, **Îslahu'l-Mesacid.**

Hamidullah**,** Muhammed, **Hazreti Peygamberin Savaşları,** çapa 4em, Weşanên Yağmur, Stenbol 1991.

…, **İslam Peygamberi**.

Îbn Faris, **Mu'cemu Meqayisu'l-Luxe.**

Îbn Hîşam, **Sîretû Îbn Hişam.**

Îbn Manzûr, Cemaluddîn Muhemmedê kurê Mukerrem, **Lisanu'l-Ereb**.

İbrahim Hakkı, Erzurumlu, **Marifetname**, sadekirina ji Osmanî: Faruk Meyan, Weşanên Bedir, Stenbol 1980.

Öz, Mustafa, (wergêr) "**el-Âlim ve'l-Müteallim**", (İmam-ı Azam'ın Beş Eseri), çapa 2yem, Weşanên İFAV, Stenbol 1992.

Pamir, Dominik, (wergêr) **Katolik Kilisesi Din Ve Ahlak İlkeleri**, Stenbol 2000.

Raxib el-Isfahanî, **el-Mufredat**, thq: Safwan ‘Adnan Dawûdî, Dimeşq û Beyrût. 1412/1992.

Yıldırım, Ahmet, **TasavvufunTemel Öğretilerinin Hadislerdeki Dayanakları,** Weşanên TDV, Enqere 2000.

Zaim, Sabahaddin, **Türkiye'de Nüfus Meselesi.**

TEZ Û GOTAR:

Bayındır, Servet, “Din ve Ülke Farklılığının Faizin Hükmüne Etkisi”, **İstanbul Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Dergisi**, 2006, jimar: 14.

Bayraktar, Zeki, “Oruçlu Hastalar İçin Bazı Tıbbi Öneriler”, **Kitap ve Hikmet Dergisi**/Kovara Kitab û Hikmetê, Temmuz-Eylül/Tîrmeh-Rezber 2015, jimar: 10.

Çolak, Ali, “Ölmek Üzere Olan Kişiye ve Mezardaki Ölüye Yapılan Telkin ile İlgili Rivayetler”, **Çukurova Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Dergisi**, 2004, c. 4, jimar. 2.

Heyet, **el-Lecnetu’d-Daime**, VII, 263, jimara fetwayê: 13376.

İbrahim Işık, **Din ve Bilim Açısından Uyuma Vakitleri,** Tefekkür Dergisi, sal: 2006, jimar: 8.

Karataş, Mustafa, **Rivayet Tekniği Açısından Hadislerin Artması ve Sayısı**, teza doktorayê ya neçapbûyî, Stenbol 1998.

Özel, Mustafa, “Ölünün Ardından Kur’an-ı Kerim Okunmasının Dini Dayanakları”, **İslam Hukuku Araştırmaları Dergisi**, jimar: 7, Nisan 2006.

Paksoy, Kadir, “Sa’lebe Kıssasıyla İlgili Rivayet Üzerine Sened ve Metin Esaslı Tahliller“, **Yeni Ümit Dergisi**, jimar: 70, 2005.

Şenol, Yahya, “Fetvalar”, **Kitap ve Hikmet Dergisi**/Kovara Kitab û Hikmetê, Rêbendan-Adar 2015, sal: 2, jimar: 8.

Tırabzon, Abdullah, **Hac İbadetinde Yasak Davranışlar**, teza doktorayê ya neçapbûyî (İstanbul Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü), Stenbol 2008.

Uzunpostalcı, Mustafa, "İslâm Hukukunda Ehliyeti Daraltan veya Ortadan Kaldıran Sebepler", **İslam Hukuku Araştırmaları Dergisi**, sal: 2007, .jimar: 9.

Yeniay, Adnan, Cevşen Duasının Hadis İlmi Açısından Kritiği, **Cumhuriyet Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Sosyal Bilimler Enstitüsü**, teza lîsansa bilind, 2008, Şêwirmend: Enbiya Yıldırım.

BENDÊN ANSÎKLOPEDÎYÊ:

Atar, Fahrettin, "Haciz", **DİA,** 1996.

Besalel, Yusuf, "Kapara-Kaparot", **Yahudi Ansiklopedisi,** Gözlem Gazetecilik.

Bardakoğlu, Ali, "Had", **DİA,** 1996.

…, "Iskat", **DİA**, 1999.

Çeker, Orhan, "Halvet", **DİA**, 1997.

Çelebi, İlyas, "Vefk", **DİA**, 2012.

Çelik, Ali, "Nuaym b. Hammâd", **DİA**, 2007.

Döndüren, Hamdi, "Âkıl" **DİA** 1989.

Erul, Bünyamin, "Keşfü'l-Hafa", **DİA**, 2002.

Kandemir, M. Yaşar, "en-Nesâî", **DİA,** 2006.

Karaman, Hayreddin, "Cuma", **DİA,** 1993.

Ocak, Ahmet Yaşar, "Hıdrellez", **DİA,** 1998.

Öğüt, Salim, "İstihâre", **DİA,** 2001, 2001.

Özel, Ahmet, "A'mâ", **DİA,** 1989.

Şener, Abdulkadir, "Abdest" **DİA,** 1988.

Şener, Mehmet, "Heyz", **İslam'da İnanç İbadet Ve Günlük Yaşayış Ansiklopedisi**, Redaktor û Şêwirmendî: İbrahim Kâfi Dönmez, Stenbol 1997.

Topaloğlu, Bekir, "Esmâ-i Hüsnâ," **DİA,** 1995.

…, "Rab", **DİA,** 2007.

Toprak, Mehmet, "Cevşen", **DİA,** 1993.

Uludağ, Süleyman, "Keşf", **DİA,** 2002.

Uzunpostalcı, Mustafa, "Defin", **DİA**, 1994.

Ünal, Sadettin, "Kâbe", **DİA**, 2001.

Yaşaroğlu, M. Kamil, "Safer", **DİA**, 2008.

Yavuz, Yunus Vehbi, "Hayız", **DİA,** 1998.

Yavuz, Yusuf Şevki, "Âşûrâ", **DİA,** 1991.

Yılmaz, Hayati, "Reyhâne bint Şem'ûn", **DİA**, 2008.

Yurdagür, Metin, "Ehl-i Kıble", **DİA**, 1994.